T.C. KÜLTÜR VE TURİZM
BAKANLIĞI
KÜTÜPHANELER VE YAYIMLAR GENEL MÜDÜRLÜĞÜ

DESTANA SEYFULMİLÛK Û BEDÎULCEMAL
SEYFÜ'L-MÜLÛK VE BEDİÜ'L-CEMÂL DESTANI

Hazırlayan, Çeviren ve Notlandıran
Bedirhan İpek

T.C. KÜLTÜR VE TURİZM BAKANLIĞI

© KÜTÜPHANELER VE YAYIMLAR GENEL MÜDÜRLÜĞÜ
3707

KÜLTÜR ESERLERİ DİZİSİ
643

ISBN: 978-975-17-4974-1

Genel ağ: www.ktb.gov.tr
e-posta: yaphaz@ktb.gov.tr

Hazırlayan, Çeviren ve Notlandıran
Bedirhan İpek

Redaksiyon
Ali Karadeniz

Yapım
Ajans Düş Pınarı
Birlik Mah. 465. Cad. No: 1/5 Çankaya/Ankara
bilgi@duspinari.com
www.duspinari.com
Grafik Tasarım: Pınar Coşgun

Baskı
MRK Baskı Ve Tanıtım Hizmetleri
Ağaç İşleri Sanayi Sitesi 1357 Sokak No: 43 Yenimahalle/Ankara
www.mrkbaski.com
Ser. No: 47955

Baskı Yeri ve Tarihi: Ankara, 2021

Baskı Adedi: 2.000

Siyahpûş

Seyfü'l-Mülûk ve Bediü'l Cemâl destanı=Destana Seyfulmilûk û Bedîulcemal/Siyahpûş; Hazırlayan Çeviren ve Notlandıran Bedirhan İpek.— Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı, 2021.

440 s.; 24 cm.— (Kültür ve Turizm Bakanlığı yayınları; 3707, Kültür Eserleri dizisi; 643)

ISBN: 978-975-17-4974-1

1. Diğer Çağdaş İran Edebiyatı, Kürt. I. Seyfü'l-Mülûk ve Bediü'l Cemâl destanı. II. Destana Seyfulmilûk û Bedîulcemal III. Muhammed Cevâd Siyahpûş IV. İpek, Bedirhan. V. Seriler

891.59





ÖN SÖZ

Sanat eserleri bir yandan insanlarda düşünce ve hayal gücünün geniş ve kuşatıcı bir seviyeye ulaşmasına bir yandan da aynı medeniyet ve topluma mensup fertlerde ortak bir duygunun oluşmasına ve benzer bakışın şekillenmesine katkıda bulunur.

Bugüne kadar bu topraklar üzerinde yükselen medeniyetlerde yetişen sanatkârlar, birbirinden değerli pek çok eser kaleme almıştır. Bu eserler kültürümüzün köklü ve zengin mazisine şahitlik eden birer gösterge olarak yerlerini koruyor. Kültürel varlıklarımızı meydana getiren bu değerleri gün yüzüne çıkarmak ve onları insanlarımıza ulaştırmak söz konusu zenginliğimizin bilinmesine yapacağı katkı bakımından büyük anlam ifade ediyor. *Seyfül Mülûk ve Bediü'l Cemal Destanı*, bugüne kadar Türkçe ve diğer birçok dilin yanı sıra Kürtçe olarak da kaleme alınmış bir hikâyedir. On dokuzuncu yüzyılda yazılmış olan bu değerli eseri Kürtçe Klasikler dizisinin bir halkası olarak insanlarımızın istifadesine sunuyoruz.

Medeniyetimizin havzasında geliştirilmiş bu hikâyenin bütün dillerde uyandırdığı duygu ve kazandırdığı bakış açısı ortak bir sonuç meydana getiriyor. Bu değerli eserin Türkçeye çevirilmesinde ve Kürtçe metniyle birlikte hazırlanarak edebiyatseverlere sunulmasında katkısı bulunan herkese teşekkür ediyorum.

Mehmet Nuri ERSOY
Türkiye Cumhuriyeti
Kültür ve Turizm Bakanı



SUNUŞ

Elinizdeki eserin yazarı Siyahpûş, öteden beri şiir ve gazelleri söylenmekle birlikte ortada herhangi bir eseri olmadığı için doğal olarak yoğun ilgi görmemişti. *Seyfü'l-mülûk ve Bediü'l-cemâl Destanı* eserinin bulunmasıyla birlikte adı edebiyat meraklılarının ve şiir severlerin arasında yayılmıştır. Öte yandan edebiyat araştırmacıları *Seyfü'l-mülûk ve Bediü'l-cemâl Destanı*'nın farklı nüshalarını ve şaire ait başka eserlerin olup olmadığını bulmak için araştırmalar yapmıştır. Bu araştırmalar neticesinde, Siyahpûş'a ait farklı bir esere rastlanılmasa da *Seyfü'l-mülûk ve Bediü'l-cemâl Destanı*'nın farklı beş el yazma nüshası ortaya çıkmıştır. Bunlardan biri benim Şanlıurfa'da, Hattat Mehmet Ali Caduk Bey'in arşivinde bulduğum ve tercümede esas aldığım Molla Muhyeddin nüshasıdır. Mehmet Ali Bey, araştırmacı Abdülkadir Badıllı'dan aldığı bu nüshanın bir kopyasını almama müsaade etti. Bu vesileyle Hattat Mehmet Ali Caduk'u minnetle anarken, değerli ilim ve araştırma adamı merhum Abdülkadir Badıllı'yı da rahmetle anıyorum.

Belirtildiği üzere, günümüzde bu eserin beş farklı el yazması bulunuyor. Ne yazık ki bu nüshalardan hangisinin müellif nüshası olduğunu bilmek zor. Çünkü bunun anlaşılmasına yardımcı olacak bir ifadeye veya açık bir imzaya rastlanmıyor. Aynı zamanda bu nüshaların hiçbirinde Siyahpûş hakkında bir bilginin yer almaması insanı hayıflandıran diğer bir noktadır. Siyahpûş'a dair var olanlar ya birbirinin tekrarı ya da birbiriyle çelişen bilgilerdir. Kürt edebiyatı çalışmalarında kaynak teşkil eden eserler veren Qanatê Kurdo veya Celilê Celîl'in araştırmalarında da Siyahpûş'un hayatıyla ilgili tatminkâr bir bilgiye rastlanılmıyor. Denilebilir ki ona dair en sağlıklı bilgiler yine bu destanın satır aralarından elde edilenlerdir. Bu bilgi kırıntılarından ve destanının satır aralarından yola çıkarak, Siyahpûş'la ilgili bazı kanaatler edinmeye çalışacağız.

Gerek *Seyfü'l-mülûk ve Bediü'l-cemâl Destanı*'ndan gerekse Siyahpûş hakkındaki araştırmalardan anladığımız, "Siyahpûş" ifadesinin

"mahlas" bir isim olup şairin asıl isminin "Muhammed" olduğudur. Bunu destanın 468. beytinde açıkça görmekteyiz. Söz konusu beyitte, Şair, Cenab-ı Hakka yalvarırken şöyle demektedir:

"Aydınlat rahmetinle, beni ey ulu Rabbim,

Muhammed'in kalbini, marifet nurlarıyla."

Bu bilgiye ilaveten, alim ve araştırmacı Baba Merduh Ruhanî, Siyahpûş'un tam isminin "Muhammed Cevâd" olduğunu söylemektedir. Kürt meşhurlarını konu edinen çalışmasında, "Muhammed Cevâd Siyahpûş" başlığı altında, onun bilge bir edip, yetenekli bir şair olduğunu, Bağdat'ta yaşadığını, Mevlâna Halid-i Bağdadî'ye sıkı sıkıya bağlı olduğunu, Halid'in 1827'de vefatı üzerine, ona dair 70 beyitlik bir mersiye yazdığını ve Siyahpûş'un kendisinin de Bağdat'ta 1831'de vefat ettiğini söyler.[1] Bahsi geçen mersiyenin 25. beytinde, şair kendini "Cevâd" ismiyle tanıtmıştır. Söz konusu beytin Türkçesi aşağıdaki gibidir:

"Ağıt yakmakta ustayım ben,

Bu hususta, ben Cevad'a ulaşamaz kimse."[2]

Baba Merduh'un verdiği bu bilgiden, Siyahpûş'un vefatının, şeyhi Mevlâna Halid'den 4 yıl sonra gerçekleştiğini anlıyoruz. Bu durumda, doğum tarihi bilinirse, kaç yaşında vefat ettiği de anlaşılmış olur. Bununla ilgili olarak, araştırmacı yazar Seyyid Kâfi Alevî şöyle demektedir: "Siyahpûş, 1774'te Urmiye'de doğmuştur. Henüz 19 yaşında iken İran'dan ayrılıp Bağdat'a yerleşmiştir. 30 yaşında iken, *Seyfü'l-mülûk ve Bediü'l-cemâl* eserini yazmıştır. 58 yaşında iken Bağdat'ta vefat etmiştir."[3]

---

1 Baba Merduh Rûhanî, "Tarih-i Meşahir-i Kürd", c. 1, s. 328-329, 2. baskı, Tahran 1382

2 age. s. 329

3 Seyid Kâfî 'Elewî," Sîyahpoş û Çêrista Wî" (Siyahpûş ve Hikâyesi), *Ria Taza*, s. 12, Ocak 2017 ve s. 13, Ocak 2017 (İlgili link için bkz. https://krd.riataza.com/2017/01/12/siyahpos-u-cerista-wi-1/ ve https://krd.riataza.com/2017/01/13/siyahpos-u-cerista-wi-2/)

Siyahpûş'un İran asıllı olduğuna dair belki de en doğru bilgi, *Seyfülmülûk ve Bediülcemal Destanı*'nda yer alan 2 ve 3 nolu gazellerin son beyitlerinde geçmektedir:

"Hoş şaraptan içtik bir bardak, ay yüzlülerinin elinden
Ve geride bırakıp İran'ı, çevirdim yönümü Bağdat'a" (Gazel-2)

"Mumun işi hep yanmaktır hem sevgidir hem yakmaktır
Ondandır ki yakıyorlar İranlı'yı, tıpkı kelebek misali" (Gazel-3)

Görüldüğü gibi, Siyahpûş bizzat kendisi İranlı olduğunu ve burayı terk ederek Bağdat'a yöneldiğini söylüyor. Bu durumda, Baba Merduh ile Alevî'nin tezlerinin isabetli, onu Diyarbakır ya da bir başka yerle irtibatlandıranların tezlerinin ise isabetsiz olduğu ortadadır. Bu hususta bir başka not ise, Hadi Bidekî'ye ait Farsça bir makaledir. Bidekî, makalesinde der ki, "İran'da, 12. yüzyılda (hicrî-kamerî tarihle) yazılmış bir *Seyfülmülûk ve Bediülcemal* manzumesi vardır. Kürtçe olan bu eserin yazarı, Mirza Şefiî Kilyayî-i Kermanşahî'dir."[4] Bu bilgide her ne kadar farklı bir şairden bahsediliyorsa da aynı isimde bir eserin zikri dikkate değerdir. Denilebilir ki, Kermanşahî'nin Soran/Hewramî lehçesiyle kaleme aldığı manzumenin, Siyahpûş, aynı isimle fakat Kurmancî lehçesiyle naziresini yazmıştır.

İfadelerinden, seyyah olduğu açık olan Siyahpûş, Urmuye-Bağdat güzergâhında Diyarbakır Silvan'a da gelmiş olabilir; ancak bu, onun Silvanlı olduğuna delalet etmez. Bağdat'a gitmesi onun Mevlâna Halid'e mensubiyetiyle ilişkilendirilebilir. Destanının birçok yerinde Nakşî tarikatına dair kullandığı argümanlar (Nüfus-u Seb'a, Nefs-i Emmare, Lewwame, Mülheme, Kabz-Bast, Sırr-ı Vahdet, Nur-i Kudsî vb.) onun Nakşiliğine dair kuvvetli delillerdir. Şehrezorlu Mevlâna Halid'in vefatı üzerine yazdığı övgülü mersiye, bu mensubiyeti teyit eden en açık belgelerdendir.

---

[4] Bkz. Kütüphane-yi Meclis-i Şurâ-yı İslamî, Tahran: Kayıt no: 1/17299, Hat: Nesta'lik, Müstensih: Mahmud Muhammedi, Tarih: HK. 1359/1940-1360/1941, Varak: 2-133, Satır sayısı: 12, Giriş: Farklı (Fihrist-i Nüsheha-yı Hatt-ı Kütüphane-yi Meclis-i Şurâ-yı İslamî, 47/130-131) ile eşleşmektedir.)

Siyahpûş'un eğitim durumu net olmamakla birlikte, kitabının satır aralarından, onun medreseden mezun (icazetli) olduğu anlaşılmaktadır.[5] Anadilinin yanında, Türkçe, Arapça ve Farsçayı da bildiğini, yine *Seyfülmülûk ve Bediülcemal Destanı*'ndan anlıyoruz. Ayrıca, aynı eserinde işaret ettiği tefsir, hadis, fıkıh, akait, kelam, beyan, tasavvuf, sarf, nahiv, mantık, bedi', astronomi ve astroloji gibi ilimlerde de vukufiyet sahibi olduğu açıktır.

Bedirhan İPEK

[5] Bu hususta, bir örnek olarak 444-448 aralığındaki beyitlere bakılabilir. Bu beyitlerden ve destanının genelinden, Siyahpûş'un medreselerde takip edilen sıralı ilimleri tahsil ettiği ve "molla" payesine sahip olduğu anlaşılıyor.

İçindekiler

5 | Ön Söz

7 | Sunuş

13 | *Seyfü'l-Mülûk ve Bediü'l-Cemâl Destanı* Hakkında

17 | Çeviri Hakkında

19 | Siyahpoş Destana Seyfulmilûk û Bedîulcemal / Siyahpûş Seyfü'l-Mülûk ve Bediü'l- Cemâl Destanı

423 | Paşbend / Ekler

434 | Yararlanılan Kaynaklar

435 | Destana Seyfulmilûk û Bedîulcemal / Seyfü'l-Mülûk ve Bediü'l- Cemâl Destanı Yazmalarından Örnekler



SEYFÜ'L-MÜLÛK VE BEDİÜ'L-CEMÂL

DESTANI HAKKINDA



SEYFÜ'L-MÜLÛK VE BEDİÜ'L-CEMÂL DESTANI HAKKINDA

Uzun yıllardan beri Siyahpûş'un kaside ve gazelleri medreselerde ve halk arasında okunurdu[1], ancak elde herhangi bir kitabı mevcut değildi. Şiir ve edebiyat meraklılarının yıllarca sürdürdükleri arama ve taramalardan sonra nihayet *Seyfü'l-mülûk ve Bediü'l-cemâl* eserine ulaşılmıştır. Elinizdeki eser, bu samimi arayışın meyvelerinden biridir. Kısa aralıklarla aynı kitabın el yazma beş nüshasına ulaşmak, şiir ve edebiyat çevreleri için çok önemli bir gelişmedir. Şahsi gayretimiz bir yana, değerli yazar ve araştırmacı Celili Celil'in bu konudaki gayreti takdire şayandır. Celil Bey destanın dört ayrı el yazmasına ulaşmış;[2] bunlardan en muteber gördüğü Molla Ahmed'in nüshasını Latinize ederek edebiyat dünyasına armağan etmiştir. Böylece bulduğumuz nüshayla birlikte, bu eserin el yazma nüsha sayısı beşe ulaşmıştır. Sonradan merhum Zeynelabidin Çiçek'in, istinsah ettiği nüshayla birlikte bu sayı altıya çıktı. Ne var ki bulunanların içinde Siyahpûş'un kendi asıl nüshası tespit edilmiş değil.

Seyfü'l-mülûk ve Bediü'l-cemâl Destanı'nın kaynağı, bilindiği üzere Bin *Bir Gece Masalları*'dır.[3] Ancak Siyahpûş, bu masalı farklı bir formda ele almış, ona ayrı bir zenginlik ve güzellik katmıştır. Bu farklılıklardan birincisi, eserin Kürtçe yazılmasıdır. İkincisi, nesir olan masalın nazımlı (şiirsel) hâle getirilmesidir. Üçüncüsü, muhtasar (kısa) olan masalın mufassal (uzun) bir destana çevirilmesidir.[4] Dördüncüsü, destanın akışı içinde, destanla ilişkili 13 gazelin serpiştirilmesidir. Be-

---

1 Örnek olarak Diyarbakırlı Hafız Menduh'un Siyahpûş'tan okuduğu kasideye bakılabilir.

2 Bkz. Celîlê Celîl, Siyahpûş, *Seyfulmuluk*, s. 6, Wen, 2000

3 Bkz. Selami Münir Yurdatapan, *Bin Bir Gece Masalları*, Elips Kitap, 10. Baskı, Eylül 2008 (Çeviride, *Bediatülcemal ile Seyfülmülûk Masalı* 919 nolu masaldır.)

4 Bu hususta Selami Münir Yurdatapan'ın *Bin Bir Gece Masalları* çevirisine bakılabilir. Söz konusu çeviride, 716-762. sayfalar arasında yer alan *Bediatülcemal ile Seyfülmülûk Masalı* toplamda 46 sayfayı bulurken, Siyahpûş'un çalışması, 332 sayfadır.

şincisi, masalın orijinalinde bulunan bazı karakterlerin yerinin değiştirilmesidir.[5]

Şüphesiz bu destansı masalın birçok dilde yazılmış onlarca varyantı bulunmaktadır. Bunlardan biri Türkçe olarak Tülay Çulha'nın "Kırım Karay" diliyle İbrani alfabesinden çevirdiği 1888 tarihli *Seyfü'l-mülûk ile Bediü'l-cemâl Hikâyesi* adlı çalışmadır. Türk Tarih Kurumu Kütüphanesinde, 30880 nolu kayıtla bulunan Osmanlıca *Seyfü'l-mülûk, Asım Safvan Hikâyesi* nüshası.[6] F. V. Ahmedova'nın üzerinde çalıştığı Kazan Tatarlarına ait *Seyfü'l-mülûk* çalışması. Süleymaniye Kütüphanesinde, 3718 numarayla kayıtlı bulunan Osmanlıca *Hikâyet-i Bağ-ı İrem ve Bediü'l-cemâl ve Seyfü'l-mülûk* eseri (Tez çalışması olarak Latinize eden Nesrin Tanbaşı). Keza Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Kütüphanesinde 7169 numarayla kayıtlı bulunan Osmanlıca *Hikâye-i Seyfü'l-mülûk* adlı kitap çalışması bunlardan sadece bir kaçıdır. Hikâyenin bir de Arapça ve Farsça versiyonları da dikkate alınırsa, masallar içinde gördüğü rağbet ve ilgi derecesini anlayabiliriz.

Siyahpûş'un *Seyfü'l-mülûk ve Bediü'l-cemâl Destanı*, konusu itibariyle -yukarıda da değindiğimiz üzere- çok farklı olmakla birlikte, ağır basan rengi "aşk" ve "kahramanlık"tır. Dil ve muhteva itibariyle, akıcı, süslü, sürükleyici, heyecanlandırıcı ve merak uyandırıcı bir niteliktedir. Okuyucuyu, kâh mitolojik, kâh gerçek mekân, olay ve varlıklarla yüzleştirmekte, onlarda farklı farklı duygu, düşünce ve tepkileri uyandırmaktadır.

---

[5] Mesela Seyfülmülûk'ün, ifritin sarayında karşılaştığı kız, masalın aslında "Serendip Hükümdarı Tacülmülûk'ün kızı Devlet Hatun" iken, Siyahpûş'un destanında bu kız, "Bedre Hatun"dur. Tacülmülûk ise, Bedre'nin babası değil amcasıdır. Ayrıca, Tacülmülûk, Serendip hükümdarı değil, ona bağlı bir vali konumundadır. Yine masalın orijinalinde "Şahbal" denilen karakter Bediülcemal'in kardeşi gösterilirken, Siyahpûş'ta babası olarak belirtilir. "Said" (bazı varyantlarda 'Sayit') isimli karakter, "Sadülmülûk" olarak geçer. Keza, masalın aslında "Kulzem" diye bir memleketten bahsedilmezken, Siyahpûş'ta "Kulzem"den, "Kulzem Padişahı"ndan çokça bahis var. Ayrıca, padişah Safvan ile vezirinin öldürdükleri iki yılandan, bu yılanların -baş ve kuyruk hariç- gizlice hanımlarına yedirmelerinden bahsedilirken, Siyahpûş'un nüshasında bu bahis yoktur.

[6] Bu Osmanlıca nüshanın bir benzeri, Toronto Kütüphanesinde bulunan iki nüshadır. Biri, *Padişah Seyfülmülûk, Asım Safvân Hikâyesi* (resimli), diğeri ise, *Seyfülmülûk Hikâyesi* (resimsiz) ismiyledir. Yazarını bir türlü tespit edemediğim resimsiz nüsha Latinize edildi, toplam sayfa sayısı A/4 ebadıyla 78'dir.

ÇEVİRİ HAKKINDA

Seyfü'l-mülûk ile Bediü'l-cemâl Destanı'nın yayına hazırlanmasında takip edilen yol ve yöntemler:

1. *Seyfü'l-mülûk ve Bediü'l-cemâl Destanı*'nınTürkçe çevirisinde Molla Muhyiddin hattıyla yazılmış olan nüsha esas alındı.

2. Kitaba ait farklı nüshalar yeniden gözden geçirildi; bu çerçevede, elinizdeki çalışmayla diğer el yazma nüshaları karşılaştırıldı, eksiklikler ve yanlış yazımlar düzeltildi. Ayrıca "Divâna Cami", "Xezelên Siyahpoş" (Siyahpûş'un Gazelleri) gibi çalışmalara da bakıldı.

3. Çalıştığımız nüshada "Badia Ba Cemal" olarak geçen isim, "Gazel-9"un başında geçtiği şekliyle, çeviride "Bediü'l-Cemal" olarak verildi; böylece kadın kahramanın ismi hikâyenin aslı olan *Bin Bir Gece Masalları*'na uygun hâle getirildi.

4. Çeviride, mümkün mertebe şiirsel bir dil esas alındı ve genellikle her mısra 14 hece vezniyle tamamlanmasına gayret edildi.

5. Destanda, ismi meçhul olan Bediü'l-cemâl'in annesinin adı, orijinalde geçen "Serwebenû" ifadesine denk düşecek şekilde, "Servi Kadın" olarak çevrildi.

6. Elinizdeki nüshada bulunmayan ama diğer nüshalarda bulunan beyitler, kitabın sonundaki "Ekler" kısmında verildi.

7. Destanda bahsi geçen dinî, tasavvufî, tarihî, mitolojik, coğrafî mekân, kavram ve kişileri tanıtmak ve açıklamak sadedinde dipnotlar hazırlandı.



SİYAHPOŞ

DESTANA SEYFULMİLÛK Û
BEDÎULCEMAL

SİYAHPÛŞ
SEYFÜ'L-MÜLÛK VE BEDİÜ'L- CEMÂL

DESTANI

Bismîllahîrrahmanîrrehîm	*Bismillahirrahmanirrahim*
Li ser Lewhê Qelem gerya ji Heq da[1]	*Dolaştırdı Hak Kalem'i, üzerinde Levh'inin[1]*
Tulû'ê fecrê 'uşşaqan şefeq da	*Söktü şafağı âşıkların, doğmasıyla fecrinin*
Ji bêhna xonçeyê baxê meya saf	*Kokusundan goncalarının, saf şarap bağının*
Mu'etter bû gulistan qafê ta qaf	*Bir baştan bir başa güzel koku sardı gülistanı*
Me lew hatin bi nezmê în hikayet	*Ondandır ki aldım nazma, ben şu hikâyeyi*
Ji neqlê rawiyan min kir rîwayet	*Alıp aktardım size, rivayetçilerin naklinden*
Der eyyamê Suleyman peyamber	*Dönemindeydi peygamber, Hazret-i Süleyman'ın*
Di Misrê da hebû şahek muzeffer	*Bulunuyordu Mısır'da, bir muzaffer padişah*
Ji 'edl û dadê wî 'alem bi rahet	*Rahattaydı âlem onun, adalet ve hükmünden*
Nebû qet kes bi zehrê wî qebahet	*İşlemezdi hiç kimse, korkusundan kabahat*
Pez û gur ew bi hev ra çûn çêregah	*Yayılırlardı otlakta, kurtla koyun beraber*
Nebû zehrê guran ez heybetê Şah	*Yoktu kurtlardan korku, Şah'ın heybetinden*
Bi çengalê serê sinanê zehrab	*Pençesinden mızrağın ki ucu ağılıdır*
Pezê bêçare raket ez serê xwab	*Dalardı uykulara, tüm zavallı sürüler*

[1] Mebest ji Lewhê, Lewhê Mehfûz, mebest ji Qelemê, amûra tomarker ya li ser Lewhê Mehfûz e. Herdu têgeh, têkildarê zanîn û teqdîra Xwedê nin ku naveroka wan mechûlê me nin. Di Qur'anê de, ji bo Lewhê Mehfûz, bnr. Sûreya Birûc ayet 22, ji bo Qelemê, bnr. Sûreya Qelem ayet 1, Sûreya Elaq ayet 4.

[1] Levh'ten amaç Levh-i Mahfuz, Kalem'den maksat, Levh-i Mahfuz'a kayıt yapan alettir. Allah'ın ilim ve takdiriyle ilgili kavramlar olup, iç yüzleri bizce meçhuldür. Kur'an'da, Levh-i Mahfuz, Buruc Suresi, ayet 22'de, Kalem ise, Kalem Suresi, ayet 1, Alâk Suresi, ayet 4'te geçmektedir.

Te'alellah ji wî hukm û 'edalê	*Yüceltsin Allah, o hüküm ve adaleti*
Ji wî cah û celal û îqbalê	*O makam ve celali, o ikbal ve talihi*
Xweda dabû ji bo 'Asim bi rehmet	*Şah Asım'a vermişti, rahmetiyle Yüce Hak*
Xwedêtirsî yû text û tac û dewlet	*Takvayla iktidarı, taç ile hem devleti*
Xusûsan medhê wî pêşî Suleyman[2]	*Süleyman huzurunda, edilirdi övgüsü*[2]
Digot teyr û wihûş û cinn û însan	*Kuşlarla canavarlar, cinler ile insanlar*
Di 'alem da gerabû nam û namûs	*Namı ile namusu, yayılmıştı dünyada*
Bi qencî lê dida awazeyê kûs	*Vurulurdu kösleri, güzel sedalarıyla*
Di ber hukmê wî da cayê xerabe	*Hükmü altında onun, harabe olan bir yer*
Nemabû tu îşaret key sebabe	*Kalmamıştı ki asla, parmakla gösteresin*
Çi cayê ku hebû xoş abidanî	*Var olan bütün yerler, mükemmel bayındırdı*
Tê danîbû şahê cennetmekanî	*Kurmuş idi tamamını, cennetmekân olan Şah*
Çi bêjim hukmê wî 'alîcenabî	*Hükmüne ne diyeyim, o yüce şahsiyetin*
Dih û qerye temam nayên hîsabî	*Kasabayla köyleri, sayıya gelmez onun*

[2] Mebest ji Suleyman, Cenabê Suleyman ê kurê Dawût Pêxember e.

[2] Süleyman'dan maksat, Davut Peygamber'in oğlu Hazret-i Süleyman'dır.

Çihar sed şehr û bajarê xudannam	*Meşhur şehirlerinden, dört yüz vardı*
Di ber hukmê wî bû wek Misr û wek Şam	*Hükmü altındaydı, Mısır ve Şam gibileri*
Di eyyamê xwe da xeyrê Suleyman	*Yalnız Süleyman hariç, kendi zamanında*
Nebû qet kes mîsalê Îbnu Sefwan	*Asla yoktu bir insan, İbni Safvan'ın dengi*
Çi bêjim 'esker û komê siwaran	*Nasıl desem askerini, süvari alayını*
'Eded zêde ji du nehsed hezaran	*İki dokuz yüz binden, fazlaydı sayıları*
Di hîna çawîşan kirya bi gazî	*Ne zaman ki duyulsa, komutanlardan çağrı*
Siwar dehtin ji dengî dor û bazî	*Etraftan ve hızlıca, gelirdi süvariler*
Hemî merdê dilawer şîregîr bûn	*Tamamı kılıçlıydı, korkusuz yiğit erler*
Ji gurz û nêze û şîmşîr û tîr bûn	*Topuzlu, mızraklıydı, kılıçlı, okluydular*
Li ser ta pê ji polayê mucewşen	*Çelikle zırhlıydılar, baştan ayağa onlar*
Dihatin sef bi sef, kom kom bi qewşen	*Geliyorlardı saf saf, grup grup nizamî*
Wekî Berz û Zehrab û Feramerz[3]	*Berz gibi, Zehrab ve Feramerz gibi[3]*
Qewî heykel wekî Rustem xweyî 'erz	*Güçlü ve dimdikti, onurlu Rüstem misali*
Dibûsîn erdê pêş Şahê mesrûr	*Öperlerdi yerleri, mutlu Şah'ın önünde*
Ji hed zêde siwarê şibhê teymûr	*Haddinden fazlaydılar, demir atlılar gibi*

[3] Hersê jî lehengên efsanewî yên İranî nin. Berz (Berzû), kurê Zehrab (Suhrâb) e. Zehrab (Suhrab) û Feramerz (Feramarz), herdu jî kurê Rustemê Kurê Zal in.

[3] Üçü de İran'ın efsanevî kahramanlarındandır. Berz (Berzû), Zehrab'ın (Sührâb) oğludur. Zehrab (Sührab) ve Feramerz (Feramarz), ikisi de Zal Oğlu Rüstem'in oğullarıdır.

Ji mal û nî'met û genc û cewahir
Nizanî qet hisabê xeyrê Qadir

Maldan ve nimetten, hazine, cevherlerden
Allah'tan gayrı kimse, bilmezdi miktarını

Di dinyayê nebû esla çu ni'met
Nedabû Xaliq bo wî bi rehmet

Her ne nimet var ise, bu dünyada
Yaratıcı vermişti, rahmetiyle hep ona

Ji xeyrî yek puser dilbend û waris
Dilê Şeh bû ji bo ewladî haris

Tek, gönlünü hoş edecek varis bir oğlu yoktu
Hırslandı Şah'ın gönlü, bir çocuğu olsun diye

Sed û heştad sal borî ji 'umrî
Şev û roj ew dinalî bû çu qumrî

Ömrü geçkindi onun, aşmıştı yüz sekseni
İnlerdi gece gündüz, tıpkı bir kumru gibi

Ji bo ewladekî nêrîne û qenc
Bi wî mîras bimîne milket û genc

Hayırlı bir erkek evlat, kendinin olsun diye
Ta saltanatla serveti, miras kalsınlar ona

Îlahî, ez dinalînim şev û roj
Ji 'işqê cam û hibbê werdê pişkoj

İnleyip sızlıyorum, gece gündüz Allah'ım
Bir şarabın aşkından, bir gülün goncasından

Virêkî bo me tu yek xonçe Baqî
Ku serxoş bim ji camê Tu û saqî

Ey Baki, ne olur gönder bize bir gonca
Ta ki sarhoş olayım, Sen'le sakî camından

Wekî Rebbî îrade biket û teqdîr
Bi cî bê, dê biket mexlûq tedbîr

Şayet Allah dilerse, takdiri el verirse
Yerine gelir o şey, kul da tedbir alırsa

Ji wî rengî sual ken bê hîcabe	*Bundan ötürü sizler, isteyiniz perdesiz*
Dû'a lew baş dibêtin mustecabe	*Güzelce kabul görür, bu tarz ile dualar*
Ji qewlê rawiyanê ehlê 'irfan[4]	*Aktardıklarına göre, ariflerden râviler[4]*
Meger rojek di dil da Îbnu Sefwan	*Günlerden bir gün meğer, gönlünde İbni Safvan*
Xeriq bû ew di deryayê tefekkur	*Dalmıştı derinlere, tefekkür deryasına o*
Bi "Kullu men 'eleyha fan" tesewwur[5]	*Düşünmekteydi o, "Kullu men 'eleyha fan"ı[5]*
Sed û heştad sal 'umrêm resîde	*Geçti ömrümden benim, tamam yüz seksen sene*
Bi mal û genc û ni'met aremîde	*Mal, servet ve nimetle, rahat, huzur içinde*
Çi kem dinya ku bê 'ehd û wefa ye	*Ne edeyim dünyayı, yoktur ahdi, vefası*
Ji kes ra axirî, ta ser nema ye	*Nihayet kalmamıştır, kimseye ondan bir şey*
Li serda tu bibîn kanê Adem û Şît	*Ta baştan izle onu, nerde Âdem ile Şit*
Refi' bû hem li dinya paşê Idrîs	*Sonrasında ise İdris, göçmedi mi dünyadan*
Wefat kir hem li dinya Nûh peyamber	*Hem vefat etmedi mi, Nûh Peygamber dünyada*
Nema baqî, be Ibrahîm û Azer	*Ne İbrahim ne Azer, baki kalmadı onda*

[4] Rawî: Kesê rîwayetkar, veguhêzer, vebêjer. Ehlê 'Irfan: Kesên xwedî fam, fêris û têgihaştiya pêşketî.

[5] Sûreya Rehman, ayeta 26. Wate: "Her zindiyê li rûyê zemîn, teqez wê fanî be."

[4] Arif: Anlayış, kavrayış ve bilgisi yüksek kimse. Râvi: Rivayet eden, aktaran, anlatan.

[5] Rahman Suresi, 26. Ayet. Meali: "Yeryüzünde bulunan her canlı fani olacaktır."

Ku Ismaîl çû keyber teessif	*Ki İsmail de gitti, yaşlı ve de hüzünlü*
Digel wî hem neman Ye'qûb û Yûsif	*Hem onunla birlikte, kalmadı Yakup, Yusuf*
Nema Mûsa, kelîmê Rebbê Rehman	*Rahman Rab'la konuşan, Musa'ya da kalmadı*
Nema Dawûd, wefa bû hem Suleyman	*Vefa etmedi ömrü, Davut'la Süleyman'ın*
Ji min ra namînî dinya hem axir	*Bana da kalmaz dünya, eninde hem sonunda*
Gelek min cem' kir genc û cewahir	*Biriktirdim fazlaca, hazine, cevherleri*
Di hîna min ku hişt ev kuhneabad	*Ki çekip gittiğimde, kalır köhne saltanat*
Wekî bo min nebî yek qenc ewlad	*Şayet olmazsa varis, bana bir iyi evlat*
Ji wî ra bît ew ni'met temamet	*Bırakayım ona ben, eksiksiz bu nimetleri*
Heyif xeyrek wî bigrî text û dewlet	*Gayrıya kalsa yazık, bu taht ile devletim*
Çi kem lêkîn bi dest min nîn e ew kar	*Lakin ne edeyim ben, bu iş elimden gelmez*
Ne bi firotin diê ta zêr û dînar	*Satılmıyor ki alsam, altın ya da dinarla*
Di bihayê bidem du sed defîne	*Bedel diye verirdim, iki yüz defineyi*
Hemî cewher, ji zêr nehsed xezîne	*Tamamı altın, cevher, dokuz yüz hazineyi*
Hezar û sed hezar hespê xudanbext	*Binlerce, yüz binlerce, kıymetli atlardan*
Cewahirbend ji zêrî kesme û rext	*Cevherlerle süslenmiş, altından eyer, kuşam*

Bihayê hesp û rextek min beraber	*Bir atımın değeri, hem üstünde eyeri*
Xeracê Misr û Şaman bê seraser	*Bedeldir tüm Mısır'ın, hem haracına Şam'ın*
Digel herçî ku qenc ez pê bibim şad	*Bana sevinç, mutluluk, veren her şeyimin de*
Bi nîvî kem di bihayê yek ewlad	*Vereyim yarısını, bir tek evlat pahasına*
Welê ewlad bi destê Zulcelal e	*Ne var ki çocuk vermek, Allah'ın elindedir*
Heta ku Ew nedit tehqîq betal e	*Şayet ki o vermezse, gerisi beyhudedir*
We qenc e rû bikem lew paş di dergah	*İyisi varıp kapısına, yöneleyim ben O'na*
Ku rehmet ke bi fezlê xoş ê Ellah	*Ki merhamet buyursun, fazlıyla versin Allah*
Bixefrînî min ê mehzûn û naşad	*Affet, bağışla beni, ben ki mahzun, mutsuzum*
Ji emrê "Kun" bidet min ew yek ewlad[6]	*Ne olur "Kün" emriyle, ver bana tek bir evlat[6]*
Li ser ta pê ez im mestê belayê	*Baştan ayağa dek, beladan bitkinim ben*
Ji Rebbê xwe dixwazim ez rizayê	*Tek isteğim benim, Rabbimin rızasıdır*
Bi ihsan û bi fezl û hem bi rehmet	*İhsanından, fazlından ve merhametinden*
Îlahî tu bidî me camê mihbet	*Ver bize Sen Allah'ım, şarabından sevginin*

[6] Têgehek "fermanî" ye ku bi afirandina Xwedê ve têkildar e. Bi wateya xwe, "bibe/pêk were". Di ayetan de, bi awayê "Kun feyekun" di 8 sûreyan de derbas dibe. Bo mînak, Sûreya Yasîn, ayeta 82'an: "(Xwedê), dema afirandina tiştekî divê, tenê 'bibe/pêk were' dibêje, ji dest ve pêk tê."

[6] Allah'ın yaratmasıyla ilgili bir 'emir' ifadesidir. "Ol" anlamındadır. Ayetlerde "Kün feyekün" şeklinde 8 surede geçmektedir. Örnek olarak, Yasin Suresi, ayet 82'de geçtiği gibi: "(Allah), bir şeyi yaratmak istediğinde, ona yalnızca 'ol' der, hemen oluverir."

Kesê ba sidq û dil da derê Heq	*Kim ki yönelse Hakk'a, gönülden doğrulukla*
Umîda xwe birrî xeyrê Wî mutleq	*Kesmelidir kesin o, O'ndan gayrıdan umut*
Eger şeh, ger geda bî, ger mesakîn	*Var istersen ki şah ol, ister fakir, dilenci*
Ji meqsed bê hêvî nabî bi te'yîn	*Olamazsın asla sen, maksadından umutsuz*
Te'alellah ji wî Şahê Mubarek	*"Yücelik Allah'ındır", diyerek mübarek Şah*
Bi 'ezmê xelweyê xoş kir tedarek	*Tam tekmil hazırlıkla, azmetti halvet olmaya*
Qedem danî bi sidq û dil bi dergah	*Diz çöktü dergâhına, doğrulukla gönülden*
Umîda xwe birrî wî xeyrê Ellah	*Kesti Allah'tan gayrı, umudunu herkesten*
Tesedduq da yetîm û hem esîran	*Dağıttı sadakayı, yetime, esirlere*
Bi derwêş û mesakîn û feqîran	*Ayrıca dervişlere, miskin ve fakirlere*
Hisabê nan û goşt û sîm û hem zer	*Ne miktarını ekmek, et, gümüşle altının*
Nizanî kes çi binvîsim bi defter	*Kimse bilmez ki onu, ta yazayım deftere*
Heta çil roj temam her rojê sed kîs	*Tamam kırk gün boyunca, her gün için yüz kese*
'Eta kir Şah bi ehlê 'ilm û tedrîs	*Bulundu bağışta Şah, hoca ve alimlere*
Libasê şahiyê yekser 'eta kir	*Hem şahlık giysisini, bağışladı tümüyle*
Bi lebsê derwêşan xwe bênewa kir	*Giyindi dervişler gibi, dönüştü zavallıya*

Li ser ta kuhne şal û xirqepoşî	*Büründü baştan başa eski şal ve hırkaya*
Ji zikrê Xaliqî ra dilxuroşî	*Yaradan'ın zikriyle, daldı kalben coşkuya*
Ji ber xwe avêtin sencab û qaqûm	*Atwerdi önünden, sincap, vaşak postunu*
Di kuncek tarî da rûnişt 'Asim	*Vardı oturdu Asım, karanlık bir köşeye*
Şev û rojê dikir zikr û 'ibadet	*Gece, gündüz ederdi, zikir ile ibadet*
Ji Rebb ra dikir ew zêde ta'et	*Ederdi hep Rabbine, fazlasıyla itaat*
Bi roj saim, bi şev qaim bû her dem	*Gece ayaktaydı o, gündüz ise oruçlu*
Ze'if û zer bibû ez zehmet û xem	*Zayıf ve sararmıştı, zahmetle gam yüzünden*
Ne germayî di birsî û ne serma	*Aldırış etmiyordu, sıcak, açlık, soğuğa*
Ji 'işa ta 'işa xûre nîm xurma	*Yatsıdan ta yatsıya, yediği yarım hurma*
Şevek cum'e di ber fecrê 'ibadet	*Bir cuma gecesinde, fecre yakın ibadet*
Qeti' kir dest hilanî kir munacaet:	*Bitirdi, el kaldırdı, döktü dile münacat*
"Xwedawenda! Tu xellaqê qedîm î	*Dedi ki, "Ey Allah'ım! Sen'sin ebedi Hâlık*
Bi halê min besîr î yû 'elîm î	*Halimden haberdarsın, Sen'sin gören ve bilen*
Tu sahibrehmet û fezl û 'emîm î	*Sen'sin rahmet sahibi, hem de fazlın umumi*
Bi 'ebdê xwe 'etabexş û kerîm î	*Kulların hakkında Sen, bağış ve ikram edensin*

Eger kerdem gunah, estaxfirullah
Ji sidq û bawerî hatim bi dergah

Şayet günahkâr isem, derim estağfurullah
Gelmişim dergâhına, doğruluk ve imanla

Nehin min xeyrê Te esla çu Ellah
Bixefrînî gunehê me y'qedîmî

Senden gayrı tanımam, asla hiçbir ilahı
Affını dileriz biz, geçmiş günahımızın

Wekî bê emrî zahir bû ji Adem
Girî yû hem nezer da 'erşê e'zem

Tıpkı emre ters düşen, Âdem Nebi misali
Ağladı hem bakındı, Yüce Arş'ın yönüne

Mihemmed dê resûlê Te y'mukerrem
Şefa'et kir bi wî Te da selîmî

Değil mi ki Muhammed, değerli elçin Sen'in
Şefaatiyle O'nun, verdin kurtuluşu Sen

Bi heqê hurmeta navê Mihemmed
Bibexşî cumle ef'alê me yê bed

Muhammed'in isminin, hakkı, hürmeti için
Sen bağışla tamamen, her çirkin işimizi

Dû'ayan ku dikim ya Rebb nekî red
Tu Xeffar î yû Rehmanurrehîm î

Reddetme ey Rabbim Sen, ettiğim duaları
Sen ki Gaffar olansın, hem de Rahman ve Rahim

Ne muhtac im bi cah û mensib û text
Çi kem bê kur bi esp û kesme û rext

Muhtaç değilim asla, makam, rütbe ve tahta
Ne edeyim oğulsuz, atı, eyeri, üzengiyi

Xweda! Tu bide y'me ewladek xudanbext
Xebîr û Qadir û Heq û Kerîm î!"

Allah'ım! Bahtı yaver bir evlat ver bize
Sen Habir ve Kadir'sin, hem Hak ve Kerim'sin

Dî hîna Xaliqê Qeyyûmê dadar
Ne ki zaman Yaratıcı, hem adaletli Kayyum

Emir kir ku bicî bê meqsed û kar
Emir verdi ki olsun, o iş ile maksat

Mu'eyyen dê bike ref'a hîcabê
Bunda hiç şüphe olmaz, kaldıracak perdeyi

Ji şuxlê ra muheyya ket sebabê
İşe ortam hazırlar, yaratır sebepleri

Ji neqlê rawiyê ku kir rîwayat
Nakilci ki bildirir, biz de aktardık ondan

Sedayê xeybê hatî ez munacat
Yalvarışı anında, gelir gaipten bir ses

Sebeb navê Mihemmed ey dilazad
Ey gönlü rahat kişi, Muhammed adı için

Xwedê tu bexşî yû dê bide te ewlad
Allah affetti, seni, hem verecek bir evlat

Welê tu jinkî dê bîn zêde mehbûb
Getirmelisin ancak, pek sevimli bir eş

Ku tu şa bî, bi Yûsif şibhê Ye'qûb
Ki Yusuf'la mutlu olasın, Yakup misali

Ji xelwetiya wî çû hîna çihl roj
Kırk gün geçti üstünden, halvetteki hâlinden

Nehat ser textê hikmet Şahê feyrûz
Varıp hikmet tahtına, oturmadı kutlu Şah

Xul û awaze peyda bû çep û rast
Sağdan, soldan yükseldi, sesler ve kaynamalar

Ji ewwel da keran xwe bê 'inan xwast
Yılarsızlık ta baştan, merkeplerin talebi

Dinêrî pez guran çavê xiyanet
Kurtlar da koyunlara, bakarlardı haince

Helatin şert û peyman û emanet
Kayboldu şart koşmalar, sözleşmeyle emanet

Wekî dî ‘arifan ewrenge rabû	*Bilgeler ki gördüler, böyle oldu vaziyet*
Tulû’ê exterê bedbextê dabû	*Doğdu artık dediler, uğursuzluk yıldızı*
Li bal hev cemi’ bûn muftî û qazî	*Bir araya geldiler, müftüler ve kadılar*
Xenî û dewlemend birçî û tazî	*Varlıklılar ve zenginler, açlar ve çıplaklar*
Digel destûrekî Şahê ‘ellame	*Bir düsturuyla o çok bilge olan Şah’ın*
Wezîrê Şahî Poşîn Îbnu Ham e	*Şah’ın veziri Poşin, ki oğludur Ham’ın*
Ji hevra go ewan qenc û qebaih	*Söyleştiler yüz yüze, iyiden ve kötüden*
We qenc e em biçine pêş Salih	*Dediler, “İyisi mi, gidelim hep Salih’e*
Çira ew merdekî zêde emîn e	*Zira öyle biri ki, fazlasıyla emindir*
Ji ‘eql û rayê xwe wek wî tunîne	*Aklıyla, görüşüyle, yoktur onun bir dengi*
Emîn û hakim û destûrê Şah e	*Şah’ın danışmanıdır, hem emin ve bilge*
Xudanesl û neseb, hem ‘alîcah e	*Asilzade ve soyludur, hem yücedir makamı”*
Hemî rabûn û çûn, wan go bi hacib	*Tümü kalkıp gittiler, dediler ki kapıcıya*
Tu her pêş Salih bêj xelqê xalib	*Var git Salih’e de ki, halktan büyük bir grup*
Dixwazin bêne pêş Îbnu Hemîdî	*Varıp Ham(id) oğluyla, görüşmeyi dilerler*
Bi ‘eql û re’yê xwe hem tu ferîd î	*Kendisi ki eşsizdir, aklıyla, hem reyiyle*

Hemî hatin û westayîn ji dergah
Tümü dergâha geldi, orda karar kıldılar

Digel tu ew biken tedbîrî bo Şah
Umutları oydu ki, Şah'a çare bulsunlar

Bi çesban hate ew hacib xweyî 'erz
Kapıcı varıp geldi, hızlıca hem saygıyla

Xeber dan pêş Salih wî kirin 'erz
Salih'in huzuruna, sundu haberi ona

Icazet da we Salih ba dilê geş
Salih ki izin verdi, mutlu ve şen olarak

Çira wî zanî hatin ew mişewweş
Zira bildi ki o, gelenler dertlidirler

Bi cem'iyet ku hatin ew seraser
Ki topluca geldiler, bir baştan bir başa

Li dîwanê runiştin sef beraber
Divanda oturdular, saf tuttular beraber

Ji ewwel bûn ji bo Salih senaxwah
Evvelce Salih için, başladılar övgüye

Heta ku hatin ew ser mebhesê Şah
Ta ki geldiler onlar, Şah'ın konusuna

Bi hevra go ewan cimle cema'et
Cümle cemaat, bir ağızdan dediler,

"Be bê hakim helak dê bit ra'îyet
"Bir halk başsız kalırsa, sonunda yok olacak

Di hîna ma li çolê bê şivan pez
Ne zaman ki bir çölde, çobansız kalırsa sürü

Çi hal bit dê ji dest gurgê xoxîbez
Ne hâllere düşer, aç kurtların elinden

Wekî baxê di dihan û bilûkan
Bir bağ misali ki, köylerde ve bayırda olsa

Be bê baxvan ji dest cewrê piçûkan
Hırsız elinden neler çekmez, bekçisiz kalsa

Ne têman û ne senc mînê, ne sîmar	*Ne kalır elma, hurma, ne de meyveden biri*
Çu namîne ji xeyrê qotekî dar	*Geriye kalsa kalsa, yalnız çıplak ağaçlar*
Çiqas ava bî bajar, na sewab e	*Bir şehir ne kadar, imar edilse yine faydasız*
Be bê hakim yeqîn dê bit xerabe	*Hükümdarı yok ise, kesin olur harabe*
Xerez ey Salihê-w tu ‘alîcah î	*Maksadımız ey Salih, makamın ki yücedir*
Bi ‘eql û kamil û destûrê Şah î	*Aklınla, kemalinle, danışmansın sen Şah’a*
Qedem nih ser serê me em biçîn pêş	*Başımızda yerin var, gel gidelim biz ona*
Şehê ‘alîmeqam bûye bi derwêş”	*Zira yüce Şahımız, dönüvermiş dervişe”*
Dilê derwêşê danayê mikemmel	*O dervişin gönlü ki, bilgelikle tam tekmil*
Kî ye ê ku vexwarî camê ewwel	*Acep kimdir o içen, evvelin kadehinden*
Ji destê saqiyê meyxaneyê ‘işq	*Aşk meyhanesinin ki, sakisinin elinden*
Bi secde raki’e ji pûtxaneyê ‘işq	*Rükû secdesindedir, puthanesinde aşkın*
Biken guhdariyê danayê kamil	*Dinlemeniz gerekir, o kâmil bilge kişiyi*
Xudan ‘irfan û qelb û şahê ‘adil	*O kalp ve irfan ehlini, o adaleti çok Şahı*
Ji esrarî nehin xalî çu ‘arif	*Sırlardan boş olamaz, her kim ki ariftir*
Eger ‘alim, eger ‘adil çi xaif	*İster alim olsun, ister adil veya korkak*

Bi hevra hatin ew cimle temamet	*Geldiler hep birlikte, eksiksiz tam olarak*
Ji ber dergahê ‘alî kir îqamet	*Yüce kapı önünde, oturup yerleştiler*
Nedîman ku bi hacib ê senaxwah	*Hizmetçiler yönelip, kapıcıya övgüyle*
Ji ber me tu bibûse penceyê Şah	*Var öp ellerini Şah’ın, hepimizin yerine*
Eger destûr da, em bêne xizmet	*Verirse şayet izin, gelelim hizmetine*
‘Eriz keyn em bi zarî çend sohbet	*Arz edelim biz ona, dilimizle birkaç söz*
Çeleng rabû, we hacib hate pêş Şah	*Kalktı hacip hürmetle, vardı Şah’ın yanına*
Bi xizmet ‘erd busî ba senaxwah	*Saygıyla hem övgüyle, öptü yer ve zemini*
‘Ecaib nerm û şêrîn wek kerîman	*İkram ehli gibi, hayli yumuşak ve tatlıca*
Temamî ‘erz kir qewlê nedîman	*Sunuverdi eksiksiz, nedimlerin sözünü*
Şehê ‘alî riza da, kir şikir purr	*Yüce Şah onay verdi, hem de etti çok şükür*
Lebê şêrîn direhtin gewher û durr	*Döküldü tatlı ağzından, cevherler ve inciler*
Bi cimle hatin û gotin “Tebarek!”[7]	*Geldiler cümle kişi, hep “Tebarek!” dediler*[7]
Yeka yek busî wan destê mibarek	*O mübarek ellerinden, öptüler her biri tek tek*

[7] Tebarek, dûayek e ku wateya xwe ev e: “(Xwedê) bila mibarek (zêdetirîn bereketî) bike.”

[7] Tebarek, “(Allah) mübarek (fazlasıyla bereketli) kılsın” manasında bir duadır.

Ji wan ra Şah xêr û hem sefa da
Şah diledi onlara, hayırlar ve safalar

Li paş ehlen we sehlen merheba da
Hoş geldiniz ardından, sundu merhabalar

Ewan dî Şah di wî şirîn meqalî
Şirince konuşurken, onlar gördüler Şah'ı

Ze'îf û zer bûye şibhê hilalî
Kî zayıf, sararmıştır, olmuş hilal misali

Bi hevra gotin: "Ey Şahê xudanbext!
Bir ağızdan dediler, "Ey bahtiyar Şahımız

Çi ehwal e ku tu nayê li ser text?
Bu ne hâl ne vaziyet, geçmiyorsun tahtına

Nema tiştek biken serhengê tu şer
Kalmadı bir şey, bekçilerinizin savaşmasına

Bi hevra bêne şewitîn hişk û hem ter
Kuru ile yaşın birlikte yakılmasına

Nekirye qet kesî textê te telbe
İnsanlardan yok kimse, tahtınıza göz koyan

Çu şah nîn in biken ew ser te xelbe
Şahlardan yoktur biri, galebe etsin size

Ne karê hakiman e ev rezalet
Olamaz bu rezalet, hâkimlere iş olsun

Ditirsî ger ji Heq, tu b'ke 'edalet
Korkun varsa Allah'tan, var uygula adalet

Li bal Xaliq bizan ew zêde qenc e
Fazlasıyla iyidir, bil Halik'ın yanında

Nebin mezlûm ji dest zalim bi rence
Çekmemesi mazlumun, zalim elinden zulmü

Bi burhan û ehadîs û delail
Ayetler, hadislerle, hem kesin delillerle

Dibît cennetmekan sultanê 'adil."
Adaletli sultanlar, olurlar cennetmekân"

Hêvîdar bin ji Şah bêjî teheyyur	*Umutlu ol Allah'tan, söyle ne bu şaşkınlık*
Çira ew xerqê 'ummanê tefekkur	*Neden boğulmuşsun sen, düşünce deryasına*
Cewab da şahî 'Asim Îbnu Sefwan	*Cevap verdi Şah Asım, ki Safvan'ın oğludur*
Cewahir rêhtin we go "Ya nedîman	*Döktürdü cevherleri, dedi ki "Ey nedimler*
Ne meqsûd tirsê şahan e, ne ku text	*Korkum ne şahlardandır ne de tahtın korkusu*
Ne gazindek heye me j'tali' û bext	*Ne vardır şikâyetim, talihimden ve bahtımdan*
Welê min kir tesewwur gel xezûkî	*Lakin düşünüverdim, hem şakayla birlikte*
Dibe hêvî di weqtê tu piçûk î	*Umut olur insana, yaş küçük olduğunda*
Dibêjî dê bimînim ta bi kehlê	*Dersin ki kalacağım, ihtiyar yaşıma dek*
Dikî hêvî sipî ke rih bi sehlê	*Umut edersin olur, sakalın kolay beyaz*
Ji wî wêda bi tehqîq dê bimirî	*Ondan öte kesindir, çare yok öleceksin*
Eger şah, ger geda bî, ger wezîr î	*Ha şahsın ha dilenci, istersen de ol vezir*
Delîlê "Kullu nefsîn" tu bibîne[8]	*"Kùllü nefsin" delildir, görmelisin sen bunu[8]*
Ji dinyayê tu baqî xwe mebîne	*Bu dünyada kendini, sakın görme ebedi*

[8] Bêjeya "Kullu nefsîn", hevokek ji ayeta Quranê ye. Wateya wê, "Her nefs/heyber" e. Tevahiya hevokê ya ji ayetê, bi wateya xwe ev e; "Her nefs, dê mirinê bitahmije..." (Alê Îmran, a. 185. Ji xeynê vê, bnr. Enbiya, a. 35; Enkebût, a.57)

[8] "Küllü nefsin" ifadesi, Kur'an'da geçen bir ayetin bir cümlesine aittir. "Her nefis/varlık" anlamına gelmektedir. Bahsi geçen ayetin tamamı şöyledir: "Her nefis ölümü tadacaktır..." (Âl-i İmrân, a. 185. Ayrıca bkz. Enbiyâ, a. 35; Ankebût, a. 57)

Bi “Kullu men ‘eleyha fan” nezer de[9]	*“Küllü men aleyha fân”, olmalıdır nazarımız[9]*
Mu’eyyen dê bibî tu tehte erde	*Çare yoktur gireceksin, toprak altındaki yere*
Diger hem “Kullu şey’în halikun” bîn[10]	*Ayrıca görmelisin, “Küllü şey’in halikün”[10]*
Ji mirna xwe biken bawer bi te’yîn	*İnan ki öleceksin, bil budur kesin gerçek*
Xususen ez dibînim ey wezîran!	*Görüyorum hususan, ey vezirler ben bunu*
Ji hakim û selatîn û emîran	*Hükümdar ve sultanlardan, ya da beylerden*
Kesê mir bû dibîtin kur bi waris	*Her kim ölse onlardan, ona varistir oğlu*
Ji bo ewlad nehin mani’ ne ba’is	*Evlada yoktur asla, ne engel ne de sebep*
Bibêjin ew me dîn kur, mal û emlak	*Deyiniz gördük bizler, oğulu, malı, mülkü*
Eger cewher hebin heta bi eflak	*Cevherlerden bulunsa dahi, ta göklere dek*
Nehin bo min ji nêrîne çu ewlad	*Lakin yok benim için, erkeklerden bir evlat*
Heta ez hem, bi dîdarî bibim şad	*Ta hayatım boyunca, şad olayım yüzüyle*
Ji dinya wî bibim her rojê haris	*Olayım ben her gün, dünyası için haris*
Di pê min ra ji min ra bête waris	*İsterim benden sonra, varsın olsun varisim*

[9] “Kullu men ‘eleyha fan”; ev îfade, ayetek ji Quranê ye. Wateya wê: “Li rûyê zemîn, her çi hebe, dê fanî be.” (Sûreya Rehman, a. 26).

[10] “Kullu şey’în halikun” ev îfade, ji ayetek Quranê hatiye wergirtin. Wateya wê, “Her tişt dê tinebe.” Meala ayetê wiha ye: “Xwedê ne tê de, her tişt dê tinebe.” (Sûreya Qesas, a. 88)

[9] “Küllü men aleyha fân” ifadesi, Kur’an’da geçen bir ayettir. Meâli, “Yeryüzünde bulunan her varlık fani olacaktır.” (Rahman Suresi, a. 26).

[10] “Küllü şey’in halikün” ifadesi, Kur’an’da geçen bir ayetten alınmadır. Anlamı, “Her şey yok olacaktır.” Bu ayetin tamamlayıcı öğesi ise, “İlla vechehü” şeklindedir. Birlikte okursak, mealen şöyledir: “Allah’tan başka, her şey yok olacaktır.” (Kasas Suresi, a. 88)

Ji wî ra mîne milk û tac û hem text
Defaîn û xezaîn, kesme û rext

Sed û heştad sal borî ji ‘umrê’m
Ze’îf û pîr im û tirsim ku bimrim

Me lew rû da derê Ellahê sami’
Mebin bo min gelî mîran bi mani’

Minacetek me kir vê subhê lareyb
Beşaret da bi min xoş hatifê xeyb

Bibexşînî gunehan û yekê kur
Jinek dê bînî lêkîn şibhetê durr

Bi qiymet qed, wekî serwê gulistan
Perîrux, nazik û narinc û bostan

Nizanim jin xewas e yan ‘ewam e
Ji Misr e yan ji Mexrib yan ji Şam e

Ji sidq û dil dinasim Heq bilareyb
Çehivnêr im ji bo awazeyê xeyb.”

Kalsın ona mülküm, hem de taç ile tahtım
Define, hazineler, hem örtülerle eyerler

Yüz seksen sene, geçti benim ömrümden
Zayıfım, çok yaşlıyım, korkum o ki öleyim

Ondan yöneldim işiten, Allah’ın kapısına
Ey beyler olmayın siz, benim için engel

Bir münacat eyledim, bu sabah ki şüphesiz
Bana güzel bir müjde, verdi gizlice gaipten

Günahını bağışlayacak ve verecek bir oğul
Ancak getirmelisin, inci benzeri bir eş

Değeriyle boyu-posu, gül fidanı benzeri
Peri yüzlü ve nazik, narenciye ve bostan

Bilmiyorum kadını, soylu mu, sıradan mı
Mısır’dan, Mağrip’ten mi, yoksa Şam’dan mı

Şeksiz tanırım Hakk’ı, gönülden, doğrulukla
Gözleyip bekliyorum, gaipten sedayı ben”

Nedîman gote “Ey Şahê xudanbext	*Hizmetçiler dediler, “Ey bahtı yaver Şahım*
Beqa bî bo te ‘umr û tac û hem text	*Daim olsun ömrünüz, hem tacınız, tahtınız*
Refiqet bît û ya Rebb “Qûlhuwellah”	*Ya Rab, Kulhuwallah olsun senin yoldaşın*
Ji wê mizgîniyê sed şukr û lîllah	*Allah’a yüzler şükür, o müjdeden ötürü*
Ji bo zanîn jî ey Şah meke xem	*Bilmek için ey Şahım, yemeyiniz sakın gam*
Dizanin hem bi xeyb ehlê mineccem.”	*Gaipten de bilirler, yıldız ilminin ehli”*
Bi ‘eqlê Şah qewlê hem nedîman	*Nedimlerin kavlinden, Şah aklını kullandı*
Bi xatir da riza şibhê kerîman	*Büyüklere münasip, hatırla rıza verdi*
Ji ‘arifan muheyyer nabî qet kes	*Şaşkın olmaz hiç kimse, sordukça bir bilene*
Xudanfaîde ne ew mislê qeqnes[11]	*Onlar ki hep faydalıdır, tıpkı Kaknes misali[11]*
Hemî awaz û nezmê wane mewcûd	*Her ne ses, nota varsa, onlarda var tamamı*
Li pê wan ger herî tu dibînî meqsûd	*Peşlerine düşersen, erersin maksadına*
Ita’a hakimê ‘adil bûye ferz	*İtaat farz kılınmış, adil hükümdarlara*
Bi “Ûlil-‘ezmi zilullahi fil-erz”[12]	*Ki yerdedir “Ûlil-‘azm, gölgesidir Allah’ın”[12]*

[11] Qeqnes, balîndeyek efsanewî ye. Li gor baweriyan, dema ba disire, li nikilê wî yê pir qulik dixe û jê naxmeyên xweşik yên cûrbecûr derdixîne. Li ser vê yekê, ji ber eşqa dengê xwe, xwe dişewitîne.

[12] “Ûlil-’ezmi zilullahi fîl-erz”, ev îfade wek hedîs hatiye qebûlkirin. Lêbelê, di îbareya bi nav hedîs de, di şûna “Ûlil-‘ezm” de, (ahkaf 35)“Es-Sûltan” derbas dibe. Wateya wê, “Mezinên civatê, li rûyê zemîn, di dilqê siya Xwedê de nin.” Lê di rastiyê de, “Ûlil-‘ezm”, ji bo pênc pêxemberên mezin tê bikaranîn. Wek Cenabê Nûh, İbrahim, Mûsa, İsa û Mihemmed (sxl) in. Di vê wateyî de, di Sûreya Ehqafê de, di ayeta 35’an de bal hatiye kişandin.

[11] Kaknes, “Kaknus” olarak da bilinen efsanevi bir kuş. Rüzgâr estikçe, çok delikli gagasından nağmeler çıktığına ve sesinin verdiği şevk ile kendisini yaktığına inanılan iri bir masal kuşu.

[12] “Ûlil-azim” ifadesi, Kürtçe orijinalinde, “Ûlil-‘azmi zilullahi fîl-erz” şeklinde geçer. Hadis olarak kabul görmüştür. Ancak, hadis olarak bilinen ibarede “Ûlil-‘azm” yerine, “Es-Sultan” geçmektedir. Anlamı, “Toplumun büyükleri, yeryüzünde Allah’ın gölgeleri gibidir.” Gerçekte ise, “Ulül-‘azm”, beş büyük peygamber için kullanılan bir unvandır. Bunlar, Hz. Nuh, İbrahim, Musa, İsa ve Hz. Muhammed (asm)’dir. Bu anlamda, Ahkaf Suresi, ayet 53’te buna dikkat çekilmiştir.

Bi zîrê sayeyê sultanê ‘adil	*Hükümleri altında, adil hükümdarların*
Dibin cabir hemî ba qencî mail	*Herkes ister istemez, yönelir iyiliğe*
Feqîr û hêsîr û miskîn û ‘alim	*Yoksullar ve esirler, miskinler ve bilginler*
Dibin rahet ji dest ehlê mezalim	*Rahat, huzur bulurlar, zalimlerin elinden*
Ji xelwetê bi derket şahê ‘Asim	*Çıkıverdi Şah Asım, girdiği halvetinden*
Li ser ta penc û poşî, kurk û qaqûm	*Baştan başa büründü, kürkle, sansar postuna*
Li ser textê xwe rûnişt ew şehînşah	*Oturdu kendi tahtına, o şahlar şahı*
Nedîman bûse da dest ba senaxwah	*El öptüler nedimler, başladılar övgüye*
Xulaman bûse dan destê bi seffdurr	*Hizmetkârlar da öpüverdi, o saf, inci elleri*
Hemî westan li pêş Şahê mizeffer	*Saygıyla durdu hepsi, muzaffer Şah önünde*
Wekî rojê mezalim çûn bi hevda	*Zannedersin ki o gün, yok oldu tüm zulümler*
Pez û gur çûn çêrê dîsan di hevda	*Koyunla kurt birlikte, vardılar otlaklara*
Miferreh saqiyan anîn mey û beng	*Sakiler getirdiler, ferahla meyi, bengi*
Mitriban lêdidan tenbûr li sed reng	*El attı çalgıcılar, tambura yüzler telden*

Wekî dîwanê mest bûn ez mey û benc[13]	*Divan ehli mest düştü, şarapla beng almaktan[13]*
Şehê ‘Asim nezer da Salihê qenc	*Şah Asım göz gezdirdi, baktı hoş tabiatlı Salih’e*
Xeber ken ku di eqtar û di etraf	*Dedi haber verin etrafa, âlemin dört bir yanına*
Mineccim û hekîm bên qaf ta qaf	*Müneccimler, doktorlar gelsin, bir baştan bir başa*
Li paşê hefteyek bê hed muneccim	*Bir hafta geçmişti ki, sayısız müneccimler*
Dibên hatin hekîm û hem mu’ellim	*Dediler ki geldi doktorlar, hem de öğretmenler*
Sê rojan xwest muhlet cumle yekser	*Bütünü bir ağızdan, istedi üç gün mühlet*
Heta yek yek kirin tali’ beraber	*Kısmetlerini ta ki, ettiler tek tek beraber*
‘Utarîd û Esed, Sertan û hem Heml	*Burçlardan Merkür, Aslan, Yengeç hem Koç’la*
Miqabil Sewr û Cewza vekirin Reml	*Boğa’yla İkizler’den, kum falını açtılar*
Ji Delw û Sunbûlet û Cedy û ‘Eqreb	*Kova ile Başak’tan, hem Oğlak’la Akrep’ten*
Muqabil yek kirin tali’ bi exleb	*Çoğunluk birleştirdi, şanslarını onlarla*
Ji Cefrê Muşîkaf û Remlê kamil	*Cifrin ince hesabı, sihrin gelişmişiyle*
Bi necmê Se’d kirin tali’ miqabil[14]	*Sa’d yıldızıyla hem, denk ettiler şansını[14]*

[13] “Benc”, erebiya “beng”ê ye. Bi navê “gihayê ban”ê jî tê naskirin. Di mêj de, wek heb an bi kêşana dûmana vî gihayî êşa ser, çav û diranan dihat birrîn. Toximê bencê bi alkol e; sergêjî û tesîra psîkotropîk pêktîne. Ji bo îroj, tenê pelçên wê tê bikaranîn.

[14] Necmê Sa’d, ji hêla falavêjên stêrkan, yek ji navê du stêrkên yomdar e. Ev stêrk, Wenis an Jopîter e. Ji herduyan re “Se’deyn” gotinin.

[13] “Benc”, “beng” ya da “ban otu” olarak da bilinir. Geçmişte, baş, göz, diş ağrılarında kullanılmıştır. Kullanımı, daha çok hap ya da dumanının solunması şeklindeydi. Günümüz tedavilerinde, hâlâ yaprağı kullanılmaktadır. Tohumları alkollüdür; alındığında, baş dönmesi ve psikotropik etkilere neden olur.

[14] Sa’d yıldızı, yıldız falıyla uğraşan müneccimlerin uğurlu kabul ettikleri iki yıldızdan biri. Venüs ya da Jüpiter. İkisine, “Sa’deyn” demişlerdir.

Keçê Şahê Yemen bo Îbnu Sefwan	*Safvan'ın Oğlu için, Yemen Şahı'nın kızını*
Peder bû Îbnu 'Emr û namê Qehtan[15]	*Kî babası Amr Oğlu idi, Kahtanî lakabıyla[15]*
Bi xizmet bûsî 'erdê ba senaxwah	*Övgülerle birlikte, saygıyla yeri öptüler*
Mineccim û hekîman mijde da Şah	*Şah'a verdi müjdeyi, müneccimler, hekimler*
Di mijdê da 'eta kir Şahê 'Asim	*Müjde alan Şah Asım, başladı bağışlara*
Ji hed zêde şal û kurk û qaqûm	*Verdi haddinden fazla, kumaş, kürk ve samuru*
Dîger esp û çek û sencab û qapût	*Ayrıca atla silah, sincap kürküyle kaput*
'Eta kir hem ji wan ra zêr û yaqût	*Bağışladı onlara, hem altın ile yakut*
Xeriq bûn ew di deryayê 'etayê	*Boğuldular tamamen, bağışlar denizine*
Heta ew hen bixwin pê ken sefayê	*Ta yaşam boyu onlar, yesinler, eğlensinler*
'Etayê 'arif û danayê kamil	*Bağışı ariflerin, hem olgun bilgelerin*
Ji behran zêde ye qet nabî zail	*Denizlerden de boldur, asla yok olup bitmez*
Divêtin lê ji wan ra Mîrê Sadiq	*Gereklidir onlara, beylerden doğru biri*
Bi adab û kemal û hibb û 'aşiq	*Edeple, olgunlukla, sevgiyle hem de aşkla*

[15] Kahtan(î), ezbetek(hoz) ji Ereban in ku li başûr û rojhilatbaşûrê Erebîstanê dijîn. Li gor angaşta wan, binyada wan digihê Qehtanê Kurê Cenabê Hûd û Erebên xwerû û rasteqîn in. Şaxên wan ên esasî, Himyar û Qehlanan in.

[15] Kahtanî, güney ve güneydoğu Arabistan'da yaşayan bir Arap kabilesidir. Soylarının, Hazret-i Hud'un oğlu Kahtan'a dayandığını; saf ve gerçek Araplar olduklarını iddia ederler. Alt kolları, Himyar ve Kahlanlar'dır.

Ji şer ra sebir ken zêde qenc e
Savaşa sabrederse, güzeldir fazlasıyla

Mebada hin bibin waqi' bi renc e
Allah etmesin olsa, zorludur, zahmetlidir

Ji karê xêrê ra me guzarî ewqat
Hayırlı işler için, geçirdik vakitleri

Yeqîn tu bizan welit-te'xîr afat
Kesin olarak bil ki, geciktirmek afettir

Bi te'cîl rabû ew Şahê mibarek
Kalktı ayağa hızlı, mübarek olan o Şah

Ji bo daxwaziyê xweş kir tedarek
Güzel bir istek için, başladı hazırlığa

Emir kir Şah be Poşîn Îbnu Hame
Şah buyurdu Poşin'e, ki Ham'ın oğludur o

Bibî binvîsî katib qencî name
"Yazdırt kâtibe hemen, güzel bir mektubu sen

Jibo Şahê Yemen ba 'izz û îkram
Yemen'in Şahı'na ki, saygıyla, ikramla

Hedîsê doxterê tê da serencam
Olayını kızının, bildir ona özetle"

Di hîna gote katib Îbnu Hame
Kâtibe dediğinde, Ham'ın oğlu mektubu

Di dest girte kaxez û nêz girt xame
Aldı eline kâğıt, yaklaştırdı kalemi

Nivisî dewlet û i'zaz û iqbal
Yazdı övgüyle ona, devlet, şeref, bahtına

Hemî ferxende bada cah û îclal
Tam hayırlar diledi, makamla kudretine

Se'adet hemdem, tu bad û hem bext
Beraberce mutluluk, şansına hem bahtına

Mibarek bin ji bo te tac û hem text
Kutlu olsunlar sana, tacın ve hem tahtın

Pes ez de'watê waqiyatê her dem	*Öyleyse çağrısından, kâtibimin her vakit*
Mebada der dilet esla yekê xem	*Gönlünde oluşmasın, senin asla bir tek gam*
Wekî kafûr û 'enber bûn melahiq	*Kâfurla amber gibi, ne vakit kavuşsalar*
Dibit peyda mihibbet ez du sadiq	*Peydahlanır muhabbet, iki dürüst kişiden*
Di eyyamê di ber me bab û ecdad	*Bizden önceki demde, babalarla atalar*
Bi name û kaxizê hevdu dibûn şad	*Mutlu, şen olurlardı, birbirinin zarfiyla*
Wereng min hêvî ye ku ew mihibbet	*Bu şekilde umudum, sözü edilen sevgi*
Bibit taze bi yek bin her du dewlet	*Yeniden birlik olsunlar, her iki devlet*
Mûti' bim ez di fermanê Şehinşah	*Buyruğuna uyayım, ben şahlar şahının*
Diger her çi heye meqsûdê bixwah	*Başkaca ne maksadın varsa, iste onu benden*
Xerez zîyn-nameyê amîz mihibbet	*Amacı süslü mektubun, belirtmektir sevgiyi*
Şenîdem ez pes perdeyê 'ismet	*İşitiyorum bunu ben, ismetin perdesinden*
Heye bo Şahê Qehtan ê mizeffer	*Kahtanlı büyük Şah'ın, derler ki vardır onun*
Letîf û nazenîn yek xûb û duxter	*İnce ve de nazenin, bir hoş ve güzel kızı*
Tema'ê hêviye ku bo me bîtin	*Umutla bekliyorum, bize olur vermeniz*
Umîda qisseya min red nebîtin	*Ümidim o ki benim, ret olmasın arzumuz*

Bidet min wê durrê Şahê serefraz	*Vermelisin inciyi, ey şerefli Şah bana*
Di textê da çi meqsed bî tu bixwaz	*Tahtımdan ne istersen, isteyiver sen onu*
Nîşanê min verê kir ey Şehînşah	*Gönderdim nişanımı, sana ey şahlar şahı*
Ji bo wê nazenînê şibhetê mah	*O ay misali olan, narin ve nazenin için*
Diger her çi heye bo Şahê meqsûd	*Ayrıca her ne var ise Şah'ın isteği olan*
Verê ket bal me ve bilcumle mewcûd	*Gönderin siz bize, hepsi de mevcuttur*
Wekî kaxez temam bû 'Asim Şah	*Mektup tamam olunca, hemen Şah Asım*
Emir kir serxezîndarê du pencah	*Emretti bakanına, hazineden yüz deve*
Devan bînin bixemlînin biken bar	*Getir süsle onları, aldır yükün altına*
Ji zerbeft û qumaş û zêr û dînar	*Sırma ile kumaşla, altın ile dinarla*
Ji şalê terme û kemxa û qapût	*Terme kumaştan, hem kemha kaputtan*
Ji dîba û qeseb û elmas û yaqût	*İpek ile yaldızlı kumaş, elmas ile yakuttan*
Ji safîhayê merwarîd û feyroz	*İncili levhalardan, hem turkuaz taşından*
Ji durr û hem guherhayê şebefroz	*İnciyle mücevher ki, aydınlatan geceyi*
Çihar sed namîdar espê xudanbext	*Dört yüz at, meşhur ve talih getireninden*
Cewahirbend ji zêrê kesme û rext	*Süslensin cevherlerle, eyerleri ve örtüleri*

Diger sêsed xulam ez ‘aribê reş	*Ayrıca siyahîlerden, üç yüz hizmetçiyi*
Li ser ta pê bi dîba û mineqqeş	*İpekler içinde süslü, baştan ayağa kadar*
Ji ‘ebdê Rûmî û Gurcî du hevtad	*Yüz kırk kadar da köle, Rumlarla Gürcülerden*
Dilaram û kemerzêrîn û dilşad	*Gönle huzur, sükûnet, kemerleri altından*
Ji Hindî cariyan heftsed bi dilxwaz	*Hintlilerden yedi yüz, gönüllü cariyeleri*
Verê kir Şahê ‘Asim ê serefraz	*Yola koyup gönderdi, şanı yüce Şah Asım*
Emir kir Şahê Misrê mîrê ‘esker	*Mısır Şahı buyurdu, askerlerin başına*
Ku hazir bin sed û pêncah bi defter	*Ki yüz elli hazır olsun sizden kayıtlı yazılı*
Li ser her mîrekî heddê siwaran	*Her komutan emrinde, sayısı süvarinin*
Ku bijmêrî nebî kem ez hezaran	*Ki saymaya kalkarsan, az değil bin kişiden*
Cemi’ bûn mu’teqîd û merdê qaif	*Toplandılar inançlı, hem işin ehli erler*
Ji salih û ji kamil û ji ‘arif	*Salihlerden kimseler, olgunlarla bilgeler*
Digel wan muftî û qazî û ‘alim	*Onların yanı sıra, müftü, kadı, bilginler*
Biçin yekser bi emrê Şahê ‘Asim	*Gidin hepiniz birden, Şah Asım’ın emriyle*
Herîfê xoşîbîr ê hem melahet	*Düşüncesi güzeller, hem de tatlı yüzlüler*
Bi husnê dengê xoş dil kir bi xaret	*Güzel ve hoş seslerle, yağma etti gönüller*

Hezar şîrîn siwarî şibhê Yûsif
Bin şirin atlılar ki, Yusuf misaliydiler

Bi deng û husnê xwe sahibtelettuf
Sesle hem güzellikle, nezaket ehliydiler

Digel da mitrib û sahibtirane
Ayrıca çalgıcılar, birlikte şarkıcılar

Di dest saz û ney û çeng û çexane
Kemençeyle ney, çengi, eline almıştılar

Bi emrê şahê Poşîn Îbnu Hame
Şah Poşin'in emriyle, ki Ham'ın oğludur o

Bi destê Salih da mehirname
Salih'in elinde ise, vardır mehir mektubu

Emîrê 'eskerî kir Şahê 'Asim
Askerlerin başına emir eyledi Şah Asım

Bi Salih da xelat û kurk û qaqûm
Ödül verdi Salih'e, hediye kürk, samur ile

Bihayê her yekî sed kîs zêde
Değeri her birinin, yüz keseden fazlaydı

Bi emrê Şah lew baş çûn bi rê de
Gittiler Şah emriyle, yolculukları hoştu

Bi kêf û xurrem û dilşad û mesrûr
Keyifle güler yüzle, sevinçle, mutlulukla

Bi nêzîkî Yemen bûn ez rehê dûr
Yaklaştılar Yemen'e, uzun yolun sonunda

Xeber çû şahê Qehtan ê mizeffer
Hemen haber yetişti, şanlı Kahtan Şahı'na

Ji 'erdê "Misrê hat bê hed 'esker
Dediler ki "Mısır'dan, gelmiş sayısız asker

Çiqas deşt û newal û kohsar in
Ne kadar çöl ve vadi, dağlık alanlar varsa

Hemî yekser tijî Rustem siwar in
Dolmuştur süvariyle, her biri Rüstem gibi

‘Egîd û pehlewan, ba nêze û gurz	*Yiğit, pehlivandırlar, mızraklı, gürzlüdürler*
Ji reng Teymûr û Berz û Feramurz[16]	*Andırırlar Teymur’u, hem Berz’le Feramurz’u[16]*
Nezanîn bo çi ew hatine êre	*Bilmiyorlardı niçin, gelmişler buralara*
Bi şer hatine ew yaxûd bi xêr e”	*Onlar savaş için mi, yoksa hayra gelmişler”*
Wekî zanî xeber Şahê mizeffer	*Muzaffer Şah duyunca, bu geliş haberini*
Emir kir, cem’ bû bêhed ‘ekser	*Emir verdi, toplattı, sayısız askerini*
Hemî şerrar ê wek şêr û pilingî	*Tamamı savaşçıydı, aslan ve kaplan gibi*
Digel wan bûn dused fîlanê cengî	*Vardı bir de onlarla, iki yüz savaş fili*
Beraber ‘eskerê xeyran miqabil	*Durdular karşısına, yabancı askerlerin*
Bi sef sekinîn û pirsîn ji mesail	*Saflarla dizildiler, sordular meseleyi*
Wekî dît Misriyan sewtê bilbil	*Mısırlılar ki duydu, bülbül sesi misali*
Seda û dengê waweyla û xulxul	*Seda ile sesini, çığlığın, gürültünün*
Ji Yemen bû bi gazî û bi hawar	*Yemenden geliyordu, bağrışmayla imdatlar*
Bi tîp û sef siwar hatin zirihdar	*Atlı saflar, bölükler, geliyordu zırhlılar*

[16] Teymûr, cûrexwendinek navê “Tîmûr” e. Tîmûrlengê navdar e ku di navbera 1336-1405an de jiyaye. Damezrînerê İmperatoriya Timûr û yekemîn serdarê wê ye. Ji bo “Berz” ve “Feramurz” (Feramerz), bnr. têbiniya 3em.

[16] Teymur, “Timur” isminin farklı bir okunuşudur. 1336-1405 yılları arasında yaşamış meşhur Timulenk’tir. Timur İmparatorluğunun kurucusu ve ilk hükümdarıdır. Berz ve Feramurz (Feramerz) için, bkz. 3. dipnot.

Koh û deşt û newal bûn pirr ji ‘esker	*Dağlar, ova, vadiler, askerle doluydular*
Bi gurz û nêz û şimşîr û xencer	*Gürzlüler, mızraklılar, kılıçlı, hançerliler*
Misala ‘eskerî borî bi şengî	*Görkemle yürüdüler, tören yapan askerler*
Digel wan da dihatin filê cengî	*Gelmekteydi beraber, hem de savaş filleri*
Ji dengê gurrêna saz û neqare	*Uğultusundan sazın, hem davul seslerinin*
Newal pirr bûn û esker bê şumare	*Çok sayıda vadiler, askerlerse sayısız*
‘Egîdan gurz û nêze girte çengan	*Aldı ele yiğitler, gürzlerle mızrakları*
Di ber hatin wekî şêr û pilingan	*Geliyordu karşıdan, aslan, kaplanlar gibi*
‘Egîdê Misriyan ê merd û dilêr	*Mısırlı yiğitler de mertçe ve cesaretçe*
Bi sef seknîn û gotin Salihê şêr	*Dizildiler saflarla, dediler aslan Salih’e*
“Eger izn û rizayê tu bikî hez	*“Şayet iznin ve rızan, hem eğer ki seversen*
Biçin wan em bikin wek gurgê ba pez	*Saldıralım onlara, kurtlar gibi sürüye*
Bi iznê Qadirê Qeyyûm ê Dadar	*İzniyle Kadir Allah’ın, Kayyum hem Adil’in*
Bi yek lehze nehêlin yek ji rêdar	*Bir anda bitirelim, kalmasın tek bir atlı*
Keleh û birc û hêsaran jê s’tînin	*Alalım kaleyle burç, hem de hisarlarını*
‘Efîfa nazenîn bo Şahî bînin”	*İffetli nazenini, getirelim Şah için”*

Cewab da Salihê sahibmelahet
Tatlı söz hoş tabiatla, Salih ki cevap verdi,

“Ku ew qisse dibîtin pirr qebahat
“Söylediğiniz sözler, bilin büyük bir suçtur

Çira em dawetiyên mest û ez mey û benc
Zira biz davetliyiz, şarapla bençten mestiz

Wisan hatine dê bikeyne ya qenc
İyilikler yapacağız, bunun için gelmişiz

Eger em wê bikin dê bit xerabî
Eğer aksini yaparsak, sonuç kötü olacak

Cewab dê biçite pêş ‘Alîcenabî
Ulaşacak haberi, zatı yüce Şahımıza

Riza nîn e bi cengî Îbnu Sefwan
Savaşa yok rızası, bilin İbn-i Safvan’ın

Digel ehlê Yemen ba Şahê Qehtan”
Ne Yemen’in halkıyla, ne de Kahtan Şahı’yla”

Li paşan gote Salihê senaxwah
Ardından dedi ki, kadir, kıymetli Salih,

“Bi du ‘aqilkamil herne pêş Şah
“İki olgun akıllı, gidin Şah’ın huzuruna

Bibêjnê dost in û em nînin bi dişmen
Deyin ki bizler dostuz, bilin düşman değiliz

Bi qasidî ku em hatine Yemen
Yalnızca elçilikle, gelmişiz biz Yemen’e

Hediye û namehayê Îbnu Sefwan
Hediye ve mektuplarını, İbn-i Safvan’ın

Me anîne ji bo wî Şahê Qehtan”
Kahtan Şahı’na bizler, vermekle görevliyiz”

Wekî ‘aqil û kamil çûne pêş Şah
Birer akil ve olgun gibi, vardılar Şah’ın önüne

Bi xizmet ‘erd bûsîn ba senaxwah
Saygıyla yeri öptüler, övgülerle beraber

Yeka yek nerm û şîrîn ba fesahet	*Birer birer, yumuşak, tatlı, fasih dil ile*
‘Erz kir qewlê Salih ba selahet	*Arz edip sundular, Salih’in sözlerini*
Dilê Şahê Yemen bû zêde mesrûr	*Fazlasıyla sevindi, Yemen Şahı’nın gönlü*
Bişaret da siwaran nêzîk û dûr	*Süvarilere müjde, verdi yakın uzağa*
Bi şahî tevlî hev bûn herdu derya	*Sevinçle, mutlulukla, karıştı iki deniz*
Seda û dengê espan çû Sureyya	*Atların ses, sedası, yükseldi ta Ülker’e*
‘Egîdanê ji xwe bûn zêde razî	*Kendine çok güvenen, savaşçı yiğitler*
Demek kir wan bi hevra nêzebazî	*Bir süre birbiriyle, oynadılar mızrakla*
Welê ehlê Yemen ba ê xwe qail	*Ancak Yemen ehlinden, kendine en güvenen*
Ji sed ba yekê Misrê ney miqabil	*Denk gelmez yüz tanesi, Mısırlı bir tek ferde*
Bi emrê Şahê Qehtanê mizeffer	*Şanlı Kahtan Şahı’nın, emriyle, aceleyle*
Qonaxê qenc dan bo cimle ‘esker	*Tüm misafir askere, verdi hoş konaklar*
Kirin araste hem text û dîwan	*Hem taht ile divanı, donattılar özenle*
Ji bo Salih digel be’zî nedîman	*Salih ile birlikte, kimi nedimler için*
Wê rojê qisse bû nav wane mestûr	*O gün gizli tuttular, geliş nedenlerini*
Şahê Qehtanê çû ser textê mesrûr	*Kahtan Şahı da gitti, sevinçle taht üstüne*

Serîrê textê ‘irfan û mehebbet	*Çıktı şahlık tahtına, anlayışla saygının*
Lebê camê şerabê sirrê wehdet[17]	*Vahdet sırrı şarabı, kadehi dudağının[17]*
Dixwazim ez ji te ey nûrê ‘eyneyn	*İstiyorum senden ben, ey iki gözün nuru*
Digel remzek ji sirrê “Qabê qewseyn”[18]	*Bir de bir tek işaret, “Kab-ı Kavseyn” sırrından[18]*
Di hîna fecrê sadiq bû mi’etter	*Sökmesiyle şafağın, saçıldı hoş kokular*
Tulu’ê şemsê kir dinya minewer	*Güneşin doğmasıyla, sardı yeri ışıklar*
Tufeylê baxî kir meylê gulistan	*Asalağı bağların, meyletti gülistana*
Xulam hatin li pêşî Şah vewestan	*Hizmetçiler geldiler, Şah önünde durdular*
Emir kir Salih û çend mîrê qaif,	*Emir buyurdu Salih, seçkin birkaç beyine,*
“Hedîyan hûn bibin pêş Şahê ‘arif	*“Götürün bilge Şah’a, armağanları sizler*
Bibêjin cimle şandin Îbnu Sefwan	*Deyin ki hepsini, göndermiş Safvan Oğlu*
Digel bêhed dû’a bo Îbnu Qehtan”	*Birlikte de çok dua, etmiş Kahtan Oğluna”*

[17] Sirrê wahdet, ew bawerî ye ku dibêje hemû heyber, ji hêla afirînerekî hatine xuliqandin û têne birêvebirin. Bu gotnek din, di suruştê de her bûnewer, ji bo hebûn û jiyana xwe têkildar û hewcedarê hev in. Di vî warî de, çi rasterast, çi nerasterast di nav danûsitandinê de nin. Lê ev têkilî û hewcedarî ji hêla wan ve nehatiye serrastkirin, ji viya re tekûzdarekî xwedî zanîn, hêz û viyan divê ew jî Xwedê yê “Wahid” e.

[18] Qabê Qewseyn, têgehek Quranî ye. (Bnr. Sûreya Necm, a. 9). Wiha tê şîrovekirin. Piştî alema maddî ya bi navê “îmkân”diqede, alema “wicûb” dest pê dike. Ji vê navberê re “Qabê Qewseyn” tê gotin. İmkan “mexlûq”, wicûb “Xaliq” îfade dike. Di bûyera Mîracê de, qonaxa ku Pêxember lê rawestaye bi vî navî tê gotin.

[17] Vahdet sırrı, bütün varlıkların tek bir yaratıcı tarafından yaratılıp yönetildiği inancıdır. Bu inanca göre, tabiattaki her bir varlık, kendi dışındakilerle doğrudan ya da dolaylı olarak ilişkidedir ve ihtiyaç hâlindedir. Ancak bu ilişki ve ihtiyaç kendiliğinden değil, bunu düzenleyen bir üstün varlıkla mümkün olmuştur. O ise, “Vahid” olan Allah’tır.

[18] Kab-ı Kavseyn, Kur’an’da geçen bir kavramdır. (Bkz. Necm Suresi, a. 9). Bu kavram, “imkân/yaratılmışlar” kapsamına giren madde âleminin bitip Allah’a özel “vücub/yaratıcılık” âleminin başladığı aralıktır. Hz. Peygamber’ın “Mirac” yükselişinde geldiği son aşamadır.

Wekî wan bir hediye Şahê î'lam
Ne zaman götürdüler, armağanları Şah'a

Bi wan bû yek bi yek cimle bi itmam
Bıraktılar tek tek, en sonuncusuna dek

Bi xizmet erd bûsîn kir di teqrîr
Saygıyla eğildiler, sonra yeri öptüler

'Ecaib qisseha wek şekir û şîr
Süt ve şeker gibi, güzel söz söylediler

Li canê Şah xoş hatin wesayet
Ruhuna tatlı geldi, akrabalık işi Şah'ın

Dûa'ê qenc û tuhfat û hediyet
Hayırlı dualarla bu güzel armağanlar

Dilê Şah ez hediye ma 'ecaîb
Hediyelerden gönlü, Şah'ın kaldı hayrette

Çira kem dîbû ba xwe ew xeraîb
Çünkü az görmüş idi, bu garip eşyalardan

Emir kir wê demê Şeh ba xezîndar,
Emretti Şah o anda, hazine bakanına,

"Hilîn yekser hediye qenc bi hejmar"
"Kaldır armağanları, birer birer sayarak"

Li paşan gote çawîş, Îbnu Qehtan,
Ardından Kahtan Oğlu, döndü çavuşa dedi,

"Tu her pê qasidanê Îbnu Sefwan
"Git getir elçileri, İbn-i Safvan Şah'ının

Kerem ken bên bixwin cam û mey û beng
Buyurup da gelsinler, içsinler şarap ve benk

Bikin guhdariyê saz û ney û çeng"
Gelsinler, dinlesinler, sazı, neyi ve çengi"

Bi emrê Şahî hatin cimle yekser
Şah emriyle geldiler, bütün elçiler birden

Digel Salih sed û pênceh serwer
Salih'in yanında onlar, yüz elli beydiler

Yeka yek bûse da wan payê text
Dua' kir wan ji bo îqbal û bext

Tek tek öptüler, Şah'ın tahtının ayağını
Duacı oldu onlar, talihi ve bahtı için

Li pê ehlen we sehlen merhebayê
Digel xweş hatin û xêr û sefayê

Güzel karşılama ve merhabanın ardından
"Hoş geldiniz"lerin yanında, hayır, safa, dilekler

Mueddeb rabû Salih mehr û name
Çeleng wî da bi destê Şahê 'ellame

Edep içinde kalktı Salih, mehir mektubunu
Verdi güzel şekilde, bilge Şah'ın eline

Emir kir katiban, "Kaxiz bixwînin
Ji metnê hûr me'nayê derînin"

Emretti kâtiplerine, "Kâğıdı okuyun
İnce, ufak metinden, siz manayı çıkarın"

Wekî xwend katiban xettê mehebbet
Beqa bada ji bo Şeh text û dewlet

Kâtipler okuyunca, muhabbet kokan yazıyı
Beka dileyen Şah'ın, tahtına ve devletine

Hedîsê doxterê tê da bi itmam
Ji me'nê, Şah û hal bû serencam

Tamam olarak yazmış, kızının meselesini
Anlaşılmıştı Şah'ın, hem durumu yazıdan

Li paşan name pêça, bûsî da ser
Emir kir Şahê Qehtanê mizeffer,

Mektubu sardı, öptü, koydu kendi başına
Emretti ki Kahtan'ın, şanlı, muzaffer Şahı

"Bedel kaxiz ku bê binvîs katib
Ji bo Şahê 'Asim sahibmeratib"

"Mektubuna karşılık, sen de yazwer kâtip
Makamı yüksek olan, Şah Asım'ın şahsına"

Nivisî katiban dewlet mu'ezzem
Yazdı kâtipler dedi, devletiniz büyüsün

Celîlûşşe'ni welqedrul mukerrem
İşleriniz yücelsin, kadriniz saygın olsun

Hemî ferxende bada text û îqbal
Tahtınız ve bahtınız, kutlu olsun her zaman

Se'adet yawerî ba cah û iclal
Makamlar, saygınlıklar, mutluluk senin olsun

"Beqa bin bo te daîm tac û hem text
"Daim olsun seninle, tacın ve tahtın

Me bada kes bi mislet tali' û bext
Hiç olmasın sana denk, bahtta, şansta bir kimse

Pes ez de'watê name cimle mefhûm
Davet mektubunuzu, tamamen anladım ben

Ji min ra metn û me'na bû bi me'lûm
Tarafımdan bilindi, metni ile manası

Eger çendan ku ez zêrînkulah im
Her ne kadar olsam da altından taç sahibi

Qedîmê bendeyê an 'alîcah im
Makamı yüce olan, Şahımın bendesiyim

Ji bab û ced eger çi tacîdar in
Atalardan, ecdattan, her ne ki padişahız

Çu bende bêser û xizmetguzar in
Kayıtsız köle gibi, ayrıca hizmetkârım

Hedîsê doxterê wek min dî yekser
Kızın meselesini ki, görür görmez anladım

Me pêça name bûsî danî ser ser
Sardık, öptük mektubu, koyduk başımıza biz

Bi çeşm û ser ji kîs xwe kem tedarek
Başım, gözüm üstüne, hazır edem kesemden

Verêkem ez ji bo Şahê mibarek
Yollayayım onu ben, mübarek şahım için

Çira dinyayê dûn pirr bêwefa ye	*Aşağılık dünya çünkü, çok vefasızdır*
Bê ‘ehd û bê qerar û bêsefa ye	*Güven olmaz ona, kararsız, sefasızdır*
Eger tê da xerabî key micerreb	*Şayet onda denersen, kötülüklerden bir şey*
Dê bînit wê ji qenciyê bit miqerreb	*İyilikten daha çok, ona yakın olursun*
Ji nehsê nabînî tu xeyrê nehsê	*Uğursuzluktan yine, doğuyor uğursuzluk*
Ji qencîyê tête dîn Ewradê Qudsê[19]	*Geliyor iyilikten, “Kudsî Evrad”ın hayrı[19]*
Eger tu ‘arif î ba qenc biçîne	*Şayet bilge isen, iyilerle yoldaş ol*
Ji xeyrê qenciyê tiştek mebîne	*Ta iyilikten gayrı, bulmayasın bir şey*
Tu nabînî ji wî pîs û mirarî	*Göremezsin sen, onda pis ve murdardan başka*
Ji xeyrê daî yû wergirt û xwarî	*Ona it, kurt, kartaldan, konar mı gayrı*
Were ser dîderonî ehlê raz im	*Gel ey gözün ışığı, ben ki sırlar ehliyim*
Tecellayê cemalê Heq dixwazim	*İstiyorum tecellisini, Hakk’ın cemalinin*
Ji qelbê min têye bêhna kebabê	*Yüreğimden geliyor, bak kebap kokusu*
Were saqî tu bîn camê şerabê.”	*Gel de getir ey saki, sun şarap kadehini“*

[19] Ewradê Qudsî, dûaya Şahê Neqşîbend (1318-1389) e. Bi sûdgirtina ji dûayên di ayet û hedîsan de derbas dibe pêkaniye. Bi navê “Ewradê Behaiye” ye jî tê naskirin.

[19] Kudsî Evrad, Şah-ı Nakşibendi’ye (1318-1389) ait bir duadır. Ayet ve Hadislerde geçen dualardan istifadeyle tertip edilmiştir. “Evrad-ı Bahaiye” olarak da bilinir.

Wekî kaxiz temam bû Şah bipêçan	*Tamam olunca mektup, Şah parmağıyla hemen*
Işaret kir tijî keyn tas û fincan	*İşaret buyurdu ki, doldurun tası, fincanı*
Meyê heft sal û saqî çardeh sal e	*Sakiler on dördünde, şarapsa yedi yıllık*
Çi xweş şirb û nezerhusn û cemal e	*İçimi gayet hoştur, bakışlar ince, zarif*
Di dîwanê gerandin meyfiroşan	*Gezdirdiler divanda, şarap sunan sakiler*
Dilê sahibkemalan hate coşan	*Yüreği olgunların, geldi raksa, coşmaya*
Bi hevra mitribanê mest û mexmûr	*Çalgıcılar birlikte, mest ve mahmur olarak*
Li sed reng lêdidan tenbûr û sentûr	*Çalarlardı yüz tarzda, tambur ile santuru*
Ji dengê çeng û awazçixane	*Çengin sesinden hem, çığanın nağmesinden*
Sedayê mitrib û sahibtirane	*Çalgıcılar sesinden, şarkıcı sedasından*
Nezerbaziyê çeşmê meyperestan	*Düşkünleri şarabın, neşeli gözlerinden*
Gulrûsadeyê fincan bi destan	*Ellerinde fincanlar, sade gül yüzlülerden*
Gelek sahibkemal bûn dîn û ebter	*Olgunlardan çok kişi, delirdi, kırıldılar*
Nebûn hişyar esla ta bi mehşer	*Uyanamadılar hiç, ta mahşere kadar*
Ji berqê ‘işq, şewqê camê zerkeş	*Şimşeğinden aşkın, altınsı kadehin şavkından*
Dilê ‘uşşaq û mestan bû mişewweş	*Âşıklarla mestlerin, gönlü oldu müşevveş*

Wekî mest bûn di dîwan cimle yekser	*Mest düştüğünde birden, divandakiler hepsi*
Emir kir wê demê Şahê mizaffer,	*Emir buyurdu o an, şanlı ve muzaffer Şah,*
“Xelat bînin ji bo wan kurk û qapût	*“Getirin hediyeler, onlar için kürk, kaput*
Qeba û şal û terme, zêr û yaqût	*Samur, kumaş ve ipek, altın ile hem yakut*
Ji gurz û nêze û şimşîr û cewşen	*Gürzlerden, mızraklardan, kılıçlardan ve zırhtan*
Ji rext û kesme û ayîn û rewşen”	*Eyer ve örtülerinden, törenle, âşikârca”*
Ji wan re dan xelat yek û yek bi tertîb	*Verdi armağanları, birer birer sırayla*
Welê Şah kir bi Salih zêde terxîb	*Ancak Şah fazlasıyla, ilgilendi Salih’le*
Li ser ta pê şeland xwe Şahê Qehtan	*Baştan ayağa kadar, her şeyi Kahtan Şahı*
Bi Salih da wezîrê Îbnu Sefwan	*Alıp verdi Salih’e, İbn-i Safvan veziri*
Mihessel roj bihurandin bi itmam	*Özetle, geçirdiler, günlerini bu şekil*
Bi keyf û xurrem û şadî heta şam	*Keyif, şenlik, mutluluk, akşam oluncaya dek*
Digel Salih ve rabûn çûne begler	*Kalkıp gittiler beyler, Salih ile birlikte*
Bi fanosan kirin qonax enwer	*Aydınlattılar tümden, fanuslarla sarayı*
Minewwer bûn dilê mecrûh û tarî	*Aydınlandı gönüller, yaralı ve karanlık*
Ji şewqa badeyê çeşmên xumarî	*Uykulu gözler dahi, ışığıyla badenin*

‘Uyûnên dilberan pirr xemzebaz in	*Yüzleri dilberlerin, çok gamzeli, cilveli*
Serê mijgan wekî sertîr û gaz in	*Kirpikleri ok ucu, sanki kerpeten gibi*
Dilê min bû ji wan mecrûh û mesrûr	*Gönlüm onlardan yana hem yaralı hem mutlu*
Gehî zulmat e, gehî pirr şû’leyê nûr	*Bazen karanlıktırlar, bazen çok nurludur*
Digel fecrê ku bişkift helqeyê gul	*Fecirle birlikte ki, açıldı gül goncalar*
Di nav de kurnî kir ‘uşşaqê bilbil	*Ötüverdiler arasında, âşık olan bülbüller*
Qijîna bilbilan çû xonçedîba	*Bülbüllerin feryadı, ipekten goncalara*
Ji hev rakir nesîm zilfê semensa	*Erdi, savurdu rüzgâr, yasemin zülüfleri*
Digel deng û sedayê wan tuyûran	*Kuşların sesleriyle, hem sedası onların*
Diêtûn û li min her dem diûran	*Yakıyorlar her vakit, yüreğimle bağrımı*
Li ser textê xwe rûnişt Şahê Qehtan	*Tahtı üstüne çıktı, Kahtan’ın namlı Şahı*
Emir kir serxezîndar û nedîman,	*Maliyecisine hem, emretti nedimlere,*
“Cihêzê doxterê ken qenc tedarek	*“Hazırlayın güzelce, çeyizlerini kızın*
Ku xas û ‘am bibêjin sed tebarek”	*Ki seçkin de avam da, yüz maşallah desinler”*
Bi emrê Şah heft filê wekî Qaf	*Emri üzere Şah’ın, dağ gibi yedi fili*
Kirin bar cimle yekser ez zêrê saf	*Yüklediler tümünü, tamamı saf altınla*

Diger nehsed deve ez kurk û qapût	*Dokuz yüzü deveyi, ayrıca kürk, samurla*
Kirin bar ez qumaş û durr û yaqût	*Yüklediler kumaştan, inci ile yakuttan*
Ji incî û ji elmas û cewahir	*İnciden, elmaslardan, çeşit çeşit cevherden*
Nizanin kes hisabê xeyrê Qadir	*Allah'tan gayrı kimse, hesabını bilmezdi*
Ji mircan û bi dexşan û ji feyroz	*Mercandan ve billurdan, hem firuze taşından*
'Eqîq û gewher û seng şebefroz	*Akikten, cevherlerden, gece ışıtan taştan*
Ji bêhnê xweş û misk û 'ud û 'enber	*Miskte, uttan, amberden, nice hoş kokulardan*
Kir barê sed deve bilcimle yekser	*Yüz deve yükü tuttu, baştan başa tamamı*
Ji Hindî cariyan û 'aribê reş	*Hintli cariyelerden, siyahî Araplardan*
Du sêsed bûn û temamî pêncî û şeş	*İki yüzü birinden, diğerinde tam elli altı*
Ji Gurcî û ji Rûmî cariyan bes	*Yeterince Gürcü'den, hem Rum cariyelerden*
Du pansed bûn temamî şêst û şeş kes	*Birinden bin idi, diğerinde tam altmış altı*
Du şeşsed espê dûvqetran ê wesme	*Seçilmiş atlardan hem, bin iki yüz Arap atı*
Cewahirbend ji zêrê rext û kesme	*Cevherlerle süslenmiş, eyerler ve örtüleri*
Xuddamê nasih û mehbûbê pencah	*Elli kadar rehberden, sevimli hizmetçiden*
Kirin hazir Şehê Qehtan ji bo mah	*Hepsini ay kız için, hazırlattı Kahtan Şahı*

Emir kir Şeh xuddaman cimle yekser,	*Cümle hizmetçilere, emretti Şah bir baştan,*
“Tedarek keyn letîfa mahê peyker”	*“Hazırlayın dedi, ay yüzlü sevgiliyi”*
Xuddam hatin, letîfa nazikendam	*Hizmetçiler geldiler, nazik boylu güzeli*
Serê wê şuştin û anîn ji hemam	*Yıkadılar başını, getirdiler hamamdan*
Bi husna zîwerî dan mahê tezyîn	*Gümüşî süsler ile, donattılar ay kızı*
Dused Ferhad kuştin le’lê şêrîn	*Şirin dudakları, öldürdü iki yüz Ferhat’ı*
Kejawe mahfe anîn pêşê dergah[20]	*Getirdiler huzura, tahtırevan mahfeyi[20]*
Di nav ‘ewrî star bû çardehê mah	*Ona girdi gizlendi, o on dördündeki ay*
Bi emrê Şah li paşan cimle ‘esker	*Ardından Şah emriyle, arkadan cümle asker*
Bi rê da çûn birin ew mahê peyker	*Yol alıp götürdüler, o ay yüzlü dilberi*
Bi Salih got Şah û dayê name,	*Salih’e bir mektubu, verip ona dedi Şah,*
“Bibûsî penceyê Şahê ‘ellame”	*“Öpesin ayağından, yerime bilge Şah’ın”*

[20] Mahfe, wek sepetek sergirtî ye ku li ser pişta hêştir an filan tê danîn. Tê de, cihê rûniştina hemberî heye.

[20] Mahfe, deve veya fil gibi hayvanların sırtına konan ve karşılıklı oturacak yerleri bulunan bir nevi kapalı sepet.

Du pansed namîdar çûn kohê Elburz[21]	*Bin namdar ile gittiler, Elbruz Dağlarına[21]*
Verêkir Şah misalê Gîwê Guderz[22]	*Yolladı Şah onları, Güderz oğlu Giv gibi[22]*
Wekalet hem bi Salih da Şehinşah	*Hem vekâleti verdi, Salih'e şahlar şahı*
Ji bo 'eqd û nikah û mehrê ba mah	*Ay yüzlü akdi için, nikâh ile mehrinin*
Li paşan çûn bi rê da û bi şadî	*Ardından düştü yola, mutlu, mesut olarak*
Kirin tayê menzil û sehra û wadî	*Kat etti menzilleri, sahrayla vadileri*
Bi şadî û bi zewq û keyf û mesrûr	*Mutlulukla, hem zevkle, keyifle hem sevinçle*
Bi nêzîk bûn ji Misrê ez rehê dûr	*Uzun seferden sonra, yaklaştılar Mısır'a*
Du kes çûn mujde bir bo Şahê 'Asim	*Müjdeyle Şah Asım'a, gittiler iki kişi*
Bi wan da Şah du esp û kurk û qaqûm	*Şah verdi ikisine, iki at, kürk ve samur*
Ku Salih hat û 'esker cimle dilşad	*Ki Salih'le askerler, cümlesi geldi mutlu*
Hediye-w nameyê Şahê perîzad	*Hediyeyle mektubu, periden olma Şah'ın*

[21] Kohê Elbrûz, li bakurê Îranê, çiyarêzekî li seranserê başûrê Deryaya Hezerê ye. Dîsa, li ser çiyarêzên Qefqasan girseyek volkanik ya bi navê "Elbrus" jî heye ku lûtkeya herî bilind ya Ewrûpê ye. Bo vê yekê, çi têkiliya van çiyan û Yemenê çênekir. Lê bi vê wesîlê, mirov dikare nasnameya şaîr ya Îranî hîn bibe.

[22] Gîwê Guderz, du lehengên efsanewî yên Îranê nin. Li gor Şehnameya Firdewsî, Gîw, kurê Guderz, bavê Bijen, zavayê Rustemê Zal e. Bi rizgarkirina Keyxusrew ya ji destê Tûraniyan navdar e. Guderz, wek Rustem, fermandarekî navdar yê Keyxusrew e. Li pêşber hicûmên Tûranê gelek serkeftin bidest xistiye.

[21] Elbruz Dağları, İran'ın kuzeyinde, Hazar Denizi boyunca uzanan bir dağ sırasıdır. Bir de Rusya sınırlarında, Kafkas Dağlarının en yüksek kütlesi olan volkanik Elbrus Dağı vardır. Dolayısıyla, Yemenle ilişkisini kuramadım. Şair, İranlı kimliğine bir işaret olarak, ülkenin bu meşhur dağlarını zikretmiş olabilir.

[22] Guderz oğlu Giv, bu iki şahıs, İran'ın efsanevî kahramanlarındandır. Firdevsî'nin *Şehname*'sine göre, Giv, Güderz'in oğlu, Bijen'in babası, Rüstem'in damadıdır. Turan ülkesinden, Keyhüsrev'i kurtarmasıyla meşhurdur. Güderz, Rüstem gibi, Keyhüsrev'in komutanlarındandır. Turanlılara karşı zaferleriyle meşhurdur.

Bi emrê Şah di wê gavê delalan	*Şah'ın emriyle hemen, tellallar ilan etti*
Nehêla kes bisekine qet di malan	*Bırakmadılar kalsın, hiç kimse evlerinde*
Ji bajar û ji sûkê Misrê yekser	*Şehir ve çarşılarda, birden bütün Mısır'dan*
Bi xas û 'am hatin pêşî 'esker	*Seçkin, sıradan herkes, geldi asker önüne*
Çi mêr û jin mezin û hem piçûkan	*İster erkek ve kadın, ister büyük ve çocuk*
Nema qet kes di malan û di sûkan	*Kalmadılar tek biri, evlerde, çarşılarda*
Di pêşî şox û mehbûb û delalan	*Sevgili ve sevimli, nazlıların önünde*
Didan tirçik bi hevra pîr û kalan	*Raksa durmuştu hepsi, yaşlı ile ihtiyar*
Bi ser mehfe perîzadê durefşan	*Peri kızının mahfesi üstüne, inci saçtılar*
Bi xas û 'am kirin vêkra zêrefşan	*Seçkin ve avam, birlikte altın saçtılar*
Jinanê Misriyan ê xemzeperdaz	*Mısır'ın kadıları, gamze saçan güzeller*
Ji mehfê anî der ew xonçeyê naz	*Çıkardılar mahfeden, o nazenin goncayı*
Di qesrek xasî da danîn ew mah	*Bir hususi saraya, bıraktılar o ayı*
Hetta sibhê bikin mehrê wê ez Şah	*Ta kıyılsın sabah, Şah'la onun nikâhı*
Sirra 'eqda dilê xwe ba cemalek	*Bir güzelle gönlünün, akdinin sırrını o*
Şîrîn û enwerîn û rû bi xalek	*Bir ben vardır yüzünde, tatlı ve ışık saçan*

Heta heşrê venabit ew mi'eyyen	*Haşre kadar açılmaz, kesin olarak öyle*
Ji wê bû dil tijî şewq û mizeyyen	*Gönül onunla doldu, ışıkla süslenerek*
Wekî bêhna nesîmê fecrê sadiq	*Şafağın rüzgarıyla, gelen hoş koku gibi*
Li zilfê 'enberîn da qelbê 'aşiq	*Amberli zülüflere, vuruldu âşığın gönlü*
Bi bê cezbe dilerizî hate recfê	*Cazibesiz titredi, başladı üşümeye*
Li wechê gul belav bûn tayê zilfê	*Saçıldı gül yüzünde, zülüflerin telleri*
Xuddamê nasih û mehrûyê çun gul	*Öğütçü hizmetliler, gül gibi ay yüzlüler*
Li bal hevdu deranîn ce'dê sinbil	*Yan yandan çıkardılar, başağın kıvrımını*
Wekî miskê belav bûn tayê zilfan	*Misk gibi saçıldılar, telleri zülüflerinin*
Şikavtin yek bi yek pişkoj ji qulfan	*Çözdüler düğmeleri, tek tek iliklerinden*
Deranîn nerm û şîrîn dest ji came	*Çektiler eli kadehten, yumuşakça, şirince*
Ji xew rabûn li paşan nû nemame	*Sonra kalktı uykudan, yeni doğmuşlar gibi*
Li hemamê ku rûniştî ew perîrû	*Ki hamamda oturunca, o peri misal yüzlü*
Li belgê gul belav bûn 'enberîn mû	*Gülün yapraklarına, saçıldı amberli saçları*
Letîfa nazenîn şûştin perîweş	*Yıkadılar güzeli, nazlı, peri yüzlüyü*
Li paş avête ser libsek mineqqeş	*Sonra onu sardılar, nakışlı bir giysiye*

Heta ku hişk bûn gul ez gulavê
Güller kuruyana dek, güllerin suyundan

Ji ce'dê 'enberîn avê xunavê
Amberli saçlarından, çiy ve jale suyundan

Mizeyyen kirne ber çun gulkirasek
Süslediler önünü, tıpkı gülden fistanla

Li ser wergirt ez sinduslibasek
Geçirdiler üstüne, sündüsten bir giysiyi

Li ser ferqê wekî miskê bi dor ker
Tepesinin etrafına, miskleri döker gibi

Şîrîn danîn tacek zer ji gewher
Kondurdular başına, cevherlerden bir tacı

Cewahirbend û elmas û mirarî
Cevherlerle süslenmiş, elmas ve incilerle

Miselsel hatne xwar ser ce'de tarî
Peş peşe döküldüler, siyah kıvrık saçlarına

Ji ber xalan ve yek yek misk û 'enber
Benlerinden ötürü, tek tek misk ve amber

Niqut danîne ser wechê minewwer
Damlalar bırakmışlar, parlak olan yüzüne

Du çahvê wê ji sibhanî kirin reş
İki gözünü sürme, sürüp siyah ettiler

Dibû qelbê 'uşşaqan jê mişewweş
Sersemleşti bununla, âşıkların kalpleri

Gelek bedîl kirin çahvê xumarî
Değiştirdiler çokça, mahmur olan gözleri

Du ebrûwesme dan çun qewsê tarî
Rastık çekip iki kaşına, ettiler siyah yaylar

Guharên şebçirax bend kir miheyya
Geceyi ışıldatan, küpeleri taktılar

Di goşan da wekî 'Iqdê Sureyya
Kulaklarında sanki, Pervin yıldız grubu

Di enfê kir ji zêrê saf wekî nûr	*Taktılar saf altından, burnuna nur misali*
Xizêmek lê di nav da gewherê hûr	*İnce ince cevherle, bezenmiş bir hızmayı*
Tijî kir gerdana zer durr û mircan	*Boynunu donattılar, altın, inci, mercanla*
Miselsel zêrî çun cotê fincan	*İki fincan göğsünü, kaplattılar altınla*
Wekî fincanê ferfûrî du bistan	*Fağfurdan fincan gibi, göğüslerin ikisi*
Mişewweş kir dilê heyran û mestan	*Mestlerin, hayranların, sersemletti gönlünü*
Kemer bestin li bejna ‘er’erên şeng	*Selvi gibi boyuna, doladılar kemeri*
Du destên nazenînê bûn henareng	*Yaktılar ellerine, kınayı nazeninin*
Di enguştan kirin elmas û yaqût	*Taktılar parmağına, elmas ile yakutu*
Li paşa kirne ber sencab û qapût	*Ardından giydirdiler, samur ile kaputu*
Li ser ta payê xemlandin cebînnûr	*Serapa süslediler, nur alınlı dilberi*
Li ser textek zêrîn danîn ew hor	*Altından taht üstüne, oturttular huriyi*
Li paşa saqiyan anîn mey û beng	*Ardından getirdiler, sakiler şarapla beng*
Miheyya kir mitriban naxme û çeng	*Sazcılar hazırladı, nağmeyle çenklerini*
Kirin zewq û sirûrî pêşî mah	*Ettiler zevkle eğlence, ay parçası önünde*
Heta şev bêt zava ‘Asimê Şah	*Geceye kadar, gelene dek damat Şah Asım*

Bi emrê Îbnu Sefwan Şahê ‘Asim	*Şah Asım’ın emriyle, ki Safvan’ın oğludur*
Cemi’ bûn miftî û qazî û ‘alim	*Toplandılar müftüler, kadılar ve alimler*
Wekîl bû Salih û damadê bû Şah	*Salih oldu kızın vekili, damat ise Şah Asım*
Bi Tewrat û Zebûr û Hukmê Ellah	*Tevrat ve Zebur ile, hem Allah’ın hükmüyle*
Birrîn ‘eqdê nikaha Bintê Qehtan	*Kıydılar nikâh akdi, güzel Kahtan kızının*
Ji bo wê Şahê ‘Asim Îbnu Sefwan	*Şah Asım’ın adına, ki Safvan’ın oğludur*
Li paşan rabû Şahê dilminewwer	*Ardından kalktı gitti, gönlü aydın olan Şah*
Xiraman hate ber dergahê doxter	*Naz ve edayla geldi, kızın kapısının önüne*
Xuddaman nêrî hev ku ew meqale	*Bakıştı hizmetçiler, anladılar konuyu*
Bi hevra rabûn û dîwan betale	*Gittiler hep birlikte, boşalttılar divanı*
Yekayek çûne der cimle bi itmam	*Birer birer cümlesi, dışarıya çıktılar*
Li paşan Şahî got: “Es-Sîn û we’l-Lam”[23]	*Ardından Şah dedi ki, “Es-Sîn û ve’l-Lâm”[23]*
“‘Eleyke” hem cewab da gul selam[24]	*Gül gelin cevap verdi ve “Aleyke” diyerek[24]*
Bi nerm û şîrînî wî an bû temam	*Yumuşakça, tatlıca an gelip tamam oldu*
Di hîna Şah deranîn kurk û qapût	*Şah çıkardı üstünden, kürkünü, kaputunu*
Li ser kafûrê danî le’l û yaqût	*Kondurdu gerdanına, dudağını, ağzını*

[23] Es-Sîn û We’l-Lam, ango, “Esselam” (Silav be).

[24] ‘Eleyke, ango “Li ser te”.

[23] Es-Sîn û Ve’l-Lâm, yani “Esselam” (Selâm olsun) demektir.

[24] Aleyke, yani “Senin üzerine” demektir.

Kirin hembêz hevdu, bûn hemaxûş
Kucaklaştı ikisi, sarmaş dolaş oldular

Ji le'l û rûyê hev dan bûseyên xoş
Kondurdu hoş bûseler, dudak ve yanaklara

Li paşan ketne serhev û mehr û ba mah
Sonra alt-üst oldular, ay ile güneş gibi

Du destên xwe li bejnê kir kemer Şah
Şah doladı kolları, kemer gibi endama

Du saqê sîmê saf ez pişt bider kir
Belden açığa vurdu, saf gümüş inciklerden

Bi elmas durrê nasufte kun kir
Deliverdi elmasla, el değmemiş inciyi

Bi emrê Şahê Rebbê Asimanî
Göklerin Şahı olan, emri ile Rabbinin

Ji ewwel car hemlê xwe hilanî
İlk seferde yükünü, yüklendi gebe kaldı

Li paşê xuslê Şah û Mahê dilber
Ardından yıkandılar, ay yüzlü dilberle Şah

Bi hevra bûn heta roj bû minewwer
Kaldılar beraberce, gün ağarıncaya dek

Ji hevdu wan dikir ez 'işq û seyran
Birbirinde onlar, aşk edip seyrederdi

Ji noşîna meyê bûn mest û heyran
İçtikleri şaraptan, olmuştular mest, hayran

Ji husna enwerê şîrîn perîzad
Parlak güzelliğine, tatlı peri kızının

Bi sed dil Şahê 'aşiq bû çu Ferhad
Yüz gönülle âşıktı, tıpkı Ferhat gibi Şah

Bi dil wî Şahê 'Asim yek xezel xoş
Gönülden arzuladı, Şah Asım hoş bir gazel

Reqem da 'aşiqê bi dil Siyahpoş
Aldı kaleme yazdı, kalpten âşık Siyahpûş

XEZEL-1	GAZEL-1
Ya Rebb çi ‘ecêb mame li wê husn û cemalê	*Ya Rab, hayretlerdeyim, o güzelliğe, o zarifliğe*
Wê dêmzerî yû surperî yû ebrûhîlalê	*O altın yanaklıya, peri tabiatlıya, hilal kaşlıya*
Çîn çîn li xwe berdane siyehzilfê mi’enber	*Salmış üstüne tel tel, amber kokan siyah zülüfleri*
Marên di reş in, dikeyn ‘ezmê qitalê	*Kara yılandırlar sanki, azmetmişler öldürmeye*
Cebhet wekî bedrê ye minewwer xetê reş lê	*Yüzü ayın on dördü gibi, parlak ve siyah çizgilidir*
Bê cezbe dilerzin li teref zilfê delalê	*Sallanıp dururlar cazibesiz, etrafında nazlının zülüfleri*
Ebrû tu dibê cedwelê neqqaşî kişandin	*Sanırsın çekilmiş kaşları, nakkaşın cetveliyle*
Bê surme siyah in bixwe çav şibhê xezalê	*Sürmesiz siyahtırlar gözler, ceylanınki misali*
Bînî wekî Elif, xettê katib lê reqem da	*Burnu “Elif” misali, çizgileri ölçülüdür kâtibin*
Ebrû weh li ser hatine her yek şibhê “Dal”ê	*Kaşlar öyle yakışmış ki, her biri dâl harfi misali*
Lê ez ji xizêma qunufil da mame heyrê	*Hayretler içindeyim ancak, o karanfil hızmadan*
Zêrê ji xwe xalis bû wekî niqteyê “Dal”ê	*Halis altından idi, dâla konulmuş nokta misali*
Xedeyn li misalê Qemer û Şems û Dûha bûn	*Yanaklar, Ay, Güneş, gün aydınlığı gibiydiler*
Du goşê li perwînguharan tîne balê	*Andırıyordu Pervin yıldızını, kulaktaki küpeler*

Naête hisabê sifatê sîmê binagoş
Saymaya gelmez sıfatı, gümüş misali kulak memesinin

Çend tuhfe hejandin tayê reş bayê seba lê
Salladı birkaç turfandayı, sabah rüzgarıyla siyah saçlar

Le'lên wê şirîn kes nedîbû dewr û zemanan
Görmemiş kimse, tatlı dudaklarını hiçbir devir, zamanda

Şehd û şekir û qend û nebat nîn di xeyalê
Yoktur karşılığı hayalde, ne balda, şekerde, ne kantta, nebatta

Çun xonçe dihen teng wekî helqeyê yaqût
Gonca misali ağzı, dardır hem de küçüktür, yakut halkası gibi

Elmas û mirarî ne didanên wê şepalê
Dişleri o dilberin, elmastan, incidendir

Çaha zeqenê zemzem e, yan 'eynê heyat e
Çenesindeki gamze, zemzem misali onun ya da hayat çeşmesi

Xebxeb wekî sêvê baxê Ridwan di fesalê
Çene altısı onun, Rıdvan bağının elması misali

Gerden wekî şûşê safî ye, dûr e ji 'eyban
Gerdan billur şişe gibidir, uzaktır ayıplardan, kusurlardan

Zilfên di reş û xal lê dikeyn ceng û cidalê
Etmekteler mücadele, onda siyah zülüfler ile benler

Teşbîhê xezalê ye bi gerden tu nezer dey
Dikkatle bakarsan şayet, gerdanıyla ceylan gibidir

Mircan û durr û yaqût û zêr tîne sefalê
Safa getiriyor, mercan ile inciyi, yakut ile altını

Sîngspî û sade ye, lewhê sîm û saf e
Beyaz tenli ve lekesizdir, gümüş ve saflığın levhası

Narinc û tirincên terr û leymûnê zîba lê
Taze turunç ve narenciyedir, güzel ve göz alıcı limondur

Mabeynê d'narincan mineqqeş bû midewwer
Narençlerin arası, nakış nakıştır, hem de yusyuvarlak

Neqşek ji wê neqşê wekî neqşê heyûla lê
O nakışlardan biri ki sanırsın heyula nakşıdır

Pişkojê ser fincanê ferfûrî ji zêr bûn	*Altındandır fağfur fincanların, üstündeki düğmeler*
Tiflê dilê ‘uşşaqî li ber weyl û welalê	*Feryat figan ederdi, ondan acemi âşıkların gönlü*
Qamet wekî şimşad û ney û ‘er‘er û serwî	*Endamı şimşat ağacı gibiydi; kamış ve servi misali*
Çîn çîn safê şehmarê bi ser da mişteha lê	*Kırkayaklar misali, dökülmüştür üstüne, tel tel saçları*
Ta kengî Siyahpoş tu di medhê da bibêjî	*Siyahpûş, ne zamana dek, bulunacaksın övgüsünde*
Şoxî û terr û nazikê û hor û cemalê	*Şuh, taze ve naziğe dair, o hurinin güzelliği hakkında*

Ji şemsa xawerê eywanê Şahî	*Doğmasıyla güneşin, Şah’ın köşkü, sarayı*
Di hîna bû minewwer murx û mahî	*Aydınlandığı zaman, kuşlar ile balıklar*
Miferreh bûn û teyran kirde perwaz	*Ferahlandı içleri, uçuverdiler kuşlar*
Bi derket Şah ji perdê mehremê raz	*Çıktı Şah perdesinden, sırlı mahremiyetin*
Xiraman hate ser textê durrefşan	*Nazlı nazlı gelerek, çıktı inci tahtına*
Xulaman kir bi ser Şeh da zêrefşan	*Şah’ın üstüne hizmetçiler, altın saçtılar*
Cema’et cimle hatin ehlê dîwan	*Geldiler tüm cemaat, divanın mensupları*
Yekayek merheba da Şeh ji bo wan	*Merhabalar verdi Şah, birer birer hepsine*

Li paşan çeng û nayê, xemr û saqî	*Ardından çenk ile ney, içki ile hem saki*
Bi hevra bûn li dîwanê milaqî	*Birbiriyle buluştu, divanda hep birlikte*
Şerab noşîn ji destê meyfiroşan	*İçtiler onlar şarabı, şarap satanların elinden*
Neyê kir nale û tenbûr xuroşan	*Ney inlemeye başladı, coşmaya geçti tambur*
Ji Şah ra xas bû yek cariye şeng	*Şah için özel idi, neşeli bir cariye*
Semenbûy û perîrûy û dihenteng	*Selvi boylu, peri yüzlü, ağzı ise ufaktı*
Cebînbedr û du ebrû qewsê tarî	*Ay alınlı, iki kaş, simsiyah yay gibiydi*
‘Ecêb qettal bûn çahvêd xumarî	*Fazlasıyla katildi, baygın olan gözleri*
Li ser ta pê ji husnê rengperî bû	*Baştan ayağa kadar, güzellikte periydi*
Ji noqsanî û ‘eyban ew berî bû	*Uzaktı, temiz idi kusurdan, ayıplardan*
Ji istebreq wekî horanê xemlî	*Sırma ile süslendi, tıpkı huri misali*
Letîf û nazenîn sorgul û kemlî	*İnceydi, nazenindi, olgundu, kırmızı gül*
Ji Salih ra ‘eta kir ew perînaz	*Salih için armağan, etti nazlı periyi*
Digel çend del’etan Şahê serefraz	*Birkaç armağan daha, etti o şerefli Şah*
Bi emrê tacidarê nûrê tel’et	*Yüzlerin aydınlığı, taçlı Şah’ın emriyle*
Bi bêhedd û qiyas anîne xil’et	*Getirdiler armağan, sayısız, sınırsızca*

Yekayek, dû bi dû dan cimle yekser	*Birer birer, peş peşe, birden verdi cümleye*
Ji bo pîr û ciwan û cimle ‘esker	*Yaşlılara, gençlere, cümle askerler için*
Wê rojê ta êvarê zewq û aheng	*O gün ta akşama dek, ettiler zevk, eğlence*
Kirin ba dan û e’ta û ney û çeng	*Armağanlar, bahşişler, neyle çenk eşliğinde*
Ji dîwanê ku rabû ‘Asimê Şah	*Şah Asım ki divandan, kalkıp da gittiğinde*
Berê xwe da derê birc û heremgah	*Yönünü döndü köşkün, hem harem kapısına*
Çelengxoş rabû Salih ba dilê geş	*Hoşça, güzelce kalktı Salih, mutlu gönülle*
Xeraman hate bal şoxa perîweş	*Nazlı nazlı gelerek, peri yüzlü güzele*
Ku suhbet kir digel ‘alîcenabî	*Ki sohbete daldı, iyiliksever Şahı’yla*
Hilanî hemlê xwe wê mahetabî	*Yüklendi bebeğini, o an ay yüzlü güzel*
Li paş çend roj xelqê kir nezare	*Birkaç gün sonrasında, gördü ki insanlar*
Ji hemlê herduwan bû aşikare	*Her ikisinin hamile olduğu oldu aşikar*
Bişaret dane Şahê reng Bedexşan[25]	*Hemen müjde verdiler, Bedahşan renkli Şah’a[25]*
Ji hemlê carî yû Mahê durrefşan	*Gebedir cariyeniz, hem ay yüzlü inciniz*

[25] Bedexşan, yek ji eyaletên Efxanistanê ye. Li vir, aqûtek bi navê “Le’lê Bedexşan” ango “Aqûtê Bedexşan” meşhûr e. Şaîr, bal birî ser vî aqûtî.

[25] Bedahşan, Afganistan’ın bir eyaletidir. Burası, kendi adıyla anılan “La’l-i Bedahşa”, yani “Bedahşan Yakutu”yla meşhurdur. Şair, bu yakuta işaret etmiştir.

Emir kir mu'tedil din wan te'aman	*Emretti dikkat edin, yemeğine onların*
Hemî anan û xisûsen sibh û şaman	*Bütün vakitler için, husussan sabah, akşam*
Wekî neh mah û neh roj çûn temamî	*Tamam geçti dokuz ay, sonrasında dokuz gün*
Beşaret hate wî 'alîmeqamî	*Müjde geldi o yüce makamın sahibine*
Letîf û dilbera şoxa Yemanî	*Yemenli güzeliniz, o nazlı, gönül çalan*
Kurek bû ehsen û hemlê xwe danî	*Doğurdu bebeğini, güzellerden bir oğlan*
Digel wê mijde da yek merdê nasih	*Ayrıca bir müjde geldi, akil bir adamından*
Ji hemlê carîyê kur bû bi Salih	*Dedi cariyeden oldu, Salih'e de bir oğul*
Beşaret, hey beşaret, xoş beşaret	*Müjdeler, hey müjdeler, müjdelerin güzeli*
Şeh û malxwê biken malê xwe xaret	*Verin malı yağmaya, ey Şah'la ev reisi*
Dellalan gazî kir miskîn û mihtac	*Tellallar çağırdılar, miskin ve muhtaçları*
"Xezînê herduwan keyn bo xwe tarac"	*"İkisinin hazinesini yağma edin kendinize"*
Ji Misrê ê bigotan qet tunîne	*Kimse yoktur ki desin, Mısır ehlinden biri*
Ji wî malî bû ew sahibxezîne	*Olmamışım o maldan, ben hazine sahibi*
Wekî mizgînî da Şah û wezîran	*Şah ve vezir ki verdi, müjdeyi ülkesine*
Zêr û ni'met bi derwêş û feqîran	*Altınla nimetleri, dervişle, fakirlere*

Emir kir Şah ba çend merdê nasih	*Emretti birkaçına, akil kişilerden Şah*
Ku hazirkeyn li dîwanê me Salih	*Hazırlayınız dedi, divanımda Salih'i*
Ku Salih hat û bûsî 'erdê xizmet	*Ki Salih geldiğinde, öptü hizmetle yeri*
Beqabî go ji bo Şeh text û dewlet	*Daim olsun Şahımız, tahtınız ve devletiniz*
Bi Salih gote wî Şahê serefraz	*Üstün ve onurlu Şah, dedi vezir Salih'e*
Tilû'ê fecrê kir ez bextê perwaz	*Uçuşan bahtımızdan, doğdu bizlere şafak*
Şekerşa bû dilê me şibhê Ye'qûb	*Şekerlendi gönlümüz, tıpkı Yakup misali*
Bi dîdarê ruxê du Yûsifê xûb	*Görmekle yüzlerini, iki güzel Yusuf'un*
Weh qenc e tu bişeynî carî û kur	*Güzel olur göndermen, cariyeyle oğlunu*
Heremgeha Mehê mehbûb çun dûr	*İnci misali olan, ayın harem köşküne*
Mezinbin da bi hevra yek şevê mah	*Ta birlikte büyüsün, aynı minval üzere*
Yekî bêtin wezîr û ya dê bî şah	*Biri veziri olsun, diğeri onun şahı*
Miferreh bû dilê Salih ji suhbet	*Ferahlandı Salih'in, gönlü bu renk sohbetten*
Temenna kird bûsî 'erdê xizmet	*Arzuladı, yeri öptü, hizmetle Şah'ın önünde*
Verêkir wê demê wî îbn û carî	*Yolladı hemen o dem, oğluyla cariyeyi*
Heremgahê serefraz tacîdarî	*Taç ehli büyük Şah'ın, özel harem köşküne*

Kurê xwe nam kir Seyfilmilûk, Şah	*Şah oğluna verdi, ismini Seyfülmülûk*
Dîger Se'dulmilûk ê bo wî hemrah	*Ona yoldaş olana, dediler Sadülmülûk*
Li paşan hatne pêş bi bêhedd mineccim	*Ardından huzuruna, geldi hadsiz müneccim*
Bi emrê Şah hekîm û hem mi'ellim	*Hem yine Şah emriyle, filozof, öğretmenler*
Ji tali' xeber dan xêr û hem şer	*Hayırdan ya da şerden, konuştular talihten*
Ji bo Xusrew beyan ken nef' eger zerr[26]	*Fayda mı yok zarar mı, bilgi verin Hüsrev'den*[26]
Minecciman lihev dan Sewr û Mîzan	*Sürttüler müneccimler, Boğa'yı Terazi'ye*
'Utarid û Esed, Cewza û Sertan	*Merkür ile Aslan'ı, İkizler'le Yengeç'i*
Ji Delw û Hût û Heml û 'Eqreb û Qews	*Kova ile Balık'tan, Koç'la Akrep ve Yay'dan*
Miqabil bû ji Cedyê se'd eger nehs	*Karşı geldi Oğlak'a, Sad'ın ki haylaz çıktı*
Minecim hatne pêş Şahê serefraz	*Müneccimler geldiler, büyük Şah'ın önüne*
Ji bo bextê pûser kir cimle axaz	*Cümlesi konuştular, bahtı için oğlunun*
Ku necmê tali'ê wî hate Qews	*Ki onun şans yıldızı, gelmişti Yay burcuna*
Ji bo Seyfulmilûk û Se'dê nehs	*Seyfülmülûk için hem, haylaz Sadülmülûk'ün*

[26] Mebest ji Xusrew, "Keyxusrew"ê Îranî ye ku ji binyada Keyaniyan leheng û padişahekî efsanewî yê Îranî ye. Keyxusrew, karaktereki sereke yê Şehname ya Firdewsî ye. Bi kuştina Efrasyabê Tûranî navdar e ku kujerê bavê wî Siyawiş e. Şaîr, Seyfulmilûkê di pêşerojê de wê bibe padîşahê milkê Misirê, dinolîne Keyxusrew.

[26] Hüsrev'den maksat, İran'ın Keyaniler sülalesinden efsanevî kahraman padişahlarından olan "Keyhüsrev"dir. Keyhüsrev, Firdevsî'nin *Şehname*'sindeki karakterlerin en meşhurlarındandır. Babası Siyavuş'u öldüren Turanlı Efrâsiyâb'ı öldürmekle meşhurdur. Şair, ileride Mısır mülkünün padişahı olacak Seyfülmülûk'ü ona benzetmiştir.

Ji ‘ilm û me’rîfet adab û erkan	*İlimden, marifetten, edep ile erkândan*
Siwarî-w nîzebazî, go û çogan	*At sürmeyle mızrakta, cirit atma oyununda*
Nehin qet kes mîsala wî beraber	*Onun yoktu hiç dengi, ona rakip olacak*
Diket wî milk û tac û text û axer	*Kısmetidir mülk onun, taç ile taht ve diğer*
Welê ku çardeh sal borîn ji ‘umrî	*Ne var ki geçtiğinde, ömrünün on dört yılı*
Ji derdê ‘eşq dinalî çu qumrî	*Aşk derdinden inledi, tıpkı kumrular gibi*
Sebeb wê di hilak bêtin ji mexlûq	*Mahluklar o sebepten, olmaktadırlar helak*
Welê axir dibit şa ew bi me’şûq	*Ne var ki en sonunda, maşukla şad olurlar*
Dirêj dê bît ‘umr û hem bi şewket	*Ömrü uzun olacak, hem de kuvvet bulacak*
Xwedêtirs û bi ’edl û dad û dewlet	*Takva ve adaletle, doğrulukla, devletle*
Ji derdê ‘eşqê kor bû Şahê bi mehzûn	*Aşk derdinden kör oldu, hüzünle yaşayan Şah*
Ji çavan avê rêht û ez zemîr xûn	*Sular aktı gözünden, içine kanlar doldu*
Welê ispare kur wî Şehrîyarî	*Ne var ki o padişah, dayadı kendisini*
Rizayê xwe bi emrê Girdekarî	*Rızasına Allah’ın, yine O’nun emriyle*
Li paşan Şah emir kir çend şepalan	*Ardından emretti Şah, birkaç güzel kadına*
Ku dayîn bin li ser herdu tifalan	*Ki annelik yapınız, sizler iki yavruya*

Heta heft sale bûn ew cohtê gewher	*Yaş yediyi bulunca, o iki cevher çifti*
Du exter bûn di bircek da minewwer	*İki yıldız oldular, aynı burçta parlayan*
Bi ‘ilmê menzilê cehlê bikin teyy	*İlimde mesafeyle, cehaleti aşınız*
Ji nûrê me’rifet qelbê mirî heyy	*Marifet ışığıyla, dirilir ölü kalpler*
Kesê bê ‘ilm bî ew bê kemal e	*Bilgisiz olan kişi, olgunluktan yoksundur*
Nehin hay ji sirrê Zulcelal’e	*Bunlar nasipsiz kalır, Allah’ın sırlarından*
Wekî heft sale bû ew ‘alîmenseb	*Yaş yediyi bulunca, o soyları yüksekler*
Bi emrê Şah herdu çûne mekteb	*İkisi de gittiler, Şah emriyle mektebe*
Bi te’cîl çêkirin hicrek mineqqeş	*Aceleden yaptılar, donatılmış bir sınıf*
Ku bixwînin di nav de ew du mehweş	*Ta onda okusunlar, o iki ay yüzlü*
Tê raxistin feraşên zêde cindî	*Onda serildi çokça, güzel güzel sergiler*
Ji sof û etlas û dîbayê Hindî	*Ham ipekten, atlastan, hem Hint dibasından*
Bi ser ferşan kirin xoş ‘enberefşan	*Serptiler sergilere, amberli hoş kokular*
Der û dîwarê hucrê bûn zêrefşan	*Altınla yaldızlandı, hücrenin içi, dışı*
Di xayet zîwerî yû zînetî bû	*Bezediler fazlaca, süslediler her yanı*
Mîsala qesrekî ji cennetê bû	*Zannedersin Cennet’ten, oldu bir köşk misali*

Bi şayî çûne nav herdu selimteb’ — *Mutlulukla girdiler, tabiatı sağlamlar*

Qebûl kir wan emir bilqelb wessem’ — *Kalple, kulaklarıyla, emri kabul ettiler*

Mi’ellim hat, merdek zêde wer’î — *Geldi öğretmenleri, fazlasıyla dindardı*

Tecawiz qet nebû esla ji şer’î — *Şeriat sınırından, taşmıyordu o asla*

Bi cumle ‘ilimha yekser xebîr bû — *Haberi vardı onun, ilimlerin hepsinden*

Ji adab û kemalê bê nezîr bû — *Eşi benzeri yoktu, edepte, olgunlukta*

Şerî’et xweş dizanî hem terîqet — *Şeriata ehildi, hem bilirdi tarikat*

Muhît bû der zemîr durrê heqîqet — *Hakikat incisinin, vakıftı ta özüne*

Qelem kêşa ji lewhek saf ez sîm — *Kalem çekti üstüne, gümüşten bir levhanın*

Elîf û Bê û Tê heta ku bê Cîm — *Eliften başlayarak, Be, Te, ta Cim’e kadar*

Bi avzêrî nivîsî xettê kûfî — *Altın suyuyla yazdı, hat olarak Kûfiyle*

Temam ebced ji yekî ta ulûfî — *Tüm rakamları dizdi, birden ta binlere dek*

Mi’ellim da bi dest wan lewhê sîmîn — *Öğretmen ellerine, verdi gümüşten levha*

Bi carek “Elif” û “Bê” wan kirne telqîn — *Bir defada belletti, onlara elif-be’yi*

Mueddeb herdu rûniştin muqabil — *Edeple her ikisi, oturdular önünde*

Ji seydayê xwe pirsîn çend mesail — *Hocalarından sordu, onlar birkaç konuyu*

Çi me'na tê ji "Elîf" û ta bi "Ya" yê	*Ne anlama geliyor, elif'ten ya'ya kadar*
Ji hibba wahdetê ba wî Xwedayê	*Vahdet'in sevgisinden, ki Allah'tan gelmiştir*
Bi dil Seyda ji Elîf û Bê Siyahpoş	*Gönülden elif'le be'den, yazdı hoca Siyahpûş*
Bi înşa kir temamê yek xezel xwoş	*Döktü kâğıda tamamen, bir gazel ki gayet hoş*

XEZEL-2[27]

"Elîf " Ellah û "La Îlahe Îlla Hû" di me'nayê

"Beraet" pirr mişewweş tê ji xala nuqteya "Ba"yê

Tecellaya cemala Heq wekî perwane ez sohtim

Me xef kir ew şîrînesrar çu deng û his ji min nayê

"Tebarek" xwendî herfê "Ta" ji husnê ehsenê dilber

Wekî "Summestewa" remzek qelem da nuqteyên "Sa"yê

Cemala "Cîm"ê "Wennecmî" wekî perwane ez sohtim

[27] Di vê xezelê de, herfên hecayî û têkiliya wan a bi hinek ayetan hatiye destnîşankirin.

GAZEL-2[27]

Elif Allah'a işarettir, "La ilahe illa hû" manasıdır onun

Çok karışık geliyor "Beraet", bâ'nın noktasının beninden

Hakk'ın cemalinin tecellisi, yaktı beni kelebek misali

Gizledik biz o tatlı sırları, kalmadı benden ne ses ne his

Okumuş tâ ile "Tebarek"i, sevgilinin güzeller güzelliğinden

Sâ'nın noktaları verdi bir kalem remzini, tıpkı "Sümme's-Tevâ" gibi

"Ve'n-Necmi" ki cîmin güzelliği, yaktı beni kelebek gibi

[27] Bu gazelde, hece harfleriyle onların Kur'an'da ilişkili olduğu bazı ayetler zikredilmektedir.

Welê “Ha”ê di “Ha Mîm”an heyata bi dilan dayê

Ne var ki “hâ mîm”deki hâ’lar, gönüllere verdi hayat

Xiyala “Xa”yê “La xewfun ‘eleyhîm” kê diye îro

Bugün kim görmüştür acep, “La havfün aleyhim”-deki ha’nın hayalini

Ji remza “Dal”ê “Ud’ûnî” beyan ket ew bi inşayê

Dâl harfinin işaretinden, yazıyla izah et “Üd’unî”-yi

Ji “Zal”a “Uzkurûnî” gerçî dil sohtî qewî îro

Gerçi “Uzküruni”nin zâl’ından, kesin kalbim yandı bugün

Ji “Ra”yê “Rehmeten mînna” heyata cawîdan dayê

Ancak “Rahmeten minna”nın râ’sı, sonsuz hayatı vermiştir

Binê “Zeyn”ê çi reng “Uzlifetilcennet” bi me’nê da

Zeyn’in altı ne de renkli, “Uzlifetu’l-Cennet” var manasında

“Selamûn qewlen” go “Sîn”ê di remza wê mi’emmayê

Sîn’in muammalı remzinde, “Selamün kavlen” müjdesi var

Şû’aya “Şîn”ê “Weşşemsî” wekî perwane ez sohtim

“Ve’ş-Şems” ki şın’ın ışınıdır, yaktı beni kelebek misali

Sedayê “Sad”ê “Welqur’anî” çû heta bi Cewzayê

Sad’ın sedasıdır “Ve’l-Kur’ani”, yükseldi ta İkizler burcuna

Çi xoş “Dad”ê wuzû’ bestim di “Zew”ê “Wedduha”ê da

Ne hoştur dât, abdest alırım onda, “Ve’d-Duhâ”-nın ziyasında

Tehûr bû dil bilaşibhet bi herfê “Ta”yê “Tâ-Ha”yê

Şüphesiz ki kalp temizlendi “Tâ-Hâ”nın tâ harfiyle

Zihûr kir “Za”yê “Wezzahir” micellayê ser ewraqan	*Süsleyip parlattı yaprakları, “Ve’z-Zahir”den zuhur eden zâ*
Ji “‘Eyn”ê “‘Îndehû ecrûn ‘ezîm” danî di tuxrayê	*Mührü vurdu imzaladı, “İndehu ecrün azim”in ‘ayn harfi*
Ji “Xeyn”ê “Xasiqîn” îro eger çi dil bi azar im	*Her ne kadar, bugün gönlüm azarlandı “Gasıkîn”in gayn’ından*
Miferreh tê dilê ‘aşiq ji wê “Fa”ê “Fetehna”yê	*Ancak âşığın gönlünü ferahlanır, “Fetehna”nın fâ harfiyle*
Ji “Qaf”ê “Qulhuwallahu ehed” cana çi mektûb e	*Ey sevgili, ne güzel mektuptur, “Kul huvellahu ehad”in kaf harfi*
Digel “Kaf”ê di “Kullu men ‘eleyha fan” di îmzayê	*Kâf ile beraber, “Küllü men aleyha fân”da vardır imza*
Ji “Lam”ê “Len tenalul bîrre hetta tunfiqû” îro	*Bugün “Len tenalü’l-birre hettâ tunfiku”nun lâm’ından*
Me can û milk û dil bexşîn di rêya wê semensayê	*O yasemin kokulunun yoluna can, mal ve gönlü bağışladık*
Ji bo dîn me pirsek kir, cewaba “Len teranî” da	*Dine dair bir soru sorduk, bize “Len terani” cevabını verdi*
Ji dil sotim gelî yaran ji dest nûrên şekerxayê	*Gönülden yaktı beni dostlar, şeker ağızlının nurlu elleri*
Binê “Mim”ê “Ma kane Muhemmed” da çi nîşan kir	*Mîm’in altı, “Ma kâne Muhammed” de nedir gösterdiği*
Çi cah û mensebek çêbû nezer den ehsenê esmayê	*Ne makam ve rütbe oluştu, nazar edin isimlerin en güzellerine*

‘Eceb “Nûn, Welqelem” min dî di remza “Qabu Qewseyn”	*Aciptir, “Kabı kavseyn”in remzinde, “Nûn, ve’l-kalem”i gördüm*
Ji “Waw”ê “Welleylî” îro şefeq da nûr û rohnayê	*“Ve’l-leyli”nin vâv’ından bugün, nur ve aydınlık şafağı söktü*
Ji “Hê” “Huwelhuda” tê “Nehannefsu” bi me’nê da	*Hı’dan “Hüve’l-hudâ” ve “Neha’n-nefsu”nun manası çıktı*
Ji “Lamelîf”ê “La yudî’u ecrelmuhsînîn” dayê	*Zuhur etti “Lâm-Elif”ten, “La yudi’u ecre’l-muhsinîn” hakikati*
Ji “Ya”, “Yewme yekûnunnasu” pir xewf û mişewweş tê	*Yâ’dan, “Yevme yekûnu’n-nasu” korkusu, sersemliği çıkıyor*
Siyahpoş xweş nezim anî, temam hurufê hecayê	*Güzel nazmetti Siyahpûş, sırayla tüm alfabe harflerini*
Me xwar camek şeraba xoş ji destê saqiyê mehweş	*Hoş şaraptan içtik bir bardak, ay yüzlülerinin elinden*
Wekî min hişte Îran û berê xwe da bi Bexdayê	*Ve geride bırakıp İran’ı, çevirdim yönümü Bağdat’a*

Di hîna ew du feyzî bûn ji dersan	*Ne zaman her ikisi, olgunlaştılar dersten*
Xilas û hem Zebûr xwendin bi dersan	*Mezun olup ayrıca, aldılar Zebur’dan ders*
Ji Tewrat û suhuf û ‘ilmê mayî	*Tevrat’tan, suhuflardan, hem diğer ilimlerden*
Hemî xwendin dû feyzê yek Xwedayî	*Okudular hepsinden, Tevhid ilminden sonra*

Çi Serf û Nehw û Mentiq û çi Hey'et[28]
Sarf olsun, Nahiv olsun, Mantık ve Astronomi [28]

Çi Ustirlab û Adab û 'Eqîdet
Kozmoloji bilimi, adap, akait ilmi

Beyan û hem Bedî' xwendin 'ulûman
İlimlerden Beyan ve Bedi' ilmini de okudular

Ji Reml û hem Felekiyyat, nicûman
Hem Kum Falından, Gök Bilimi ve Yıldız Biliminden

Di Cifrê da kirin xweş muşikafî
Kılı kırk yararak, öğrendiler Cifiri

'Erûz xwendin temamî wan bi safî
Okudular aruzu, tamamen hem özgünce

Tefasîr û Ehadîs û Şerî'et
Tefsir ilmini hem, hadisle şeriatı

Hemî xwendin temam dest da terîqet
Tam tekmil okudular, el attılar tarikate

Ji seydayê xwe wergirtin îcazet
Aldılar öğretmenden, diplomalarını hem

Kirin meşxûlî xwe ba riyazet
Ardından koyuldular, riyazetin yoluna

Nifûsê Sabi'e yekser li hevdan[29]
Ölçüp tarttılar onlar, yedi adet nefsi[29]

'Eqîq û cewher û elmas tevdan
Karıştırdılar akikle cevheri, hem de elması

Ji paşê qebzê bestin ku dihatin
Ardından tutulmayla, geldiğinde sıkışma

Celal û hem cemal û cezbe hatin
Oluşurdu onlarda, Celal, Cemal cezbesi

---

[28] Serf û Nehw, du zanist in di derbarê ziman û rêzimana Erebî de. Du qonaxên xwe heye; ya di derbarê "bêje"yan de mijara Serfê, ya di derbarê "hevok"an de mijara Nehwê ye.

[29] Nifûsê Seb'e, ango "heft nefs" e. Mebest jê ev e; di pêşketin û kemilîna mirovan de, nefs di heft qonaxan re derbas dibe. Ji binî bi alê jor ve ev in: Nefsa Emmare, Nefsa Lewwame, Nefsa Mulheme, Nefsa Mutmaînne, Nefsa Raziye, Nefsa Marziye, Nefsa Kamile (Safiye). Ev tesnîf, li gor terîqeta Qadiriyan e. Di terîqa Neqşî de, li hember heft nefisan, deh letîfe henin; pêşketin û bilindbûna mirovan, bi terbiyekirina van deh letîfeyan pêkan dibînin.

[28] Sarf ve Nahiv, Arapça'nın dil ve grameriyle ilgili iki ilimdir. Dilin "kelime" aşaması Sarf'ın, "cümle" aşaması ise "Nahv"in konusudur.

[29] Yedi nefisten maksat, insanın manevi gelişme ve yükselmesinde nefsin geçtiği yedi aşamayı ifade eder. Bu aşamalar aşağıdan yukarıya doğru şunlardır: Nefs-i Emmâre, Nefs-i Levvâme, Nefs-i Mülheme, Nefs-i Mutmainne, Nefs-i Râdiye, Nefs-i Mardiye, Nefs-i Kâmile (Sâfiye). Bu tasnif, Kadirî tarikatına göredir; Nakşîlerdeki karşılığı on latifedir. Onlar, insanların manevi gelişmelerini, bunların terbiyesiyle mümkün görüyorlar.

Ji behrê heyret û ‘ecz û tesewwur	*Hayret ile acizlik, düşünce denizinden*
Bi derkevtin meqam çûn ser teffekkur	*Çıktılar ve daldılar, tefekkür makamına*
Tesewwif xwendin û zanîn heqîqet	*Okudular tasavvuf, öğrendiler gerçeği*
Ji ‘ilm û dersê ‘işqê bûn ferîqet	*Böylece koptu onlar ilim, aşk derslerinden*
Wekî mustexnî bûn ez dersê ‘işqê	*Artık uzak durdular, aşka dair derslerden*
Bi hevra herduwan dest kir bi meşqê	*İkisi el attılar, yazıyla kitabete*
Wereng bûn ew bi mislê wan nebû qet	*Öyle bir hâl aldılar, yoktu misli onların*
Çu xettatê bi wan ra deyne ser xet	*Hiçbir hattat yoktu ki, yarışabilsin hatta*
Di înşayê xwe de munşî bûn ew pirr	*Yazı yazma işinde, artık usta oldular*
Ji elfazan dirêhtin gewher û durr	*Döküyorlardı sözden, cevher ile inciler*
Ji neqqaşî dikir wan neqşê texmîn	*Nakkaşların nakşını, kapıyorlardı derhal*
Wekî Manî, neqqaşê Çîn û Maçîn[30]	*Çin ve Maçin nakkaşı, Mâni misaliydiler[30]*

[30] “Manî”, avakarê baweriya Manîzmê ye. Piştî İsa, di sala 216’an de li bajarê Tîzpon ya Arşakiyan ji dayîk bûye. Di xortaniya xwe de bi kar û hunera neqaşiyê re mijûl bûye; debara xwe bi neqaşkariyê kiriye. Baweriya wî, di dema Şapûrê I. ê Îranî de bi pêş dikeve, lê di dema Behramê I. ê Îranî de tê berbendkirin. Wek Cemabê Mûsa, ew jî bi “Deh Emir”an tê naskirin. Ev deh emir, di hemû ayînên Xwedayî de hevpar e. Bêjeya “Zindiq” bi derketina Manî Peyda bûye. Li gor rîwayetan, sedem ku ji ayîna Zerdeşt derketiye, ev dexme lê danînin.
“Maçîn”, herêma başûr ya Çînê ye. Di wêjeyê de, piranî bi “Çîn”ê re tê serzimankirin.

[30] Mâni, Manizm inancının kurucusudur. İ.S. 216’da, Arşaklara ait Tizpon şehrinde doğmuştur. Gençliğinde, nakkaşlık sanatıyla uğraşmış; geçimini bu meslekle temin etmiştir. Onun inancı, İran İmparatoru I. Şapur zamanında gelişmiş, ancak I. Behram zamanında engellenmiş, kendisi idam edilmiştir. Hz. Musa gibi, Mâni de “On Emir”leriyle meşhurdur. Bu on emir, bütün İlahî dinlerce müşterektir. “Zındık” olarak bildiğimiz kavram, onun ortaya çıkışıyla doğmuştur. Sebebi ise, kendisinin Zerdüşt dininden çıkması gösterilmektedir.
“Maçin”, Çin’in güney bölgesidir. Edebiyatta, genellikle “Çin”le beraber anılır.

Di şi'rê herdu manendê Lubeyd bûn[31]	*Her ikisi şiirde, Lübeyd'e benzerlerdi[31]*
Di eyyamê xwe ew herdu ferîd bûn	*İkisi, zamanında, tek ve eşsiz idiler*
Mîsala nexmeyê Dawûd ewan deng	*Seslerine gelince, nağmede Davut gibi*
Li sed reng lê didan tenbûr û hem çeng	*Çalarlardı yüz tarzda, tamburu hem de çengi*
Di hîna ku binoşiyan mey û beng	*Ne zaman ki içseler, şarapla bengi onlar*
Dibûn meşxûl bi le'b û nerd û şetrenc	*Dalarlardı oynuna, tavla ile satrancın*
Ji rûxê hev didan wan Fîl û Ferzîn	*Karşılıklı hamleyle, Fillerle, Vezirlerle*
Wekî Behmen digel azade berzîn[32]	*Behmen misali onlar, serseri taylar gibi[32]*
Eger hazir bûyan sed merdê 'aqil	*Hazırda ki olsaydılar, yüz akıllı rakipler*
Di le'bê da nebûn ba yek miqabil	*Oyunda gelmezlerdi, onlardan birine denk*
Çi le'b û mûsîqa û rûdê şahî	*Oyunla musikiler, yanında eğlenceler*
Şiyaling û çi berbet, goşimahî	*Perendeyle ut çalma, musiki makamları*
Yekayek cimle adabê siwarî	*Kurallarını tek tek, biniciliğin onlar*
Hilanîn herdu durrê şehriyarî	*Öğrendiler ikisi, inci misali şahlar*

[31] "Lubeyd", an Lebîd (b. Rabîe), yek ji şairên erep yên dewra cahiliyê ye. Ji nivîskarê "Mualleqat"ê yek jî ev e. Li gor gotinan, bi rêza xwe, 3. şairê cahliyê ye. Di sala 631ê de bûye misilman. Kêm be jî diwana wî gihaştiye deme me. 661ê de çûye ser dilovaniya xwedê.

[32] "Behmen", ji hukimdarên Îranî, kurê Îsfendiyar e. Li gor dîrokvanan, ji hukimdarên Îranî, ê yekem car bi navê Xwedê dest bi nameyan kiriye Behmen e. Bi dadwerî û avadaniya xwe navdar e.

[31] Lübeyd ya da Lebid (b. Rabia), Cahiliye dönemi Arap şairlerindendir. "Muallekat"ın şairlerinden biridir. Rivayete göre, Cahiliyenin şairleri içinde 3. sırada yer alır. Miladi 631'de Müslüman olmuştur. Eksik de olsa, günümüze ulaşan bir divanı bulunmaktadır. 661 yılında vefat etmiştir.

[32] Behmen, İran hükümdarlarından İsfendiyar'ın oğludur. Tarihçilere göre, İranlı hükümdarlar içinde, ilk olarak mektuplarının başında Allah'ın ismini zikreden kişidir. Adalet ve bayındırlık işleriyle meşhurdur.

Kemend û nêzebazî, go û çogan
Kement, mızrak atımı, topla çevgen oyununu

Çi tîrendazî yû mertal û colan
Ok atma, kalkan tutma, hem manevra yapmayı

Mikemmel bûn ji adabê kemalî
Mükemmeldi ikisi, olgunluk adabında

Di hîna herdû bûn ew çardeh salî
Yaşları on dördüne, gelip de vardığında

Îlahî! Tu mikemmel key Îlahî!
Allah'ım mükemmel et, mükemmel et Allah'ım

Îman û sidqê min sahibgunahî
İman ile sıdkımı, ben günahkâr kişinin

Bixefrînî gunehanê Siyahpoş
Ben Siyahpûş'un Sen, affeyle günahını

Ji camê mihbetê key mest û medhûş
Sevginin şarabından, onu eyle mest, medhuş

Minewwer key bi rehmet ya Mimecced
Aydınlat rahmetinle, beni ey ulu Rabbim

Ji nûrê me'rîfet qelbê Muhemmed!
Muhammed'in kalbini, marifet nurlarıyla

Di hîna xonçe pişkivt ez gulistan
Goncalar açılınca, bahçelerinde gülün

Xumarî bûn 'uyûnên meyperistan
Mahmurlaşır gözleri, şaraba düşkünlerin

Sedaya 'endelîb û sewtê bilbil
Bülbülün sedasıyla, onun nağmeleri

Ji xew rakir şîrîn du nêrgis û gul
Uyandırdı şirince, iki nergisle gülü

Di 'alem da gera ewreng xeberdan
Dolaştı tüm âlemde, bu tarzda konuşmalar

Minewwer bûn bi der ez bircê Sefwan
Safvan'ın burçlarında, doğdu bu nuraniler

Me'elqisse, ku seyda dît ew reng	*Sözün özü bu tarzda, hocaları görünce*
Mikemmel bûn du gul ez baxê ewşeng	*Olgunlaşmış iki gül, fidanlık bahçesinden*
Digel subhê ku "Şemsî wedduha" xwend[33]	*Sabahleyin okudu, "Şemsi ve'd-Duhâ"yı[33]*
Miferreh ber bi dîwanê qedem rand	*Ferahlanmış olarak, gitti divana doğru*
Cewab çû Şahê 'Asim hate seyda	*Şah Asım'a denildi, hoca geliyor diye*
Sirûr û xurremî bûn bo wî peyda	*Peyda oldu kendinde, sevinç ile mutluluk*
Got "Bînin hey xulaman wî bi i'zaz	*Dedi, "Ey hizmetçiler, getiriniz saygıyla*
Li bal min cihê wî çêkin bi sed naz"	*Hazırlayın yanımda, yüzer nazla yerini"*
Herîfan anî textek pirr ji gewher	*Adamlar getirdiler, mücevherden bir tahtı*
Miqabil textê Şah danîn beraber	*Birlikte bıraktılar, Şah'ın tahtına karşılık*
Muşekker hat seyda çû li ser text	*Teşekkürle beraber, hoca oturdu tahta*
Dû'a kir wî ji bo Şah tali' û bext	*Dua eyledi Şah'a, talihine, tahtına*
Şehê 'Asim ji wî ra merhaba da	*Şah Asım öğretmene, dedi ki merhabalar*
Selam û emn û hem xêr û sefa da	*Selamla hem güvenle, hayır, safa diledi*

[33] "Şemsî wedduha", parek ji ayeta 1. a Sûreya Şemsê ye. Bi kurtewateya xwe wihaye: "Sond bi tavê û ronahiya wê."

[33] "Şemsî ve'd-Duhâ", Şems Suresi'nin 1. ayetine ait bir cümledir. Meali, "Güneşe ve onun aydınlığına andolsun!" şeklindedir.

Got, “Bînin Şahê ‘Asim şerbet û mey	*Şah dedi ki, “Getirin, hocaya şerbet, şarap*
Ji xemra xas ku miryan diket hey	*Yıllanmış içkiden ki, ölüleri diriltir*
Ji bo seydayê me dil pê biket geş”	*Hocamız için olsun, gönlü şen eylesin”*
Li paşan xoş xeber det halê mehweş	*Sonra hoş söyleştiler, ay yüzlünün hâlinden*
Gulab û şerbet û hem xemr û saqî	*Gülsuyu ile şerbet, hem içki ile saki*
Li dîwanê bi hevra bûn milaqî	*Divanda kavuştular, yüz yüze buluştular*
Reşandin ser serê seyda gulabe	*Serptiler üzerine, gülsuyunu hocanın*
Li paşan dane dest xemr û şerabe	*Ardından ellerine, verdiler içki, şarap*
Wekî serxoş bû seyda înçunîn guft	*Hoca ki sarhoş oldu, öyle bir konuştu ki*
Cewahir rêhtin û elmasêha suft	*Döküverdi cevherler, delikli elmasları*
Bi ‘irfan got ewî, “Ey Şahê ‘Asim!	*Anlayış, bilgelikle, dedi ki, “Ey Şah Asım!”*
Nema qet kes di dinyayê çu ‘alim	*Kalmamıştır dünyada, hiçbir kişi ve bilgin*
Ku ‘ilmê wan me naînîte ber kef	*Ki bilgilerini biz, toplamamış olalım*
Heta Loqman û Eflatûn û Asef[34]	*Hatta Lokman, Eflatun, Asef bunlar içinde*[34]

[34] Asef, Asef b. Berehya ye. Li gor çavkaniyên Îslamî, ew kurê xaltiya Sileyman Peyxamber e. Di heman wextê de wezîr, katib, ewlemend û hemrazê wî ye. Çavkanî, wî wek zanayê duaya İsmê Ezam, xwediduaye meqbûl û ehlê keramet dihesibînin. Li gor tefsîran, di Quranê de, “Zatê ku li cem wî ilmekî ji kitabê heye”, Âsaf b. Berehya ye. (Bnr. Sûreya Neml, a. 40)

[34] Asef, Âsaf b. Berahyâ’dır. İslâmî kaynaklar, onu, Hz. Süleyman’ın teyzesinin oğlu, veziri, kâtibi, emini ve sırdaşı göstermektedir. İsm-i Azam duasını bildiği, duasının makbul olduğu ve keramet ehli olduğu da anlatılmaktadır. Tefsirlerde, Kur’an’da, “Kendisinde, kitaptan bir ilim bulunan zat”ın, Asef b. Bereyha olduğu bildirilmiştir. (Bkz. Neml Suresi, a. 40)

Bi carek min nîşan Seyfulmilûk da
Tüm olarak öğrettim Seyfülmülûk'e ben

Ji ber wî min nîşan Se'dulmilûk da
Onun yanı sıra da verdim Sadülmülûk'e

Ji adab û siwarî û nêzebazî
Mızrakla binicilik, hüner ve kuralını

Çi le'b û nerd û şetrenc û tinazî
Oyun ve tavla olsun, satranç ile espri

Hilanîn yek bi yek cimle bi itmam
Bellediler hepsini, eksiksiz birer birer

Ji şerq û le'bê cimle xas û hem 'am
Doğudan ve dünyadan, özel, genel oyunlar

Nema esla di dinyayê çu 'irfan
Kalmadı dünyada hiç, bilgi, kültürden biri

Nizanin ew bi wê ya Îbnu Sefwan!"
Öğrenmemiş olsunlar, onu ey İbni Safvan

Wekî 'Asim bihîst ewreng ji seyda
Asim ki duyduğunda, bu şekilde hocadan

Hezar keyf û sirûr bûn bo wî peyda
Peyda oldu kendinde, binler keyif ve sevinç

Li ser ta pê şeland xwe Şahê 'Asim
Soydu her neyi varsa, Şah Asım baştan başa

Ji bo seydayê pirr 'irfan û 'alim
Çok bilgili, kültürlü, değerli hoca için

Li paşan gote seyda, tu çira yî
Sonra döndü dedi ki, hocam sen bir çırasın

Digel min tu ji yekpişt û bira yî
Benimle birlikte sen, aynı belden kardeşsin

Çiqasê min hebî tu jî şerîk î
Her neyim ki var ise, sen de ona ortaksın

Pirr û endik ji sed heta bi yekî
İster çok ya az olsun, yüzden ta bire kadar

Li paşan Şahî emrê çawîşan kir	*Ardından emir verdi, kendi çavuşlarına Şah*
Letîf û nazenîn û mehweşan kir	*Kî yumuşak, nazenin, hem de ay yüzlüydüler*
Digel Salih û Poşîn Îbnu Hame	*Salih ile birlikte, Poşin İbn-i Ham'a da*
Misahibê di dîwan xas û 'ame	*Divan sohbet ehline, alim ya da sıradan*
Ji mîr û begleran û merdê qaif	*Beylerden, paşalardan, ehil adamlarından*
Ji 'aqil û çi zana, merdê 'arif	*Akil ve bilginlerden, hem bilge kimselerden*
Biçin yekser pê Seyfulmilûk	*Gidin birlikte dedi, Seyfülmülûk ardına*
Di hucrê da digel Se'dulmilûk	*Hücresindedir şimdi, Sadülmülûk beraber*
Di hîna çawîşan kir ban û gazî	*Çavuşlar yaptığında, çağrıyı, duyuruyu*
Ji dengê kerrena û tebl û bazî	*Borazan, dümbeleğin, hem tefin seslerinden*
Du çar nehsed hezar faris micewşen	*Zırhlarına bürünmüş, binlerce yiğit kişi*
Dibên hatin bi sef tîp tîp bi qewşen	*Derler saf saf geldiler, muntazam bölüklerle*
Ji rengê Teymûr û Berz û Gîw û Guderz	*Timur ile Berz, Giv ile Guderz benzeri*
Kerîman û Cihangîr û Feramerz[35]	*Keriman gibi, Cihangir ve Feramerz gibi*[35]

[35] Kerîman, divê "Nerîman" be. Nerîman, yek ji lehengên Îranî yê efsanewî ye. Bavê wî, Etbînê kurê Cemşid e. Nerîman, bavê Sam, bapîrê Rustemê Zal ê navdar e. "Cihangîr", leqeba Sam e. Sam, yek ji serleşkerê navdar yê Ferîdûn e. Yê ev leqeba "Cîhangîr" dayiyê jî Ferîdûn bixwe ye. Wek tê zanîn, Ferîdûn, kujerê Dehhaqê xwînxwar e. Ji bo Timur an Teymûr, bnr. têbiniya 16.; ji bo Berz û Feramerz, bnr. têbiniya 3.; ji bo Gîw û Guderz, bnr. têbiniya 22.

[35] Keriman, "Neriman" olmalıdır. İran'ın efsanevi kahramanlarındandır. Cemşid'in soyundan Atbîn'in oğludur. Meşhur Rüstem-i Zal'ın dedesi, "Cihangir" lakabıyla meşhur "Sam"ın babasıdır. Feridun'un güçlü komutanlarındandır. Sam'a "Cihangir" lakabını takan da Feridun'dur. Feridun, zalim Dahhak'ı öldüren kişidir. Timur için, bkz. 16 nolu dipnot. Berz ve Feramerz için, bkz. 3 nolu dipnot. Giv ve Guderz için, bkz. 22 nolu dipnot.

Kirin arasteyê eywan û hem text
Düzenlediler bir köşk, hem de içinde bir taht

Ji bo Şehzadeyê ba tali' û bext
Talih ve bahtı yaver, şehzadenin adına

Tê raxistin firaşê sof û etles
Serdiler her yanına, atlas, ipekten sergi

Zêrefşan dane wan taqê miqewwes
Altınla yaldızlandı, kavisli kemerleri

Gulav û misk anîn lê reşandin
Misk ile gülsuyunu, getirerek serptiler

Ji ferşê etlesî 'enber feşandin
Yağdırdılar amberi, atlaslı sergilere

Der û dîwarêha bû 'enberamîz
İçiyle hem dışıyla, oldu amber kokulu

Li ser bircan vewestan fitneengîz
Burçlara oturdular, fitne saçan dilberler

Xumar û serxweşan zewq û huzûr e
İçkiciler, sarhoşlar, dalmışlar zevk, huzura

Ji her şeş cihetan keyf û sirûr e
Her altı cihetten de keyif ile sevinçtir

Mitriban girte destan naye û çeng
Çalgıcılar aldılar, ellerine, neyle çenk

Muxennî da li tenbûrê li sed reng
Şarkıcılar vurdular, yüz tarz ile tambura

Bi emrê Şahê 'Asimê xudanbext
Bahtı açık ve yaver, Şah Asım'ın emriyle

Du esp anîn ji zêrê kesme û rext
Getirdiler iki at, eyer ve örtüsü altından

Digel du deste libsê zêde faxir
İki kat elbise, fazlasıyla kıymetli

Du tacê şahiwar ê pircewahir
Şahane iki taç, cevherlerle işlenmiş

Bibin yekser ji bo Seyfulmilûkî	*Götürün tamamını, Seyfülmülûk adına*
Digel hem sohbeteş Se'dulmilûkî	*Bir de Sadülmülûk'e, onun sohbet yoldaşı*
Ku çûn cimle digel Salih beraber	*Ki gittiler tamamı, Salih'le beraberce*
Di bircek da deranî ew du exter	*Çıkardılar bir burçtan, o her iki yıldızı*
Libasê faxire xweş kirne ber wan	*Giydirdiler onlara, çok kıymetli giysiden*
Du tacê şahiwar danîne serê wan	*Şahane iki tacı, koydular başlarına*
Wê rojê du hezar mehbûbê nadir	*O gün seçkin kızdan, iki bin güzel kişi*
Ji bo mehbûbanê Misrê bûn hazir[36]	*Hazır oldular orda, Mısırlı şuhlar için[36]*
Li ser ta pê xeriq ez zêr û gewher	*Süslendiler serapa, altın ve cevherlerle*
Bi misk û 'enberan ew bûn mi'etter	*Gark oldular kokuya, misk ile amber ile*
Kesê dîbanê ew mehbûbê mehweş	*Kim görseydi onları, ay yüzlü dilberleri*
Bi benê beng û şerabê dê bûna serxweş	*Olacaklardı sarhoş, şarapla beng ipiyle*
Ku wan çahvê xwe dan Seyfulmilûkî	*Ki onlar gözlerini, dikince Seyfülmülûk'e*
Cemala dilgeşê Se'dulmilûkî	*Ve gönülleri hoş eden, Sadülmülûk'e*
Bi hevra navê xwe j'lewhê kirin hek	*Birlikte adlarını, kazıdılar levhaya*
Ku heyv û roj in ew, lareyb û laşek	*Ki ay ve güneştiler, bunda hiç şüphe yoktur*

[36] Ji mehbûbanê Mısır mebest, Seyfulmilûk û Sa'dulmilûk e.

[36] Mısırlı şuhlardan maksat, Seyfülmülûk ve Sadülmülûk'tür.

Weyan ruhaniyîn ew hatne ‘erdan
Birin reng û rûyê nesrîn û werdan

Veya ruhanidirler, inivermişler yere
Renk ve yüzleriyle, nesrin, çiçekler gibi

Me lew zanîn çu qedr û ne niştin
Ne mehbûb in û belkû zêde zişt in

Ondandır anladık ki ne bir kıymet ne bir şey
Sevimli değillerdir, belki fazla çirkinler

Me’elqisse, bi Cewza ra beraber
Kewakib çûne destê mahê enwer

Sözün özü beraber, İkizler Burcu ile
Yıldızlar varıp gitmiş, nur saçan Ay eline

Ku ye’nî Salih û cimle kuşade
Yekayek çûne destê Şahizade

Kî yani Salih ile tüm gönlü ferahlılar
Birer birer vardılar, Şehzadenin eline

Du esp anîn reftarê berqê lami’
Ji bo şehzade ên ba bext û tali’

Getirdiler iki at, şimşek gibi süratli
Baht ve talihi açık, şehzadeleri için

Digel şimşîr û gurz û nêze û tîr
Miselleh bûn siwar ew cohtê pismîr

Ayrıca kılıçla gürz, mızrakla ok ve yayı
Bindiler tam silahlı, o beyzadeler çifti

Sedayê çawîşan gerya di şehrî
Ji etrafan dihatin xelqê Misrî

Yankılandı şehirde, çavuşların sedası
Etraftan geliyordu, Mısır’ın ahalisi

Temaşa ken rûyê Seyfulmilûkî
Cemala dilgeşê Se’dulmilûkî

Koyuldular seyrine, Seyfülmülûk yüzüne
Hem de Sadülmülûk’ün iç açan cemaline

Bi girdagirdê şehrî ew gerandin	*Şehrin ulularıyla, gezdirdiler onları*
Bi meydanê siwaran ew gihandin	*Ulaştırdılar onları atlılar meydanına*
Siwarên cindî yû meşhûrê meydan	*Alımlı biniciler, meydanın meşhurları*
Di ber xwe avêtin wan go û çogan	*Attılar öne topu, davrandılar çevgene*
Miqabil hev vewestan sef beraber	*Karşılıklı durdular, saf hâlinde rakipler*
Şiqîna goyê çû ber çerxê exter	*Topa vurma şakırtısı, ulaştı yıldızlara*
Te'alellah ji wan çendî siwaran	*Allah yüce kılsın ki, o birkaç süvariyi*
Di dest wan da ye çogan zilfê yaran	*Ellerinde çevgenler, sevgili zülfü gibi*
Ku meydan 'arize ku xal û xebxeb	*Ki girmişler meydana, benlerle, gerdanlarla*
Gelek Mecnûn kirin, Leyla şekerleb	*Çoğunu Mecnun etti, şeker dudaklı Leyla*
Me'elqisse, du pismîrê digel bav	*Özetle beyzadeler, yanlarında babalar*
Ku wan dît ku li meydanê behiştav	*Ki gördüler meydanda, onlar cennet suyunu*
Kirin ne're û pehnî dane rexşan	*Narayla mahmuzladı, parıldayan atlarını*
Bilez dest dane çoganên zêrefşan	*El attılar hızlıca, ışıldayan çevgene*
Bi ser meydanê da çû mahê xurşîd	*Yürüdüler meydana, Güneşle Ay misali*
Mîsala Heyderî yû gazî Xalid[37]	*Tıpkı Haydar misali, Gazi Halid benzeri*[37]

[37] Mebest ji "Heyder", Cenabê Elî ye; bi wateya xwe şêr e. "Gazî Xalid", jê mebest, Xalidê Kurê Welîd e ku her ketiye kijan cengê, wek "Xazî"yekî bi serkefti jê derketiye.

[37] "Haydar"dan kasıt, Hazret-i Ali'dir. Anlamı, aslan demektir. "Gazi Halid"den kasıt ise, Halid b. Velid'dir. Girdiği bütün savaşlardan, zaferle ve gazilikle çıkmıştır.

Siwarên namîdar bûn cimle yek sef	*Tek saf oldu cümlesi, tüm meşhur süvariler*
Digel Poşîn û Salih çûn bi derkef	*Poşin, Salih birlikte, terk ettiler meydanı*
Sefa dî herdu mehbûbê dilawer	*Gönülleri şen oldu, iki mahbup yiğidin*
Vewestan xoş miqabil wan beraber	*Her ikisi birlikte, karşılıklı durdular*
Kirin ne're û xerî yû new xuroşîn	*Haykırarak narayı, atıp coştu ikisi*
Cemî'ê 'eskerê Salih û Poşîn	*Tüm askerle birlikte, Salih ile hem Poşin*
Te'cîl ku li meydanê revandin	*Ki kaçırdı onları, aceleyle meydandan*
Be pîşê herdu şehbazan gihandin	*Taktırdı artlarına, vardı iki şahine*
Li ser da hatin şehbaz û şahîn	*İndiler üstlerine, doğan, şahin misali*
Bi kaşoyê hilanîn goyê zêrîn	*Çevgenle kaldırdılar, altından olan topu*
Ji destê wan deranîn go bi le'bê	*Oyunla çıkardılar, ellerinden o topu*
Ji şerqê lêdidan heta bi xerbê	*Doğudan vururlardı, atarlardı batıya*
Heta deh ser temam bû go neda kes	*On set boyunca topu, vermediler kimseye*
Du cindî, farisê danayê eqdes	*Her iki yakışıklı, kutlu bilge yiğitler*
Siwarên namîdar mabûn miheyyer	*Kalmışlardı hayrette, tüm meşhur süvariler*
Digel Salih û Poşîn, cimle yekser	*Salih'le Poşin dahil, tamamı baştan başa*

Ji wan şîrîn siwarê çapûk û tîz	*O tatlı biniciler, çevikler ve hızlılar*
Zilif çogan ku xal û leb şekerrîz	*Benli, çevgen zülüflü, dudakları şekerli*
Civîn meydanê lê ku xalê zengî	*Meydana doluştular, yalnız siyah benliler*
Dileyzin xoş li ser mexmûr û bengî	*Güzel oynuyorlardı, mahmur ve sarhoştular*
Li paşan kirne rimbazî û cewlan	*Ardından eylediler, manevra, mızrak atma*
Ji dest xwe avêtin wan go û çogan	*Ellerinden attılar, çevgen ile topunu*
Du car nehsed hezar farisê xûnxwer	*Savaşçı yiğitlerden, bin sekiz yüz kadarı*
Bi hevra hatine wan şêrê dilawer	*Girdiler hep birlikte, yiğitlerle savaşa*
Du cindê namîdaran kir xuroşîn	*İki namlı güzeller, coşup taştılar o an*
Li ser da hatine Salih û Poşîn	*Üzerlerine geldi, Salih ile hem Poşin*
Wekî ew reng dî Xalid û Heyder	*Vaziyeti bu tarzda, gören Hâlid'le Haydar*
Bi hevra herdûwan da qelbê 'esker	*Birlikte yönelldiler, askerlerin kalbine*
Ji rast û çep diavêtin bi herban	*Sağla soldan savurdu, ellerinden kargıyı*
Neda kes wan şehan destê çu derban	*Vuramadı hiç kimse, şehzadelere darbe*
Wekî Berzo û Zehrab dicengî[38]	*Berzo'yla Zehrab gibi, ediyorlardı savaş[38]*
Şikênand 'eskerê pirr ê pêşengî	*Kırwerdi çoğunu, öncü olan askerin*

[38] Ji bo Zehro (Zehrab) bnr. têbiniya 3.

[38] Berzo (Berz) ve Zehrab için, bkz. 3. dipnot.

Li ser da ne'reyên Seyfulmilûkî	*Üzerlerine savurdu, narayı Seyfülmülûk*
Di ber da hohoyên Se'dulmilûkî	*Heyt heyt sesleriyle, yanında Sadülmülûk*
Sef û tîpê siwaran tev şikandin	*Kırdılar askerlerin, tüm safla bölüğünü*
Du çobanê şîrîn pez vêkgihandin	*Birbirine kattılar, sürüyü iki güzel çoban*
Bi hevra çawîşan, "Sed barekellah"	*Çavuşlar hepsi birden, "Yüzler tebrikler" dedi*
Digo ruhaniyan "Nesrun minellah" [39]	*Ayrıca ruhaniler, "Nasrun minellah" derdi*[39]
Ji wan çendî siwarê mest û dilêr	*Onlardan vardı birkaç, mest, yürekli süvari*
Çeleng û çapûk û çespan wekî şêr	*Çevik, atik, atılgan, hem aslanlar gibiydi*
Mihessel, got wê rojê ta bi 'esrê	*Sözün özü, dediler o gün ikindiye dek*
Kirin zewq û berê xwe dane qesrê	*Gönlünce eğlendiler, sonra döndüler kasra*
Muxennî da li çeng û tebl û nayê	*Şarkıcılar çaldılar, çenkle dümbelek, neyi*
Dinê kerr bû ji dengê kerenayê	*Sağırlaştı dünyamız, borazanın sesinden*
Çi xelqê şehrî yû xelqê sipahî	*Şehir halkından olsun, ya da askerler olsun*
Zêrefşan û durrefşan kir bi şahî	*Mutluca dağıttılar, altın ile gümüşler*
Bi ser wan du siwarî şibhê Yûsif	*Yusuf misali olan, iki süvari üstüne*
Dilêr û cindî yû sahibtelettuf	*Yürekli, yakışıklı, hem de kibar kimseler*

[39] "Nesrun minellah", parek ji ayeta 13. ya Sureya Saffê ye. Meala wê, "Serkeftin ji Xwedê ye."

[39] "Nasrun minellah", Saff Suresi, ayet 13'ten alınma bir parçadır. Meali, "Başarı (zafer) Allah'tandır."

Di hîna çûne ber dergahê e'zem	*Ne zaman yaklaştılar, onlar büyük saraya*
Du pismîr û sipahî cimle bahem	*Her iki beyzadeyle, tüm sipahiler birlikte*
Peya bûn xoş ji wan espên zêrefşan	*İniverdiler güzel, altın süslü atlardan*
Berê xwe dane eywanên durrefşan	*Yüzlerini çevirdi, incili köşklerine*
Du pismîr çûne ser textê miresse'	*İki beyzade çıktı, bezenmiş tahtlarına*
Ji elmas û cewahiran milemme'	*Pırıl pırıl parlardı, elmastan, cevherlerden*
Ji 'Asim re hebûn deh xubê mehweş	*Asım Şah'ın var idi, on ay yüzlü güzeli*
Siyahçeşm û xumar û mest û dilgeş	*Siyah gözlü ve sarhoş, mest ve gönül çekici*
Letîf û nazik û mehbûb û dilber	*Yumuşak, naziktiler, sevgili ve de dilber*
Zeqensîb û dihenxonçe lebehmer	*Ak çene, gonca ağız, kırmızıydı dudaklar*
Tijî bûn gerdana wan durr û mircan	*Doluydu gerdanları, inci ile mercandan*
Mineqqeş bûn di ber wan de du fincan	*Önlerinde onların, süslüydü iki fincan*
Melî bûn ew ji xemra meyperestan	*Doymuştu içkisinden, şarapçı düşkünlerin*
Qed û qamet wekî serwê gulistan	*Boy-posları onların, gül bahçesi servisi*
Verêkir cimle bo Seyfilmilûkî	*Yolladı tamamını, Seyfülmülûk için*
Digel deh dî ji bo Se'dulmilûkî	*Bir diğer onunu da Sadülmülûk için*

Digel çend gurciyan û ‘aribê reş[40]	*Ayrıca yanındaki, birkaç gürcü, siyahî[40]*
Li ser ta pê bi zîba û mineqqeş	*Baştan ayağa kadar, süslü ve de nakışlı*
Bi şadî roj bihurandin heta şam	*Günlerini mutluca, akşama dek geçirdi*
Nezer ken dê çi bit axir serencam	*İzleyin, bakın siz, akıbet ne olacak*
Ji xizmet Şahizade cimle ‘esker	*Şehzade hizmetinden, askerlerin cümlesi*
Vegeryan ber bi qonaxê xwe yekser	*Döndü geri geldiler, konakla yerlerine*
Ji pismîran standin rext û cewşen	*Beyzadelerden onlar, aldılar zırh, kuşamı*
Ji şem’ê rûyê wan bû qesir rewşen	*Yüzlerindeki ışıktan, aydınlandı köşkleri*
Bi fanosan kirin eywan enwer	*Fanuslarla sarayı, aydınlatwerdiler*
Vewestan gurcî yû carî beraber	*Durdular hep birlikte, gürcüler, cariyeler*
Bi emrê Şahizade xwanê zêrîn	*Şehzadenin emriyle, altından sofraları*
Xulaman anî yû danîn bi tezyîn	*Hizmetçiler getirip tertip ile dizdiler*
Tijî bû xwan ji enwa’ê te’aman	*Sofralar dolu idi, her türlü yiyecekle*
Şerab û qend di nava tas û caman	*Vardı tas ve camlarda, şarap ile hem şeker*

[40] Bêjeya gurcî, her çend kesên “girêdayiyê gelê gurc” bi bîr bîne jî, di şi’ran de bi wateya dilbera “gewr” û “dilkêş” tê bikaranîn.

[40] Gürcü kelimesi, “Gürcü halkına mensubiyet”i çağrıştırsa da şiirde, “ak” ve “alımlı” dilber anlamını ifade eder.

Di destê saqiyan da bûn du fincan	*Ellerinde sakiler, vardı ikişer fincan*
Meyê heftsale û xoşab ê ruman	*Yedi yıllık şaraptan, hoşafla nar suyundan*
Li paşê xwarin neql û kebab	*Ardından hep yediler, döner ile kebabı*
Meyê heftsale û qend û şerab	*Yedi yıllık içkiyi, şeker ile şarabı*
Kirin zewq û sirûr û keyf û xweşî	*Keyif, zevk ve sevinçle, daldılar hoş sohbete*
Ji awazê ney û tenbûrxuroşî	*Neyin nağmelerinden, tamburun coşkusundan*
Di hîna ku bihurîn pênc sa'et	*Aradan geçtiğinde, beş saat kadar zaman*
Bi şadî meyl kir wan istirahet	*Mutluca meylettiler, istirahatle uykuya*
Li ser textê cewahirbend û me'mûr	*Bakımlı ve cevherli, süslü tahtlar üstünde*
Di xewra çûn du şêrê mest û mexmûr	*Dalıverdi uykuya, iki mest, mahmur aslan*
Xewa şîrîn çi xweş e ba dilê xweş	*Hoşça bir gönül ile, uyumak ne güzeldir*
Were ey saqiyê zîba û serxweş	*Gel ey süslü ve sarhoş, kendinden geçmiş saki*
Bi yek fincan meyê du heftsale	*Bir fincan ile getir, on dört yıllık şaraptan*
Dilê mehzûn bike şeyda û wale	*Eyle tasalı gönlü, sersem, aşk divanesi*
Di hîna ku tilû' da fecrê sadiq	*Ne zaman doğuverdi, gerçek şafak ışığı*
Sedaya bilbilê şeyda û 'aşiq	*Âşık ve aşk delisi, bülbül sedalarıyla*

Ji xew rakir ‘uyûnên meyperestan	*Uykudan açwerdi, şarapçılar gözünü*
Nesîm da çiçek û terhên gulistan	*Hoşça esen meltemle, çiçek gül fidanlığı*
Çeleng rabûn û gurcê dilkuşade	*Güzelce uyandılar, gönül açan gürcüler*
Şîrîn dan bûse pêyên Şahizade	*Tatlı bûseler verdi, Şehzade ayağına*
Bi nermî cariyanê serxweş û mest	*Yumuşakça, mest hem sarhoş cariyeler*
Didan bûse serê enguştî ba dest	*Buseler veriyordu, parmakların ucuna*
Du çeşmê nergisîn rakir ji xwabê	*Uyandırdı uykudan, iki mahmur gözleri*
Ji bêhnê ‘enber û misk û gulabê	*Amber ile misk ile, gül suyu kokusuyla*
Ji zilfê cariyan hatî dimaxê	*Cariyeler zülfünden, gelmiş ta beyne kadar*
Hilanî ser şîrîn çeşm û çiraxê	*Kaldırdı kafasını, şirince göz ve çıra*
Bi hev rabûn ew herdu xudanbext	*Kalktı birlikte onlar, bahtı yaver ikili*
Pes ez de’watê sibh çûne ser text	*Ardından tahta çıktı, sabah, davet üzere*
Bi yek sef bûn gurc û ‘aribê reş	*Tek sıra dizildiler, gürcüler, siyahîler*
Sefadê cariyê mehbûb û mehweş	*Safları cariyenin, mahbup, ay yüzlülerin*
Vewesta bûn miqabil hev beraber	*Durmuştular mukabil, birlikte birbirinin*
Di xizmet pûrê Şah tacê ber ser	*Hizmetinde oğlunun, Şah’ın taht varisinin*

Gerandin saqiyan şûşê şerabê	*Gezdirdiler sakiler, şarap şişelerini*
Fîxan kir têlê tenbûr û ribabê	*Başladılar feryada, tambur, rübap telleri*
Ji awazê ribab û têlê tenbûr	*Feryadından rübabın, tellerinden tamburun*
Lebê camê meyê saqiyê mexmûr	*Dudağından kadehin, mahmurundan sakinin*
Gelek ‘aqil bûyîn mecnûn û şeyda	*Oldular birçok akıllı, mecnunla divaneler*
Nezanîn tiştekî ew xeyrê Leyla	*Leyla’dan gayrı bir şey, bilmiyorlardı onlar*
Sedayê ‘aşiqan çû çerxê e’zem	*Âşıkların sedası, ulaştı arş göğüne*
Heta şemsê tilû’ da cimle ‘alem	*Ta güneş ki âleme, doğup da aydınlattı*
Di hîna şemsê xettê “Weddûha” xwend[41]	*Okuduğunda güneş, “Ve’d-Duhâ”nın hattını[41]*
Bi hev ra ber bi dîwanê qedem rand	*Yürüdüler birlikte, tümü divana doğru*
Du pismîrê xudan‘irfan û ‘alim	*Kültürlü ve bilgili, beyzade ikilisi*
Selamkarî biçîn pêş Şahê ‘Asim	*Selam verip girdiler, Şah Asım huzuruna*
Xiramên şibhetê kebkan bi hemrah	*Keklikler gibi nazla, iki yoldaş, arkadaş*
Du pismîr çûne dîwanê Şehinşah	*Vardı iki beyzade, büyük Şah divanına*
Temenna kir şîrîn û bûse dan text	*Saygıyla kondurdular, tahta şirin öpücük*
Dû’a kir wan ji Şeh ra tali’ û bext	*Talih ve şans adına, dua ettiler Şah’a*

[41] “Weddûha”, ji Sûreya Dûhayê ayeta 1. e. Meala wê: “Sond bi dema berbangê.”

[41] “Ve’d-Duha”, Duha Suresi’nin 1. ayetidir. Meali: “Kuşluk vaktine yemin olsun.”

Bi emrê Şah du kursî zêrê sade	*Şah'ın emriyle kürsü, som altın iki adet*
Kirin hazir, çû ser yek Şahizade	*Oturdu şehzadeler, her biri birisine*
Êdî Se'dulmilûkê badepeyma	*Artık Sadülmülûk ki, o şarap düşkünüdür*
Çû serda û rûniştin mahê seyma	*Gitti oturdu ona, o yüzü ay misali*
Nezer kir Şah ji wan mest û xumaran	*Şah gözünü gezdirdi, o mest ve sarhoşlara*
Misalê 'aşiqan, ber rûyê yaran	*Tıpkı yârin yüzüne, bakan âşıklar gibi*
Dilê Şeh bû kuşade, zêde mesrûr	*Ferahlandı Şah gönlü, sevindi fazlasıyla*
Bi wan du tacidarê mest û mexmûr	*O taçlı ikiliye, mestlere, mahmurlara*
Ji sidq û dil digot, "Elhemdulillah	*Samimi ve gönülden, derdi "elhamdülillah"*
Hezar û sed hezar eşşukrulillah	*Binlerce, yüz binlerce, "eş-şükru lillah" derdi*
Bi çavê xwe me dît rûyê dilawer	*Gözümüzle gördük biz, kahramanın yüzünü*
Dilê min bû bi wî mesrûr û enwer"	*Gönlüm oldu onunla, sevinçli ve aydınlık"*
Dibên wê rojê nehsed mîr û begler	*Diyorlar ki o günde, dokuz yüz bey ve paşa*
Rûniştî bûn li dîwanê beraber	*Divanda oturmuştular, hepsi bir ve beraber*
Ji xeyrê Salih û Poşînê Hame	*Gayrı Salih, Poşin'den, ki o Ham'ın oğludur*
Xisûsen ehlê dîwan xas û 'ame	*Özellikle erkândan, seçkinler ile halktan*

Bi mislê kewkeban bûn cimle yekser	*Yıldızlar gibiydiler, tamamı baştan başa*
Ji etrafê meh û xurşîdê enwer	*Ay'la nurlu Güneş'in, etrafındaki gibi*
Şehê 'Asim wereng go, "Ya xezîndar	*Böylelikle Şah Asım, dedi "Ey maliyeci*
Werîn sindoqê xasê min tu ey yar"	*Getir özel sandığı, ey sevgili dost benim"*
Xezîndar anî sindoqek miresse'	*Maliyeci getirdi, yaldızlı bir sandığı*
Cewahirbend ji elmasê milemme'	*Süslenmişti cevherden, parıltılı elmastan*
Bi miftê fetih kir babê mixelleq	*Anahtarıyla açtı, kapalı kapağını*
Deranî Şah di nav da zerfek ebleq	*Şah çıkardı içinden, renkli, dolgunca bir zarf*
Kirin xaric ji zerfê Şah derhal	*Zarftan çıkardı derhal, Şah ağzını açarak*
Cewahirbend ji zêrî hejdeh desmal	*On sekiz altın mendil, cevherlerle bezenmiş*
Deranî Şah ji wan etles pelasek	*Şah onlardan çıkardı, atlastan bir haliçe*
Di nav wê bû ji istebreq libasek	*Arasında da var idi, sırmadan bir elbise*
Du ungustîlê qaş ez le'lê feyroz	*Taşlı iki de yüzük, uğurlu lâl taşından*
Ne wek wan bûn ew belkî şebefroz	*Gece parlayan taş, değildi onlar gibi*
Şeva deycûrî mislê zilf û xalan	*Karanlık geceyi, zülüf, benler misali*
Diîsan herdu qaş şibhê şemalan	*Parlıyordu iki taş, meşaleler benzeri*

Kirin her sê ziyaret Şah bi dilsoz
Üçünü Şah gönülden, içten ziyaret etti

Di destek girt libas û qaşê feyroz
Bir eliyle giysiyi, hem tuttu lâl yüzüğü

Kirin i'ta ji bo Seyfulmilûkî
Armağan etti, onları Seyfülmülûk'a

Le'l avête ber Se'dulmilûkî
Lâl'ı ise fırlattı, Sadülmülûk önüne

Şekerrîz bû zebanê Îbnu Sefwan,
Dökülmekteydi şeker, İbni Safvan dilinden,

"Ku ew her sê hediye ez Suleyman
"Kî o üç hediye de nebi Süleyman'dandı

Ji min ra hatine pirr qedr û qîmet
Gelmiştir bana onlar, çok saygın, değerlidir

Ji wan tiştek me nîn bêtin bi hurmet
Yoktur yanımızda benim, onlardan daha saygıya

Me her sê dan ji bo we ey serefraz
Verdik üçünü bizler, sizlere ey seçkinler

Diger herçî ku meqsed bî tu bixwaz"
Onun dışında neyse, buyurun isteyin sizler"

Temenna kir dibûsîn 'erdê xizmet
Saygı ve teşekkürle, öptüler huzurda yer

Du pismîrê xudanîqbal û şewket
Her iki beyzade ki, şans ve kuvvet sahibi

Li dîwanê Şehinşahê mizeffer
Şahlar şahının onlar, divanından ikili

Şîrîn rabûn ew herdu dilawer
Usulünce kalktılar, iki yiğit kahraman

Xiramên nazenîn mehbûb û mehweş
Salınarak nazlılar, sevimli, ay yüzlüler

Berê xwe dane eywanên mineqqeş
Yöneldiler görkemli, nakışlı köşklerine

Bi keyf û xurrem ew herdu xudanbext	*Keyifle ve sevinçle, iki şanslı, talihli*
Misala roj û heyvan çûne ser text	*Güneş ve Ay misali, çıktılar tahtlarına*
Bi sef westan miqabil gurc û carî	*Karşıya dizildiler, gürcüler, cariyeler*
Digel çend saqiyê mest û xumarî	*Bir de mest, sarhoşlardan, birkaç tane de saki*
Mitirban girte destan, naye û çeng	*Çalgıcılar aldılar, ellerine ney, çengi*
Bi caman saqiyan anîn mey û beng	*Getirdiler kadehler, sakiler şarap, bengi*
Çû çerxê heftemîn awazê mitrib	*Vardı yedinci göğe, çalgıcıların sesi*
Kirin zewq û xoşî heta bi mexrib	*Zevk ve keyfe daldılar, mağrip vaktine kadar*
Nezer ken hûn ji le'bê wê şeva reş	*Nazar edin oyuna, o karanlık gecenin*
Çi dê bînit bi ser pismîrê mehweş	*Ne getirir başına, ay yüzlü beyzadenin*
Were saqî, werîn camê mihebbet	*Ey saki, getir bize, şarabından sevginin*
Ku hişyar bit dilê m'ez sirrê wehdet	*Ki uyansın kalbimiz, vahdetin gizemine*
Di gava ku vexwim fincanê 'işqê	*Ki içtiğimde ben, aşkın fincanından*
Bibarînim ji dil mircanê 'işqê	*Yağdırayım gönülden, aşkın mercanlarını*
Were mitrib digel çengê bibêje	*Gel çalgıcı çenginle, beraberce söyle bize*
Newayê mihbetî xûnem birêje	*Nağmeleri sevginin, varsın kanımı döksün*

Dilê ku tê nebit enwarê ‘işqê
Bir gönül ki yok ise, onda aşkın ışığı

Ji wî dûr e gelek esrarê ‘işqê
Bil ki ondan uzaktır, aşkın hayli sırları

Di hîna zaxê şebşehper belav kir
Yaydığında çaylak, uzun, siyah kanadın

Siyehzilfan li ser eniyê silav kir
Siyah zülüfler alnın, üstünde selam verdi

Li ser bircan firrîn teyrê wisalê
Uçwerdi burçlarda, kavuşmanın kuşları

Ji kêşîna nesîm û zilf û xalê
Solumakla meltemi, hem zülüf ve benleri

Ji bo Şehzadeyê mest û dilawer
Mest ve yürekli olan, Şehzade için onlar

Ji şem’ê kir şepalan qesrê enwer
Aydınlattılar mumla, köşkü zarif güzeller

Li pêş danî delalan xewanê zêrîn
Önüne bıraktılar, altın sofra nazlılar

Ji enwa’ê te’aman bûye rengîn
Rengârenk olmuştu, çeşitli yiyecekten

Li paş xwarinê neql û şerabî
Yemeğin arkasında, döner ile hem şarap

Kemançe çû selam têlê ribabî
Kemençe selam durdu, rübabın tellerine

Li ser têlan ku hat û çû kemançe
Ki telleri üstünde, gelgitle kemençenin

Muxennî da li ser teblê tebançe
Yükseldi şarkı-türkü, vurunca dümbeleğe

Ji ber awazê mitribê şekerxend
Şarkılarından, tatlı gülüşlü şarkıcıların

Şîrîn ruhaniyên ba reqs û govend
Raksa, halaya durdu, şirince ruhaniler

Kirin zewq û sirûr ehlê mela'ib	*Zevk, sevince boğuldu, oyuna dalmış olanlar*
Di xewra çûn heta çeşmê kewakib	*Ta ki uyuyana dek, yıldızların gözleri*
Neman qet kes ji mexmûrî bi hişyar	*Kalmadı hiçbir kimse, mahmurluktan uyanık*
Ji gurc û cariyanê mest û xummar	*Mest ile sarhoş düşmüş, gürcüyle cariyelerden*
Welê wan du emîran qet nehat xew	*Ancak iki emirin, hiç gelmedi uykusu*
Heta sê pay bihurandin ez an şew	*Gecenin dörtte üçü, geçmiş olduğu hâlde*
Kî ez wasiteyê libsê mineqqeş	*Ki buna sebep olan, süslü, nakışlı giysi*
Cewahirbend direxşan zêde dilgeş	*Cevherlerle bezenmiş, parlak ve çok alımlı*
Bi hevra wan dinêrî libsê zerbeft	*Bakarlardı birlikte, hep o sırma kumaşa*
Sa'et çû ta şevê Kanûnê du heft	*Ta geçti on dört saat, Aralık gecesinden*
Di hîna ku bihurîn çardeh sa'et	*Ne zaman geçirdiler, on dört saat geceyi*
Meyl kir pûrê Salih istirahet	*Meyletti dinlenmeye, vezir Salih'in oğlu*
Di xewra çûn li bal Seyfulmilûkî	*Daldı uykuya o an, Seyfülmülûk yanında*
Du çeşmê nergisê Se'dulmilûkî	*İki nergis misali, Sadülmülûk'ün gözleri*
Li paşan ma bi tenha Mîrê mehweş	*Ardından yalnız kaldı, o ay yüzlü Şehzade*
Ji 'işq û dil dinêrî libsê dilgeş	*Bakıyordu gönülden, aşkla cazip giysiye*

Ji hev pişkavt libs û qenc nihêrî	*Çözerek açwerdi, dikkatlice baktı giysiye*
Cewhirbend bû yekser ji zêrî	*Bezenmişti cevherden, tümü de altındandı*
Li ser dît sûretek hergiz nedîde	*Gördü giysi üstünde, görülmemiş bir suret*
Bi çeşman û ne goş ez kes şinîde	*Gözlerle, kulaklarla, işitmemiş hiç kimse*
Ne neqqaşan bi hikmet neqşê kêşay	*Ne becerisidir o, nakkaşlar hikmetinin*
Ne Tewrat û Zebûran jê xeber day	*Ne ondan haber vermiş, Tevrat ile hem Zebur*
Di hîna dîte sûret Mîrê sadiq	*Sureti gördüğü an, dürüst olan Beyzade*
Recif girt, bi sed dil lê bû ‘aşiq	*Titremeye tutuldu, ta yürekten vuruldu*
Dilerzî yû direcifî ew bi bêcezb	*Sallanıp titriyordu, kendinden geçmeksizin*
Ji ferq û sîneyê xwe wî didan derb	*Dövünüp duruyordu, başından ve göğsünden*
Ji wêr rabû çû kuncek zêde tarî	*Oradan kalkıp gitti, çok karanlık bir köşeye*
Digirya û dikir efxan û zarî	*Ağlayıp durmaktaydı, feryatla, inlemeyle*
Ji derdê ‘işqê bû bê sebr û taqet	*Düştü aşkın derdinden, sabırdan hem takatten*
Neman bo wî qerar û sekn û rahet	*Kalmadı ona karar, ne sükûnet ne rahat*
Dil û cerg û ceger bûn pirr ji ateş	*Ateş oldu yüreği, dalağı hem ciğeri*
Gahî hişyar bû ew gahî bê heş	*Bir uyanık olurdu, bir geçerdi kendinden*

Serê xwe danî ser dil şibhê jojî	*Başı koydu göğsüne, tıpkı kirpi misali*
Kesê ‘aşiq bî dê dil lê bisojî	*Her kim âşık olursa, yüreği yanacak elbet*
Dilê xwe wî diguvişî û dikir ah	*Gönlünü sıkıyordu, ediyordu ah, vah*
Duxanê dil çû mij bû pêşberê Şah	*Gönülden dumanı çıktı, sislendi önü Şah’ın*
Digel ahan ji çahvê wî dibûn rêz	*Ahlarla birlikte onun, gözlerinden peş peşe*
Du sed qetre çu ateş germ û hem têz	*Aktı iki yüz damla, ateşli ve hızlıca*
Ji ahîna dilê rencûr ê xwînxwar	*Kederli, kan akıtan, kalbinin ahlarından*
Dinalîn cimle yekser dar û dîwar	*İnliyordu tamamen, ağaçlar ve duvarlar*
Dişewtî dil ji ‘işqê şibhetê zeyt	*Aşktan yanıyordu yürek, zeytinyağı misali*
Dinalî yû digotin înçunîn beyt:	*İnleyip söyleniyordu, şöylece beyitleri*

XEZEL-3

GAZEL-3

Ez nizanim ew çi sûret bû me dît der cameyê	*Bilmiyorum neydi, o gördüğüm suret, elbisenin üstünde*
Şibhê şem’ê sohtî cergê min wekî perwaneyê	*Kelebek misaliyim ben, yaktı yüreğimi mum gibi*

Wayêweyla sohtî cerg û ez kirim mest û cinûn	*Yüreğimin yanmasından çıkan feryatlar, etti deli divane*
Lew me qesd e secde bim ber saqiyê meyxaneyê[42]	*Ondandır ki niyet ettim meyhane sakisine secdeye gideyim[42]*
Min qebûl in xemr û saqî dêr û zunnar û senem	*Kabulümdür benim, içki ile içkici, kiliseyle kuşak ve put*
Me nevên seccade û ewrad, digel sed daneyê	*İstemiyorum secde, dua, beraberinde yüzler ihsan*
Ey hebîba! Ger cehennem da vebit tu dane bî	*Ey sevgili, şayet cehennemde açılan dane olsan, bilesin*
Bi qesem dê biçme nav da ez bi qesda daneyê	*Yeminle söylüyorum, gireceğim ona ben, dane niyetiyle*
Lê nizanim tu j'kêyî ey Leylê ebnayê Tay[43]	*Ancak bilemiyorum, kimlerdensin sen, ey Tay'ın kızı Leyla[43]*
Şibhê Mecnûnê zemanî rû bikeym wêraneyê	*Zamanın Mecnun'u misali, yüzümü edeyim viran*
Ez çi çare kem kî ji derdê min xeber de ey hawar	*İmdat, hangi çareye başvurayım, derdimden haber ver*
Dê ji kê bipirsim nizanim menzilê cananeyê	*Bilmem kimden sorayım, sevgilimin mekânını ben*

[42] Di wêjeya tesewifê de, "eşq", "mey/şerab", "meyxane/pûtxane", "secde", bi gişt têgehên mecaz in. Bi eşqê "hezkirina xwedayî", bi meyê "evîna xwedayî", bi meyxaneyê "tekye/ibadetxane", bi secdeyê "Berîdana Xwedê" tê armanckirin. Wek diyar e, Seyfulmilûk jî xwe dikşîne kunceki û derdê xwe ji Xwedê re vedike. We ger, li ser wateya xuyayî were aliqîn, fehmên çewt dertên û dibe sedemê şîroveyên şaş.

[43] Tay, navê eşîra Leylaya serdilka Mecnûn e.

[42] Tasavvuf edebiyatında, "aşk", "mey/şarap", "meyhane/puthane", "secde" gibi ifadeler mecazdır; aşk ile "ilahî sevgi", mey ile "ilahî aşk", meyhane ile "tekke, ibadethane", secde ile "Allah'a yönelme" ifade edilmektedir. Nihayet, Seyfülmülûk da bir inzivaya çekilecek, derdini Allah'a açacaktır. Yoksa bu kavramların zahiri anlamlarına takılmak, yanlış yorumlara götürür.

[43] Tay, Mecnun'un sevgilisi Leyla'nın mensup olduğu aşiretin adıdır.

Şem'ê cana dûredest e menzila min zulmet e — *Ruhun çırası çok uzaklarda, kaldığım yer karanlık*

Ez ji kê gazinde kem bînî şemala xaneyê — *Kimden şikâyetçi olayım, ta getirsin evimin şamdanını*

Xuziya roja wisalê bixûyê zilfê hebîb — *Keşki kavuşma günü, görünsün sevgilinin zülfü*

Ku bi mijgan ta bi ta kem ez misala şaneyê — *Ta kirpiklerimle tel tel edeyim, tıpkı tarak misali*

Mihbetê kuştim Siyahpoş şibhetê Seyfulmilûk — *Sevgi öldürdü beni Siyahpûş, tıpkı Seyfülmülûk benzeri*

Lew li ser min ferzê 'eyn e secdeya pûtxaneyê — *Ondandır ki farz oldu üstüme, secde etmek puthanede*

'Aşiqê sadiq ew e, ê ku di rêya dilberê — *Doğru âşık odur ki, dilberin yolu üstünde*

Ger ewî bînin bi ker kin neşkêne peymaneyê — *Ki lime lime etseler onu, asla bozmaz anlaşmayı*

Karê şem'ê her şewat û mihbet û sohtinî ye — *Mumun işi hep yanmaktır hem sevgidir hem yakmaktır*

Lew disojitin Îranî şibhetê perwaneyê — *Ondandır ki yakıyorlar İranlı'yı, tıpkı kelebek misali*

Di hîna rewneqa şemsê ji erdî — *Ne vakit ki Güneşin, aydınlığı yerden*

Bilind bû ta bi çerxê laciwerdî — *Yükseliverdi ta ki, lacivert göğe doğru*

Ji xew rabûn 'uyûnên murx û mahî — *Uykudan uyandılar, kuş ve balık gözleri*

Ji tîrêjnan minewwer qesrê Şahî — *Işınlarla parladı, Şehzadenin sarayı*

Çeleng rabû kurê Salih mişewweş
Uyandı Salih oğlu, güzelce ama sersem

Nihêrî çend nedî pismîrê mehweş
Baktı baktı görmedi, ay yüzlü beyzadeyi

Go, “Hey hey ey ‘ecêb wî şehriyarî
Dedi “Hey hey, gariptir, nerede padişahım

Hewes kirye nizanim weslê carî”
Bilmem, hevesi tutmuş, cariyeye mi varmış”

Du çeşmê kewkebê wî qet nehat xew
İki yıldız gözüne, giremedi hiç uyku

Bi hişyarî bihurand cimleyê şew
Geçirdi tüm geceyi, gözü açık, uyanık

Ji cih rabû nihêrî cimle carî
Yerinden kalktı, baktı, cariyelerin hepsi

Ketin xewabê xoş ez mest û xumarî
Güzel bir uykudalar, mestler, sarhoşlar gibi

Ji etrafan dinêrî lê dikir deng
Etrafına bakıyor, seslenip duruyordu

Sedayek hate wî ez kuncekî teng
O anda duydu bir ses, daracık bir köşeden

Ku çû dît Şahizade der girînî
Gittiğinde ki gördü, Şehzadedir, ağlıyor

Ji du çahvan dirêjî ab û xûnî
İki gözünden onun, akmakta yaş ile kan

Di destan da libas û sûretê mah
Elinde bulunmakta, giysi ve ay suratlı

Dinalî lê dinhêrî yû dikir ah
Bakıp bakıp inliyor, ahlar, vahlar ederek

Dirêj kir destê xwe Se’dulmilûkî
Uzattı ellerini, Sadülmülûk giysiye

Revand libas ji dest Seyfulmilûkî
Kaptı elinden onu, Seyfülmülûk’un

Libas kir pare go, “Ma ev çi hal e?	*Giysiyi parçaladı, “Bu ne hâldir” dedi*
Bi vî rengê girîn û ah û nale!	*“Bu şekilde ağlamak, ah edip inlemek*
Çi hatî serê te ey çeşmê çirayem	*Ne gelmiştir başına, ey gözümün ışığı*
Bibê bo min tu ey şîrîn birayem	*Diyesin benim için, sen ey şirin kardeşim*
Bi vê sirrê ku ez îro bizanim	*Bu gizemi ki bugün, bilebilirsem onu*
Bibin qurbanê te sed rûh û canim”	*Var kurban olsun sana, yüz ruhum ve de canım”*
Mihessel, çend xeber da Se’dê çun mah	*Özce, biraz konuştu, ay gibi Sadülmülûk*
Ji wî tiştek nedî cuz nale û ah	*Ondan bir şey duymadı, inleme, ah dışında*
Ji nik rabû melûl û zêde mehzûn	*Yanından kalktı melül, fazlasıyla hüzünlü*
Xeber bir bo Şehê xemxwarê mecnûn	*Haberi ulaştırdı, tasalı, mecnun Şah’a*
Çeleng rabû Şehê ‘Asim mişewweş	*Kalktı Şah Asım hızlıca, kafası karışıkça*
Bi çespan hat dît ew Mîrê mehweş	*Süratle gelip baktı, gördü ay yüzlü Beyi*
Dinalî yû dikir efxan û zarî	*İnleyip duruyordu, feryat-figan ederek*
Digiriya şibhetê ebrê biharî	*Ağlıyordu öylece, bahar bulutu gibi*
Wekî Şeh dîtî Şehzade bi ewreng	*Şehzadeyi bu hâlde, görünce Şah Asım*
Çiqas pêra xeber da qet nekir deng	*Ona her ne dediyse, almadı bir karşılık*

Çunîn go şahê ‘Asim ba nedîman,
“Ditirsim rast bî qewlê hekîman

Ji derdê ‘işqê bîtin ew hewale
Wiha rengî fixan û ah û nale”

Nedîm û ‘arifan go, “Ey Şehinşah!
Ji çeşmê zexmdan, an nale û ah

Bişewtînin di ber da ‘ûd û ‘enber
Ji bêhnê xoş dîmaxê ken mi’etter

Bila bên mu’teqîd û merdê qaif
Musennif û xwedêtirsan û ‘arif

Biken bo wî tilismat û niviştan
Selîm dê bit bi dû’ayê feriştan”

Bi emrê Şeh xwedêtirsan û wer’î
Ji nehsed zêde hatin cimle cem’î

Nivisîn “În yekadu” ba “Tebarek”[44]
Tilism û çendê ayatên mibarek

Böylece Şah Asım ki, dedi nedimlerine
“Korkarım doğru çıksın, hekimlerin sözleri

Yaşananlar olmalı, aşk derdinden onun
Bu feryatlar o yüzden, hem ahlar, inlemeler”

“Ey şahlar şahı” dedi, nedimler ve bilgeler
“Gelen ahla inleme, gözün yarasındandır

Yakın onun önünde, öd ağacıyla amber
Güzel kokularla siz, beyne koku salınız

Gelsinler itikatlı, hem ehliyetli zatlar
Yazarlar ve bilgeler, takva ehli kimseler

Yapsınlar onun için, büyüler ve muskalar
Melekler duasıyla, kavuşur sıhhatine”

Şah emriyle geldiler, takvalılar, salihler
Tamamı toplandılar, çoktular dokuz yüzden

Yazdılar “İn yekâdu”yu, yanı sıra “Tebarek”[44]
Büyü ile birlikte birkaç mübarek ayet

[44] “În yekâdû” bêjeya sereke ya ayeta 51. ya Sureya Qelemê ye ku bi navê “ayeta çavînê” jî tê zanîn. “Tebarek” bixwe, peyva serî ya ayeta yekemîn ya Sureya Milkê ye.

[44] “İn yekâdu”, “nazar ayeti” olarak da bilinen Kalem Suresinin 51. ayetinin başındaki kelimedir. “Tebarek” ise, Mülk Suresinin 1. ayetinin ilk kelimesidir.

Digel Hirzê Yemanî yû Nûrê Qudsî	*Hırz-ı Yemânî duasıyla Nur-u Kudsî*
Me'el Îxlas û Hizbulbehr û Kursî[45]	*İhlâs, Hizbu'l-Bahr ve Kürsî beraber[45]*
Digel Îsmê 'Azîm û herdu Cewşen[46]	*İsm-i Azim'le birlikte her iki Cevşen[46]*
Ji xeyrê van çend Esmayê rewşen	*Bunların dışında da birkaç da nurlu Esma*
Hemî yekser nivisîn wek hemayîl	*Tamamını yazdılar, hazırladılar bir muska*
Kirin ber gerdenê şîrîn şemayîl	*Astılar boynuna onun, tabiatı şirinin*
Bixûr û miskê çîn û 'ud û 'enber	*Buhurla Çin miskini, hem öd ile amberi*
Di ber da sohtin ew cimle bi yekser	*Yaktılar tamamını, Şehzadenin önünde*
Nebû esla 'ilacê derdê mecnûn	*Olmadı o mecnunun, derdine asla ilaç*
Ji çahvan av dibarî yû ji dil xûn	*Yaş akardı gözünden, yüreğinden ise kan*
Tekellim qet nekir esla wî ba kes	*Konuşmadı kimseyle, asla bir tek kelime*
Li sed rengî dinalî şibhê qeqnes[47]	*Ağlıyordu yüz tarzda, kaknüs kuşu misali[47]*

[45] "Hirz-ı Yemanî", divê "Hırz-ı Emanî" be. Dûayek dirêj, navdar û bimbarek e. Şerhên wê yên Erebî û Farisî henin. Li ser navê parastina nexweşî, çavînî û karesatên wekî din tê xwendin. Bi çavkaniya xwe digihê Ehlê Beyt.
"Hizbulbehr", dûayek ayîdê Ebûlhesenê Şazelî ye ku ji ayet û hinek dûayan pêk tê. Zêdetirîn, ji bo parastinê tê xwendin. Mebest ji "İxlas" û "Kursî" yê, Sûreya İxlas û Ayeta Kursî ye. "Îsmê 'Ezîm", dûaya "Îsmê 'Ezam" e. Wateya xwe, "Navê Xwedê yê herî mezin" e. Ango, digel vî navî, daxwazkirina ji Xwedê ye. Li ser vî navî, tifaq nîn e.

[46] "Cewşen", dûayek meqbûl e ku bi rêya Ehlê Beyt gihaştiye roja me. Di nav çavkaniyên Ehlê Sunnet de, di "Mecmûatul Ehzab"ê de derbas dibe. Çavkaniya wê digihê Cenabê Pêxember. Tê de hezar û yek navê Xwedê derbas dibe; duayek parastin û tefekurî ye.

[47] "Qaqnes" (Kaknüs), balindeyekî esatirî (mîtolojîk) ya wek Anqê ye. Tê gotin ku di nikil de gelek qul henin û bi sirîna ba re ji wan qulan dengên cihê cihê yên melodîk dertên.

[45] "Hırz-ı Yemânî", "Hırz-ı Emânî" olmalıdır. Arapça, Farsça şerhleri olan uzun, meşhur ve mübarek bir duadır. Hastalık, nazar ve sair musibetlere karşı muhafaza fonksiyonlu olduğuna inanılır. Ehl-i Beyt kaynaklıdır.
"Hizbü'l-Bahr", Ebu'l-Hasan eş-Şazeli'ye ait bir duadır. Ayet ve hadislerden oluşturulmuştur. Daha çok korunma amaçlı okunmaktadır.
"İhlâs" ve "Kürsi"den maksat, İhlâs Suresi ile Ayete'l-Kürsi'dir. "İsm-i Azim", "İsm-i Azam" duasıdır. "Allah'ın en yüce ismi" demektir; yani o isimle Allah'a olan duadır. Bu isimde ittifak yoktur.

[46] "Cevşen", Ehl-i Beyt kanalıyla günümüze ulaşan bir duadır. Ehl-i Sünnet kaynaklarından *Mecmuatü'l-Ahzab* adlı kitapta geçmektedir. Kaynağı, Hz. Peygamber'e dayanmaktadır. Bin bir esmanın geçtiği, bir emân (korunma) ve tefekkür duasıdır.

[47] "Kaknüs", Anka gibi, esatiri (mitolojik) bir kuştur. Gagasında çok delik olduğu; havanın değmesiyle bu deliklerden farklı melodide seslerin çıktığı söylenmektedir.

Hekîm hatin nihêrîn nebze û dest	*Gelip baktı doktorlar, eline ve nabzına*
Rehê qolinc û rengê Şahê sermest	*Damarlarına sırtının, rengine sarhoş Şah'ın*
Nebûn 'alim ji derdê wî bi hikmet	*Bilginler hikmetiyle, bulmadılar derdini*
Ji rencê wî hilanîn zêde heybet	*Azdırdılar daha çok, ağryla sızısını*
Bi hevra go "Ewan ev derde zor e	*Ağız birliğiyle onlar, "Zordur bu dert" dediler*
Ji halê wî bûyîn em cimle kor e	*"Hâlinden onun bizler, olmuşuz kör hepimiz*
Nihin ev derd, "Îlla fi fûadih"	*Öylesi dert değildir, "İlla fi fuadih"tir*
Kî "Subhanellezî esra bi 'ebdih"[48]	*Ki "Sübhanellezi esra bi abdih" olmalıdır*[48]
Ji azarê dil e, ew bê tekellim	*Gönlün acısındandır, konuşmaması onun*
Bi lez tên coyê ab ez çeşmê purnem"	*Ondan ıslak gözlerden, hızla akar iki ark"*
Bi emrê Şeh li paşan dayîkaneş	*Şah'ın emriyle onun, son olarak ninesi*
Digel ummê heqîqî der feşaneş	*Öz anneyle birlikte, oraya çağrıldılar*
Bi lez hatin bi hevra û bi te'cîl	*Vakit kaybetmeksizin, aceleyle geldiler*
Ji pûrê Şeh bikeyn meqsûdê teshîl	*Şah oğlundan muradı, öğrenmek istediler*

[48] "Îlla fi fûadih", ibareyek erebî ye ku bi wateya xwe wiha ye: "Tenê karê dilê wî ye.
"Subhanellezî esra bî 'ebdih", ev îfade, qismê destpêka ayeta 1. ya Sûreya Îsraê ye. Meala wê wiha ye: "Xwedayê ku ji kêmasiyan pak e, ew 'ebdê xwe bilind kir..."

[48] "İlla fi fuadih", yani "Ancak gönlünün işi" anlamında Arapça bir deyim.
"Sübhanellezi esra bi abdih" ifadesi İsra Suresi, 1. ayetinin baş kısmıdır. Meali şöyledir: "Eksikliklerden münezzeh Allah, o kulunu yükseltti..."

Çiqas pêra xeber dan Şahizade	*Ne kadar konuştular, Şehzade'ye hitaben*
Nekir hasil ji wan re yek mirade	*Açmadı ağzını o, tek muradına dair*
Girîn û şîwen û zarî yû aheng	*Ağlamalarla yaslar, feryatlarla ezgiler*
Kirin danîn û Şehzade nekir deng	*Yaptılar ancak, Şehzade vermedi ses*
Li nik rabûn melûl û 'aciz û zar	*Kalktılar Bey yanından, melül, aciz, perişan*
Teheyyur bûn ji halê wî bi yekcar	*Hayretlerde kaldılar, hâlinden bütün bütün*
Dinalî Şahizade şibhê qaqnes	*İnliyordu Şehzade, kaknüs kuşu misali*
Ji halê wî me çêkir în muxemmes:	*Bu hâlinden onun, yaptık bu muhammesi*

XEZEL-4

GAZEL-4

Îro me j'destê xonçeleban nale ji dil tên	*Gonca dudaklıların elinden bugün, inlemeler geliyor yürekten*
Ahîn û girîn û şîwen ez cerhê di kul tên	*Geliyorlar ahlar, ağlamalar ve şivenler, yaralı yürekten*
Zêde ji cefa û elemên tîrê qizil tên	*Fazlasıyla eziyet ve acılar, geliyorlar kızıl oklardan*
Sed bilbilê şeyda ji teleb badeyê gul tên	*Yüz deli divane bülbül, talepteler gül şarabından*
Lê cimle bi zarî ji xedengan bi qetil tên	*Ancak hepsi de ağlamaktalar, öldürücü okların darbesinden*

Sewdazedeyê ‘işqê to em ey rahetê can	*Senin aşkının tutkunuyum ey ruhumun rahatı*
Ta kengî ji hicranê te kem nale û efxan	*Daha ne vakte dek ayrılığından inleyip feryat edeceğim*
Bê dîn û wisala te nihin bo me çu derman	*Dermanımız yok bizim, seni görmezsek, sana kavuşmazsak*
Eflaton û Calînos û ‘Îsa me’e Loqman[49]	*Eflatun ve Calinos’da olsun, İsa’yla beraber Lokman’da olsun[49]*
Billah ji cefa û elemê ma bi xecil tên	*Allah’a yemin ki, zahmet ve acılarımızdan mahcup olurlar*
Serxoş û xumar im ji meyê horîsiriştan	*Sarhoş ve kendimden geçmişim, huri tabiatlıların şarabından*
‘Eql û dil û fehmê me birin kakul û qeştan	*Akıl, gönül ve anlayışı aldı bizden, kâküller ve güzeller*
Te’wîz û tilismat û dû’ayêd feriştan	*Muskalar, büyüler ve meleklerin duaları*
Nakin eserê dil ji birînê rim û xiştan	*İz ve eserini silemez gönülden, mızrak ve şiş yaralarının*
Lewma ku siyehmar bi ger û bi fetil tên	*Ondandır ki siyah zülüfleri yılan olanlar, döne dolaşa gelirler*

[49] Eflatûn, bi navê din Plaon, B.M. di 427an de li Atînayê xwedêdaye, 347an de li heman bajarî miriye. Damezrînerê “Akademî”yê, xwediyê ramana “Dewleta Îdeal” e. Şagirdê Sokrat e. Di warê felsefeyê de kesekî pêşeng e. Li ser navê wî 28 pirtûk gihaştine roja me.
“Calînos”, P.M. di sala 108’an de li Bergemayê jidayîk bûye, 200’î de li heman cihî wefat kiriye. Bijîşk û felsefezanê heyama Romaiyan e. Bi orijînal ya Grekî 140 pirtûkê wî gihaştiye roja me.
“Îsa”, mebest jê, Nebî Îsa ye.
“Loqman”, bi binyada xwe Yemenî ye. Dîroka xwedêdan û cihê xwe ne diyar e. Bi xebatê tıbbî yên li ser nebatan navdar e. 31. sûreya Quranê bi navê wî ye. 12. ayeta vê sûreyê de, ev hevok heye: “Me, hîkmet bexşê wî (Loqman) kir...” Ji bo wî, “bapîrê hekîmtiyê” jî tê gotin. Ji ber vê unwanê, ew zêdetir bi vî navê “Loqmanê Hekîm” tê serzimankirin.

[49] Eflatun, Platon ismiyle de bilinir. M.Ö. 427 yılında Atina’da doğmuş, 347’de aynı yerde vefat etmiştir. Sokrat’ın öğrencisi ve felsefede öncü bir şahsiyet olan Platon, “Akademi”nin kurucusu ve “İdeal devlet” görüşünün sahibidir. Üzerinde anlaşmaya varılan 28 eseri günümüze ulaşmıştır.
“Calinus”, M.S. 108 yılında Bergama’da doğmuş, 200’lerde aynı yerde vefat etmiş bir Roma dönemi doktor ve felsefecisidir. Günümüze 140 civarında eseri Grekçe orijinalleriyle ulaşmıştır.
“İsa”dan maksat, Hz. İsa’dır.
“Lokman”, Yemen asıllıdır. Doğum ve vefat yılı ve yeri meçhuldür. Tıp alanında, bitkiler üzerindeki çalışmalarıyla bilinir. Kur’an’ın 31. suresi (Lokman) onun adıyladır. O surenin 12. ayetinde, “Ona (Lokman’a ‘hikmet’ verdik...” denilmektedir. Ona, ayrıca “hekimliğin atası” unvanı da verilmiştir ki, bu unvan, onun “Lokman-ı Hekim” olarak anılmasını beraberinde getirmiştir.

Cana çi bikem, ger ne bikem nale û zarî	*Ey sevgili, ne edeyim, şayet inleyip ağlamazsam*
Robe şewed ez ‘işqê to sed şêrê şikarî	*Senin aşkından ötürü, tilki yüz avcı aslana bedel olur*
Dil bir bi kerî kir senema çeşmê xumarî	*Gözleri mahmur sanem, gönlü götürüp yardı, parçaladı*
Zilf û xet û xal û serê ce‘dên reş û tarî	*Zülüf, hat ve benler, koyu siyah kıvırcık saçlarının uçları*
Rengsinbil û reyhan û binevş û qenefil tên	*Sümbül, reyhan, menekşe ve karanfil renkli gelir*
Du ‘eynê bi siwadî, te çire zêde binaz in	*İki kara gözün, neden fazlasıyla nazlıdır*
Ehdabê li canê me misal neşterê gaz in	*Canımız üzerinde kirpikler, neşter ve diş misalidir*
Hemrazî me îro ji hewayet ney û saz in	*Sırdaşınım bugün ben, senin aşkından ney ve sazın*
Qurbanê du çeşmê te bim û zend bi baz in	*İki gözüne kurban olayım, ey bilekleri bilezikli*
Sed şibhê Siyahpoş ji cefayan bi fetil tên.	*Yüzlerce Siyahpûş benzeri, cefalardan dönüp de geliyor*

Li paşan Şeh emir kir serxezîndar,	*Ardından emretti Şah, hazine bakanına*
Cewahir û zêr û sîm biîn bi xerwar	*Cevher, altın, gümüşten, çuvallarla getirin*
Ku i’ta ken bi derwêş û feqîran	*Ki hediye etsinler, dervişle fakirlere*
Xerîb û hem mesakîn û esîran	*Gariple miskinlere, hem esir düşmüşlere*
Dellalan gazî kir manendê qumrî	*Tellallar çağırdılar, sanki kumrular gibi*
Xerîb û bênewa, miskînêd şehrî	*Şehrin garibanları, nasipsizler, miskinler*

Cemi' bûn ber derê Şahê keremdar	*Toplandı kapısında, kerem sahibi Şah'ın*
Cewahir û direm bir wan bi xerwar	*Dağıttı cevherleri, dirhemi çuvallarla*
Xulaman bir bi emrê Şahê 'Asim	*Hizmetçiler götürdü, Şah Asım'ın emriyle*
Ji hedd zêde şal û kurk û qaqûm	*Haddinden fazlasıyla, şalı, kürkü, samuru*
Cewahir û zêr û sîm sed hezar kîs	*Cevherler, altın, gümüş, miktarı yüz bin kese*
'Eta kir wan bi ehlê 'ilm û tedrîs	*Alimlere armağan, hem de müderrislere*
Feqîh û 'alim û miskîn xina kir	*Zengin etti fakihi, hem bilginle miskini*
Mesacid û pir û xanha bina kir	*İnşa eyledi mescit, hem köprü ve hanları*
Ji dused xizne bêhtir kirne tarac	*Dağıttı hazineyi, iki yüzden daha çok*
Di Misrê da neman esla çu mihtac	*Kalmadı Mısır'da hiç, asla bir muhtaç kişi*
Welêkin red nekir teqdîrê Ellah	*Ancak onay vermedi, buna İlahî takdir*
Got "La hewle wela quwwete illa billah"[50]	*"Lâ havle velâ kuvvete, illâ billâhi" dedi*[50]
Çunîn got Şahê 'Asim Îbnu Sefwan,	*Şöylece dedi Asım, İbni Safvan olan Şah,*
"Ela ey Qadirê Qeyyûm û Mennan!	*"Malumundur ey Kadir, Kayyum ve Mennan Allah*
Teseddiq çendê min da û miqedder	*Verdim onca sadaka, ancak mukadderat ki*
Nebû red û mirada min miyesser	*Kabul görmedi Sen'den, kavuşmadım murada*

[50] "La hewle wela quwwete îlla billah", yek ji hedîsên Cenabê Pêxember e. Bi wateya xwe wiha ye: "Hêz û şiyan, tênê ji Xwedê ye."

[50] "Lâ havle velâ kuvvete illa billâh", Hz. Peygamber'e ait bir sözdür, yani hadis kaynaklıdır. Anlamı: "Güç ve kuvvet, yalnızca Allah'tandır."

Nebû ba rûyê Şehzade sirûrî	*Gülmedi şehzademin, yüzü, gönlü sevinçli*
Qedîm û Qadir û Heqq û Sebûr î	*Sen ki Kadim, Kadir'sin, hem Hak ile Sabur'sun*
Bi emrê Şeh bi zencîrek miresse'	*Şah'ın emriyle süslü, bir zincir getirdiler*
Ji elmas û cewahiran milemme'	*Parıl parıl parlardı, elmasla cevherlerden*
Kirin qeydê du payê Şahê mehcûr	*Vurdular terk edilmiş, ayaklarına Şah'ın*
Ji mehcûrî dibû her lehze rencûr	*Azaplar çekiyordu, yalnızlıktan her lahza*
Di hucrek xas da şahane zergeş	*Özel bir odada, yaldızlı ve şahane*
Kirin mehbûs û bend ew Mîrê mehweş	*Bağlayıp hapsettiler, ay yüzlü beyzadeyi*
Li nik rabûn bi cem'î cimle me'yûs	*Yanından umutsuzca, tümü kalkıp gittiler,*
Bi tenha ma Şehê xûnxwar û mehbûs[51]	*Yalnız başına kaldı, mahpus ve tükenen Şah[51]*
Dinalî ew seraser cimleyê şew	*İnliyordu tüm gece, boyunca baştan başa*
Wekî tûtak û goyînan nebû xew	*Tûtî ve dudu gibi, tutmazdı uyku onu*
Xew û xwarin hilatin jê bi yekcar	*Mahrum kaldı uykudan, yemekten de tümüyle*
Gehî bêhiş dibû ew gahî hişyar	*Bazen kendinden geçer, bazen kalır uyanık*
Ji derdê 'işqbazî yû xeyalî	*Mecazi aşk derdinden, hem hayalî olandan*
Ze'if û zer bibû şibhê hilalî	*Zayıf ve sararmıştı, tıpkı hilal misali*

[51] Bêjeya "Xûnxwar" bi wateya "xwexwar" mumkin e were fehmkirin; ew dildarên ku bi ber êşa evînê xwe dixwe, xwe diqedîne.

[51] "Tükenen" kelimesi, "Xûnxwar" (hunhar) karşılığı olarak kullanıldı. Aşk acısıyla kendini yiyip bitirme durumu.

Welê Se'dulmilûkê mest û mexmûr	*Ancak mest, mahmur olan, yoldaşı Sadülmülûk*
Nebû xafil demê ez Şahê mehcûr	*Bir an gafil olmadı, yalnızlığa çekilen Şah'ından*
Şev û rojê di xizmet îstade	*Gece gündüz ayakta, hizmetindeydi onun*
Ze'îf bibû ji derdê Şahizade	*O da zayıf düşmüştü, Şehzadenin derdinden*
Çi bêjim 'Asimê mehzûn û xemnak	*Ne diyeyim, ya Asım, üzüntülü, kederli*
Dinalî şibhetê goyîn û tûtak	*İnleyip duruyordu, tûtî ve üveyik gibi*
Ji derdê Şahizade ew şebefroz	*Şehzadenin derdinden, o geceyi aydınlatan*
Nebû mesrûr demê ew şahê feyroz	*Sevinmedi hiçbir dem, o kutlu, mübarek Şah*
Dinalî Şahê 'Asim wek keboter	*İnliyordu Şah Asım, güvercinler misali*
Digel ummê pûser, Şehzademader	*Oğlunun annesiyle, Şehzadenin annesi*
Hezîn û mustemend ez çeşmê pirr ab	*Kederli ve gamlıydı, yaş dolu gözlerden*
Dirêhtin ab û xûn ser kurk û sencab	*Akardı kanlı yaşlar, kürkle samur üstüne*
Wekî Ye'qûb dixwarin pirr teessif	*Yakup misaliydiler, fazlasıyla kederli*
Digot wan ew çibû ya îbnu Yûsif	*Diyorlardı ne oldu, sana ey Yusuf oğlu*
Çiqas ehlê biladê Misr û Şaman	*Ne kadar varsa halkı, Şam'ın hem de Mısır'ın*
Çi mêr û jin ji xas û hem 'ewaman	*İster kadın ve erkek ister, seçkin ve halktan*

Hemî yekser hezîn û dil pirr ez xem	*Tamamının kalpleri, çok gamlı, kederliydi*
Ji xemxwarî nebûn mesrûrî yek dem	*Bir an olsun sevinçli, olmadılar gam, dertten*
Xemê Şehzadeyê mest û dilawer	*Mest düşmüş, gönül vermiş, şehzadenin gamından*
Dixwarin zêde çendî mîr û begler	*Çekmekteydiler çokça, nice beyler, paşalar*
Di bin daireyê çerxê miqernes	*Şu kubbemsi feleğin, altında çatısının*
Çira wan qet nedîbû mislê wî kes	*Görmemiştiler çünkü, benzerinden birini*
Hemî yekser hezîn û mistemend bûn	*Tümü birden olmuştu, üzüntülü, kederli*
Melûl û ‘aciz û hem derdimend bûn	*Boynu bükük ve aciz, hem olmuştular dertli*
Gelî yaran nezer dên halê gerdûn	*Ey dostlar bakwerin, şu dünyanın hâline*
Ne mesrûr bin ji teb’ê wê ne mehzûn	*Ne huyuyla sevinin ne de olun hüzünlü*
Gehî ehwalê wê hizn û girîn e	*Bazen hâlleri onun, ağlayış ve kederdir*
Gehî şadî yû keyf û hem kenîn e	*Bazen de hâli olur, sevinç, keyif ve gülme*
Dibînin hûn ku dinya bêwefa ye	*Görüyorsunuz işte, dünya ki vefasızdır*
Ji kes ra wê nehin ‘ehd û wefa ye	*Yoktur onun kimseye, ahdi ile vefası*
Serencam dê bidet we şerbetê merg	*Akıbet verecektir, size ölüm şerbeti*
Heta ew terkê dit, hûn wê bidin terk	*O sizi terk etmeden, varın siz terk edin*

Xemê ‘işqê û zewq û lezzetê ‘işq	*Aşkın gamları ile, aşkın zevk ve lezzeti*
Dizanî ey vexwarê şerbetê ‘işq	*Nedir onu bilirsin, ey içen aşk şerbeti*
Kesî cur’ek nexwarî camê ‘işqê	*Bir yudum şarabından, aşkın içmeyen kişi*
Heta bimirit nizanî tamê ‘işqê	*Anlayamaz ölene, kadar aşkın tadını*
Hikayatên der ‘işqê pirr dirêj in	*Hikâyeleri aşkın, fazlasıyla uzundur*
Emanet sirrê ‘işqê hûn mebêjin	*Tavsiyem söylemeyin, sırlarını siz aşkın*
Neşêtin sirrê ‘işqê qet ‘eyan ken	*Sakın ola açmayın, aşkın sırrını asla*
Meger bo yarê canî hûn beyan ken	*Ancak açıklayınız, onu can yoldaşınıza*
Me’elqisse ku borîn çend eyyam	*Özetle, geçti böyle, birkaç gün zaman*
Nebû ‘Asim bi halê pûrî i’lam	*Asım anlayamadı, hallerinden oğlunun*
Ji derdan bû ze’îf û mest û medhûş	*Dertlerden zayıf düştü, mest ve şaşkın*
Wekî dîwaneganê ‘işqê serxoş	*Tıpkı aşk sarhoşları, aşk delileri gibi*
Cemi’ bûn ehlê Misrê cimle yekser	*Toplandı Mısır halkı, bir baştan öte başa*
Digel Salih û Poşîn mîr û begler	*Salih, Poşin ve beyler, hem birlikte paşalar*
Ji dîwanê Şehê ‘Asim bi tedbîr	*Şah Asım divanında, aldığınız tedbirler*
Digo wan, “Qet mixeyyer nabî teqdîr	*Derlerdi “Değiştiremez, asla onlar takdiri*

Wekî nabî bi tedbîr Şahizade
Görüldü ki olmuyor, tedbirle şehzadeden

Me guftarek ji halê wî mirade
Bir laf dahi almadık, muradıyla ilgili

Ji halê wî nizanin em çi bêjin
Ne diyelim halinden, onun, bilmiyoruz

Ji derdê wî hemî em mest û gêj in
Halinden hepimiz, mest ve sersem olmuşuz

Nehin bo me qerar û sebr û taqet
Kalmadı bizim için, karar, sabır ve takat

Nema pirr Şahizade çit helaket
Az kalsın mahvolacak, yok olacak şehzade

Xew û xwarin hilatin bo me yek bar
Yok oldu bizim için, tamamen uyku, yemek

Ji ber derdê Şehê mehzûn û xûnxwar
Kederli, kan ağlayan, Şehzadenin derdinden

Çi daînên nebû bo wî dewayek
Yoktur ki verelim biz, onun için bir derman

Li pêy her cewrekî dê bit sefayek”
Her cefanın ardından, gelir mutlak bir safa”

Wereng got Salihê zana û ‘aqil,
Bu şekilde söyledi, akil ve bilge Salih,

“Ji behrê heyret û fikr û teemmil
“Hayret ve düşüncenin, umudun deryasından

Nebû bendek ku min ew bend kuşa kir
Hiçbir engel yoktur ki, kaldırmış olmayayım

Nebû qeydek ku min ew qeyd reha kir
Hiçbir kayıt yoktur ki, onu çözdürmeyeyim

Ji ehwalê Şehê mehzûn çu tedbîr
Ne tedbir var idiyse, kederli Şah’a dair

Nemayîn û nekirye min çu teqsîr
Bırakmadım ben eksik, etmedim kusur onda

Welê tedbîrekî dî ez dizanim	*Ancak başka bir tedbir var, biliyorum ben*
Ji wî halê jî zû da ez gumanim	*Uzun zamandır, şüpheliyim onun bu halinden*
Dibêjim ew ji ‘işqê bûye mecnûn	*Derim ki aşktan olmuştur, böyle mecnun*
Ji sewdayê dil e ewrenge mehzûn	*Şu haldeki kederi, sevdasındandır gönlün*
Çira ‘işqê şebabî pirr şewat e	*Neden ki çok yakıcı, gençlik aşkının ateşi*
Dilê ‘işq tê nebî ew dil mewat e	*Ölüdür o gönül ki, onda aşk bulunmazsa*
Çu kes nînin di halê çardeh salan	*Kimseler anlayamaz, on dördünde olanı*
Ji dil meylê nedet ebrûhilalan	*Vermemişse gönlünden, hilal kaşlılara meyil*
Yeqîn dil daye mehbûbek biyarî	*Kesindir, gönül vermiş, yabancı bir dilbere*
Weya ber sûretek wî şehriyarî	*Veya bir suret görmüş, gözleri Padişahın*
Werengî ew ji ‘işqê dil hezîn e	*O aşktan dolayıdır, yüreği kederlidir*
Bi ah û şîwen û nal û girîn e	*Ah edip yas tutmakta, inleyip ağlamakta*
‘Îlaca haletê Seyfulmilûkî	*İlacıdır halinin, Seyfülmülûk’ün bilin*
Dibî ba yarê can Se’dulmilûkî	*Götürmektir yanına, canı Sadülmülûk’ü*
Bi nerm û şîrînî bînî bi guftar	*Konuşturmalı onu, yumuşakça, şirince*
Di nav wan de hebûne sirr û esrar	*İkisinin arasında vardır, sırları, arzuları*

Bi halê hev dizanin ew ji mêjî
Dibê remzek ji halê xwe bibêjî”

Onlar hâlini birbirinin, bilirler ta başından
Halinden bir işaret, olur ki söyler ona”

Ji Şeh xoş hatin ew guftar û teqrîr
“Di dil min got wereng e husnê tedbir”

Şah’a gayet hoş geldi, o konuşma, tavsiye
“İçimden dedim ki budur, tedbirin en güzeli”

Bi emrê Şah hat Se’dê dilawer
Vewesta pêş miqabil Şeh beraber

Geldi Şah’ın emriyle, kahraman Sadülmülûk
Ayakta karşısında, durdu Şah’ının öyle

Şehê ‘Asim werengê gote, “Ey Se’d!
Ji te min telbeye îro bikî cehd!

Şu şekilde Şah Asım, dedi, “Ey Sadülmülûk
Bugün senden talebim, gayret etmendir senin

Bi guftar bînî tu Şehzadeyê mest
Ji ah û nalînan da wî çiye qest

Söze getirmelisin sen, mest düşmüş Şehzadeyi
Kastı nedir, niçindir, ahlardan, inlemelerden

Bila izhar biket ew bo te meqsûd
Bi tewfîqa Xwedê dê bîte mewcûd

Nedir arzusu onun, açığa vursun sana
Allah’ın yardımıyla, her neyse olacaktır”

Bi ferman Se’d çû nik Şahizade
Got: “Ey mestaneyê bê xemr û bade

Ferman ile Sad vardı, yanına Şehzadenin
Dedi ki, “Ey mest düşmüş, içki, şarap içmeden

Ji derdê te ze’îfim wek hilalî
Şev û rojan dikem fikr û xiyalî

Derdinden zayıf düştüm, bak hilal misaliyim
Düşüncen hayalinle, meşgulüm gece gündüz

Ji halê te nizanim ez çi bêjim	*Senin durumundan ben, bilmem ki ne diyeyim*
Wekî dînan xumar û mest û gêj im	*Tıpkı deliler gibi, mest, sarhoş, avareyim*
Nemayîn bo me sebr û hiş û taqet	*Kalmadı bizim için, ne sabır, akıl, takat*
Xew û xwarin me çûn zewq û rahet	*Ne uyku ne de yemek, kalmadı zevkle rahat*
Heta kengî wiha bî bê tekellim	*Ne zamana kadar sen, sessizce kalacaksın*
Bi yarê xwe çira nakî terehhim	*Neden bu yoldaşına, hiç merhamet etmezsin*
Dizanî yarê canêm bo te ey yar	*Ey benim can yoldaşım, bilirsin ki dostunum*
Digel min tu çira nayê bi guftar	*Neden yanaşmıyorsun, benimle konuşmaya*
Ji bo halê te ez mişkilkuşa me	*Senin zor durumunu, açan anahtarım ben*
Digel te yarê canî yû bra me	*Bilirsin ki ben sana, candan yoldaş, kardeşim*
Ji ta me'lûm e ku yaranê can î	*Bilirsin ki sen bana, candan yoldaşsın daim*
Çu esraran ji hev nakin nihanî	*Gizlemezsin benden sen, sırlarından tekini*
Were bo me bike sirrê xwe izhar	*Gel açıkla sırrını, onları benim için*
Mu'în bim ku ji bo derdê te ey yar	*Ta yardımcın olayım, dertlerine ey dostum*
Bi halê hev dizanin em ji mêjî	*Birbirimizi biliriz, ta evveliyattan beri*
Heta key sirrê xwe bo min nebêjî	*Ne zamana dek bana, anlatmazsın sırrını*

Eger ê min tu nabî yarê dilbend
Li min billah were tu b'de bi sewkend

We ger ne bes hilîne te'nê merdan
Dizanî da çi rengî hin xeberdan

Çiqasê cimleyê xas û 'ewam e
Dibên Şehzade 'aqil netemam e

Sefîh û ehmaq e mecnûn û dîn e
We ger ne ew çi nalîn û girîn e

Eger pêra xeberdan ken li sed reng
Sedayek jêve nayê şibhetê seng

Çu 'aqil wek te nabin bê tekellim
Bi bab û day çira nakey terehhim

Ku bab û day ji bo te her bi ah in
Li ser ta pê libasê wan siyah in"

Li paşan gote wî Se'dê dilawer,
"Bi heqê hurmetê an şîrê mader

Şayet ki bana candan, olamazsan gönüldaş
Gel artık ebeden sen, yeminle vazgeç benden

Yok eğer kabulünse, kaldır mertten kınama
Bilirsin ne haldesin, ondan bize ver haber

Ne kadar var seçkinler, hem sıradan insanlar
Hepsi Şehzadem için, aklı eksik dediler

Beyinsiz ve ahmaktır, hem deli ve divane
Yok eğer ki değilse, ne bu inilti, ağlayış

Konuşulsa onunla, şayet ki yüz şekilde
Ondan çıkmaz tek seda, zannedersin taştır o

Kalmadı tek akıllı, seninle konuşmayan
Nedendir acımazsın, annene, babana sen

Ki annen ve baban hep, ah vah ediyor sana
Baştan ayağa onlar, giymişler karaları"

Ardından Sadülmülûk, o yiğit ona dedi,
"Annenden içtiğin sen, o sütün hakkı için

Bi av û nan û an meyê dilefroz
Su için, ekmek için, gönül açan mey için

Bi zewqê sohbet û xwabê şeb an roz
Sohbetlerin tadına, gece, gündüz hâbına

Bi şîranî, an yaranê canî
Ya tatlılıkla olsun ya candan yoldaşlığın

Çu esraran jihev naken nihanî
Ki onlar hiç gizlemez, birbirinden sırrını

Ji te min telbe ye ey mahê enwar
Senden talebim benim, ey ışık saçan ayım

Ku halê xwe bike tu bo me izhar!"
Ki bizim için artık, açmalısın halini!"

Çiqas cehd kir wî gulbiharî
Ne kadar çabaladı, o Sad ki bahar gülü

Ji wî tiştek nedî cuz ah û zarî
Ondan hiçbir şey görmedi, ahu zarın dışında

Ku dît Se'd ku cehda wî betal e
Ki gördü Sadülmülûk, boşunadır çabası

Got: "Ey Şehzadeyê bi ah û nale!
Dedi, "Ey ahlar çekip inleyen Şehzade sen

Were ehwalê xwe bo min xeber de
Gel, anlat durumunu, ta ki bilmiş olayım

We ger ne, dê bikim helqûm bi ker de!"
Yok anlatmazsan eğer, boğazlarım kendimi"

Dirêj kir destê xwe Se'dê dilawer
Uzattı elini o, kahraman Sadülmülûk

Ji kalan keşand elmasê xencer
Kınından çekiverdi, elmastan hançerini

Serê xençer bi nêzîk kir ji helqûm
Yaklaştırdı ağzını, boğazına hançeri

Wekî ewreng û hal dîn Şahê mexmûm
Şahit oldu duruma, gamlara boğulmuş Şah

Bilezdestê xwe xençer girt ji destan
Stand û got, “Ey dildarê mestan!

Tu çi dixwazî ji halê min bibêjim
Ji derdê ‘işq e ewreng mest û gêjim”

Çekiverdi süratle, elinden hançerini
Alıp eline dedi, “Ey mestlerin dildaşı

Ne istiyorsan söyle, halimden anlatayım
Bu hal aşkın derdidir, ondan mestim, sersemim”

XEZEL-5

‘Aşiq be perîzade me bê nam û nîşan e
Çavnêrê mehê me ku ji ‘ewrî ne xûya ne

Ger çi ku hebîb xaîb e pêş çahvê me lêkin
Wek “Şemsê Dûha”yê di dilê min da ‘eyan e

Ehwalê xemê ‘işqê li ‘ammê çi ‘eyan kem
Tuhmetzedeyê maherûyêyem xaîbane

‘Amî çi bibêjin di heqê halê me meqbûl
Çil roj e çi zanit lezzetê çeng û çexane

Ser ta bi pêyan dê bikem ez xwe bi siyahpoş
Ku şem’ê munîra me ji zulmatê nihan e

GAZEL-5

Aşığıyım peri kızına, namsız ve unvansızdır
Aya bakmaktayım ben, ki görünmüyor buluttan

Her ne kadar kayıptır sevgili, gözlerimizin önünde ancak
Dûha’nın güneşi gibi, gönlümde ayan beyandır benim

Aşk gamlarının halini niçin beyan edeyim herkese
Ay yüzlü töhmetine uğradım, gizli ve kapalı olarak

Cahiller ne derlerse halimizden bizim, makbuldür
Kırk gündür ne bilsinler lezzetini, saz eğlentisinin

Baştan ayağa dek edeceğim kendimi, siyahlara bürünmüş
Ki bizim aydınlatıcı mumumuz, gizlidir karanlıklardan

Li paşan gote Se'dê mest û zîba,
"Eger ya min dît carek te bidîba

Ji min bêhtir tu bûy mecnûn û ebter
Bimay serxweş û heyran ta bi mehşer!"

Go yara, "Te çi dît ey Şahizade
Me guftarek ji wî halê mirade"

Go "Min dît sûretek mehbûb û dilgeş
Li ser libsê zêrefşan û mineqqeş

Nizanim ew perî bû yane insî
Weya şiklek bedî' enwarê qudsî

Dil û cerg û ceger pirr herişandin
Ji du çahvan av û xûn rijandin

Bi min şerm û heya ye, pirr hicab e
Ku vê sirrê beyan kem pêşê babe

Çira ew sûretê şiklek ji mêj e
Dixwazî tu bibêjî, her bibêje!"

Sonra, Sadülmülûk'e, dedi o mest, güzele,
"Eğer gördüklerimi, bir kez de sen görseydin

Benden fazla olurdun, deli ve de divane
Sarhoş, hayran olarak, ta mahşere kadar sen"

Dedi "Ey dostum benim, neyi gördün Şehzadem
Bekleriz senden bir söz, o halden muradınla"

Dedi, "Gördüm sevgili, gönül çeken bir suret
Altın yaldız kumaşta, nakşedilmiş olarak

Bilmiyorum peri mi, yoksa insanlardan mı
Ya da eşsiz bir şekil, kutsal bir nur muydu

Fazlasıyla ezdirdi, can, ciğer, yüreğimi
Döktürdü gözlerimden, kanımı, gözyaşımı

Utanıp sıkılıyor, hayam da el vermiyor
Ki babamın önünde, açayım ben bu sırrı

Nedendir ki o suret, olsun eski bir şekil
İstersen var sen söyle, söylemelisin mutlak"

Ku sirrê xwe beyan kir Şahê serxoş	*Ki sırrını açıkladı, kendinden geçmiş Şah*
Digel ah û girînî geşte xamûş	*Ah ile ağlamayla, gömüldü sessizliğe*
Wekî Se'dulmilûk evrenge teqrîr	*Sadülmülûk bu tarzda, açıklamaları ki*
Bihîstin yek bi yek çun şekir û şîr	*İşitti birer birer, ki şeker, süt misali*
Bi nermî 'erz kir pêş Şahê 'Asim	*Usulünce giderek, arz etti Şah Asım'a*
Li ser wî zêde kir litf û terehhim	*Etti ona fazlaca, iyilik hem merhamet*
Ku ew teqrîr bihîstin Îbnu Sefwan	*Ki bu söz, izahları, duyunca İbni Safvan*
Serê xwe danî ser dil mest û heyran	*Yüreğine baş koydu, mest ve hayran olarak*
Bi miqdarê sa'etek qet nekir deng	*Bir saat kadar durdu, sustu hiç konuşmadan*
Li paşan xweş xeber da wî bi ev reng,	*Sonra dönüp güzelce, haber verdi bu tarzda*
"Gelî merdan ku ev sirr e ji mêjîn	*"Ey yiğitler bu sırdır, ta geçmişten*
Hikayetên di vê sirrê dirêj in	*Ki çok uzundur hikâyeleri, bu sırrın*
Rûniştî bûm li eywana xwe carek	*Oturmuştum bir gün, köşkümün balkonunda*
Bi tenhayî dikir zikrê mibarek	*Yapıyordum tenhada, mübarek zikirleri*
Ji nageh hat bayek sext ê dijwar	*Ansızın esiverdi, sert, şiddetli bir rüzgâr*
Direcfîn û dihejiyan dar û dîwar	*Titriyordu, sallanıyordu, ağaçlarla duvarlar*

Me go belkî ku dinya dê xera bî	*Bundan dedik herhalde, dünyamız yıkılacak*
Çira dinya bi bayê dê xera bî	*Niçin yıkılsın dünya, etkisiyle rüzgârın*
Li paşê lehzeyek hevt tên bi itmam	*Bir lahzanın ardından, tamamı yedi kimse*
Selam kir wan li min nageh ji endam	*Belirdi birden bana, verdiler boydan selam*
Me go hûn kî ne bêjin bo me ey merd	*Sorduk ki siz kimsiniz, ey mertler deyin bize*
Ji ber bayê dihejya cimleyê ‘erd	*Esintinizden sizin, titriyordu yerküre*
Ewan got tu metirs ey Îbnu Sefwan	*Dediler ki korkma sen, ey İbni Safvan Asım*
Ku heyin em qasidî tên ez Suleyman	*Ki elçileriyiz biz, Süleyman peygamberin*
Ji cih rabûm bi şadî ez ji endam	*Sevindim, kalktım yerden, dikildim ben ayakta*
Ji wan re pirr me kir i’zaz û ikram	*Onlara yaptım epey, saygı ile hem ikram*
Eger te divê bizanî ku em kî ne	*Öğrenmek istersen ki, bizler kimiz, neciyiz*
Eger çi qasid in, lê em perî ne	*Her ne kadar elçiyiz, ama bizler periyiz*
Li ser text me cih da wan ku rûnîn	*Yer verdim ben onlara, ki tahtta otursunlar*
Dilê min bû ji şadiyê bi temkîn	*Gönlüm rahata erdi, mutluluktan, sevinçten*
Ewan da dest me ungustîlê elmas	*Verdiler elime onlar, elmastan bir yüzüğü*
Ji bo te ev hediye ey xwedênas	*Dediler hediyedir, ey Allah’ı tanıyan*

Suleyman şandiye bo te diyarî	*Süleyman'dır gönderen, senin için armağan*
Ku tu 'ebdê Xwedawendê Xeffar î	*Ki sen kulusun O'nun, Gaffar olan İlahın*
Li ser çavan me danî kir bi carek	*Göz üstüne aldık biz, birlikte deyiverdik*
Ziyade "ehsenellahu tebarek"[52]	*Ki fazlasıyla olsun, "ahsenellahü tebarek"[52]*
Me libas ku nihêrî, dîte sûret	*Ki elbiseye baktık, üstünde gördük suret*
Dilê min jî vexwerî zêde hesret	*Gönlüm de çekti benim, fazlasıyla bir hasret*
Me got eslek heye bo sûretê he	*Dedik acep var mıdır, bu suretin bir aslı*
Bi 'eşqa xwe revayî wê dilê me	*Aldı götürdü bizden, aşkıyla gönlümüzü*
We yan bê esl e xwe ev dil hebandî	*Ya da yoktur bir aslı, bu gönlün sevdiğinin*
Meger neqşek bi zînet neqişandî	*Olur ki olmuş olsun, süslü sade bir nakış*
Bi min got wan ku ew sûret bi esl e	*Onlar dediler bana, vardır aslı suretin*
Xwedancah û meratîb û bi nesl e	*Makam mevki sahibi, hem de saygın bir nesil*
Bizan navê Bedî'ul Ba Cemal e	*Bediülcemal'dir, bil ki adı onun*
Şeha peryan e, bintê Şahibal e"[53]	*Şahibal'ın kızıdır, o periler şahıdır[53]*

[52] "Ehsenellahu tebarek", îfadeyek dûayî ya bi erebî ye. Wate: "Xwedê xweşiktirîn/zêdetirîn mibarek bike."

[53] Nivîskar navê "Şahibal", di hin cihyan de bi awayê "Şehbal" jî nivîsiye.

[52] "Ahsenellahü tebarek", Arapça bir dua ifadesidir. Anlamı, "Allah en güzelliyle/fazlasıyla mübarek kılsın."

[53] Orijinal metinde, "Şahibal" olarak yazılan bu isim, bazı yerlerde "Şehbal" şeklinde de geçmekte. Karışıklığı önlemek için bundan böyle "Şehbal" olarak geçecek.

Kurê Şahê Rûx e, Baxê Îrem da[54]	*Rûh Şahı'nın oğludur, İrem'in bağlarında[54]*
Ji şeklê wî neqqaşan ev reqem da	*Nakışçılar bu şekli, ta oradan aktarmış*
Hediye şandî periyan bo Suleyman	*Periler Süleyman'a, hediye olarak göndermiş*
Suleyman şandî bo te Îbnu Sefwan	*Süleyman da göndermiş, sana ey ibni Safvan*
Di hîna min bihîstin ew îşaret	*Ne zaman ki işittim, onlardan o tarifi*
Me bêhtir kir temenna û keramet	*Fazlasıyla eyledim, saygı ile ikramlar*
Li paşan xwest xatir wan 'ecaib	*Ardından o garipler, benimle vedalaştılar*
Li pêş çahvê me bûn filhal xaib	*Birden kayıp oldular, gözümüzün önünde*
Ne 'arif bûm ku evreng têne ser me	*Bilge değildim ki ben, bunlar gelsin başıma*
Terîqek zêde dijwar kete ber me	*Şimdi çok zorlu bir yol, düştü önüme benim*
Suleyman Îbnu Dawûd çû wefatê	*Davud oğlu Süleyman, vefat etmiş, gitmiştir*
Ku em îro ji ber wî keyn şikatê	*Ki bugün yokluğundan, etmekteyiz şikâyet*

[54] "Baxê Îrem", jîyangeha Qewmê 'Ad e. Bi navê "Mintiqeya/Warê Ehkaf" jî tê naskirin. Tê erêkirin ku yekemîn şûngeha Erebu'l-'Erîbeyan (bapîrên ereban).Di navbera Ûman û Yemenê de, li qeraxê Deryaya Ûmanê cih digire. Cihê bajêr, bi navê "Ubar" tê naskirin. Di zimanê Arkeolojiyê de, jê re "Etlantîsa Qûman" tê gotin. Îrem, bêjeyek Aramî ye. Ji şêniyên wê re (Qewmê 'Ad) Cenabê Hûd hatiye şiyandin. Di Quranê de, ev bajar, bi "Îreme Zatu'l-Îmad" (Bajarê xwedî avahiyên/stûnên bilind) tê wesifandin. Bnr. Sûreya Fecr, a. 7) Bi zeviyên adan, avên xumexum, rez û bexçeyên bêserûber, avahiyên newaze û hwd. bi cûrbecûr dewlemendiyên xwe (bnr. Sûreya Şûera, a. 25-40) navdar e. Sedem ku bi îhtişama xwe bawer kirinin û li jarên xwe zilm kirinin, Xwedê ew bi bayekî dijwar ceza kirinin. Bermahiyên Îremê, piştî kolamdina qûmê ya 12 mêtiren derketiye holê.

[54] "İrem Bağları", Âd kavminin yaşadığı bölge olarak da bilinen "Ahkâf Mıntıkası/Diyarı"dır. Arabu'l-Âribe denilen asıl Arapların ilk yerleştiği bölge kabul edilir. Umman ile Yemen ortasında, Umman Denizi kıyısında "Ubar" olarak adlandırılan bölgede yer alır. Arkeoloji literatüründe, "Kumların Atlantisi" olarak adlandırılır. Aramî dilinde "İrem" olarak da bilinen bu bölge halkına (Âd kavmine) Hz. Hud gönderilmiştir. Kur'an-ı Kerim'de, bu şehir "İreme zatu'l-İmad" (Yüksek bina/sütunlar sahibi şehir; bkz. Fecr Suresi, a. 7) olarak zikredilir. Verimli toprakları, gürüldeyen suları, zengin bağ-bahçeleri, muhteşem binaları vb. zenginlikleriyle (bkz. Şuara Suresi, a. 25-40) tarihlere geçmiştir. İhtişamlarına güvenerek Allah'a isyan ettiklerinden, zayıflara zulmettiklerinden dolayı şiddetli bir rüzgârla helâk edilmişlerdir. İrem kalıntıları, 12 metrelik kum tabakasından sonra ortaya çıkmıştır.

Ji min naête ew karê giranî
Gulistanê Îrem kî pê dizanî

Gücümü aşıyor benim, yapmak o ağır işi
Nerede İrem Bağları, onu kimler bilecek

‘Ecaib mişkil e ew şuxl û kare
Me hêvî û meded Şahê Cebbar e

Fazlasıyla zahmettir, o iş ve de vazife
Ümit ve imdadımız, yalnız Cebbar Allah’tır

Çi xoş zewqe ku bi hêvî bî ‘aşiq
Ji dîdara wisalê yarê sadiq

Ne güzel bir zevktir ki, âşık umutlu olsa
Kavuşmaktan yüzüne, hakiki sevgilinin

Nebit nam û nîşanek qet ji metlûb
Ji nageh bêt mizgînî ji mehbûb”

Talep edilenin olmadan, bir nam ve nişanı
Ansızın geliversin, sevgiliden bir müjde”

Me’elqisse, xudanê Misr û Şaman
Veh şîrîn got, “Gelî aqiltemaman

Sözün özü olarak, Şam’la Mısır’ın sahibi
Dedi tatlı bir dille, “Ey aklı tamam erler

Çi tedbîr e ji halê Şahizade
Ku ew pê bit miferreh dilkuşade!”

Ne tedbiriniz var sizin, Şehzadenin hakkında
Ki ferahlanabilsin, hem de açılsın gönlü”

Bi cem’ gotin, “Qenc e Se’dê mesrûr
Bibit mizgînî bo Şahê mexmûr

Hepsi güzeldir dedi, “İyisi, gitsin mutlu Sad
Götürsün bu müjdeyi, mahmur Şehzade için

Bibêjîtê nîşan û namê dilber
Bi tewfîqa Xwedê dibit miyesser”

Ona desin ismini, hem lakabını dilberin
Olacaktır muvaffak, Allah’ın yardımıyla”

Bi emrê Şah Se'dê dilkuşade — *Şah'ın emri üzere, gönlü açık olan Sad*
Bi mizgîn çû xizmet Şahizade — *Müjdeyle gitti, Şehzadenin hizmetine*

Temenna kir dibûsî 'erdê xizmet — *Saygıyla birlikte Sad, öptü hizmet yerini*
Got, "Ey Şehzade, mizgîn û bişaret — *Dedi ki "Ey Şehzademiz, sana müjde, beşaret*

Got, "Navê wê Bedîa Ba Cemal e — *Dedi, "İsmi Bedülcemal, o dilberin*
Şeha perîyan e, bintê Şahibal e — *Şehbal'in kızıdır o, perilere kadın şah*

Ji neslê Şahê Rûx, Şahê Îrembax — *Ruh Şahı'nın neslinden, İrem Bağı'nın Şahı*
Ji min tehqîq bizan tu saxê ber sax!" — *Kesin bil benden bunu, sağ birine âşıksın"*

Ku Şehzade bihîst ew dilkuşadî — *Kî Şehzade işitti, gönül açan haberi*
Ji hiş çû ew ji zewqan û ji şadî — *Aklı başından gitti, zevkten ve mutluluktan*

Ji hindav rabû ser xwe mest û mexmûr — *Ayağa kalktı birden, mest ve mahmur olarak*
Bi şadî yû bi keyf û zewq û mesrûr — *Mutlu ve keyiflice, hem zevkle, sevinçlice*

Go "Min zen bir ku ew sûret 'edem bî — *Dedi "Ben zannettim ki, olmayan bir surettir*
Weya şeklek ji esrarê qidem bî — *Ya da geçmişten kalma, gizemli bir şekildir*

Me lew gahî girîn û gahî bêheş — *Ondandır bazen ağlar, bazen oluruz bihuş*
Dil û cerg û ceger bûn pirr ji ateş — *Oldular ateşten hep, yürek, ciğer, canımız*

Mi'eyyen bû ku ew sûret bi esl e	*Açığa çıktı ki var, o suretin bir aslı*
Ji eslê şahê peryan û bi nesl e	*Periler şahındandır aslı, nesli, nesebi*
Weya dê bînim û pêra xeberdem	*Ya alıp geleceğim, konuşurum onunla*
Weya sed can di rêya wê bi der dem"	*Ya da onun yolunda, feda olsun yüz canım"*
Li paşan gote, "Ey Se'dê mibarek	*Ardından dedi ki, "Ey kutlu Sadülmülûk*
Divêtin bo me hemam û tedarek"	*Bizler için lazımdır, hamam hem de hazırlık"*
Bi emrê Şahizade gurc û carî	*Şehzadenin emriyle, gürcüler, cariyeler*
Bi cemi' hatin ew mest û xumarî	*Geldiler tam olarak, mest ve sarhoş şekilde*
Birin Şehzade û danîne hemam	*Götürüp bıraktılar, Şehzadeyi hamama*
Gulab anîn û şûştin cimle endam	*Gelip de yıkadılar, gülsuyuyla tamamen*
Libasê Şahî xoş kirne ber da	*Giydirdiler güzelce, Şah'a layık giysiyle*
Dilê wî sed hezar ah û keser da	*İnledi gönlü onun, yüz bin ahla, acıyla*
Bi nerm û şîrînî rabû çû ser text	*Yumuşak ve şirince, gidip tahta oturdu*
Bi ser keyfxweş, di dil da agirek sext	*Yüzü güleçti ama, yüreğinde kor ateş*
Ji sed rengî te'am anîn bi defter	*Getirdiler yüz çeşit, dizi dizi yemekler*
Li paş xwarinê badam û şeker	*Sonrasında yediler, badem ile hem şeker*

Şerab û çeng û tebl û nay û saqî	*Şarapla, çenk, dümbelek, hem ney ile saki*
Ji pêş Şehzade bûn vêkra milaqî	*Kavuştular orada, Şehzade karşısında*
Sedayê ‘aşiqan çû çerxê çaran	*Sedası âşıkların, vardı dördüncü göğe*
Dibarî ab û xûn ez çeşmê yaran	*Gözlerinden dostların, yağıyordu yaş ve kan*
Dinê xweş bû ji dengê wî sedayî	*Güzelleşti dünyası, ahenginden seslerin*
Mixennî da ji çeng û tebl û nayî	*Çaldılar şarkıcılar, çenkle dümbelek, neyi*
Cewab çû Şahê ‘Asim ku sirûr e	*Şah Asım’a ulaştı, bu sevincin haberi*
Ji pêş Şehzade xoş zewq û hizûr e	*Şehzade divanında, eğlenceyle huzur var*
Ji hindav rabû ser xwe ba dilgeş	*Ayağa kalktı birden, gönlü hoşnut olarak*
Digel şoxa Yemanî mahê mehweş	*Ay gibi parıldayan, Yemenli güzeliyle*
Bi hevra hatne bal Mîrê dilawer	*Beraberce geldiler, yiğit Beyin yanına*
Ji dêyna wî kirin ebsarî enwer	*Görmeleriyle onu, aydınlandı gözleri*
Li paşan Şahê ‘Asim xweş diyar kir	*Ardından da Şah Asım, güzelce açıkladı*
Ji etba’ê xwe sed mêr ixtiyar kir	*Kendi halkından seçti, yüz kadar erkek kişi*
Xudan’irfan û ‘alim û hunermend	*Kültürlü bilginlerden, hem de hüner ehlinden*
Be adab û kemal û ‘eql û dilbend	*Edep erkân sahibi, olgun, akil, gönüllü*

“Herin” got, “Cimle etrafan binêrin	*“Gidin” dedi onlara, “Bakının tüm etrafa*
Di ‘alem da evî qissê bigêrin	*Sorun bu hikâyeyi, var mı dünyada izi*
Kesê bîne cewabê Baxê Îrem	*Her kim getirse bana, İrem Bağı’ndan müjde*
Ji wê mizgînê şa ket zemîrem	*O müjdeyle gönlümü, mutlu edecek bilsin*
Didem wî ez devek zêrîn bi zahir	*Vereceğim ben ona, bir deve yükü altın*
Di cewfê da tijî le’l û cewahir	*İçi dolu olacak, lâl taşıyla, cevherle*
Ji xeyrê wî çiqas hûn dixwazin	*Ondan gayrı ne miktar, istiyorsa serbesttir*
Bixwazin hûn xweyî rahê diraz in”	*Varsın istesin benden, yol ve yordam kendinin”*
Bi cimle gotin ey Şahim “Semi’na!”	*Birlikte dediler, “Ey Şahımız ‘işittik’*
Ji vî emrê te ser me qed “ete’na!”[55]	*Deriz biz buyruğuna, ancak ‘itaat ettik’*[55]
Welê mihlet dixwazin em yek sal	*Ancak süre isteriz, bize tanıyın bir yıl*
Ji Şahê ‘alîcah û sahibîqbal	*Siz makamı yüceden, ikbali parlak Şah’tan”*
Riza da yek sene Şahê mibarek	*İzin verdi bir sene, mübarek Şah onlara*
Li paşan cimle kir ‘ezmê tedarek	*Ardından hepsi birden, azmettiler gitmeye*

[55] Şaîr, bi îfadeyên wek “semî’na” (me bihîst) û “ete’na” (me serî tewand)ê, balê dikşîne ser Sûreya Beqere, ayeta 285 e.

[55] Şair, “İşittik” (semi’na) ve “itaat ettik” (eta’na) ifadeleriyle Bakara Suresi, ayet 285’e gönderme yapmış.

Çiqasî wan teleb kir Şahê ‘Asim	*Her ne ki istediler, Şah Asım’ın şahsından*
Bi wan da xoş digel sed kurk û qaqum	*Verdi onlara hoşça, yüz kürkle yüz samuru*
Ku destûr xwest cimle çar etraf	*Ki izin istediler, cümlesi dört bir tarafa*
Bi rê da çûn bi ‘ezm qaf ta qaf	*Yola düştü gittiler, gayretle baştan başa*
Bi çar canib dibêjin çûne ew merd	*Diyorlar ki gittiler, dört bir yana o mertler*
Ji meşriq ta bi mexrib tey kirin ‘erd	*Doğudan ta batıya, aştılar yeryüzünü*
Nihêrîn Çîn û Maçîn û Xoresan	*Vardılar Çin, Maçin’e, baktılar Horasan’a*
Xita û Xeten û milkê libasan[56]	*Hıtâ ile Huten’e, kumaşlar ülkesine[56]*
Ji Tirk û Hind û Sind û milkê Zengî[57]	*Türk ve Hint diyarına, Zengiler ülkesine[57]*
Nihêrîn ta bi Rumî yû Firengî	*Uğradılar Rumlara, Frenklere gittiler*
Mihessel wan nihêrîn cimle etraf	*Özetle aradılar, her tarafa baktılar*
Seraser cemi’ dinya qaf ta qaf	*Yeryüzünün tümüne, bir baştan öte başa*
Nedîn nam û nîşanek qet ji Îrem	*Ne bir nam ne de nişan, bulamadılar İrem’den*
Negot kes ez bi wê pirsê xebîrem	*Sordukları hiç kimse, haberdarım demedi*

[56] Ji bo “Maçîn”, bnr. têbiniya malika 456’an.
“Xoresan”, eyaletek Îranê ye ku li rojhilatê başûr yê welêt cih digire.
“Xita”, “Xeten” heman cih in. Navê herêmek Tirkîstana Rojhilat e. Di wêjeyê de bi xeqan, çol, neqişkar, misk û baca xwe derdikeve pêş.

[57] “Milkê Zengî”, bi îhtimalek mezin, “welatê Zenciyan” e; ango parzemîna Efrîqê ye.

[56] “Maçîn” için bkz. 30. dipnot.
“Horasan”, İran’ın kuzeydoğusunda yer alan bir eyalettir.
“Hıta”, “Huten” aynı yer olup, Doğu Türkistan’da yer alan bölgenin adıdır. Edebiyatta, hakanları, çölü, nakkaşları, miski ve vergisiyle (bac) ön plana çıkar.

[57] “Zengiler ülkesi”, büyük ihtimalle “Zenciler Ülkesi”dir.

Di hîna dozdeh meh wan bûn temame	*Ne zaman ki onlara, tanınan toplam bir yıl*
Vegeryan pêşê Şahê Misr û Şame	*Tamam oldu döndüler, Mısır'la Şam Şahı'na*
Welê j'bintê şehan çarsed bi defter	*Ancak şah kızlarından, listesini dört yüzün*
Cewab anîn ji bo Şahê mizeffer	*Getirdiler beraber, muzaffer Şahlarına*
Hemî şekerdihan û zêde mehbûb	*Hepsi şeker ağızlı, fazlasıyla sevgili*
Perîrû yû semen bû, nazik û xûb	*Peri yüzlü, yasemin, nazik ve de güzeldir*
Misala meş'elê teysan şebê tar	*Meşale gibiydiler, karanlık gecelerin*
Siwadul'eyn û nûrînwech û xumar	*Siyah gözlü, nur yüzlü, hem de mesttiler*
Letîf û dilber û xweş qed û qamet	*Naziktiler, dilberdi, boy poslarıyla güzel*
Ji fitna wan nebûn 'alem bi rahet	*Âlem etmedi rahat, fitnesinden onların*
Cewabê wan bihîst ku 'Asimê Şah	*Duyduğunda onların, haberini Şah Asım*
Got "La hewle wela quwwete îlla billah	*Dedi, "La havle velâ, kuvvete illâ billah*
Me nînin taqet û quwwet Îlahî!	*İlahî, yoktur bizim, takatle kuvvetimiz*
Minewwer key ewî xetê siyahî	*Sen aydınlat İlahî, o karanlık çizgiyi*
Îlahî! Tu minewwer key şebê tarî	*İlahî! Sen aydınlat, karanlık geceleri*
Kerîm û Qadir û Heqqî yû Cebbar î"	*Zira Kerim, Kadir'sin, hem Hak ile Cebbar'sın"*

Li paşan Şeh wereng go ba xitabî,
“Eger Şehzade bibihêtin cewabî

Ardından Şah şöyle seslenerek dedi,
“Gelen cevabı şayet, işitirse Şehzade

Ji nû dê bît sewdadîn û mecnûn
Be ahîn û girîn û derd û mehzûn

Yeniden olacaktır, mecnun, sevda delisi
Ahlarla, ağlamayla, dertlenir, mahzun olur

Neşêtin qet evê sirrê diyar ken
Emanet hûn ji Şehzade sitar ken”

Sakın ola açmayın, bu sırrı asla ona
Emanet olsun size, gizleyin Şehzadeden”

Welê Şehzade herdu çav li rê bû
Dem û sa’et di wê fikr û xemê bû

Ne var ki Şehzadenin, yolda idi gözleri
Her saat ve dakika, o gam ve fikirdeydi

Diborand roj bi roj Şahê yegane
Bi ser xwe rozîgarên aşiqane

Geçirirdi günbegün, o biricik olan Şah
Üzerinden niceler, âşıkça vakitleri

Gehî ba hol û kaşo û geşt û seyran
Gehî rimbazî yû mertal û cewlan

Bazen cirit ve satranç, piknik ve gezintiler
Bazen mızrak atışı, kalkan ve manevralar

Gehî ba reqs û govend û şiyahî
Gehî şetrenc û nerd û goşimahî

Bazen oyun eğlence, halaylar, şahlanmalar
Bazen satranç ve tavla, hem müzikten fasıllar

Gehî saz û mey û fincan û saqî
Gehî çeng û xezelhayê firaqî

Bazen saz ile şarap, fincan ve de sakiler
Bazen çenkten nağmeler, ayrılık gazelleri

Welê Şehzade herroj çav li rê bû	*Ancak her gün Şehzade, gözlüyordu yolları*
Xezelhayê firaqê wî di dil bû	*Ayrılık gazelleri, gönüldendi onun hep*

XEZEL-6

Ey hebîba qelb û rûh î, wey qerara canê ma

Dê çi bîtin carekî ger tu bibî mîhmanê ma

Biye serçavê me ronî menzeret qelbê me bî

Ez xulamê kemterîn bim her tu bî sultanê ma

Sed wekî ‘Îsa w’Eflatûn û Calînosê hekîm

Çareyê derdê me naket bê te ey Loqmanê ma[58]

Qelb û dil mecrûhê ‘eynên eswed û birhên te ne

Nîn e bê cama meyê qet melhem û dermanê ma

[58] Bnr. li Xezela-4., pêncbenda 2. rêzika 9.

GAZEL-6

Ey kalp ve ruhumun sevgilisi, vay canımızın kararı

Ne olur ki bir tek defa, misafir olasın bize

Aydınlat yüzümüz sen, kalbimizin manzarası ol

Değersiz hizmetçin olayım, hep sen ol sultanımız

Yüz İsa ve Eflatun gibisi, hem de hekim Calinus

Bulamaz derdimize çare, sensiz ey Lokman'ımız[58]

Kalp ve yürek yaralıdır, siyah göz ve kaşlarından senin

Yoktur şarap kadehinden gayrı, merhem ve dermanımız

[58] Bkz. Gazel-4, 2. beşlik, 9. satıra.

Tûrê Sîna ya dilê min, daîmen ‘erşê te ye[59]	*Gönlümün Tur-i Sina’sı, daima arşındır senin[59]*
‘Ehdê çil rojê temam kir Mûsayê ‘Îmranê ma[60]	*Tamamladı Kırk günlük ahdini, İmran’ın Musa’sısın bizim[60]*
Çav ji rê da korî bûn Ye’qûbê ez beytulhezen[61]	*Kör oldu gözleri yol gözlemekten, Hüzün Evi’nin Yakub’u[61]*
Qet nema carek xûya bit Yûsifê Ken’anê ma[62]	*Bir daha görünmedi artık, Kenan’ın Yusuf’usun bizim[62]*
Ez esîrê qeyd û bendê zilf û zencîrê te me	*Esiriyim kayıt ve bağlarının, zülüf ve zincirlerinin senin*
Rehm kun tu ba esîran ey mehê tabanê ma	*Merhamet eyle esirlere, ey göğümüzün ayı olan sen*
Qet nema Hudhud xûya bit pêşê Belqîs ez Seba[63]	*Hüthüt görünmüyor artık, Seba’lı Belkıs’ın yönünden[63]*
Pê miferreh bit Suleyman mutmeîn bî canê ma	*Ki ferahlasın Süleyman’ı, canımızın güveni olan sen*

59 “Tûrê Sîna”, çiyayê ku Cenabê Mûsa, ji bo dûakirin û fermangirtina ji Xwedê derdiket ser. Bi navê “Cebelê Mûsa” (Çiyayê Mûsa) jî tê zanîn.

60 İfadeya “‘Ehdê çil roj” ya di derbarê Cenabê Mûsa de, ji ayeta 50. ya Sûreya Beqereyê hatiye wergirtin. Ayet, balê dikşîne vê ayetê, “Bibîrbîne ku me ji bo wergirtina hizûra xwe, ji bo çil rojan ji Mûsa soz girtiye...”

61 “Beytulhezen”; mala Cenabê Yeqûb e ku piştî wendakirina Cenabê Yûsif, keserkêş dibe û ji bo tepisandina keserên xwe vedikşe mala xwe, an holikek keserkêşiyê.

62 “Ken’an”; Ji axên Filitînê yên qedîm re tê gotin ku li rojavayê çemê Ordinê dikeve. Di roja me de, li gel axa İsrayîl, Filistîn û Libnanê, beşên peravî yên Ordin, Misir û Sûriyeyê dihundirîne.

63 “Belqîsa Seba”; Belqis, navê qralîça Sebayê ye. Seba, qraliyetek berya tarîxê ye ku li axên Yemen û Hebeşistanê (Etopya) hatiye avakirin. Belqis, di heyama Cenabê Silêman de jiyaye û hikimdariya Sebayê kiriye.

59 “Tur-i Sina”, Hz. Musa’nın münacat, emir almak üzere çıktığı dağdır. Msır’ın Sina yarımadasında yer alır. Cebel-i Musa (Musa Dağı) olarak da bilinir.

60 Hz. Musa hakkında kullanılan “Kırk günlük ahd” ifadesi, Bakara Suresi’nin 50. ayetine işarettir. O ayette şöyle deniliyor: “Hatırla ki, biz Musa’dan, huzurumuza gelmesine dair, kırk günlük ahit(söz) almıştık...”

61 “Hüzün Evi” (Beytü’l-Hazen”, Yusuf’u kaybetmesinden dolayı, Hz. Yakub’un hüzün yerine dönüşen evine ya da teselli için çekildiği kulübeye verilen isimdir.

62 “Kenan”, Ürdün Nehri’nin batısında kalan Antik Filistin topraklarına verilen isimdir. Günümüzdeki İsrail, Filistin ve Lübnan topraklarıyla Ürdün, Mısır ve Suriye’nin kıyı kesimlerini kapsar.

63 “Sebalı Belkıs”; Seba, mazisi milattan öncesine dayanan ve bugünkü Yemen ve Etiyopya (Habeşistan) topraklarında hükmeden bir krallıktır. Belkıs, Hz. Süleyman zamanında, bu krallığa hükmeden kraliçedir.

Sohtim ez narê firaqê mijdeya weslê nehat — *Yaktı beni ayrılık ateşi, gelmedi kavuşmanın müjdesi*

Ku ji wê şem'ê munîr bit zulmetê eywanê ma — *Ki o mumla aydınlansın, karanlığı köşkümüzün*

Zilf û xalên maherûyan, çok Siyahpoş ettiler — *Ay yüzlülerin zülüf ve benleri, çok Siyahpûş ettiler*

Korkarım ben kara ola çadir û seywanê ma[64] — *Korkarım ben, kara ola, çadırımız, otağımız bizim[64]*

Me'elqisse, wekî salek temam bû — *Sözün özü tam bir yıl, tamam oldu böylece*

Şehê mehrû bi qasidan 'elam bû — *Göründüler elçiler, ay yüzlü Şehzadeye*

Ku qasid hatin û neanîn cewabe — *Ki elçiler gelip de getirmeyince cevap*

Dilê Şehzade bû pirr izdirabe — *Oldu Şehzade gönlü, fazlasıyla mustarip*

Pêsîra xwe qelaştî wî ji hindav — *Yırttı gömleğini o, aniden ve de tümden*

Bilez ta tên ji çahvan qetreyê av — *Ta aktı gözlerinden, hızla yaş damlaları*

Digel ah û girînî, geşte xamûş — *Ahları, ağlaması, dönüştü sessizliğe*

Gehî hişyar bû ew gahî bêhûş — *Bazen aklı başında, bazen giderdi aklı*

Cewab çû Şah 'Asimê xudanbext — *Ulaştı Şah Asım'a, o hoş bahtlıya haber*

Giha Şehzadeyê te haletek sext — *Dediler Şehzadene, zor bir durum bulaşmış*

64 Ev malik, rasterast bi Tirkiya şaîr e. Ev yek dide xuyakirin ku Siyahpoş, bi zimanê tirkî jî dizane.

64 Bu beyitte geçen, "çok Siyahpûş ettiler" ile "Korkarım ben, kara olsun" ifadeleri, şairin kendi Türkçesiyledir.

Ji nû bû dîn û sewdaî yû mecnûn	*Yeni baştan olmuştur, deli, mecnun, sevdalı*
Ji çahvê wî bilez tên qetreyê xûn	*Akıyor kanlı damla, hızlıca gözlerinden*
Şehê ‘Asim ji cî rabû mişewweş	*Yerinden kalktı hemen, müşevveşçe Şah Asım*
Bi te’cîl hate bal pismîrê mehweş	*Hızla geldi yanına, ay yüzlü Şehzadenin*
Go: “Ey sebr û qerar û taqeta min	*Dedi, “Ey sabrım benim, kararım hem takatim*
Heyat û rûh û can û raheta min	*Hayatım ile ruhum, canım ile rahatım*
Şahidellah, nekirye min çu teqsîr	*Şahit olsun ki Allah, işlemedim bir kusur*
‘Elimellah, nizanim ez çu tedbîr	*Allah biliyor ki ben, bilmiyorum bir tedbir*
Ji bo te serf kirî min bê ‘eded mal	*Sarf etmişim uğruna, sayısız miktarda mal*
Me sed qasid virêkir ta yekî sal	*Yüz elçiyi yolladım, ta bir sene boyunca*
Seraser cimleyê dinya kirin teyy	*Baştan başa aştılar, bütün dünyayı onlar*
Nebû hasil ji Baxê Îremî şey	*Bir şey hasıl olmadı, İrem Bağı’ndan yana*
Welê ji bintê şahan çarsed bi itmam	*Ancak dört yüz kadarı, şah kızlarından haber*
Cewab anîn mehrû yû gulendam	*Geldi onlara dair, ay yüzlü, gül boylular*
Hemî tel’et û şîrîn şekerleb	*Tamamı güzel yüzlü, tatlı, şeker dudaklı*
Perîrûy û semen bû sêbê xebxeb	*Kokuları yasemin, peri yüz, elma gerdan*

“We în exterte minhunne hebîben”	*“Şayet seçmek istersen, onlardan bir sevgili”*
Bibî bo min ‘Cewaben ‘en qerîben’[65]	*Vermelisin bir ‘cevap, en kısa bir zamanda’*[65]
Ku ez bînim ji bo te ey rûh û can	*Ki sana getireyim, ey ruhum ve ey canım*
We ger ne tu dizanî ku Suleyman	*Hem sen de biliyorsun, Hazret-i Süleyman da*
Vexwarî şerbetê merg û heyatê	*İçmiştir şerbetini, ölümün ve hayatın*
Zemanek borî ew çûye wefatê	*Belli bir zaman sonra, o da varmış ölüme*
Me taqet nîn e ba cayê Îrembax	*Bizim gücümüz yoktur, İrem Bağı’na gitmek*
Ne kes, pê ‘alim e Heq sax ba sax	*Allah’tan gayrı bilmez, sağlardan bir tek kişi*
Cihê peryan ne me’lûm e, sitar e	*Periler mekânıdır, bilinmiyor, gizlidir*
Ji xem te çûn ji destê min ixtiyare	*Senin gamından beri, gitmiş elimden tercih*
Eger meqsûdê tu genc û cewahir	*Şayet maksadın senin, hazineyle cevherse*
Digel esp û çek û rext û ‘esakir	*Yanında atla silah, hem teçhizat ve asker*
Bi cimle hazir in bo te serefraz	*Tamamı hazırdır bil, senin için şereflim*
Tu çi dixwazî ji mal û milk, bixwaz	*Ne istersen var iste, mal olsun, istersen mülk*
Ku Şehzade bihîst evreng teqrîr	*Ki Şehzade işitti, bu türden söylemleri*
Ji Şahê ‘alîcah wek şeker û şîr	*Makamı yüce Şah’tan, süt, şekerli sözleri*

[65] Di vê malikê de, îfadeyên di nav neynûkê de Erebî nin, “Di nêz de bîne ji min re bersivekê.”

[65] Bu beyitte, tırnak içi ifadeler, şiirin orijinalinde Arapça olarak geçiyor.

Got: “Ey Şahê xiredmendê bi iqbal
Eger neynî ji bo me bintê Şehbal

Yeqîn ez dê hilak bim nîne derman
Ji bo derdê me jî bû ‘Îsa û Loqman!”

Ku Şahê ‘alîcah qewlên bi evreng
Ji Şehzade bihîst qet nekir deng

Serê xwe danî ser dil ma miheyyer
Go, “Ya Rebb! Tu muqedder key müyesser”

Wekî Şehzade dî baba bi evreng
Sebeb wê bû hezîn û mest û dilteng

Got: “Ey Şahê xudaniqbal û şewket
Dilet mesrûrî bit ez nûrê rehmet

Qezayê Rebbî ye evreng û ev hal
Dilê min sohtî şem’ê bintê Şehbal

Dizanim tu ji bo me renc û mihnet
Gelek dîn û vexwarî zêde hesret

Vardı dedi, “Ey Şahım, ey akil ve ikbal ehli
Şayet sen getirmezsen, bana Şehbal kızını

Kesin yok olacağım, bil ki yoktur ilacım
Derdimiz için bizim, ilaç İsa, Lokman’dır

Ki makamı yüce Şah, bu türden konuşmayı
İşitti Şehzadeden, sustu, açmadı ağzını

Başını yüreğine, yasladı durdu şaşkın
Dedi “Ey Rabbim benim, sen kavuştur takdire”

Şehzade ki bu tarzda, görünce babasını
Bu nedenden üzüldü, mest ve gönlü daraldı

Dedi ki, “Şahım benim, ey ikbal, görkem ehli
Mutlu olsun gönlünüz, rahmetin nurlarıyla

İlahî bir kazadır, bu durum, bu vaziyet
Yüreğimi yakmıştır, Şehbal kızının mumu

Çekmektesin bilirim, zahmetimi, tasamı
Çok çektin, çok yuttun sen, fazlaca hasretleri

Ne ku ji tedbîr û teqsîrê te bû ew	*Bunlar olmadı senin, tedbir ve kusurundan*
Welê ne ji teyr û nêçîrê te bû ew	*Değildi onlar senin, şahininden, avından*
Nehat destê te ew Tawûsê meqsûd	*Konmadı elinize, arzulanan o Tavus*
We ger ne dê te yê bianyaye mewcûd	*Ve olmazsa bilirim, onu sen getirirsin*
We ger Şeh ku riza det çend xeberdan	*Olsa Şah'ın rızası, birkaç sözüm var benim*
Hebin bo me bibêm ez 'eşq û derdan!"	*Lazımdır demeliyim, aşk ve derdin halinden"*
Şehê 'Asim got: "Ey cana bibêje	*Şah Asım dedi söyle, "Ey canım benim söyle*
Ewan le'l û cewahiran birêje	*Döktürüver onları, lâlleri, cevherleri*
Dixwazim ku ji ewwel min helal key	*İsterim ki önceden, helal edesin beni*
Ji dil me sparê Şahê Zulcelal key	*Gönülden emanet et, Celal sahibi Şah'a*
Bi iznê te li paşan çîne xurbet	*Senin izninden sonra, isterim ki gurbete*
Bibînim 'eczê rah û renc û mihnet	*Gideyim de göreyim, yolun zahmet, zorunu*
Eger min dît ew dildarê mehbûb	*Şayet gördümse onu, sevgilisi gönlümün*
Weya nam û nîşanek qenc û hem xûb	*Ya da bir namla nişan, güzel ve de hayırlı*
We ger ne dê bibînim germ û serdê	*Yok göremedimse eğer, çekeyim sıcak, soğuk*
Bela û mihnet û renc ji 'erdê	*Yerin zahmet, zorunu, hem çekeyim eziyet*

Dê sar bîtin ji bo min ew şîrîn mah
Bi şadî yû fereh dê bême pêş Şah”

O vakit soğuyacak, gözümde o şirin ay
Mutlu ve ferah ile, döneceğim Şahıma”

Şehê ‘Asim got: “Ey dilbend û rahet
Çi rengî dil bidem tu herye xurbet

Şah Asım dedi ona, “Ey bir tanem, rahatım
Nasıl el verir gönlüm, gurbete gidişine

Nedarem taqetê barê firaqê
Xemê tu wû belayê iştiyaqê”

Takatim kaldıramaz, ayrılığın yükünü
Hem de gamını senin, özlemin belasını”

Cewab da Şahizade, “Ey Şehinşah!
Nikaret kes betal ket hukmê Ellah

Şehzade cevap verdi, dedi, “Ey şahlar şahı
Hükmünü Rabbimizin, kimse iptal edemez

Bi her rengê hebit dê bidey tu destûr
Ku ez herim binêrim nêzîk û dûr

Her ne şekilde olsa, vermelisin izin sen
Ki gidip bakayım ben, uzak, yakın yerlere

Temaşe kem li mewc û pêlên derya
Bikem pirsî ji ehlê Çîn û Xûta

İzlemeliyim ben, deniz dalgalarını
Soruvermeliyim ben, Çin ve Hıtâ halkına

Dê ya hasil bibîtin bo me weslet
Weya sar bit dilêm ez renc û mihbet

Ya hasıl olacaktır bize, kavuşmak sevgiliye
Ya da soğuyacak gönlüm, bu zahmet, eziyetten

We ger carek bibînim germ û serdan
Mi’eyyen dê helak bim ez li ‘erdan”

Ve şayet görsem bir kez, sıcağı ve soğuğu
Kesindir yok olurum, yerlerde, diyarlarda”

Wekî evrengî dî ‘eşqê wî dijwar	*Gördüğünde bu tarzda, onun yaman aşkını*
Şehê ‘alî riza dayê bi naçar	*Büyük Şah çaresizce, ona rıza gösterdi*
Wekî Seyfulmilûkê hûş ê mexmûr	*Böylece Seyfülmülûk, ki akıllı, mahmurdur*
Ji şah û begleran xoş xwest destûr	*Şahlardan ve beylerden, istedi hoşça düstur*
Digel Se’dulmilûk dan ber bi keştî	*Yöneldiler gemiye, yiğit Sadülmülûk’le*
Melaîkrengî çûn qesrê bihiştî	*Cennet kasrından çıkmış, melek misaliydiler*
Kewakib ba Suha çav dane kewkeb[66]	*Yıldızlar Süha ile, göz koydular yıldıza[66]*
Cirandin keştîha ra ber bi metleb	*Yürüttüler gemiyi, talepleri yönüne*
Di hîna keştî ceryan Îbnu Sefwan	*Gemi akıp gidince, izleyen İbn-i Safvan*
Ji dil kir nale û zarî yû efxan	*İnledi ta yürekten, etti feryat ve figan*
Ji camê firqetê Şeh keftî serxoş	*Ayrılık şarabıyla Şah, kapıldı sarhoşluğa*
Digel ah û girîn û guft û xamûş	*Ahlar ve ağlamayla, söylenir hem susardı*
Digel Salih we Poşîn Îbnu Ham e	*Salih ile birlikte, İbni Ham’ın Poşin’i*
Hilanîn wê demê Şahê ‘elam e	*Götürdüler oradan, alim ve bilge Şah’ı*
Digel şoxa Yemanî hate qesrê	*Geldi sarayına Şah, Yemenli güzelliyle*
Bi cimle cem’ hatin ber bi şehrê	*Cümlesi de geldiler, şehre doğru akarak*

[66] “Suha”, stêrka piçûktir ya komstêrka Hirça Mezin e. (Di mêj de, bînahiya çavan, bi vê stêrkê dihat ceribandin).

[66] “Süha”; Büyükayı yıldız kümesindeki en küçük yıldızdır. (Eskiden gözün keskinliği bu yıldızla denenirdi).

Di hucrek xasî da danîn Şehinşah
Ku hişyar bû ji bê hûşî dikir ah

Şahlar Şah'ını özel, odaya bıraktılar
Ki uyandığında o, ah derdi şaşkınlıktan

Gelo Şehzadeyê min bir bi kuda
Dibên çû û ji halê wî çi rû da

Acep nereye doğru, gitti benim şehzadem
Diyorlar ki gitti o, neler geldi başına

Dilê min sohtî narê iştîyaqê
Dibêjim lew ji dil qewlên firaqê

Yandırdı yüreğimi, iştiyakın ateşi
Ondan ki diyorum, ayrılık sözlerini

XEZEL-7

Bê şekîb im dil ji destê iştiyaq
Can bi derdem lew li min tal e mezaq
Ah û efxan serwîqedem kuşt bi taq
Elfîraq û elfîraq û elfîraq

Çav li rê me daîmen leyl û nehar
Da bibînim carekî an şehsiwar
Dilbidax im, bêqerar im, bêqerar
Elfîraq û elfîraq û elfîraq

Xûziya roja ku min xoş bî dîmax
Bêtî bayek wesletê zan werdê bax
Can bi der dem, sîne serdem suxtê dax

Elfîraq û elfîraq û elfîraq

GAZEL-7

Tahammülüm kalmadı gönül, iştiyakın elinden
Canım çıkmak üzere, ondan acıdır zevkim
Ahlar ve feryatlar, öldürdü kaşlarıyla servi boylu
Elveda, elveda, elveda

Yollardadır gözlerim, sürekli gece gündüz
Bir kez görseydim ben, şu süvariler şahını
Yüreğim dağlıdır, kararsızım, kararsız
Elveda, elveda, elveda

Keşki o gün ki kafam hoş haldedir
Geliverse kavuşmanın rüzgârı, bahçesinden güllerin
Canımı vereyim ben, göğsümü gereyim tahammülsüz dağlara

Elveda, elveda, elveda

Şibhê Mecnûn mam ji Leylayê xerîb	*Mecnun misali kaldım, ben Leyla'dan yabancı*
Çareyê derdê me naket çu tebîb	*Bulamaz derdimize çare, hekimlerden hiçbiri*
Çûn ji destê min taqet û sebr û şekîb	*Çıktı elimden benim, güç, sabır ve de direnç*
Elfîraq û elfîraq û elfîraq	*Elveda, elveda, elveda*
Ey hewar e çû bi ku ve serfiraz	*Medet diliyorum, hangi tarafa gitti ulu Şehzadem*
Ê ku qelbê me guvaştî şibhê gaz	*Sıktı yüreğimizi o, tıpkı mengene misali*
Dil ji derdan wî dinalî şibhê saz	*Gönlümüz derdinden onun, inlemekte saz gibi*
Elfîraq û elfîraq û elfîraq	*Elveda, elveda, elveda*
Min ji dil tên nale û zarên 'ecîb	*Yüreğimden gelmektedir benim, acayip inlemeyle ağlamalar*
Ji iştiyaq û şewqê, an yarê xerîb	*Arzusundan, eğiliminden, şu yabancı sevgilinin*
Çav li rê me daîma her roj keîb	*Daim gözlemekteyim yolunu, her gün kasvetli olarak*
Elfîraq û elfîraq û elfîraq	*Elveda, elveda, elveda*
Camê 'eşqê ez kirim mest û xerab	*Aşk şarabı eyledi beni, mest ve harap olarak*
Lew Siyahpoş bûme manendê xurab	*Ondandır ki olmuşum Siyahpûş, tıpkı kuzgun misali*
Kel-'iqab im, xoşribab im, dilkebab	*Azap çekenim ben, hoş rübabım ben, yüreği kebabım ben*
Elfîraq û elfîraq û elfîraq	*Elveda, elveda, elveda*

Li ser ta pê libasê xwe siyah kir	*Büründü karalara, baştan ayağa kadar*
Ûmîda xwe bi dergahê Îlah kir	*Bağladı umudunu, Allah'ın dergâhına*
Ji xeyrê Heqq birrî ûmîdê qet'î	*Haktan gayrıdan kesti, katiyen umudunu*
Şehê 'Asim ji mal û milk û cem'î	*Maldan, mülkten, tamamen, Şah Asım bildi bunu*
Çiqas ehlê biladê Şahê medhûş	*Ülkesinde kim varsa, şaşkın Şah'ın halkından*
Li ser ta pê bi cemi' bûn siyahpoş	*Siyaha büründüler, baştan ayağa kadar*
Ji huznê pûrê Şah Îbnu Sefwan	*Kederinden oğlunun, İbni Safvan Şah'ın*
Di Misrê da nebû yek leb bi xendan	*Kalmadı Mısır'da hiç, gülümseyen bir dudak*
Çiqasî begler û mîr û wezîra	*Ne kadar bey var ise, hem de paşa, vezirler*
Digotin qewlê "Welyebku kesîra"[67]	*Okurlardı birlikte, "Ve'l-yebku kesîra"yı*[67]
Ji vê dinyaya dûn qenc e bişom dest	*Bu aşağılık dünyadan, iyisi el çekeyim*
Ji camê mihbetê bim serxoş û mest	*Sevgi şarabıyla ben, olayım sarhoşla mest*
Were saqî, werîn camê tijî mey	*Getiriver ey saki, şarap dolu kadehi*
Ji wê meyê ku emwat pê dibin hey	*O şaraptan olsun ki, diriltir ölüleri*
Ji min ra bîne da ku ez binoşim	*Getir bana ondan, ta ki içeyim onu*
Zemîr û qelbê purzewq û xuroş im	*İçimle, gönlümle ben, çok zevkli ve coşkunum*

[67] "Welyebku kesîra", hevokek ji ayeta 82. ya Sûreya Tewbeyê ye. Meal: "Û bila pir bigirîn..."

[67] "Ve'l-yebkü kesîra"; Tevbe Suresi, ayet 82'den alınma bir cümledir. Meali: "Ve çok ağlasınlar..."

Tu wer mitrib bi saz û naxme û ney	*Sen de gel ey çalgıcı, sazla, sözle, neyinle*
Bireqsîne qelbê me ba mey bûyê mey	*Oynat sen gönlümüzü, şarapla, kokusuyla*
Bi zayi' da biçît ew 'umrê baqî	*Fani olan ömrümüz, varsın bakiye gitsin*
Nebim xalî ji fikrê tu û saqî	*Düşüncem boş kalmasın, senden ve de sakiden*
Çi xoş bêhn e ji qewlê 'arifan tê	*Ne hoş kokudur gelir, ariflerin sözünden*
Sedayek xoş ji sewtê 'aşiqan tê	*Hoş sedalar yükselir, âşıkların sesinden*
Hedîsê can e eqwalê Şerî'et	*Can vericidir bil, şeriatın sözleri*
Terîqet fi'l û ehwalê heqîqet	*Tarikatın işleri, hakikatin halleri*
Şerî'et ra bi keştî tu binase	*Şeriat ki gemidir, tanımaya çalış sen*
Bina ken keştiyê mihkem esas e	*Sağlam yapmak gemiyi, unutma ki esastır*
Terîqet behr û deryayê mezin tê	*Tarikat bir denizdir, öyle bilinir ancak*
Heqîqet durrê 'ilmê "mîn ledûn" tê[68]	*İncisidir hakikat, ledün ilminden gelir[68]*
Eger çêkî tu wê tertîb û sazî	*Şayet yaparsan eğer, o tertip ve düzeni*
Heqîqet dê bibînî tu j'mecazî	*Göreceksin o zaman, mecazdan hakikati*

[68] "İlmê min ledün"; jêderka vê îfadeyê Quran e. Di Sûreya Kehfê, ayeta 65'an de îfadeya "Ledunna 'ilmen" îşaretê vî ilmê dike. Tefsîrkar, di tefsîra vê ayetê de, zanayê vî ilmî "Xizir" didin nîşandan û herwiha dibêjin ev ilm, ji wî re hatiye bexşkirin. Ev ilm, ji dervê wahiy û îlhamê ye; bi gîştî ilmekî taybet û dayîna Xwedê ye. Bi gotinek din, bi rêya xebatê nayê bidestxistin. Xwedê kê bixwaze, dide wî. Jê re "ilmê batin" jî tê gotin.

[68] "Ledün ilmi"; Kur'an kaynaklı bir ifadedir. Kehf Suresi, ayet 65'de, "Ledünna 'ilmen" ifadesi, buna işarettir. Tefsirciler, ayette belirtilen "kullarımızdan biri" denilen kişinin "Hızır" olduğunu; kendisine "ledün ilminin" verildiği kişinin de kendisi olduğunu söylerler. Bu ilim, Vahiy ve ilhamın dışında, özel bir ilim olup tamamen Allah vergisidir; çalışmakla kazanılmaz. Allah, bu ilmi "veli" denilen dostlarına verir. "Batın ilmi" olarak da bilinir.

We ger ne dê bimînî tu kerr û kor
Yok eğer olmazsa şayet, kalacaksın kör, sağır

Di nav derd û bela û mihnetên zor
Dert ve bela içinde, hem ağır zahmetlerde

Me'elqisse, di hîna keştîbanan
Sözün kısası böyle, ne vakit gemiciler

Kişandin keştîha ra nexmexwanan
Çektiler gemilerini, şarkılar eşliğinde

Kirin zewq û sirûr û keyf û aheng
Daldılar zevk, sevince, keyifle eğlenceye

Digel saz û ney û tenbûr û hem çeng
Saz ile hem ney ile, tambur ile, çenk ile

Gehî dixwarin kebab û şîr û şeker
Bazen yerlerdi kebap, hem süt ile şekeri

Gehî badam û incîrên şekerwer
Bazen de yerdi badem, hem şeker misal inciri

Gehî camê mey û tiryak û hem benc[69]
Bazen içerlerdi mey, bezen tiryak ile beng[69]

Gehî meşxûl bi le'b û nerd û şetrenc
Bazen olurlar meşgul, oyun, tavla, satrançla

Gehî şirînzebanên sînesade
Bazen tatlı dilliler, göğsü sade dilberler

Qissebêj bûn miqabil Şahizade
Şehzade karşısında, anlatır hikâyeler

Bihurand Şahizade sibh û şame
Geçerdi sabah akşam, Şehzadenin üstünde

Ji qewlê rawiyan çil roj temame
Rivayetçiler derler, tamamı kırk gün oldu

[69] "Benc", ji bêjeya "Beng"ê hatiye erebîkirini Bi awayekî benk, ban û benek jî navên vî gihayî henin. Toximên vî gihayî, di tevizandin û kêfdanê de tê bikaranîn.

[69] Beng, ban otu olarak da bilinir. Tohumu afyon gibi uyuşturucu ve keyif verme özelliğindedir.

Li paşan dîn biderket şehrê Çînî	*Sonra göründü birden, onlara Çin ülkesi*
Ku nêzîk bûn ji wî ‘erd û zemînî	*Ki yaklaştılar onlar, oranın zeminine*
Cewab çû şahê Çînî nam e Fexfûr	*Fağfur’a gitti haber ki Şahı’ydı o Çin’in*
Îlahî dewletê Tu badî me’mûr	*Allah’ım devletini, mamur ve ümran eyle*
Bi derket ‘eskerek zêde ji behrê	*Çıktılar hep denizden, fazlasıyla askerler*
Bi lez tên ew ji canib şehrê Misrê	*Geliyorlar hızlıca, Mısır’ın tarafından*
Bihîst ewreng xaqanê hunerwer	*Bu şekilde duyunca, hüner sahibi hakan*
Emir kir cemi’ bûn bê hedd ‘esker	*Emretti toplansınlar, sayısızca askerler*
Bi nermî ber bi wan hat ew miqabil	*Geldiler usulünce, karşısına onların*
Bi qasidî hinart çend merdê aqil	*Elçilik için gönderdi, birkaç akil adamı*
Biken pirsê ku dost in ya ne dijmen	*Sorsunlar diye, dost mudur, düşman mıdırlar*
Ji xelqê Misrê ew yan xelqê Eymen	*Mısır halkından mıdır, yoksa Yemenli midirler*
Dibên rabûn û çûn qasid bi te’cîl	*Derler ki aceleyle, varıp gitti elçiler*
Ji xelqê Misrê kir meqsûd tehsîl	*Maksadını bildiler, gelen Mısır halkının*
Li paşan çûne pêşî Şahê mestan	*Sonra varıp gittiler, mestler Şahı önüne*
Miqabil dest li ser destan vewestan	*El el üstüne koyup, karşısında durdular*

Bi nerm û şîrînî wek şekir û şîr	*Usulünce, şirince, tıpkı süt, şeker gibi*
Çu tûtî bûn şekerxa ew bi teqrîr	*Tutiler gibi dedi, şekerli dilleriyle*
Dû'a kir wan ji Şeh ra bext û tali'	*Onlar eyledi dua, baht ve şans için Şah'a*
Diger ya Reb neçît rencê te zayi'	*Ya Rab diyerek hem, kâr kalsın zahmetiniz*
"Bi qasidî hinarîn em Şehê Çîn	*Dediler, "Biz elçiyiz, Çin'in Şahı gönderdi*
Ji Şehzade bikeyn meqsûdê te'yîn	*Ta ki öğrenelim biz, Şehzade maksadını*
Ji hatin te çi meqsûd û mûrad e	*Murat, maksadın nedir, gelişinden gaye ne*
Mi'eyyen tu bibêj ey sînesade	*Söylemelisin kesin, ey yüreği tertemiz*
Ne karê Çîniyan e cengê dişmen	*Çinlilerin değildir, işi düşmanla savaş*
Xusûsen Şahê Misr û ehlê Eymen	*Hele Mısır Şahı'yla, bir de Yemen ehliyle*
Diger herçî hebîtin bo te meqsûd	*Varsa başka maksadın, her ne olursa olsun*
Bibêj xaqanê Çîn dê katê mewcûd"	*Söyleyiver bizlere, Çin Hanı eder temin"*
Wekî evrengê teqrîrê bi dilxwaz	*Bu tarzdaki sözleri, gönülden içtenlikle*
Ji qasidan bihîst Şahê serefraz	*Dinledi elçilerden, şanı yüce Şehzade*
Bi wan re zêde kir i'zaz û îkram	*Çokça etti onlara, izzet ile hem ikram*
Ji î'ta û kerem dayîn û în'am	*Kerem ve bağışından, verdi nimet, ihsanlar*

Xerq bûn ew di deryayê ‘etayê	*Boğuldular elçiler, denizinde bağışın*
‘Ecêb mabûn ji wê cûd û sexayê	*Kalmıştılar hayrette, o cömertlik, lütuftan*
Li paşan Şahizade xweş ‘eyan kir	*Ardından açıkladı, Şehzade elçilere*
Meger şemek ji halê xwe beyan kir	*Durumundan mecburen, bahsetti birazını*
Ji bo qasidî şahê Çînê Fexfûr	*Elçiliğe gelenler, Çin’in Şahı Fağfur’un*
Mueddeb rabûn cimle xwestin destûr	*Kalktılar hep edeple, istediler düsturu*
Vegeryan pêşê şahê Çîn û Maçîn	*Dönüp gittiler hepsi, Çin ve Maçin Şahına*
Bi ew zêde kirin wan medhê tehsîn	*Fazlasıyla sundular, ona övgü, takdirler*
Dilê xaqanê Çîn bû pirr kuşade	*Fazlasıyla hoş oldu, gönlü Çin Hakanının*
Bi şadî hat miqabil Şahizade	*Gelip de Şehzadeyi, karşıladı mutluca*
Wekî Şehzade dît hat şahê Çînî	*Şehzade gördüğünde, gelmektedir Çin Şahı*
Ji ‘eqlê wî didan sed aferînî	*Anlayışından ötürü, yüzler aferin dedi*
Digel Se’dulmilûkê mest û mexmûr	*Alıp Sadülmülûk’ü, ki mest ile mahmurdur*
Bi nermî çûne pêş Şahê Fexfûr	*Gittiler usulünce, Fağfur Şah’ın önüne*
Bi şîranî û ikram û bi i’zaz	*Tatlılıkla birlikte, izzet ve ikramlarla*
Hilanîn dest bi dest şahê serefraz	*Kaldırdılar el ele, şanı yüce hakanı*

Li ser textek zêrîn danîn miresse’	*Oturttular bir tahta, altınlarla donanmış*
Ji elmas û cewahiran milemme’	*Parlayıp durmaktadır, elmas ile cevherden*
Bi emrê Şahizade xemr û saqî	*Şehzadenin emriyle, içkiler ve sakiler*
Digel çeng û ribab bûn milaqî	*Çenk ile rübap ile, bir araya geldiler*
Kirin zewq û sirûr û keyf û xoşî	*Zevklenip sevindiler, hem keyifle hoş vakit*
Digel awazê ney tenbûrxuroşî	*Sesiyle nağmesiyle, neyle tambur coştular*
Hetta pênc roj temam bûn Şahê mexmûr	*Mahmur düşmüş Şehzade, beş gün doluncaya dek*
Neda destûr Şahê Çînê Fexfûr	*İzin vermedi gitmesine, Çin hakanı Fağfur’un*
Bi şadî û bi i’zaz û bi ikram	*Mutlulukla saygıyla, hem de ikramlar ile*
Bihartin pênc roj ez sibh û ta şam	*Geçirdiler beş günü, sabahtan akşama dek*
Dibêjin ew qeder ikram û i’zaz	*Derler izzet ikramda, o kadar bulundu ki*
Digel Fexfûr kir serwê serefraz	*Fağfur ile birlikte, o şanı yüce servi*
Ku ehlê Çîn û Maçîn bûn miheyyer	*Ki Çin ve Maçin halkı, hayretlere gömüldü*
Ji wê cûd û sexayê mîrê dilber	*O gönül vermiş beyin, cömertçe keremine*
Li paşan şahê Çînê nerm û şîrîn,	*Arkasında Çin Şahı, yumuşakça, tatlıca,*
“Ela ey şahibazê bircê tehsîn	*“Ey güzellik burcunun, yiğidi sen bilesin*

Dixwazim ku tu jî mîhmanê min bî	*İsterim ki sen dahi, olasın misafirim*
Çira û meş'ela eywanê min bî	*Olasın sarayımın, lambası, meşalesi*
Çiqasî bêt ji me i'zaz û îkram	*Bizden geldiği kadar, izzet ile ikram*
Bikeyn em bo te ey serwê gulendam	*Ey gül boylu servi, edelim senin için*
Diger em gazî ken cimle neqqaşan	*Yetmez, çağıralım biz, bütün nakışçıları*
Ji sûretçêkeran em ken temaşan	*İzleyelim birlikte, suret çizenleri hem*
Bipirsin em ji wan cayê Îrembax	*Soralım biz onlardan, İrem Bağı'nın yerini*
Dibîtin ew bibêjin saxî ba sax"	*Mümkündür söylesinler, canlı canlı olarak"*
Ku ew şîrînmeqalê Şahê Fexfûr	*Şah Fağfur'un dediği, şirin, tatlı sözleri*
Bihîstin şahibazê mest û mexmûr	*Duyunca mert Şehzade, mest ve mahmur olarak*
Riza da û çeleng rabûn digel Şah	*Razı oldu güzelce, hakan ile gitmeye*
Digel Se'dulmilûkê mîrê hemrah	*Hem yoldaşı beyle, yani Sadülmülûk'le*
Bi cimle hatin ew eywanê xaqan	*Geldiler hep topluca, hakanın sarayına*
Ji şekl û sûretan qelbê 'uşşaqan	*Şekil ve suretlerden, âşıkların gönülleri*
Dinalîn şibhê goyîn û keboter	*İnlerdi üveyikler, hem güvercinler misali*
Ku ferş û taq û eywan dîn misewwer	*Köşkün tavan, kemeri, gördüler ki hep suret*

Ji bo Şehzade danîn textekî zer	*Şehzadeye altından, bir tahtı bıraktılar*
Tijî elmas û durr û le'l û gewher	*Her tarafı elmastan, inci, lâlden, cevherden*
Çû ser textê miresse' Şahê mehcûr	*Çıktı süslü tahtına, sevgiliden uzak Şah*
Miqabil padişahê Çînê Fexfûr	*Oturdu karşısına, Çin hakanı Fağfur'un*
Ku rûniştin miqabil yek beraber	*Oturdular ikisi, karşılıklı, beraber*
Vewestan dest li ser dest mîr û begler	*Eller eller üstünde, ayakta paşa, beyler*
Bi emrê şahê Çîn fincan û saqî	*Çin Şahı'nın emriyle, fincanlar ve sakiler*
Li dîwanê bi hev ra bûn milaqî	*Geldiler bir araya, divanda dizildiler*
Gerandin saqiyan fincan û şûşe	*Gezdirdiler sakiler, sürahi, fincanları*
Dilê mestan bû pirr zewq û xuroşe	*Gönlü mest olanları, saldı zevk ve coşkuya*
Bikar êxist mitrib têlê tenbûr	*Dokundu çalgıcılar, tamburların teline*
Fîxan kir saz û çeng û nay û sentûr	*Başladılar feryada, sazla çenk, neyle santur*
Sedayê 'aşiqan çû çerxê heşte	*Vardı uşşak sedası, ta sekizinci göğe*
Dinalîn xweş li ber sûretferişte	*İnliyorlardı güzel, melek süratlilerden*
Heta pênc roj temam bûn Şahê Fexfûr	*Tam beş gün boyunca, Çin'in hakanı Fağfur*
Sirûr û keyf kir ba şahê mehcûr	*Keyif, eğlence yaptı, yârinden uzak Şah'la*

Gehî ba mûsîqa û rûdê şahî	*Bazen musiki ile, şahane kemençeyle*
Gehî şaleng û berbet, goşimahî	*Bazen halay ve cirit, çevgen ile beraber*
Ku bûn pênc roj Şehzade bi itmam	*Ki beş gün süresince, eksiksiz Şehzadeye*
Şahê Çîn kir ji wî ra zêde ikram	*Çin Şahı yapwerdi, ona izzet ve ikram*
Ji enwa'ê nefaisêd 'ecaib	*Güzel, nefis şeylerden, birçok kıymetli malı*
Meta'e Çîn û Maçînê d'xeraib	*Çin ve Maçin'e mahsus, ilginç, garip metayı*
Li paşan çûn biken vêkra temaşan	*Ardından beraberce, gittiler izlemeye*
Ji sûretçêker û cem'ê neqqaşan	*Hem suret çizenleri hem de bütün nakkaşı*
Wekî Şehzade çû dîn sûret û neqş	*Gördüğünde Şehzade, suretle nakışları*
Zêr û sîm û cewahir kir bi wan bexş	*Bağışladı onlara, altın, gümüş ve cevher*
Çiqas pirsî ji sûretçêkerên kal	*Her ne kadar sorduysa, ihtiyar ressamlara*
Ji Baxê Îremî yû Bintê Şehbal	*İrem'in Bağlarından, hem de Şehbal kızından*
Nedayê kes cewabek xoş û kafî	*Vermedi biri cevap, güzel, kâfi olarak*
Ji bo derdê dilê Şehzade şafî	*Olamadılar şifa, gönlüne Şehzade'nin*
Welê gotin ji bo Şehzadeyê mîr	*Ancak şunu dediler, Bey Şehzade'ye onlar*
Filan cayî heye dihqaniyek pîr	*Filan yerde bulunur, yaşlılardan bir çiftçi*

Ze'îf û zer bûye şibhê hilalî	*Zayıftır, sararmıştır, olmuş hilal misali*
Meger ew det cewaba vê sûalî	*Verse ancak o verir, bu suale bir cevap*
Dibên Şehzade û Fexfûrê xaqan	*Derler ki Şehzade'yle, Çin hakanı Fağfur*
Bi te'cîl çûne nik ew pîrê Dehqan	*Aceleyle gittiler, yaşlı çiftçi yanına*
Kirin pirs û sûal ez merdumê kal	*Sual ettiler ondan, yaşlı olan adama*
Ji Baxê Îremî yû Bintê Şehbal	*İrem Bağı'na dair, hem de Şehbal kızından*
'Ecêb ma pîr ji pirsêd xeraib	*Hayrette kaldı yaşlı, bu garip sorulardan*
Verengî got, "Me dîne pirr 'ecaib	*Bu tarzda dedi ki o, "Görmüşüz çok acayip*
Ji seyyahê ku ez geryam di şehran	*Gezdiğim şehirlerden, oralı seyyahlardan*
Çiya û deşt û çol û berr û behran	*Dağlardan, ovalardan, çöl, kara, denizlerden*
Sed û heştad sal 'umrêm resîde	*Ömrüm ulaşmıştır tam, yüz seksen senesine*
Ne min dîn ew ne goş ez kes şûnîde	*Ne kendim görmüşümdür ne işittim kimseden*
Ji wan pirs û sûalan ez 'ecîb im	*Bu soru ve sözlerden, hayrette kalmışım ben*
Ji Baxê Îrem û Şehbal xerîb im	*Yabancıyım Şehbal'in, hem de İrem Bağının*
Welê mimkîn e der Qostantiniye[70]	*Belki mümkündür ancak, ola ki Konstantin'de[70]*
Tu bibhî wê cewabê pirr beliye"	*Bulasın cevabını, şu çok bela sualin"*

[70] "Qonstantîn", bajarekî Cezayîrê ye ku li bakurê rojhilatê welêt e. Navê Stenbolê yê kevin jî "Qostantînopolis" e. Bi telaffûza erebî, "el-Qonstantîniyye" ye. Di heman wextê de, yekemîn hukimdar û avakarê dewleta Romayê ye. Mebest ji Qonstantiya destanê, divê Stenbol be.

[70] "Konstantin", Cezayir'in kuzeydoğusunda bir şehirdir. Ayrıca İstanbul'un eski adı, "Konstantinopolis"tir. Arapça telaffuzu "el-Kostantiniyye"dir. Konstantin, ayrıca Roma devletinin ilk kurucusu ve ilk imparatorunun (I. Konstantin) adıdır. Destanda bahsi geçen Konstantin, İstanbul olmalıdır.

Ku evreng bihîst Şehzadeyê mîr	*Ki işittiğinde bu tarz, Bey Şehzade sözleri*
Ji wî kalê ketî, Dehqaniyê pîr	*Kocamış ihtiyardan, düşmüş olan çiftçiden*
Li nik rabû û xoş ‘ezmê sefer kir	*Kalktı yanından güzel, azmetti yolculuğa*
Ji şahê Çîniyan destûr teleb kir	*Çin Şahı’ndan istedi, derhal desturunu o*
Hezîn û dilbixem hat ber bi keştî	*Hazin, gamlı yürekle, geldi gemiye doğru*
Melaikrengî çû qesrê bihiştî	*Sanki melek şeklinde, gitti cennet köşküne*
Xemê ‘eşqê ‘ecêb zewq û sefa ye	*Acayiptir aşk gamı, zevkten, sefadan yana*
Eger çi zahirî derd û bela ye	*Her ne kadar zahirde, olsa da dert ve bela*
Were saqî werîn camê sefayê	*Gel ey saki, getir sefa camını*
Ku ez mest bim ji wî derd û belayê	*Ki geçeyim kendimden, o dertten ve beladan*
Bibûsim ku lebê fincan û şûşe	*Öpeyim dudağını, fincan ile kadehin*
Dilê mehzûn bî pirr zewq û xuroşe	*Olsun hüzünlü gönlüm, çokça zevkli ve coşkun*
Tu wer mitrib dilê dana bireqsîn	*Geliver ey çalgıcı, bilge gönlü raks ettir*
Bi sewtê xoş û şi’r û lefzê şîrîn	*Güzel seda, şürle, hem de tatlı sözlerle*
Ji şi’rên xoş miferreh ke zemîrem	*Var güzel şürlerle, ferahlandır gönlümü*
Ji destê mihnet û derdan esîrem	*Ki esirim elinden, sıkıntı ve dertlerin*

Ji ‘eşqê dûr mebin ger çi mecaz e	*Mecaz olsa da eğer, kalmayın aşktan uzak*
Çira ku bo heqîqet karisaz e	*Çünkü o etkilidir, gerçeğe varmak için*
Nehin xalî çu sûret der terîqet	*Sakın siz tarikattan, olmayınız nasipsiz*
Ji nûrê zatê ‘eşqê ken heqîqet	*Hakikati edinin, aşkın kendi nurundan*
Eger tu ‘arif î sûretperest be	*Şayet ki bilge isen, tapıcı ol surete*
Besê meyxane û mehbûbê mest be	*Yeter gör meyhaneyi, mest ol sevgilide sen*
Dibit carek bidet saqî nihanî	*Bir defa olsun saki, sunmalısın gizlice*
Du sê fincan şerabê erxewanî	*Ergwanî şaraptan, iki üç fincan*
Me’elqisse, ku derket Şeh ji Çînê	*Sözün özü, Şehzade, çıktı Çin ülkesinden*
Ribab û çeng û ney dest kir girînê	*Başladı ağlamaya, rübapla, çenk ile ney*
Berê xwe dane Qostantînê dilgeş	*Gönülden bir arzuyla, yöneldi Konstantin’e*
Ji nalîna neyê dil bûye ateş	*Ateş olmuştu yürek, inlemesinden neyin*
Heta çil roj temam ba zewq û mesrûr	*Tam kırk gün boyunca, zevkle hem de sevinçle*
Buhartin ‘eskerî yû şahê mehcûr	*Geçirdiler askerler, hem yârinden uzak Şah*
Ji nageh hate bayek suxt û dişwar	*Esti ani bir rüzgâr, gayet sert ve şiddetli*
Li hev dan gemye û çil jê kirin xar	*Çarpıştırdı gemileri, kırkını batırdı suya*

Di behrê da xeriq bûn yek hezar merd	*Denizde boğuldular, askerlerden bin adam*
Dilê Şehzade bû xemgîn û pirr derd	*Yüreği Şehzadenin, oldu çok gamlı, dertli*
Digel berq û brûsk ebrê biharî	*Şimşekle, yıldırımla, ilkbahar bulutları*
Wekî tofan di ser wan da dibarî	*Yağıyordu başlara, tıpkı tufan misali*
Ji dengê re'd û bayê suxt ê naxoş	*Gök gürleme sesinden, sert, şiddetli rüzgârdan*
Dibên Şehzade bû pirderd û bêhoş	*Derler oldu Şehzade, çok dertli ve de sersem*
Ji bêhoşî ku hişyar bû sena kir	*Sersemlik geçtiğinde, kalktı övdü Allah'ı*
Digel hemdê Xwedayî xweş dû'a kir	*Allah'ın şükrüyle hem, güzel durdu duaya*
Go: "Ey Xellaqê xelqê cimle 'alem	*Dedi, "Ey Yaratıcı, tüm âlemi halk eden*
Ji qudret çêkirî Hewwa û Adem	*Yapansın kudretinden, Âdem ile Havva'yı*
Dizanim xafil in herroj ta şeb	*Biliyorum gafiliz, her gün ta akşama dek*
Bi nefs û aletê "yerte' we yel'eb"[71]	*Nefsimizle meşgulüz, "yerte' ve yel'ab" ile*[71]
Tu sahib rehmet û fezlê 'emîm î	*Sensin rahmet sahibi, Sensin lütfu kuşatan*
Bixefrîn me, Tu Rehman û Rehîm î!"	*Bağışla Sen bizleri, Sensin Rahman ve Rahim"*

[71] "Yerte' we yel'eb"; ev îfade, ji ayeta 12. ya Sûreya Yûsif hatiye wergirtin. Meala xwe wiha ye: "(bila bi têra xwe) vexwe, bileyîze..." Tevahiya ayetê: "(Birayên Yûsif, deng li bavê xwe Yaqûb dikin) Sibe, wî (Yûsif) bi me re bişîne geştê; da bi têra xwe bixwe, vexwe û bileyîze. Bê guman, emê teqez biparêzin."

[71] "Yerte' ve yel'ab"; bu ifade Yusuf Suresi, ayet 12'den alınmadır. Meali: "(bol bol) içsin, oynasın..." şeklindedir. Ayetin tamamı şöyledir: "(Yusuf'un kardeşleri, babaları Yakub'a hitaben) Yarın onu (Yusuf'u) bizimle gönder de bol bol yesin, içsin, oynasın; onu mutlaka koruruz."

Li paşan xweş emir kir Şahizade — *Arkasından güzelce, emir verdi Şehzade*

Ji xwe dûr kin çi alatê fesad e! — *Atın yanınızdan siz, fesat ne aletler varsa*

Ney û saz û ribab û çeng û xemrî — *İster ney ve saz olsun ister rübap, çenk, içki*

Bi cemi' bavêjin nav pêlê behrî! — *Atwerin hepsini, dalgaları önüne denizin*

Bi cemi' avêtin wan xemr û fincan — *Hepsini attı onlar, içkiyle fincanları*

Çiqas çûn zêde bû lê ba û baran — *Ancak gittikçe arttı, rüzgâr ile hem yağmur*

Gehî j'pêlan diçûn tahtesserayê — *Dalgalardan dolayı, bazen yerin dibine*

Gehî bala dibûn fewqessemayê — *Bazen yükselirlerdi, ta semanın üstüne*

Ji nageh hat pêlek zêde dişwar — *Ansızın geliverdi, çok şiddetli bir dalga*

Du heşt û şeş hezar keştî kirin xar — *Battı on altı gemi, altı bin kadar asker*

Dilê Şehzade bû pirr derd û ateş — *Şehzadenin yüreği, dert oldu, ateş doldu*

Welê Se'dulmilûkê mest û serxweş — *Ancak Sadülmülûk'se, mest ve sarhoş olarak*

Digot ba Şahizade ev bela ye — *Diyordu Şehzadeye, bu olanlar beladır*

Nehin îlla ji canibê Xweda ye — *Başka şeyden değildir, yalnızca Allah'tandır*

Divêtin şukrê bêhedd û hisabe — *Farzdır bize şükretmek, sınırsız, sayısızca*

Mebada bimînin em tahtel îqabe — *Yoksa Allah etmesin, kalacağız azapta*

Diken şukrê li ser derd û belayê	*Onlar şükre durdular, dert ve bela üstüne*
Xudanê fikr û teslîm û rizayê	*Oldular ehli onlar, fikir, teslim, rızanın*
Ji nû da hat bayek bê ‘eded sext	*Yine bir rüzgâr esti, fazlasıyla şiddetli*
Li hev da gemye û jê ker kirin text	*Çarptırdı gemileri, söktürdü tahtaları*
Dîger baqiyê keştîha xerq bûn	*Böylece batıp gitti, geri kalan gemiler*
Welê şems û qemer ji yekha ferq bûn	*Böylece ayrıldı tümden, güneş, ay birbirinden*
Ji ber berq û brûsk û bayê naxoş	*Şimşekten, yıldırımdan, hem de güçlü rüzgârdan*
Dibê Şehzade bû dîsan bêhoş	*Derler ki oldu sersem, yeni baştan Şehzade*
Mihessel, ta sê rojan ba û baran	*Özetle rüzgâr, yağmur, sürdü uç gün boyunca*
Dibên hat û bilind bû pêlê behran	*Derler gelip yükseldi, denizin dalgaları*
Wekî sê roj û sê şev bûn bi ejmar	*Bu hali de sayarsak, üç gün üç gece doldu*
Temamî Şahizade bû bi hişyar	*Ancak kendine geldi, tam uyandı Şehzade*
Rûniştin pêlê behr û ba û baran	*Sakinleşti dalgalar, denizde rüzgâr, yağmur*
Eyyam xoş bû wekî rojê biharan	*Hoş oldu gün ortası, bahar günleri gibi*
Nezer kir Şahizade gemye û merd	*Şehzade daldı seyre, gemiyle adamlara*
Xeriq bûyî kişandî ahekî serd	*Tamamı batmış gitmiş, çekti soğuk bir ahı*

Nihêrî çend nedî Se'dê şîrînşah[72]
Nebûn hazir li nik wî xeyrê pencah

Baktı ama görmedi, şahlar tatlısı Sad'ı[72]
Hazır kimse kalmamıştı, elli kişiden gayrı

Ji ber Se'dulmilûkê mest û mehweş
Dibên Şehzade bû dîsan bêheş

Sadülmülûk yüzünden, o mestin, ay yüzlünün
Derler ki yeni baştan, sersem oldu Şehzade

Ji bêhişî ku hişyar bû 'uşşaqî
Digotin qewl û eş'arê firaqî

Âşıklar uyanınca, sersemlik uykusundan
Okurlardı firakın, şarkısı, şiirini

XEZEL-8

Ah ji dest narê firaqê dil wekî biryan im ez
Her li ber wê iştiyaqê pirr kul û kovan im ez

Pirr kovan im derd û ahem 'aşiqrûyê çu mahem
Bendeyê û zilfê siyah em Yûsifê canan im ez

Yûsifê min berbi kuda çû ji halê wî çi rû da
Tehliyan ser li me zû da Ye'qûbê Ken'an im ez

GAZEL-8

Ayrılık ateşinin elinden, ah yüreği büryan gibiyim
O iştiyakla hep gözlerim, çok yaralı, hüzünlüyüm

Hüznü, derdi, ahı çoğum, aşığıyım ay yüzlülerin
Siyah zülfün bendesiyim, sevgili Yusuf'um ben

Hangi yöne gitti Yusuf'um, başına neler geldi
Acılar erken baş gösterdi, Kenan'ın Yakup'uyum ben

[72] "Se'd"; mebest jê Se'dulmilûk e.

[72] "Sad"dan kasıt, Sadülmülûk'tür.

Ye'qûbê pîr û hezîn im, pirr fîxan û pirr girîn im	*,Yaşlı ve hüzünlü Yakup'um, çok feryatlı, çok ağlarım*
Mestê camê 'Eyn û Şîn im, bê mey û fincan im ez	*Ayn ve Şin şarabın mestiyim, meysiz ve kadehsizim ben*
Bê mey û mexmûr û mest im 'aşiqê sûret-perist im	*Meysiz sarhoş ve mestim, suretperest bir aşığım*
Serxoşê camê "elest" im Mûsayê 'Îmran im ez[73]	*"Elest" şarabının sarhoşuyum, İmran'ın Musa'sıyım ben[73]*
Şibhê Mûsa min li Tûrê xweş temaşa kir li nûrê	*Musa misali ben Tur'da, güzel temaşa eyledim nuru*
Naliyam şibhê bilûrê, bi nale û efxan im ez	*İnledim kaval misali, inleyip feryat edenim*
Nale û efxan û zarî xoş li min bûne diyarî	*İnleme, feryat ve ağlama, bana güzel görünmüşler*
Şibhetê teyrê biharî mailê bostan im ez	*İlkbahar kuşları misali, bahçelere meyledenim ben*
Mailê werd û hilalan, çi ze'îf bûn wek xilalan[74]	*Eğilimliyim ben çiçeklere, hilallere, ne de zayıftı hilaller gibi[74]*
Ah ji dest fikr û xiyalan, bê ser û samanim ez	*Ah, düşünce, hayallerin elinden, servetsiz, sermayesizim ben*

Me'elqisse, dibên mîrê hunerwer	*Sözün özü diyorlar, Bey ki hüner sahibi*
Sûal kir halê Se'd û halê 'esker	*Sordu halinden Sad'in, bir de askerlerini*

[73] "Elest", mebest jê, ayeta "Elestu bî Rebbîkum" e (E'raf, a. 72). Wateya wê, "Ma ez ne xwedayê we me?"

[74] "Xilal"; armanc ji vê bêjeyê, bijangê zirav yê serdilkê ye.

[73] "Elest", "Elestü bi-Rabbiküm" (A'râf Suresi, a. 72) ayetine göndermedir. "Ben rabbiniz değil miyim?" anlamındadır.

[74] "Hilal"; burada kastedilen gökteki hilal değildir, sevgilinin ince kaşıdır.

Bi cem'î 'eskerê keştî xerq bûn	*Battılar tamamıyla, askerlerin gemisi*
Welê gemyê me û Se'd jêk ferq bûn	*Ancak bizimle Sad'ın, ayrı kaldı gemisi*
Nizanim çû bi kuda bê ser û ber	*Bilmeyiz nereye o, gitti iz bırakmadan*
Ji xeyrê me nema baqî çu 'esker	*Bizden gayrı kalmadı, geride bir tek asker*
Ku Şehzade bihîstin ew hewale	*Ki Şehzade duyduğunda, bu verilen haberi*
Ji nû kêşa ewî sed ah û nale	*İçerlendi yeniden, çekti yüz ah, inleme*
Go, "Ya Reb Se'dê min çûye bi kuda?	*Dedi "Ya Rab nereye, gitti acep Sad'imiz*
Nizanim ez ji halê wî çi rû da"	*Bilmiyorum başına, ne gibi haller geldi"*
Ji wî rengî digotin qewl û eş'ar	*Bu minvalde sözleri, şiirleri söyledi*
Digel ah û girîn û nale û zar	*Ah ile ağlamayla, inleme, sızlamayla*
Emîrek rabû got, "Ey Şahizade!	*Bir Bey kalktı dedi ki, ey bizim Şehzademiz*
Miyesser bî tu meqsûd û mirade	*Dileğimiz ulaşman, maksatla muradına*
Qezayê Rebbî ye dê tu bikî sebr	*Bu ilahî bir kaza, sana düşen sabırdır*
Digel hemd û sena û bê 'eded şukr"	*Hamd, övgüyle beraber, sayısız şükretmektir"*
Ji wî qewlî bû Şehzade xenîdil	*O sözle Şehzadenin, gönlü rahata erdi*
Bi naçarî dikir sebr û tehemmil	*Çaresizlikten ötürü, etti sabır, tahammül*

Li paşan got, “Heye tiştek ji it’am
Bixwim da ez, çê bit axir serencam”

Ardından deyiverdi, “Var mı yiyecek bir şey
Ta yiyeyim, bakalım, sonumuz olsun hayır”

Te’am anîn, li pêş danîn bi tezyîn
Kebab û nan û şurbê xoş û şîrîn

Dizdirdiler önüne, güzelce yiyeceği
Kebap, ekmek yanında, hoş ve tatlı şerbetler

Dibên çend loqme xwarî ahekî serd
Kişand û got, “Ay û way li min Se’d

Derler yedi kaç lokma, sonrası soğuk bir ah
Çekti, dedi derinden, “Eyvah bana ey Sad

Bi kuda çû gelo ew yarê canî?
Li ber min şem’ê rû reş bû nihanî

Nerelere acaba gitti, o candan yoldaşım
Ansızın o fenerim, kararda göz önünde

Ji dest çû melhemê êş û birînê
Bi nermî got digel ah û girînê

Elden çıkıp gitti, acı, yara merhemi
Hafifçe bir ah dedi, ağlamayla birlikte

Gelî yaran dizanin ev çi cî ye?
Ku em tê da diçin îro li rê ye!”

Neresidir burası, bilir misiniz dostlar
Ki bugün oradayız, almaktayız yolu biz”

Bi cimle gotin, “Rebb pê dizane
We ger ne yek ji me esla nizane”

Hepsi birden dediler, “Ancak Rabbimiz bilir
Bizden burayı asla, bir kişi bile bilmez”

Di van qal û meqalan bûn, yekê merd
Ji dûr da got. “Ewî tên çend gemî merd”

Onlar bunu derlerken, içlerinden bir adam
Dedi ki “Birkaç gemi, adamlarla geliyor”

Dibên Şehzade go ba karê danan,	*Bilge insanlar gibi, Şehzade dedi ki,*
“Dibîtin ew cema’et kariwanan	*“Olur ki olsun onlar, bir kervan topluluğu*
Bikey pirsî ji wan ew pê dizanin	*Onlardan soralım biz, bilirler cevabını*
Ku ev çiye çi cay û hem mekan in?”	*Ki neresidir bura, hangi yer ve mekândır”*
Di hîna bûn bi nêzîk ew cema’et	*Yaklaştığında onlar, ki o gelen topluluk*
Çihil keştî ji zengî bûn temamet[75]	*Kırk gemiydi mevcudu, tamamı zenciydiler[75]*
Di nav her keştiyek bû şêst zengî	*Her gemide var idi, toplamda altmış zenci*
Miselleh bûn temam û mêrê cengî	*Silahlıydılar hepsi, savaşçı adamlardı*
Ji wan zengiyê rûreş ger yekê merd	*O kara yüzlü olan, zencilerden bir adam*
Berê xwe bide çiyayek dê biket kerd	*Yönelseydi bir dağa, ederdi parça parça*
Ji ewwel kariwan bo cimle anan	*Ta evvelden beridir, bu korsan topluluğu*
Biken yexma û xaret kariwanan	*Yağma, talan ederler, kervanları her zaman*
Ku wan dîn keştiyê Şehzadeyê mîr	*Ki gördüklerinde onlar, Şehzade gemisini*
Bi cimle gote hevdu “Werne nêçîr!”	*Birbirine hepsi dediler, “Haydi gelin siz ava!”*

[75] Bêjeya “zengî” ya ku di vê destanê de derbas dibe, bi gişti bi wateya bûnewerên xewrojkî hatiye gotin. Peywendiya wê bi civaka “Zenci”re yên ku îro tên naskirin tuneye. Wateya “Zeng”, “zengar/qilêr”, “zengî”, “zengarî/qilêroki” ye.

[75] Şiirin orijinalinde “zengi” olan bu sözcük, “zenci” olarak çevrildi. Destanda bahsi geçen “Zengi”ler, masalımsı yaratıklar olup bilinen Afrikalı manasındaki “Zenci”ler değildir. “Zeng”, “pas/pasak”, “zengi” “paslı/pasaklı” demektir.

Kulabê ahenîn avête keştî	*Attılar sağlam kanca, Şehzade gemisine*
Kişandin ber bi xwe bi qehr û ziştî	*Çektiler kendisine, öfkeyle, kızgınlıkla*
Wekî Şehzade dît ewrengî zengî	*Şehzade gördü bu tarz, zencilerin işini*
Go, "Bikujin wan sekan, yaran bi cengî	*Dedi, "Savaşın dostlar, öldürün bu itleri*
Miselleh bûn temam û zirh û cewşen[76]	*Silahlıydılar hepsi, zırhlarla, cevşenlerle[76]*
Bilez wergirtin wan ba cengê dişmen	*Aceleyle aldılar tedbir, düşmanla cenk üzere*
Kirin cengînê şûr û gurz û nêze	*Tutuştular savaşa, kılıç, gürz ve mızrakla*
Bû heşr û neşr û rojê ristexêze	*Haşir ve neşir oldu, döndü kıyam gününe*
Li hev xistin wekî şêr û pilingan	*Vuruştular birebir, aslan, kaplan misali*
Bi gurz û nêze û şûr û kulingan	*Gürzlerle mızraklarla, kılıç ile kargıyla*
Ji ber derbê rim û sînanê zehrab	*Darbesinden dolayı, mızrak, zehirli okların*
Dibên bû behrê xûn ew behr û ew ab	*Derler ki kanla doldu, her tarafı deryanın*
Welê kuştin, dibên Şehzadeyê mîr	*Ancak derler Şehzade, öyle öldürdü ki*
Ji heddî zêde ba gurz û rim û tîr	*Haddinden fazlasını, gürzle, mızrakla, okla*
Dibên Şehzade dest da ba tîr û tîrkeş	*Derler ki ok ve yayı, aldı ele Şehzade*
Gelek kuştin ji wan zengîyê rûreş	*Haylisini öldürdü, yüzü kara zenciden*

[76] "Cewşen", ne ew "Cewşen" ku wek dûayekî tê xwendin. Ew jî bi wateya xwe "zirx" e.

[76] "Cevşen"; bilinen "Cevşen" duası değildir. O da "zırh" anlamındadır.

Ji derbê Şahizade, merdê cengî	*Şehzade darbesinden, savaşçı adamlardan*
Deh û du gemye bûn vala ji zengî	*Toplam on iki gemi, boşaldı zencilerden*
Ji derb û hinge-hingê şêr û mêran	*Aslanların, mertlerin, darbeyle hamlesinden*
Seda û ne'rayê merd û dilêran	*Sedayla naraları, mertlerin, yiğitlerin*
Dibên ew roj bû wek rojê mehşerê	*Derler ki olwerdi, o gün mahşer misali*
Çiqas behrî bûn çûn qe'rê behrê	*Deniz ehli olanlar, daldılar derinlere*
Dibên Şehzadeyê mexmûr û mehweş	*Derler mahmur Şehzade, o ay yüzlü kahraman*
'Ecêb şer dikir bi gurz û tîr û tîrkeş	*Acayip savaşırdı, gürzle, okla, yay ile*
Digotin Zengiyan, "Ey şêrê sermest!	*Zenciler diyorlardı, "Ey sarhoş olan aslan*
Nedît me kes wekî te çapûk ez dest!"	*Asla görmedik senden, hızlı, atik kimseyi"*
Ji yarê Şahizade bûne kuştî	*Şehzade dostlarından, ölenlerin sayısı*
Çihl û sê kes temamî ew di keştî	*Gemide olanlardan, toplamda kırk üç kişi*
Wekî dît zengiyan salarê şêran	*Zenciler gördüğünde, aslanların başını*
Bi tenha ma digel pênc û du mêran	*Odur yalnız kalmıştır, yalnız yedi yiğitle*
Kirin gazî û qêrînî û hawar	*Çağırıp bağırdılar, yardıma istediler*
Go "Wernê hûn bi cemi' wek seyê har	*Dediler "Gelin toptan, kuduz itler misali*

Bi dest bigrin ewan em şibhê hêsîr	*Yakalayın kolundan, esir edin onları*
Hediye em bibin bo zengiyê mîr	*Götürelim onları, zencilerin beyine"*
Dibêjin hatine ew ji çar canib	*Derler ki saldırdılar, dört bir taraftan onlar*
Welê Şehzade bû mêrek 'ecaib	*Ne var ki o Şehzade, acayip bir yiğitti*
Gehî kuştin bi zerk û tîr û tîrkeş	*Bazen öldürüyordu, hançerle, okla, yayla*
Gehî ba şûr û rim û gurz û perşeş[77]	*Bazen kılıç, mızrakla, bazen gürzle, perşeşle[77]*
Ku nêzîk bûne zengî ji Şahizade	*Ki yaklaşwerince, Şehzadeye zenciler*
Bi dest girtin xulamêd bê mûrade	*Kollarından tuttular, muratsız dostlarının*
Welê Şehzade da ne're bi huner	*Ancak Şehzade attı, hünerle bir narayı*
Ji du sed zêde kuştin wî bi xencer	*Öldürdü hançeriyle, iki yüzü onlardan*
Çar sed merdê dilêranê zengî	*Zenci adamlardan ki, dört yüzü cesurca*
Bi hev ra hatne Şehzade bi cengî	*Saldırdılar topluca, Şehzadenin üstüne*
Ji derban rehtibûn wî dest û hem zend	*Yoruldu darbelerden, kolları, bilekleri*
Ji piştra Şahizade xweş kirin bend	*Ardından Şehzadeyi, bağladılar sıkıca*
Teşbîhê esîran rakişandin	*Esirler gibi onu, sürüklediler onlar*
Li paşan gemye û keştî cirandin	*Sonra gemiye alıp, harekete geçtiler*

[77] "Perşeş", di heman wextê de bi navê "şeşper" jî tê naskirin. Gurz an tompizekî şeş pare ye.

[77] "Perşeş", "Şeşper" olarak da bilinen altı dilimlik bir gürz(-topuz).

Siyehpoş tu bike cehd û cîhadê	*Ey Siyahpûş, eyle sen, cihat ile çabayı*
Digel nefsê dê bînî tu miradê	*Nefsin ile yap bunu, kavuşursun murada*
Wekî Şehzade be mêr û bi huner	*Ol Şehzade misali, yiğit ile hünerli*
Bikuj nefsê xebîsê xwe bi xencer	*Hançerle öldürüver, sen o habis nefsini*
Emanet guh nedî fikrê hewayî	*Sakın ha kulak verme, içi boş fikirlere*
Sekê nefsê yû kibrî yû riyayê	*Nefis itine hem, kibir ile riyaya*
Li ser ta pê reş in ew şibhetê qîr	*Baştan ayağa kadar, odur katran misali*
Bi mislê Zengiyan dê keyn te hêsîr	*O da zenciler gibi, edecek seni esir*
Di hîna Zengiyê ehlê ‘inade	*Ne zamanki zenciler, ki inat ehliydiler*
Kirin hêsîr xulam û Şahizade	*Ettiler Şehzadeyi, hem esir dostlarını*
Kişandin der ji behrê gemye û merd	*Gemiye demir atıp çıkardılar mertleri*
Qerar girtin mekanek xweş ezê ‘erd	*Karar kılıp aldırdı, güzel yere onları*
Bilez anîn û danîn textekî zer	*Süratle getirdiler, kurdular bir altın taht*
Tijî mercan û le’l û durr û gewher	*Donatılmış mercanla, hem lal, inci, cevherle*
Ji jor da hate ser pala minarek	*Yukarıdan birisi, geldi minare boylu*
Li ser ta pê reş û şewtî çinarek	*Baştan ayağa kadar, kara kuru bir çınar*

Di gerdan de ji zêrî toqê le'net	*Ki boynunda altından, vardı lanet bir halka*
Li ser textê zerîn rûnişt bê minnet	*Gelip de altın tahta, minnetsize oturdu*
Cewahirbend bû an toqê ez zer	*İşlenmişti cevherden, altın halkası onun*
Çu zînê hepsê şehzadan li pişt xer	*Eşekte şehzadenin, atının üzengisi*
Li paşan Zengiyan Şehzade û yar	*Ardından Şehzadeyle dostlarını, zenciler*
Hilanîn û birin pêş pîrê kuftar	*Alıp da götürdüler, sırtlan beyi önüne*
Kî ye'nî hakimê zengî yê naxoş	*Ki yani hakimiydi, o nahoş zencilerin*
Şikilpîs û reş û sergîn binagoş	*Şeklen pis ve karaydı, kulağı tezek gibi*
Go "Ehlen merheba ba qedr û qîmet	*Dedi, "Merhaba, ehlen, kadir kymet vererek*
'Ecaib bo me kir hûn zêde xizmet"	*Bizim için yaptınız, fazlaca siz hizmetler"*
Dibên Şehzade seh kir ba feraset	*Derler bundan anladı, ki Şehzade ferasetle*
Emîrê Zengiyan e ew necaset	*Zencilerin beyidir, necaset kokan adam*
Temenna kir ji wî ra, got, "Îlahî!	*Temennide bulundu, dedi ki, "Ey Allah'ım*
Xilas key me ji dest wî rûsîyahî!"	*Kurtar elinden bizi, şu kara yüz adamdan"*
Ji hevdu pay kirin zengiyê rûreş	*Ayırdılar onları, kara yüzlü zenciler*
Bi emrê Şeh xulam û mîrê mehweş	*Şahlarının emriyle, ay yüzlü Bey, dostları*

Mihessel, du xulam û mîrê çun mah	*Kısaca, iki dostla ay misali Şehzade*
Ji payê ew ketin bo doxterê Şah	*Hisse olarak düştü, şah kızının payına*
Hilanîn zengiyan du yar û ba mîr	*Kaldırdılar zenciler, Bey ile dostlarını*
Birin bo doxterê Şahê wekî qîr	*Götürdüler kızına, Şah'ın ki katran gibi*
Ku doxter dît xulam û mîrê sadiq[78]	*Kız görünce iki gulamı hem sadık Beyi[78]*
Bi sed dil bû ji Şehzade bi 'aşiq	*Yüz gönül ile oldu aşığı, Şehzadenin*
Emir kir doxterê Zengiyê çun zax	*Emretti kuzgun gibi, zenci beyinin kızı*
Bibin Şehzade û yaran bi nêv bax	*Götürün dostlarını, Şehzadeyle bahçeye*
Biken xizmet ji wan re zêde mehbûb	*Hizmet edin fazlaca, onlara gönlünüzce*
Ji dil ez talib im ber rûyê metlûb	*Ben gönülden talibim, arzumdur yüzü onun*
Hilanîn yar û Şehzade bi 'izzet	*Kaldırdı Şehzadeyle dostlarını saygıyla*
Birin baxek misala baxê Cennet	*Götürdüler bahçeye, cennetten parça gibi*
Tijî xurma û xox û cewz û incîr	*Doluydu hurma, incir, şeftaliyle cevizler*
Hinar û sêb û incazê wekî tîr	*Narıyla, elmasıyla, upuzundu erikler*

[78] "Xulam"; bi wateya xwe, hem xort e hem jî kole û dîl e. Lê, di vir de wateya xwe, "dost" û "heval" e. Jixwe, di pir cihan de, Seyfulmilûk, ji bo hevalên xwe "yar" an "yaran" bikartîne ku ev yek delîla vê ye.

[78] "Gulam"; delikanlı, kul, köle, esir gibi anlamlara gelmektedir. Ancak burada kastedilen, dost ve arkadaştır. Zaten çoğu yerde, Seyfülmülûk'ün arkadaşları için "yâr", "yârân" ifadelerini kullanması buna delidir.

Tirinc û qeysî û leymon û narinc	*Portakal, kayısı, limon ve mandalinalar*
Tirî û fişne û badam û hem senc	*Üzümle hem fişneyle, badem ile iğdeler*
Wekî Şehzade û yaran werengî	*Şehzadeyle dostları, bu tarzda, bu minvalde*
Te'am dîtin di baxê bintê zengî	*Yiyecekler gördüler, zenci kız bahçesinde*
Dibên xwarin ji new'ê cimle et'am	*Derler onlar yediler, her türden nimetleri*
Heta heft roj û heft şev bûn bi itmam	*Tamam oluncaya dek, yedi gün, yedi gece*
Welê bintê digo, "Min her sê xwarin	*Ancak kız diyordu ki, "Yerdim ben üçünüzü*
Ji babî ra ku tu bo min hinarin"	*Ne var ki gönderildin, babamdan benim için"*
Ku çû yek hefte bintê şahê zengî	*Ki bir hafta dolduğunda, zenci şahının kızı*
Ji 'eşqan bû xumar û mest û bengî	*Aşkından oldu sarhoş, mest ve tutkun olarak*
Ji dil kir 'ezmê 'eşqê Şahizade	*Gönülden çabaladı, Şehzadenin aşkına*
Ji weslê wî bibînê da mirade	*Ta ona kavuşmakla, ermekti muradına*
Çû ser behrê siyah xwe şûşt ewreng	*Denize gitti siyah, öyle bir yıkadı kendini*
Heta bû tehl û şor û pîs û pirr jeng	*Ta oluncaya dek, acı, tuzlu, pis, pasak*
Kefa behrê û xûnê reş wekî dû	*Denizin köpüğünü ve duman gibi siyah kanını*
Di rûyê şibhê kûsî dan û pîsû	*Aldı, sürdü yüzüne, o tosbağa benzeri*

Ewan zilfê wekî dêlêd hespan	*Zülüfleri ki onun, at kuyruğu gibiydi*
Vemaliştin bi xûn û kefê behran	*Temizledi onları, bahrin kan ve köpüğüyle*
Du guhê şibhê palasê tijî mû	*İki palas kulağı, doluydu kıllar ile*
Ji reng û kefê behran bû wekî gû	*Kire döndü, deniz köpüğü rengiyle*
Du ebrû wesme dan ba dûdê sergîn	*Damgalıydı iki kaş, sanki tezek dumanı*
Ji xûn û kefê behran bûyî rengîn	*Renklenmişti ikisi, bahrin kan, köpüğünden*
Du çahvên zer teyîsan şibhê meş'el	*İki sarı gözü ki, meşale gibiydiler*
Mikehhel kir ji xûn û neft û dûkel	*Çekti kandan sürmeyi, hem katrandan, kurumdan*
Bi wan çahvan dikir naz û girişme	*O gözlerle yapardı, nazını, cilvesini*
Du firnê pozê wê bûn mislê çeşme	*İki burun deliği, sanki iki çeşmeydi*
Dibêjin lêvê jêrî çûbû ser sîng	*Alt dudağı derler ki, sarkmıştı göğsüne dek*
Bi serda hatibû badê wekî deng	*Uzamış idi dişleri, değirmen taşı gibi*
Reş û qalin bi dev şibhê mexare	*Siyah ve kalın ağzı, zannedersin mağara*
Didanê wê dirêj bûn wek meqare	*Dişleri upuzundu, tıpkı matkap misali*
Ji ber lêvan çenê wê kes nedîbû	*Dudaklarından onun, görülmezdi çenesi*
Ku bêhna dev wekî kelbê mirî bû	*Ağzından çıkan koku, ölmüş it kokusuydu*

Wekî du mişkê mey bûn wê du bustan	*İki dişi fareydi, onun her iki göğsü*
Reş û pîs û necis daim û zeştan	*Kara ve de kuruydu, daim kirli, çirkindi*
Wekî min go delal bû wê dev û zar	*Dedim ya nazlıydı, ağzıyla hem diliyle*
Serê gerden di sîngê da diçû xwar	*Kayıptı gerdan başı, ta göğsünün içinde*
Qed û qamet wekî şewtê çinarê	*Misaliydi boyu posu, yanmış çınarın*
Du neh gaz bûn di vê jêrên mexarê	*İn misali ağzında, vardı on sekiz dişi*
Dibên dehlek temam bû wê mûy û pirç	*Derler orman gibiydi, kılları ve tüyleri*
Di navda bûn gur û wehş û nir û hirç	*Yaşardı onda kurtlar, domuz, kaplan ve ayı*
Ji pê ra hatibû heta bi navê	*Önünden kirlenmişti, ta göbeğine kadar*
Ji pişt ra ser bi milda bû ziravê	*Arkadan bulanmıştı, ince beline kadar*
Nezerken hûn ji wê pîsa mitences	*Nazar ediniz sizler, o pislerden pis kıza*
Çi rengî bû ji libsê qenc milebbes	*Ne de renkliydi üst başı, iyi giysilerle*
Li ser rehlê serî bû tacek ez zer	*Başının semerinde, vardı altından bir taç*
Cewahirbend ji le'l û durr û gewher	*Süslüydü cevherlerden, inci, lal, mücevherden*
Di ber da bû ji belgê gul kirasek	*Giyinmişti üstüne, gül yapraklı bir gömlek*
Li ser wergirtî ez sindûs libasek	*Üzerine örtmüştü, sündüsten bir elbise*

Du sed menn zêrkemer bû wê li piştê
Belinde altın kemer, altı yüz kilo kadar

Serê şirkan dihatin ser qeliştê
Saçaklarının ucu inmiş, ta kalçalara kadar

Di gerden bû benek sêsed ji gewher
Vardı boynunda bir ip, üç yüz cevherden idi

Bi ser xwe da reşandî misk û ‘enber
Serpmişti üzerine, miskten, amberden koku

Çi xoş meş kir bi misalê meşê zax
Ne güzel yürüyordu, sanki kuzgun misali

Bi wî şekl û fesalê hate nêv bax
Gelmişti bahçeye o, bu giyim kuşamıyla

Çu qesrek xoş misala qesrê Cennet
Ne güzel bir köşk idi, cennet köşkü benzeri

Bi şadî û bi keyf û zewq û sohbet
Sevinçle hem keyifle, zevk ile hem sohbetle

Bi emrê dêlê san qîza seyê pîr
Emriyle o dişi itin, ki yaşlı itin kızıdır

Kirin hazir li nik Şehzadeyê mîr
Hazırladılar onu, Beyin Şehzadesi yanında

Got: “Ey çeşm û çira û raheta min
Dedi, “Ey gözümün ışığı, rahatım benim

Qerar û hûş û sebr û taqeta min
Kararım, aklım benim, sabır, takatim benim

Bi mislê min nehin esla çu mehweş
Yoktur benzerim benim, asla hiçbir ay yüzlü

Letîf û nazik û mehbûb û dilgeş
İncelikle naziklikte, tatlılıkla caziplikte

Ji şerma min bi şev şemsê veşart xwe
Utandığından benden, gece gizlendi güneş

Ji husna min siyahîn bû qemer ro
Güzelliğimden gündüz, ay karardı, kayboldu

Ji hesret min gelek şehzadê zengî	*Hasretimdendir benim, nice zenci şehzade*
Bûyîn mecnûn û şeyda ta Frengî	*Çıldırdı, mecnun oldu, ta Frengistan'a dek*
Didin medhê me bo zeng û libasan	*Methimizi vermekte, zenciler, giysiler için*
Xetta û Hind û Qîçaq û Xoresan[79]	*Hıtâ ve Hint'ten, Kıpçak ve Horasan'a dek*[79]
Di 'alem da bi deng û nav im ez pur	*Dünyada yayılmış, benim namım, şöhretim*
Ji husna min bi qedr in gewher û durr	*Hüsnümden dolayıdır, inci, cevher değeri*
Ji derdê min xerab bûn çendi kişwer	*Benim derdimden oldu, nice devletler harap*
Bibî bo min tu çawanî dilawer	*Olmalısın sen benim, ne biçimsin yiğidim*
Te ez dîm û nedî te ji min mirad e	*Gördün beni sen ancak, almadın benden murat*
Me da destûrê te ey Şahizade	*Sana izin verdim ben, bilesin ey Şehzade*
Bi bê tirsî were tu wê bi dilxwaz	*Korkusuzca gel bana, gönülden, isteyerek*
Ji min meqsûd bigre ey serefraz!"	*Muradını al benden, ey yiğit, yüce kişi"*
Ku ev rengî bihîst qewlê seyê reş	*Bu tarzda sözlerini, işitti siyah itin*
Ne guh dayê ne nêrî bûye bêheş	*Bakıp kulak asmadı, kalakaldı şaşkınca*

[79] "Qiçak"; di jêderkên Mongol û Çîn de wek "Qipçak", yê Bîzans û Rojhilatî de wek "Qûman" tên naskirin. Bi binyada xwe Tirk in. Di navbera sedsala 9-11an de, li bakurê Derya Reş, di cografyaya Qiriman de, li derdora çemê Irtîşê xuya bûnin. Di wêjeya rojhilat de, bi "Deşta Qîçak (Beyarên Qiçak)" navdar e.
Ji bo "Hita" û "Xoresan"ê agahî di têbiniyên jor da hatiye dan.

[79] Moğol ve Çin kaynaklarında Kıpçak, Bizans ve Doğu kaynaklarında ise Kuman olarak bilinen Türk kökenli bir halktır. Tarih sahnesine çıkışları, 9 ila 11. yüzyıllardır. İlk görüldükleri yer, Karadeniz'in kuzeyinde, Kırım coğrafyasında, İrtiş nehri boylarıdır. Doğu edebiyatında, "Deşt-i Kıpçak (Kıpçak Bozkırları)" meşhurdur.
"Hıta" ve "Horasan" için, yukarıdaki dipnotlarda bilgi verilmişti.

Ji bêhişiyê ku hişyar bû dilawer
Şaşkınlığı geçince, gönül sahibi Şehzade

Ne guh dayê ne nêrî şekl û menzer
Ne şekil ve manzarasına baktı, ne kulak astı

Ku evreng dêlê reş dî hat ‘iqabê
Gördüğünde bu tavrı, öfkelendi kara it

Got, “Wernê wî bibin pirr den ‘ezabê
Dedi, “Gelin götürün, ona edin çok azap

Bibin wî û hevalê wî bidin rex
Bir kenara atınız, arkadaşlarıyla onu

Her ro bînin bi wan êzingê metbex
Mutfak için onlarla, her gün odun getirtin

Dibêjin herdu hevalan bi destar
Derler iki yoldaşı, el değirmeniyle hep

Şe’îr û hinte û garis dikir ar
Öğütürdü arpayı, buğday ile mısırı

Birin Şehzade û yar dan teniştê
Götürdüler şehzadeyi yâranını da beraber

Her ro dianîn bi wan êzing bi piştê
Getirtirlerdi her gün, onlarla sırtla odun

Ku endek ba be her sê piştiyê wan
Ki şayet az olsaydı, her üçünün getirdiği yük

Dê mehrûm ba ne ew ez ab û ez nan
Kalacaktılar mahrum, sudan hem de ekmekten

Dibêjin Seyfulmilûk û herdu heval
Derler ki Seyfülmülûk, hem iki arkadaşı

Ji destê Zengiyan bûn zêde bedhal
Çok kötü oldu onlar, zencilerin elinden

Ji derd û mihnet û cewr û cefayê
Dert ile eziyetten, zahmetle zorbalıktan

Ji bîr kiribûn ewan namê sefayê
Sefa, sevinç ne şeydir, unuttular adını

Bi xef rabûn revîn û xoş nezer kir
Etrafı kolaçanla, gizli kalkıp kaçtılar

Nedîn zengî û çûn ‘ezmê sefer kir
Göremedi zenciler, azmettiler sefere

Ji rex behrê bû hêj gemya bi rê da
Kıyıda idi henüz, yola düşecek gemi

Wekî Şehzade û yaran bûn têda
Sanki bekliyor idi, Şehzade, dostlarını

Ji her enwa’ fêkî wan çinî xoş
Her çeşitten meyveyi, kopardılar gönlünce

Birin gemî bi dest û pişt û doş
Taşıdılar gemiye, ellerle, omuzlarla

Li paşan gemî berdan û cirandin
Ardından halat söküp yüzdürdüler gemiyi

Bi te’cîl selbê du canib weşandin
İki yandan hızlıca, asıldılar küreğe

“Feqed qalû tewekkelna ‘elellah
Dediler, “Allah’a biz, etmişiz tevekkülü

Nufewwiz emerna her dem îlellah”[80]
İşimizi her zaman, teslim ederiz ‘Ona”[80]

Kesê emrê xwe bispêrit Îlahî
Şayet her kim işini, teslim etse Allah’a

Yeqîn ew dê xilas bit ez siyahî
Kurtulacaktır kesin, siyahî kimselerden

Munîr bit dê ji wî ra rengê zulmet
Nurlanacaktır ona, karanlıklı durumlar

Be ser dê çîn cefa û derd û mihnet
Başından uzak olur, dertlerle eziyetler

Çi xoş wext e wekî emmareyê nefs
Ne güzel bir andır ki, kötülük seven nefsi

Bi dûr bîtin wekî lewwameyê nehs
Uzak tutmak, ayrıca, huysuz, kınanmış nefsi

[80] Ev malik, şa’ir bi Erebî nivisiye.

[80] Bu beyit, şiirin orijinalinde Arapça olarak geçmektedir. Burada Türkçesi verildi.

Seyir ket mulheme pur zewq û pur derd	*Seyret ilhamlı nefsi, çok zevkli ve de dertli*
Dilê derwêş û dana, ‘arif û merd	*Dervişle bilginlerin, bilge, mertlerin gönlü*
Me’elqisse, dibêjin Şehzade û yar	*Sözün kısası, derler, Şehzade’yle dostları*
Li ser behrê wekî gemyê kirin kar	*Ne zaman ki denizde, çalıştırdı gemiyi*
Heta bîst roj û şev çûn lê ‘ecaib	*Yol aldılar yirmi gün, hem yirmi gece kadar*
Gelek dîn û gelek tiştên xeraib	*Rastladılar çok şeye, acayip, garip şeyler*
Neşêm bêjim ji tetwîla kitabê	*İstemem ki diyeyim, ta kitap uzamasın*
‘Ecaib û xeraibên di abê	*Denizdeki acayip, hem de garip şeyleri*
Welê Şehzade got ba du xulame,	*Ancak Şehzade dedi, iki hizmetkârına*
“Eger ‘erdek bibînin pirr te’ame	*“Şayet görseniz bir yer, yiyeceği bol olan*
Heta em sax bibin dê bikin sebrê	*Lazımdır sabır bize, ta biraz canlanalım*
Sefer nakeyn qet esla di behrê	*Denizde etmemeliyiz, asla biz yolculuğu*
Me ewreng dîn ‘ecaib bê ‘eded bes	*Gördük onca acayip, ki sayıya gelmezler*
Ji ewwel ta bi axir qet nedî kes”	*Görmemiştir hiç kimse, evvelden bugüne dek”*
Nezer kir Şahibazê mest û serxweş	*Göz gezdirdi Şehzade, o mest ve sarhoş yiğit*
Bi nêzîkê li wan pirr adeyek xweş	*Onlara yakın olan, çok güzel bir adayı*

Bi derkevtin ji behrê çûn cezîre	*Üçü çıktı denizden, girdiler o adaya*
Tê da dîn xurme û sêv û hejîre	*Onda gördüler hurma, hem elma ile incir*
Ji enwa'ê fewakih dîn bi mitleq	*Meyvenin çeşidinden, gördüler sayısızca*
Çu engur û hinar û senc û findeq	*Üzüm olsun nar olsun, iğdeyle fındık olsun*
Hilanîn dest û Şehzade dû'a kir	*Kaldırdılar elleri, dua etti Şehzade*
Digel şukrê gelek hemd û sena kir	*Şükür ile birlikte, nice hamd ile övgü*
Li paşan gote yaran, "Dê bikeyn sebr	*Ardından dostlarına dedi, "Sabredeceğiz*
Heta em sax bin di vê adeyê behr"	*Bu deniz adasında, ta iyileşene dek"*
Wê rojê bûne rahet ta êvarê	*Dinlendiler o günde, akşama kadar onlar*
Bi mexrîb hersê çûn ser gulyê darê	*Mağrip vaktinde üçü, gittiler bir ağaca*
Mubada ku cenawer bên bixwin wan	*Olmaya ki canavar, gelip yesin onları*
Ji mexlûqatê behr elwan bi elwan	*Deniz yaratıkları, ki rengârenk idiler*
Wekî şev tarî bû dîtin cenawer	*Karanlık bastığında, canavarlar gördüler*
Ji behrê derketin bêhedd û defter	*Denizden çıkıp geldi, sayısız, sınırsızca*
Çu bor û herç û gurg û rûbe û wehş	*Yaban atı ve ayı, kurt, tilki ile domuz*
Dixwarin wan fewakih ba dilê xweş	*Yiyorlardı meyveler, gönüllerince, hoşça*

Diger ba'zê cenawer şibhetê merd	*Bazı canavarlarsa, insanlar misaliydi*
Li ser avê diçûn xoş xoş wekî 'erd	*Yüzerlerdi güzelce, suda kütükler gibi*
Diger be'zê dihatin ew bi te'cîl	*Diğer bazılarıysa, gelirlerdi hızlıca*
Bi gazî wan dihat tesbîh û tehlîl[81]	*Yükselirdi onlardan, tesbih, tehlil sözleri[81]*
Diger be'zê ji çeng û naye û saz	*Diğer bazılarınınsa, çenkten, neyden ve sazdan*
Gelek xoştir bû sewt û deng û awaz	*Daha da güzel idi, ses, seda, avazları*
Diger be'zê misala şêrê şerze	*Diğer bazılarıysa, kükreyen aslan gibi*
Ji dengê wan dihat 'alem bi lerze	*Titrer idi onların, seslerinden tüm âlem*
Ku dev dabane ser avê bi lez xweş	*Kî ağız atsaydılar, su üstünden hızlıca*
Dibû derya ji lêvê wan bi ateş	*Dudaklarından dolar, deniz tümü ateşle*
Çi binvîsim sifet cimle cenawer	*Sıfatlarını yazsam, canavarların tamam*
Temam naken dused kitab û defter	*Sığmaz onlar iki yüz, kitap ile deftere*
Mihessel, gote yaran Mîrê dilber,	*Özetle dedi dostlarına o yürekli Bey,*
"Werin da em ji vê adê herin der	*"Geliniz çıkalım biz, bu adadan dışarı*

[81] "Tesbîh"; peyvên bêqisûrî û bêkêmasiya Xwedê serziman dikin; wek "Subhanellah"ê.
"Tehlîl"; peyvên yekîtî û bêhevaltiya Xwedê serziman dikin; wek "La îlahe illellah"ê.

[81] "Tesbih"; Allah'ın her türlü kusur ve noksandan uzak olduğunu ifade eden sözler; "sübhanellah" gibi.
"Tehlil"; Allah'ın birliğini, ortaksız olduğunu ifade eden sözler; "Lâ ilâhe illallah" gibi.

Eger bên û bibînin me cenawer	*Şayet bizi görseler, canavarlar adada*
Mi'eyyen dê biken ew me bi ker ker	*Kesindir edecekler, lime lime bizleri"*
Ku 'alem bû munîr ez tel'etê şems	*Ki güneş doğar doğmaz, aydınlanınca dünya*
Cenawer çûne behrê qenc û hem nehs	*Canavarlar daldılar, iyi, kötü denize*
Ji darê hatne xwar Şehzade û yar	*Şehzadeyle dostları, indiler hep ağaçtan*
Çinîn fêkî birin gemyê kirin kar	*Koparıp meyveleri, götürdüler gemiye*
Tewekkul daneyê bê xwarin û xew	*Tevekkülle gittiler, yemeksiz ve uykusuz*
Li ser behrê gemî çû ta çihil şew	*Gemiyi yürüttüler, denizde ta kırk gece*
Te'amê wan xilas bû qet nizanîn	*Bitti yiyecekleri, bilmiyorlardı asla*
Ji behrê ew çi cay û çi mekanîn	*Denizde neredeler, ne yer, mekândadırlar*
Bi emrê Xaliqê Heyy û Qedîre	*Yaratıcının emriyle, ki O Hay'dır, Kadir'dir*
Ji dûr dîtin bi derket yek cezîre	*Uzaktan gördü onlar, bir adayı karşıda*
Ku nêzîk bûn û çûn dîn cayekî qenc	*Ki yanına varınca, baktılar güzel bir yer*
Tijî xurma û xox û fişne û senc	*Hurmayla, şeftaliyle, dolu vişne, iğdeyle*
Hinar û sêb û bih, incîr û engur	*Narla, elma, ayvayla, hem incirle, üzümle*
Tirinc û lêmon û narinc û mexmûr[82]	*Portakalla, limonla, narenciye, mahmurla[82]*

[82] "Mexmûr"; serxoş, jixweçûyî, xurekên serxoşker û hişbir.

[82] "Mahmur"; sarhoşluk veren, kendinden geçirten yiyecekler.

Tijî hirmî û gûz û darê gilyaz	*Armutla, cevizlerle, doluydu kirazlarla*
Diger badam û qeysî darê incaz	*Hem badem ağacıyla, kaysıyla eriklerle*
Gelek bindeq hebûn tê da we ‘er’er	*Var idi hayli fındık, hem ardıç ağaçları*
Ney û yasmîn û hem serw û senûber	*Kamışlar, yaseminler, serviyle çam fıstığı*
Spîndar û bîy û şengdarê bilbil	*Kavak ağacı, söğüt, bülbülün hoş ağacı*
Reyahîn û binefş û nergiz û gul	*Reyhanlar, menekşeler, nergisler ile güller*
Hilal û sosin û sinbil mihelleq	*Kürdan çiçeği, süsen, hem sümbülün döneni*
Reyahîn û şilêr û mêlaq û ebleq	*Reyhan, ağlayan gelin, alacalı sümbüller*
Ji bêhnê xoş û misk û ‘ud û ‘enber	*Hoş koku ile miskten, öd ağacıyla amberden*
Gelek dîtin Şeh û yaran û dîger	*Nicesini gördüler, Şehzadeyle dostları*
Dirextî bû du bergeş hem çu lale	*Ağaç iki siniye, hem de laleye döndü*
Semerbustanê bintê çardeh sale	*Meyvesi göğsünündür, on dördünde kızların*
Heme şeb ta seher manendê ‘uşşaq	*Tüm gece sehere dek, tıpkı âşıklar gibi*
Bi sewtê xoşbilindî guft waq waq	*Yüksek ve hoş seslerle, vak vak eder dururdu*
Dirextê dîgereş qeh qeh bi xende	*Diğer bazı ağaçlar, kahkahayla gülerdi*
Heme şeb ta seher mîkerd bilinde	*Tüm gece ta sehere dek, ederlerdi yüksekçe*

Hebû darek di belgê wê şebefroz
Bir ağaç ki yaprağı, ışıtırdı geceyi

Diîsa şibhê meş'el şeb heta roz
Meşale gibi parlardı, geceden ta gündüze

Ji belgê darekî dî her ji mexrib
Bir başka ağacınsa, yapraklarından onun

Heta sibhê dihat awazê mitrib
Akşamdan sabaha dek, gelir şarkı sesleri

Li ser daran hebûn tawûs û bilbil
Ağaçlar üzre vardı, tavus ile bülbüller

Digel qumrî yû tûtî bê tehemmil
Kumruyla papağanla, tahammülsüz olarak

Dibêjin Şahibazê mest û heyran
Derler mest, hayran olan, yiğitler yiğidi ki

Ji 'eşq û dil dikir wî geşt û seyran
Aşk ile, gönül ile, etmekte seyir, seyran

Gehî wek bilbilan bû ew bi awaz
Bazen bülbül gibiydi, sesiyle sedasıyla

Gehî tûtî dibû wî mehremê raz
Bazen papağan gibi, gizli sırlar içinde

Gehî dinêrî qedê şemsad û 'er'er
Bazen olur, bakardı, şimşir, servi boylara

Gehî yasmîn û hem serw û senûber
Bazen yasemin idi, hem servi, fıstık çamı

Gehî dinêrî ji rengê nergis û gul
Bazen bakınır idi, nergisle gül renginde

Gehî xettê binefş û ce'dê sinbil
Bazen menekşe hattı, sümbülün kıvrımları

Gehî dinêrî li qedê şeng û nesrîn
Bazen bakar boyuna, salkımsöğüt, nesrine

Gehî lêmon û bih narincê şîrîn
Bazen de limona o, hem tatlı narençlere

Diborand rozîgarên ‘aşiqane	*Geçirirdi böylece, âşıkça vakitleri*
Ji nageh dît hatî xaibane	*Ansızın görüverdi, gelmekteler sinsice*
Ji serwehşan dibên qewmê libasan	*Domuzdan kafalılar, derler Libaslar kavmi*
Du yarê Şahizade girt bi asan	*Kolayca zapt ettiler, Şehzadenin iki arkadaşını*
Hilanîn û birin ew şibhê hêsîr	*Alıp da götürdüler, esirler gibi onları*
Li paşan hatne pê Şehzadeyê mîr	*Arkasından geldiler, Bey Şehzade izine*
Revî Şehzade lê du kes ji serwehş	*Şehzade kaçtı ancak, iki domuz kafalı*
Bi nêzîk bûn ji Mîrê mest û mehweş	*Yaklaştılar mest düşmüş, ay yüzlü Beye doğru*
Dibên Şehzade dest da şûr û xençer	*Derler kılıç, hançere, el uzattı Şehzade*
Bi du derban kirin herdu bi du ker	*Etti iki darbeyle, iki lime onları*
Li paşan xweş revî û ma bi tenha	*Sonra kaçtıkça kaçtı, kaldı yalnız başına*
Li hev xistin çiya û deşt û sehra	*Ardı sıra bıraktı, dağla ova, çölleri*
Heta sê roj û sê şev bû temame	*Toplam üç gün, üç gece, tamam olduğunda o*
Bi çolê da diçû ew bê te’ame	*Çölde yürüyüp gitti, yiyeceksiz olarak*
Nezer kir şahibazê sînesade	*Baktı yürekli yiğit, gönlü temiz Şehzade*
Ji ber xwe dît rêyek xoş û cade	*Gördü tam karşısında, güzel, büyük bir yolu*

Ji destê rastê rê çû ew şîrînsur[83]	*Yürüdü sağ yanından, o şirin tabiatlı[83]*
Ji dûr da dît şehrek bê ‘eded pur	*Uzakta bir şehri ki, gördü fazlaca büyük*
Çû şehrê dît merdumê zişt-rûçik	*Gitti o şehre baktı, ehli çirkin suratlı*
Cesed însan welê ser şibhê kûçik	*Bedenleri insandı, lakin kafa it gibi*
Wekî serkûçikan dîn Mîrê çun mah	*Görünce it kafalı, ay yüzlü parlak Beyi*
Dibên girtin hilanîn birne pêş şah	*Derler ki götürdüler, Şahlarının yanına*
Di qesrek xas de şahane zerkeş	*Özel bir köşk içinde, yaldızlı ve şahane*
Ji pêş Şahî danîn Mîrê mehweş	*Ay yüzlü Şehzadeyi, koydular Şah önüne,*
Nezer kir Şahibazê mest û pirxem	*Baktı yiğitler başı, mest ve pür gam olarak*
Li ser text dî yek ji ewladê Adem	*Gördü tahtın üstünde, Âdemoğlu birini*
Bi sef sef sekinîn bêhed sekser	*Saf saf dizilmiş idi, sayısız it başlılar*
Mûtî’ û dest li ser destan beraber	*İtaatkâr idiler, elleri üst üstteydi*
Temenna bû ji ber Mîrê serefraz	*Saygıda bulundular, Şehzadeden dolayı*
Welê şeh kir ji wî ra gelek i’zaz	*Ancak Şahları etti, çokça izzet ve ikram*

[83] Şaîr, li vir balê dikşîne ser têgeha “destê rast” ya kevneşopî ya İslamî ku ji bo serzimakirina wateya “xêr”, “yom” û “kamranî”yê îfadeyek sembolîk e.

[83] Şair, “sağ yan” vurgusuyla, İslâmî gelenekteki “sağ” kavramına dikkat çekmektedir. Bu da “hayır”, “uğur” ve “saadet” için kullanılan sembolik bir ifadedir.

Bi emrê Şah textek pirr ji gewher	*Emriyle Şahlarının, çok cevherli bir tahtı*
Dibên danîn miqabil Şeh beraber	*Derler Şah karşısına, getirip de koydular*
Çû ser text Şahibazê Misr û Şame	*Oturdu taht üstüne, Mısır, Şam'ın yiğidi*
Bi emrê Şeh li ber danîn te'ame	*Bıraktılar önüne, Şah emriyle yiyecek*
Emanet ku ji bo te hat mêhman	*Nasihatimdir sana, geldiğinde misafir*
Bi te'cîl bîne ber tu av û hem nan	*Acilen getiresin, önüne suyla ekmek*
Dilê birçî bî ew têr ke ji te'ame	*Aç olan gönlünü sen, doyurasın yemekle*
Li paşan tu bike pirs û kelame	*Ardından sormalısın, giriver söz, sohbete*
Me'elqisse, dibên Mîrê Xwedênas	*Özetle Şehzade ki, o Allah'ı tanıyan*
Li ser xwanê zerîn dî durr û elmas	*Altından sofrada o, gördü, inciyle elmas*
Firaq û tas û temsî cimle yekser	*Kap kacak, tasla tepsi, tamamı baştan başa*
Ji le'l û şebçirax û yaqût û gewher[84]	*Lâl ile şebçerağdan, yakut ile cevherden[84]*
Ji ewwel xwarinê got, "Bismillah"	*Yemeğe başlamadan, deyiverdi, "Bismillah"*
Wekî têr xwar gotî, "Elhemdulîllah"	*Tok olduğunda ise, dedi, "Elhamdülillah"*

[84] "Le'l" û "Şebçirax" du kevirên hêja nin. Ji vanan le'l, kevirekî sor û birqonek e. Di wêjeya dîwanî de, lêvên sor yên serdilkê li vî kevirî tê nolandin. Lê şebçirax, di wateya "çiraya şevê" de ye. Di tariyê şewl dide.

[84] Lâl ve şebçerağ; iki kıymetli taştır. Lâl, parlak kırmızı renkli bir taştır. Divan edebiyatında, sevgilinin kırmızı dudağı bu taşa benzetilir. Şebçerağ ise, "gece çırası" anlamına gelmekte olup gece parlayan bir taştır.

Bi nerm û şirînî Mîrê hunerwer	*Yumuşakça, şirince, o hünerli Şehzade*
Bi Şahê sekseran got, “Ey birader!	*İt başlılar şahına dedi ki, “Ey kardeşim!*
Ji halê te gelek mayîm ‘ecîbe	*Bu durumundan senin, fazlaca hayretteyim*
Dizanim tu wekî min bûy xerîbe	*Bilirim benim gibi, yabancısısın buranın*
Ji ewwel da tu halê xwe bibêje	*Ta baştan itibaren, anlat sen durumunu*
Çira ku qisseta min pirr dirêj e”	*Zira benim hikâyem, fazlasıyla uzundur”*
Çi xoş kir Şahê Sekseran hikayet	*Anlattı öyküsünü, it başlıların şahı*
Ji ewwel halê xwe heta nihayet	*Başından başlayarak, son ana kadar onu*
Got: “Ey yar û birayê min ji Adem	*Dedi, “Ey dostum benim, Âdemoğlu kardeşim*
Hebûm ez îbnu merdê Şahê Belxem[85]	*Belğam Şahı’nın idim, bir adamının oğlu[85]*
Bi bazirganî ez hatim di behran	*Tüccar olarak geldim, denizler yoluyla ben*
Ji nageh hat bayek suxt û baran	*Ansızın esiverdi, sert bir rüzgâr ve yağmur*
Hilanîn gemye û jêk rakirin text	*Devirdi gemileri, söktürdü tahtaları*
Xerq bû mal û ez mam ser yekî text	*Battı tüm mallarımız, kaldım ben bir tahtayla*

[85] “Belxem”, di dîrok an li rûyê erdê cihekî bi vî navî tineye; şop û mayîndeyek xwe nîn e. Xewrojkî ye.

[85] “Belğam”, tarihte ve yeryüzünde izi, eseri olmayan bir yerdir; masalımsıdır.

Li paşan mewc û pêlan ez hilanîm	*Ardından sürükledi, akıntılar, dalgalar*
Li nik bajarê Bozengan deranîm[86]	*Bozengân adlı şehrin, kıyısına bıraktı[86]*
Wekî Bozengiyan dîm şibhê hêsîr	*Görünce Bozengiler, beni esirler gibi*
Hilanîm û birim wan ez kirim mîr	*Alıp da götürdüler, kendi beyi yaptılar*
Ji ewwel qa'ide û qanûnê seksar	*Başta it başlıların, kanunla kuralını*
Dibêjim bo te guh de ey şirînyar	*Anlatayım ben sana, iyi dinle tatlı dost*
Heye sed şehr pirtir milkê Bozeng	*Vardır yüzden ziyade, Bozeng ülkesi şehri*
Hemî serkûçik û pîs û reş û zeng	*Tamamı it başlıdır, pis, kirli, pasaktırlar*
Ji xeyrê ademî naken bi sultan	*Ademoğlundan gayrı, sultanlar edinmezler*
Li ser xwe ew mûtî'ê emr û ferman	*İtaat eder onlar, emrine fermanına*
Ku ew merdî yekî dê bînin ser text	*Ki getirdiklerinde, tahtlarına bir adam*
Diken hakim ji xwe ra bi tali' û bext	*Yönetici kılarlar, şanslı, bahtlı olarak*
Mûtî' dê bin ji emr û nehy û hikmet	*İtaat ederler emre, yasaklarla hikmete*
Diden dest qesr û milk û mal û zewcet	*Köşk, mülk verirler ona, hem mal ile hatunu*
Di ber min hakimê wan bibû merhûm	*Ölmüş benden önceki, hakimleri onların*
Ji bê hakimî ew bûn zêde mexmûm	*Hakimsiz kalmak ile, olmuşlar çok kederli*

[86] "Bozengan", di dîrok û li rûyê erdê bajarekî bi vî navî tineye; şop û mayîndeyek xwe nîn e. Xewrojkî ye.

[86] "Bozengân", tarihte ve yeryüzünde izi, eseri olmayan bir şehirdir; masalımsıdır.

Ku wan ez dîm ji rex behrê hilanîm	*Ki deniz kıyısında, görünce getirdiler*
Bi sultanî li ser vî texti danîm	*Sultan olarak beni, oturttular bu tahta*
Mûtî' bûn ew di fermana me yekser	*Başladılar uymaya, emrime tüm olarak*
Eger bikujim ji wan dused bi xençer	*Hançerle öldürsem de, iki yüzü onlardan*
Me nêrî qesr û milk û mal û metlûb	*Baktım saray ile mülk, hem mal ile arzular*
Di qesrê da me dî yek doxterek xûb	*Gördüm ki sarayda ben, bir de sevimli bir kız*
Me got tu kiy bibêje ey şîrînmeh!	*Dedim ey şirin yüzlü, söyle bana kimsin sen*
Got ez bintê şehî me ku di ber teh	*Dedi ki Şah kızıyım, ki senden öncekinin*
Me anî mahr kir ew ba rizayî	*Onunla kıydım nikâh, rızasını alarak*
Tewekkul xoş me da Barî Xudayî	*Sırtımızı dayadık, yaratıcı Allah'a*
Me got halê xwe bo te endik û pur	*Anlattık halimizi, az-çok olarak sana*
Tu hem halê xwe bibêje ey şîrînsur!"	*Sen de anlat halini, ey tatlı tabiatlı"*
Dibên Şehzade halê xwe beyan kir	*Derler Şehzade dedi, başından geçenleri*
Ji ewwel ta bi axir xweş 'eyan kir	*Başından sonuna dek, açıkladı güzelce*
Gelek bû şahê Sekseran miheyyer	*İt başlıların şahı, fazlaca kaldı hayrette*
Ji Baxê Îrem û Şehbalê serwer	*Hem İrem'in Bağı'ndan, başı olan Şehbal'den*

Ne min dîn û bihîstî qisse ewreng	*Bu tarz bir hikâyeyi ne gördüm ne işittim*
Ji şehrê Belxem û hetta be Bozeng[87]	*Belğam şehirlerinden, ta Bozeng ülkesine[87]*
Hetta wan kir hikayet derd û asîb	*Onlar anlatırlarken, dert, acı geçmişini*
Dibên roj çû nêzîk bû ji mexrib	*Derler mağrip vaktine, gün gelip de dayandı*
Were saqî werîn camê bi fincan	*Gel ve getir ey saki, fincandan kadehleri*
Ku rahet bim ji dest derdan û rencan	*Ki rahat edeyim ben, dertlerden, acılardan*
Di hîna ku bibûsim xweş lebê cam	*Öptüğümde güzelce, kadehin dudağından*
Dilê mehzûn û mest bête serencam	*Mest ve hüzünlü gönlüm, ulaşsın muradına*
Were mutrib bi saz û naye û çeng	*Gel çalgıcı sen de, sazla, neyle ve çenkle*
Bireqsîn qelbê mexmûrê j'mey û beng	*Oynat sen mahmur kalbi, ki mey, benkten ötürü*
Neçit zayi' 'umir ez derd û asîb	*Harcanmasın ömrümüz, dertlerden, belalardan*
Sebahê 'umrî çû nêzîk e mexrib	*Ömrün sabahı geçti, yaklaştı ta mağribe*
Di hîna 'eskerê Mexrib zemînî[88]	*Ne zaman askerleri, Mağrip coğrafyasının[88]*
Bi derket munhezim bo Şahê Çînî	*Yenilgiye uğradı, Çin Şahı karşısında*

[87] Ji bo "Bexam" bnr. têbiniya 103.; ji bo "Bozeng" bnr. têbiniya 104.

[88] "Mexrib", di mêjû de, ji bakurê rojavayê Efrîqayê re tê gotin, Welatê Berberiyan e. (Fas, Cezayîr, Tûnis)

[87] "Belğam" için bkz. 103. dipnota, "Bozeng" için bkz. 104. dipnota.

[88] "Mağrip", tarihte, kuzeybatı Afrika'ya verilen isim. Berberilerle meskûn coğrafya (Fas, Cezayir, Tunus).

Çiya û deşt û sehra bûne zengî
Zencilerle doldular, dağ, ova ile çöller

‘Edem bû şahê Meşriq û Frengî[89]
Yok olup gitti Maşrık, hem Frenklerin Şahı[89]

Bi emrê Şah danîn xwanê zergeş
Emriyle Şahlarının, koydular altın sofra

Di pêş Şah û Mîrê mest û mehweş
Şah ile Bey önüne, ki mest ve ay yüzlüydü

Kebab û nan û neql û şîr û şeker
Kebap ile ekmeği, dönerle süt, şekeri

Firaq û tas û temsî, durr û gewher
İnci ile cevherden, kap kacak, tas, tepsiyi

Li paşê xwarin xoşab û rûmman
Ki ardından içtiler, hoşafla nar suyunu

Di dîwanê gerandin mey bi fincan
Divanda gezdirdiler, fincanla içkileri

Wekî mey xwarî Şah û Mîrê mehweş
İçtiklerinde içki, Şah ile ay yüzlü Bey

Digel ehlê dîwanê bûne serxweş
Divan ehliyle onlar, sarhoş olup gittiler

Dikir Bozengiyan nalîn wekî çeng[90]
İnliyordu Bozengler, çenk aleti misali[90]

Li ser ‘erdê didan pê hing û hey hing
Tepinip dururlardı, gümlüyordu ayaklar

Ku şewqê mey li ser wan bû texellib
Ki galip geldiğinde, onlara şarap aşkı

Dibên Şehzade pirr ma der te’eccib
Derler Şehzade kaldı, fazlaca hayretlerde

---

89 “Meşriq”, beşek ji rojhilata navîn e ku erdnîgara di navbera Derya Spî û İranê de ye.
“Freng/Frank” an “Frengîstan/Welatê Frankan”; gel û cografyaya rojava û başûrê Ewrûpayê ye ku ev nav ji hêla Ereb û İraniyên Misilman hatiye dayîn.

90 Ji bo “Bozengiyan” bnr. têbiniya 104. “Çeng/çenk”; amûrekî mûzîqê yê bi têl e; di hembêzê de bi awayekî rep tê lêxistin. Di navbera 14-35an têlê wê henin.

89 “Maşrık”, Akdeniz-İran arasında yer alan Ortadoğu coğrafyasının bir bölümü.
“Frenk/Frank” ya da “Frengistan/Frankların Ülkesi”; Müslüman Araplarla İranlıların Batı ve Güney Avrupa halkına ve coğrafyasına verdikleri isim.

90 “Bozengler” için bkz. 104. dipnota.
“Çenk/Çeng”; kucakta dik tutularak çalınan telli bir müzik aletidir. İki el ile çalınır. 14-35 arasında değişen tel sayısı vardır.

Direqsîn û dikir wan nale û zar	*Dans edip dururlardı, ağlayıp sızlarlardı*
Ji şewqa mestiyê mey cimle Seksar	*Sarhoşluğun aşkından, bütün it kafalılar*
Dibêjin yekê Bozeng bê xeberdan	*Derler Bozengîlerden, biri sessiz sedasız*
Di nêv dîwanê seknî wek şemi'dan	*Divanda bekledi o, tıpkı bir mum misali*
Çira danî li ser xwe wî bi bê xem	*Koydu başına çıra, gamsızca, tasasızca*
Hetta şemsê tulû' da cimle 'alem	*Ta güneş tüm dünyayı, aydınlatıncaya dek*
Wekî dinya bi şemsê bû minewwer	*Aydınlanınca dünya, güneşin doğuşuyla*
Bi iznê Şeh dibên Mîrê dilawer	*Derler ki Şah izniyle, yiğit yürek Şehzade*
Ji qesrê ew bi derket mest û heyran	*Saray dışına çıktı, mest ve hayran olarak*
Ji bo 'ezmê temaşa geşt û seyran	*İstedi seyretmeyi, biraz gezmek, dolaşmak*
Didîtin wî di şehrî da 'ecaib	*Görüyordu şehirde, acayip tuhaf şeyler*
Gelek enwa'ê mexlûqê xeraib	*Garip yaratıklardan, çok sayıda türleri*
Hetta çû dît merdek Ademiyê kal	*Derken gidip de gördü, yaşlıca bir insanı*
Dibên Lahîd nam bû 'umir sed sal	*Derler ki adı Lahid, yüz idi yaşı onun*
Got, "Ey Lahîdî nam ê dilminewwer	*Dedi, "Ey namı Lahid, aydın gönüllü kişi*
Dizanî tu mekanê durr û gewher	*Biliyor musun acep, inci, cevher yurdunu*

Digel min tu were da biçîn Xwedênas	*Gel gidelim birlikte, ey Allah'ı bilen kişi*
Temaşe keyn durr û yaqût û elmas"	*İzleyelim ikimiz, inci, yakut, elması"*
Dibên Lahîd rabû ba dilawer	*Derler ki Lahid kalktı, yürekli Şehzadeyle*
Bi şadî çûne kohê durr û gewher	*Sevinç ile gittiler, inci, cevher dağına*
Yekayek Şahizade durr û elmas	*Birer birer Şehzade, inciyle elmasları*
Hilanîn lêk Lahîdê Xwedênas	*Topladılar birlikte, Allah dostu Lahid'le*
Got wan, "Bavêje wan qîmet ti nîn e	*Dedi onları, "At sen, onları yok değeri*
Tu wer ya qenc ji vî 'erdê hilîne"	*Geliver sen buraya, buradadır iyisi"*
Dibên Şehzade çû cewher ji sed reng	*Derler Şehzade gitti, yüzler çeşit cevherden*
Hilanîn û birin pêş Şahê Bozeng	*Toplayıp da götürdü, Bozeng Şahı'nın önüne*
Wekî Şeh dît ewreng durr û gewher	*Şah görünce bunları, bu tarz inci, cevheri*
Got "Ey yar û bira şîrîn dilawer	*Dedi, "Ey dost ve kardeş, ey tatlı yiğidim sen*
Çiqas te divê hilîne tas û temsî	*Ne kadar istersen, alwer tas, tepsiden*
Te'eccib jê bimînin cin û insî"	*Ondan kalsın hayrette, insanlar ve de cinler"*
Mihessel, ta du sal û nîv temame	*Kısacası, toplamda, tamam oldu iki yıl*
Li nik Şeh ma emîrê Misr û Şame	*Kaldı Şah'ın yanında, Mısır, Şam'ın emiri*

Jibîrkir rencê rah û mihnet û derd	*Unuttu zahmetleri, yol, eziyet, dertleri*
Ji dil kêşa ji nageh ahekî serd	*Ansızın soğuk bir ah, yüreğinden yükseldi*
Çira û meş'ela 'eşqê ku hil bû	*Ki gürleşince aşkın, çırayla meşalesi*
Dilê Şehzade pirr çewsan û kul bû	*Yüreği Şehzadenin, çok sıkkın, yaralandı*
Nema taqet ji 'eşqê Mîrê mehcûr	*Takati kalmamıştı, aşkından Şehzadenin*
Ji Şahê Sekseran xoş xweste destûr	*Hoşça izin istedi, it kafalılar şahından*
Dibên Şeh dan bo wî çend durr milemme'	*Derler Şah verdi ona, birkaç parlak inciden*
Li paşan espek û zînek miresse'	*Ardından verdi bir at, süslenmiş eyeriyle*
Bi wî bexşîn du mêrê ademîreng	*Ayrıca bağışladı, insansı iki adam*
Emanet bî li esp gel mîrê Bozeng	*Ata baksın diye de bir de Bozengli bir bey*
Tewekkil da Xwedawend Şahizade	*Allah'a teslim ile, hazırlandı Şehzade*
Li paşan dane ber xwe rêy û cade	*Sonra kattı önüne, yolları, caddeleri*
Heta ew çûn bi serhedê wilayet	*Ta ulaşınca onlar, ülkenin hududuna*
Li paşan mîrê Bozeng 'erdê xizmet	*Bozengli bey saygıyla, sundu ona hizmetler*
Dibên bûsî serê espê kirî bend	*Derler ki öptü başını, tuttu eliyle atı*
Li paşan bû piya Şahê xiredmend	*Ardından indi ondan, anlayışlı Şehzade*

Vegerya mîrê Bozeng Şahizade
Bozeng beyi geriye, döndü ancak Şehzade

Digel yaran diçûn ser rêy û cade
Durmadı dostlarıyla, yol ve cadde gittiler

Dibên Şehzade û herdu hevale
Derler Şehzade ile, diğer iki arkadaş

Tewekkil dane Şahê Zilcelale[91]
Güvenle dayandılar, Celal Sahibi Şah'a[91]

Li ser derd û bela û mihnet û rah
Dert ve bela üzere, zahmet, yol çilesiyle

Dibên Şehzade kir ez dil yekî ah
Derler ki ta yürekten, çekti Şehzade bir ah

Bibîrket Se'dê şahîn û Perîzad[92]
Hatırladı o birden, Sad'la Peri Kızını[92]

Ji dil kir nale û zarîn û feryad
Ta yürekten inledi, ağladı feryatlarla

Li paşan Şahizade dil be Ellah
Ardından ki Şehzade, Allah ile gönlünü

Dibên xoş kir digo, "Elhemdulillah!
Derler iyi etmişti, derdi, "Elhamdülillah!

Xwedaya! Qadir û Rebb û Rehîm î
Ey Allah'ım! Kadir'sin, hem Rab ile Rahim'sin

'Elîm û Besîrî yû Kerîm î"
Alim ile Basir'sin, hem Kerim olan Sensin"

Mihessel, hersê çûn hetta bi behrê
Özetle, gitti üçü, ta denize vardılar

Muhîtî ew gehiştin şibhê Bedrê[93]
Çok genişti, oraya, Bedir gibi doğdular[93]

---

91 Mebest ji "Şahê Zilcelal" Cenabê Yezdan e.

92 Mebest ji "Perîzad"ê, Bedîulcemal e.

93 Ji "Bedr"ê mebest, rewşa heyvê ya çardeşevî ye.

---

91 "Celal Sahibi Şah"tan maksat, Cenab-ı Allah'tır.

92 "Peri kızı"ndan maksat, Bediülcemal'dir.

93 "Bedir", ayın on dördün hâli; dolunay.

Dibên Şehzade û herdu hevalan
Digeryan nav cezîre namê Walan[94]

Derler ki Şehzade'yle, her iki arkadaşı
Dolaşırken adada, ki Valan derler ona[94]

Gelek dîtin di nav tiştên 'ecîbe
Ji xakê zêr û elwanên xerîbe

Gördüler onda hayli, acayip acayip şeyler
Altından toprakları, garip garip renkleri

Wekî 'ud û 'ebîr û darê sendel
Wekî kelban hebûn mûrî mihessel

Utla abir gibisi, hem de sandal ağacı
Özetle, karıncalar, itler kadar büyüktü

Nezer kir Şahibazê mest û dilêr
Ji dûr da hate wan teyrek wekî şêr

Baktı, gördü Şehzade, o mest ve cesur yiğit
Uzaktan gelmektedir, aslan gibi bir kartal

Hilanîn herdu yarê Şah ê derseyr
Dirêjdest wegirtin pençeyê teyr

Kapıp götürdü onun, her iki yoldaşını
O da tuttu kartalın, eliyle pençesini

Hilanîn teyr wan hersê bilind kir
Bi çahvê heybetê mehweş nezer kir

Kartal kaldırwerdi, yükseltti her üçünü
Baktı heybetle ona, ay misali Şehzade

Tewekkil da Xweda û qet'ê umîd
Ji xwe kir wî yû dest ez canê Yurîd[95]

Allah'a güvenerek, kendinden ümidini
Keserek el uzattı, Büyük İradeye o[95]

---

94 Girava "Walan"ê, cihekî xewrojkî ye; di rastiyê de nîn e.

95 Mebest ji "Yurîd", viyana bê qeyd û bend a ku hukimfermayê hemû vîna ye; ew jî vîna Xwedê ye.

94 "Valan" adası, masalımsıdır; gerçekte var olan bir yer değildir.

95 "Büyük İrade"den maksat, bütün iradelere hükmeden mutlak iradedir, yani Allah'ın iradesi.

Ji deryayê mûhît û bahrê tîre
Okyanuslardan aşıp bulanık denizlere

Bi derxistin gihandin yek cezîre
Geçirterek onları, götürdü bir adaya

Ji sed fersex bêhtir teyr ew hilanîn
Yüz fersahtan daha çok, kartal taşıdı onları

Di nava dehlekî pirr darî danîn
İndirdi bir ormana, kaplıydı ağaçlarla

Ku nêzîk bû ji ‘erdê Şahê medhûş
Ki yere yaklaşınca, şaşkın olan Şehzade

Ji sewda û hewayê keft û bêhûş
Sevda ve arzudan, düştü, kendinden geçti

Dibên Şehzade ma lê teyr du yar
Derler Şehzade kaldı, kartal iki dostunu

Birin ser hêlîna xwe ber serê dar
Ağaçta üstünde olan, yuvasına götürdü

Wekî Şehzade hişyar bû nezer kir
Şehzade uyanınca, nazar etti etrafa

Teyr dî herdu hevalê wî bi ker kir
Gördü ki parçalıyor, kartal iki yoldaşı

Ji bo çar têjikên xwe hate pê Mîr
Dört yavrusu için o, döndü Bey'in üstüne

Welê Şehzade dest da ser qebzeyê şîr
Ancak Şehzade hemen, davrandı kılıcına

Dibên carek nezer kir Mîrê dilber
Derler âşık olan Bey, o an bir de ne görsün

Ji bala hate xwarê marek ejder
İnmekte yukarıdan, ejder gibi bir yılan

Ji dengê wî dilerzîn ‘Erş û Kursî[96]	*Sesinden inliyordu, Arş ile hem de Kürsî[96]*
Bi enfasê dikêşa ga û masî	*Çekerdi nefesiyle, öküz ile balığı*
Di hîna teyr dît ew marê ejder	*Kartal ki gördüğünde, ejderha yılanını*
Bi çengalan çûyê mislê xezenfer	*Hücum etti pençeyle, tıpkı bir aslan gibi*
Welê ejder bi enfasê kişand teyr	*Ancak ejder nefesle, çekti, yuttu kartalı*
Ji dinyayê ‘edem kir Şeh dikir seyr	*Kaldırdı bu dünyadan, izliyordu bunu Şah*
Ji pêş Şehzade ejder çû serê dar	*Şehzadenin önünde, ejder çıktı ağaca*
Bi yek loqme ‘edem kir fer’ê her çar	*Tek lokmayla yuttu, yavruların her dördünü*
Li paşan marî çû û geşte me’dûm	*Ardından yılan gitti, gezintiye, kayboldu*
Bi tenha ma Şehê mehzûn û mexmûm	*Kaldı yalnız başına, üzgün, gamlı Şehzade*
Dibên lew baş bi rê da çû heta şew	*Derler iyi yol aldı, ta akşama kadar o*
Ku tarî bû çû ser darek ji bo xew	*Ki gecede tırmandı, uyku için ağaca*
Di xewra çû Şehê xûnxur û ‘aşiq	*Uykuya daldı âşık, yüreği kanlı Şehzade*
Li ser darê heta bû fecrê sadiq	*Ağaçta üstünde kaldı, şafak sökünceye dek*
Wekî bû fecrê sadiq û minewwer	*Şafak sökerek gün ağarınca iyice*
Ji rojê bû dinê, rabû dilawer	*Aydınlandı dünyamız, kalktı yiğit Şehzade*

[96] Mebest ji “Erş” û “Kursî”yê, bi rêya mecazek fişalî, îşaretê “zemîn” û “asîman” e.

[96] Buradaki “Arş” ve “Kürsi”den maksat, abartılı bir mecaz yoluyla, “yer” ve “gök”e işaret edilmiştir.

Bi çolê da meşî ew bê te'ame	*Yürüdü çölün içinde, azıksız ve yemeksiz*
Heta pênc roj û pênc şev bûn temame	*Beş günle beş gecesi, tamam olunca onun*
Dibêjin bûne avek herdu ricleyn	*Derler ki su topladı, her iki ayağı da*
Ji rehtê pirr dihatin abê 'eyneyn	*Bitkinlikten gözünden, damlıyordu bol yaşlar*
Mineqqeş bûn ji xûnê pêy û enguşt	*Kan ile nakışlandı, ayakla parmakları*
Ji birçan mittesil hevbûn zik û pişt	*Açlıktan birleştiler, karın ile hem sırtı*
Ji rehtî yû ji derdê iştiyaqê	*Yorgunlukla beraber, arzuyla aşk derdinden*
Hemî guft înçûnîn qewlên firaqê	*Şöylece söylenirdi, ayrılık sözlerini*
Li paşan gote, "Ey Xellaqê 'Alem	*Ve ardından dedi ki, "Ey Âlemleri Yaratan*
Qedîm û Qadir û 'Ellam û Ekrem[97]	*Sensin Kadim ve Kadir, Allâm ile Ekrem[97]*
Nedarem taqetê azar û mihnet	*Kaldıramam artık ben, eziyet, azapları*
Xusûsen ateş û narê mihebbet	*Hususen ateşini, alevini sevginin*
Eger kirye ji bo min Tu miqedder	*Şayet ki benim için, takdir buyurmuş isen*
Mirad û meqsedê min key miyesser"	*Beni kavuşturuwer, muratla maksadıma"*

[97] "Ellam", yek ji wesfên Xwedê ye; ango "pêzan û agahdarê her tiştî".
"Ekrem", yek ji wesfên Xwedê ye; ango "dayîn û comerdiya wî gelektir e."

[97] "Allâm", Allah'ın sıfatlarından biri olup, "her şeyi bilen" anlamındadır.
"Ekrem", Allah'ın sıfatlarından biri olup, "lütuf ve cömertliği çok fazla" olan demektir.

Ku dû'a kir nezer da mehweş ê Mîr
Ji nêzîk dît miqabil darek incîr

Ki dua ettiğinde, bakındı ay yüzlü Bey
Gördü karşıda yakın, bir incir ağacını

Çû bin darê û têr xwar Mîrê 'aşiq
Di xewra çû heta bû fecrê sadiq

Âşık Bey gitti altına, yedi doyana kadar
Dalwerdi uykuya, gün ağarıncaya dek

"Îlahî! Tu şeva reş key minewwer
Ji bêhnê xoş dimaxê key mi'etter

Dedi ki "Ey Allah'ım, aydınlat gecemizi
Kuşat beynimizi, hoş kokular ile

Were saqî werîn camê mey û xemr
Hilatin bo me huş û taqet û sebr

Gel ey saki, getir sen, şarapla içki camı
Kalmadı bizim için, akıl, takat ve sabır

Bibûsim ku lebê camê şerabê
Ji mijda wesletê bibihim cewabê

Öpeyim dudağından, şarap kadehinin ben
Müjdesiyle vuslatın, alayım cevabımı

Were mitrib bi saz û çeng û nayê
Dilê mest bête ber reqs û semayê

Gel ey çalgıcı sen de, sazın, çengin, neyinle
Kaldır raksa, semaya, mest düşmüş gönlümüzü

Ji awazê ney û çeng û ribabê
Ji ber wesla hebîban de cewabê

Neyle çengin sesinden, hem rübap sedasından
Cevap ver sevenlerin, vuslatıyla ilgili

Li ser xwe go, veger ya Şahê meşrîq
Ji etrafan 'esakir bûn bi tefrîq

Üzerine dedi o, dön ey doğunun Şahı
Her taraftan askerler, gelmekteler gurupla

Ji pa ra tên Şehê Şerq û Frengî	*Geriden geliyorlar, Doğu'yla Frenk Şahı*
Bi mexreb da revîn Hindî yû Zengî[98]	*Batıya doğru kaçtı, Hintlilerle Zenciler[98]*
Digel fecrê ku rabû Şahê mexmûr	*Fecirle ile birlikte, kalktığında mahmur Şah*
Ji etrafan dinêrî nêzîk û dûr	*Bakındı etrafına, yakın ve uzak yerlere*
Mi'ella dît qesrek, çû kir û qest	*Gördü yüksek bir saray, gitmek istedi ona*
Ku nêzîk bû ji qesrê Şahê sermest	*Ki yaklaştı saraya, kendisinden geçmiş Şah*
Li ser ta pê li bin dîn sîm û hem zer	*Baştan başa gördü ki, gümüşten, altındandır*
Ji wê qesrê misala qesrê Qeyser	*Benzeriydi o saray, Kayser sarayı gibi*
Bilind bû bê 'eded ew qesrê şahî	*O şahane saray ki, fazlasıyla yüksekti*
Mineqqeş dergehek tê dîte mahî	*Gördü onda bir mekân, nakış nakış işlenmiş*
Ji etrafan dinêrî Şeh nedî kes	*Etrafına bakındı, Şah görmedi kimseyi*
Ji wehş û teyr û mar û cin û hem ins	*Ne domuz, kartal, yılan, ne de cin ile insan*
Tewekkil da Xwedawendê Mezin, Mîr	*Tevekkülle yöneldi, Yüce Allah'a Bey*
Ji kalanî kişand elmasê şimşîr	*Kınından çekiverdi, elmastan kılıcını*

[98] "Zengî"; sedem ku bi Hindiyan re hatiye serlêvkirin, di wateya zenciyên parzemîna Efrîqayê de ye. Nexû, divê di wateya "zengî"yên ku bi qilêr û zengara laşên xwe bûnin mijara vê destanê neye famkirin.

[98] "Zenci", şiirin orijinaldeki "Zengî"nin karşılığıdır. Burada, Hintlilerle birlikte zikredilen "Zenciler" gerçek Kara Afrika'sındaki zencilerdir. Daha önce bahsi geçen masalımsı kara, kirli/pasaklı "zenciler" değildir.

Fetih kir dergehê qesrê mi'ella	*Açtı kapısını, yüksek sarayın*
Bi ser ket nerdiwanên zêde e'la	*Tırmandı merdivenden, fazlasıyla yüksekti*
Ji ber xwe dît qesrek xoş û dilber	*Karşıda gördü bir köşk, güzel hem de çekici*
Ji misk û 'enber û 'udan mi'etter	*Kokardı misk kokusu, hem de amber ile ut*
Zêrefşan û mineqqeş bû mirebbe'	*İşlenmişti dört yandan, altınla, nakışlarla*
Ji le'l û şebçirax û durr milemme'[99]	*Lal taşıyla inciden, gece parlayan taştan[99]*
Ji her çar rukneha yek textê zîba	*Dört rüknüne konulmuş, süslü, güzel birer taht*
Tê danî bû firaş ez xez û dîba[100]	*Sergilerle döşenmiş, gaz beziyle ipekten[100]*
Misewwer bûn ji sed reng dar û dîwar	*Resimlerle süslüydü, yüzler ağaç, duvarlar*
Hebûn tê da ji new'ê cimle etyar	*Vardı onlar içinde, kuşların tüm çeşidi*
Wekî tûtî û qumrî, kebk û bilbil	*Papağan ile kumru, keklikle bülbül gibi*
Çu tawûs û keboterha bi xilxil	*Kaynaşıp dururlardı, tavusla güvercinler*
Çu 'uşşaqan dikir wan nale û zar	*Âşıklar gibi onlar, inleyip ağlarlardı*
Miqeffes bûn mi'elleq ew bi dîwar	*Kafesteydiler tümü, duvarlarda asılı*

[99] Peyva "Şebçerax" tê wateya "Kevirê ku bi şevê diçirûse, kevirê dibiriqe." Ji bo "lal" û "şebçerax" bnr. têbiniya 102.

[100] "Xez", cawê tenik û kitanî yê qenewçe ye ku li Gazeyê tê hûnandin. Jê re "Cawê Gazeyê" jî tê gotin.

[99] "Gece parlayan taş"tan maksat "Şebçerağ" olarak bilinen taştır. Lal ve Şebçerağ için, bkz. 102. dipnota.

[100] "Gaz bezi", Gazze'de dokunan ince ve çok seyrek keten bez. "Gaz bezi" olarak da bilinir.

Hebûn tê da çihil pencere û der	*İçinde kırk pencere, hem de vardı kırk kapı*
Temam ez şebçirax û durr û gewher	*Tamamı şebçerağdan, inci ile cevherden*
Miheyyer bû te'eccib Şeh nedî kes	*Hayretteydi Şehzade, garipti, kimse yoktu*
Miqabil dîtî yek perdeh ji etles	*Gördü o karşısında, atlastan bir perdeyi*
Hilanî perde Mîrê mest û mehweş	*Kaldırdı o perdeyi, ay yüzlü mest Şehzade*
Mixelleq dît yek dergeh mineqqeş	*Gördü süslü bir mekân, kilitli, kapalıdır*
Be bê mifte fetih kir ehsenellah	*Allah ki denk getirdi, kilitsiz açtı onu*
Bi hindir keft û go "Nesrun minellah"	*"Nasrun minellah" dedi, içeri dalwerdi*
Nezer kir dît yek textê miresse'	*Baktı gördü, süslü bir taht durmakta*
Ji le'l û şebçiraxan bûn milemme'	*Pırıl pırıl parlıyor, lal ve şebçerağ taştan*
Li ser dît dilberek razayî medhûş	*Gördü onda yatıyor, ürkek halde bir dilber*
Şîrîn û mehweş û sîmîn binagoş	*Tatlıydı, ay yüzlüydü, kulak memesi gümüş*
Letîf û nazik û mehbûb û dilgeş	*Hoştu ve de nazikti, sevgili, gönül çeken*
Xumar û mest û dildar û perîweş	*Sarhoştu, mest düşmüştü, sevdalı, peri yüzlü*
Cebînbedr û du ebrû qewsê tarî	*Alnı dolunay gibi, kaşı siyah yay gibi*
Siyehzilf û çeşimmest û xumarî	*Zülüfleri siyahtı, gözleri mest ve sarhoş*

Şekerxa leb dihenxonçe du bistan	*Dudakları şekerdi, ağzı gonca ve göğsü*
Çu narinc û bi qed serwê gulistan	*İki portakal gibi, boyu gül servisiydi*
Li ser wechan bû desmalek mineqqeş	*Yüzü üstünde vardı, süslü, güzel bir mendil*
Dibû qelbê ‘uşşaqan jê mişewweş	*Sersem olurdu bundan, âşıkları kalpleri*
Selam kir jê Şehê ‘alîcenabe	*Selam verdi Şehzade, o yüksek ruhlu kişi*
Nedayî wê mehê esla cewabe	*Cevap vermedi asla, ona ay yüzlü güzel*
Li ser dêmê hilanî Şah desmal	*Kaldırdı yanağından, Şehzade o mendili*
Li ser wechan xûya bûn zilf û hem xal	*Yüzünün üzerinde belirdi, zülüf ile benleri*
Wekî kafûr û werd û misk û ‘enber	*Kâfur ve gül gibiydi, hem miskle, amber gibi*
Dîmaxê Şeh ji bêhnê bû mi’etter	*Mest oldu Şehzade beyni, kokusuyla güzelin*
Bi destan girt hejand Şahê şîrînsurr	*Şirin tabiatlı Şah, tuttu, salladı onu*
Nebû hişyar ji xwabê xwe şirîndurr	*Uyanmadı uykudan, o inci tatlısı kız*
Di ber guhan bi deng gazî kirî Şeh	*Kulakları dibinde, Şah seslice çağırdı*
Nebû hişyar ji bêhûşî şîrîn meh	*Uyanmadı uykudan, sersemlikten şirin ay*
Te’eccib ma gelek Şahê xudanbext	*Hayrette kaldı çokça, bahtlı Şehzade*
Nezer kir dî, yekê pace, yekî text	*Baktı, gördü bir tahta, var pencere içinde*

Ji asin wê nivîsayî du sê xet
Demirden yazmıştır o, iki-üç satır yazı

Ji wî rengê nivîsan Şeh nedî qet
O tarz yazıdan asla, görmemişti Şehzade

Dibên çu text deranî ku bixwîne
Derler okumak için, gitti aldı tahtayı

Çû cihek rohnî sirrek jê hilîne
Gitti aydınlık yere, ta alsın ondan bir sır

Wekî Şehzade text dûr kir ji pacê
Uzaklaştırınca Şehzade, tahtayı pencereden

Hilanî ser mehê gerden ji ‘acê
Kaldırdı başını o, gerdanı fildişi gibi olan ay

Nezer kir Şeh nexwendî hêj mektûb
Şehzade ki baktı, okumadan henüz yazıyı

Ji xew rabû mehê dildar û mehbûb
Uykudan uyandı ay, gönül vermiş, sevgili

Miferreh text danî paceyê mehweş
Sevinçle o tahtayı, bıraktı pencereye

Ku qesd kir dît mehbûb kefte bêheş
Gördü ki ay yüzlü, yine geçti kendinden

Go hey hey ey ‘ecêb xwe jê kirin bend
“Hey hey, ne acayip!” dedi, kesti ipleri

Bi wî textê ji wê mehbûbê dilbend
O tahtadan, o sevdalı güzel sevgiliden

Hilanî text dûr kir wî ji qesrê
Tahtayı aldı attı, uzaklaştırdı saraydan

Ji xew rabû çeleng mehbûbê ‘esrê
Uykudan hemen uyandı, asrın o sevgilisi

Nezer kir dît Şahê Misir û Şame
Baktı, gördü o anda, Mısır’la Şam Şahını

Mehê enwer ji Şeh xoş kir selame
Parlak Ay, Şehzadeye, verdi güzel bir selam

Selam istand Şah û halê pirsî	*Şehzade aldı selamı, sordu onun halini*
Go ey dilber tu cin î yan e ins î?	*Dedi ona, "Ey dilber, insan mısın, cin misin?"*
"Feqalet innenî min neslî Adem[101]	*Dedi, "Ben neslindenim, muhakkak ki Âdem'in[101]*
Welê tu kiyî bibêj ey yarê hemdem?	*Ancak sen kimsin söyle, ey canciğer arkadaş*
Çi rengî tu gehiştî vî mekanî	*Ne şekilde geldin sen, ulaştın bu mekâna*
Bi behran hatî yan abê tu anî?	*Denizlerle mi geldin, yoksa sular ile mi?"*
Cewab dayê Şahê mexmûr û bengî,	*Cevap verdi Şehzade, o mahmur, tutkulu bey,*
"Ji neslê Adem im min her we rengî	*"Âdem'in soyundanım, tıpkı senin gibi ben*
Welê halê xwe tu bo min bibêje	*Ancak anlat sen bana, halini, durumunu*
Çira ku qisseta min pirr dirêj e"	*Çünkü benim hikâyem, fazlasıyla uzundur"*
Bi nermî zehreyê bo me xeber da	*Yumuşakça anlattı, o çiçek benim için*
Welê ez dil du sed ah û keser da	*Ancak yürekten etti, yüz ah ile yüz keder,*
"Du xuşk bûn em keçê Şahê Serendîb[102]	*"Biz iki kız kardeş idik, kızları Serendip Şahı'nın[102]*
Di baxê şahî da bê derd û asîb	*Yaşardık Şah bağında, dertsizce, tasasızca*

[101] Ev rêzik, Erebî ye; wateya wê, "Got belê j'neslê wî me, bê guman yê Adem im"

[102] "Serendîb", bêjeyek bi zimanê Hindî ye ku li başûrê Hindistanê, di nav Deryaya Hindî de, ji bo girava "Seyland"ê tê bikaranîn.

[101] Bu mısra şiirin orijinalinde Arapça olarak geçmektedir.

[102] "Serendip", Hintçe bir sözcük olup, bu kıtanın güneyinde, Hint Okyanusu içinde yer alan "Seyland" adasını ifade etmektedir.

Dikir seyran û reqs û ‘işqebazî	*Gezinip gülüşürdük, raks edip oynaşırdık*
Ji nageh serserê bayê mecazî	*Ansızın serseri, mecazi bir kasırga*
‘Eceb dijwarî hat tahlî kir seyr	*Acayip şiddetle esti, bozdurdu keyfimizi*
Ji jor da hate me eslaniyek teyr	*Yukarıdan bize geldi, aslan gibi bir kartal*
Di cî da xuşkê ma, lê ez hilanîm	*Bacım yerinde kaldı, ancak beni kaldırdı*
Be bêhûşî li ser vî textê danîm	*Beni baygın getirdi, koydu taht üstüne*
Ku hişyar bûm me nêrî yek dilawer	*Ki uyanınca baktım, karşımdadır bir yiğit*
Miqabil min vewestayî beraber	*Duruvermiş karşımda, benim ile beraber*
Bi min go tu metirs ey yarê sadiq	*Bana dedi ki korkma, ey benim sadık yârim*
Ji dîdarê te me ez dil bi ‘aşiq	*Görünce âşık oldum, ta gönülden ben sana*
Be min xweş ke dilê xwe ey rûh û can	*Var gönlünü hoş eyle, benimle ey ruh ve can*
Ji camê wesletê min noş ke fincan	*Vuslatın kadehiyle, koy fincana iç beni*
Ji bab û dan dilê xwe sar ke ey meh	*Var babayla anadan, gönlünü soğut ey ay*
Ji peryê Qulzemî me ez kurê şeh[103]	*Perisiyim Kulzem’in, hem de oğluyum şahın[103]*

[103] “Qulzem” an “Qulzum”, bêjeyek wateya “behr” de ye. Wek nav, zêdetirîn ji bo “Behra Sor” (Behra Ehmer/Behra Şabê) hatiye bikaranîn. Ji bilî wê, li qeraxê Behra Sor, li nêzî bendera Qeşîrî, ji bajarekî kevnar re jî “Qulzum” hatiye gotin.

[103] “Kulzem” ya da “Kulzüm”, deniz anlamında, daha çok “Kızıldeniz” (Bahr-i Ahmer/Şap Denizi) için kullanılmıştır. Bir de Kızıldeniz kenarında, Kasirî iskelesine yakın antik bir kente de “Kulzüm” denilmiştir.

Cihê peryan e ev qesr û mekane
Ji însanan gelek eb'ed bizane

Perilerin yurdudur, bu saray ile mekân
Fazlasıyla uzaktır, insanlardan burası

Nehin taqet ji bo însanan esla
Ku wasil bin bi vê qesra mi'ella

Asla yoktur insanlar için güç, takat
Ki gelip kavuşsunlar, bu mualla saraya

Çi reng ez 'aşiq im tu jî wisa be
Ji camê wesletê noş keyn şerabe

Ben nasıl âşık isem, sen de öyle âşık ol
Vuslatın kadehinden, içelim biz şarabı

Gehî mest bin ji xemr û bûse û leb
Gehî dilxweş ji zewqê sêbê xebxeb

Bazen mest olalım biz, içki, bûse, dudakla
Bazen gönül hoş olsun, elmasından gerdanın

Çiqasî wî dikir meylê wisalê
Me got bes ke temennayê mecalê

Her ne kadar eylerdi, kavuşmaya eğilim
Biz ona yeter dedik, arzu, istek çabası

Ku bêhed cehd kir wî min nekir meyl
Bi sû hat ew li min got hey "lekel weyl"[104]

Ki sınırsız cehdetti, meyletmedim ona ben
Üstüme geldi dedi, "yazıklar olsun "sana"[104]

Ji wî textê hesin xew kir li min bend
Li cem min rabû çû eyyamekî çend

Uyku ile bağladı beni, bu demir tahtaya o
Yanımdan kalkıp gitti, birkaç günlük süreyle

Li paşan ku vegerya ew perîzad
Ji xwabê mestîyê ez kirme azad

Ardından döndüğü zaman, o peri oğlu
Azat etti beni, sersemlik uykusundan

[104] "Lekel weyl", hevokek Erebî ye; ango "Xebînet li te be!"

[104] Tırnak içindeki ifade, şiirin orijinalinde Arapçadır.

Bi min go ey şîrîn meh hey çi miqdar	*Döndü bana dedi ki, ey tatlı ay ne miktar*
Ji ewwel bêhişyê ta bûyî hişyar	*Sersemliğin üstünden, geçti sen uyanana kadar*
Me go yek sa'et e belkî ku kêmtir	*Dedim ona bir saat ya da ondan da azdır*
Ne tu halen li nik me bûyî hazir	*Değil mi ki sen hala, durmaktasın başımda*
Bi min kenya û go yek meh temam e	*Güldü bana ve dedi, tamtamına bir aydır*
Ku ez çûm û tu bûyî mestê nam e	*Ki gittim buradan, sen oldun uyku mesti*
Te'am anî me xwar û camê weslet	*Getirdi yemek, yedik, sonra vuslat camını*
Bi min da û me da wî camê firqet[105]	*Uzattı verdi bana, bense fırkat camını[105]*
Bi min go dê bibim nêzîk te ey hor!	*Dedi ey huri bana, yaklaşmak istiyorum*
Me go ney here tu j'weslê min dûr	*Dedim hayır, uzak dur, benimle olmaktan sen*
Çiqasî wî ji weslê min dikir cehd	*Her ne kadar azmetti, benimle olmak için*
Me pirtir her ji bu'dê wê dikir cehd	*Fazlasıyla azmettim, ondan uzak durmağa*
Li nik min rabû dîsa ew xiredmend	*Yanımdan kalkıp gitti, anlayışla bir daha*
Heta heyvekî dî xwab me kir bend	*Bir ay daha bağladı, beni uyku bağıyla*

[105] Mebest ji "cam"ê, "îskana meyê" ye; di tesewifê de mecaz e; di wateya "şerbeta mirinê" ye. "Firqet", di wateya "cudabûn"ê de ye.

[105] "Cam"dan maksat, "içki kadehi"dir. Tasavvufta, mecazdır; "ölüm şerbeti" anlamındadır. "Fırkat", "ayrılık" manasındadır.

Muhessel halê min û wê her wisan e
Sözün özü, halimiz, böyleydi benle onun

Ji heyvek carekî dê bit ‘eyane
Ayda bir kez gelirdi, görünürdü karşımda

Didet min xwarinê ez her te’ame
Verirdi bana yemek, her türlü taamlardan

Ji qurb û bu’dê deh sal bûn temame
Yaklaşmak, uzaklaşmak, tamam oldu on sene

Me got halê xwe bo te ey dilawer
Anlattım sana, ben halimi ey yiğit

Tu hem izhar ke sirrê xwe seraser”
Sen de anlat sırrını, baştan ta sona kadar”

Dibên Şehzade go: “Ey raheta min
Şehzade deyiverdi, “Sen ey rahatım benim

Gelek dûr û dirêj e qisseta min
Hikâyem çok uzundur, anlatması çok sürer

Bi rojek qisset nabîtin temame
Bir tek günde hikâyem, bil ki tamam olamaz

Ditirsim bête ew periyê nemmame”
Korkarım geliversin, o arabozucu peri”

Letîfa nazenîn got: “Ey dilefroz
Nazenin güzel dedi, “Ey gönüller ferahı

Ji we’dê hatinê wî mane sê roz
Onun geliş vaktine, daha üç gün var

Bibêje halê xwe tu ey şîrînsurr
Anlat sen durumunu, ey şirin tabiatlı

Ji ewwel ta bi axir endik û pur
Başında sonuna dek, az ya da çok olarak

Xuda Hafiz û Rehman û Rehîm e
Allah Hafız, Rahman’dır, hem odur Rahim olan

Xeffûr û Qadir û Rebb û Kerîm e”
O’dur Gaffur ve Kadir, hem Rab ile Kerim’dir”

Ku derket milhem pirr zewq û hem nehs	*Ki kalpten doğsa ilham, zevkli ya da faydasız*
Dê lahiq bit bi "Mutme'inetunnefs"[106]	*Hedefine ulaşır, 'Mütmainetü'n-nefs'le[106]*
Bi ser dê çîn zelîl û heqaret	*Üstüne yağacaktır, aşağılık, hakaret*
Ji weslê dilberan xoş tê beşaret	*Güzel müjdeler gelir, dilberlere vuslattan*
Dibên Şehzade ewwel ta bi axir	*Derler anlatwerdi, Şehzade baştan başa*
Yekayek, nuktenukte kir bi zahir	*Birer birer her şeyi, açıkladı detaylıca*
Ji 'işqê bintê Şehbal ku xeber da	*Ki haber verdiğinde, Şehbal kızı aşkından*
Dilê wî sed hezar ah û keser da	*Yüreğinden yükseldi, yüz bin ah ile keder*
Wereng kir medhê bintê Şahê Şehbal	*O şekilde övdü ki, Şehbal Şah'ın kızını*
Te'eccib ma gelek ew 'enberîn xal[107]	*Hayret içinde kaldı, o benleri amberli[107]*
Ji firaqê hebîb û Se'dê dilgeş	*Ayrılığından yârin, hem hoş gönüllü Sad'ın*
Dibên Şehzade pirr girya û mehweş	*Derler Şehzade o ay yüzlü, çokça ağladı*
Gulendama hebîba naz û rengîn	*Ay yüzlü, gül endamlı, nazlı, cazip sevgili*
Go ey Şehzade ger ez dem te mizgîn	*Dedi "Ey Şehzade şayet, versem sana müjdeyi*

[106] Bêjeya "mutme'inettunnefs", ji Quranê, îşaretê ayeta 27. ya Sûreya Fecrê ye. Wateya wê, "Tu, ey nefsa ku gihaştiye têrbûn/aramiyê..."

[107] "Enber", bêhnek xweş e ku ji masiyekî bi heman navî tê naskirin tê bidestxistin. Ji bilî wê, ji bo hinek pêzeyên bêhnxweş û dar û kulîlkan jî navekî hevpar e.

[106] "Mütmainetü'n-nefs" ifadesi, Kur'an'da, Fecr Suresi, ayet 27'ye işarettir; mealen, "Sen ey huzura/tatmine kavuşmuş nefis..."

[107] "Amber", aynı isimle anılan bir balıktan çıkarılan kül renkli güzel bir kokudur. Ayrıca, güzel kokulu kimi maddeler ya da ağaçlar/çiçekler için kullanılan ortak bir isimdir.

Ji baxê Îremî û bintê Şehbal[108]	*İrem'in Bağlarından, hem Şehbal'in kızından[108]*
Gelek xêr û sewabe ey şîrînxal"	*Çok hayır, sevap olur, sana ey tatlı benli"*
Dibên Şehzade sê car kir temenna	*Derler Şehzade üç kez, bulundu temennide*
Li ber wê nazenîna xûb û re'na	*O nazenin önünde, o güzel ve sevimlinin*
Bi sed zarî ku bûsî 'erdê xizmet	*Yüz yalvarışla eğildi, öptü hizmet yerini*
Got, "Cana! Tu çi go ey mahê tel'et?"	*Dedi, "Ey canım söyle, ne dedin ey dolunay"*
Xeber da dilberê wek şeker û şîr	*Dilber bildirdi ona, şeker ve süt tadında*
Şekerxa bû çu tutî ew bi teqrîr	*Papağan misaliydi, şeker ağızlıydı konuşmasıyla*
Got: "Ey Şehzadeyê pirr naz û terxîb	*Dedi, "Ey çok nazlı hem, çok arzulu Şehzade*
Bizan sê xuşk bûyîn û em der Serendîb	*Bil ki üç kız kardeştik, Serendip ülkesinde*
Ez im Melke, duwem Bedrê Cemal e	*Biri ben ki Melke'yim, ikinci Bedrecemal*
Sêyem nav wê Bedîa Ba Cemal e[109]	*Üçüncüyü sorarsan, Bediülcemal'dir ismi[109]*
Ez û Bedre ji yek talib û metlûb	*Ben ve Bedre'nin birdi, taleple matlubumuz*
Ridâî bû welê ew peryê mehbûb	*Ancak bizimle aynı sütü emmişti, o sevgili peri*

[108] Ji bo "Baxê Îrem", bnr. têbiniya 59.

[109] Navê "Bedîa Ba Cemal"ê, di beş û rûpelên dahatû de, ji hêla nivîskar ve wek "Bedîulcemal" hatiye nivîsandin. Di rastiyê de ev reng nivîsandin maqûltir e; lewra hem ji ziman re sivik e, hem bilêvkirina wê şêrîntir e. Wek tê zanîn, Bediulcemal, serdilka Seyfulmilûk e ku lehengê destanê ye.

[108] "İrem Bağları" için, bkz. 59. dipnota.

[109] "Bedi'a Be Cemal" olarak geçen isim, destanın ilerleyen bölümlerinde "Bedi'ulcemal" olarak değişmektedir. Biz, şairin ikinci kullanışını esas alarak, çevirinin tamamında "Bediülcemal"i tercih edeceğiz. Zira ikincisinin telaffuzu daha kolay ve daha hoştur. Bediülcemal, destan kahramanı Seyfülmülûk'ün sevgilisidir.

Nebûn bo bab û dayê min çu ewlad
Annemle babamın, olmamıştı başka evladı

Ji xeyrê min ku ew pê bin bi dilşad
Benden gayrı, ki mutlu olsunlar onunla

Ji teqdîrê Îlahî bû bi hemle
Allah'ın takdiri ki annem kaldı hamile

Bi Bedrê maderem hemleş bû kesle
Bedre ile yüklendi, ağırlaştı gittikçe

Hebû babê me baxek zêde cindî
Vardı babamızın, gayet güzel bir bağı

Di nav de çadirê ji dîbayê Hindî
İçinde Hint kumaşından, bir çadır

Vegirtin xoş û perde lê hebûn cift
Kurdular çok güzelce, çift perdesi vardı

Ji kêmxa û qesb hevrêşim û zerbift
Kadife ve ketenden, ipek ve sırmadandı

Bi emrê Şeh çû bax û xîme mader
Şah'ın emriyle gitti, bağa ve çadıra annem

Disotin miskê Çîn û 'ud û 'enber
Yakıyorlardı Çin miskiyle udu, hem amberi

Bi teqdîra Xudayê asimanî
Takdir eylemesiyle, semaların Rabbinin

Heta ku maderem hemlê xwe danî
Nihayet annem, doğurdu çocuğunu

Gelek bû zewq û şadî, keyf û aheng
Arttı zevkle mutluluk, hem keyif, sevincimiz

Ji cam û bade û saz û ney û çeng
Kadehten ve içkiden, sazdan, neyden ve çenkten

Bi teqdîra Xwedê rojekî mader
Allah'ın takdiriyle, günlerden bir gün anne

Bi tenhayî rûniştîbû di çadir
Oturmuştu çadırda, yalnız ve bir başına

Ji nageh dî bi derket mehcebînek	*Gördü ansızın, alnı ay gibi biri geldi*
Letîf û şeng û xûb û nazenînek	*Güzel ve neşeli, sevimli ve nazenin biri*
Qed û qamet wekî serwîxeraman	*Boyuyla, endamıyla, yürüyen servi gibi*
Ji ‘eyban dûr e ez ser ta bi daman	*Ayıplardan uzaktı, başından eteğine kadar*
Selam kir nerm û şîrîn wê ji mader	*Selam verdi anneme, yumuşak ve şirince*
Bi mader bexşî çengek durr û gewher	*Bağışladı anneme, bir avuç inci, cevher*
Selam stand û mader rabû ikram	*Selamı aldı annem, kalktı ikram için*
Gelek kir bo hebîba nazikendam	*Fazlasıyla yaptı, nazik endam güzele*
Bi mader got hebîba şengê wek durr	*Anneme dedi ki o neşeli, inci gibi sevgili,*
Heqqê te ketiye ser me bê ‘eded pur	*“Üstümüze hakkın düşmüş, çok ve sayısız”*
Diya min go boyê mehbûbê mehweş,	*O ay yüzlü güzele, dedi ki annem,*
“Tu cin î, yan e îns î ey perîweş?”	*“Cin misin, insan mısın, yoksa peri yavrusu?”*
Bi nermî go, “Zenê Şehbalê mîr em	*Usulca dedi o, “Karısıyım Bey Şehbal’in*
Kurê Şahê rûxê peryanê Îrem	*Rûh Şahı’nın oğludur, İrem perilerinin*
Heye yek hefte ser darek te’ame	*Bir hafta kadar oldu, bir yemiş ağacında*
Di baxî da me kir bo xwe meqame	*Kendimize bir mekân, kıldık sizin bahçede*

Bi teqdîra Xudayê asimanî
Göklerin İlahının, takdir etmesiyle

Ji rengê te me jê hemlê xwe danî
Senin gibi ben de doğurdum yavrumu

Kerîm xoş kir kerem yek xûbê doxter
İkramı bol Allah'ım, verdi sevimli bir kız

Letîf û nazenîn û mahê peyker
Çok güzel, nazenindir, yüzü tıpkı ay gibi

Di baxê we li ser darê bû mewcûd
Sizin bahçede, bir ağaç üstünde doğdu

Li paşan hatî bêhnê 'enber û 'ûd
Ardından geliverdi, amberle ud kokusu

Dîmaxê min ji bêhnê bû mi'etter
Bu kokular ile, güzel koktu benim beynim

Dizanim bo te jî yek xûb û dilber
Bilirim senin de var güzel, dilber bir kızın

Xuda dayî bi rehmet hem bi teqdîr
Vermiş Allah rahmetle, hem de takdiriyle

Eger destûr bidî dê ez bidem şîr
Şayet izin verirsen, süt içirmek isterim

Diya min da bi dest wê Bedre Xatûn
Annem verdi eline, Bedre Hatun bebeği

Heta têr xwarî şîrê durrê meknûn
Sütünden doyuncaya, içti saklı incinin

Ji wan bistanê wek narincbostan
Onun göğüsleri ki, narenciye misali

Dikir mexmûr û şeyda qelbê mestan
Mahmur, mutlu ederdi, mest düşmüş gönülleri

Li paşan Bedre da destê diya min
Ardından verdi geri, Bedre'yi anneme

Ewê 'ezmê sefer kir, lê diya min
Yolculuğa azmetti, ne var ki annem benim

Go “Ey yar û hebîba hemsera min	*Dedi “Ey arkadaşım, ey yaşıtım, benzerim*
Dikî rabî te şîr da doxtera min	*Kalkmaya niyetlendin, süt verdin sen kızıma*
Heqqê te ketiye ser min yarê dilgîr	*Düştü hakkın üstüme, ey gönül kapan dost*
Dixwazim doxterê te ez bidem şîr”	*İstiyorum kızına, vereyim ben de sütü”*
Perîzadê bi darê da nezerxoş	*Peri kızı ağaca, attı güzel bir bakış*
Cewahirbend ji zêrê yekê dergûş	*Cevherlerle süslenmiş, altından bir beşiği*
Perîrûyên carî xweş ji darê	*Peri yüz cariyeler, onu ağaçtan güzel*
Bi sed nazdarî û naz anî xwarê	*Yüz naz ve naziklikle, indirdiler aşağı*
Bi nerm û şîrînî dan destê dilber	*Yumuşakça, şirince, verdiler annesine*
Hebîba dilrûba da destê mader	*O gönül kapan dilber, verdi annem eline*
Li ser dergûşê bû perdek mineqqeş	*Vardı beşik üstünde, nakşedilmiş bir perde*
Diya min ku hilanî bû mişewweş	*Kaldırdığında annem, birden döndü serseme*
Ji husna wê cemala nazperwer	*Güzelliğinden onun, o naz saçan zarifin*
Semenbû û dilrûba û mahê peyker	*Yasemin kokuluydu, gönül kapan ay yüzlü*
Miheyyer bû xumar û mest û sewda	*Afalladı, sarhoşça, düştü mest ve sevdaya*
Bê sebr û taqet û dilbend û şeyda	*Sabrı, takati gitti, bağlandı, oldu şeyda*

Wekî pişkojê zer bû goyê bistan	*Tomurcuk gibi sarı, oldu göğüs uçları*
Welê bistan wekî narincê bostan	*Ancak yine de göğsü, narenciye gibiydi*
Serê pişkojê da ser xonçeyê gul[110]	*Tomurcuğun ucunu, koydu gül goncası üstüne[110]*
Ji ‘işqan bû xumar û mest bilbil	*Aşktan ötürü oldu, sarhoş ile mest bülbül*
Bi sed naz û tene’um le’lê şeker	*Yüzler nazla, ferahla, şeker misali dudaklar*
Dimêjiya şîr û mey ez hewzê kewser[111]	*Emiyordu süt, şarap, havuzundan Kevser’in[111]*
Wekî têr xwarî şîr wê xonçeyê naz	*İçmeye doyunca, o nazlı gonca sütü*
Hilanî ku bibit wê mehremê raz	*Kaldırdı ki götürsün, o gizli olan sırrı*
Bi sed ‘eşq û mihebbet ew perîzad	*Yüzer aşk ve sevgiyle, o periler kızına*
Diya min bûse da ew kir bi feryad	*Annem verdi bûseler, o ise etti feryat*
Diya min go, “Nedarem sebr û taqet	*Annem dedi, yoktur sabır ile takatim*
Ku ew dildarê nazik bî bi firqet	*Ki ayrılırsa benden, o nazik sevgili*
Eya hemser bihêl da ez bidim şîr	*Ey arkadaşım, dostum, bırak ki emzireyim*
Bidit aram û sebrê canê dilgîr”	*Ta bu kırgın bedene, versin sabır, dinginlik”*

[110] Îfadeyên mecaz yên vê hevokê wiha nin: Mebest ji “pijkoj”ê pêsîrê dayîkê, “xonçe”, devê pitikê ye.

[111] Ji îfadeyên mecaz yên vê malikê, mebest ji “le’lê şeker”, lêvên pitikê yên şêrîn nin; mebest ji “hewzê kewser”, pêsîrê dayîkê yên bi şîr dagirtî nin.

[110] Cümledeki mecaz ifadelerden “tomurcuk”, anne memesi, “gonca” ise bebeğin ağzına işarettir.

[111] Bu beyitteki mecaz ifadelerden “şeker misali laller”den maksat, bebeğin şirin dudakları, “Kevser havuzu”ndan maksat ise, sütle dolu olan anne memeleridir.

Perîrûyê got “Ey dildarê hemdem
Ji derdê firqeta wê tu meke xem

Bi tewfîqa Xwedê wê husnê wek mah
Dê bînim tu bibînî her serê mah”

Diya min go “Eya mehbûbê dilber
Çi nam e wê cemala naz û perwer”

Go, “Navê wê Bedîa Ba Cemal e
Şehê periyan e bintê Şahibal e”

Ku periyê dît diya min pirr dikir cehd
Bi dilxwoşî digel mader dikir ‘ehd,

Serê her mahê dê bêt bi yek hefte
Di baxê da rûnê rûmahî du hefte

Bedîa Ba Cemal a nazperwer
Nehin wek wê di nêv periyan çu dilber

Ku tên baxê me ew dildarê rengreng
Heta heft roj diken pirr zewq û aheng

Peri yüzlü dedi ki, “Ey sevgili arkadaşım
Derdinden ayrılığın, sakın tasa etme sen

Allah’ın yardımıyla, o ay gibi güzeli
Her ayın başında, görmen için getiririm”

Annem ona dedi ki, “Ey sevgili dilber sen
Ne isim verdin ona, o nazenin güzele”

Dedi, “Ona verdim ben, Bediülcemal ismi
Perilerin şahıdır, Şehbal’in de kızıdır”

Kî peri görünce annem, ediyor fazla gayret
Gönül hoşluğuyla o, anneme veriyordu söz,

Her ayın başında o, gelecektir bir hafta
Kalacaktır bahçede, ay yüzlü iki hafta

O Bediülcemal ki, nazlıdır, sevimlidir
Yoktur onun bir misli, perilerden bir dilber

Gelince bahçemize, o renk renk sevgililer
Yedi gün süresince, zevklenip eğlenirler

Xuzî ku ez li wêr bam Şahizade
Keşke olsaydım orda, ey sevgili Şehzade

Sebeb bam ez ji tehsîla mirade
Sebep olabilseydim, muradınıza sizin

Bi tewfîqa Xudê dê ba ye mewcûd
Oluşurdu inşallah, Allah'ın yardımıyla

Ji bo te wesletê dildarê meqsûd"
Senin için kavuşmak, kastın olan aşkına"

Dibên Şehzade go "Ey yarê serxoş
Derler Şehzade dedi, "Ey sarhoş düşmüş güzel

Nizanim rast dibêjî ya ne dilxoş
Bilmem doğru mu dersin, yoksa gönlümü hoş

Dikî tu her bi wan lefzê şekerbar
Ediyorsun sen beni, şeker yüklü sözlerinle

Wekî şîr û şekerha tên te goftar"
Süt ve şeker gibi tatlı geliyor bana sözlerin"

Qesem kir wê mehê bi Ellahu Ekber
Allahü Ekber ile yemin ederek o ay dedi

"Ku sadiq im di qewlê xwe dilawer
"Ey yiğidim kesin bil, doğruyum sözlerimde

Emanet ku te bikujin her be sadiq
Öğüdümdür doğru ol, şayet ki öldürseler

Ji kizbê dûr be tu ey yarê 'aşiq
Ey aşka kapılmış bey, uzak dur sen yalandan

Şerîkê xwe bigir wek qurretul 'eyn
Sahip çık yoldaşına, gözünün nuru gibi

Ku Rebbî got ez im salis şerîkeyn[112]
Ki Allah demiştir ben, üçüncüsüyüm onların[112]

---

[112] Li vir, helbestvan balê dikşîne ser hedîsek qudsî ya Cnb. Pêxember. Xwedê wiha diferme: "Kesek, heta ji şirîk û rêhevalê xwe re xaîntiyê meke, ez hevalê wan ê sêyemîn im (alîkar û parêzvanê wan im). Lê heger yek ji wan xaîntiyê bike, ez ji navbera wan derdikevim; wan bi serê xwe dihêlim." (Ebû Dawid, Biyû', 26)

[112] Şair, burada, Hz. Peygamber'in bir kudsi hadisine dikkat çekmiştir. Allah şöyle buyurmuştur: "Biri arkadaşına (yoldaşına) hainlik etmediği müddetçe, ben o iki ortağın üçüncüsüyüm (onlara yardım eder, onları korurum). Ama onlardan birisi hainlik ederse, ben aralarından çekilirim." (Ebû Davud, Büyu', 26)

Di hîna rastê hev bên rûyê sadiq
Mi'eyyen şuxlê wan rast tîne Xaliq"

Ne zaman birbirine, rastlarsa dürüst yüzler
Kesin, Allah onların, işlerini düzenler"

Me'elqisse, dibên Şehzadeyê Mîr
Bi doxter got, "Nizanî qet çu tedbîr?

Özetle, diyorlar ki, Bey Şehzade o anda
Kıza dedi, "Var mıdır, bildiğin bir tedbirin

Xilas bin em ji wî periyê bi qewwet
Xudancah û meratib û bi şewket"

Ta kurtulabilelim, o kuvvetli periden
Ki makamla, mertebe, iktidar sahibidir"

Hebîbê got, "Çi tedbîr kem dilara
Ku canê wî heye der qe'rê derya"

Sevgili kız dedi ki, "Yok tedbir gönül süsüm
Ki onun ruhu yaşar, ta deniz diplerinde

Dibên Şehzade pirr girya û pirr xem
Gelek bû go, "Û ey dildarê hemdem

Derler ki çok ağladı, hem gamlandı Şehzade
Çok zaman sonra dedi, "Ey gönülden arkadaş

Rihê periyê çi rengî ye di behrê
Bibê bo min tu ey enwarê bedre"

Denizde ne renktedir, ruhu acep perinin
Söyleyiver bana sen, ey dolunay ışığı"

Letîfa nazika mi'enberamîz
Çu tûtî bû şekerxa û şekerrîz

"O hoş ve nazik güzel, hem de amber kokulu
Tıpkı dudu gibiydi, ağzı, dili şekerli

Me got rojek, "Çi cî ye ev besît e"
Bi min got periyê, "Deryayê muhît e"

Dedim bir gün periye, "Bu nasıl yer, kolay mı"
Dedi bana o peri, "Okyanustur burası"

Ji vî ‘erdê me pirsî jê bi asan	*Soruverdim ben ondan, bu yeri de rahatça*
“Çi miqdar rê be bo cin û însan”	*“Yolu ne kadar sürer, cinle insanlar için”*
Go, “Însan qet nikarin ger şev û roj	*Dedi, “İnsan gelemez, şayet gelse gün boyu*
Heta sed sal bîn, lê cinn sê roj”	*Ancak yüz yılda varır, cine ise üç gündür”*
Me got “‘umrê perî dibît çi miqdar”	*Dedim, “Ömrü perinin, ne miktar devam eder”*
Got, “Heft sed sal temam diçîn bi ejmar”	*Dedi, “Ömrü saymakla, yedi yüz sene sürer”*
Ji rihê wî ku min pirsî xezeb kir	*Ki ruhundan sorunca, öfkeyle gazap etti*
Bi sû hat û li min dengê kerbê kir	*Hiddetle döndü bana, kaygısını bildirdi*
Ku min ewrengî dî dest kir girînê	*Ki bu tarzda görünce, başladım ağlamağa*
Me go, “Hêja ne bes gel wê birînê	*Dedim, “Bunca yaramla, yetmez mi ey değerli*
Ji bab û day û yaran em kirin dûr	*Beni ki uzak ettin, baba, ana, dostlardan*
Ji bo pirsek dikî tu min bi rencûr”	*Bir soru sorduk diye, azarlıyorsun beni”*
Li min hat rehm û ew dûr bû ji xedrê	*Merhamet etti bana, vazgeçti hiddetinden*
“Rihê min” got “û wê bin qe’rê behrê	*Dedi ki, “Ruhum benim, okyanusun dibinde*
Di sindoqek belorîn da ye ew can	*Bir sandığın içinde, ki camdandır o sandık*
Eger peyda bî yek xatem Suleyman	*Eğer bulunsa bir mühür, Süleyman Peygamberin*

Nîşan din wê ji behrê dê biêt der	*Ona doğru göstersen, çıkar deniz dibinden*
Di sindoq da ye ew can wek keboter”	*Güvercin misalidir, o ruh sandık içinde”*
Ku ewreng bihîst Şahê xiredmend	*Ki işitince bu tarz, anlayışlı Şehzade*
Go “Xatem va digel min yarê dilbend”	*Dedi “Mühür bende var, ey gönül bağlamış yar”*
Dibên rabûn bi derkeftin ji qesrê	*Derler onlar birlikte, kalkıp çıktılar köşkten*
Bi şadî yû fereh çûn rûyê behrê	*Şen ve şakrak gittiler, kıyısına denizin*
Miqabil rihê wî xatem kirin av	*Peri ruhunun hizasında, mührü suya bıraktı*
Ku dîn sindoq bi derket hat bihiştav	*Gördüler sandık çıktı, sudan geldi süratle*
Ku nêzîk bû ji wan girtin hilanîn	*Yaklaşınca onlara, alıp da götürdüler*
Birin qesrê kevokek jê deranîn	*Sarayda güvercini, çıkardılar sandıktan*
Dibên Şehzade serjê kir bi xencer	*Derler hançerle kesti, güvercinin başını*
Ji qesrê dûr avêt ew bi huner	*Attılar uzaklara, saraydan ustalıkla*
‘Ecêb peyda bû ba û toz hem serd	*Oluştu acayipten, rüzgâr, toz ile soğuk*
Wekî kohek li ser rih kefte ser ‘erd	*Sanki bir dağ yıkıldı, ruh üstünden yerlere*
Ku can û rihê şîrîn jê berî bû	*Ki ondan ayrılınca, şirin ruhu ile canı*
Hebîba dilrûba got, “Ew perî bû”	*Gönül alan sevgili, dedi, “O giden periydi”*

Dibên Şehzade go “Elhemdulillah”	*Derler ki Bey Şehzade, “Elhamdülillah” dedi*
Digel hemd û sena û şikrê Ellah	*Hamd, övgüyle beraber, şükür etti Allah’a*
Ku ‘aqibet mirin bî ey Siyehpoş	*Ey Siyahpûş ki ölüm dahi olsa akıbet*
Eger ehmeq nebî, nabî tu dilxoş	*Eğer ahmak değilsen, hoşnut olmazsın*
Bi vê dinyayê dûnê qençe û pîr	*Bu aşağılık dünyaya ki, kancık ve kocakarıdır*
Necis û pîs û sewda şibhetê qîr	*Kirli, pis ve karadır, tıpkı katran misali*
Serê şahan û xundkar û wezîran	*Şahların, hünkârların, vezirlerin başını*
‘Elîmê fikr û teswîr û zemîran	*Düşünce, tasvirleri, hem sırları öğreten*
Di hîna da reqem xettê mecazî	*Mecazi hatlarla ki, yazdığında yazıyı*
Qilûbê ‘arifan da ‘işqebazî	*Kaptırdı aşk eline, bilgelerin gönlünü*
Ji cezb û fikr û seyranê terîqet	*Tarikat cezbesinden, fikir ve gezisinden*
Dê wasil bit mecazî ba heqîqet	*Gerçeğe dönüşecek, mecazi olan şeyler*
Dibên Şehzadeyê mexmûr û pirr cehd	*Derler mahmur Şehzade, o çok gayretli kişi*
Digel Melke kirin pirr qewl û pirr ‘ehd	*Melke’yle karşılıklı, çok söz, ahit verdiler*
Bi hevra ku biçin baxê Serendîb	*Birlikte gitmek için, Serendip bağlarına*
Biket Melke hikayet derd û asîb	*Ta ki anlatsın Melke, çektiği dert, belayı*

Ji ewwel ta bi axir hal û hewal	*Başından sonuna dek, tüm hâl ile ahvali*
Ji pêş enwercebîna bintê Şehbal	*Şehbal'in kızı önünde, ki yüzü ışıl ışıl*
Digel zarî biket hêvî ji dilber	*Ağlamayla dilberden, umut ederek istesin*
Ku nîşan det rûyê xwe ba dilawer	*Ki göstersin yüzünü, o yiğit Şehzadeye*
Wekî 'ehd û qerar kirne temame	*Böylece tamam edip kararla sözlerini*
Li paşan wan hilanîn pirr te'ame	*Ardından hazırladı, onlar hayli yiyecek*
Digel bêhed cewahirê şebefroz	*Ayrıca sayısızca, ışıldayan cevherler ile*
Ji le'l û şebçirax elmas û feyroz[113]	*Lal ile şebçerağdan, elmasla firuzeden[113]*
Bi şadî ew bi derkeftin ji qesrê	*Çıkıp gittiler onlar, sevinç ile saraydan*
Xeramên nazenîn çûn rûyê behrê	*Nazlılar salınarak, vardılar denize dek*
Dibên Şehzadeyê mexmûr û çalak	*Derler mahmur Şehzade, o ki çabuk, çeviktir*
Girêda keştiyek ez dar û xaşak	*Bağladı bir gemiyi, ağaçtan hem hurdahaş*
Tewekkul dan Xudayê Heq û Dadar	*Dayandılar Allah'a, o ki Hak ve Adil'dir*
Li ser gemî siwar bûn û kirin kar	*Bindiler o gemiye, eylediler hareket*

[113] Ji bo "le'l û şebçerax" bnr. têbiniya 102. "Feyroz", kevirekî hêja ye. Bi rengê xwe şînê vekrî û ne birqonek e. Di nav karûbarên zêrkariyê de, di hingulîsk, bazin û guharan de tê bikaranîn.

[113] "Lal ve şebçerağ" için, bkz. 102. dipnot. "Firuze", açık mavi renkte, şeffaf olmayan kıymetli bir taştır ki, yüzük, bilezik ve küpeler gibi kuyumculuk işlerinde kullanılır.

Ji behrê çûn heta şeş meh temame	*Denizde gittiler, altı ay tamam olana dek*
Miheyyer bûn xilas bû wan te'ame	*Telaşa kapıldılar, bitmişti yiyecekleri*
Dibên Şehzade got ya Heyyê Bêçûn!	*Derler Şehzade dedi, "Ey Ebedi Rabbim*
Du sadiq in li nik hev qelbê mehzûn	*İki hüzünlü kalbiz, birlikteyiz, sadığız*
Kerîm û Qadir û Heq î û Ekber	*Sensin Kerim ve Kadir, Hak ile Ekber olan*
Mirad û meqsûdê me bikî miyesser"	*Ulaştır Sen bizleri, maksatla arzumuza"*
Ku dû'a kir Şehê mehzûn bi tehsîn	*Ki hüzünlü Şehzade, güzel dua edince*
Dibên Melke digo, "ya Rebbî, amîn"	*Derler Melke de derdi, "ya Rabbi âmin"*
Bi emrê Heq rabû bayek efroz	*Esti Hakk'ın emriyle, şiddetlice bir rüzgâr*
Rahê deh sal bir gemî sê roj	*Gemi aldı üç günde, toplam on yıllık yolu*
Nezer kirin wan gehiştin adeyek qenc	*Baktılar ulaşmışlar, güzel bir adaya*
Tijî xurma û xox û nar û narenc	*Dolu narla, hurmayla, şeftali, portakalla*
Bi emrê Xaliqê Heyy û Qedîr e	*Emriyle Yaratanın, ki o Hay'dır, Kadir'dir*
Bi derkevtin ji gemiyê çûn cezîre	*Gemiden çıktı onlar, yürüdüler adada*
Kirin hemd û sena û zewq û sohbet	*Hamd, senayla birlikte, ettiler zevk ve sohbet*
Heta yek mahî man û bûne rahet	*Burada bir ay kadar, dinlendiler gönlünce*

Li paşan rabû Şehzade digel yar
Sonra kalktı ikisi, Şehzade ile Melke

Çinîn fêkî birin gemî kirin kar
Gemiye bolca meyve, taşıyıp yol aldılar

Ji behrê çûn heta sê mah û sê şew
Onlar gitti denizden, tam üç ay, üç gece

Bi emrê Xaliqê bê xwarin û xew
Emriyle Yaratıcının, ki yemeksiz, uykusuz

Gelek dîtin ‘ecaibêd ‘ecîbe
Çokça şeyler gördüler, acayip mi acayip

Ji behrê û bi elwanên xerîbe
Geçerlerken denizden, garip garip renklerde

Di xew rabû dibên Şehzade carek
Derler uyurdu bir kez, uykusunda Şehzade

Seleb dilgaftî du destê mibarek
İki mübarek eli, çaprazca bağlı idi

Ji nageh dît bi derkeft re’sê yek hût
Birden bir balinanın, gördü çıktı kafası

‘Ezim kir gemî da bel’îne wek qût
İstedi ki gemiyi, yutsun yemek misali

Dibên Melke bi wan le’lê şekerbar
Derler ki Melke Hanım, şirin dudaklarıyla

Fîxan kir gote “Ey Şehzade hawar!
Feryat etti, dedi, “Ey Şehzadem imdat!”

Çeleng rabû ji xew ew şêrê mexmûr
Uykusundan uyandı, usulca mahmur aslan

Bi te’cîl dest da ser qebzeyê şûr
Aceleyle el attı, kabzasına kılıcın

Ji kalan kişand tîxê bi cewher
Kınından sıyırdı, cevherli kılıcını

Bi huner xist li masî bû bi du ker
Ustalıkla indirdi, balık oldu iki parça

Gelek hemd û sena û şikrê ekber	*Çokça hamd ve övgüler, hem en büyük şükürler*
Digel Melke dikir Şahê dilawer	*Ediyordu Melke'yle, yiğit Şehzade*
Mihessel, dît nêzîk Şahê medhûş	*Özetle, yakından gördü, kendisinden geçmiş Şah*
Ji wan bû pirr fewakih adeyek xoş	*Meyveler ile dolu olan, güzel bir ada*
Bi derkeftin ji behrê çûne adê	*Çıktı onlar denizden, girdiler hoş adaya*
Ji wê adê bibînin xweş miradê	*Görmek istediler adadan, güzelce istifade*
Heta yek mah temam bû ew li wê man	*Bir ay dolana kadar, ikisi kaldı orda*
Bi şadî û fereh serxoş û heyran	*Mutlulukla, ferahla, sarhoşça, hayranlıkla*
Gehî Şehzade derdê iştiyaqê	*Şehzade bazen olur, iştiyakın derdini*
Digo bo Melke û daxê firaqê	*Hem ayrılık dağını, açıyordu Melke'ye*
Gehî Melke ji bo Mîrê dilawer	*Bazen de Melke derdi, yiğit olan Bey için*
Digot medh û sena û wesfê dilber	*Dilberin övgüsünü, takdirlerle vasfını*
Ji nageh hate wan awaz û hem deng	*Ansızın duydu onlar, bir seda ile sesi*
Ji rengê deng fesalê Ademîreng	*Ses tonundan belliydi, insana ait idi*
Çeleng Şehzade rabû serxoş û mest	*Şehzade usulünce, kalktı mest ve sarhoşça*
Wekî şêrê şikarî çû kir û qest	*Avcı bir aslan gibi, gitti bekleyedurdu*

Ku nêzîk bû ji wan Şeh dît çend merd	*Ki yaklaştıklarında, gördü birkaç adamdır*
Ji hat û çûnê wan xoş tey dibî ‘erd	*Gidip gelişlerinden, aşınıyordu yerler*
Ku wan dît hate pêş wan Şahê dilêr	*Ki yiğit Şahı onlar, görünce yollarında*
Miqabil Şahî hatin pênc û du mêr	*Şah’a karşı geldiler, onlardan yedi kişi*
Bi nerm û şîrînî wan kir ji Şeh deng,	*Yumuşakça, tatlıca, seslediler Bey Şah’a*
“Çi merd î, ey xerîbê Ademîreng?”	*“Kimsin sen ey yabancı, ey Âdemoğlu kişi?”*
Got “Ez însan im û hem Ademîzad	*Dedi ki, “İnsanım ben, hem de Âdemoğluyum*
Xerîb keftim ji ‘eşqê yek perîzad	*Düştüm yaban ellere, aşkından bir perinin*
Digel min Melke ye pirr naz û terxîb	*Yanımdaki Melke’dir, çok nazlı ve değerli*
Bilareyb keçê Şahê Serendîb	*Hiç şüphesiz kızıdır, Serendip Şahı’nın o*
Welê hûn kî ne ser vê rêy û cade	*Ancak siz kimlersiniz, bu yol, geçit üzere*
Ji hatûçûn çi meqsûd û mirad e?”	*Hem gelip gitmekten, nedir gayeniz sizin”*
Ewan go “Ev rê xas û ‘amm e	*Onlar dediler ona, “Bu yol özel, geneldir*
Rehê bajarê me, Wasit e name[114]	*Şehrimize aittir, adı Vâsıt’tır onun[114]*

[114] Bi navê “Wasit”, bajarekî di navbera Bexda û Besrayê de heye ku ji hêla waliyê Emewiya Yûsifê Kurê Heccac ve hatiye avakirin. Wasit, ji bo îro ne şên e, kavil û xirbe ye.

[114] “Vâsıt”; bu isimle bilinen şehir, Emevi valisi Haccac b. Yusuf tarafından, Bağdat ile Basra ortasında, Dicle ırmağı kıyısından kurulmuştur. Vâsıt, bugün için harabe hâldedir.

Xeracê em diden Şahê Serendîb	*Biz haracı veririz, Serendip'in Şahı'na*
Ku babê Melkeyê pirr naz û terxîb"	*Ki çok nazlı değerli, Melke'nin babasıdır"*
Bi dilxoşî vegerya teb'ê mewzûn	*Döndü gönlü sevinçle, o sağlam huylu yiğit*
Bi lez Şehzade pêşê Melke Xatûn	*Hızlıca geliverdi, Melke Hatun yanına*
Go, "Ey nazikleb, şirînkelame	*Dedi, "Ey tatlı dilli, dudakları nazenin*
Heyin ew şehriyê Wasit e name	*Bir şehir ki burada, adına Vâsıt derler*
Xerecdarên ji bo Şahê Serendîb	*Vermekteler haracı, Serendip'in Şahı'na*
Ji te mizgîn meha pirr naz û terxîb"	*Müjdeler sana ey ay, çok nazlı, değerli"*
Miferreh go, "Melke ey yarê hemdem	*Dedi, "Melke sevinçle, ey benimle olan yar*
Ji Wasit min heye hakim yekê 'em	*Vâsıt'ta vardır benim, yönetici bir amcam*
Ji 'edlê wî xoş in qerye w'bilûke	*Hoşnuttur köy, beldeler, adaletinden onun*
Bizan namê wî hem Taculmilûk e"	*Bil o adil kişinin, adı Tacülmülûk'tür"*
Bi dilxoşî ku rabûn herdu dilber	*Kalktılar iki dilber, gönül hoşluğuyla hem*
Digel xwe wan birin elmas û cewher	*Götürdüler birlikte, elmas ile cevherler*
Ku nêzîk bûn ji sûrê şehr û bajar	*Ki yaklaştıklarında, surlarına o şehrin*
Bi şadî û fereh çûn bin yekî dar	*Bir ağacın altına, sevinçle hem ferahla*

Di cî da Melke ma lê Mîrê Misrê	*Kaldı Melke orada, ancak Mısır'ın beyi*
Bi qesda mîrê bajêr hate qesrê	*Geldi saraya şehrin, beyi görmek üzere*
Ji 'emê Melke pirsî Mahê dilgîr	*Sordu kırgın olan Ay, amcasını Melke'nin*
Cewab danê we gotin çûye nêçîr	*Verdiler cevabını, ava gitmiş dediler*
Sebir kir lehzeyek çavnêrî rahan	*Sabretti ve bekledi, hem gözledi yolları*
Ji nageh dît bi derket Tacê şahan	*Ansızın görüverdi, gelmekte Tacülmülûk*
Peya bû Mîr ji hespê hate dîwan	*İniverdi atından, geldi divanına Bey*
Miheyya bûn ji wî ra text û eywan	*Hazır idi hem tahtı, hem de onun köşkü*
Nezer kir Mîr dît lawê dilawer,	*Bey bakındı etrafa, gördü yiğit oğlanı*
"Dibînim ku xerîb î ey dilawer!	*Dedi, "Görüyorum ben, yabancısın yiğidim*
Ji xelqê kêder î, bibêje çi meqsûd?	*Nerenin halkındansın, söyle arzun ne senin*
Heyin bo te bibêj da bîte mewcûd!"	*Ne talebin var ise, söyle edelim mevcut"*
"Ji Misrê me go xerîb, ey hemser û yar	*Dedi, "Ben Mısırlıyım, ey dostum ve yoldaşım*
Nehin bo min çu meqsûd xeyrê dildar	*Tek gönül verdiğimdir, yoktur başka bir arzum"*
Çi miqdar ku tu hatiyî di xurbet?	*"Ne süredir gelmişsin, bu gurbet ellere sen"*
Deh û du sal temam bûn ku di mihnet	*"Tam on iki yıl oldu, zahmetli, meşakkatli"*

Dibên Taculmilûkê mestî du çav
Ji derdê Melkeyê xoş bûn tijî av

Derler yorgun gözleri, birden Tacülmülûk'ün
Doluverdi yaşlarla, Melke Hatun derdinden

"Temam bû yazdeh sal ku bê serûber
Ku ew wenda bûye mislê dilawer"

"Bir baştan öte başa, tamam oldu on bir yıl
Ki kayıp olmuştur o, tıpkı yiğit olan sen gibi"

Dibên Şehzade go "Mizgîn tu mehzûn
Mebe her wî digel min Melke Xatûn"

Derler Şehzade dedi, "Müjdeler, sen üzülme
Melke Hatun yanımda, gelmiştir, benimledir"

Ji hindav rabû ser xwe Tacê mesrûr
Bi mihbet bûsî rûyê Şahê mexmûr

Birden ayağa kalktı, Tacülmülûk sevinçle
Sevgiyle gelip öptü, mahmur yüzünü Şah'ın

"Çi gotin bû te go, ez weslê dilber
Te xoş mizgînî da min ey dilawer"

"Neydi senin dediğin, dilbere kavuşmayla
Güzel bir müjde verdin, ey yiğidim sen bana

Go "Rast e wê digel min da ye dildar
Ji der sûrê me hêla bin yekî dar"

Dedi Şehzade, "Doğru, benimledir sevgili
Bıraktım sur dışında, altındadır ağacın"

Dibên Taculmilûk û Mîrê mehcûr
Digel ehlê dîwanê rabûn mesrûr

Derler Tacülmülûk'le, yârinden uzakta Bey
Kalktılar sevinç ile, divan ehli beraber

Bi şadî yû fereh çûn yekê mehfe[115]
Cewahirbend birin bo Mahê tuhfe[116]

Mutlulukla, keyifle, bir mahfeyle gittiler[115]
Cevherlerle bezenmiş, Ay'a hediye ettiler[116]

[115] "Mehfe", ji bo rûniştina li ser pişta pîl, heştir û hwv. amûreka di dilqê sepeta sergirtî an servekrî de ye.

[116] Mebest ji "Mah"ê, Xatûn Melke ye.

[115] "Mahfe"; deve, fil vb. hayvanların sırtına konulan, üstü açık ya da kapalı, oturmaya yarayan sepet.

[116] "Ay"dan maksat, Melke Hatun'dur.

Ku dît Taculmilûk Melke w'cewahir	*Görünce Tacülmülûk, cevherlerle Melke'yi*
Go "Subhanel kerîmul heqqen qadir"[117]	*Dedi, "Sübhane'l-Kerimü'l-hakkan Kadir"*[117]
Di hîna Melkeyê dît rûyê mamî	*Gördüğünde Melke, amcasının yüzünü*
Bi şadî û fereh rabû qiyamî	*Kalktı ayakta durdu, mutluca, hem ferahla*
Bi nerm û şîrînî çû bûse da dest	*Yumuşakça, şirince, varıp öptü elini*
Welê Taculmilûkê serxoş û mest	*Ancak Tacülmülûk'se, mest ve sarhoş olmuştu*
Dida bûse serê mehbûbê dilber	*Öpüyordu başından, sevgili dilberin o*
Di nav 'ewrî star bû bedrê enwer	*Gizlenmişti bulutta, ışık saçan dolunay*
Hilanîn mehfe rabûn çûne qesrê	*Kaldırdılar mahfeyi, gittiler hep saraya*
Bi derket jê çeleng û mehbûbê 'esrê	*Çıktı içinden güzel, hem asrın sevgilisi*
Kirin şadî û zewq û keyf û aheng	*Kutladılar sevinci, zevk, keyif, eğlenceyle*
Digel saz û ribab û naye û çeng	*Sazla, rübapla, neyle, beraberinde çenkle*
Heta şemsê munîr çû rûyê mexrib	*Ta ışık saçan güneş, batmaya yüz tutuna dek*
Bi ser wan çû cefa û derd û asîb	*Kayboldu üstlerinden, zahmet, dert ve belalar*

[117] "Subhanel kerîmul heqqen qadir", hevokek mezinandinê ye. Ango, "Tesbîh dikim wî Xwedayê ku dayîna wî gelektirîn e û xwedîşiyanek bê sînor e."

[117] "Sübhane'l-Kerimü'l-hakkan Kadir", Arapça bir tazim ifadesidir. Yani, "İkramı bol olan Allah'ı tesbih ederim ki hakkıyla güç yetirendir."

Îlahî! Tu li min dûr key cefayê	*Uzaklaştır Allah'ım, benden eza, cefayı*
Ji camê dilberan bînim sefayê	*Dilberlerin camından, ta göreyim sefayı*
Ji wê camê bibim serxoş û heyran	*O kadehten içerek, olayım sarhoş, hayran*
Di baxê dilberan kem geşt û seyran	*Bağında dilberlerin, dolaşıp seyredeyim*
Binefş û sinbil û reyhan û 'enber	*Menekşe ile sümbül, hem reyhan ile amber*
Texellub bûn li ser werdên ehmer	*Baskın geldiler onlar, al güllerin üstüne*
Gul û nergis û sosin çûn û xef bûn	*Gül, nergis ve süsen, gittiler, gizlendiler*
Binefş û sinbil û reyhan şeref bûn	*Şereflendi menekşe, hem sümbül ile reyhan*
Xulam û cariyanê Tacê şahan	*Hizmetçileri Tac'ın, hem de cariyeleri*
Hemam xoş kir germ bo şems û mahan[118]	*Ay ve güneş için hoşça, ısıttılar hamamı[118]*
Birin hemamê şûştin nazendam	*Hamamda yıkadılar, nazlı endamlıları*
Şîrîn û pak Şehzade û gulendam	*Tatlı ve pak Şehzade, hem de gül endamlıyı*
Milebbes bûn bi libsê padişahî	*Giydirdiler onları, padişah giysisiyle*
Dû'acî bûn ji wan ra mirx û mahî	*Duacıydı onlara, kuşlar ile balıklar*

[118] Ji "şems" û "mah" mebest, Seyfulmilûk û Xatûn Melke ye.

[118] "Ay" ve "Güneş"ten maksat, Seyfülmülûk ile Melke Hatun'dur.

Birin Melke bi ‘izzet der heremgah	*Götürdüler Melke’yi, saygı ile hareme*
Welê Şehzade der dîwanê wek mah	*Ancak Şehzade kaldı, bir ay gibi divanda*
Li ser textek zêrîn danîn bi ‘izzet	*Saygıyla oturttular, altından taht üstüne*
Miqabil textê tacê Şahê şewket	*Tahtı karşılık idi, kudretli şahınkine*
Li paşê xwarinê şahane rengreng	*Sonra yemekler yendi, şahane, çeşit çeşit*
Kirin hazir şerab û bade û çeng	*Hazırlandı içkiler, şarap, bade ile çenk*
Wekî serxoş û mest bû Mîrê mehcûr	*Sarhoş ve hem mest düştü, o aşkından uzak Bey*
Ji wesfilhalê xwe bo Tacê mexmûr[119]	*Durumunu anlattı, mahmur olan Taç için[119]*
Ji ewwel ta bi axir kir hikayet	*Ta başından sonuna, bitirdi hikâyeyi*
Te’eccib bûnê danawin ji heybet	*Kaldı hayrette hepsi, titrediler heybetten*
Çiqas ehlê dîwanê bûn miheyyer	*Döndü tümü şaşkına, divandaki kimseler*
Ji ‘ibret wan digot Ellahu Ekber	*İbretten hep dediler, Allahü Ekber onlar*
Mihessel ta hikayet kir dilawer	*Özetle, bittiğinde, hikâyesi yiğidin*
Ji nûrê rojê bû dinya minewwer	*Aydınlandı dünyamız, ışığıyla güneşin*

[119] Mebest ji “Tac”, “Taculmilûk” e.

[119] “Taç”dan maksat, “Tacülmülûk”tur.

Diborand roj bi roj ba nerd û şetrenc	*Geçirirdi günleri, tavlayla, hem satrançla*
Welê şeb ba lebê camê mey û benc[120]	*Ancak akşam olunca, ağzı mey ve bengteydi[120]*
Digel Taculmilûk hetta tedarek	*Hazırlığa başlandı, Tacülmülûk beraber*
Kirin kar bo Serendîbê mibarek	*Gitmek üzere onlar, mübarek Serendib'e*
Wekî bû kariwan cimle miheyya	*Hazır hale gelince, kervan ehli tamamen*
Kirin teyy menzîl û wadî yû sehra	*Aştılar menzilleri, vadileri, çölleri*
Bi bê renc û cefa û derd û asîb	*Eziyetsiz, zahmetsiz, hem de dertsiz, tasasız*
Ku nêzîk bû ji wan şehrê Serendîb	*Ki yakın olduğunda, Serendip şehri onlara*
Cewab çû bo Şehê manendê Cengîz[121]	*Ulaştırıldı haber, Cengiz misal Şahı'na[121]*
Ku hat Taculmilûk û Melkeyê qîz	*Ki gelmektedir, Melke kızın ile Tacülmülûk*
Digel Şehzadeyê Misrê senaxwan	*Bir de seni öven, Mısır'ın şehzadesi*
Dilawer Îbnu 'Asim Îbnu Sefwan	*Asım'ın yiğit oğlu, hem torunu Safvan'ın*
Ku evreng bihîst Şahê keremdar	*Cömertliği meşhur Şah, alınca bu haberi*
Delalan kir bi gazî û bi hawar	*Tellallara duyurttu, çağırıp bağırdılar*

[120] Ji bo "benc"ê, bnr. têbiniya 13.

[121] "Cengîz" (1162-1227); yekemîn damezrîner, xeqan û serfermandarê cîhangîriya Mongolan e (sedsala 13.) Navê wî yê bi Mongoli Temûçîn e. Di cografyaya misilmanan de gelek kavilî û qetliem pêkaniye. Bi xwînrijiya xwe navdar e.

[120] "Benc" için, bkz. 13. dipnota.

[121] "Cengiz" (1162-1227); 13. yüzyılda, Moğol İmparatorluğunu kuran kişidir. Aynı zamanda, bu imparatorluğun ilk kağanı, hükümdarı ve komutanıdır. Moğolca ismi Temuçin'dir. İslam coğrafyasında, hunharlığıyla ün salmıştır.

Di şehrî da çiqasî cimle xelke	*Şehirde her kim varsa, istisnasız bütün halk*
Bi xas û ‘amm hatin pêşî Melke	*Zengin fakir tamamı, karşıladı Melke’yi*
Digel Taculmilûk û Şahizade	*Bir de Tacülmülûk’ü, hem Şehzade’yi onlar*
Bi mesrûrî û zewq û dilkuşade	*Sevinçle, zevklenerek, gönlü açık olarak*
Ji etrafan dihatin xelq sef sef	*Çevreden geliyordu, saflar halinde insanlar*
Siwarên namdarên nêze der kef	*Namlı süvarilerden, ellerinde mızraklar*
Dibên nehsed siwarê nam ê cindî	*Meşhur süvarilerden, derler ki dokuz yüzü*
Di nav xelkê dihatin şaşê Hindî	*Halk içinden gelirdi, Hint sarıklarıyla onlar*
Kirin şadî yû zewq û keyf û aheng	*Tertiplediler sevinç, zevk, keyif ve eğlence*
Mitriban dan li tebl û naye û çeng	*Çalgıcılar vurdular, davula, neye, çenge*
Bi waweyla û gazî şibhê mehşer	*Çığlıklar, bağrışmalar, tıpkı mahşer misali*
Mihessel, Şah bû wasil bi doxter	*Sözün özü, Şah kavuşmuş oldu kızına*
Misala Pîrê Ken’anê Ye’qûb	*Tıpkı Kenan yaşlısı, Yakup Peygamber gibi*
Ji husna Yûsifê dildar û mehbûb	*Sevimli ve sevgili, Yusuf’unun hüsnünden*
Du çahvê xwe kirin rewşen ji dînê	*Görmekle kızını o, aydınlandı gözleri*
Hebîba nazik a enwercebînê	*O nazik sevgiliyle, o parlak alınlıyla*

Rûyê Meh bûse dan Şahê sermest
Welê mahê dibûsîn pençe û dest[122]

Ay yüzüne buseler, kondurdu mest düşmüş Şah
Ancak ay öpmekteydi, elinden, ayağından[122]

Wekî dilxoş bû Şeh ba weslê dilber
Bi çavê mihbetê nêrî birader

Gönlü hoş olunca Şah, kavuşmayla dilbere
Döndü sevgi gözüyle, kardeşi Tacülmülûk'a

Digel Şehzadeyê mexmûr û şehbaz
Digel wan pirr kirin ikram û i'zaz

Hem yiğit olan, o mahmur Şehzadeye
Onlar için eyledi, çokça izzet ve ikramlar

Bi şadî yû sirûr û naz û terxîb
Bi cem'î bûne daxil ez Serendîb

Mutlulukla, sevinçle, cilveyle hem umutla
Girdiler hep birlikte, şehrine Serendip'in

Di hîna çûne ber dergahê Şahî
Dibêjin Bedre û mader bi şahî

Gittiklerinde Şah'ın, sarayının önüne
Derler ki Bedre ve annesi, sevinç içinde

Digel çend jin letîf û xûb û tuhfe
Mehê enwer bi derxistin ji mehfe

Birkaç kadın ile, güzel, hoş ve alımlı
Parlak ayı mahfeden, çıkardılar o anda

Bi nerm û şîrînî rabûn kirin meş
Birin qesrek zerefşan û mineqqeş

Şirince, yumuşakça, yürüdüler birlikte
Götürdüler saraya, süslü, altın yaldızlı

Li ser textek zêrîn danîn bi 'izzet
Dipirsîn ji cefa û derd û mihnet

Altından taht üstüne, oturttular saygıyla
Sorarlardı ondan hep, zahmet, dert, eziyeti

[122] Mebest ji "Meh/Mah"ê, Xatûn Melke ye.

[122] "Ay"dan maksat, Melke Hatun'dur.

Ji ewwel ta bi axir sînesade	*Başından ta sonuna, o kalbi tertemiz kız*
Hikayet kir ji xwe û Şahizade	*Anlattı hikâyeyi, kendisiyle Şehzadenin*
Welê Şehzade bir Şahê Serendîb	*Ancak Serendip Şahı, Şehzadeyi, götürdü*
Li ser textek zêrîn danî bi terxîb	*Oturttu altın tahta, saygıyla, özeniyle*
Go ey, "Şehzade tu mesrûrbe dilşad	*Dedi ki, "Ey Şehzade, mutlu, huzurlu ol sen*
Nehin bo min ji nêrînî çu ewlad	*Hiç olmadı erkekten, benim için bir evlat*
Qebûl min tu bi ewladî yû dilbend	*Evladım ve gönül bağım olmana kabulüm,*
Miyesser ket miradê te Xudawend	*Allah kolay eylesin, sana arzu ettiklerini*
Çi reng te ez kirim dilxoş bi ewlad	*Nasıl ki sevindirdin, sen evladımla beni*
Werengî tu bi meqsed bî bi dilşad	*Aynısıyla olasın, muradınla sen mutlu*
Eger Ellah kiribî bo te teqdîr	*Takdir etmişse Allah, şayet ki senin için*
Ji bo me qet nehin bo te çu teqsîr	*Bil ki bizden hiç olmaz, senin için bir kusur*
Biket Melke digel Bedre bi mader	*Melke'yi Bedre'yle birlikte, gönder anneye*
Ricayê te ji husnê mahê peyker"[123]	*İletirler ricanı, ay yüzlü güzellimden"[123]*

[123] Mebest ji "Mahê Peyker", hevaljîna Şahê Serendîb e; ango diya Bedîulcemal e.

[123] "Ay yüzlü"den maksat, Serendip Şahı'nın hanımıdır; yani Bediülcemal'in annesi.

Dibên Taculmilûkê mest û mexmûr	*Derler ki mest ve mahmur, kardeşi Tacülmülûk*
Dikir her dem ji bo Şeh qisse mezkûr[124]	*Anlatırdı her vakit, kıssasını onların[124]*
Ji halê Melke û Şehzadeyê Mîr	*Halinden Melke'nin hem, bey Şehzadenin*
Ji ewwel ta bi axir xoş û teqrîr	*Anlattırdı tamamen, güzelce ve tane tane*
Kirin araste qesrek zêrefşan	*Düzenlediler bir köşk, altınlarla yaldızlı*
Ji bo Şehzadeyê mest û durrefşan	*Mest düşmüş, inci saçan, bey Şehzade adına*
Tê raxistin firaşên sof û dîba	*Serildi nice sergi, atlas ile ipekten*
Du sed balîn mineqqeş karê zîba	*Gümüşten işlemeli, iki yüz kadar yastık*
Bi ser ferşan reşandin misk û 'enber	*Serptiler sergilere, amber ile hem miski*
Firaş û dar û dîwar bûn misewwer	*Resimle bezediler, yatak, ağaç, duvarı*
Du textê zêr tê danîn û miresse'	*Kurdular iki taht, altınlarla süslenmiş*
Ji le'l û şebçiraxan bûn milemme'	*Lal ile şebçerağdan, ışıyıp parladılar*
Xulam û cariyanê xûb û dilber[125]	*Güzel ve gönül kapan, gulamdan, cariyeden[125]*
Ji du sed zêde bexşîn ba dilawer	*Armağan etti ona, iki yüzden de fazla*

[124] "Qisse", ango "çirok".

[125] Mebest ji "xulam", xizmetkarê mêr e, "carî", xizmetkara jin e.

[124] "Kıssa", "hikâye" demektir.

[125] "Gülam"dan maksat genç erkek hizmetkâr, "cariye" ise, genç kadın hizmetkârdır.

Dilê Şehzade xoş û mitmeîn bû
Wisalê dilberan bo wî qerîn bû

Hoş ve mutmain oldu, gönlü Şehzadenin
Ulaşması dilbere, yakınlaştı onun için

Çi ger dilxoş bû ew ba weslê dilber
Welê her dem xemê Se'dê dilawer[126]

Dilbere kavuşmaktan, mutlu olmuştu gerçi
Ancak o her vakit, gamındaydı yiğit Sad'in[126]

Dikêşa û dikir efxan û zarî
Digirya şibhetê tavêd biharî

Ah çekiyordu, ağlamalar ve feryatlar
Ağlayıp duruyordu, bahar bulutu gibi

Miheyyer bû ji dil pirr derd û asîb
Ji wî yû Se'd dûr Şahê Serendîb

Şaşkındı o gönülden, çok dertli, belalıydı
Uzaktı ondan ve Sad'dan, Serendip'in Şahı

Nebû xalî ji fikrê wan şeb û roz
Ji hal û mihbeta wan Şahê feyroz

Bir an olsun çıkmadı, fikrinden gece gündüz
Hâl ve sevgilerinden, o kutlu Şah

Gehî Şehzade dilxoş bû ji dildar
Gehî pirr xem ji hicrê yarê xemxwar[127]

Bazen gönlü hoş olur, Şehzadenin yârinden
Bazen çok gamlanırdı, arkadaş hicranından[127]

Gehî kir wî temennayê sefayê
Gehî pirr xem ji hicrê pircefayê

Bazen oluyordu o, arzusundan sefanın
Bazen gamlanırdı çok, pür zahmetli hicrandan

126 "Se'd", hevalbendê Seyfulmilûk yê berze ye.
127 Mebest ji "hicran"ê, "cûdatî" ye.

126 "Sad"dan maksat, Seyfülmülûk'ün kayıp arkadaşı Sadülmülûk'tür.
127 "Hicran", "ayrılık" demektir.

Gehî zewqê j'temennayê wisalê	*Bazen zevkleniyordu, kavuşma arzusuyla*
Gehî mehzûn ji hicranê hilalê	*Bazen üzülüyordu, hicranından hilalin*
Gehî mesrûrê cam û xemr û bade	*Bazen seviniyordu, kadeh, içki, badeyle*
Gehî xemyarê Se'dê bê mirade	*Bazen muratsız Sad'in, olurdu gam yoldaşı*
Gehî çavnêrê Şîrîn û şekerleb	*Bazen gözler Şirin'i, o şeker dudaklıyı*
Gehî xemgînê Se'dê Xusrewîleb	*Bazen çeker gamını, Hüsrev dudaklı Sad'in*
Çi xweş weqt e li pey daxê firaqê	*Ne hoş bir demdir, ayrılık yarasının ardından*
Xem û endûh û derdê iştiyaqê	*Gamın ve tasanın, hem de iştiyak derdinin*
Bibin wasil bi hev du yarê sadiq	*Kavuşmaları birbirine, iki sadık arkadaşın*
Ji camê wesletê bin mest û 'aşiq	*Mest ve âşık olmaları, vuslatın kadehinden*
Dibên Şahê Serendîb her mudamî	*Derler Serendip Şahı, her zaman ve devamlı*
Dixwend dîwanê Şahê Misr û Şamî	*Davet eder divanına, Şam ile Mısır Şahı'nı*
Çi carê ku bikirya zewq û aheng	*Ne vakit eyleseydi, zevk ile eğlenceyi*
Ji cam û bade û saz û ney û çeng	*Kadehle ve badeyle, sazla, neyle hem çenkle*
Wekî Şehzade serxoş bû ji sohbet	*Ne vakit olsa sarhoş, Şehzade ki sohbetten*
Dikir ehwalê xwe ba Şeh hikayet	*Şah yanında durumunu, ederdi hikâye*

Ji bo Se'dulmilûk û derdê firqet
Dikêşan bê 'eded ahîn û hesret

Sadülmülûk'e dair, hem ayrılık derdini
Çekiyordu derinden, sayısız ahla hasret

Li nik Şahê Serendîb bû bi rexbet
Gelek Şehzade ba 'işq û mihibbet

Rağbet bulmuştu o, Serendip Şahı yanında
Aşk ile muhabbetteydi, Şehzade fazlasıyla

Çu xizmet bêemirî nedikir çu caran
Misalê 'aşiqan ber emrê yaran

Hizmette hiçbir zaman, uymazlık etmez idi
Tıpkı sevgilinin emrinde olan âşıklar gibiydi

Ji 'ilm û me'rîfet adab û erkan
Siwarî-w nêzebazî, go û çogan

İlimden, marifetten, adaptan hem erkândan
Binicilik, mızrak ustalığı hem top ile çevgen

Ji 'aql û re'y û tedbîrê şehane
Nedibû mislê wî Şahê yegane

Akıl ile görüşten, şahane tedbirlerden
Görülmemiş bir misli, o biricik Şah gibi,

Çi carê ku biçûba geşt û seyran
Digel xwe dê bibirya mest û heyran

Ne vakit gider ise, seyirle seyahate
Götürürdü beraber, o mest ve de hayranı

Di seyrê da diborand rozî ta şam
Welê şeb ta seher mest ez lebê cam

Geçirirdi gezintide, sabahtan akşama dek
Akşamdan sehereyse, düşerdi içkiden mest

Digel Şahê Serendîb mest û heyran
Bi şadî û fereh çûn geşt û seyran

Mest ile hayran idi, Serendip Şahı'yla o
Ferahla, mutlulukla, giderlerdi seyrana

Gehî ba bilbilan bû ew bi awaz	*Bazen bülbüllerleydi, sesiyle, sedasıyla*
Gehî ba tûtiyan bû ew bi hemraz	*Bazen dudularlaydı, sırdaşıydı onların*
Gehî wek qumriyan bû ew bi nalan	*Bazen kumrular gibi, inleyip durmaktaydı*
Gehî heyran ji du çahvên xezalan	*Bazen hayranı idi, ceylanın çift gözüne*
Ji nageh nûciwanek dît mehweş	*Gördü birini birden, ay gibi bir oğlanı*
Ji rengşekl û fesalê Se'dê dilgeş	*Şekliyle, endamıyla, gönül çeken Sad gibi*
Emir kir ser xulaman şibhê cebran	*Emretti gülamlara, tıpkı zorbalar gibi,*
Hilînin go, "Bibin wî qesr û eywan"	*"Alın onu götürün, saraya ya da köşke"*
Xulaman bir ciwanê sînesade	*Hizmetçiler götürdü, yüreği temiz genci*
Ji seyrê ta vegerya Şahizade	*Ta geziden Şehzade, dönüp gelene kadar*
Wekî Şehzadeyê ba tali' û bext	*Şansı yaver Şehzade, hem de bahtı açık ki*
Vegerya hat û çû rûniştli ser text	*Dönüp de geldiğinde, gitti oturdu tahta*
Bi nerm û şirînî go, "Hey xulaman,	*Dedi, "Ey hizmetçiler, yumuşakça, tatlıca*
Çi pê kir we herîfê tas û caman[128]	*Ne ettiniz siz, tasla cam arkadaşı olana[128]*
Bikin hazir ji ber min da bibînim	*Getirin huzuruma, ta ki onu göreyim*
Gelek xetên ji mêjîn gel bixwînim"	*Onunla okuyayım, geçmişin hatlarını"*

[128] Mebest ji "herîfê tas û caman", kesê "mest û serxoş" e.

[128] "Tasla cam adamı"ndan maksat "mest ve sarhoş" kişidir.

Kirin hazir ji pêş Mîrê dilawer	*Hazırladılar onu, yiğit Beyin önünde*
Bi nerm û şirînî ew Se'dê dilber	*Yumuşakça tatlıca, gönül kapan o Sad'ı*
Dibên Şehzade go: "Ya qurretul 'eyn!	*Derler Şehzade dedi, "Ey gözlerin ışığı*
Feqûl îsmek mekanek lî mînel eyn"[129]	*De bana adını yerini, hem neredensin sen"*[129]
"Ji Misrê m'go kurê Salih senaxwan	*Salih oğlu övgüyle, dedi, "Ben Mısırlıyım*
Wezîrê Şahê 'Asim Îbnu Sefwan	*Kendisi veziridir, Şah Asım İbni Safvan'ın*
Digel Şehzade em hatin di behran	*Geldik Şehzademle ben, denizler üzerinden*
Me pirr dîtin cefa û ba û baran	*Çokça zahmetler çektik, yağmur ile rüzgârdan*
Cuda bûn em ji hevdu bê serûber	*Koptuk birbirimizden, o günden bugüne dek*
Nizanim qet kuda çû ew dilawer	*Bilmiyorum asla ben, o yiğit nereye gitti*
Bizan Şehzade nam Seyfulmilûk e	*Şehzadenin ismi ki, bil ki Seyfülmülûk'tür*
Xerîbê bende, nam Se'dulmilûk e"	*Ben ise hizmetçisi, adım Sadülmülûk'tür"*
Ku evrengî bihîstin qisse teqrîr	*Ki dinleyince bu tarz, anlatılan kıssayı*
Mişewweş keft bêhiş Şahê dilgîr	*Gönül kaptırmış Şah'ın gitti aklı başından*

[129] Hevok, Erebî ye; wateya wê wiha ye: "Ey rohniya çavan, bêje min, tu ji kêderê yî û ji kêderê têyî."

[129] Tırnak içindeki kısım, şiirin orijinalinde Arapça olarak yazılmış.

“Feqalû idribû haza sehharî”[130]	*“Vurunuz dediler, şu sihirbazı”*[130]
Revî bazda çû kuncek zêde tarî	*Kaçarak gitti, karanlık bir köşeye*
Li pê çûn û nedîtin ew dilawer	*Peşi sıra gittiler, görmediler yiğidi*
Ji bêhuşî ku rabû Tacê ber ser[131]	*Sersem hâlde kalktı, yanı başındaki Taç*[131]
Go, “Kanê hey xulaman raheta min	*Dedi “Ey hizmetçiler, nerde rahatım benim*
Qerar û huş û sebr û taqeta min	*Kararım, hem bilincim, sabrım ile takatim*
Bi nerm û şîrînî bo min bixwînin	*Benim için okuyun, yumuşakça, şirince*
Di dil da min ji wê bêhed birîn in”	*Yaralıyım hadsizce, onun için yürekten”*
Ji etrafan dinêrîn lê kirin deng	*Bakıyorlar etrafa, seslendiler ona hep*
Sedayek hate wan ez kuncekî teng	*Daracık bir köşeden, bir ses geldi onlara*
“Çi kirye min xerîbê dilbirîndar	*“Ne ettim bilmiyorum, ben ki gönlü yaralı*
Ji derbê dar ken hûn min wekî ar”	*Ateşte döver gibi, beni dövün odunla”*
Ku dengê wî bihîstin nerm û şîrîn	*Ki sesini duyunca, yumuşakça, şirince*
Xulam çûn rakirin anîn bi tehsîn	*Kaldırdı hizmetçiler, getirdiler güzelce*

[130] Hevok, Erebî ye; wateya wê wiha ye: “Gote lêdinin, li vî kesê sihêrbaz”

[131] Mebest ji “Tac”, ne Taculmilûk e, Seyfulmilûk bixwe ye.

[130] Tırnak içindeki satır, şiirin orijinalinde Arapça olarak geçmektedir.

[131] “Taç”tan maksat, Tacülmülûk değildir, Seyfülmülûk’tür.

Dibên Şehzade rabû pirr bi dilşad	*Derler kalktı Şehzade, gayet mutlu olarak*
Weranîn dest di cîdê serwê azad	*Sarıldı elleriyle, boynuna o servinin*
Got, "Se'da tu bizan şehzadeyê tem	*Dedi, "Ey Sad bilesin, benim şehzaden senin*
Ji dil îro ji xemazadeyê tem"	*Gönülden bugün seni, gamdan özgür kılanım"*
Du 'aşiq bûne ew ba hem resîde	*Ulaştı iki âşık, birbirine hasretle*
Ji weslê yekdîger bûn aramîde	*Vuslatla birbirine, her biri tam huzura*
Dibên Şehzade û Se'dê dilawer	*Derler ki Şehzade'yle, hem korkusuz Sad*
Miqabil hevdu rûniştin beraber	*Oturdular her ikisi, karşı karşıya beraber*
Bi ser wan çûn cefa û renc û mihnet	*Üzerlerinden kalktı, zorluk, zahmet, eziyet*
Ji weslê yekdîger bûn şad û rahet	*Kavuşmaktan her biri, oldular mutlu, rahat*
Cewab çû Şah û Melke, Bedre Xatûn	*Cevap ulaştı Şah'a, hem Melke'yle Bedre'ye*
Ku hat Se'dulmilûkê tab'ê mewzûn	*Ki gelmiş dediler, düzgün huylu Sadülmülûk*
Miferreh bûn kuşad û dil minewwer	*Ruhları ferahlandı, gönülleri nurlandı*
Emir kir bîne dîwanê dilawer	*Emretti ki getirin, divana yiğitleri*
Du husnê enwerê tel'et wekî mah	*İki çehresi güzel, parlaklıkta ay gibi*
Miferreh çûne dîwanê Şehinşah	*Ferahlıca gittiler, Şehinşah divanına*

Du textê zêr danîn pirr ji gewher	*İki taht kondurdular, saf altın, bol cevherden*
Ji bo Şehzade û Se'dê dilawer	*Biri Şehzade için, biri yiğit Sad için*
Çû dest Şahî Se'd ez tali' û bext	*Şans ve baht dileyerek, Sad öptü Şah elini*
Dû'a kir wî ji Şeh ra çûne ser text	*Şah'a dua ederek, vardılar taht üstüne*
Mîsala heyv û rojan ew dilawer	*Benzerdi iki yiğit, tıpkı ay ve güneşe*
Ku rûniştin miqabil hev beraber	*Ki oturduklarında, birbiriyle karşılıklı*
Çiqas ehlê dîwanê bûn miheyyer	*Divandakiler hepsi, şaşkındı, hayretteydi*
Ji wan husnê munîr û mahê peyker	*O parlak güzellerden, o ay gibi yüzlerden*
Emir kir saqiyan anîn şerabe	*Emretti sakilere, getirdiler şarabı*
Ji dengê mitriban dil bûn kebabe	*Çalgıcılar sesinden, yürekler oldu kebap*
Ribab û çeng û nayê kir bi nale	*İnlemeye başladı, rübapla, çenk ile ney*
Bi fincanan şerabê çardeh sale	*Fincanlarla sunuldu, on dört yıllık şaraplar*
Di dîwanê gerandin zêde bû şewq	*Divanda gezdirdiler, arzular coşturuldu*
Ji şadî û sirûr û keyf û hem zewq	*Mutlulukla sevinçten, keyif ile hem zevkten*
Wekî dîwan serxoş bûn bi carek	*Divandaki sakinler, sarhoş oldular tümden*
Digel Se'dulmilûk Şahê mibarek	*Kutlu Şah'ın yanında, yoldaşı Sadülmülûk*

Gelek kir bê ‘eded îkram û i’zaz	*Fazlasıyla eyledi, sayısız izzet, ikram*
Ji zêr û cewher û hesp û çekan baz	*Altın ile cevherden, at ile silahtan Şah*
Xulam û cariyanê mest û mehweş	*Mest düşmüş hizmetçiler, ay yüzlü cariyeler*
Digel qesrek zêrefşan û mineqqeş	*Altınla donatılmış, hem süslü bir sarayı*
Li ser ta pê libas û libsê Şahî	*Baştan ayağa kadar, şahane giysileri*
Bi Se’dê dilrûba da Şeh bi şahî	*Gönülden verdi Sad’a, o gönül kapan Şah’a*
Birin hemamê şûştin ew dilawer	*Hamama götürdüler, yıkadılar yiğidi*
Libasê şahî wergirte yekser	*Baştan ta ayağa dek, şahane giydirdiler*
Dibên Şehzade û Se’dê wekî mah	*Derler Şehzade’yle hem, ay misali olan Sad*
Digel Şeh çûn miferreh der heremgah	*Şah’la varıp gittiler, hareme şen olarak*
Ku Melke û Bedre û Xanim bi carek	*Kî Melke ile Bedre, hem hanımanne birden*
Ji dil bûsîn milê Se’dê mibarek	*Öpüverdiler içten, omzundan kutlu Sad’in*
Wezîr û mîr rûniştin digel Şah	*Beyler ile paşalar, oturdular Şah ile*
Bi keyf û zewq û şadî der heremgah	*Hep mutluca haremde, keyfedip zevk ederek*
Were saqî werîn fincan û bade	*Gel ey saki getir sen, fincanla bize bade*
Minewwer ke zemîrê qelbê sade	*Aydınlat içini sen, sade ve temiz gönüllerin*

Ji xemra ku dinoşîn der gulistan	*O içkiden içilir, gül bahçesi içinde*
Diket serxoş û şeyda qelbê mestan	*Ki mestlerin kalbini, sarhoş, çılgın ediyor*
Were mitrib bi çeng û saz û tenbûr	*Sen de gel ey çalgıcı, sazla, çenkle, tamburla*
Bireqsîne tu qelbê mest û mexmûr	*Oynatver kalpleri, mest, mahmur düşmüşlerin*
Ji dil talib ji bo husnê suheyla[132]	*İsteklidir hüsnüne, gönülden süheylanın[132]*
Bûye Mecnûn ji ‘eşqê camê Leyla	*Olmuş Mecnun, aşk kadehinden Leyla’nın*
Çi xoş keyf e ji zewqê xemr û bade	*Ne güzel bir keyiftir, içki ve bade zevkiyle*
Miqabil hevdu rûnên sînesade	*Karşılıklı oturmak, yüreği temiz dost ile*
Ji destê rencê eyyam ken şikayet	*Zahmetleri elinden zamanın, şikâyet etmek*
Bi hemrazî digel hev ken hikayet	*Sırdaşıyla karşılıklı, anlatmak hikâyeleri*
Wereng rawîyanê sînesafî	*Böyle etti rivayet, yüreği saf raviler*
Ji halê dilberan kir muşîkafî	*Kılı kırka yararak, halini dilberlerin*
Dibên Şehzade go “Ey Se’dê dilber	*Derler Şehzade dedi, “Ey gönül kapan Sad*
Bibê bo min hewalê xwe seraser	*Anlatver sen bana, tüm yaşadıklarını*
Ji weqtê ku li min tu bûyî firqet	*O zamandan beri ki, benden ayrı düşmüştün*
Çi hat ser te ji renc û rah û mihnet”	*Neler geldi başına, yoldan, zordan, zahmetten”*

[132] Ji “suheyla”yê mebest, jina bi sirişta xwe nerm, bi xuyê xwe qenc e.

[132] “Süheyla”, yumuşak ve iyi huylu kadın demektir.

Ji teqrîrê şîrîn bû ew şekerrîz
Miselsel zilfê exbar ‘enberamîz[133]

Oldu o şeker saçan, tatlı anlatmalardan
Amberlenmiş zülüfler, zincirleme ahbardan[133]

Go: “Ey Şehzade min dît bayekî suxt
‘Ecêb dişwar hat jêk rakirin text

Dedi ki “Ey Şehzadem, gördüm sertçe bir rüzgâr
Şiddetle esiyordu, ayırdı tahtaları

Bi tenha çûm di gemiyê da çihil roj
Me xwe ispare Şahê ‘Alemefroz

Gittim yalnız başıma, kırk gün kadar gemide
Dayandım âlemleri, nurlandıran Allah’a

Ji rehmet min dît sekinîn ba û baran
Ger û mewcê ‘ezîm û pêlê behran

Gördüm ki rahmetiyle, durdu yağmurla rüzgâr
Girdaplar, fırtınalar, denizin dalgaları

Ji nageh min dît nêzîk adeyek qenc
Ji met’umat nebû tê da bi cuz senc

Ansızın ben gördüm ki, yakın bir güzel ada
İğdeden gayrı yoktu, içinde bir yiyecek

Me got dê ez bimînim ta bi mirden
Bişûd halem xerab ez sencxurden

Dedim ben kalacağım, ölüme dek burada
Böyle giderse halim, öleceğim iğdeden

Bi naçarî bi derkeftim ji dest renc
Birin gemyê ji xwe ra bê’ eded senc

Çaresizlikten çıktım, eziyetler elinden
Kendim için gemiye, götürdüm çok iğdeyi

Ji behrê çûm heta sê meh temame
Ji xeyrê senc nebû bo min te’ame

Gittim deniz yoluyla, tam üç ay boyunca
Yok idi benim için, iğdeden gayrı yemek

133 “Exbar”, bi wateya xwe, nûçe û peyivandin e.

133 “Ahbar”, haberler, konuşmalar anlamındadır.

Welêkin herçi ku min dît di behran	*Ne var ki ben denizde, gördüm nice şeyleri*
Ji masiyê ‘ecêb elwan bi elwan	*Acayip balıklardan, renkleri elvan elvan*
Xilas nabit bi çil salî seraser	*Kırk yılda bile bitmez, aralıksız anlatsam*
Temam naket dused kitab û defter	*Bitiremez onları, iki yüz kitap, defter*
Ji nageh min dît behrê kir xuroşan	*Gördüm ansızın coştu, kabarıp taştı deniz*
Ji pêl û mewcê derya hate coşan	*Dalgayla hem taşmayla, deniz coşmaya geldi*
Hilanîm ez birim ber adeyek qenc	*Güzelim bir adaya, sürükleyip götürdü*
Tijî sêb û hinar û xurme û senc	*Doluydu elmalarla, hem nar, hurma, iğdeyle*
Bes e min got heta ez sax bimînim	*Dedim ki yetti artık, sağ kaldığım sürece*
Di vê adê bi naçarî dimînim	*Kalacağım adada, çaresizim çünkü ben*
Bi ser min da buhurîn çendî eyyam	*Üstümden geçti benim, ne süredir bilemem*
Xewa min hat ‘We innî kuntu finnam’[134]	*Geldi uykum dalmıştım, ‘Ve kesin uyumuştum’[134]*
Ji nageh dîtim ez qewmê libasan[135]	*Ansızın ben rastladım, Libasların kavmine[135]*
Di xew da girtim ez wan xoş bi asan	*Uyurken zapt ettiler, beni gayet kolayca*

[134] Îfadeya nav neynokê erebî ye; wateya wê wiha ye: “Bê guman xew ve çûbûm”.

[135] “Qewmê libasan”, navekî efsanewî ye; herhal li ser nolandina “îblisan” (Bnr. li malikên 1773-1774’an)

[134] Tırnak içindeki ifade, şiirin orijinalinde Arapça olarak geçmektedir.

[135] “Libaslar kavmi”, efsanevi bir ifadedir; herhâlde, “iblisler”e nazire olarak seçilmiştir. (Bkz. 1773-1774 nolu beyitlere).

Ku ez girtim misala seyd û nêçîr	*Ki yakaladı onlar, tıpkı bir av misali*
Hilanîm ez birim wan şibhê hêsîr	*Alıp da götürdüler, beni esirler gibi*
Ku wasil bûn mekanê xwe wekî teyr	*Varınca yurtlarına, aldılar bir kuş gibi*
Qefes kirim û ji dil mam pirr miheyyer	*Bir kafese koydular, düştüm cidden hayrete*
Bi darek xurmê da ez daliqandim	*Kafesimi astılar, bir hurma ağacına*
Ji kerb û hesretan wan ez teqandim	*Ki çatlattılar beni, üzüntü ve hasretten*
Da wan bi min giyayê sebz û hêşîn	*Verdiler onlar bana, taze ve yeşil ottan*
Heta heyvek temam bû xoş bi te'yîn	*Belirlenmiş süreyle, bir ay tamam olunca*
"Fequltûşşî're fîl efnanî welcû'	*"Bu yüzden şiir dallarda ve açlıkta dedim*
We kanû cami'în bilqewlî mesmû'"[136]	*Ve toplanmışlardı, sözlerimi dinliyorlardı"*[136]
'Ecêb mabûn ji sewt û gazî yû deng	*Kalmıştılar hayrette, seda, avaz ve sesten*
Nedîbûn qet çu caran Ademîreng	*Görmemiştiler asla, Âdemoğlundan bir fert*
Ji derdê cû' û xem heta ku carê	*Derdinden ben açlığın, hem de gamdan bir sefer*
Hejand xwe ez ji darê ketme xarê	*Salladım ben kendimi, düştüm ağaçtan yere*

[136] Ev malika Erebî ye; wateya wê bi Kurmancî wiha ye: "Lewma dibêm helbest di birçîtî û şaxan de ye; Û ew hatibûn kom bibûn guh didan peyvên min."

[136] Tırnak içindeki beyit, orijinalinde Arapça olarak geçmektedir.

Tijî bin xurme bû ew darê xurma
Doldu altı hurmayla, o hurma ağacının

Me têr xwar xurme û xem çû bi ser ma
Ondan yedim doyunca, kalmadı tasam benim

Ku wan dît ez dixwim xurmayê her car
Ki onlar gördüğünde, yemekteyim hep hurma

Didan min xurme heta çendê miqdar
Verirlerdi hurmadan, bana bir miktar kadar

Dibêjin Şah got, "Ey Se'dê dildar
Derler Şehzade dedi, "Ey sevgili Sad söyle

Çi şikl û hey'et in ew qewmê mekkar
O aldatıcı kavmin, suret, şekli nasıldı

Bi ser xenzîr in ew ecsad unas e
Başları domuz gibi, gövdeleri insandı

Çi rengî ku ji dest wan bûy xilase?"
Ellerinden onların, ne şekilde kurtuldun"

Got, "Şaha, carekî wan ez bi yarî
Dedi, "Şahım, bir sefer onlar, arkadaşça

Ji dostek ra dişandim xoş diyarî
Yolladılar bir dosta, hoş bir armağan diye

Miqeffes wan hilanîm û behiştav
Kafes içinde beni, kaldırdılar hızlıca

Bi rê da çûn gehiştin ser yekî av
Gittiler yolda onlar, vardılar bir pınara

Ji 'erdê danîm wan meşxûl û pirr tab
Bıraktılar oraya, yorgun, meşgulken onlar

Qefes min avêt û ez çûme nêv ab
Kafesi üzerimden, attım, daldım suya ben

Go hey hey ew revî dest kir şitabê
Dedi, hey hey kaçıyor, yeltendiler hızlıca

Kirim dûr ez ji wan pêlên di abê
Uzaklaştırdı onlardan, beni su dalgaları

Xilas bûm ez ji dest wan kerê boz	*Boz renkli eşeklerin, kurtuldum ellerinden*
Bi avê da diçûm heta be penc roz	*Gittim suda yüzerek, ta beş gün süreyle*
Di avê da me dîtin çend zengî	*Suda gördüler beni, zencilerden birkaçı*
Di gemiyê da hemî çenkal û çengî	*Geminin her tarafı, çengeldi, kargılardı*
Ku wan ez dîm û girtim şibhetê seyd	*Beni nasıl gördüler, tuttular av misali*
Hilanîm û birim wan ez kirim qeyd	*Kaptılar götürdüler, kayda vurdular beni*
Gihiştin ta mekanek sebz û exder	*Ulaştılar bir yere, sebzelik, yeşillikti*
Bi min dan bê ‘eded badam û şeker	*Sayısızca verdiler, bana badem ve şeker*
Li wêr mam ez gelek miqdarekî pirr	*Orda kaldım fazlaca, uzun bir süre için*
Nebûn xafil li min feqet ew seyê dirr	*Üstümdeydi gözleri, o yırtıcı itlerin*
Ji şeker hem giyah ez bûm wekî meşk	*Şekerle ot yemekten, oldum tulum gibi*
Fefîr-rîhû qurbe wek kurebeşk	*Hava üflenmiş kırba, tıpkı porsuk misali*
Digotin be’zekan dê bixwun nêçîr	*Bazıları diyordu, yiyelim avımızı*
Welê be’zek digotin beyne bo mîr	*Ancak bazıları da kalsın bey için derdi*
Mihessel, ez hilanîm wan seyê pîr	*Özetle kaldırdılar, beni o koca itler*
Birim gemiyê bibin bo Zengiyê Mîr	*Gemiye götürdüler beni, bey zenci için*

Welê keştî mi'elleq ma di derya	*Ancak gemi takıldı, rüzgârsız o denizde*
Heta sê roj nebû bayek miheyya	*Üç gün boyunca rüzgâr, esmedi hiçbir yerden*
Ji nageh rabû mewc û pêlê behran	*Birden yükseliverdi, denizin dalgaları*
Ji jor da av dihat teşbîhê tofan	*Yağdı gökten yağmurlar, tıpkı tufan misali*
Bi şiddet rabû bayek zêde feyroz	*Şiddetle esiverdi, çok uğurlu bir rüzgâr*
Hilanî gemî bir heta çil roz	*Kırk gün boyunca bizi, gemiyle hep yüzdürdü*
Ku sekinîn mewc û pêl û ba û baran	*Ki durduğunda dalga, hem de rüzgarla yağmur*
Eyyam xoş bûn, qerîb dîn şehrê 'Umman[137]	*Durup düzeldi hava, göründü Umman şehri[137]*
Nebû taqet ji wan ra ku xilas bin	*Kalmadı takatleri, ki kurtulabilsinler*
Ji bo wî agirî dê ew risas bin	*O ateşe karşılık, onlar kurşun olacak*
Wekî dît şehrê 'Umman hatin zengî	*Umman şehri ki gördü, gelmekteler zenciler*
Bi hev ra hatinê vêkra bi cengî	*Hep birlikte geldiler, cenk için önlerine*
Di gemiyê da deranîn ew seyê pîr	*Gemiden çıkarttılar, o kocamış itleri*
Yekayek kuştin ew teşbîhê xenzîr	*Birer birer öldürdü, onları domuz gibi*

[137] "Umman", li başûrê rojhilatê nîvgirava Erebîstanê, li peravê okyanûsa Hindî de welatek e. Payîtextê vî welatî, Mesqat e. Tê gotin ku li Ummanê, yekemîn şopên bicihbûna mirovan, berya 10 hezar sal berê ye.

[137] "Umman", Arabistan yarımadasının güneydoğusunda, Hint okyanusuna kıyısı bulunan bir ülkedir. Başkenti Maskat'tır. Umman'da, ilk yerleşme izlerinin, 10 bin yıl öncesine tarihlendiği söylenmektedir.

Xilas kirim ji dest wan xelkê ‘Umman
Me got hemdê Xuda û şikrê Rehman

Kurtardı ellerinden, beni Umman’ın halkı
Dedik hamd Allah’adır, hem de şükür Rahman’a

Heta heyvek li wê mam bûme rahet
Ji dest min çûn qerar û sebr û taqet

Bir ay kadar orada, kaldım rahat ettim ben
Çıktı elimden benim, karar, sabır ve takat

Digel karwaniyan hatim miqabil
Serendîb, bûm meyyit can bû bi wasil”

Geldim kervanlar ile beraber, karşısına
Serendip’in, ölüyken dirildim kavuşmayla”

Li paşan Şahizade xoş beyan kir
Hewalê rencê xwe bo wî ‘eyan kir

Ardından anlattı hoş, Şehzade ona tamam
Darlık, zahmet, eziyet, başından geçenleri

Ji destê mihnetê Mîrê bi huner
Ji bîr kir rencê xwe Se’dê dilawer

Eziyetler ki çekmiş, elinden Hünerli Bey
Kahraman Sad unuttu, zahmetini kendinin

Dibên Se’dulmilûk go, “Ya emîrem
Nîşanek qet heye ez baxê Îrem”

Dediler Sadülmülûk, sordu dedi “Ey beyim
Bağlarından İrem’in, bir işaret var mıdır”

Miferreh bedrê enwer go dilawer[138]
“Şikirdarem nîşan û namê dilber

Ferahla o yiğide, parlak dolunay dedi,[138]
“Şükürler ediyorum, ad, sanıyla o dilber”

Li paşan ‘ehdê xwe û Melke Xatûn
Beyan kir bo xwe Se’dê teb’mewzûn

Ardından ahdini ki, Melke Hatun’la olan
Anlatıp açıkladı, hoş tabiatlı Sad’e

[138] Mebest li “dilawer”, Se’dulmilûk, “bedrê enwer”, Seyfulmilûk e.

[138] “Yiğit”ten maksat, Sadülmülûk, “parlak dolunay”dan maksat Seyfülmülûk’tür.

Şîrîn got, “Melke û Bedra minewwer	*Şirince dedi ona, “Melke’yle nurlu Bedre*
Bi sê roj dî diête ew mahê peyker	*Üç gün sonra gelecek, yüzü ay gibi güzel*
Kî ye’nê bintê Şehbal ez Îrembax	*Yani kızıdır onun, İrembağ Şehbal’inin*
Biêt dilxoş biket can di nêv bax”	*Gelecek gönlümü, hoş edecek bağında”*
Şîrîn got, “Se’dê mehrû şikrê Sami’[139]	*Şirin dedi, “Şükür Allah, ey ay yüzlü Sad[139]*
Neçû rencê me û Şehzade zayi”[140]	*Boşa gitmedi ey Şehzade, çektiğimiz renc”[140]*
Hikayet wî temam bû şemsê ba mah	*Tamam oldu hikâye, ay ile güneşin hem*
Şîrîn rabûn ji dîwanê heremgah	*Kalktılar şirin tarzda, divanından haremin*
Xiramên nazenîn mest û durrefşan	*Nazikçe salınarak, mest ve inci saçarak*
Berê xwe dane eywanên zerefşan	*Dönüp gittiler onlar, altın yaldızlı köşke*
Li ser textan rûniştin mislê xanan	*Oturdu tahtlarına, tıpkı hanlar misali*
Çahvnêr bûn ji dil bo weslê canan	*Gönülden gözlüyordular, kavuşmayı canana*
Were saqî şerabê erxewanî[141]	*Gel ey saki, getir sen, erguvanî şaraptan[141]*
Tu bîne tê hene sirrê nihanî	*Getir ondan sen bize, onda var gizli sırlar*

[139] Ji “Sami”” mebest, Xwedê ye ku bihîstyarê hemû dengan e.

[140] “Renc”, azar û bela nin ku bi ser wan de hatinin.

[141] Mebest ji “erxevanî”, rengekî di navbera sor û eflatûnî de ye.

[139] “Sami””den maksat, her sesi duyan Allah’tır.

[140] “Renc” çekilen eziyet ve acılardır.

[141] “Erguvanî”, erguvan çiçeğinin rengi; eflatunla kırmızı arası renk.

Bibûsim ku lebê camê şekerleb	*Öpeyim dudağından, şeker dudak kadehin*
Ji şem'ê ra xeber dem zulmetê şeb[142]	*Muma anlatayım ben, zulmetini gecenin[142]*
Çi xoş zewq e ji cam û badeya saf	*Ne hoş zevktir şarapla, hem de şeffaf kadehle*
Munîr bit qelbê zulmet qaf ta qaf	*Karanlığının kalbin, aydınlanması tümden*
Ji weslê dilrûbayên xweş 'ibaret	*Sade hoşluk olan güzellerin vuslatından*
Peyapey bên li pey hevdu beşaret	*Müjdelerin gelmesi, birbiri peşi sıra*
Dilê danayê 'arif û mi'erref	*Gönlü bilge kimselerin, bilenle bilinenlerin*
Nezerbaz e li ser husna mişerref	*Gözleri cilve eder, şerefli güzellik üzerinde*
Eger çendan ku dilxoş bû ji Se'dî	*Her ne kadar memnundu, Sad'ı bulduğu için*
Welakin qelb û rûh û meyl û cehdî	*Ancak kalbiyle ruhu, hem meyil ve çabası*
Li ser husna cemalê le'lê qend bû	*Şeker dudaklının güzelliği üstündeydi*
Tecella û kemalatê bilind bû	*Yüksek tecelli, hem olgunluklar üstünde*
Digel Se'dî bû teqrîr û 'ibaret	*Sad ile sohbet edip, konuşup dururlarken*
Tulû' da fecrê 'uşşaqê beşaret	*Aydınlattılar fecri, müjdenin âşıkları*
Ji birca ehsenê Cewzayê rengîn	*En güzel ve de renkli, İkizler Burcundan*
Ji le'lê me ji şemsê bû bi mizgîn	*Dudaklarımıza bizim, müjde geldi güneşten*

[142] Mebest ji "zulmet"ê, herçend tariya şevê be jî, li vir, armanc, porê reş yê serdilkê ye.

[142] "Zulmet", karanlık anlamındadır, ancak burada kastedilen sevgilinin siyah saçlarıdır.

Ku kebk û tawûs û bilbil rengreng	*Ki güvercin ile tavus, hem rengârenk bülbüller*
Bi xulxul hatin ew ser werdê bê şeng	*Neşesiz güllerin üzerine, geldiler uğultular ile*
Dibêjin Bedre hat nik Şahizade	*Derler ki Bedre geldi, yanına Şehzadenin*
Go: "Mizgînî, tu rabe sînesade	*Dedi, "Müjdeler olsun, kalk ey temiz yürekli*
Biçin baxî temaşa keyn ji lale	*Gidip de izleyiniz, laleleri bahçede*
Miferreh hat bintê Şahibale!"	*Gönlünüz rahat olsun, geldi Şehbal'in kızı"*
Dibên Şehzade û Se'dê dilawer	*Derler ki Şehzade'yle, arkadaşı yiğit Sad*
Digel Bedre ku çûn nêv baxê dilber	*Bedre ile birlikte, vardı dilber bağına*
Dibên yek çadirê dîba mineqqeş	*Derler gayetle süslü, ipekten bir çadırda*
Qerar girt Şahizade û Se'dê dilgeş	*Gelip de oturdular, Şehzadeyle mutlu Sad*
Sa'etek bûne meşxûl ew ji bade	*Oldular meşgul onlar, bir saatlik badeyle*
Nezer kir dît hatin sînesade	*Baktılar gelmekteler, albenili güzeller*
Kî ye'nê dilrûbayên mahê peyker	*Ki yani ay yüzlüler, gönül çalan güzeller*
Letîf û nazik û mehbûb û dilber	*Sevimli, dilberdiler, hoş ve cilveliydiler*
Bi ref ref ta tên ew teşbîhê qazan	*Geliyorlardı saf saf, tıpkı kazlar misali*
Gelek xoştir bû dengê wan ji sazan	*Sesleri gayet güzel, sazlardan bile hoştu*

Misalê kebk û tawûs û keboter	*Keklik ve tavus gibi, hem güvercin misali*
Tijî kir bax û ser werdên ehmer	*Doldurdular bahçeyi, hem kırmızı gülleri*
Bi keyf û zewq û şadî yû bi govend	*Keyifle, zevklenmekle, halaylarla, mutluca*
Direqsîn bir be bir xûb û şekerxend	*Sırayla raks ederdi, o tatlı gülüşlüler*
Ji mehtabê rûxê periyanê sade	*Parıldayan yüzüne, o parlak perilerin*
Nezerbaz bûn Se'd û Şahizade	*Seyredip bakarlardı, Sad ile hem Şehzade*
Ji husnê wan letîf û mahê peyker	*Hüsnünden ki onların, o hoş, ay yüzlülerin*
Miheyyer bûn Şeh û Se'dê dilawer	*Hayrette kalmıştılar, Şah ile kahraman Sad*
Ji bona serwebanûya semenber	*Servi boylu hanıma, o yasemin yüzlüye*
Vegirtin çadirê ji dîbayê exder	*Kurdular bir çadırı, yeşil ipek kumaştan*
Tê raxistin firaşê etlese zûd	*Hızla serdiler onda, atlastan sergileri*
Mi'etter kir ji bêhnê 'enber û 'ûd	*Saçtılar her tarafa, amber ve öd kokusu*
Bi nêzîk çadirê Şahê dilawer	*Çadırına yakın, kahraman Şehzadenin*
Dibên borîn perîrûya semenber	*Derler geçti periler, hem yasemin yüzlüler*
Nedî Şehzade lêkin ew perîrû	*Görmedi Şehzade, ancak peri yüzlüyü*
Çeleng borîn û xoş ba Serwebanû	*Gelip geçtiler güzel, servi hanım yanına*

Ku çûn bin çadirê dîba perîweş	*Girdiklerinde peri yüzlüler, ipek çadır içine*
Gerandin saqiyan fincanê zergeş	*Gezdirdiler sakiler, altından fincanları*
Ji le'lê camê leb bûn mest û mexmûr	*Kadehleri içmekten, oldular mest ve mahmur*
Fîxan kir çeng û nay û saz û sentûr	*Feryat etti çenk ve ney, hem de saz ile santur*
Bedîa Ba Cemala naz a perwer	*O Bediülcemal ki, nazlıydı, sevgiliydi*
Bi Melke got misala şîr û şeker	*Melke'ye deyiverdi, süt ve şeker misali*
"Çi rengî tu xilas bûyî ji behran?	*"Ne şekilde kurtuldun, o denizlerden söyle*
Bibêj bo min temamê derd û kesran	*Baştan başa anlat sen, dert, ıstıraplarını*
Ji destê wê perîzadê bi qewwet	*Elinden o perinin, o kuvvetli oğlanın*
Xudancah û meratib û bi şewket	*Ki mertebe sahibi, makamla iktidarın*
Me qesd kirbû bişînin bo te imdad	*Niyetlendik imdada, gönderelim biz kuvvet*
Xilas keyn te ji mekkarî perîzad	*Ta o peri oğlandan, hilekârdan kurtarmak*
Welêkin şikir hatî tu selamet	*Ancak şükürler olsun, geldin sen selametle*
Bibêj bo min hewalê xwe hikayet!"	*Anlatıver sen bana, başından geçenleri"*
Şîrîn got Melke û mehbûb û dilber	*Melke tatlı anlattı, sevimli hem sevgili*
"Ji hatinê min sebeb bo yek dilawer	*"Bir yiğit kişidir, gelmeme sebep olan*

Xwedêtirs û hunermend û bi qewwet	*Allah'tan korkan biri, hem hünerli, kuvvetli*
Xudancah û meratib û bi şewket	*Makam, mertebe ehli, hem iktidar sahibi*
Emin û 'alim û dana û 'aqil	*Güvenilir ve bilgin, bilge, akıl ehlidir*
Şîrînlefz û şekerrîz husnê kamil"	*Lafzı şirin, şekerli, güzellikte olgundur"*
Perîrûyê go, "Ey Melke çi rengî	*Peri yüzlü dedi ki, "Ey Melke ne şekilde*
Li wê peyda bû ew mexmûrî û bengî	*Göründü sana o zat, o mahmur, tutkun kişi*
Nehin taqet ji bo ewladê Adem	*Takati yetmez ona, Âdemoğlu birinin*
Ku wasil bin li wî ey yarê hemdem"	*Ki vasıl olsun ona, ey canciğer sevgili"*
Dibêjin Melkeyê şîrîn riwayet	*Derler ki Melke Hatun, etti şirin rivayet*
Ji ewwel ta bi axir kir hikayet	*Başından ta sonuna, anlattı öyküsünü*
Ji halê xwe û Şehzade seraser	*Kendiyle Şehzade'nin, halinden baştan başa*
Ji dil guh dabûyê serwî-semenber	*Yürekten dinlemişti, yasemin yüzlü servi*
Ji nageh hat sewtê mislê Dawûd	*Ansızın geldi bir ses, Davut sesi misali*
Bi eş'arên Lubeyd tenbûr û ez 'ud	*Lübeyd'in şiirleri, tambur ve ut birlikte*
Bedîa Ba Cemala teb'mewzûn	*Tabiatı hoş, güzel, Bedülcemal Hatun*
Şîrîn û nerm go: "Ya Bedre Xatûn	*Tatlıca, yumuşakça, dedi, "Bedre Hatun*

Çi xoş denge diête min her peyapey
Ji wê sewtê dilê miriyan dibit heyy

Ne güzel bir sestir ki, geliyor dalga dalga
Öyle bir ses ki ondan, dirilir ölü kalpler"

Go, "Ew Şehzadeye wek durrê meknûn
Di nêv behran xilas kir Melke Xatûn"

Dedi, "O Şehzadedir, saklı bir inci gibi
Kurtarandır denizden, kardeş Melke Hatun'u"

Perîrûyê go, "Ey Bedra minewwer
Tu rabe çîn temaşe keyn dilawer"

Dedi o peri yüzlü, "Sen ey nur saçan Bedre
Kalk gidip izleyelim, o kahraman kişiyi"

Ku Melke îna şîrîn çi rengî
Li min xoş tên sedayê wî yû dengî

Ki Melke'yi getirince Şirini, bir şekilde
Hoş gelmekte bana onun, sesi ile sedası

Di dil Bedrê wisa bû her bi meqsûd
Dixwest ew hal û axir bû bi mewcûd

Bedre'nin de gönlünde, öyle bir maksat vardı
İsterdi artık o hâl, akıbet hasıl olsun

Çeleng rabûn çûn serwa semenber
Temaşe ken ruxê xûbê dilawer

Güzeller kalkıp gittiler, yasemin serviler
İzlemeğe yiğidi, o hoş, güzel yüzlüyü

Li bin darek rûniştin du miqabil
Nezer dan husn û nûra bedra kamil[143]

Karşıda bir ağacın, oturdular altına
Baktılar o hüsnüne, dolunayın nuruna[143]

Welê Şehzade serxoş bû ji şewqê
Mey û cam û şerabê 'eşq û zewqê

Ancak aşkın şevkinden, sarhoş idi Şehzade
Aşk ve zevk içkisinden, kadehle, şarabından

[143] Mebest ji "bedra kamil", heyva çardeşevî, ango Seyfulmilûk e.

[143] "Dolunay"dan kasıt, Seyfülmülûk'tür.

Ji wî rengî digotin qewl û eş'ar	*Söylüyordu öylece, deyişlerle şiirler*
Miqabil bûn ji wî du mest û xummar	*Karşısında durmuştu, iki mest ile sarhoş*

XEZEL-9

Sohtim bi 'eşqê narê hibba Bedî'ul Cemal

Perwanereng ji şem'ê sohtin li min per û bal

Wek bilbil ez 'eşqê gul nalîn me tên xoş ji dil

'Eşqê hebîb ez kirim zil û zerd û ze'îf wek hilal

Şeb ta seher dinêrim husn û cemalê kewkeb

Feqet nabînim husnekî ehsen ji bedra kemal

Heta bit 'umrê baqî çavnêr im cam û saqî

Ya zehrê camê firqet, ya qetreyê ez wisal

Şahidê dil Xwedê ye nînin di dil me hibbek

Hember bi 'eşqa te bî, talib in fikr û xiyal

GAZEL-9

Aşk ateşiyle yaktı beni, Bediülcemal'in sevgisi

Yaktı kolumu, kanadımı, mumda yanan kelebek gibi

Yürekten hoş gelir inlemem, bülbülün gül aşkı gibi

Sevgilinin aşkı kamış gibi, sarartıp zayıf kıldı hilal gibi

Bakarım geceden ta sehere, yıldızın güzellikle hüsnüne

Ancak göremiyorum ben, dolunaydan daha güzel

Ömrüm vefa ettikçe, olacaktır gözüm, kadeh ile sakide

Ya ayrılık şarabının zehri ya kavuşmanın damlaları

Allah'tır gönüllerin şahidi, gönlümüzde yoktur bir sevgi

Senin aşkına denk gelecek, isteğisin fikir ile hayalimizin

Sakinê pûtxane me çavnêrê wesla te me	*Puthanenin sakiniyim, ancak gözüm sana kavuşmadadır*
Sewdayê zilfa te me dêmdurr û ebrûhilal	*Vurgunuyum zülüflerinin, ey inci yanaklı, hilal kaşlı*
Feqet kes wekî me nabit şeydayê camê ‘işqê	*Ancak yetişemez bize kimse, delisi olmakta aşk şarabının*
Zehrî bîlaçeşîd e dil bendeyê xett û xal	*Çiçekler sayısızdır ancak gönül bendesidir benle boyun*
Ger ez bibînim wesletê ehwalê rencê firqet	*Görsem şayet vuslatı, hallerini ayrılık acısının*
‘Erzê hebîb kem ji serê heta dibitin zewal	*Sunacağım sevgiliye, baştan ta bitene dek*
Camê firaqê ez kirim ser ta be pê Siyahpoş	*Ayrılık şarabı etti beni, baştan ayağa dek Siyahpûş*
Ya Reb vexwim qetreyê weslê Bedîulcemal	*Nasip et ya Rab içeyim, katresini Bediülcemal vuslatının*

Bedîa Ba Cemala nazperwer	*Nazlı ve cilveli Bediülcemal Hatun*
Ku dît Şehzadeyê mest û dilawer	*Görünce mest ve yiğit Şehzadeyi*
Xedeng û tîrê hibb û ‘işqê sadiq	*Oku, şişi sevginin, hem de gönülden aşkın*
Ji ser dil ket hezar reng bû bi ‘aşiq	*Değdiğinde gönlüne, bin renkle oldu âşık*
Cezib kir hibbê dil dildarê meczûb	*Çekti gönül sevgisi, cezbe kapılmış âşığı*
Bû metlûb û rûyê talib û metlûb	*İstenen oldu yüzü, isteyen ile istenenin*

Ji dest çûn keyf û xoşî zewq û rahet	*Elinden çıktı keyif, güzellik, zevkle rahat*
Neman bo wî qerar û sebr û taqet	*Kalmadı onun için, karar, sabır ve takat*
Çiqas Şehzade leyzend têlê tenbûr	*Şehzade ne kadar ki, vurdu tambur teline*
Dilê mestan dibû zêde bi rencûr	*Daha çok incinirdi, gönlü mest düşmüşlerin*
Ji awazê sedayê Şahizade	*Yankısından sesinin, tutkun Şehzadenin*
Tijî bû dil ji ‘eşqê sînesade	*Dolup taştılar aşktan, sinesi parlakların*
Şîrîn go Bedrê rabe ey perîweş	*Bedre şirince dedi, kalk ey peri güzeli*
Nizanî ku ji dest çûn taqet û heş	*Bilmiyordu ki ondan, gitmişti akıl, kuvvet*
Çiqas go rabe tu ey nazenînê	*Her ne kadar ki Bedre, kalk ey nazenin dedi*
Peyapey wê dirêht xwîna birînê	*O döküyordu yavaşça, yarasından kanları*
Mihessel, rabû ew zêde bi naçar	*Sonuçta o da kalktı, çok çaresiz olarak*
Bi qamê xwe şikestî dil birîndar	*Bükülmüştü boy posu, kalbi ise yaralı*
Di dil da ku mebada kes nizanî	*Gönülde olanı ki, sakın kimse bilmesin*
Xemê ‘eşqê hebîb dê bit nihanî	*Gizli kalması gerek, aşk gamı sevgilinin*
Bi nermî hate çadir ew şirînsur	*O şirin tabiatlı, geldi çadıra sessiz*
Xemê ‘eşqê hebîb xwar bê ‘eded pur	*Aşk gamını habibin, sayısızca çekti o*

Wekî mestan dikir xweş xweş nezare	*Sarhoşlar misali o, güzel güzel bakardı*
Niyet kir ku libas ket pare pare	*Parçalamak istedi, üstündeki giysiyi*
Ji derdê ‘eşqê Şehzade hezîn bû	*Hüzünlendi derdinden, aşkın yine Şehzade*
Bi ah û şîwen û derd û birîn bû	*Ah edip yas tutarak, dertlenip yaralandı*
Go ta key ez xemê ‘eşqê nihan kem	*Ne zamana dek dedi, aşk gamını gizlemek*
Ji kê ra sirrê mexfî ez beyan kem	*Kime açacağım ben, gizli, saklı sırları*
Gelek dîtin ji ‘eşqê derd û asîb	*Çok gördü aşk derdinden, dertler ile belalar*
Bi ser çû roj û hat ewqatê mexrib	*Geçti gündüz vaktı, geldi mağrip zamanı*
Were saqî werîn camê hilalî	*Gel ey saki, getir sen, hilal gibi kadehi*
Ji wê tê reng û bû ta’mê wisalî	*Ondan gelir renk, koku, hem de tadı visalin*
Di hîna ku bibînim camê weslet	*Henüz görmemiş iken, onlar vuslat camını*
‘Erz kem derd û dax û rencê firqet	*Arz edeyim fırkatin, dert, dağ, eziyetini*
Ji nefsê mitmeînne rencê mazî	*Tatmine varmış nefse, geçmişin acıları*
Bi ser dê çîn yeqîn dê bîte razî[144]	*Yüklenirse başına, kesin olacak razı[144]*

[144] Di vê malikê de, îşareta ayetên 27. û 28. ên sûreya Fecrê hatiye kirin. Bêjeya “mutmaînne” û “marziyye” du bêjeyên Quranî nin. Di heman wextê de, nêrînek tesewifi ye ku “tetmîn/mutmeîn”, “razî/merziye” du qonaxên nefsê nin. Nefsa ku gihaştiye qonaxa tetmînê, di pêngavek din de vedigihê qonaxa riza/razîtiyê. Ji bo vê yekê, bnr. têbiniya 29.

[144] Bu beyitte, Kur’an’ın Fecr Suresi, ayet 27 ile 28’de geçen “mutmainne” ve “marziyye” ifadelerine işaret edilmiştir. Aynı zamanda, tasavvufi bir yaklaşımdır; “tatmin/mutmain” ve “razı/marziye”, tasavvufta nefsin iki aşaması kabul edilir. Manevi tatmine kavuşan nefsin bir üst (gelişmiş) aşaması rıza/razılık makamıdır. Bkz. 29. dipnota.

Ku mazî bû nefsê nûra tecella	*Ki olsa geçmiş zaman, tecelli nurun kendisi*
Dê wasil bit kemalatê mi'ella	*Vasıl olur mutlaka, yüce olgunluklara*
Nesîmê xweş ê ji mexribê biharî	*Hoştur meltem rüzgârı, akşamı baharların*
Hejandin sinbil û reyhanê tarî	*Sallıyor sümbülleri, hem kara reyhanları*
Li ser wechê gulê xûh bûn belave	*Gül yüzünde dağılmış, terler ile şebnemler*
'Ebîrên reş ji enyê kir silave	*Alnından kara miskler, duruwerdi selama*
Dibêjin Melke û Bedrê ji çadir	*Derler Melke'yle Bedre, çadırdan her ikisi*
Çiraya wesletê yaran hil kir	*Yaktılar âşıkların, kavuşma çırasını*
Ji bêhnê 'enber û fincanê zergeş	*Kokusundan amberin, altınlı fincanların*
Dilê 'uşşaqan bû mest û mişewweş	*Âşıkların kalpleri, oldu mest ile sersem*
Çahvnêr bû gelek Şehzadeyê mest	*Mest düşmüş şehzadeler, gözlüyorlardı çokça*
Digel canan bibit wasil û sermest	*Kavuşup sermest olmak, cananlarla birlikte*
Ku Melke û Bedre Xatûn ken ricayê	*Ki ricaya başladı, Melke'yle Bedre Hatun*
Ji wê şekerleb û şîrînliqayê	*O şeker dudaklıdan, o şirin çehreliden*
Riza det wan ji zarê sînesade	*Razıyım demesini, o temiz yüreğinden*
Cemalê xwe nîşan det Şahizade	*O güzel cemalini, göstersin Şehzadeye*

Di dil bû ew temenna Mîrê sadiq	*Arzuluyordu kalpten, o doğru olan Beyi*
Bê hayî bû ji wî ku bûye ‘aşiq	*Habersizdi o ondan, kendisine âşıkından*
Bi damê mihbetê bûye girîftar	*Düşmüş sevgi tuzağına, yakalanmıştır ona*
Ji tîrê ‘eşqê dil bûye birîndar	*Gönlü yaralı olmuş, aşk oklarından onun*
Ji dest çûn xwarin û xew durrê meknûn	*Kalmamış yemek uyku, o saklı inci için*
Ji derdê ‘eşqê bû rencûr û mehzûn	*Aşk derdinden olmuştur, hasta ile hem mahzun*
Di meclîsa şeva wek zilf û xalan	*Meclisinde gecenin, ben ve zülfe benzeyen*
Bedîa Ba Cemal mabû d’xiyalan	*Kalmıştı hayallerde, güzel Bediülcemal*
Ku mest bûn sînesade j’camê zergeş	*Ki altın kadehlerden, mestti saf yürekliler*
Bi Bedre go, şîrînşoxa perîweş	*Peri misal o güzel, döndü Bedre’ye dedi*
“Ku îşev ez nexweş im ba behane	*“Ki olsun bahaneden, bu akşam ben hastayım*
Divêtin bo me yek şîrîn behane”	*Gerekli olsun bana, bahaneden bir şirin”*
Bi nermî Bedreyê nazperwerîde	*Bedre usulca dedi, o nazlı, cilveliye*
Go, “Ez dîde bibêjim yan şenide”	*“Görmek ya da işitmek, hangisini diyeyim”*
Şîrîn got nazika xub û şekerrîz	*Şirince dedi nazlı, hem güzel, tatlı dilli*
“Bibêj ez herdu ta xoş ‘enberamîz”	*“İkisinden de bahset, ta saçılsın amberler”*

Miselsel Bedreyê zilfên mi'enber
Ji hev bişkaft û 'alem bû mi'etter

Birer birer amberli, zülüflerini Bedre
Açtı biri birinden, koku sardı âlemi

Hikayet kir ji 'Asim Îbnu Sefwan
Ji ungustîl û îrsal kir Suleyman[145]

Anlatmaya başladı, Asım İbni Safvan'dan
Ki yüzüğünden onun, göndermişti Süleyman[145]

Ji hukm û 'edl û ze'f û halê şeybî
Ji fikr û hem dû'a û sirrê xeybî

Hüküm ile adlinden, zayıflık, yaşlılıktan
Fikrinden, duasından, gizli olan sırlardan

Ji wê şoxa Yemanî sînesade
Ji bûn û 'îlm û 'eqlê Şahizade

O Yemenli güzelden, o saf, berrak yüzlüden
Doğmasıyla ilminden, aklından Şehzadenin

Ji şekl û sûret û libasê mezkûr
Ji 'aşiqbûnê Mîrê mest û mexmûr

Şeklinden, suretinden, bahsi geçen giysiden
Tutulması aşkından, o mest ve mahmur beyin

Ji derdê mihbetê zarî yû efxan
Ji destûrê Şeh û keştiyê behran

Sevgi derdinden, ağlama ve feryatlardan
Şah'tan izin alışından, gemilerle denizlerden

Ji mêhvandariya Fexfûr û Xaqan
Ji ba û xerq û hicranê 'uşaqan

Fağfur ile Hakan'a, misafirliği onun
Rüzgârlarla batmalar, dostlarından kopmalar

Ji cengê zengiyan û bintê kuftar
Ji serwehş û ji qedrê şahê seksar

Zencilerle cenginden, sırtlanların kızından
Domuz kafalılardan, it başlılar şahından

[145] Mebest ji "Suleyman", Cenabê Suleyman e.

[145] "Süleyman"dan kasıt, Hz. Süleyman'dır.

Ji teyr û herdu heval û ji ejder
Kartal ile ejderden, hem iki arkadaştan

Ji derd û mihnet û qesrê li bin zer
Dertlerden, sıkıntıdan, altın dipli saraydan

Ku tê da Melke û qetlê perîzad
Ki onda idi Melke, öldürüldü peri zat

Ji masî yû ji Tacê ‘em be îcad
Hem balık olayından hem Tac amca planı

Ji daxilbûnê wî şehrê Serendîb
Girivermesinden onun, ta Serendip şehrine

Ji Se’dê dilgeş û pirnaz û terxîb
Gönlü şen ve çok nazlı, rağbet sahibi Sad’dan

Yekayek kir hikayet ‘enberîn xal
Birer birer anlattı, benleri amber kokan

Welê zêde ji ‘eşqa bintê Şehbal
Ancak çokça aşkından, bahsetti Şehbal kızının

Çiqasî qisse kir Bedre nerm nerm
Bedre ki konuştukça, yumuşakça, usulce

Bedîa Ba Cemal girya germ germ
Sıcak sıcak ağladı, güzel Bediülcemal

Gelek tekrar kir Bedra şîrînxal
Fazlasıyla bahsetti, benleri şirin Bedre

Ji ‘eşqê Şahizade û bintê Şehbal
Şehbal kızına olan, Şehzade’nin aşkından

Perî go “Ez dibêm bêje hikayet[146]
Peri dedi Bedre’ye, “Dedim anlat hikâye[146]

Tu waqî’ bûy bi qissek bê nihayet”
Sen ise çıkverdin, bitmeyen bir olayla”

Şîrîn go, “Bedreyê ey sînesade
Bedre şirince dedi, “Ey gönlü temiz güzel

Bibêjim ez ji ‘eşqê Şahizade
Anlatayım sana ben, aşkından Şehzade’nin

[146] Mebest ji “Perî”yê, Bedîulcemal” e.

[146] “Peri”den maksat, Bediülcemal’dir.

Ji ‘eşqê te çi dîtin derd û mihnet
Ku qelbê te digel wî bête rehmet”

Aşkından ki o senin, ne eziyet dert görmüş
Ki onla senin kalbin, gelsin ta merhamete”

Perîrûyê go, “Ey Bedre çi meqsûd?
Dikî wê qissetê tekrar û mewcûd!”

Peri yüzlü Bedre’ye, dedi, “Nedir maksadın
O olayı tekrarla, getirirsin gündeme”

Şîrîn go, “Bedreyê wek durrê meknûn
Miradê Şah û mader Melke Xatûn

Saklı inci Bedre ki, dedi ona şirince
“Şah’la anne muradı, hem de Melke Hatun’un

Ewe ku em bikeyn bo te hikayet
Hewalê Şahizade bittemamet”

Bu olayı biz sana, edelim hikâye ki
Şehzade kıssasını, erdirelim tamama

Şîrîn go dilrûbayê dil bi ‘aşiq
“Nizanim kazib e yaxû bi sadiq

Gönül kapan şirince, gönlünde aşk olarak dedi,
“Bilmiyorum ben, yalan mı, doğru mudur

Perî yû Ademî qet cufte nabin
Di nav wan de gelek perde w’hicabin”

Mümkün mü evlenmesi, perilerle insanın
Çünkü vardır arada, birçok engel ve perde”

Şîrîn go Melkeyê, “Pirr qewl û pirr ‘ehd
Digel Şehzade min kirye bikim cehd

Şirince dedi, “Melke, çok söz ile çok ahit
Vermişim Şehzadeye, göstermeliyim gayret

Ku tu nîşan bidey wechê minewwer
Bi Şehbazê şîrîn mest û dilawer

Ki gösterirsen eğer, parlak olan yüzünü
Şirin olan yiğide, o meste, yürekliye

Ku ew bû naciyê me j'wê belayê
Ji te em pirr diken hêvî w'ricayê"

Bi nermî go hebîba 'enberîn mû
"Bi namahrem çi reng nîşan bidem rû?

Eger bab û diya min bin bi sami'
Bi vî sirrê dibin bo min bi mani'

Ku carek dî biêm baxê Serendîb
Bibînim mader û xwahê bi terxîb"

Nerim go Bedre û Melke şemalî
Herin ciyek ji cin û însî xalî

Bila Şehzade bê yû tu bibînî
Ji ber te şerhê halê xwe bixwînî

Ji hêvî yû ricayê wan şekerbar
Riza da xoş Meha mehbûb û dildar[147]

Bêhayî bûn ji wê ew xemzeperdaz
Ê 'aşiqdil ew e, lêkin diket naz

Kî odur kurtarıcım, o bela, musibetten
Senden çokça ederiz, bizler umut ve rica"

Yumuşakça dedi o, amber saçlı sevgili
"Yüzümü namahreme, nasıl gösteririm ben

Eğer babam ve annem, bunu şayet duyarsa
Bu sır bahanesiyle, bana engel olurlar

Kî geleyim bir daha, Serendip bağlarına
Göreyim ben annemi, kıymetli bacıları"

Yumuşakça dediler, Bedre'yle parlak Melke
Gidin öyle bir yere, ki olmasın cin, insan

Varsın Şehzade gelsin, göreceksin sen onu
İzahını halinin, bakar bakar okursun

O şeker saçanların, umut ve ricaları
Hoş ikna etti ayı, sevilen sevgiliyi[147]

Habersizdiler ondan, o gamzeli güzelden
Gönlü âşıktı onun, ancak yapmaktaydı naz

147 Mebest ji "Meh"ê, Bedîulcemal e.

147 "Ay"dan maksat, Bediülcemal'dir.

Bedîa Ba Cemala ‘eşqê pirtab

Go, “Hûn rabin diêt min bê ‘eded xwab”

Bediülcemal yanıyordu, aşk ateşinden çokça

Dedi, “Çokça uykum var, varın siz kalkın gidin”

Şîrîn rabûn bi cem’ê ‘enberînxal

Welê j‘eşqê nehat xew Bintê Şehbal

Amber benliler kalktı, tatlıca ve topluca

Ancak Şehbal kızına, uyku gelmedi aşktan

Çeleng rabû bi derket ew perîweş

Cezib kir ‘eşqê Şahê mest û mehweş

O peri gibi güzel, usulca kalkıp çıktı

Mest ve ay yüzlü Şah’ın aşkı cezbetti onu

Çû nêzîk çadira Şehzadê dildar

Nezer kir xoş digotin qewl û eş’ar

Yaklaştı çadırına, gönüllü Şehzadenin

Baktı ki söylenmekte, deyişler ve şiirler

XEZEL-10

Ela ey saqîya şîrîn werîn camê j’meya ale

Li min îroj qewî b’xedr in ber û zilf û xet û xale

Şerabê erxewanî bîn di camek zernişanî bîn

Qerar û sebr û taqet çûn ji ‘eşqê Bintê Şehbale

GAZEL-10

Bana bak ey şirin saki, getir kadehi kırmızı şaraptan

Bugün çok zalimdirler bana, yüz ile zülüfler, hat ile benler

Getir erguvanî şaraptan, altın işlemeli kadehten olsun

Kalmadı karar, sabır ve takat, aşkından Şehbal kızının

Nehin min qewwet û taqet di baxê Îrem û weslet[148]	*Yoktur kuvvet ve takatim, kavuşmak için İrem bağında[148]*
Eger bim Heyderê Xazî weyaxud Ristemê Zale[149]	*Şayet ki olsam ben Gazi Haydar yahut Zaloğlu Rüstem[149]*
Hedîsê ez rûyê dil hezar defter temam naket	*Yaşadıklarımı ki gönül yüzünden, tamamlayamaz bin defter*
Çi rengî ez di medhê da nebim heyran û hem wale	*Nasıl olur da ben övgüsünde, olmayayım hayran ve sersem*
Ji le'lê qasidê dilber, sehergeh hate mizgînê	*Dilber elçisi al dudaklar, müjdeye geldiler seher vaktinde*
Perîweş têne seyranê di baxê werd û helhale	*Seyre geliyorlar peri güzelleri, gül ve lale bahçesine*
Be ref ref siyy û qaz û kew, bi çahvê xwe me dî hatin	*Gördük gözlerimizle, geldiler saf saf turnalar, kazlar, keklikler*
Dinê pirr bû ji wî reng û sadayê tewq û xelxale	*O renk ve sedalardan, dünya doldu gerdanlık ve halhallarla*
Ji dengê wan mişewweş bûm xerab û mest û bêhiş bûm	*Seslerinden onların, oldum sersem ve harap, akılsız ve mest*
Me go sed car bixêr bên ew bi ser çahvê di min xale	*Hoş gelsinler yüz kez dedim, gözüm üstüne o benliler*

148 Ji bo "baxê Îrem" bnr. têbiniya 59.

149 Ji "Heyderê Xazî", mebest, Cenabê Elî ye.
"Ristemê Zal", yek ji navdartirîn lehengê efsanewî yê Îranê ye. Ji ezbeta Eşkâniyan kurê Zal û ji keça hikumdarê Kâbilê Mîhrab ya bi navê Rûdabeyê ye. Li gor "Şehname"ya Firdewsî, Ristem bi Dêwê Spî re ceng kiriye, lehengê Îranî yê bi navê Bijen, ji çahla Efrasyabê Tûranî rizgar kiriye, tola Siyawei rakiriye, Eşkabûs û ji mîrzadeyên asê Îsfendiyar kuştiye. Li gel van qehremaniyên Ristem, wek hêlên dilşewat, bi nezanî kuştina wî kurê xwe Sohrab û ji hêla zirbirayê xwe Şexad ve, bi rêya hîle û losan, xistina wî ya çahle bi rim û xençeran dagirtî û bi tevlê hespê xwe yê bi nav Rahş e, kuştina wî tê vegotin.

148 "İrem bağı" için, bkz. 59. dipnota.

149 "Gazi Haydar"dan maksat, Hazret-i Ali'dir.
"Zaloğlu Rüstem", İran'ın efsanevî kahramanlarındandır. Eşkâniler Sülalesinden, Zal ile Kâbil Hükümdarı Mihrâb'ın kızı Rûdabe'den olma bir şahsiyettir. Firdevsi'nin *Şehname*'sinde, Div-i Sepîd (Beyaz Dev) ile savaşı, Bîjen'i Turanî Efrâsiyab'ın kuyusundan kurtarması, Siyâveş'in intikamını alması, Eşkebûs ve asi şehzade İsfendiyâr'ı öldürmesi gibi kahramanlıklarının yanı sıra, bilmeden oğlu Sührâb'la savaşıp ölümüne sebep olması ve nihayet üvey kardeşi Şeğad'ın hileleriyle mızrak ve hançerle dolu bir kuyuya düşürülerek atı Rahş'la birlikte öldürülmesi gibi hayatının trajik yanı anlatılmaktadır.

Siyahpoş û birîndar im û çahvnêr û telebkar im	*Siyahpûş'um, yaralıyım, gözetlemekteyim, arzulamaktayım ben*
Ji destê saqiya mehweş du fincanan meyê ale	*Ay yüzlü sakinin elinden içmek, kırmızı şaraptan iki fincan*

Di hîna bintê Şehbalê perîweş	*Ne vakit ki Şehbal'in, peri misali kızı*
Werengî dît Şahê mest û mehweş	*O tarz üzere gördü, mest düşmüş olan Şahı*
Ji 'eşqa wî bûye serxwoş û mexmûr	*Oldu aşkından onun, sarhoş ile hem mahmur*
Ji hibba wê bûye pirr derd û rencûr	*Çok dertlenip incindi, sevgisinden hep onun*
Bi sewtê Dawûdî şi'rên Lubeydî	*Davudî bir ses ile, şürlerini Lübeyd'in*
Ji husna Yûsifê kir hibb mezîdî	*Artırdı sevgisini, hüsnünden o Yusuf'un*
Ji camê mihbetê bû mest û serxoş	*Oldu mest ile sarhoş, sevginin şarabından*
Mişewweş bû j'eşqê kefte beyhoş	*Döndü kafası, düştü, aşkın sersemliğinden*
Welê Seyfilmilûk jê bê xeber bû	*Ancak Seyfülmülûk'ün, yoktu haberi bundan*
Ji 'eşqa wî bi ahîn û keser bû	*Çekiyordu aşkından, ahlar ile hasretler*
Ji nîvî zêde wî borandî ew şew	*Geçirdi yarısından, fazlasını gecenin*
Ji sewdayê dil û 'eşqê nehat xew	*Gelemedi hiç uykusu, aşkla gönül elinden*

Di xewra çûn temamê gurc û carî
Gürcüler, cariyeler, daldılar hep uykuya

Du çahvê Se'dê şehla û xumarî
Ancak ela gözleri, Sad'in ki sersem düşmüş

Bi tenha ma emîrê 'işqebazan
Yalnız başına kaldı, aşk oyuncuların beyi

'Eciz bû ew ji keyfê çeng û sazan
Bıkkınlık geldi ona, çenkle sazın keyfinden

Bi derket ew ji çadir mest û mexmûr
Çıktı çadırdan o an, mest ve mahmur olarak

Ji mehbûban dinêrî nêzîk û dûr
Bakardı uzak, yakın, sevgililerden taraf

Ji nageh dît wekî şem' û şemalek
Gördü ansızın bir şey, mum ve meşale gibi

Diîsa nûrê wechê rû bi xalek
Işıldıyordu yüz nuru, yüzü benli benliydi

Diîsa şibhê meş'el dêm ez nûr
Yanakları nurdandı, meşale ışıltılı

Çi geh tarî bû ew şev mislê deycûr
Ki gece karanlıktı, hem de koyu karanlık

Ku qenc nêrî ji wechê qedd û eşkal
Yüze dikkatle baktı, boyundan, eşkâlinden

Ji sûret yeqîn kir bintê Şehbal
Yüzünden anladı ki, Şehbal'in kızıydı o

Ji nûrê 'eşq sohta dil wekî zeyt
Zeytinyağı misali, yaktı aşktan gönlünü

Miqabil çû digotin înçunîn beyt
Gidip de karşıladı, şöyle beyitler okuyarak

XEZEL-11	GAZEL-11
Ey nûrê du dîde min ê, mestaneyê mexmûr	*Ey mahmur ve mest düşmüş, iki gözümün nuru*
Wey rûh û heyatê dilî, dîwaneyê mehcûr	*Ve ey aşkından uzak divane, gönlümün ruh ve hayatı*
Ey şem' û şemalê qesrê şehbalê perîweş	*Ey peri ve kuş tüyü gibi güzel, köşkümün mum, meşalesi*
Wey sebr û sikûnê dilê xemdîdeyê rencûr	*Ve ey gam yiyen, acı çeken, gönlümün sabır ve sükûnu*
Ey xonçeleb baxê Îrem Zatul-'Îmadî[150]	*Ey yüksek kulelerin sahibi, İrem bağlarının gonca dudaklısı[150]*
Wey bedr û mehê zulmet û tarîşebê deycûr	*Ve ey karanlıkların, zifiri gecelerin, ayı ve dolunayı*
Ey abê heyatê lebcamê Xidr û Elyas	*Ey Hızır'la İlyas'ın ağızlarının değdiği, hayat bahşeden kadeh*
Wey hikmetê nûrê dilî Îskenderê me'mûr[151]	*Ve ey set ve duvar ören İskender, gönüller hikmetinin nuru[151]*
Ey heyykerê emwatê lebê 'Îsayê Meryem	*Ey Meryem'in İsa'sının, ölüleri dirilten dudağı*
Wey Mûsayê 'Îmran û munacatê li ser Tûr[152]	*Ve ey sahibi münacatın, Tur'daki İmran Musa'sı[152]*

150 Ji bo "İrem zatu'l 'imad", bnr. têbiniya 59.

151 "İskender/Skender", ne ew Skender e ku jê re "Skenderê Makedonî an Romî" tê gotin. Digel ku navê wî di Quranê de derbas nebe jî, di Sûreya Kehfê, di navbera ayeta 83 -98'an de behsa wî derbas dibe. Li gor van ayetan, li hember girseyên tahdekar, talanker û êrîşkar (Ye'cûc û Me'cûc) sed û berbendek asê û qasidîn ava kiriye, ew parastinin. Navekî wî jî "Zilqarneyn" e. Li gor çavkanşyên İslamî, hemçaxê Cenabê Brahîm e.

152 "Heyykerê emwatan", ango zindîkirina miriyan, yek ji mucîzeyê Cenabê İsa ye. Bi destûra Xwedê, mûcîzeyên wek başkirina koran, ebreşan û zindîkirina miriyan delîlên pêxembertiya Cenabê İsa nin. (bnr. Sûreya Alê İmran, a. 49; Sûreya Maîde, a. 110) Ji bo "İmran" û "Tûr" bnr. têbiniyên 66., 67.

150 "İrem bağları" için, bkz. 59. dipnot.

151 "İskender", kastedilen Makedonyalı İskender (İskender-i Rûmî) değil, Kur'an'da açık ismi geçmemekle beraber, zalim, saldırgan ve çapulcu topluluklara (Yecüc-Mecüc) karşı mazlumları koruyan, onları yaptırdığı setlerle korumaya alan peygamber vasıflı İskender'dir. Diğer adı, "Zülkarneyn"dir. Kehf Suresi'nde, 83-98 aralığındaki ayetler bu zattan bahseder. Hz. İbrahim'le çağdaş olduğu söylenmektedir.

152 "Ölüleri diriltme", Hz. İsa'nın mucizelerinden biridir. Körleri, abraşları (alaca hastaları) ve ölüleri diriltme mucizeleri, -Allah'ın izniyle- Hz. İsa'ya verilen peygamberlik delilleridir. (Bkz. Âl-i İmrân Suresi, a. 49; Mâide Suresi, a. 110)
"İmran" ve "Tur" için, bkz. 66, 67. dipnota.

Çil rojî temam kir me ji ‘ehdê te riyazet	*Ahdinden senin riyazetimiz, tamam doldurdu kırk günü*
Razîim ji cemalê şihabê qebesê nûr	*Razıyım o cemalden ki, çıkar kıvılcımlar nurlu ateşinden*
Heta bi ebed serxoş û heyran bî Siyahpoş	*Siyahpûş, ta ebede kadar sen, kalasın sarhoş ve hayran*
Meyxwareyê camê lebê şehkaseyê ferfûr	*İçesin dudağından şarabı, şahlara has porselen kâseden*

Wekî Şehzade nêzîk bû ji mehweş	*Yaklaşınca Şehzade, ay yüzlü güzele*
Nezer kir kefte serpişt ew bêheş	*Baktı, sırtüstü düştü, sersem, baygın olarak*
Wekî şems û qemer enwarê tel’et	*Güneş ile ay gibi, doğunca ışıkları*
Ji husna wê munîre rengê zulmet	*Onun güzelliğinden, aydınlandı karanlık*
Ji şehdê le’lê leb şeker dibarî	*Kırmızı, bal dudaktan, yağıyordu şekerler*
Du çeşmeş ahû asan bû xumarî	*İki ceylan gözleri, baygın ve sarhoş idi*
Mi’enber zilfê mişkefşan û eswed	*Siyah ve de misk kokan, amberli zülüfleri*
Cebînbedr û qewsebrû munîrxed	*Ay alınlı, yay kaşlı, yanakları nurluydu*
Hebîb û xonçe û nazperwerîde	*Sevgiliydi, goncaydı, nazlıydı, cilveliydi*
Xettê kafûrî bû bînî keşîde	*Teni kâfur kokulu, gözleriyse çekikti*

Nerim rûnişt li balê yû hilanî
Usulca yanına o, oturdu ve kaldırdı

Serê dilber li ser zendê xwe danî
Başını dilberinin, bıraktı kollarına

Şîrîn Şehzade danîn lêv lêvî
Koydu şirin Şehzade, dudağı dudağına

Bi destê rastê girt lîmon û sêvî
Sağ eliyle dokundu, limon ile elmaya

Ji ‘eşqê dil dinêrî wechê dildar
Bakardı kalp aşkıyla, sevgilinin yüzüne

Digel şadî digotin qewl û eş’ar
Mutlulukla söylerdi, şiir ile deyişler

XEZEL-12

Ey xonçeleba! Talibê dîdarê tuwem ez
Ey gonca dudaklı, isteklisiyim ben, yüzünün senin

Çavnêrê leb û le’lê şekerbarê tuwem ez
Seyircisiyim ben, şekerli kırmızı dudaklarının senin

Talib ne bi meyxane me bo zewq û dilê xoş
İsteklisi değilim meyhanenin, zevklenmek, gönlü hoş etmek için

‘Aşiq bi du çahvê mest û xumarê tuwem ez
Aşığıyım ben, sarhoş ve baygın iki gözlerinin senin

Ey gul veke çahvan û bibîn bilbilê ‘aşiq
Ey gül, aç gözlerini, gör sana âşık olan bülbülü

Qurbanê du zilfê wekî şehmarê tuwem ez
Kurbanı olayım ben, şahmeran misali iki zülfüne senin

Ellah! Çi bi erzan tu bi destê min ketî îro
Allah’ım! Ne ucuzca düştün elime, bugün sen

Ba can û heyat û ruh birîndarê tuwem ez
Canımla, hayatımla, hem ruhumla yaralısıyım senin

GAZEL-12

Min zû te dixwestî ji mekanek wehe xalî	*Çoktandır istiyordum, böylesi tenha bir yerde seni*
We'dek bidetî 'aşiqê guftarê tuwem ez	*Tanımalısın bana süre, sözlerinin aşığıyım senin*
Melhem bikerî min bi du destê henerengî	*Merhem sürmelisin bana, iki kınalı ellerinle*
Cerhê min bibînî ku birîndarê tuwem ez	*Görmelisin yaralarımı, yaralısıyım ben senin*
Sed şikur Îlahî! Min dî husna te mikerrem	*Yüzler şükür Allah'a, gördüm senin büyük hüsnünü*
Heqqê xwe dixwazim ku emekdarê tuwem ez	*Hakkımı istiyorum, ki emek vereniyim senin*
Yek bûse ji le'lê lebê canbexşe bi min bexş	*Sun bana bir öpücük, can bahşeden kırmızı dudaklarından*
Be rûh û heyat û dilê bîmarê tuwem ez	*Ruhumla, hayatımla, gönlümle, hastasıyım ben senin*
Ev dewletê baqî bi Siyahpoş Xwedê da	*Verendir Allah elbet, bu devamlı devleti Siyahpûş'a*
Çavnêrê leb û le'lê şekerbarê tu em ez	*Seyircisiyim ben, şeker saçan kırmızı dudaklarının senin*

Dibûsîn le'lê şekerbarê mehbûb	*Öpüyordu aşkının, tatlı dudaklarını*
Digirya xoş ji zewqê weslê metlûb	*İsteğine vuslattan, zevk ile ağlıyordu*
Ji girya abê du çeşmê dilawer	*Ağlamaktan yiğidin, iki gözünün yaşı*
Nerim weşyane ser werdên ehmer	*Saçıldı yumuşakça, al gülün üzerine*

Ji bêhnê Ademî yû abê ‘eyneyn
Kokusundan insanın, iki gözün yaşından

Behiş hat û hilanîn eswedul‘eyn
Aklı başından gitti, açtı göz kapağını

Egerçî narê ‘eşqê dil germ kir
Her ne kadar gönlünü, ısıttı aşk ateşi

Welê ez naz û ‘işwe pirr şerm kir
Ancak çokça utandı, nazıyla, işvesiyle

Bi dest û asitîn rûyeş nîqab kir
Eliyle hem yeniyle, kapattı yüzünü o

Li Şehzade gelek naz û ‘itab kir
Etti o Şehzadeye, epeyce naz ve azar

Ji naz go “Ev çi kustax ê xiredmend?
Nazlanarak dedi ki, “Bu ne akıllı küstah

Çi dildarî serê min danî ser zend?
Ne âşıksın başımı, bırakmışsın koluna”

Şîrîn Şehzade go: “Ey rûh û canêm
Şehzade şirin dedi, “Ey benim ruhum, canım

Nebî yek lehze bê te rûh û canêm”
Olmasın tek bir lahza, sensiz ruh ile canım”

Li ser wechê munîr wek afitabê
Dolunay gibi olan, o parlayan yüzünden

Tu b’Xwedê key hilîn dest û nîqabê!
Allah aşkına var sen, kaldır el ve perdeyi

Bikem ‘erzê hebîb yek qisseyê dûr
Arz edem sevgiliye, uzunca bir kıssayı

Ji ‘işqê te çi reng ez bûme rencûr”
Ta aşkından senin, ne acılar çekmişim

Hilanî perde got, “Ey Ademîzad
Kaldırdı perdeyi o, “Ey Âdemoğlu dedi

Çi kar û qissedar î ba perîzad”
Ne iş ve meselen var, yanında peri kızın”

Şîrîn Şehzade go: “Ey yara dildar
Tu b’Xwedê key qesem Ellahê Cebbar

Şirin dedi Şehzade, “Ey gönüllü sevgili
Eğer ki seviyorsan, Cebbar olan Allah’ı

Bi heqqê hurmetê şîrê te xwarî
Ji qewlê min bikey tu guhdarî!”

Hakkına olsun onun, o emdiğin süt için
Dinlemeni isterim, diyeceğim sözleri”

‘Eceb go “Dadeyê ba min tu sewgend
Tu çi d’bêjî bibêje ey xiredmend”

Hayretle dedi, “Ant olsun, yanımdaki iyilik
Ne diyeceksen de, dinlerim ey akıllı”

Ji ewwel ta bi axir sûretê hal
Şîrîn teqrîr kir bo bintê Şehbal

Başından ta sonuna, yaşadığı durumu
Güzel güzel anlattı, Şehbal’in kızı için

Perîrûyê ji naz û xemze durrsuft
“Perî û Ademî key dê bibin cuft?

Cilveli, peri yüzlü, gamzesi delik inci dedi
“Olur mu bir insan, bir periyle eş olsun

Wisalê mah û tu pirr dûredest e[153]
Çir eng teslîm kem ez xwe bi dest te

İmkân dışı gibidir, ayla senin kavuşman[153]
Kendimi eline ben, nasıl teslim ederim

Eger bab û diya min pê xeber ken
Bi vê sirrê dê bînin me bi ker ken

Haberi olsa şayet, annem ile babamın
Lime lime ederler, bu sır yüzünden bizi

Bi zayi’ dê biçî rencê te yekser
Welê tehqîq nizanim ey dilawer

Bütün çektiğin zahmet, bir çırpıda yok olur
Ancak doğrusunu ben, bilmiyorum ey yiğit

[153] Mebest ji “mah”ê, Bedîulcemal bixwe ye.

[153] “Ay”dan maksat, Bediülcemal’in kendisidir.

Tu kazib î weya ez qewlê sadiq	*Yalan mıdır sözlerin, ya da doğru söylersin*
Bi can û dil bûyî tu j'min bi 'aşiq"	*Âşık olmuşsun bana, candan ve de gönülden"*
Dikir ewreng Şehzade tecerrib	*Bu yolla ediyordu, Şehzadeyi tecrübe*
Welê 'eşqê dikir ez dil texellib	*Ancak baskındı onun, aşkı gönlünden öte*
Dil û cerg û ceger hatin xiroşê	*Coşmaya geldi gönlü, hem ciğer ve yüreği*
Ji 'eşqê Şahizade meyfiroşê	*Aşkından, mey satıcısı olan o Şehzadenin*
Ji nazdarî xeber da sînesade	*Konuşurdu nazından, berrak sineli dilber*
Ji 'eşqê dil digirya Şahizade	*Ağlıyordu Şehzade, gönül aşkı yüzünden*
Mi'eyyen kir hebîb seyrê terîqet[154]	*Tarikat yoluyla o, sevgiliyi test etti[154]*
Ji dil zanî ku 'eşqê wî heqîqet	*Anladı ki gönülden, gerçektir aşkı onun*
Şîrîn go ba tecerrib, "Ey dilawer!	*Tecrübe için dedi şirin, "Ey yiğidim*
Ji min çêtir hene pirr xûb û dilber	*Güzel ve dilberlerden, vardır benden iyisi*
Bibîn tu dilberek dî mest û mehbûb	*Mestlerden, güzellerden, bul başka bir dilber*
Bibe talib bo wê ew bo te metlûb"	*Sen onu isteyen ol, o olsun istenenin"*

[154] "Terîqet", bi wateya xwe pirraniya "terîq/rê" ye. Ji bo nêzîkbûna Xwedê, rêbazek perwerdeyî ye ku li gor xwe xwedî rêç û pênaseyên taybet e. Di bingeha xwe de, perwerdeya nefsê esas digire. Di vê rêbazê de, qonaxên wek şerîet, terîqet, heqîqet û marifet esas in. Ev pêngav, ji bo pêkhatina "însanê kamil" e.

[154] "Tarikat", "tarik/yol" sözcüğünün çoğuludur. Allah'a yakınlaşmak amacıyla kendine özgü yol ve yöntemleri olan bir eğitim metodu. Temelde, nefsin terbiyesi esas alınır. Bu metotta; şeriat, tarikat, hakikat, marifet gibi evrelerinden geçme hedeflenir. Nihai amacı "insan-ı kâmil" denilen "olgun insan" şahsiyetine kavuşmaktır.

Şehê mestan go: “Ey ebrûhilalem
Serê mûyek te nadim ez bi ‘alem

Tu çi d’bêjî me ey dilbend û rahet
Sa’etek weslê te nadim bi cennet!”[155]

Mehê enwarê go: “Ger tuy be sadiq
Heqîqet ku li min bûyî bi ‘aşiq

Bixwe sondê ji min ra ey dilawer
Ji sidqê ‘eşqê te ez bim bi bawer”

Şîrîn Şehzade go: “Ey mahê peyker!
Billahil-’Ezîm û Rebbê Ekber!

Bi husnê enwer û mahê cebînet
Bi mişkînxal û xettê ‘enberînet

Be ebrûyê te yên wek qewsê tarî
Be du çahvên te yê mest û xumarî

Mest düşmüşler Şahı dedi, “Ey hilal kaşlım
Tüm âleme karşılık, vermem bir tel saçını

Ey tutkum ve rahatım, ne söylersin sen bana
Seninle bir saati, değişmem ben cennete”[155]

Işık saçan ay dedi, “Şayet doğruysan bunda
Gerçekten de sen bana, olmuşsan eğer âşık

Ey yiğidim o halde, yemin etmelisin sen
Ta inancım tam olsun, bana aşkından yana”

Dedi şirin Şehzade, “Ey ay yüzlü güzelim
Büyük Allah adıyla, en büyük Rab adına

Ay misali alnına, senin nurlu hüsnüne
Amberli bedenine, misk kokan benlerine

Kara yaylar misali, senin iki kaşına
Mest ile sarhoş düşmüş, senin iki gözüne

[155] Ev peyva zêdegav, rewşa evînê ya pengî û demdemî ye. Şaîr, ev reng şîrove, xwestiye ku bêje, pengî û zêdegaviya evînê, carna bi ser hiş û mihakemeyê dikeve, sînoran binpê dike. Yane ev ne baweriyek e.

[155] Buradaki aşırılık, aşkın anlık ve taşkınlık halidir. Şair, bu yorumuyla, aşk taşkınlığının, bazen akıl ve muhakeme sınırlarını aştığını, aşabileceğini ifadeye çalışmıştır. Yoksa bu bir inancın ifadesi değildir.

Be husnê wech û rûyê enwerînet	*Nurlu olan simana, güzel olan yüzüne*
Bi le'lên te şîrîn û şekerînet	*Tatlı ve şeker saçan, o al dudaklarına*
Be zilfên te sîyah û 'enberamîz	*Siyah ve amber kokan, zülüflerine senin*
Bi pişkojê dihanê te şekerrîz	*Şeker saçan ağzının, goncalarına senin*
Bi qedd û qametê serwîxiraman	*Servi gibi sallanan, boyun posuna senin*
Ji 'eyban dûr ez ser ta bi daman	*Ayıplardan pirüpak, baştan ayağa senin*
Ji xeyrê te nevên min qet çu dilber	*Asla yoktur bir dilber, bana senden gayrısı*
Eger bêtin çu şems û mahê enwer	*İster varsın gelsinler, bana güneş, dolunay*
We ger horîsifet bin ew bi 'irfan	*Ve irfanlarıyla ister, huri sıfat olsunlar*
Di Firdewsê berîn û baxê Ridwan[156]	*İster Rıdvân bağından ister yüce Firdevs'ten*[156]
Ji xeyrê te ji wan dê bim bi nefret	*Edeceğim nefret ben, senden gayrı onlardan*
Ji min tehqîq dan ey mahê tel'et	*Ey doğan ayım benim, kesin bunu benden bil*

[156] "Ridwan" û "Firdews", di derbarê bihiştê de du têgeh in. Di Erebî de, Ridwan, di wateya "riza, xweşnidî" de ye. Li ser vî esasî, navê Ridwan, teşmîlê hemû behiştê dibe. Lê bi awayekî giştî ev nav, ji bo ferişteyê ku "dergevanê bihiştiyê" tê bikaranîn.
"Firdews" bixwe, di Erebî de, di wateya "bexçe" û "çerdax"ê de ye. Di Quranê de ji bo tevahiya bihiştê bikarhatiye. (Bnr. Sûreya Mu'mînûn, a. 11; Sûreya Mearic, a. 23-25). Di hedîsan de, wek beşê bihiştê yê herî bilind û hêja hatiye bikaranîn. Di Quranê de di du ayetan de derbas dibe (bnr. Kehf, a. 107; Mu'mînûn, a.11).

[156] "Rıdvan" ve "Firdevs", Cennet'le ilgili iki kavramdır. Rıdvan, Arapçada, "rıza, hoşnutluk" anlamına gelir; bundan hareketle Cennet'e de teşmil olunur. Ancak genel olarak, "Cennetin kapıcısı olan melek" için kullanılan bir isimdir.
"Firdevs" ise, Arapça'da "bahçe" ve "çardak" anlamına gelir. Kur'an'da, Cennet'in tamamı için kullanılan bir ifadedir (Bkz. Mü'minun Suresi, a. 11; Mearic Suresi, a. 23-25). Hadislerde ise, Firdevs ifadesi, Cennet'in en yüksek ve değerli kısmı için kullanılmıştır. Kur'an'da, iki ayette geçer (bkz. Kehf, 107; Mü'minun, 11).

Bi tîrê ‘işqa te bûyim birîndar
Yaralanmışım ben, senin aşkın okuyla

Ji narê hibba te mestî me yekcar
Mest düşmüşüm ben tümden, sevginin ateşiyle

We ger cana li min nakey tu bawer
Şayet ki ey sevgili, inanmaz isen bana

Bi xencer dê bikim hilqûm bi du ker
Boğazımı hançerle, edeceğim iki parça

Nevên min rûh û can bê wesletê te
Olmadıkça seninle, istemem ruhu, canı

Yeqîn dimrim ji derdê firqetê te
Kesin olarak ölürüm, ayrılığın derdinden

Ji pêş çahvê te xwe b’kujim bi xencer
Öldüreyim kendimi, hançer ile önünde

Yeqîn dê bim şehîdê ‘eşqê dilber!”
Kesin dilber aşkının, olurum ben şehidi”

Kişand Seyfilmilûk xencer ji kalan
Kınından Seyfülmülûk, çekiverdi hançeri

Nêzîk hilqê kir elmasê burran
Yaklaştırdı boğaza, keskin olan elması

Xumar û meyperesta şeng û dilber
Neşeli, dilber olan, sarhoş, içki düşkünü

Heqîqet kir ji ‘eşqê wî be bawer
Gerçekten de inandı, aşkına Şehzadenin

Bi lez destê xwe bir, girt destê xencer
Hızlıca davranarak, el koydu hançerine

Go: “Ey ruh û heyatê canê dilber
Dedi, “Ey dilberin canına, ruh ve hayat olan

Ji ‘eşqê te ez im dil bûye mehrûq
Gönlüm yanmıştır benim, senin aşkın yüzünden

Yeqîn ez ‘aşiqê te m’tu yî me’şûq
Kesin âşığım sana, sen ise maşukumsun

Wekî du ehlê hibbê ‘eşqê sadiq	*Olmazsa sadık bir aşk, iki seven gönülde*
Nebin ‘aşiq bi hev nabin muwafiq”	*Muvaffak olamazlar, iki taraf da aşkta”*
Ji ‘eşqê dilberê zendê xwe hilmişt	*Swadı kollarını, aşktan ötürü dilber*
Şîrîn du çahvê Şehzade vemalişt	*Şirince Şehzadenin, sildi iki gözünü*
Şirîn da bûse du le’lê şekerleb	*Şirin öpücük verdi, şeker dudaklarına*
Li ser lêvê wî danî sîbê xebxeb	*Koydu çifte gerdanı, dudakları üstüne*
Got, “Ey Şehzade, yê min dî ji mihbet	*Dedi ki, “Ey Şehzade, sevgiden gördüğüm şey*
Di dewran û zemanan kes nedî qet	*Hiç kimse görmemiştir, devranda, zamanlarda*
Bi carek dîtina nûra cebînet	*Cephendeki nuru ben, bir tek defa görmekle*
Siwadê ‘eyn û le’lê şekerînet”	*Şekerli dudaklarını, hem gözbebeklerini”*
Ku ewreng dî Şeh ez dildarê sermest	*Kî sarhoş sevgiliyi, bu tarz gördü Şehzade*
Ji dil dan bûse pêy û pençe û dest	*Gönülden verdi buse, el, ayak, parmağına*
Go, “Ya Reb qet nebim ez bê wisalê	*Dedi, “Kılma ey Rabbim, visalden beni mahrum*
Dilê mecrûhê bê fikr û xiyalê”	*Yaralı olan gönlü, fikrinden, hayalinden”*
Du dildarê hebîb û mest û ‘aşiq	*Sarhoş ve aşk tutkunu, iki seven sevgili*
Be ‘ehd û qewl û peyman saf û sadiq	*Saf ve dürüst olarak, sözle, antla, yeminle*

Kirin himbêz hevûdu şibhê şehmar	*Şahmeranlar misali, kucaklaştılar onlar*
Bi meqsûd bûn ji hevdu mest û dildar	*Sarhoş ve sevgililer, buldular maksadını*
Guvaştin ‘aşiqan hevdu bi himbêz	*Kucaklaşmış âşıklar, oldular sarmaş dolaş*
Vexwarin şîr û mey le’lên şekerrîz	*Şeker saçan dudaklar, içtiler sütle şarap*
Ji xemrê mest bûn bedr û mehê new	*Hilal ile dolunay, mest düştüler içmekten*
Gehiştin meqsedê Şîrîn û Xusrew[157]	*Maksadına erdiler, o Şirin ile Hüsrev[157]*
Ji le’lê şekerîn bûn ew şekerxa	*Şekerli dudaklardan, onlar çiğnedi şeker*
Mîsala Yûsifê Misrê û Zuleyxa[158]	*Tıpkı Züleyha gibi, Mısırlı Yusuf gibi[158]*
Ji weslê ‘eşqê dilber Şahê dildar	*Sevgili Şah dilberin, kavuşmaktan aşkına*
Digo ya Rebb di xew da me yan e hişyar?	*Derdi uykuda mıyım yoksa uyanık mıyım ya Rab*
Hebîb û nazika dildar û meqsûd	*Sevilenle nazlı sevgili ve de maksat*
Digel ‘eşqa mihubet bûye mewcûd	*Ortaya çıktı sevgiden doğan aşkla*

[157] “Şîrîn”, dotmîra bajarê Berde ya Azerbaycanê ye (li gor Şehname’yê, xwarziya melîkeya welatê Ermen Mihîn Banûyê ye). “Xusrew” bixwe, ji hukimdarê Sasaniyan kurê Hurmiz e. Şaîr Şêxî, bi navê “Xusrew û Şîrîn” destanek ji 6400 malikan pêktê nivîsandiye. Mijara vê destanê, evîn û dilşewatiya herdu serdilkan e. Ev destana, di rastiyê de li jiyana hukimdarê Sasanî Perwîz hatiye wergirtin.

[158] “Zuleyxa”, jina ezîzê Misrê ye ku bi îftira xwe bûye sedemê avêtina Yûsif ya zîndanê. Yûsif bixwe, wek di Quranê de derbas dibe, pêxember e. “Yûsif û Zuleyxa”, kitabek mesnewî ye ku bi rêya sûdgirtina ji ayet (bnr. Sûreya Yûsif, ayetên 3-102.), tefsîr û rîwayetan hatiye nivîsandin. Mijara vê mesnewiyê, evîna Zuleyxayê ya li pêşberê Cenabê Yûsif, di vî warî de hewildanê wê û jiyandinên Cenabê Yûsif e. Ev mesnewî, bi gelek zimanan hatiye nivîsandin. Ya herî girîng û hêja, berhema Mela Camî ya 7777 malikî ye.

[157] “Şirin”, Azerbaycan’ın Berde kentinin prensesi (Şehname’ye göre, Ermen ülkesinin melikesi Mihîn Banû’nun yeğenidir), “Hüsrev” ise, Sasani hükümdarlarından Hürmüz’ün oğlu olarak bilinir. Şair Şeyhî tarafından kaleme alınan ve esasta Sasani Hükümdarı Perviz’in hayatından alınan “Hüsrev ile Şirin” destanı, bu iki şahsın aşk ve dramını konu etmiştir. Toplamda, 6400 beyitir.

[158] “Züleyha”, Yusuf’a iftira atıp zindana atılmasına sebep olan Mısır azizinin karısıdır. Yusuf ise, Kur’an’da adı geçen peygamberdir. ”Yusuf ile Zuleyha”, ayet (bkz. Yusuf Suresi, 3-102. ayetlere), yorum ve rivayetlerden yola çıkarak hazırlanmış mesnevi kitabıdır. Zuleyha’nın Hz. Yusuf’a olan aşkını; bu uğurdaki çabalarını ve Hz. Yusuf’un yaşadıklarını konu edinir. Birçok dilde versiyonu olan bu eserin, en önemlisi Molla Cami’nin 7777 beyitlik mesnevisidir.

Bi yek fîncan tijî abê heyatê	*Hayat suyuyla dolu, bir fincanla ile benim*
Xizir heyy kir dilê min ez mematê[159]	*Ölü iken diriltti, Hızır benim gönlümü[159]*
Ji hicranê mirî bû qelbê pirxem	*Ayrılıkla ölüydü, çok gamlı olan kalbim*
Bi weslê saxî kir 'Îsayê Meryem	*Vuslat ile diriltti, Meryem'in oğlu İsa*
Birîndarek xerab bûm ez bi ferman	*Ferman ile olmuştum çok kötü bir yaralı*
Digel melhem li min peyda bû Loqman	*Bana göründü Lokman, merhem ile birlikte*
Xerîb bûm ez terîqwinda cebelnehs	*Garip idim gurbette, yol kayıp, dağlar sarptı*
Şeva tarî bi derket tel'etê şems	*Güneş doğuverince, bitti karanlık gece*
Selamet çûm şikur ser rê yû cadde	*Şükür ben selametle, gittim yol, caddelerde*
Di baxê dilberê min dî mûrade	*Kavuştum muradıma, dilberin ben bağında*
Digo Şehzade ewreng qewl û eş'ar	*Söylüyordu Şehzade, bu tarz şiir, deyişler*
Digirya nazika mehbûb û dildar	*Ağlıyordu sevimli, nazik, sevgili dilber*

[159] "Abê heyat" ya di vê malikê de, ne ava ebediyetê ye ku nîsbetê Xizir tê kirin; evîna Seyfulmilûk ya li hemberê Bedîulcemal e. Wek têgehek tesewifî, di wateya "evîna rasteqîn", "evîna xwedayî", "îlmê ledûn" e. Ji bo "Xizir" bnr. têbiniya 192.

[159] Bu beyitte geçen "hayat suyu", Hızır'a nispet edilen ebediyet suyu değildir; Seyfülmülûk'ün Bediücemal'e olan aşkıdır. Tasavvuftaki karşılığı ise, "hakiki aşk", "ilahi aşk", "ledün ilmi"dir.
"Hızır" için, bkz. 192. dipnota.

XEZEL-13	GAZEL-13
Îro ji meya ‘eşqa butan elhemdulillah	*Putların aşkından bugün, mey içtim elhamdülillah*
Camek me temam xwarî nihan elhemdulillah	*Tamam bir kadeh içtik, gizliden elhamdülillah*
Meyxware û mestane û rend im û nezerbaz	*İçkiciyim, sarhoşum, kalenderim, neşe ile bakanım*
Leb ber leb û hemrazeyê can elhemdulillah	*Dudak dudağa karşı, canın sırdaşıyım elhamdülillah*
Mûsa-sifet ez nêrîm tecellaya cemalê[160]	*Cemalin tecellisine daldım, tıpkı Musa misali ben[160]*
Şem’a me munîr kir xanûman elhemdulillah	*Aydınlattı mumumuz ev barkımızı elhamdülillah*
Wek Heyder û Ristem ji meya ‘eşqê hebîbê[161]	*Sevgilinin aşk şarabından, Haydar ve Rüstem gibi[161]*
Zillet bidehem sefşêkînan elhemdulillah	*Saf ve ara bozanlara, zillet verene elhamdülillah*
Îro kî digel min tête meydanê ‘uşşaqan	*Benimle beraber kim bugün, geliyor âşıklar meydanına*
Keyfek bidemê ez bi deman elhemdulillah	*Ona zaman içinde, bir keyif tattırayım elhamdülillah*

[160] Ev “tecelli”, tecelliya ku di Quranê de derbas dibe û hatiye nîsbetkirina Cenabê Mûsa bixwe ye. Cenabê Mûsa, li ser çiyayê Tûrê, di Newala Tûwayê de, li ser darekî, di dilqê agir de şewlekî dibîne. Ev şewl (tecelli), teysek ji nûra Xwedê bû. Ji wê, dengvedanek peyda dibe û ji vî dengê Xwedayî, Cenabê Mûsa, mezherê wehya Xwedê dibe. Sedem ku ev wehiy bi awayekî axaftinî ye, ji vê yekê re “tecelliya sûrî”(şewlandina rûserî) tê gotin. (Bnr. Sûreya Qesas, a. 29-30; Sûreya E’raf, a. 143; Sûreya Nem, a. 7-9)

[161] Ji bo “Heyder” bnr. têbiniya 37. Ji bo “Rustem” bnr. têbiniya 188.

[160] Burada, Hz. Musa’ya nispet edilen “tecelli”den maksat, Kur’an’da bahsi geçen “ateş şeklindeki” tecellidir. Hz. Musa’nın Tur Dağı’nda, Tuvâ Vadisi’nde, bir ağaç üzerinde gördüğü ateşe benzeyen bu tecelli, Alah’ın nurundan bir parıltı olup, bu nurdan yankılanan ilahî sesle, Musa Allah’ın kelamına (vahye) mazhar oluyor. Konuşma şeklindeki bu tecelliye, “sûrî tecelli” denilmiştir. (Bkz. Kasas Suresi, a. 29-30; A’râf Suresi, a. 143; Neml Suresi, a. 7-9)

[161] “Haydar” için, bkz. 37. dipnota. “Rüstem” için, bkz. 188. dipnota.

Heta be ebed serxoş û heyran û cinûnî	*Sonsuzluğa dek sarhoş, hayran, deli olarak*
Daîm ku bibêjî be dehan elhemdulillah	*Sana düşen daima, demelisin ağzınla elhamdülillah*
‘Afiyet noş bad li canê te Siyahpoş	*Afiyet şifalar olsun, ey Siyapûş bedenine senin*
Cama ji meya ‘eşqê butan elhemdulillah	*Putların aşkından yudumlanan şaraba, elhamdülillah*

Îlahî tu me mest key şibhê lale	*Allah’ım, mest eyle sen, bizi lale misali*
Ji le’lê cam û xemrê çardehsale	*On dört yıllık şaraptan, dudağından kadehin*
Were saqî werîn xemrê heyatî	*Gel ey saki, getir sen, hayatın şarabından*
Ku pê ehya dibit qelbê mewatî	*Ki onunla dirilir, ölü olan gönüller*
Li min xoş tên lebê fincan û bade	*Bana iyi geliyor bade, fincan dudağı*
Ji noşîna meyê em sînesade	*Biz sinesi saflara, hem meyi içivermek*
Were mitrib bi çeng û naye û def	*Gel ey çalgıcı sen de çengin, neyin, tefinle*
Bireqsîn qelbê me y’ez wey mişerref	*Şerefli gönlümüzü, oynatver onlarla*
Terik nadem lebê fincan û saqî	*Terk edemem fincanın, hem saki dudağını*
Heta ‘umrê ‘ezîzem bête baqî	*Benim aziz ömrüm ki, baki kaldığı sürece*

Wekî Şehzadeyê şîrîn, perîzad
Ji camê mihbetê bûn mest û dilşad

Firaqê rûsiyeh bûn camê weslet
Vexarin zêde bûn şewq û mihubet

Perîzadê go: “Ey Şehzadeyê mîr!
Ji weslê ra divêtin bo me tedbîr

Ku mînbe’d em nebin esla ji hev dûr
Ji camê wesletê bin şad û mesrûr

‘Ki vardir bizde yedi bin perîweş’[162]
Letîf û nazik û mehbûb û mehweş

Eger ma’lûmê wan bit ev hewale
Dibêjin maderem gel Şahibale

Çi hiyle dê bikeyn ey yarê dilgîr
Kerem ken ey ‘ezîzem husnê tedbîr!”

Cewab dayê şîrîn Şahê şekerrîz
Go: “Ey nûrîn liqayê fitneengîz

Peri Bediülcemal, hem de Şirin Şehzade
Mest ve mutlu oldular, muhabbet şarabından

Rezildiler firaktan, vuslatın şarabını
İçtiler, arttırdılar, arzuyla muhabbeti

Peri kızı dedi ki, “Ey bey olan Şehzade
Tedbir lazımdır bize, kavuşmamıza dair

Ki bundan böyle bizler, hiç uzak düşmeyelim
Mutlu, memnun olalım, kavuşma şarabından

‘Ki vardır bizde yedi bin perîweş’[162]
Latif ve naziktirler, sevimli, ay gibiler

Şayet ki bilgileri, olsalar bu durumdan
Gider söylerler onlar, annem ile Şehbal’e

Ne plan gereklidir, ey gönül bağlamış yar
Buyurun ey azizim, alalım güzel tedbir”

Şeker sözlü Şehzade, şirince cevap verdi
Dedi ki, “Parlak yüzlüm, ey fitne saçan güzel

[162] Ev hevoka tirkî ya di nav neynokê de, rasterast ya nivîskar bixwe ye.

[162] Tırnak içindeki cümle, bizzat şairin kendi Türkçesiyledir.

Cemalê dilkuşayet bit mibarek	*Gönül açan güzellik, olsun bize mübarek*
‘Ezîzem ma heye min ixtiyarek?	*Var mı ki bir tercihim, ey benim aziz yarim*
Tu abê Kewser î ez qetreyê tem	*Sen Kevser’in suyusun, ben ise damlasıyım*
Tu şemsê enwer î ez zerreyê tem	*Sen nur saçan güneşsin, ben ise zerresiyim*
Tu Yemlîxa yî Qitmîrê tu em ez[163]	*Sen benim Yemliha’msın, ben ise Kıtmir’inim[163]*
Tu mehsîma yî dilgîrê tu em ez	*Sen benim ay yüzlümsün, ben ise aşığınım*
Serê me û xakê payê tu beraber	*Beraberdir başımla, ayağının toprağı*
Ruhê me û zilfê sayê tu beraber	*Beraberdir ruhumla, gölgenin zülüfleri*
Bi kuda tu herî dê ez bi bez bim	*Her nereye gidersen, koşarım ben arkandan*
Li pey te pirr bi te’cîl û bi lez bim	*Geleceğim arkandan, çok süratli ve hızlı*
Çi rengî tu emir key dê wisa kem	*Her nasıl emredersen, yapacağım ben öyle*
Mi’eyyen ger bibê ez can hilak kem	*Şayet karar verirsen, yok ederim canımı*
Li min xoş tê mirin lê ez nebim dûr	*Bana hoş gelir ölüm, ancak uzaklık asla*
Ji husnê dilkuşet pirr şu’leyê nûr”[164]	*Çokça nurlar saçılır, dilkûşâ güzellikten”[164]*

---

163 “Yemlîxa”, yek ji 7 hevalên şikeftê yê bi navê Eshabê Kehf (Reqîm) e. “Qitmîr” bixwe, kûçikekî şivanan yê hevalbendê wan e. Di Quranê de, ji bo Qitmîr, “û yê heştemîn, seyê wan e” dibêje. Şîrovekarên Quranê, bi yekdevî, behsa kûçikê ku di ayeta 18. ya Sûreya Kehfê de derbas dibe, wek Qitmîr tefsîr kirinin. Bi wateya xwe Qitmîr, (wek di ayeta 13. ya Sûreya Fatir de derbas dibe) “rîvelê tenik û xavikîn yê ser dendikê” ye.

164 “Dilkuşet”, ango dilveker.

163 “Yemliha”, Ashab-ı Kehf (Rakîm) olarak bilinen 7 mağara arkadaşından biridir. “Kıtmir” ise, onlara arkadaşlık eden bir çoban köpeğidir. Kur’an, Kıtmir için, “Ve sekizincisi köpekleridir” der. Müfessirler, Kehf Suresi, ayet 18’de bahsi edilen köpeğin, Kıtmir olduklarında müttefiktirler. “Kıtmir”, anlam olarak (Fatır Suresi, ayet 13’te geçtiği gibi) “çekirdek üzerindeki ince, nahif zar”dır.

164 “Dilküşa”, gönül açan demektir.

Perîzadê go: “Ey mehr û dilawer
Bi min ra hatiye şadî yû mader

Kî ye’nî serwebanûya semenber
Delal û dilbera Şehbalê serwer

Xudan‘îrfan e û ehlê terîqet
Bi ser wê hatiye ‘eşqê heqîqet

Eger ‘alim bibîtin ew senûber
Bi halê me dibîtin bo me rehber

‘Îlacê dê biket Bedre bi herro
Digel Melke li pêşê serwebanû[165]

Bibêj wan da biçin pêş serwê bostan
Beyan ken nerm û şîrîn halê mestan

Ji ewwel bîne ser bazarê ‘eşqê
Gelek tekrar biken esrarê ‘eşqê

Heta dil coş biden bi bade û beng
Biken tekrarê ‘eşqê ew li sed reng

Peri kızı dedi ki, “Ey ayım ve yiğidim
Mutlulukla birlikte, gelmiş aklıma annem

Yani o Servi Hatun, o yasemin göğüslü
Reisimiz Şehbal’in, dilberi ve nazlısı

İrfan sahibidir o, hem tarikat bağlısı
Onun nasibi olmuş, hakikatin sevgisi

Şayet ki bulsa bilgin, o çam fıstığı misali
Bulur halimiz için, o taktirde bir rehber

İlacı verecektir, her gün olarak Bedre
Melke ile birlikte, Servi Hatun önünde[165]

Söyle onlara gitsin, servinin huzuruna
Şirin, yumuşak desin, biz mestlerin halini

Getirsinler ta baştan, aşk pazarına sözü
Etsinler tekrar tekrar, sırlarını hep aşkın

Coşana dek gönüller, bade ile beng ile
Veya yüz tarz ile siz, etsinler aşkı tekrar

[165] Mebest ji “serwebanû”yê, dayika Bedî’ulcemal e.

[165] “Servi Hatun”dan maksat, Bediülcemal’in annesidir.

Ji xeyrê wê gelek dê ez bikem cehd	*Ondan gayrı fazlaca, edeceğim gayret ben*
Ji bo weslê xwe û te ey cebînse'd	*Vuslatı ikimizin, ey mutlu yüzlüm benim*
Binêrin qudretê Dadarê Dawer	*İzleyin kudretini, âdil olan Allah'ın*
Çi kiriye bo me teqdîr û miqedder"	*Görelim kader bize, neyi takdir buyurmuş"*
Bihurandin bi 'eşq û şîret ew şew	*Aşk ve öğütler ile, geçirdiler geceyi*
Du çahvê wan delalan qet nehat xew	*Girmedi asla uyku, nazlıların gözüne*
Heta weqtê bi derket fecra sadiq	*Ağarıncaya kadar, aydınlıkla tan yeri*
Bilind bû ba xeber bûn herdu 'aşiq	*Fark etti iki âşık, güneş hayli yükselmiş*
Li cem hev rabûn ew herdu bi naçar	*Kalktılar her ikisi, yan yandan çaresizce*
Mebada ku bizanin xelkê exyar	*Olmaya ki bilsinler, halktan başka kimseler*
Wekî perwane sohtin dil ji 'eşqê	*Kelebekler misali, aşktan yaktılar gönlü*
Dinalîn şibhetê bilbil ji 'eşqê	*Tıpkı bülbüller gibi, inliyorlardı aşktan*
Bi sed derd û bela çûn ew perîrû	*Yüzer dert ve belayla, peri yüzlüler gitti*
Di çadir da rûnişt ser da bi ejnû	*Oturdular çadıra, diz üstünde çökerek*
Dikêşa ahekî serd, sîne pirxem	*Çekiyordu çok gamlı, sine soğuk bir ahı*
Mîsala ku vexwarî şûşeyê sem	*Zannedersin ki içmiş, bir şişe dolu zehir*

Ji zehrê pirr belatir camê ‘eşqê	*Beterdir aşk şarabı, zehirden daha bela*
Çi zanin ê nexwarî tamê ‘eşqê	*Aşkı tatmamış kişi, bunu nereden bilir*
Sehergah bilind bû fecrê sadiq	*Yükseldi gün ışığı, seher vakti içinde*
Ji xew rabûn ‘uyûnên mest û ‘aşiq	*Uykudan uyandılar, sarhoş ve âşık gözler*
Ji dengê ‘endelîb û sewtê bilbil	*Sesinden kanaryanın, avazından bülbülün*
Di baxê gul’îzaran bû bi xulxul	*Gül yanaklılar bağında, başladı bir velvele*
Bi tenha ma emîrê ‘eşqîbazan	*Yalnız başına kaldı, aşk oyuncusu emir*
Bi mihbet da li têlê çeng û sazan	*Sevgi ile dokundu, çenkle sazın teline*
Sedayê wî bilind bû çerxê çalak	*Yükseldi ses, sedası, ta hareketli göğe*
Dikir seyr û temaşa cem’ê emlak	*Seyredip izlerlerdi, bütün bir memleketi*
Ji dengê wî dinalin cimle bilbil	*Bütün bülbüller onun, inliyordu sesinden*
Binevş e ser bizan û helqe sinbil	*Bil ki menekşedir baş, sümbüllerse halkası*
Ji ber husna sedayê Şahizade	*Seda ile sesinin, hüsnünden Şehzade’nin*
Ji xew rabûn temamê sînesade	*Uyandılar uykudan, tüm parlak sineliler*

Sedayê wî çû gohê Melke û Bedr	*Gitti kulaklarına, Melke'yle Bedre'nin ses*
Şîrîn rabûn ji xwabê Leyletulqedr[166]	*Şirince uyandılar, uykusundan Leyl-Kadr'in[166]*
Kirin guhdariya sewtê ney û 'ûd	*Verdiler kulakları, neyle udun sesine*
Seda û nexmeyê manendê Dawûd	*Öyle bir ses, nağme ki, Davud sedası gibi*
Bi remz û hal xeber da Melke Xatûn	*İşaret, hal diliyle, bildirdi Melke Hatun*
Digel bedrê du hefte teb'ê mewzûn[167]	*Güzellik numunesi, iki haftalık ay ile[167]*
Wereng deng û sedayê şîrîn û pirr	*Öyle bir ses seda ki hem şirindir hem de gür*
Bi tehqîq û mi'eyyen nîn e bê sirr	*Kesindir hem açıktır, gizemsiz olmaz asla*
Tu rabe da biçîn pêş Şahizade	*Kalk ve gidelim biz, Şehzade'nin önüne*
Ji bo me dê bibê ew sînesade	*Bizlere söyler mutlak, o yüreği tertemiz*
Ji îstiqbal û hal nêzîk eger dûr	*İster yakın, ya uzak, bugünden, gelecekten*
Çi dibêt Şahibazê mest û mexmûr	*Mest ve mahmur Şehzade, acep neler söylüyor*
Şîrîn rabûn xeramên kebke reftar	*Şirin kalkıp gittiler, keklikçe sallanarak*
Du mehsîma bi qesda Şahê dildar	*Âşık Şah niyetiyle, ay yüzlü iki dilber*

166 "Leyletulqedr", bi wateya xwe "Şeva Qedrê" ye. Ev şev, di meha Remezanê, di nava deh rojên dawîn de, zêdetir di 27ê wê de tê pîrozkirin. Di vê şevê de, xêr û qencî, bi sewabên xwe derdikeve asta herî jor. Ji bo qenciyekî sih hezar sewab tê nivisîn. Bi navê vê şeva pîroz, sûreyek Quranê (97.) heye ku jê re "Sûreya Qedrê" tê gotin. Bi giştî 5 ayet e. Di ayeta sisê de, diferme ku ev şev ji hezar mehan xêrtir e.

167 Mebest ji "bedrê du hefte", Xatûn Bedre ye ku xuşka Bedîulcemal e.

166 "Leyl-Kadr" olarak kısalttığım ifade, gerçekte "Kadir Gecesi" demek olan Leyletü'l-Kadirdir. Bu gece, Ramazan ayının son on günü içinde, genellikle 27. gecesinde ihya edilir. Sevapların zirve yaptığı (bire otuz bin) saygın bir gecedir. Kur'an'ın 97. Suresi, onun adıyla (Kadir Suresi) anılır; 5 ayettir. Üçüncü ayette, Kadir Gecesi'nin bin aydan hayırlı olduğu vurgulanır.

167 "İki haftalık ay"dan maksat, Bediülcemal'in kız kardeşi Bedre Hatun'dur.

Wekî Şehzade dîn ew mehremê raz
Şehzade gördü onlar, sırları bilenlerdir

Ji dest xwe avêtin tenbûr û hem saz
Atıverdi elinden, tambur ile hem sazı

Go: “Sed car hûn bixêr bên ser ser û ‘eyn
Dedi “Baş göz üstüne, yüz defa hoş geldiniz

Gelî yaran nemabû qet çu mabeyn
Ey dostlar kalmamıştı, arada hiç mesafe

Ku ez behta me mislê ateşê germ
Ki şaşırıp kalmıştım, ateş közü misali

Welêkin zû bû hêjan min dikir şerm
Ancak erkendi henüz, bundan utanıyordum

Ji wê hatina we min sed aferîn e
Ondandır gelişiniz, bence takdire şayan

Keramet bû li nik min ew yeqîn e”
Kesin yanımda benim, bu oldu bir keramet”

Mihessel, Şeh xeber da halê dilber
Özetle haber verdi, Şah dilberin halinden

Ji ewwel ta bi axir cimle yekser
Tamamını anlattı, başından sonuna dek

Miferreh bûn Melke û Bedre Xatûn
Ferahlandı ikisi, Melke’yle Bedre Hatun

Ji qewlê Şahibazê teb’ê mewzûn
Tabiatı uyumlu, yiğidin sözlerinden

Çeleng rabûn û çûn ew herdu mehrû
Güzel kalkıp gittiler, ay yüzlü iki dilber

Şîrîn westan li pêşê Serwebanû
Servi Hatun önünde, şirince beklediler

Gulab û misk û ‘ûd û ‘enber û mey
Gülsuyu, misk ve udu, hem amberle şarabı

Kirin hazir digel çeng û def û ney
Hazırladılar hem de, çengi, tefi ve neyi

Gerandin saqiyan fîncan û bade	*Sakiler gezdirdiler, fincan ile badeyi*
Xumar û mest bûn jê sînesade	*Sarhoş ve mest düştüler, sinesi sadeliler*
Bi nermî hatne ser bazara ‘eşqê	*Usulünce geldiler, aşk pazarı üstüne*
Şîrînan da xeber guftarê ‘eşqê	*Söz konusu ettiler, aşka dair sözleri*
Xeber dan mihbeta Hewwa û Adem	*Sevgisinden girdiler, Âdem ile Havva’nın*
Qerarê wan nebûyî hevdu yekdem	*Olmamış kararları, bir arada yaşamak*
Çi reng dil bir zenê Ûrya ji Dawûd[168]	*Ne şekil gönül verdi, Davud’a Urya eşi[168]*
Dinalî dem bi dem wek naye û ‘ûd	*İnliyordu zaman zaman, ney ile ud misali*
Ji Belqis û Suleymanê bi ‘aşiq	*Belkıs’tan Süleyman’a, ikisinin aşkından*
Xeber dan haletê ‘Ezra û Wamiq[169]	*Konuştular durumundan Azra ile Vâmık’ın[169]*

[168] Yek ji efsaneyên îsraîlî ye ku îsnadê Cenabê Dawid dikin. Li gor Ahîda Kevn, qaşo Dawidê Qral, di nava golekî de, di halê xweşûştinê de jinekî dibîne. Ev jin Betşeba ye; jina serbazê/fermandarê Dawid Ûriya ye. Xwedêgiravî, Dawid rêyekî dibîne û bi vê jinê re radize. Ji vê razana nemeşrû, qaşo Cenabê Silêman peyda bûye. Lê ev çîrok efsaneyek li dijê rengê pêxeberan yê “îsmet”ê ye.

[169] Li gel gelek wersiyon û nusxeyên xwe, li gor çîroka “Ezra û Wamiq” ya Lamiîyê Bûrsewî, “Ezra”, keça hukimdarê Gazneyê ye. “Wamiq” bixwe, kurê hukimdarê Çînê Taymûs e ku bi hesreta zarokekî jiyaye. Ji ber nav û dengê hev bihîstinin, ev herdu ciwan dibin evîndarê hevûdin. Bi armanca ku bigihêjin hev, derdikevin rê û di vî warî de gelek bela û talûkeyan dijiyîn. Piştî nêçe fidekarî û lehengiyan digihên hev. Di nav nusxeyên vê çîrokê de ya herî navdar ya “Ûnsûrî” yê Îranî ye. Ya Lamiî, tu bêje kopiya Ûnsûrî ye. Di sedsala 16. de, bi Tirkî hatiye nivîsandin. Wek mesnewî ye; 5981 malik e.

[168] Davut Peygamber’e isnat edilen bir israiliyat efsanesidir. Eski Ahid’in bu efsanesine göre, (kral) Davut, Hititli subayı/komutanı Uriya’nın karısı Batşeba/Batşeva’yı gölde yıkanırken görür. Bir yolunu bulur; onunla yatar. Sonra da kocasını öldürtür. Güya ki Süleyman Peygamber, bu gayrimeşru ilişkiden doğmuştur. Peygamberlerin “ismet” sıfatına tamamen aykırı bir efsane.

[169] Birçok nüsha ve versiyonu bulunan “Azra ile Vamık” hikâyesine göre, “Azra”, Gazne hükümdarının kızı, “Vamık” ise, Çin ülkesinin çocuk hasreti çeken hükümdarı Taymus’un oğludur. Birbirinin ününü duyan iki genç, âşık olmuşlardır. Kavuşmak üzere çıktıkları yolda, çok bela ve tehlikelere, maruz kalmışlardır. Nice fedakârlık ve kahramanlıklardan sonra, kavuşurlar. Bu hikâyenin en meşhuru, İranlı Şair “Unsurî” tarafından yazılanıdır. Ondan esinlenerek yazılan Türkçe nüshası ise, 16. yy. Bursalı Lâmiî’nin kaleme aldığı mesnevidir. Toplamda 5981 beyittir.

Hedîsê bilbil û perwanê gotin
Anlattılar olayı, bülbülle kelebeğin

Dilê ‘uşaq û mestan pêkve sotin
Yaktı tüm âşıkların, gönlünü sarhoşların

Ji wê meclîsê hilbû narê ‘eşqê
Yükseldi aşk ateşi, o meclisin içinden

Mikerrer bû gelek guftarê ‘eşqê
Aşkla ilgili sözler, tekrar tekrar söylendi

Ji nû hilbû çiraya serwebanû
Servi Hatun’un yandı, çırası yeni baştan

Gihandin yek serê qewseynê ebrû
Yay gibi iki kaşın, değdi biri ucuna

Du ta bû qametê serwa elîfwar
Elif misali servi, katlandı iki büklüm

Ji şewqa ‘eşqa berqê ateş û nar
Ateş, alev misali, aşk şimşeği şavkından

Çira wê dîtibû azara ‘eşqê
Çünkü o görmüş idi, ıstıraplarını aşkın

Gelek wê dîtibû bazara ‘eşqê
Fazlasıyla gezmişti, pazarlarını aşkın

Ji nageh hat sewtê Şahê mexmûr
Ansızın geliverdi, mahmur Şah’ın sedası

Be eş’arên Lubeyd û çeng û tenbûr
Çenk ve tambur sesiyle, Lubeyd’in şiirleri

Eser kir der dilê Serwa gulendam
Gül endamlı servinin, işaret verdi gönlü

Bi narê mihbetê sot cimle endam
Bedenini bir baştan, yaktı sevgi ateşi

Go, “Hey hey ew çi sewt e tê peyapey
Dedi, “Hey hey nedir o, dalga dalga gelen ses

Ji wî deng û sedayê dil dibin heyy!”
Öyle bir ses, seda ki, diriltir gönülleri”

Cewab da Bedreyê du hefte sale
Go: “Ew Şehzadeyê şîrîncemal e

Xudancah û meratîb e bi şewket
Hunermend û şecî’ û pirr bi qewwet

Emîn û ‘alim û dana û ‘aqil
Xudan’îrfan û husn û nûrê kamil

Şîrînlefz û serapa durrê meknûn
Ji behran anî der wî Melke Xatûn

Çi reng şîrîn liqayek nazenîn e
Bila bê meclîsê yû tu bibîne

Peyamberzade ye, sahîbsefa ye
Xudan‘ehd û qerar û pirwefa ye

Yeqîn ew mehrem e qet nîn e exyar[170]
Digel wî pirr hene mehbûbê exyar

Çi rengî tu bixwazî dê bibêjî
Wekî elmas û le’l û durr dirêjî”

Cevabı verdi ona, yaşı on dörtlük Bedre
Dedi ki, “Şehzadedir, yüzü güzel ve şirin

Hem makam sahibidir, mertebe ve büyüklük
Yetenekli, cesurdur, hem de çok güçlü biri

Güvenilir ve bilgin, bilge, akıl sahibi
Kültürlüdür, güzeldir, nuruyla olgun kişi

Konuşması tatlıdır, tamam saklı incidir
Çıkaran denizden, odur Melke Hatun’u

Ne tatlıdır çehresi, hem de gayet cilveli
İyisi mi meclise, gelsin de gör sen onu

Peygamber soyundandır, huzur ehlindendir o
Sahibidir ahdinin, kararlı, çok vefalı

Kesin o mahrem biri, asla değil başkası[170]
Yanında çoktur onun, hayırlı sevgililer

Ne şekilde istersen, söyleyiverir onu
Döktürüver onları, elmas, lâl, inci gibi”

[170] Mebest ji “mehrem”’e, ango kesekî xwedî raz e.

[170] “Mahrem”den maksat, gizemli biridir, demektir.

Ji qewlê Bedreyê şîrîn û dilber	*Şirin ve dilber olan, Bedre'nin sözlerinden*
Riza da serwebanûya semenber	*Rıza gösterdi servi, göğsü yasemin kadın*
Go, "Bînin Şahizade mislê bilbil	*Dedi, "Bülbül misali, Şehzadeyi getirin*
Temaşa ket ji werd û xonçeyê gul"	*İzlesin güllerden, goncalarından gülün"*
Çeleng çû Melke pêşî Şahizade	*Melke gitti güzelce, Şehzadenin yanına*
Go, "Rabe ey emîrê sînesade	*Dedi, "Kalkın ey beyim, ey yüreği tertemiz*
Biçin dîwanê wê serwa gulendam	*Gidelim divanına, gül endamlı servinin*
Bibîn şekerlebê şîrînendam"	*Gör şeker dudaklıyı, hem şirin endamlıyı"*
Miferreh rabû Şahizade çu bilbil	*Bülbül gibi Şehzade, ferahlanarak kalktı*
Digel Melke kirin qesd xonçeyê gul	*Niyetlendi Melke'yle, yanına gül goncanın*
Ku çûn dîwanê serwa nazik û rend[171]	*Ki gitti divanına, nazik ve rint servinin[171]*
Sê caran kir temenna Şahê dilbend	*Sevgili Şah üç defa, saygıyla eğilerek*
Vewesta dest li ser dest mislê 'er'er	*Elleri bağlı halde, servi gibi ayakta*
Miqabil Serwebanûya semenber	*Yasemin yüzlü olan, Servi Hatun'a karşı*

[171] Bi tevlî ku gelek wateyên rast û mecaz yên bêjeya "rend"ê henin, li vir, di wateya "xweşbîn" û "ehlê dil" de hatiye bikaranîn. (Wek rengdêrek dayika Bedîulcemalê ye).

[171] Gerçek ve mecaz birçok anlamı olan "rint/rind" ifadesinin buradaki anlamı, "hoşgörülü" ve "gönül ehli" demektir. (Bediülcemal'in annesinin özelliği için kullanılmıştır).

Werengî Şahizade xoş dû'a kir	*Bu tarz ile Şehzade, dua etti güzelce*
Digel medh û senayê dil heba kir	*Övgü ve senalarla, ziyan etti gönlünü*
Ji medhê zêde bûn meyl û mihibbet	*Övgüden fazlalaştı, eğilim ile sevgi*
Digel wê Serwebanû hate rehmet	*Onunla Servi Hatun, geliverdi rahmete*
Go, "Rûnê ey emîrê 'eşqîbazan	*Ona dedi ki, "Otur, ey aşk oyunun beyi*
Bikim guhdariya te w'çeng û sazan	*Dinleyeyim ben seni, hem çenk ile sazını*
Sedayê te dihat min xoş peyapey	*Geliyordu hoş sedan, kulağıma peyderpey*
Digel awazê çeng û nale û wey"	*Çenk sesiyle beraber, inilti, feryatların"*
Temenna kir rûnişt Şahê mexmûr	*Oturdu hem saygıyla, mahmur olan Şehzade*
Şîrîn dingande têlê çeng û tenbûr	*Tatlıca tıngırdadı, çenk ve tambur telini*
Yeqîn miryê dused salî dikir heyy	*Diriltirdi mutlaka, iki yüzlük ölüyü*
Sedayê çeng û şi'r û nale û ney	*Çenkle şiir sedası, hem inlemeyle neyin*
Miheyyer bû ji wê ew serwa dildar	*O sevgili serve ki, şaşkına döndü ondan*
Werengî xoş digotin qewl û eş'ar	*Bu tarzda hoş okurdu, şiir ile deyişler*

XEZEL-14	GAZEL-14
‘Aşiq û dilker kirim mexmûr û ebter kirim	*Eyledi beni âşık ve kalbi paralanmış, hem mahmur ve soyu kesik*
Bê yar û hemser kirim ‘eşqê Bedîulcemal	*Dostsuz ve eşsiz etti beni, aşkı Bediülcemal’in*
Perwanereng im ji şem’ê, nazirê min cimle cem’	*Mum etrafında kelebek misaliyim ben, toplandı tüm benzerlerim*
Rêz kir li çahvê min dem’, şewqê Bedîulcemal	*Dizdi gözyaşlarını gözümde, ışığı Bediücemal’in*
Sohtî dilê jarê ma, dilber û dildarê ma	*Yaktı perişan gönlümüzü, dilber ve sevgilimiz bizim*
Pirr didet azarê ma, hibbê Bedîulcemal	*Fazlasıyla eziyet vermektedir bize, sevgisi Bediülcemal’in*
Çeşmeyê çeşmê pirab, yarê me dî bê hîcab	*Gözlerin çok sulu çeşmesi, gördü yar perdesiz bizi*
Ateş û berqê şihab, dil li me kir wek kebab	*Ateş ve şimşeği göktaşının, yüreğimizi eyledi kebap misali*
Azar û hibbê hebîb, têkbirin sebr û şekîb	*Sevgilinin eziyet ve sevgisi, mağlup etti sabrı ve tahammülü*
Mecrûh im ez bê tebîb, naleyê wek ‘endelîb	*Yaralıyım, yoktur tabib, inliyorum bülbül gibi*
Nale û ah û keser, têtin ji qelb û ceger	*İnleme, ah ve üzüntü, gelmekteler yürekten, ciğerden*
We z’eşiqê le’lên şeker, barê Bedîulcemal	*Ben ki şeker dudakların aşığı, sebebidir Bediülcemal*
Le’lên şekerbar û mey, saz û def û çeng û ney	*Şeker dağıtan, şarap içen dudaklar, saz, tef, çenk ve ney*
Leb ji leb û leblebey, qelbê me kir sax û hey	*Dudaktan dudağa ve dudak dudağa, gönlümüzü eyledi sağ, diri*

Heyy kir me şoxa letîf, bade û camên zerîf	*Diriltti bizi nazik güzel, bade ile zarif kadehlerle*
Qamet û bejinelîf, warê Bedîulcemal	*Boyuyla endamıyla, elif misali, Bediülcemal gibi*
Qamet û bejinçeleng, bir li me namûs û deng	*Boyu ve posu güzel, bizden alıp götürdü, namusla rengimizi*
Zêh û keman çu neng, dan li me tîr û xedeng	*Kiriş ile yay ki ar ve ayıp misali, yağdırdı üzerimize okları*
Tîr dan li qelbê Sîyahpoş, xwe wî pirr gule	*Sapladılar oku Siyahpûş'un kalbine, ki o çok gülleri*
Bi bîn kirî zulfên çu şehmarê Bedîulcemal	*Koklamıştır şahmeran misali, zülüflerini Bediülcemal'in*
Wekî dît Serwebanûya semenber	*Görünce Servi Hatun, o yasemin göğüslü*
Seda û şî'r û 'eşqê Şahê dilber	*Gönül çeken o Şah'tan, aşk, şiir sedasını*
Nihêrî Melke û Bedra kemal e	*Baktı gördü ki Melke, hem olgun Bedre Hatun*
Dibêjin go çi sirr e ew hewale	*Diyorlardı ne sırdır, bu yapıp ettiklerin*
Şîrîn û nerm rêhtin le'l û gewher	*Tatlı, yumuşak döktü, dudaklardan cevherler*
Du lê'lê şekerîn wê Bedra enwer	*O ışık saçan Bedre, şekerli dudaklardan*
Ji ewwel da ji 'Asim Îbnu Sefwan	*Ta başından başlayıp, Asım İbni Safvan'dan*
Ji şeklê ku şihand boyê Suleyman	*Peygamber Süleyman'a, gönderdiği resimden*

Kî ye'nî sûretê şîrîn Perîzad	*Ki yani o suret ki, şirin peri kızının*
Ji 'aşiqbûn Şehzade bi îcad	*Onu görmekle âşık, olması Şehzade'nin*
Mihessel wê xeber da ta bi axir	*Özetle haber verdi, ta sonuna kadar*
Ji mezkûrê hikayet ta bi teqrîr	*Anlattı hikâyeyi, bahsi geçmiş olanın*
Miheyyer bû gelek jê Serwebanû	*Şaşırttı söylenenler, çokça Servi Hatun'u*
Ji 'eşqê Şahizade şeklê mehrû	*Aşkının Şehzadenin, ay yüze olan şekli*
Sena û hemdê Rebbanî gelek kir	*Fazlasıyla şükretti, hem överek Rabbini*
Li paşan meylê wan çavêd belek kir[172]	*Arkasından yöneldi, siyah-beyaz gözlere[172]*
Nihêrî ku li pişt perdê semen bû[173]	*Baktı gördü yasemin, perdenin ardındadır[173]*
Ji zexmê tîrê ser daye bi ejnû	*Okların yarasından, dize koymuş başını*
Diket ahîn û nalîn û girînê	*Ahlayıp inlemekte, ağlayıp durmaktadır*
Ji çahvê xwe direjî av û xwînê	*Gözlerinden dökmekte, kan ile gözyaşını*
Sivik rabû çû nik wê Serwebanû	*Servi Hatun hafifçe, kalkıp gitti yanına*
Go: "Ey şirînliqayê taqê ebrû	*Dedi, "Ey kemer kaşlı, siması şirin kızım*
Sebeb çi ev girîn û ah û nale	*Sebebi nedir, ağlarsın, nedir bu ah, inlemen*
Bibêj ey dilberê nûrîncemale	*Bana söyle dilberim, ey benim nur cemalim*

[172] Li vir, armanc ji "çavên belek", çavên Seyfulmilûk in.

[173] Mebest ji "semen"ê, Bedîulcemal e.

[172] Burada, "siyah beyaz (alacalı) gözler"in sahibi Seyfülmülûk'tür.

[173] "Yasemin"den murat, Bediülcemal'in kendisidir.

Ji ahî dilkeşet sohta li min dil	*İç çekmesi ahlardan, yaktı gönlümü benim*
Ji girye helqeyê zilfêm çu sinbil	*Ağlaması halkasından, sümbül gibi zülfümün*
Bi ker bû damenê sebrem ji halet	*Bu durumdan yırtıldı, sabrımın etekleri*
Nehişt nûrê rûxêm şewqê cemalet	*Aldı nuru yüzümden, hem güzellik şavkını*
Ela ey mahê rûyê nûrê ruxsar	*Bak ey yüzlerin ayı, yanaklar için ışık*
Were bo min bike sirrê xwe izhar	*Gel de açıkla bana, ta sırrını bileyim*
Be Ellahû ‘Ezîm û Rebbê Ekber	*Yüce Allah adına, hem de en büyük Rabbin*
Bi Esmaê Şerîf û Zatê Enwer	*Hem şerefli esması, Nurlu Zatı adına*
Meger esla nebî qet çare û xem	*Olma asla umutsuz, gamlı ve de tasalı*
We ger ne dê bikem cerhê te melhem	*Böylece yaranı ben, kesin ederim merhem*
Di hîna dîte firset mahitabê[174]	*Dolunay ki bulmuştu, fırsatını o anda[174]*
Beyan kir sirrî ez rûyê hîcabê	*Geldi perde yüzüne, vurdu dışa sırrını*
Go: “Ey mader nizanim ez çi bêjim?	*Dedi ey anneciğim, bilmem ne diyeyim ben*
Xumar û mest û sewdaî yû gêj im!	*Sarhoş ve mest düşmüşüm, sevdalıyım, sersemim*
Dilê min sohtiye enwarê ‘eşqê	*Yüreğini yakmıştır, aşkın nurları benim*
‘Ecêb dijwar e pirr azarê ‘eşqê	*Acayip zahmet iştir, azabı çoktur aşkın*

[174] Mebest ji “mahitab”ê, Bedîulcemal e.

[174] “Dolunay”dan maksat, Bediülcemal’dir.

Nehin min taqetê barê firaqê
Ji dil sohtim ji derdê îştiyaqê

Takatim, gücüm yoktur, yüküne ayrılığın
Ta gönülden yandım ben, derdinden iştiyakın

Dilê min pehtî ‘eşqê wek kebab e
Ji ‘eşqê ra nehin şerm û hicab e

Aşk kızarttı gönlümü, tıpkı kebap misali
Aşk için yoktur asla, utanmayla çekinme

Birin ‘eşqê heya û nam û namûs
Li min îro mîsala bintê Teymûs[175]

Aşk götürdü hayayı, hem de nam ve namusu
Bugün benim durumum, Taymus kızı misali[175]

Egerçî Leylayem, Mecnûn-sifatem
Lebê ‘Îsa dixwazim weke mewatem

Her ne Leyla isem de ancak Mecnun gibiyim
Ölüyüm ben, isterim, dudağını İsa’nın

Lebê şîrîn kirin Ferhad û Xusrew
Ze’îf û zer misala mahê yekşew

Ferhat, Hüsrev misali, şirin dudaklarımı
Zayıf, sararmış kıldı, bir gecelik ay gibi

Heyatê cawîdan ez Xizir xwahem
Şû’aê nûrê ez bextê siyahem

Ebedi hayatı ben, istiyorum Hızır’dan
Kara bahtımdan benim, nurumun ışınları

Çu Ya’qûbê hezîn ez mistemend im
Ji husnê Yûsifî ra derdemendem[176]

Hüzünlü Yakup gibi, acılı, tasalıyım
Dertlisiyim Yusuf’un, güzelliğinin onun[176]

[175] Mebest ji “bintê Teymûs”, Zuleyxe ya dildar û dilbest a ji bo Cenabê Yûsif e.

[176] Armanc ji “Ye’qûbê hezîn”, Cenabê Ye’qûb e. Kesera wî, ji ber berzebûna Yûsif e.

[175] “Taymus’un kızı”ndan maksat, Hz. Yusuf’a gönül veren Züleyha’dır.

[176] “Hüzünlü Yakup”, Hz. Yakup’tur. Hüznü (kederi), Hz. Yusuf’u kaybetmesinden ötürüdür.

Wekî perwaneyê maîlê bi şem' im
Ji sozê 'eşqê xoş tên cem'ê dem' im

Ji 'eşqê bilbilê şeyda miheyyer
Gulê rûyem ji 'eşqê bûye esfer

Ji 'eşqê qametem wek qewsê ebrû
Ji janê dil me ser daye bi ejnû

Mîsala mûyê dilber bûme helqe
Ji janê dil bûye du nîm û felqe

Mebên kes mislê min pirderd û 'aşiq
Nehin yek zerre em 'Ezra û Wamiq

Felek ez 'eşqê min sergeşte geşte
Ji ahê min dinalîn ferişte

Wekî avê çeman ez bêqerar im
Şev û roj talib û mail bi yar im

Çi kem 'Îsa we Eflatûn û Loqman[177]
Nehin cuz le'lê leb derdê me derman

Kelebek misali ben, eğilimliyim muma
Aşk ateşinden akar, benim hoşça tüm kanım

Çıldırmış bülbül gibi, şaşırmışım aşktan ben
Gül gibi yüzüm benim, sararıp solmuş aşktan

Aşktan endamım benim, bükülmüş kaş, yay gibi
Gönül sancısındandır, baş koymuşuz dizlere

Dilberin saçı gibi, halkalı olmuşum ben
Sancısındandır gönlün, iki lime olmuşum

Demeyin benim gibi, çok dertli, âşık vardır
Bizim zerremiz olmaz, Azra Hatunla Vâmık

Felek aşkımdan benim, gezmektedir sersemce
Ahlarımdan ötürü, inlemekte melekler

Akarsular gibi ben, kararsız, huzursuzum
Gece gündüz yârime, eğilimli, talibim

Ne edeyim İsa'yı, hem Eflatun, Lokman'ı[177]
Yoktur dudaklarında, bize bir parça derman

[177] Mebest ji "Îsa", Cenabê Îsa ye.
Ji bo Eflatûn û Loqman, bnr. têbiniya 54.

[177] "İsa"dan maksat, Hz. İsa'dır.
"Eflatun" ve "Lokman" için, bkz. 54. dipnota.

Dinalînim ji ‘eşqê Şahizade	*İnleyip durmaktayım, ben Şehzade aşkından*
Wîsalê wî min ra qesd û mirad e	*Kastım, muradım benim, kavuşabilmek ona*
Çi halek xoş e rehber bête mehrem	*Ne güzel bir durumdur, sırlara rehber olmak*
Bilez bînî ji bo cerhê me melhem	*Yaramız için merhem, aceleyle getirmek*
Bide min mijdeyê zewqê wîsalê	*Ver bana sen müjdeyi, zevkini kavuşmanın*
Şeb û roj ez bimînim der xeyalê	*Gece gündüz kalayım, hayalinde ben onun*
Me’elqisse, wekî dî Serwebanû	*Sözün özü olarak, Servi Hatun ki gördü*
Hewalê ‘êşqê mehtabê perîrû	*Peri yüzlü mehtabın, hallerini aşkının*
Gelek hemdê Xudawendî bi heq kir	*Hakkıyla ediverdi, Allah’a övgüyle hamd*
Rizayê dil bi ‘ilmê masebeq kir	*Gönülden kabul etti, yaşanmış hikâyeyi*
Go, “Ey çeşm û çirayem qet meke xem	*Dedi, “Hiç tasalanma, ey gözüm, çıram benim*
Ji bo cerhê dilet hazir e melhem	*Hazır merhemi senin, gönlünün yarasının*
Bi tewfîqa Xwedê dê bit miyesser	*Kolay olacaktır bu, Allah’ın yardımıyla*
Mirad û meqsedet ey nûrê enwer	*Senin maksat, muradın, ey nurların en nuru*
Welê miqdarekî sebrê bi herhal	*Ancak bir miktar senin, sabretmen gerekmekte*
Divê da em dê çîn pêş Şahê Şehbal”	*Lazımdır ki gidelim, Şehbal Şah’ın önüne”*

Mihessel, Serwebanûya serefraz	*Sözün özü olarak, onurlu Servi Hatun*
Bi derket xweş li perda mehremê raz	*Sırlı mahrem perdeden, çıktı güzel şekilde*
Nihêrî rûyê Şehzade bi mihbet	*Yüzüne Şehzade'nin, bakwerdi sevgiyle*
Mîsala umm û ferzandan bi şefqet	*Çocuklu anne gibi, şefkat saçan gözlerle*
Go: "Ey Şehzadeyê mest û dilawer!	*Dedi ki, "Ey Şehzade, ey mest düşmüş yiğidim*
Xudawendet biket meqsed miyesser	*Erdirecektir Allah, arzuna, maksadına*
Li min xoş hatin ew remz û nîşanet	*O işaret, nişanlar, hoşuma gitti benim*
Seda û husnê teqrîr û beyanet	*Sesinle hem hüsnünle, anlatıp dediklerin*
Tu çi dixwazî bixwaze ey dilawer	*Ne istersen var iste, ey yürekli yiğidim*
Dibit Rebbî biket meqsed miyesser	*Olur ki kavuşturur, maksadına Rabbimiz*
Wekî bê dewlet zewq û sefa ye	*Zevk ve safadır bil, devletten mahrum olmak*
Ji bala qet ne mihtacê cefa ye"	*Zahmete değmez bunun, asla yüksekten bakmak"*
Sê caran kir temenna Mîrê dilber	*Sevgili Bey üç defa, minnettarlık bildirdi*
Li pêşî Serwebanûya semenber	*Göğsü yasemin olan, Servi Hatun önünde*
Go: "Talib im ber wê xonçeyê gul[178]	*Dedi, "İstekliyim ben, gül goncası önünde[178]*
Wekî bilbil firrîn sebr û tehemmil	*Sabır ve tahammülle, bülbül gibi uçuşmak*

[178] Armanc ji "xonçeyê gul", Bedi'ulcemak bixwe ye.

[178] "Gül goncası"ndan maksat, Bediülcemal'dir.

Dixwazim xonçeyê baxê Îremzat	*İrem bahçelerinin, isterim goncasını*
‘Fefî qelbî hewaha kulle ewqat’[179]	*‘Bütün zamanlar için, kalbimde vardır aşkı’*[179]
Sebeb ew bû me hiştin milk û emlak	*Ondan dolayıdır ki, malı, mülkü bıraktım*
Ji ahê min dinalin cimle eflak	*Ahlarımdan dolayı, inlemekte felekler*
Me hêla madera şîrîn û baba	*Bıraktım ben geride, şirin anne, babayı*
Sebeb ‘eşqê cemalê pirr hicaba	*Çok gizli ve perdeli, güzelliğin aşkından*
Ji şehrê Misr û yaran bûm cudaye	*Koptum geldim Mısır’dan, şehridir dostlarımın*
Ji behran bûm girîftarê belaye	*Denizlerden gezerken, uğradım belalara*
Ji Çînê çend me dîtin sûretê xûb	*Birkaç güzel sureti, gördüm Çin diyarında*
Nebû qet yek miqabil rûyê mehbûb	*Ancak hiçbiri gelmez, dengine sevgilinin*
Ji mewc û pêleha çend bûme bê heş	*Denizden, dalgalardan, sersem oldum ise de*
Ji dil min qet neçû hibba perîweş	*Gönlümden hiç gitmedi, peri yüzlünün aşkı*
Ji destê zengîyan min pirr cefa dîn	*Çokça zahmetler çektim, zencilerin elinden*
Ji Serwehşan gelek zêde bela dîn	*Epey belalar gördüm, domuz kafalılardan*
Ji Sekseran hebek ez bûme rahet	*Biraz rahatladım ben, it kafalılar elinden*
Dikêşa min xem û azarê firqet	*Ancak çekiyordum gam, ayrılık acısının*

[179] Ev rêzik, erebî ye; kurmanciya wê wisa ye: “Ji bo her demê heye, dilê min de eşqa wê”.

[179] Tırnak içindeki mısra, şiirin orijinalinde Arapça geçmektedir; Türkçesini uygun gördüm.

Ji Bozengan kirim der hibba dilber	*Dilberin sevgisinden, kaçtım Bozenklerden ben*
Hilanîm û birim teyrê xezenfer	*Alıp kaldırdı beni, aslan gibi bir kartal*
Ku qesdê canê min kir teyrê derseyr	*Ki canıma kastetti, uçmakta olan kartal*
Kişand ejder bi enfasê xwe an teyr	*Onu çekti içine, bir ejder nefesiyle*
Xilas bûm ez ji wê çol û beyaban	*O çöl ve yabandan, kurtuluwerdim o an*
Li hev dan birçî yû pêxwas û ‘uryan	*Kaldım yalnız başıma, aç, çıplak, yalınayak*
Dinalî min di bin yek darê incîr	*İnliyordum altında, bir incir ağacının*
Ji ‘eşqa dilbera ku bûye teqdîr	*Dilberin aşkından ki, oydu benim kaderim*
Me dî qesrek di nav da Melke Xatûn	*Rastladım bir köşke ben, Melke Hatun içinde*
Ji wê min dît cewaba durra meknûn	*Ondan cevabı aldım, saklı inci hakkında*
Xwedê tewfîq da ‘efrît ‘edem bû	*Allah verdi başarı, yok ettik ifriti biz*
Ji bo min Melke xweş yar û herem bû	*Benim için Melke, hoş arkadaş ve sırdaş oldu*
Şev û rojê dikir behsa hebîban	*Gece gündüz ederdi, sevgililerden bahis*
Diaxiftin ji nû cerhê xerîban	*Kanatırdı yaramı, yeniden ben garibin*
Mihessel, em bixêr hatin Serendîb	*Sonuç olarak geldik, hayırla Serendib’e*
Eger çendan me dît pirr derd û asîb	*Her ne kadar gördükse, nice dert, musibeti*

Wîsala dilberan bo min qerîb bû
Mirada min ji du le'lên hebîb bû

Yakın oldular bana, kavuşmak dilberlere
İki al dudağıydı, muradım sevgilinin

Mirin xweş tê li min nik ez cuda bim
Wekî perwane qurbanê çira bim

Ayrılmaktansa ondan, ölüm bana hoş gelir
Bir kelebek misali, kurbanıyım çıranın

Bila 'umrêm sa'etek bî digel yar
Ne sed salan bimînim ez bê dildar"

Varsın bir saat olsun, yar ile benim ömrüm
Sevgilisiz istemem, yüzler yıl yaşamayı"

"Çi xweş" go, Serwebanûya şekerrîz
"Ela ey Şahibazê mest û xûnrîz

Dedi ki, "Ne hoş dedin, tatlı dil Servi Hatun
Bilesin ey Şehzade, ey mest ve kan akıtan

Heta tu can nedî nabînî tu kam
Venaxwî şerbeta le'lê gulendam"

Canını vermedikçe, bulamazsın mutluluk
İçemezsin şerbeti, gül endam dudaklardan"

Go, "Can û dil dibexşim ez bi carek
Bibînim ez wê têr husna mibarek

Dedi, "Can ve gönlümü, bağışlarım ben yekten
Görmek için yeterli, o kutlu güzelliği

Bi can û ruh ku meqsed bî miyesser
Hezar canêm bî qurbana dilber

Maksadım olsun diye, canımla hem ruhumla
Kurban ederim yâre, bin canım olsa bile

Mihessel, Serwebanûya semenber
Bi tecribe xeber da ba dilawer

Kısaca Servi Hatun, o yasemin göğüslü
Konuştu yiğit ile, onu denemek için

Ji vî rengî gelek qet jê nedît ‘eyb	*Bu şekilde onda çok, görmedi hiçbir kusur*
Heqîqet dîtî ‘eşqê wî bîlareyb	*Gördü ki gerçekte de âşıktır o şüphesiz*
Çi xweş go Serwebanûya gulendam	*Ne güzeldir dedi o, gül boylu Servi Hatun*
Bi Şehzade emîrê Misr û hem Şam	*Şehzadeye ki odur, Mısır, Şam’ın emiri*
“Mekşîn xem ji îro pêve yekser	*“Bugünden itibaren, tasalanma sen asla*
Ji rêya heq ez im her bo te rehber	*Olacağım hak yolda, daim senin rehberin*
Digel xwe dê bibim te baxê Îrem	*Götüreceğim kendimle, seni İrem bağına*
Bi Şehbal dê bikem cerhê te melhem	*Şehbal’le edeceğim, bizler yaranı merhem*
Ji qewlê Heq ku warid bûye ev xet	*Bize ki bildirilmiş, Hak kelamından bu söz*
Bi zayi’ naçî “ecrelmuhsinîn” qet[180]	*Asla kaybolup gitmez, iyilerin ücreti[180]*
Kesê du dil biket ba hevdu mail	*Kimler ki iki gönlü, birbirine bağlasa*
Heqîqet bî ku ‘eşqê wan bi wasil	*Kavuşmayla onların, aşkı hakikat olsa*
Bi şer’ê muftiyê sirra heqîqet	*Hakikat sırlarının, Şeriat müftüsünce*
Dê mixelled bit bîlaşek ew di cennet”	*Ebedi kalacaktır, şüphesiz o cennette”*

[180] Nivîskar, li vir, balê dikşîne ser ayetek Qurana pîroz. Ew jî, ji Sûreya Hûdê ayeta 115. e. Wiha dibêje: “(Se-bir ke, bêguman Xwedê) xelata qencîkaran li valatiyê nabe.”

[180] Şair, burada Kur’an’dan bir ayete işaret etmektedir. O da Hud Suresi, ayet 115’tir. Ayette şöyle geçmektedir: “(Sab-ret, şüphesiz ki Allah) güzel davrananların mükâfatını zayi etmez.”

Mihessel, borî ew meclis werengî	*Özetle, böyle geçti, meclis bu tarz üzere*
Dilê Şehzade bû mexmûr û bengî	*Yüreği Şehzadenin, mahmur ve tutkun oldu*
Were saqî tu bîne camê mitleq	*Gel ey saki, getir sen, kadehini Mutlak'ın*
Tijî bî ew şeraba wahdetê Heq[181]	*Doldur o şarabı ki, Hak Vahdet'indir[181]*
Bibûsim ez ku wê camê mi'ella	*O değerli kadehi, ki öpeyim onu ben*
Ji lewhê dil mehw bitin heyûla	*Silinsin kötü hayaller, gönül levhasından*
Were mitrib bi saz û çeng û tenbûr	*Geliver ey çalgıcı, sazla, çenkle, tamburla*
Bireqsîne dilê me-y mest û mexmûr	*Oynat sen gönlümüzü, ki mest ve de mahmurdur*
Digel çengê beyan ke remz û qudret	*Açığa vur çenginle, remiz ile kudreti*
Bikem guhdariya esrarê wehdet[182]	*Dinleyivereyim ben, sırlarını Vahdet'in[182]*
Sehergahê şefeq da ku tecella	*Parıldadı şafak ki seher, sabah vaktinde*
Ji şerqê 'arifan nûra mi'ella	*Doğdu yüce ışıklar, bilgeler doğusundan*

[181] Nivîskar, li vir, serî li termînolojiya tesewifê xistiye; di nav evîna mecazî de evîna rast serziman kiriye. Bi bêjeya "mitleq", bal kişandiye ser Xwedê ku hebûna wî bê qeyd û merc e. Bi têgeha "wehdetê Heq" jî, herwek pîşeya Wehdetê Wicûd, yekbûna bi Xwedê re, fanîbûna bi cenabê Wî re rênîşan daye.

[182] "Wehdet", taybetmendî û rengdêrek ji bo Xwedê ye. Ango, di her tiştî de, hevpariyek ji bo "yekîtî/hebûn"a Xwedê heye. Bo nimûne, di hemû mirovên cîhanê de, di heman cihê laşê wan de, nolanê hev û xwedîfonksiyonên hevpar lebat henin ku ev yek wehdeta/yekbûna aferîner nîşan dide.

[181] Şair, burada tasavvufî terimlere başvurmuş; mecazi aşk içinde hakiki aşkı dillendirmiştir. "Mutlak"la, kayıtsız, şartsız varlığa, yani Allah'a işaret ederken, "vahdet-i Hak"la, Vahdet-i Vücut mesleğinde olduğu gibi, "Hak" olan Allah'ta birleşmeyi, onda fanileşmeyi öğütler.

[182] "Vahdet", Allah'a özgü özelliklerinden biridir. Yani her şeyde "bire/kendisine" işaret eden bir müştereklik yaratmasıdır. Mesela bütün insanlarda; vücutlarının aynı yerinde, benzer şekilde, ortak fonksiyonlarda organlar yaratması gibi.

Miferreh bûn ji şewqê heftê kîşwer
Ferahlandı o şavktan, yetmiş civarı ülke

Nifûsê sabi'e merza bû yekser
Razı oldular tümden, yedi nefis hep ondan

Mihessel, rabû Serwa heftê perda
Özetle kalktı Servî, yetmiş perde ardından

Digel peryan bi remza xwe xeber da
Perilerle birlikte, verdi remzinden haber

Go rabin em herin baxê Îremzat
Dedi kalkın gidelim, İremzat bahçesine

Temam bû we'deyê me w'hate ewqat
Süremiz doldu bizim, geldi artık vaktimiz

Dibên rabûn temamî cimle yekser
Derler ki kalktılar hep, cümle birden olarak

Bi emrê Serwebanûya semenber
Yasemin sineliler, Servi Hatun emriyle

Miferreh heft hezar perî dilawîz
Ferahla, cazibeli, yedi bin peri ile

Semenbûy û dilîstîn û şekerrîz
Gönül alan, şekerli, hem yasemin kokulu

Ji siltanê Serendîb xwestî destûr
Serendip sultanından, istediler desturu

Bi şadî yû bi keyf û zewq û mesrûr
Mutlulukla, keyifle, hem zevk ile sevinçle

Gulab û misk û 'enber lê reşandin
Serptiler gülsuyunu, hem misk ile amberi

Bedîa Ba Cemal zêde hebandin
Bediülcemal'i ki, onur verdiler çokça

Gelek wesyet kirin bo Şahizade
Ettiler hep vasiyet, Şehzade için çokça

Ji wê Serwa letîf û sînesade
O yumuşak serviye, o sade sineliye

Bi hevra wan çi xoş go ez wesiyet	*Beraberce dediler, güzel ve hoş nasihat*
Eger te d'vê nebit qet'ê mihibbet	*Şayet ki istiyorsan, sevginiz devam etsin*
Dibîtin tu bikî Şehzade mesrûr	*Lazımdır Şehzade'yi, etmelisin mutlu sen*
Be wê husna şerîf nûrun 'ala nûr	*Nur üstüne nur olan, seçkin güzelliğinle*
Gelek xoş hatin ew wesîyet ji banû	*Gayet hoşuna gitti, o vasiyetler hanımın*
Îşaret kir bi du qewseynê ebrû	*İki yay kaşlarıyla, işaret etti hemen*
Bila bên du perî zêde bi şefqet	*Gelsinler iki peri, fazlasıyla şefkatli*
Li ser piştê xwe deynin pirr bi rehmet	*Büyük bir merhametle, bindirsin sırtlarına*
Ku Şehzade nebînit qet cefayê	*Şehzade ki görmesin, hiçbir zoru, cefayı*
Li bala xweş biket seyr û sefayê	*Etsin yükseklerde o, hoşça seyran, sefayı*
Nekêşit qet cefa û mihnet û xem	*Çekmesin asla cefa, hem eziyet ile tasa*
Heta wasil dibîtin baxê Îrem	*Ta ulaşıncaya dek, İrem'in bağlarına*
Li paşan xwest destûr Şahê dilgîr	*Sonra istedi izin, gönlü incinmiş Şah*
Ji Şah û Melke û Bedre-w zenê Mîr	*Şah'la Melke, Bedre'den, hem de eşinden Bey'in*
Dibên Şehzade çû cem yara canî	*Derler Şehzade vardı, candan yârin yanına*
Du destê xwe di gerden da weranî	*İki kolunu onun, gerdanına doladı*

Werengî xoş girîn ew herdu dildar
Heta nalîn ji wan re av û eşcar

Güzelce ağladılar, bu tarz iki sevgili
İnlediler onlarla, sular ile ağaçlar

Ji dengê wan gelek erwah cemi' bûn
'Uyûn û dil tijî xûn û demi' bûn

Seslerinden onların, toplandı çoğu ruhlar
Gözlerle gönülleri, kanlarla doldurdular

Ji sozê 'eşqê wan hatin bi ref ref
Melaîk û perî însan bi sef sef

Onların aşk sözünden, grup grup geldiler
Sıra sıra melekler, insanlarla periler

Ji 'eşqan ku dikir wan ah û nale
Dilê erwaheha bûn mest û wale

Aşktan ki ederlerdi, ahlarla inlemeler
Oldu ruhların gönlü, sersem ile hem sarhoş

Heta heft sa'etan wan kir bi zarî
Ji çahvê herdûwan avxûn dibarî

Ağlaştılar onlar hep, yedi saat kadarı
Akardı gözlerinden, ikisinin irinler

Mihessel, xwestî destûr Şahizade
Ji Se'dê dilruba û sînesade

Sözün özü Şehzade, istedi desturunu
Gönül kapan Sad'dan, hem parlak sineliden

Go: "Se'da! Tu bike bo me dû'ayê
Ji Xaliq pirr bike hîvî-w ricayê

Dedi, "Ey Sad edesin, bizim için sen dua
Çok eyle Yaratandan, umut ile ricayı

Ku zû bêtin min re meqsed miyesser
Bi êm û ez bibînim te dilawer"

Ta gerçekleşsin bizim, maksadımızı çabucak
Geleyim de göreyim, ben seni ey yiğidim"

Hilanîn destê Se'd û xoş dû'a kir	*Kaldırdı ellerini, Sad etti güzel dua*
Dilê rûhaniyan yekser heba kir	*Harap etti gönlünü, ruhanilerin yekten*
Digel ku kir dû'a zêde bi tehsîn	*Duasını ki etti, fazlasıyla güzelce*
Digo ruhanîyan bîlcimle amîn	*Cümleten ruhaniler, diyorlardı ki âmin*
Selam kir go bi xatirê te ey yar	*Selamla ey dost dedi, Allah'a ısmarladık*
Selam istand Se'dê mest û xumar	*Karşılık verdi ona, mest ve sarhoş Sad*
Go: "Ya Rebb, tu herî xêr û selamet	*Dedi, "Allah seninle, git hayır, selametle*
Nebînî rencê rah û hem melamet	*Görmeyesin yolunda, zahmet ile kınama*
Digel meqsed tu bê û min bikî şad	*Arzuna ulaşmakla, gelir, mutlu edersin*
Ji destê firqetê Şeh kir bi feryad	*Şehzade etti feryat, ayrılığın elinden*
Gelo, sohtim bi narê iştiyaqê	*Acaba yanmış mıyım, arzunun ateşiyle*
Nema sebra me ez destê firaqê	*Kalmadı hiç sabrımız, ayrılığın elinden*
Li ser ta pê firaqê rû bibin reş	*Karardı yüzlerimiz, baştan başa firaktan*
Nehişt bo me qerar û taqet û heş!"	*Bırakmadı bizde o, karar, takat ve akıl*
Bi naçarî kirin sebr û tehemmil	*Ettik çaresizlikten, sabır ile tahammül*
Bi halê xwe çû Şehzade bi dudil	*Gitti kararsız halde, Şehzade isteksizce*

Dilê Şeh ma li nik Se'dê dilawer	*Kaldı Şehzade gönlü, yiğit Sad'ın yanında*
Ruh û can çû digel Serwa semenber	*Gitti ruh can serviyle, yasemin sineliyle*
Mihessel, bû siwar mislê Suleyman[183]	*Özetle, biniverdi, tıpkı Süleyman gibi[183]*
Şehê mexmûr li ser piştê du peryan	*İki peri sırtına, mahmur olan Şehzade*
Perî rabûn bi cem'î şad û bê xem	*Kalktı bütün periler, mutluca, tasasızca*
Bilind bûn û firrîn ew ber bi Îrem	*Yükselerek uçtular, İrem yönüne taraf*
Bilind bûn ew qeder ta mislê xerbal	*O denli yükseldiler, kalbur misali oldu*
Li ber çehvan dinê ma ew şîrîn xal	*Dünya gözü önünde, kaldılar şirin ben kadar*
Bi zewq û keyf û aheng û bi seyran	*Seyrettiler zevk ile, hem keyifle, ahenkle*
Ji jor da hatne xwar teşbîhê teyran	*Tıpkı kartallar gibi, yukarıdan indiler*
Heta wasil bûn ew şîrîn di nêv bax	*Ta kavuşuncaya dek, onlar bağın içine*
Dilê Şehzade lê bû daxê ber dax	*Yüreği Şehzadenin, şişlenerek dağlandı*
Bi emrê Serwebanûya gulendam	*Endamı gül misali, Servî kadın emriyle*
Li bin darek tuffah danîn Şahê Şam	*Bırakıldı Şam Şahı, bir elma ağaç altına*
Bi tenha ma emîrê 'eşqebazan	*Yalnız başına kaldı, aşk oynayanlar beyi*
Li balê çûn perî wek siyy û qazan	*Gitti yanından peri, kaz ve turnalar gibi*

[183] Mebest ji "Suleyman", Cenabê Silîman e. Îşaretê geşt û gera wî ya bi ba re dike.

[183] "Süleyman" maksat, Hz. Süleyman'dır. Onun rüzgârla seyahatine işarettir.

Çû qesra xwe dibên Serwa şîrînxal	*Derler köşküne gitti, benleri tatlı Servi*
Ji hatin wê gelek dilxoş bû Şehbal	*Gelmesinden dolayı, çok memnun oldu Şehbal*
Bedîa Ba Cemala mahê peyker	*O Bediülcemal ki, çehresi ay misali*
Çû hucrek xoş çahvnêrê dilawer	*Geçti bir hoş odaya, gözledi yiğidini*
Bi destûr çûn periyanê şekerleb	*İzin alıp gittiler, şeker dudak periler*
Miferreh bir bi mala xwe mueddeb	*Ferahla edeplice, götürdüler evine*
Were saqî tu bîn camê mi'ella	*Gel ey saki, getir sen, o mualla kadehi*
Tijî bîtin şerab-nûra tecella	*Doldur sen tecellinin, nurani şarabından*
Bi yek qetre ji wê camê şekerleb	*Bir tek damlasıyla, şeker dudak kadehin*
Munîr bî qafê ta qaf zulmetê şeb	*Aydınlansın tümüyle, karanlığı gecenin*
Bi dewranê felek qet xoş mekin dil	*Hoş etmeyiniz gönlü, asla felek devriyle*
Gehî gul nîsbet e gahî çu sinbil	*Bazen güle benziyor, bazense sümbül gibi*
Gehî roj û sirûr û xemr û cam in	*Bazen aydınlık, sevinç, içki ile kadehtir*
Gehî huzn û girî û hem zelam in	*Bazen hüzün, ağlamak ve hem de karanlıktır*
Me'elqisse, dibên Şehzade dîsa	*Sözün özü, derler ki, Şehzade yeni baştan*
Di dil da meş'ela 'eşqa we îsa	*Parlaywerdi gönlünde, aşkın meşalesi*

Dinê pur kir ji dengê saz û çengan
Doldurdu dünyayı o, sazla çengin sesiyle

Ku wî dît şeklê narincê bîşengan
Ki görünce şeklini, salkımsöğüt turunçlar

Li ser hewzek mirebbe' ferşê mermer
Dört köşe bir havuzda, mermerden taş üstünde

Rûniştî bû miqabil darê 'er'er
Oturmuştu mukabil, bir dağ servisinin o

Ji gerhanê felek, tîra qezayê
Feleğin dönmesinden, kazanın oklarından

Li nik xwe çend nefer dîn wek belayê
Gördü kendi yanında, bela gibi kaç kişi

We zen bir ew ji xelqê Îremê ne
Zannetti ki onlar da halkındandır İrem'in

Nizanî ew ji serçeşma xemê ne
Bilmedi ki onlardır, gam pınarının başı

Ku wan dît Şahibazê mest û dildar
Ki gördüler yiğidi, mest düşmüş sevgiliyi

Li cem rûniştin û jê kirne pirsyar
Yanına oturdular, ondan ettiler sual

"Tu ew Adem ne yî, pirsa me hal ke
"Değil misin o insan, hallet sen sorumuzu

Perîkuşt û bi xwe ra anî Melke?"
Periyi öldürüp de Melke'yi alıkoyan"

Ji serxoşî cewab da bê teemmil
Cevap verdi sarhoşça, düşünmeden soruyu

Belê go, "Ez ew im", wan go, "Tefeddil
Evet, "O benim" dedi, onlar dedi, "Buyurunuz

Resûlê tey ne em rabe eya Mîr!
Bizler elçileriniziz, kalk dediler ey bey

Bi emrê şahê Şehbal tu yî nêçîr!"
Şehbal Şah'ın emriyle, sensin avımız bizim"

Ji Şehbal ku bihîst wî qet nekir deng	*İsmini ki Şehbal'in, duydu, ses çıkarmadı*
Hilanîn û birin ta heftê ferseng[184]	*Kaldırıp götürdüler, yetmiş fersah öteye[184]*
Biderxistin ji milkê Îremê Mîr	*Çıkardılar İrem'den, Şehbal'in ülkesinden*
Du dest û ling û gerden kirne zincîr	*Zincire vurdular, iki el, ayak ve boynunu*
Birin ser kohekî zêde mi'ella	*Götürdüler bir dağa, fazlasıyla yüksekti*
Ji qelbê wî biderxistin heyûla[185]	*Çıkardılar kalbinden, heyula denen şeyi[185]*
Bi wan go, "Şahizade ev çi hal e?	*Şehzade deyiverdi onlara, "Bu ne haldir?*
Bi bêbextî we ez girtim û hale!	*İhanetle aldınız, getirdiniz buraya*
Bibêjin halê xwe ez we nizanim	*Kimsiniz deyin bana, tanımıyorum sizi*
Ji halê xwe û we ez biguman im"	*Kuşkuluyum ben sizden, hem halimden kendimin"*
Ewan go: "Em ji xelqê Qulzemê ne	*O kimseler dediler, "Kulzem'in halkındanız biz*
Ji bo te ba'isê derd û xemê ne	*Senin hakkında bizler, sebebiyiz dert, gamın*
Me kuştin şehrê te cimle bi yekser	*Katlettik şehrinizi, bir baştan öte başa*
Çi bab û dê yû çendî mîr û begler	*İster annen ve baban, isterse bazı beyler*

184 "Ferseng" an "fersex", yek ji pîvana dirêjahiyê ye. 1 ferseng, hemberê 3 mîlan (bi qasê 5 kilometir) e.

185 "Heyûla", xiyal an tiştên xiyalî yên tirsnak e. Wek termek felsefî, bingeha tiştan, destpêka madeyan, qismê rastîn yê madeyan e.

184 "Fersah", bir uzunluk birimidir. 1 fersah 3 mile (yaklaşık 5 kilometreye) tekabül eder.

185 "Heyula", ürkütücü hayal ya da hayali şey demektir. Felsefi terim olarak; eşyanın aslı, ilk maddesi, maddenin gerçek olan kısmı anlamındadır.

Te kuşt Şehzadeyê me ez qisasî	*Sen ki şehzademizi, öldürdün, kıssasıdır*
Te jî em dê bihelînin wek risasî	*Seni de biz kurşun gibi, bil ki eriteceğiz*
Dibînî em çil in, lê şeş hezar in	*Görüyorsun ki biz kırkız, ancak altı bin kişiyi*
Şehî Qulzem li pê te em hinarin	*Kulzem Şahı gönderdi, taktırdı peşinize*
Ji asmanan dixwestî me ji ‘erdan	*Gökte ararken seni, bulduk şimdi biz yerde*
Bi destê me ketî îro tu erzan”	*Düştün sen elimize, bugün gayet ucuzca”*
Go: “Arê kuştina min qet nehin xem	*Dedi, “Evet öyledir, hiç gam değil ölümüm*
Welê şehrî û bab û dan çi kir hem?	*Ancak anne ve babam, hem şehir halkı neden*
Ji min ra dîtî wan bê hed cefaye	*Onlar ki benim için, çektiler nice zahmet*
Bi ‘aqibet li ser min dîn belaye	*Akıbet benim için, gördüler nice bela*
Çi tali’ek xirab û nehs û ebter	*Ne kötü bir talihtir, uğursuz ve de soysuz*
Bo ew tali’ ku ez pê bûm ji mader”	*O talihten ötürü, doğmuşum ben annemden”*
Mihessel, Şahizade ku kirin bend	*Hasılı bağladılar, Şehzadeyi her yandan*
Gelek hatin temaşa serxoş û rend	*Geldiler izlemeye, nice sarhoş, gönlü hoş*
Ji ehlê Qulzemê ger can, eger pîr	*Kulzem’in sakinleri, genç olsun, yaşlı olsun*
Bi hevra go çi heyf e kuştina Mîr!	*Yazıktır diyorlardı, öldürülmesi Bey’in*

Bi esla destê kes neçû ku bikujin	*Kimsenin eli asla, kıymadı ki öldürsün*
Ji ber qisasê xûnê Şah birêjin	*Kısas yüzünden Şah'ın, varıp kanını döksün*
Bi qewlê 'arifan û 'aqilmendan	*Bilgelerin sözüyle, hem akil adamların*
Nekuştin lê kirin mehbûs di zîndan	*Öldürmediler onu, ettiler hapis, zindan*
Serê zîndanê girtin pirr kirin teng	*Zindanı kapattılar, daralttılar fazlaca*
Bi mislê paceyek tê da Şehê şeng	*Neşe saçan Şah için, açtılar bir pencere*
Li ser danîn muwekîlek qewî purr	*Bıraktılar başına, çok güçlü bir görevli*
Ku hişyar bit li şêrê mest û sefdurr	*Ta gözlesin aslanı, o mest ve saf inciyi*
Bidetê nan û avê da ji Ekber	*Versin ona su, ekmek, ta ki hakkında Allah*
Çi bê teqdîr nivisî yû miqedder	*Görelim neler yazmış, neyi takdir buyurmuş*
Were mitrib digel çengê bibêje	*Gel ey çalgıcı söyle, çengin ile birlikte*
Sedayê mihbetê xwûnem birêje	*Sevginin sedasıyla, akıtwer kanımı*
Xerîb û 'aşiq im min nîn e qet kes	*Garip ve de aşığım, yoktur hiç kimsem benim*
Ji xeyrê Wahidê Zana û Eqdes[186]	*Vahid'den gayrı benim, O'dur Alim ve Akdes[186]*

[186] "Vahid", "Zana" û "Eqdes", her yek wesfekî Xwedê ye. Bi kurtî, Vahid: Bi wateya yekta, bêmînak e. Zana, ango Alim: Di warê zanînê de, zanayê bi her tiştî ye. Eqdes: Pîrozê bi ser pîrozan re ye; yê pîroztirîn e.

[186] "Vahid", "Alim" ve "Akdes", Allah'ın sıfatlarındandır. Kısaca; Vahid: Tek, benzersiz anlamındadır. Alim: İlim itibariyle her şeyi bilen demektir. Akdes: Kutsallar üstü kutsal, en kutsal demektir.

Di zîndanê çi xoş got Şahizade	*Ne hoş dedi Şehzade, yalnızlığında zindanın*
“Xerîbek ‘aşiq im pirr bê mirade	*“Garip bir aşığım ben, fazlasıyla muratsız*
Ne min têr dît rûyê walideynan	*Ne doydum yeterince, anne, baba yüzüne*
Ji xemza mihbeta tîrê du ‘eynan	*Muhabbet gamzesinden, iki gözün okundan*
Ne min têr dît rûyê Se’dê canî	*Ne doyuncaya gördüm, canım Sad’ın yüzünü*
Ji ‘eşq û mihbeta yara nihanî	*Gizli olan yârimin, aşkından, sevgisinden*
Ne min têr dît şehrê Misr û Şaman	*Ne doyuncaya gördüm, Şehrini Mısır, Şam’ın*
Ji şewqê ‘eşqê le’lê tas û caman	*Aşkın cazibesinden, tas, kadeh dudağını*
Ne min têr dît çek û esp û siwarî	*Ne doyuncaya gördüm, at, silah, binicilik*
Ji hibba badeyê çeşmên xumarî	*Şarabın sevgisinden, sarhoş düşen gözlerim*
Ne min têr xwar te’amek xoş bilezzet	*Ne doyuncaya yedim, hoş lezzetli bir yemek*
Ji derdê ‘eşq û soz û ahê mihbet	*Aşk ve yanmak derdinden, muhabbetin ahından*
Ne têr bûn carekî çeşmem ji xwabê	*Ne doydular gözlerim, bir kez olsun uykuya*
Ji berqê ‘eşq û şewqê afitabê	*Aşkının şimşeğinden, hem şavkından güneşin*
Cefa û derd û daxên bê ‘eded bes	*Sayısızca zahmetten, usandıran dert, dağdan*
Gelek min dîn di bin çerxê miqewwes	*Fazlaca gördüm, çektim, gök kubbesi altında*

Ji huzn û derdmendî bûme mizter	*Çaresiz kalakaldım, üzüntü, dertlilikten*
Îlahî! Tu şeva reş key minewwer	*İlahi, aydınlık et, karanlık gecemizi*
Qerîb û Qadir û Heq û Qedîm î	*Karib ve de Kadir'sin, hem de Hak ve Kadim'sin*
Kerîm û Reb û Rehman û Rehîm î[187]	*Kerim'sin ve de Rab'sın, hem de Rahman, Rahim'sin[187]*
Tu Settarî yû Xeffaruzzunûb î	*Sen Settar'sın, örtersin, günahları görmezsin*
Mûcîbudde'we, Keşşafulkurûb î[188]	*Duaları cevaplar, kaygıları atarsın[188]*
Kesê mizter ku dû'a kir bi esma	*Çaresizler ki dua, ettilerse esmayla*
Ji sidq û bawerî yû cayê tenha	*Doğrulukla, inançla, hem de tenha yerlerde*
Digel secde-w selawat û amînî	*Secdeyle, salavatla, hem âmin duasıyla*
"Ucîbudde'wetedda'î' dibînî"[189]	*'Sen icabet edersin, kulların duasına'"[189]*

[187] "Qerîb", "Qadir", "Heq", "Qedîm", "Kerîm", "Reb", "Rehman" û "Rehîm", yek ji wesfên Xwedê nin. Bi kurtî, Qerîb, yê ku nêzîktirê her tiştî ye. Qadir, yê bi hêza xwe beshatiyê her tiştî ye. Heq, yê bi tevger û miameleya xwe li hember hemû heyberan yeksan û yekawa ye. Qedîm, yê serî û destpêka hemû tiştan e. Kerîm, yê dayîn û qenciya wî bêsînor e. Reb, perwerdekar û xwedîderketiyê her tiştî ye. Rehman, riziqdar û dlovanê hemû heyberan e. Rehîm, li axiretê tenha merhemetkarê bawermend û qencîkaran e.

[188] "Settar", ango, yê ku gunehan sernuxêm û binpas dike. "Xeffaruzzunûb", yê gunehan diborîne û jê derbas dibe. "Mucibudde'we", yê ku bersivdarê dûayan e. "Keşşafulkurûb", yê ku ji dilê ebdên xwe, guman û taswasan dûr-dixe.

[189] "Ucîbudde'wetedda'î", beşek ji ayeta 186. ya Sûreya Beqerayê ye. ango, "Bersivdarê dûayê dûakaran im."

[187] "Karib", "Kadir", "Hak", "Kadim", "Kerim", Rab", "Rahman" ve "Rahim", Allah'ın birer sıfatıdırlar. Kısaca, Karib, her şeye en yakın olan demektir. Kadir, her şeye gücü yeten, güç yetiren demektir. Hak, her varlığa eşit mesafede duran, eşit muamelede bulunan demektir. Kadim, her şeyin başı ve başlangıcı demektir. Kerim, kerem ve ikramı sınırsız demektir. Rab, terbiye ve sahiplik eden demektir. Rahman, tüm yaratılanların rızkını veren, onlara merhamet eden demektir. Rahim, ahirette, müminlere merhamet eden demektir.

[188] Metnin orijinalinde, "günahları affeden" ifadesi, "Gaffarü'z-Zünûb" şeklindedir. "Dualara cevap veren" ifadesi, "Mucibu'd-Da've" şeklindedir. "Kaygıları atan" ise, "Keşşafü'l-Kürûb" şeklindedir. "Settar", tercümesinde de belirtildiği gibi, günahları örten demektir.

[189] Tırnak içindeki ifade, orijinalin Arapça olup, aslı itibariyle bir ayet mealidir. (Bkz. Bakara Suresi, a. 186)

Wekî dû'ayê Şehzade qebûl bû
Duası Şehzadenin, kabul edilmiş gibi

Bedîa Ba Cemal zêde melûl bû
Bediülcemal oldu, fazlasıyla hüzünlü

Ji 'eşq û mihbetan kir ah û gazî
Aşktan ve de sevgiden, ediyordu ah, feryat

Nema pirr ew biket xwe sor û tazî
Az kalsın ki kendini, ateşte yakacaktı

Sedayê wê çû guhê Serwebanû
Sedası gitti onun, Servi Hatun'a kadar

Jê xemxur bû qeddê wê şibhê ebrû
Oldu tasadan boyu, kaş gibi iki büklüm

Du ta bû qametê Serwa elîfreng
Büküldü Elif gibi, boyu Servi Hatun'un

Ji huznê mest bû bê bade û beng
Hüzünden sarhoş oldu, şarapsız ve de benksiz

Çeleng rabû û hat nik wê hilalê
Güzelce kalkıp geldi, o hilalin yanına

Ze'îf û zerbûyî xwar şibhê "Dal"ê[190]
Zayıf ve sararmıştı, eğilmişti Dal gibi[190]

Go, "Ey rahet sebeb çin' ah û nale?
Dedi "Ey rahatım benim, ne sebeple inlersin

Dikem rabim biçim nik Şahibale
İstiyorum kalkayım, gideyim Şehbal'in yanına

Bikem tedbîrê 'eşqê te bi her hal
Aşkın için tedbiri, alayım her şekilde

Bi nerm û şîrînî gel Şahê Şehbal
Yumuşakça, şirince, birlikte Şehbal Şah'la

Sebir ke ey meha şîrînliqayem
Sabreyle dolunayım, ey çehresi şirinim

Mekêşîn xem eya çeşmê çirayem!"
Tasalanma ey benim, gözlerimin çırası"

[190] Mebest ji "Dal"'ê, ne guliyê darê ye, tîpa "Dal"ê ya elfaba erebî ye.

[190] Buradaki dâldan maksat, ağaç dalı değil, Arap alfabesindeki dâl harfidir.

Go: “Ey ummê şefîqem ez dikim sebr
Welêkin tu çiraya Leyletulqedr

Dedi, “Sabretmekteyim, ey şefkati çok anne
Ancak sen ki çırasın, o Kadir Gecesinin

Li ku hêla sedayê wî qet nema bê
Dilê min peht ‘eşqê weke kebabê

Bıraktınız nereye, gelmiyor hiç sedası
Yaktı yüreğimi aşk, tıpkı kebap misali”

Ji ehlê Qulzemê çil kes temamî
Dibên hatin dixwazin Şahê Şamî

Kulzemlilerden tamam, kırk kadar kişi
Derler gelmiş peşinden, isterler Şam Şahı’nı

Ji bo qisasê ew hatin bi destûr
Ditirsim ew biken Şehzade rencûr

İzin almış gelmişler, almak için intikam
Korkum ki incitsinler, Şehzademizi onlar

Hilak bûm ez ji destê ‘eşq û mihbet
Bi te’cîl rabe tu qet meke hincet!”

Yok oldum ben elinden, aşk ile muhabbetin
Aceleyle kalkıver, asla bulma bahane”

Ku evrengî bihîst Serwa şîrînxal
Çeleng rabû û çû nik şahê Şehbal

İşitince bu tarzda, benleri şirin Servi
Güzelce kalkıp gitti, Şehbal Şah’ın yanına

Digel zewq û sefa û bûs û himbêz
Xeber da Serwebanûya şekerrêz

Zevk, sefayla birlikte, öpücük, kucaklaşma
Konuştu Servi Hatun, şeker saçan o güzel

Temamê halê Şehzade seraser
Ji ‘eşq û mihbet û ehwalê doxter

Halini Şehzadenin, baştan sona tamamen
Aşkından, sevgisinden, kızlarının halinden

Te'eccib ma gelek Şahê şîrînkar
Go, "Ey Serwa! Li ku hilate ew yar?

Çokça hayrette kaldı, işi gücü tatlı Şah
Dedi, "Nerde kayboldu, ey Servi söyle o yar"

Mekanê wî nîşan da Şah go weh
Xerabî kir te ew hişt ey şîrînmeh!"

Tarif etti yerini, Şah dedi ki, "Ey vahlar
Kötü ettin, bıraktın, ey benim şirin ayım"

Ji ehlê Qulzemê çil kes bi ejmar
Dibên hatine pirr mekkar û xeddar

Sayıca kırk kadarmış, Kulzem halkından imiş
Derler gelmişler gayet, aldatıcı ve gaddar

Ditirsim Şahizade ew qisas ken
Tebî'et agir in ew wî risas ken

Korkarım ki alsınlar, Şehzadeden intikam
Onlar ateş huyludur, etsinler onu kurşun

Bi derket Şah û pansed merdê cengî
Verêkir wê demê pê Mîrê bengî

Dışarıya çıktı Şah, beş yüz cenkçi adamı
Yolladı o an hemen, tutkun Bey'in ardına

Çiqas geryan perî ew Ademîzad
Nedîtin lê ji pîrek mislê Ferhad

Ne kadar dolaştılar, periler o insanı
Göremediler ancak, Ferhat misli yaşlıdan

Bihîstin ku çihil kes ehlê Qulzem
Hilanîn û birin ew Şahê pirxem

İşittiler kırk kişi, Kulzem ehlindendiler
Kaldırıp götürdüler, çok gamlı Şehzadeyi

Vegeryan pêşê Şehbal û kirin 'erz
Go, "Ey yaran li ser min bû sefer ferz!"

Döndüler geriye, arz ettiler Şehbal'e
Şehbal dedi, "Ey dostlar, farz oldu sefer bize"

Emir kir cemi' bûn pansed hezar mêr	*Emretti ve toplandı, beş yüz bin kadar adam*
Hemî merd û dilawer bûn wekî şêr	*Tamamı aslan gibi, merttiler, yiğittiler*
Bi gurz û nêze û şîmşîr û cewşen	*Gürzlerle, mızraklarla, kılıçla, zırhlarıyla*
Siwar û namîdaranên rewşen	*Gözleri aydınlatan, nam yapmış süvariler*
Xirabê wan wekî Rustem bizanin	*Bilin ki en kötüsü, Rüstem gibiydi onlar*
Bi deng û nav û zor wek qehreman in	*Nam, nara, güçleriyle, her biri bir kahraman*
Ji gurzê wan dibin koh û cebel gerd	*Gürzlerinden onların, dağlar un ufak olur*
Ji rengê wan dibên bû lerzeyê 'erd	*Heybetlerinden derler, yer titremeye geldi*
Wekî berq û brûskê ew çeleng in	*O kadar çeviktirler, yıldırım, şimşek gibi*
Ji zor û qewwetê ew mest û beng in	*Güç ve kuvvet yönünden, tutkun, sarhoşlar gibi*
Ji nehsed menn bû gurzê wan giranî[191]	*Gürzleri çok ağırdı, dokuz yüz menden fazla[191]*
Serê şûr û riman zehrabê danî	*Kılıç, mızrak uçları, zehirli suya batırılmıştı*
Ji gurzê wan diçû wek meş'el ateş	*Gürzlerinden uçuşur, meşale gibi ateş*
Ku bin vartane gurzê Mîrê perîweş	*Ki peri güzeli beyin, gürzü hepsinden meşhur*
Digel Şehbal firîn ew çûn wekî berq	*Uçtular Şehbal ile, gittiler şimşek gibi*
Dinê kir wan ji dûd û ateşê xerq	*Boğdurdular dünyayı, ateş ile dumana*

[191] "Men", yek ji pîvana giraniyê ye. Standarda xwe, 816 gram e.

[191] "Men", bir ağırlık birimidir. Standardı, 816 gramdır.

Ji Îrem derketin ew çûne Qulzem
Çıktılar hep İrem'den, yöneldiler Kulzem'e

Diken de'wa Şehê naçar û pirxem
Çaresiz ve çok gamlı, Şah'ı kurtarmak için

Cewab çû Şahê Qulzem 'eskerek pur
Haber Kulzem Şahı'na, ulaştı ki bir ordu

Ji Îrem hate ser te şêr û sefdurr
Gelmekteler üstüne, aslanlar, saf inciler

Bike tedbîrekî bo xwe tu ey Mîr
Almalısın bir tedbir, ey bey kendin adına

We ger ne xelkê Qulzem bû bi hêsîr
Şayet yapmazsan bunu, esir bil Kulzem'i sen

Emîrê Qulzemê manendê şêran
Kulzem'in emiri ki, tıpkı aslan misali

Biderket emir kir mêr û dilêran
Çıkarak emir verdi, erlere, yiğitlere

Ji etrafan cemi' bûn bo wî 'esker
Etraftan toplandılar, o emirle askerler

Dibên sêsed hezar kes hate defter
Derler sayı olarak, tamam üç yüz bin kişi

Li hespê berqê reftarî siwar bûn
Bindiler atlarına, şimşek gibi dörtnala

Dilêr û sefdurr û xoş namidar bûn
Cesur, inci dizgeli, namlı, şöhretliydiler

Kirin ne're w'pehnî dane hespan
Attılar naraları, mahmuzladı atları

Wekî berq û birûskan çûn bi çespan
Şimşek, yıldırım gibi, gittiler nizamlıca

Miqabil 'eskerê ferxendeyê iqbal
Gelenlere mukabil, o kutlu askerlere

Vewestan Qulzemî sef girte derhal
Kulzemliler durdular, derhal safa girdiler

‘Egîd û sefdurrê Şahê ferehbexş	*Ferahlandıran Şah’ın, saf inci yiğitleri*
Bi cewlan bûn li meydan şibhê ateş	*Dolanıp dururlardı, ateş gibi meydanda*
Ji ehlê Qulzemê çend merdê dilêr	*Kulzemliler ehlinden, yiğitlerden birkaçı*
Miqehher çûne wan ne’re wekî şêr	*Öfkeli bir narayla, saldırdı aslan gibi*
Li hev xistin wekî şêr û pilingan	*Tutuştular kavgaya, aslan, kaplan misali*
Bi gurz û nêze û şûr û kulingan	*Gürzleriyle, mızrakla, kılıç ile kargıyla*
Li paşan tevlîhev bûn herdu derya	*Hemen ardından onun, iki deniz karıştı*
Serê tîr û riman kor kir Sureyya[192]	*Ok ve mızrak uçları, kararttı Süreyya’yı[192]*
Bi şûr û tîr û rim hevdu dirandin	*Kılıç, okla, mızrakla, yırttılar birbirini*
Ser û zend û du dest û pê firandin	*Baş, bilek ve kolları, uçurdular bunlarla*
Ji qehra tevlîhev bûn av û ateş	*Öfkeden karıştılar, su ve ateş iç içe*
Ji ‘erdê ta felek dûman kire reş	*Yerden çıkan dumanlar, kararttı felekleri*
Dibên rojek bû ew roj şibhê heşrê	*Derler günlerden o gün, döndü haşir gününe*
Ji weqtê heşrê bû hetta bi neşrê[193]	*Oldu haşir vaktinden, ta neşir vaktine dek[193]*

[192] “Sureyya”, komstêrkek ji 7 stêrkan pêktê ku bi navê “Ulker” û “Perwîn”ê jî tê naskirin.

[193] “Neşr”, piştî qewimandina qiyametê, vejandina hemû mirovan e. “Heşr”, piştî qiyametê, komkirina mirovên ku hatine vejînandin e. Bi dor, pêşiyê neşir, duwem heşir, sêyem qonaxa mihasebeyê tê.

[192] “Süreyya”, Ülker Takım Yıldızı olarak bilinen 7 yıldızlık grup. “Pervin” olarak da bilinir.

[193] “Neşir”, kıyamet sonrasında bütün insanların diriltilmesi. “Haşir”, kıyamet sonrasında, diriltilen insanların bir araya toplanması. Sırayla, önce neşir, sonra haşir, üçüncü aşama da muhasebe gerçekleşir.

Ji waweyla û xulxul rustexîze	*Feryatlar, haykırışlar, sanki kıyamet anı*
Di dest wan de şikestin gurz û nêze	*Kırıldı ellerinde, gürzler ile mızraklar*
Xwedê tewfîq da Şahê Îremîzat	*Allah zafer bahşetti, İrem sahibi Şah'a*
Ji jor da ayet "Fethun qerîbun" hat[194]	*Yukardan indi ayet, "Fetih yakındır"[194]*
Digel wê ayetê "Nesrun minellah"[195]	*O ayetle birlikte, ki "Yardım Allah'tandır"[195]*
Digo rûhanîyan sed barekellah!	*Derlerdi ruhaniler, yüz kez mübarek olsun*
Li meydanê bi gurzê xwe huner kir	*Meydanda gösterdi o, gürzüyle birçok hüner*
Kesê şûrê xwe lêxist wî bi ker kir	*Her kime indirdiyse, doğradı kılıcıyla*
Kemend kir wî li meydan Şahê Qulzem	*Kemende vurdu onu, Kulzem'in Şahı'nı o*
Li paşan 'eskerê Qulzem bû milzem	*Ardından mağlup etti, Kulzem'in ordusunu*
Di hîna dîte firsend Şahê mehrû	*Fırsatı bulduğunda, ay yüzlü İrem Şah'ı*
Cewab û mijde şand bo Serwebanû	*Ulaştırdı müjdeyi, eşi Servî Hatun'a*
Hilala nû bihîst ew qal û gufte	*Yeni ay duyduğunda, bu söz ile haberi*
Ji mesrûrî bû wek heyva du hefte	*Sevincinden dönüştü, on dördünde ay gibi*

[194] "Fethun qerîbun", perçeyek ji ayetê ye. Wateya wê, "Serkeftin/bidestxistin nèzîk e." (Bnr. Sûreya Seff, a. 13)

[195] "Nesrun minellah", perçeyek ji ayetê ye. Wateya wê, "Alîkarî ji Xwedê ye." (Bnr.Sûreya Seff, a. 13)

[194] "Fetih yakındır" ifadesi, ayetten bir parçadır. (Bkz. Saff Suresi, a. 13)

[195] "Yardım Allah'tandır" ifadesi, ayetten bir parçadır. (Bkz. Saff Suresi, a. 13)

Gelek zêr û cewahîr wê ‘eta kir	*Bağışladı epeyce, altını hem cevheri*
Dilê jar û xerîban xweş û şa kir	*Hoş etti kalplerini, fakirle gariplerin*
Xerîb û mest û mexmûr û xumarem	*Garibim ve de mestim, mahmur ile sarhoşum*
Ji lutfê Heq gelek umîdewarem	*Umutluyum fazlaca, lütfundan ben Allah’ın*
Tecellaya ferehbexş û minewwer	*Tecellisi ki saçtı, ferah ile aydınlık*
Seraya dil di hîna kir mi’emmer	*O anda imar etti, yüreğin sarayını*
Ji enwarê şefeq ji etrafê gerdûn	*Dünyanın dört yanından, şafağın nurlarından*
Minewwer bû seraser Qulzemî xûn	*Aydınlandı tümüyle, kanla sulanmış Kulzem*
Ji qewlê rawiyê esrara Wahdet[196]	*Sırlarından Vahdet’in, ravilerin sözünce[196]*
Şehê Şehbal çû ser textê heybet	*Oturdu o Şehbal Şah, heybet tahtı üstüne*
Kirin hazir li pêş wî Şahê Qulzem	*Getirdiler önüne, mağlup Kulzem Şahı’nı*
Miqeyyed dest û pê mehzûn û milzem	*El ve kolları bağlı, yenik ve üzüntülü*
Go: “Ey bedexterê tali’ bûye reş!	*Dedi, “Ey yıldızı bet, ey talihi kararan*
Bibêj te pê çikir ew Mîrê mehweş?”[197]	*Söyle ne ettin ona, o ay yüzlü Beyime[197]*

[196] Ji bo “Wahdet”, bnr. têbiniya 239.
“Rawî”, ji ragihîner an dazanînerê agahîyekî yan jî rûdanekî/bûyerekî re tê gotin.

[197] Armanc ji “Mîrê Mehweş”, Seyfulmilûk e.

[196] “Vahdet” için, bkz. 239. dipnota.
“Ravi”, rivayet eden, bir bilgi ya da haberi aktaran, bildiren demektir.

[197] “Ay Yüzlü Bey”den maksat, Seyfülmülûk’tür.

Go: “Min ew anîye ez wî qisas kem	*Dedi, “Onu getirttim, ta öcümü alayım*
Bi narê qahrê qelbê xwe risas kem	*Öfkemin ateşiyle, kurşun gibi eritmek*
Tu çi dixwazî aya şah û emîrem?	*Ne istersin acaba, ey Şahım ve emirim*
Bi ‘esker hatî ser me tu ji Îrem!	*Ki ordu ile geldin, ta İrem’den üstüme”*
Go: “Ey tali’siyahê bê miruwwet!	*Dedi, “Ey kara bahtlı, mertlikten uzak kişi*
Şehê xûnxwarê mestê camê xurbet	*Yüreği kanlı şah ki, gurbet şarabı mesti*
Bûyî mêhvanê me di baxê Îrem da	*Misafir olmuş bize, İrem’in bağlarında*
Çi rengê kilkê zemîret ev reqem da	*Yüreğinin kalemi, buna ki karar verdi*
Bibî Şehzade û tu bikî bi kuştî	*Şehzade’yi götürüp, öldürseydin eğer sen*
Ji min ra xîret û namûs çi hiştî?	*Bana namus, gayretten, ne bırakmış olurdun*
Kesê xîret nebit nabit navdar	*Gayreti olmayanın, nam ve ismi de olmaz*
Eger dinya eger axret şîrînkar”	*Ne dünya ne ahrette, olmaz hayırlı işi”*
Şehî Qulzem go: “Ey Şahê xudanbext!	*Kulzem Şahı dedi ki, “Ey şansı yaver Şahım*
Beqa bî bo te ‘umr û tac û hem text	*Devamlı olsun senin, ömrün, tacın ve tahtın*
Benî Adem ku hen bê i’tibar in	*Âdemoğlu ki kimi, yoksundur itibardan*
Ji espê bozê nefsê şûm siwar in	*Binmiştir boz nefise, uğursuz at gibidir*

Ji wan ra navêtin evçend xeyret	*Onlar için değer mi, bunca gayret, çabaya*
Sebeb çin rehtê qelb û hem zemîret”	*Sebep nedir yorarsın, gönlünü, vicdanını”*
Hewalê Şahizade Şahê Îrem	*İrem’in Şahı ki hem, Şehzade durumunu*
Xeber da serbiser bo Şahê Qulzem	*Anlattı baştan başa, Kulzem’in Şahı için*
Li paşan gotî Şahê dilminewwer:	*Ardından dedi ona, yüreği aydınlık Şah*
“Nizanî tu j’benî Adem Peyamber	*“Bilmez misin evladı, Âdem Peygamber’in sen*
Çiqas rabûne em ew bûyîn muhtac	*Onlara biz her zaman, duymaktayız ihtiyaç*
Eger ‘abid eger hakim xudantac	*İster olsunlar abit, ister hâkim, padişah*
Xusûsen Şehzadeyê me pirr wefaye	*Hususen Şehzademiz, vefalıdır fazlaca*
Peyemberzade ye ehlê sefa ye	*Peygamber soyundandır, huzur ehlindendir o*
Ji ‘eqlê wî yû ‘ilm û husnê enwer	*Akıl, ilminden olsun, parlak güzelliğinden*
Xeber daye Suleymanê Peyamber	*Haberini vermiştir, Süleyman Peygamber ondan*
Ji tali’ê wî ewreng bûye me’lûm	*Bu vasfından ötürü, şansı malum olmuştur*
Bedîa Ba Cemal bo wî ye meqsûm	*Ona kısmet olmuştur, kızım Bedîülcemal*
Ji cinsê Ademî d’baxê Îrem da	*Âdemoğlu cinsinden, İrem’in bağlarına*
Ne hatiye ne kes ew xet reqem da	*Gelmemiştir hiç kimse, sade ona yazılmış*

Heta îro ku peyda bûye ew can	*Bugüne dek kalmışsa, eğer hayatta bu can*
Ji hikmet hatiye ew bûye mîhman	*Hikmettendir gelmiştir, olmuş bize misafir*
Ji emrê Rebbê Rehman û Xeffûr e[198]	*Emriyledir o Rab'in, ki Rahman'la Gafur'dur*[198]
Ew e zava ez im bo wî xezûre	*O benim damadımdır, ben ise kaynatası*
Li ser wî ye digel te min şerr û ceng	*Seninle cenk, savaşım, onun üzerinedir*
Digir ez xîret û namûs û hem deng	*Bunu böyle istiyor, gayret, namus, şöhretim*
Sa'etek zû verêke ew bila bê!	*Bir an önce gönder, hemen gelsin buraya*
We ger nakey tu bibhê wê cewabê	*Şayet ki yapmaz isen, işte duy şu cevabı*
Dê rabim şehrê te zîr û zeber kem	*Kalkıp şehrini senin, yakıp da yıkacağım*
Bi şîmşîrê bi cewher te bi ker kem	*Doğrayacağım seni, cevherli kılıcımla*
Bikem emwal û milkê te bi hêsîr	*Malını ve mülkünü, alacağım ganimet*
Zen û ferzend û eqreb qeyd û zencîr	*Zincire vurulacak, karın, çocuk, akraban*
Verêkim cimle bo 'Asim bi carek	*Yollarım onları ben, Asım için topluca*
Ku 'alem bo me bêjî sed tebarek"	*Kî âlem desin bize, yüz aferinler size"*

[198] Ji bo "Reb" û "Rehman", bnr. têbiniya 251.
"Xeffûr", yek ji rengdêrê Xwedê ye; ango jêborê gunehan; ji bo lêborînxwazan lêborîner e.

[198] "Rab" ve "Rahman" için, bkz. 251. dipnota.
"Gafur", Allah'ın sıfatlarından biridir. Günahları affeden; affını dileyenleri affeden demektir.

Şehê Qulzem bihîst evreng ji Şehbal	*Kulzem Şahı ki duydu, Şehbal'den bu sözleri*
Mi'eyyen kir ji dil wî hal û ehwal	*Kestirdi ta gönülden, durumla vaziyeti*
Go "Şaha! Min ji qeydê xwe reha ke	*Dedi, "Ey Şahım benim, kurtar beni kaydından*
Dilê mexmûm pirr zewq û sefa ke	*Gamları çok gönlümü, zevk, sefaya kavuştur*
Ji bo xatirê te ey Şahê Îrembax	*Hatırın için senin, ey İrem Bağın Şahı*
Dê melhem kem dilê mecrûh û pirdax	*Merhem süreceğim ben, çok yaralı, dağlı gönle*
Bi keyfa te bikem çawan te xwestî	*Keyfince yapacağım, her nasıl istiyorsan*
Bi tehqîq û mi'eyyen her bi rastî"	*Kesin ve kararlıyım, hep doğru bir şekilde"*
Gelek xoş bû dilê Şahê şîrînsurr	*Gönlü gayet hoş oldu, şirin tabiat Şah'ın*
Ji wan qewlê Şehê Qulzem wekî durr	*Kulzem Şahı'ndan çıkan, inci gibi sözlerden*
Ji qeydê qehrê berda, kir mixelle'	*Öfke bağından çözdü, onu serbest bıraktı*
Bi yek tacê cewahirbend miresse'	*Koydu başına bir taç, bezenmiş cevherlerle*
Bi izna Şahê Şehbalê mibarek	*Kalkıp iznini aldı, mübarek Şah Şehbal'in*
Şehê Qulzem çû xoş kir hem tedarek	*Gitti Kulzem'in Şah'ı, yaptı güzel hazırlık*
Biket mêhvanê xwe Şahê Îrembax	*Kendine misafir etmek, İrem bağı Şahı'nı*
Ji qeyda xem reha ket qelbê pirdax	*Gam kaydından kurtarmak, dağlanmış yüreğini*

Welê xembarî ma, ya Rebb hezîn e!
Ji xeyrê rehmetet hêvî ti nîn e

Ancak gam yüklü kaldı, ya Rab ne hazin durum
Rahmetinin dışında, kalmadı hiçbir umut

Ji behra rehmetê qetrek sefayê
Bikey ser qelbê me nuqsan te nayê

Rahmet denizinden, olsun bir damla sefa
Vermekle kalbimize, Sana olmaz bir noksan

Be weslê Mistefa tu bikî me dilxoş[199]
Bi qurbanê te bit her dem Siyahpoş

Mustafa'ya vuslatla, hoş eyle gönlümüzü[199]
Her vakit olsun kurban, Siyahpûş Senin için

Tecellaya şefqet ji esrara wehdet
Minewwer kir seraya qelbê mihbet

Vahdet'in sırlarından, tecellisi şefkatin
Aydınlattı köşkünü, sevgiyle dolu kalbin

Durrefşan bû zemîr ez sirr û esrar
Bi cem'î xulxulîn enwa'ê etyar

Sırlardan, gizemlerden, inciler saçtı yürek
Topluca ötüştüler, her çeşidinden kuşlar

Şehê Qulzem muheyya kir bi 'unwan
Sera û dar û dîwar, text û eywan

Hazırladı Kulzem Şah, unvan ile birlikte
Saray, mekân ve duvar, taht ile hem otağı

Mizeyyen kir bi neqşek zêde enwer
Mi'etter kir bi misk û 'ud û 'enber

Süsleyip donatarak, çok parlak bir nakışla
Boğdurdu kokulara, miskle, udla, amberle

Tê raxistin firaş ez xez û mahût
Du textê zêrnîgar ez durr û yaqût

Serdirdi sergileri, ketenden ve çuhadan
İki altın işleme, inciyle yakuttan taht

[199] Armanc ji Mistefa", Cenabê Mihemmed (sxl) e.

[199] "Mustafa"dan kasıt, Hz. Muhammed (sav)'dir.

Miqabil hevdu danîn zêrê xilxal	*Karşılıklı koydular, halhalları altından*
Bi emrê Şahê Qulzem hatî Şehbal	*Kulzem Şahı buyurdu, emriyle geldi Şehbal*
Bi hevra çûne ser text ew cîhangîr	*Birlikte cihangirler, gittiler taht üstüne*
Bi sef seknîn xulam û sefder û mîr	*Saf tuttu hizmetçiler, hem bahadırlar, beyler*
Digel îkram û î'zaz û şerabî	*İzzet ile ikramlar, hem de şarap sunmalar*
Sirûr û keyf û aheng û ribabî	*Sevinç ile keyifler, eğlenceyle rübaplar*
Şehê Qulzem emir kir dilkuşade	*Kulzem Şahı emretti, gönül açar bir tarzda*
Ji qeydê xem reha kir Şahîzade	*Gam bağından kurtardı, o tutsak şehzadeyi*
Li paşê şerbetê qend û mey û beng	*Şeker şerbet ardından, hem şarap ile bengin*
Birin hemamê şûştin canê gulreng	*Hamamda yıkadılar, gül rengindeki teni*
Bi nerm û şîrînî ew çardehî mah[200]	*Yumuşakça, tatlıca, on dördündeki ayı[200]*
Kirin hazir li dîwanê Şehînşah[201]	*Hazırladılar onu, Şehinşah divanında[201]*
Ji 'eql û 'îlm û 'îrfan mahê yekşew[202]	*Akıl, ilim, irfanla, o bir gecelik ay[202]*
Ji hevdu ferq kir ew herdu Xusrew[203]	*Fark etti birbirinden, o iki Hüsrev'leri[203]*

200 Mebest ji "çardehî meh", Seyfulmilûk e.

201 Mebest ji "Şehînşah", Şeh Şehbal e.

202 Mebest ji "Mahê yekşew", Seyfulmilûk e.

203 Mebest ji "herdu Xusrew"; yek jê Şah Şehbal e, yê din, Şahê Qulzem e.

200 "On dördündeki ay"'dan maksat, Seyfülmülûk'tür.

201 "Şehinşah", şahlar şahı demek olup, kastedilen Şehbal Şah'tır.

202 "Bir gecelik ay"dan maksat, Seyfülmülûk'tür.

203 "İki Hüsrev"den maksat, Şehbal Şah ile Kulzem Şahı'dır.

Çeleng û şîrîn û şahane mînwal	*Güzelce ve şirince, şahane bir tarz ile*
Temenna kir dibûsî textê Şehbal	*Saygılarını sundu, öptü Şehbal tahtını*
Wereng dû'a û medh û hem sena kir	*O tarzla etti dua, hem övgü ile sena*
Dilê Şahînşeh û cimle heba kir	*Yaktı, yıktı gönlünü, Şehinşah'la cümlenin*
Ji dû'a û sena û medhê pismîr	*Bey oğlu duasından, hem sena, övgüsünden*
Rijandin le'l û durr û şeker û şîr	*Döktü dudaklarından, inci, şeker ile süt*
Ji medh û lefzê şirîn çu şeker	*Şeker misali olan, övgü, tatlı sözlerden*
Miheyyer bûn du Şah û cimle yekser	*Hayretlerde kaldılar, iki şahla tüm herkes*
Li paşan mehrûyê azade ez xem	*Ardından gamdan azat, o ay yüzlü Şehzade*
Temenna kir şîrîn ber Şahê Qulzem	*Şirince saygı sundu, Kulzem Şahı önünde*
Digel medh û senayê bûse da text	*Övgüyle hem takdirle, öptü onun tahtını*
Vewestanî şeker ba tali' û bext	*Diledi ayakta tatlıca, şanslar ile uğurlar*
Zebanî neyşeker bû şekeramîz	*Dili şekerkamışı, şekerle karışıktı*
Çu tûtî bû şekerxa û şekerrîz	*Şeker yemiş duduydu, hem saçardı şekeri*
Ji medhê du Şehînşahê serefraz	*İki şahlar şahının, methinde seçkinlerin*
Gelek xoş hat dâ'ayê mahremê raz	*Çok hoş geldi duası, o sırları bilenin*

Ji Şehbalê xudannamûs û şewket	*Şehbal ki sahibidir, namus ile görkemin*
Li ser wî zêde bûn meyl û mihibbet	*Ona karşı çoğaldı, eğilimle sevgisi*
Şehînşahê Îrem go Şahê Qulzem	*Şahlar şahı İrem'in, dedi Kulzem Şahı'na*
"Gelek bê misl e ew cananê hemdem	*"Eşi bulunmaz onun, o sevgili yoldaşın*
Xudan 'îrfan û 'aql û pirr xewas e	*İrfan, akıl sahibi, dalgıcı derinlerin*
Te birçî kir nekuştî ez qisase"	*Öldürmedin kısasla, lakin sen aç bıraktın*
Go, "Yara ew ji yumnê Şehriyar bû	*Dedi, "Ey şahlar şahım, bereketindi dostum*
We ger ne qelbê me pirr dûd û nar bû	*Yoksa kalbim benim çok, kederli, ateşliydi*
Ji bo xatirê te min ew kerd azad	*Onu serbest bıraktım, senin hatırın için*
Ji qisasê w'xûnê canê ewlad"	*Evlat kanına karşı, kısas ile öldürmek"*
Diger Şehzade hem wî kir mixelle'	*Hem bununla birlikte, süsledi Şehzadeyi*
Bi lebsê faxîre-w tacek miresse'	*Kıymetli giysilerle, yaldızlı bir taç ile*
Gelek xoş hat ji Şeh Şehbalê mes'ûd	*Gayet hoşuna gitti, mutlu Şah'ın, Şehbal'in*
Go, "Şaha min ji te her ew bû meqsûd"	*Dedi, "Ey Şahım benim, buydu senden isteğim"*
Gelek mesrûr bûn hazir û guhdar	*Sevindiler fazlaca, hazır ve dinleyenler*
Binêrin da çi bîtin axirî kar	*Bakın, görün sonucu, bakalım ne olacak*

Ji ewsafê hemîd û nefsê kamil	*Övülmüş vasıflardan, olgunlaşmış nefisten*
Di hîna borî mecme' bin xesail	*Geçen zaman içinde, toplanacak hoş huylar*
Tecellaya cemalê Heqq peyda	*Hakkın güzelliğinin, âşıkâr tecellisi*
Dibit bo wî yû rûh dê bît şeyda	*Çıkacak onun için, ruhu mutlu olacak*
Ji qewlê rawiyê exbargufte[204]	*Geçmişten haber veren, ravilerin kavlince[204]*
Ji Şahê Îrem borîn du hefte	*İrem Şah'ı üstünden, geçti tam iki hafta*
Ji şehrê Qulzemê dilşad û bêxem	*Kulzem'in şehrindeydi, mutluydu, tasasızdı*
Gelek îkram kir bo Şahê Qulzem	*Kulzem Şahı'na etti, hayli bağış ve ikram*
Digel Şehzade Şahê mest û mexmûr	*Şehzadeyle birlikte, mest ve mahmur olan Şah*
Ji Şahê Qulzemê xweş xwestî destûr	*Usulünce istedi, Kulzem Şahı'ndandır destur*
Cemi' 'eskerê peryan bi îtmam	*Bütün peri askerler, toplandılar tamamen*
Digel Şehzade û Şahê şîrînnam	*Şehzadeyle birlikte, namı şirin olan Şah*
Berê xwe dane baxê Îremê çûn	*Yöneldiler, gittiler, İrem bağına doğru*
Bikin bê xem dilê Leyla û Mecnûn[205]	*Ta kılsın gönlü gamsız, Leyla ile Mecnun'un[205]*

[204] "Exbargufte", ango, li gor gotin û vegotina ragihînerên agahî an rûdanan.

[205] Li vir, armanc ji "Leyla û Mecnûn", Bedîulcemal û Seyfulmilûk e.

[204] "Ravilerin kavlince", yani bir olay ve bilgiyi aktaranların dediğine göre.

[205] Burada kastedilen "Leyla ve Mecnun", Bedîülcemal ile Seyfülmülûk'tür.

Cewab û mijde çû ba Serwebanû	*Gitti Servi Hatun'a, haber ile hem müjde*
Bedîa Ba Cemala taqê ebrû	*Hem Bediülcemal'e, o kaşları kemerli*
Sirûr û keyf û aheng û ferehpurr	*Sevinç, keyif, eğlence, hem de çokça ferahla*
Ji wan peyda bû rêhtin gewher û durr	*Peydahlandı onlardan, döktüler inci, cevher*
Xenî bûn jê gelek mihtac û miskîn	*Bolluğa kavuştular, muhtaçlar, çaresizler*
Bi derket 'eskerê Şehbalê rengîn	*Çıkageldi rengârenk, askerleriyle Şehbal*
Bi waweyla û keyf û zewq û aheng	*Tezahürat, keyifle, zevk ile eğlenceyle*
Siwarên namîdar û taze û şeng	*Şöhretli biniciler, gençlerle neşeliler*
Li meydanê vewestan ew beraber	*Toplandılar meydanda, onlar hepsi beraber*
Kirin rimbazî yû cewlanî çenber	*Başladılar ciride, devredip dolaşarak*
Perîrûyanê mest û sînesade	*Peri yüzlüler, mestler, sinesi sadeliler*
Dihatin xweş temaşa Şahîzade	*Gelmişler izlemeye, dikkatle Şehzadeyi*
Ji dîna wî perî bûn mest û heyran	*Onu gören periler, mest ve hayran oldular*
'Uyûnê mahîtaban kir bi seyran	*Gözleri mehtapların, hoş seyirler ettiler*
Bedîa Ba Cemal û Serwebanû	*Bediülcemal ile, annesi Servi Hatun*
Kirin xweş wan temaşa Şahê ebrû	*Güzelce seyrettiler, ebrulu Şehzadeyi*

Miferreh bûn temam cimle perîweş
Tamamen ferahlandı, bütün peri yüzlüler

Ji keyf û zewq û le'lê camê zergeş
Keyiften ve de zevkten, altın kadeh şaraptan

Şeraba Wehdeta Heq mest ker em dil
Mest etti gönlümüzü, Hak Vahdet'in şarabı

Wekî bilbil dixwazim xonçeyê gul
İsterim gonca gülü, tıpkı bülbüller gibi

Digel Bedrê du hefte mahê yekşew[206]
Dolunay gibi Bedre, bir gecelik hilâlle[206]

Bi hevra çûne cem Şehbalê xusrew
Gittiler beraberce, Şah Şehbal'in yanına

Ji dîna wan gelek mesrûrî bû Şah
Görmesiyle onları, Şah sevindi bundan çok

Nerim bûsîn du payê Şeh şîrîn mah
Şirin ay öptü Şah'ın, usulca ayağını

Meha şîrîn ji bab ra dû'a kir
Şirin ay dua etti, babasına minnetle

Digel medh û senayê dil heba kir
Övgüyle hem senayla, paraladı gönlünü

Ku dilxoş bû Şehê Şehbal ji doxter
Ki gönlü hoşnut oldu, kızından Şehbal Şah'ın

Vegerya ber bi qonaxê xwe dilber
Döndü öz konağına, dilber kızı doğruca

Welêkin Serwebanûya şekerrîz
Ne var ki Servi Hatun, o şeker saçan anne

Li nik Şehbal ma mest û dilawîz
Kaldı Şehbal yanında, mest ve gönül çekerek

Dibûsî çeşm û rûyê Şahê Şehbal
Öperdi göz, yüzünü, kocası Şehbal Şah'ın

Bi yek fîncan dinoşî wan meyê al
Bir fincandan içerdi, al şaraptan ikisi

---

[206] Mebest ji "mahê yekşew", Bedîulcemal e.

[206] "Bir gecelik hilal"den maksat, Bediülcemal'dir.

Şehê Şehbal ji Serwê ra hikayet	*Şehbal Şah hikâyeyi, Servi Hatunu için*
Ji ewwel ta bi axir kir rîwayet	*Aktardı birer birer, başından sonuna dek*
Tilû'ê şemsa enwer ku şefeq da	*Nurlu güneş doğunca, ki söktürdü şafağı*
Gul û belgê reyahînan 'ereq da	*Güllerle reyhanların, terledi yaprakları*
Sedaya bilbilan gerya di nêv bax	*Bülbüllerin sedası, dolaştı bahçelerde*
Dibû mirî dused salî ji ber sax	*Dirilirlerdi bundan, iki yüzlük ölüler*
Ji qewlê rawiyê mîzana mewzûn[207]	*Dengeli terazinin, kavlince ravisinin[207]*
Niwişтem nameya wek durra meknûn	*Yazdım ben bir mektubu, saklı inci misali*
Dibên Şehbal çû qesra mibarek	*Derler ki Şehbal Şah, gitti kutlu köşküne*
Ji bo Şehzade kir qesrek tedarek	*Özel Şehzade için, hazırladı bir saray*
Bilindê heft tebeq bû zêde dilkeş	*Yedi kattan fazlaydı, fazlasıyla çekici*
Li ser ta bin libên zêr bû mineqqeş	*Baştan başa nakışlı, tane tane altından*
Ji durr û gewheran meş'el wekî nûr	*İnciden, cevherlerden, ışıl ışıl parlardı*
Dikir çavê hesûdan kor û ez dûr	*Kör ederdi uzaktan, kıskançların gözünü*
Tê raxistin firaşa rengarengî	*Serildi her tarafı, rengârenk sergilerle*
Ji dîba û ji sof û etles-Frengî	*İpek ile tiftikten, Frengi atlasından*

[207] "Qewlê rawî", ango ew gotinên ku ravî (ragihîner) vegu-hastiye.

[207] "Kavlince ravisinin", yani rivayet edenin bildirdiğine göre.

Reşandin lê gulab û misk û ‘enber	*Serpiştirdiler ona, gülsuyu, miskle, amber*
Çû nav da Şahîzade bi emrê Serwer	*Girdi ona Şehzade, Şah Şehbal’in emriyle*
Digel çend mahîrûyanê mieddeb	*Birlikte birkaç tane de edepli ay yüzlüler*
Diborand Şahîzade roz û hem şeb	*Geçirirdi Şehzade, gündüz ile geceyi*
Xemê ‘eşqê di dilda bû gelek pur	*Gönlünde fazlasıyla, vardı aşkın tasası*
Gehî digirya gehî dikenya wekî durr	*Bazen ağlar, bazen de gülerdi inci gibi*
Gehî dilxweş ji weslê baxê Îrem	*Bazen gönlü hoş idi, İrem bağa vuslatla*
Gehî j‘eşqê dibû mehzûn û pirxem	*Bazen aşktan ötürü, gamlanıp üzülürdü*
Gehî keyfxweş ji zewqê Şahê Şehbal	*Bazen mutlu olurdu, zevkinden Şah Şehbal’in*
Gehî mehzûnê ‘eşqê zilf û hem xal	*Bazen mahzunu olur, zülüfle ben aşkının*
Gehî dilşadê baxê taq û eywan	*Bazen gönlü sevinçli, bağıyla köşk, kemerin*
Gehî pirxem ji derdê roj û heyvan	*Bazen olur çok gamlı, güneşle ay derdinden*
Gehî mesrûrê eyyamê wîsalî	*Bazen olur sevinçli, kavuşma günlerinin*
Gehî mehzûnê ‘eşqê laubalî	*Bazen üzüntü tutar, ciddiyetsiz aşkların*
Digel ahan dinalî ew şeb û roz	*Ahlar ile birlikte, inlerdi gündüz gece*
Ji dil naçî xemê durrê şebefroz[208]	*Çıkmazdı kalpten gamı, gece ışığı dürün[208]*

[208] “Durrê şebefroz”, ango morî û mirwariyên ku bi şev dibiriqin, şewq didin. Li vir, mebest, Bedîulcemal e.

[208] “Dür”, inci demektir. Şair, “gece ışığı dür” derken, Bediülcemal’i kastetmektedir.

Xemê ‘eşqê hebîban pirr cefa ye
Emanet qet mebîn zewq û sefa ye

Tasası çok zahmettir, aşkı sevgililerin
Sakın ha sanmayın ki, zevk ile hem sefadır

Di nêv cergê me dîsa şibhê ateş
Bilind bû narê badê meş’ela geş[209]

Ciğerimizde bizim, yine ateş misali
Yükseldi bade narı, gür meşale misali[209]

Ji qewlê rawiyê ser sefheya xûn
Guherrîzê dilê Seyhûn û Ceyhûn

Kavlince ravilerin, ki kanlı safhaların
Gönlüne cevher saçan, Seyhun ile Ceyhun’un

Ji le’lê leb dibarî şîr û şeker
Miselsel subhereng ê durr û gewher

Kırmızı dudaklardan, yağıyordu süt, şeker
Tespih tanesi gibi, dizili inci, cevher

Ku hîna Şahê Şehbal hate qesrê
Kirin zewq û sirûr heta bi ‘esrê

Ne zaman ki Şehbal Şah, geldi yeni saraya
Zevkle keyfe daldılar, o gün ikindiye dek

Şehê Misrê çû nav qesra mi’ella
Çehvnêrê qedda nûra tecella

Gitti yüksek kasrına, Mısır Şahı Şehzade
Gözlüyordu boyunu, tecelli eden nurun

Bedîa Ba Cemala mest û bengîn
Ji hatina dilbera dil bû bi teskîn

Mest ve tutkun haldeki, Bediülcemal’in
Geldiğinde dilberler, gönlü erdi sükûna

Welêkin wî dixwestin şerbet û mey
Ji meya rengîn du le’lê şekkerîn ney

Ancak istiyordu o, şerbet ile şarabı
İçmekle renkli meyi, şekerli dudaklardan

[209] “Nar”, bi wateya xwe agir û pêt e.

[209] “Nar, ateş, alev anlamındadır.

Di dil da agirek hilbû çu meş'el	*Alevlendi gönülde, meşale gibi ateş*
Miselsel zilfê der gerden wekî xul	*Halka halka zülüfler, gerdanda peşi sıra*
Kişandin ber bi qesrê Şahîzade	*Kasra doğru çektiler, Şehzadeyi onlar*
Dilê fîncan kerî kir dengê bade	*Paraladı gönlünü, fincanın bade sesi*
Gelek bê ixtiyar rabû nezer kir	*Kalkıp izledi çokça, iradesiz olarak*
Ji peryan kes nedît û dil du ker kir	*Görmedi hiçbir peri, ikiye yardı gönlü*
Wekî berqê ji Şehzade bi derket	*Şimşek misali çıktı, yükselip Şehzadeden*
Mîsala tûtiyê qesda şeker ket	*Düştü şeker izine, tıpkı dudu misali*
Ji wî bayê nesîm û nûra enwer	*O yumuşak rüzgarla, hem de parlak ışıkla*
Mişewweş bû ji mesrûr dilawer	*Sersemledi o yiğit, boğuldu sevinçlere*
Ji nageh dî li nik xwe meqseda dil	*Birden gördü yanında, gönlünün maksadını*
Wekî bedra du hefte nûra kamil	*On dördünde ay gibi, olgun ve dolgun nuru*
Kirin hembêz hevdu bûn hemaxûş	*Kucaklaşıverdiler, oldular sarmaş dolaş*
Du 'aşiq dil ji hibbê mest û medhûş	*Sevgiden iki âşık, mest ve şaşkın olarak*
Ji le'lê leb vexwarin şerbet û mey	*İçtiler al dudaktan, şerbet ile şarabı*
Dilê miryan ji wê meyê dibû hey[210]	*Dirilirdi o meyden, ölülerin yüreği*[210]

[210] Mebest ji "mey"ê, şerab e.

[210] "Mey"den maksat, şaraptır.

Gehî serxweş ji cam û badeya ‘eşq	*Bazen aşkın sarhoşu, kadehle badesinden*
Gehî mest bûn ji dest û pençeyê ‘eşq	*Bazen mest düşerlerdi, aşkın el, pençesinden*
Ji qewsê husnê tîrendaz bûn ew	*Oklarını atardı, güzelliğin yayından*
Li ser piştê kumeyt rimbaz bûn ew	*Sırtında doru atın, fırlatırdı mızrağı*
Xerabiyek ji wan sadir nebû qet	*Doğmadı bir kötülük, onlardan asla, kata*
Nekêşa katiban cuz qenciyê xet	*İyilikten gayrı hat, yazmadılar kâtipler*
Ji halê wan nebû qet ba xeber kes	*Hallerinden hiç kimse, olamadı haberdar*
Ji xeyrê Wahidê Zana û Eqdes	*Vahid Allah istisna, O’dur Alim ve Akdes*
Welêkin Serwebanûyê dizanî	*Ancak biri bilirdi, o da Servi Hatun’du*
Bi qewl û fi’lê wan yaranê canî	*Söz ile işlerinden, o candan âşıkların*
Wekî yek hefte borî ji hatinê Şah	*Bir haftası geçmişti, Şah gelişi üstünden*
Çeleng rabû şîrîn Serwa cebînmah	*Güzelce kalkwerdi, ay cepheli Servi’si*
Çû dîwana Şehînşahê serefraz	*Divanına uğradı, seçkin şahlar şahının*
Dibê keyf û sirûra mehremê raz	*Derler keyif, sevinci, o sırları bilenin*
Beyan kir haletê Şehzade dîsa	*Yine dile getirdi, halini Şehzadenin*
“Ku ew mird e dixwazit le’lê ‘Îsa	*“Ki ölüdür, istiyor, İsa’nın dudağını*

Nema ên wî qerar û sebr û taqet	*Kalmadı onun için, karar, sabır ve takat*
Ji dest çûîn sirûr û keyf û rahet	*Çıkmış elinden onun, sevinç, keyif ve rahat*
Peyamberzade ye şekerzeban e	*Peygamber soyundandır, dili ise şekerdir*
Ji ‘eşqê bûye bê nutq û beyan e	*Aşktan nutku kesilmiş, hem beyanda da öyle*
Gelek dîtin cefa der berr û behran	*Çokça zahmet çekmiştir, karada hem denizde*
Çiya û çol û wadî deşt û sehran	*Dağlarda ve çöllerde, vadi, ova, yabanda*
Deh û pênc sal e derkeftî ji xurbet	*On beş yıl kadar oldu, çıkmış gurbet ellere*
Ji bab û dê û yaran bûye fîrqet	*Anne, baba, dostlardan, kalmış uzak ve ayrı*
Gelek dîtine wî renc û cefa ye	*Fazlasıyla görmüştür, eziyetle cefayı*
Mibarek tel’et û nûrek sefa ye	*Kutlu yüze sahiptir, ışıktır huzur için*
Heqîqet ‘aşiqê husnê bedî’e	*Gerçekte de âşıktır, garip güzelliklerin*
Dilê xwe daye ‘eşqê wek mebî’e	*Gönlünü vermiştir o, satmış misali aşka*
Diket meylê wîsalê husnê dilber	*Meylediyor kavuşmaya, dilber hüsnüne*
Ji wî hem ‘aşiq e zîbayê doxter	*Ondandır ki âşıktır, güzelliğine kızın*
Gelek bêtir ji wî dixwazî wisalê	*Ondan daha fazlası, kız kavuşmak istiyor*
Ji ‘eşqê bûye doxter wek hilalê	*Aşkından oluvermiş, hilal misali zayıf*

Yeqîn teqdîra Şahê Zulcelal e[211]	*Kesin takdir O'nundur, Celal sahibi Şah'ın[211]*
Wereng 'aşiq bûyîn Bedr û Hilale[212]	*Âşık olmuşlar bu tarz, Bedir, Hilal ikisi[212]*
Gelek îhsan e ey Şahê dilazad	*Büyük ihsandır bize, ey gönlü azat Şahım*
Dilê wan key bi camê wesletê şad	*Şad edelim onları, kavuşma şarabıyla*
Di rêya Heq bike ey Şahê muxtar	*Hak yolunda ediniz, ey benim seçkin Şahım*
Cezayê qenciyê qencî ye ey yar"[213]	*Bil ey yar, iyiliktir, cezası, iyiliğin"[213]*
Gelek xoş hatin ew eqwal û exbar	*Hoşuna gitti fazla, o sözler ve haberler*
Ji Şehê Şehbal û gotî, "Tu yî muxtar	*Şah Şehbal'den ki dedi, "Sensin tercih sahibi*
Riza da Serwebanûya dihenteng	*Rızasını gösterdi, ağzı küçük serviye*
Siba dê bikeyn saz û keyf û aheng	*Yarın tertip ediniz, saz, keyif ve eğlence*
Sehergeh hate ser textê durrefşan	*Seher vaktinde çıktı, inci saçan tahtına*
Şehê Şehbal û kir zêde zêrefşan	*Saçwerdi fazlaca, altınları Şehbal Şah*
Emir kir cemi' bin xub û şekerxend	*Emretti toplansınlar, güzeller, şirin yüzler*
Bila bên û bikeyn ew reqs û govend	*Gelsinler, raks etsinler, çeksinler halayları*

211 Mebest ji "Şahê Zulcelal", Cenabê Yezdan e.

212 Ji "Bedr"ê mebest, Seyfülmülûk e; ji "Hilal"ê mebest, Bediulcemal e.

213 Ev hevoka di nav neynokê de, wateya ayeta 60. ya Sûreya Rehman e.

211 "Celal sahibi Şah"tan maksat, Cenab-ı Allah'tır.

212 "Bedir"den maksat, Seyfülmülûk, "Hilal"den maksat, Bediülcemal'dir.

213 Tırnak içindeki ifade, Rahman Suresi, ayet 60'ın mealidir.

Perîrûyanê mest û zêde dilşad	*Peri yüzlüler ki fazla, mesttirler, mutludurlar*
Bikeyn reqs û sema der baxê Şedad[214]	*Girsinler raksa, semaya, Şedad'ın bağlarında[214]*
Nivisî name ser 'ehdê Suleyman[215]	*Süleyman'ın ahdiyle, yazdı mektuplarını[215]*
Bila bêne heft padîşahê cinan	*İstedi ki gelsinler, cinlerin yedi şahı*
Digel etba' û 'esker cumle yekser	*Halklarıyla beraber, baştan başa askerler*
Sexîr û hem kebîr û şab û doxter	*Büyükler ve küçükler, oğlanlarla genç kızlar*
Ji dil guh dê bizan esmayê şahan	*Kulak ver sen gönülden, bil şahların ismini*
Xudan'edl û sexa û dadxwahan	*Adaletli ve cömert, talipler doğruluğun*
Ji ewwel Ebyez û Meymûn û Exder[216]	*İlk evveli Ebyez'dir, sonra Meymun ve Ahder[216]*
Digel Berqan û Muzhib sadis Ehmer	*Berkan ile Muzhib'dir, altıncısı Ahmer'dir*
Şehî sabi'e Seyyîd 'Ebdirrehman	*Yedinci şah olarak, Seyyid Abdurrahman'dır*
Dibêjin Zewbi' e pirrehm û îhsan	*Derler boldur Zevbi'in, merhametle ihsanı*
Xudancah û meratîb in bi şewket	*Sahibidir makamın, hem mertebe ve gücün*
Wekî padişahê Îslam in bi heybet	*Heybetleri İslam'ın, padişahları gibi*

214 Mebest ji "baxê Şedad", "Baxên/Baxçeyên İrem"ê ye ku ji hêla Şedadê kurê Ad ve hatiye çêkirin. Ji bo "Baxên İrem"ê, bnr. têbiniya 59.

215 Ji "Suleyman" mebest, Cnb. Suleyman e.

216 Ev navê cinan yên hatine rêzkirin, esatîrî nin; di pirtûkên derbarê sir û razan de derbas dibin.

214 "Şeddad'ın bağları"ndan maksat, Şeddad b. Ad tarafından yaptırılan "İrem bağları/bahçeleri"dir. "İrem bağları" için, bkz. 59. dipnota.

215 "Süleyman"dan maksat, Hz. Süleyman'dır.

216 İsimleri sıralanan cin isimleri, esatiridir; sırlara dair kitaplarda geçmektedir.

Dibên qadiyê wan Meyteterû ne	*Derler ki Meyteteru, kadısıdır onların*
Xudan'îlm û keramet rehnumûn e	*İlim, keramet ehli, hem de yol gösterici*
Şehê e'zem ew in wan sînesadan	*Büyük şahları odur, o sinesi pakların*
Dibexşin ew miradê bêmiradan	*Muratsız olanlara, bahşederler muradı*
Gelek bêçare bûne j'wan bi dewlet	*Onlarla çok çaresiz, olmuşlar servet ehli*
Wekî min bênewayê camê xurbet	*Benim gibi zavallı, gurbet şarabı içenler*
Diger herçî ku hin xizmetguzar in	*Her ne kadar bazısı, hizmet gören ise de*
Ji camê wan şehan mest û xumar in	*Camından o şahların, mesttirler, sarhoşturlar*
Bi emrê Padişahê Zulcelal e	*Emriyle O Padişahın, ki Celal sahibidir*
Ku ew hatin bi emrê Şahibal e	*Ki geldiler tamamı, Şehbal Şah'ın emriyle*
Cemi' bûn ew di nêv baxê Îrem da	*Toplandılar tamamı, İrem bağı içinde*
Ji îlhamê qelem evreng reqem da	*İlhamdan belirledi, kalem bunu bu tarzda*
Bi rengareng hatin ew dildarê dilbend	*Renkli renkli geldiler, sevimli, sevgililer*
Li ser ta pê şîrîn û leb şekerxend	*Baştan ayağa şirin, o tatlı gülüşlüler*
Digel wan saz û tenbûr û çexane[217]	*Onlarla birlikte saz, tambur ile çegâne[217]*
Sedayê mitribê sahibtirane	*Çalgı çalanlar ile, ezgicilerin sedası*

[217] "Çexane", amûrekî mûzîkê yê çengiyan (reqesan) e. Dirêjahiya wî bi qasî metreyekê ye û ji dar û pêlikê pêk tê. Li ser wî pêlikê zingilên piçûk hene.

[217] "Çegâne", çengilerin (rakkasları) raks ederken kullandıkları makasa benzer zilli, pullu bir çalgı aleti.

Spî yû kesk û sor û ezreq û zer	*Beyaz, yeşil, kırmızı, hem sarı, gök mavisi*
Reş û narincî yû ebleq beraber	*Siyah ile turuncu, alaca renk birlikte*
Dihatin sef bi sef rengreng yaran	*Geliyorlardı dostlar, grup grup, rengârenk*
Wekî gulçîçekê ewwelbiharan	*Baharın başındaki yaban gülleri gibi*
Ji wesfê wan nizanim ez çi bêjim	*Vasıflarıyla ilgili, bilmem ki ne diyeyim*
Xumar û mest û sewdaî yû gêjim	*Sarhoş ve mest düşmüşüm, sevdalıyım, sersemim*
Dihatin berbiber ba reqs û govend	*Geliyorlardı az az, raksla, halaylarla*
Dikin heyy mewatan ew şekerxend	*Diriltir ölüleri, o şeker ağızlılar*
Te'alellah ji wan mest û xumaran	*Yücelik Allah'ındır, o mestler, sarhoşlar ki*
'Eded zêde ji sed nehsed hezaran	*Sayıları fazlaydı, yüzden, dokuz yüz binden*
Bi cimle mest û mexmûr û dilawîz	*Cümlesi mest düşmüştü, mahmur ve âşıktılar*
Semenbûy û dilstîn û şekerrîz	*Yasemin kokuluydu, tatlı dil, gönül kapan*
Minewwerhusn û qamet serwebustan	*Parlak güzeller idi, bahçelerin servisi*
Rûh û can ên ji bo me meyperestan	*Ruhtular, hayattılar, biz mey düşkünlerine*
Hezar reng xulxulîn enwarê tel'et	*Bin çeşit ses, sedayla, o çehresi parlaklar*
Di nêv baxê mîsala baxê Cennet	*Cennet misali olan, bu bahçenin içinde*

Ji wan mesrûrî bûn darê gul û mil	*Onlarla mutlu oldu, gül ve taflan ağacı*
Dinalî mitriban manendê bilbil	*İnlerdi çalgıcılar, tıpkı bülbüller gibi*
Nezerbazê wan çeşm û ‘uyunan	*Neşeli bakışlarla, o gözlere bakanlar*
Gelek ‘eqil kirin şibhê cinûnan	*Gitti çoğunun akli, oldu deliler gibi*
Ji reqsê qametê serwî yû ‘er’er	*Raksından güzellerin, o servi boyluların*
Gelek mislê me bûn mecnûn û ebter	*Bizim gibi nicesi, mecnun ve ebter oldu*
Ji her şeş cihetan zewq û sirûr e	*Her altı taraftan da zevk vardı, sevinç vardı*
Sedayê mitrib û sewtê bilûr e	*Çalgıcıların sesi, kavalın nağmeleri*
Bi rengreng xemilîn horî di Cennet	*Süslendiler rengârenk, huri gibi Cennet’in*
Perîrûyanê mest û pirr mihibbet	*Peri yüzlü mestlerle, çok sevimli güzeller*
Ji zingzingê tilism û toqê yaran	*Şıngırdıyor kolyeler, sevgili tokaları*
Xuşîna zêr û xelxal û guharan	*Hışırtısı altının, halhalla küpelerin*
Rûxê ‘enbersifet lê bûye peyda	*Amber misali renkler, oluşmuş yüzlerinde*
Gelek mislê me bûn mecnûn û şeyda	*Bizim gibi çokları, oldu mecnun ve meczup*
Perîrû cem’ bûn der baxê Îrem	*İrem’in bağlarında, toplandı peri yüzlüler*
Ji tirsê keyf û zewq xweş revî xem	*Keyif, zevk korkusundan, onlardan kaçtı tasa*

Ji terfê zewq û aheng û sirûr e	*Bir taraftan zevktir, eğlence ve sevinçtir*
Ji terfê reqs û govend û bilûr e	*Bir taraftan rakstır, halay ile kavaldır*
Ji zewqê padîşahan û emîran	*Eğlenmeleriyle orda, padişahla beylerin*
Gelek xweş bû dilê jar û feqîran	*Gönülleri hoş oldu, zayıf ve yoksulların*
Hezar rehmet li wan canê letîf bî	*Binler rahmetler yağsın, o güzelim canlara*
Selamê ma li balayên şerîf bî	*Bizden selamlar olsun, şerefli büyüklere*
Çi ger noqsan im û tiştek nizanim	*Her ne kadar eksiğim, bilmiyorum hiçbir şey*
Dû'açî yû meddahê wan şehan im	*Hiç değilse şahlara, duacı, övgücüyüm*
Ez im noqsan ew in xweş'ehd û peyman	*Kî benim noksan olan, onlar söz, yemin ehli*
Wekî morim li dîwanê Suleyman[218]	*Karınca misaliyim, Süleyman divanında[218]*
Suleyman nîsbetî cananê mexmûr	*Süleyman misaliydi, o mahmur olmuş cinler*
Dikir zewqî bi saz û çeng û tenbûr	*Eğleniyorlardı onlar, sazla, çenkle, tamburla*
Gerandin saqiyan cam û peyale	*Dolaştırdı sakiler, bardakla, kadehleri*
Di nêv caman şerabê çardehsale	*Kadehlerde var idi, on dört yıllık şaraplar*

[218] Mebest ji "Suleyman" Cnb. Suleyman e. Mînaka ji moriyê (gêrikê), şanedana ayetekî ye. Di ayeta 17. ya Sûreya Neml de, wiha dibê je: "Di encamê de, dema gihîştin newala moriyan, yek ji moriyan wiha got: Gelî moriyan, têkevin kunên xwe. Da -bêyî ku lê biarqilin- bila Suleyman û artêşa xwe, we nepelçiqîne!"

[218] "Süleyman"dan maksat, Hz. Süleyman'dır. "Karınca" örneği ise, bir ayete göndermedir. Neml Suresi, ayet 17'de, "Nihayet Karınca vadisine geldiklerinde, bir karınca şöyle dedi: Ey karıncalar! Yuvalarınıza girin, Süleyman ve ordusu -farkına varmadan- sizi ezmesinler!"

Ji zerfê zêr û fincanê çu elmas	*Elmas misali olan, altın fincan içinde*
Miferreh bû dilê sed Xizr û Îlyas	*Ferahlandı kalpleri, yüz Hızır ve İlyas'ın*
Mirî heyy bûn ji le'lê şibhê 'Îsa	*Ölüler dirildiler, İsa misali dudaklardan*
Li Tûrê meş'ela nûrê Heq îsa	*Tur'da parıldadı, Hak nurunun meşalesi*
Dikir wan padîşahan û emîran	*Ediyorlardı padişahlar, hem de onu beyler*
Miferreh şûşeya qelb û zemîran	*Sevindirerek içlerini, hem kalp şişelerini*
Gehî ba cam û fincan û mey û beng	*Bazen kadeh ve fincanla, şarapla, bengle*
Gehî saz û ney û tenbûr û aheng	*Bazen saz ve ney ile, tamburla, eğlenceyle*
Gehî b'deng û sedayê pirmelahet	*Bazen çok tatlı bir ses, hem seda ile*
Gehî şekerzebanên pirfesahet	*Bazen şekerli diller, gayet açık, akıcı*
Gehî şetrenc û nerd û rûdê şahî	*Bazen satranç ve tavla, hem de şah kemençesi*
Şiyaling û çi berbet goşîmahî	*Halay çekme, ud çalma, hem de bazen ciritler*
Yekayek pê dileyizîn padîşahe	*Birer birer oynardı, padişahlar onlarla*
Emîr û beglerên rû şibhê mah e	*Emirlerle beyler ki, yüzleri ay gibiydi*
Gehî rimbazî yû hesp û siwarî	*Bazen mızrak sallama, at ile süvarilik*
Gehî kaşo û go û keyf û yarî	*Bazen çevgen oyunu, keyif ile şakalar*

Gehî nêçîr û geşt û seyd û seyran	*Bazen av ile piknik, avcılıkla gezmeler*
Gehî şahîn û baz û çerxê teyran	*Bazen atmaca, şahin, kartal manevraları*
Gehî ba dest û berdê pehlewanan	*Bazen kollar ve beller, seçkin pehlivanların*
Wekî şêr û piling û hem beranan	*Aslan kaplanlar gibi, hem de koçlar misali*
Gehî ba çerxê gurzan û kulingan	*Bazen gürz çevirmeler, kargı fırlatmaları*
Gehî ne'rînê filan û nehengan	*Bazen fil naraları, timsah homurtuları*
Gehî ho ho li pey çeşmê xezalan	*Bazen hey hey sesleri, ceylan gözler ardında*
Gehî seyranê husn û zilf û xalan	*Bazen benle zülfünü, izlemek güzellerin*
Gehî tîran dê bavêjin nîşanê	*Bazen atıyorlardı, oklarını hedefe*
Ez im nîşanê wê tîr û keşanê	*Hedef olan ben idim, o ok ile atışın*
Gehî dileyzîn bi şîmşîr û mertalî	*Bazen oynuyorlardı, kılıç ile kalkanla*
Gehî seyran li ser bedr û hilalî	*Bazen seyrederlerdi, dolunay, hilâlleri*
Welê şekerleb û şîrîndehanan	*Ancak şeker dudaklar, ağzı şirin olanlar*
Serapê dilberan û nûciwanan	*Baştan başa dilberler, terütaze civanlar*
Dikir reqs û semayek zêde mehbûb	*Raksa, semaya kalkmış, gayet güzel şekilde*
Ji 'eşqê mest bûn talib û metlûb	*Aşktan mest düşmüştüler, isteyen, istenenler*

Di baxê Îremê qesrek nemabû
Di nav da reqs û govend û sema bû

Kalmamıştı tek saray, İrem'in bağlarında
Hepsinde sema vardı, raks ile halaylar

Direqsîn mest û bejnê serw û 'er'er
Li ser ta pê xeriq ez zêr û gewher

Zarif, servi boylular, raks ederlerdi mestçe
Baştan ayağa kadar, altınla, cevherlerle

Li ser pencan dileyzîn ew şîrînsur
Şîrîn û şeng û dilber şibhetê durr

Oynarlardı şirinler, ayak parmaklarında
Tatlı, neşeliydiler, inci gibi dilberler

Ji zilfê wan diweşyan misk û 'enber
Ji husnê dilrûba yaqût û gewher

Dökülürdü zülfünden, misk ve amber onların
Gönül kapan hüsünden, yakut ile cevherler

Şîrîn datanî wan ser pence û pê
Nerim hiltanî datanîn wekî bê

Tatlıca indirirdi, ayakla pençeleri
Kaldırıp indirirler, yumuşak rüzgâr gibi

Ji hat û çûyînê wan pey û pencan
Serê mûr û mekes nedibû bi rencan

İnip kalkmasıyla o, ayakla pençelerin
Ondan acı çekmezdi, sinek ile karınca

Te'alellah ji wan bejnê mibarek
Tebarek sed tebarek sed tebarek

Ne yücedir Allah, o mübarek boyları
Mübarek, yüz mübarek, yine yüz mübarek

Ji husnê dilrûbayê mahîtaban
Sedayê mitrib û çeng û ribaban

Hüsnünden yüzü aylar, hem gönül kapanların
Sesinden çalgıcılar, hem çenkle rübapların

Dilê min bir ji nû bayê mecazî
Bi sed ker kir bi şîrê serfirazî

Bi şev nayê me xew dîsa ji şewqê
Şerabê saqiyan û çeng û zewqê

Lebê fincanê yaran zêde mest in
Dilê min bir bi zilfa xwe ve bestin

Li pê xwe dê bikêşin şibhê tûle
Bi min pirr xweş, ew hal min qebûl e

Kesê negrê bi zulfê mahîtaba
Dimînî ta ebed ew der ‘ezaba

Me lew girtine ew zilfê mi’enber
Terik nadem bi kuştin camê dilber

Ji dildaran ji min ra her Ehed bû
Letîf û pak û zatê pirr Semed bû[219]

Kaptı gönlümü benim, yine mecazi rüzgâr
Yarıverdi yüz parçaya, kutlu olan kılıçla

Gelmiyor gece bizim, yine şavktan uykumuz
Sakilerin şarabından, çenk ile eğlenceden

Fazla mesttir yârlerin, fincansı dudakları
Kaptı gönlü götürdü, bağladılar zülfüne

Sürükleyecek ardından, tıpkı tazı misali
Hoştur o hal fazlaca, kabulümdür hep benim

Her kim ki tutunmazsa, mehtapların zülfünden
Kalacak ebede dek, o azaplar içinde

Ondandır ki tutmuşuz, amberli zülüfleri
Öldürsem de bırakmam, dilberin kadehini

Sevgililerden bana, daim olan Ehad'dır
Latif ve tertemizdir, çok Samed olan zattır[219]

[219] “Ehed” û “Semed”, du wesfên Xwedê nin. Ehed, bi taybetmendî û potansiyelên xwe yên serbixwe, şanedana yek bi yekî ya ji Xwedê re ye. Bo mînak, bi derketina tavê ve, li gel teyisandina wê ya gelemperî û ronahîkirin, li ser her tiştî, teyisandin û ronahîkirinek cihêreng û cihêqepesîte jî heye. “Semed” bixwe, tê wê wateyê ku her heyber, di her rewş û her demê de hewcedarê Xwedê ye, lê Xwedê, bi ti awayî û di ti rewşê de ne hewcedar e.

[219] “Ehad” ve “Samed”, Allah'a ait iki sıfattır. Ehad, her bir varlığın kendine has özellik ve potansiyelleriyle bir olan Allah'a işaret etmesidir. Örneğin, Güneşin, genel yansımasının yanında, her bir nesnedeki yansımasının farklı özellik ve kapasitede olması gibi. “Samed” ise, her varlığın, her durumda ve her zaman için kendisine muhtaç olup kendisinin hiçbir şeye muhtaç olmayan anlamındadır.

Cinûn û mestî bûm ez dîn û ebter[220]	*Çılgın ve sarhoş idim, deliydim, ebter idim[220]*
Ji xemr û saqî yû fîncanê dilber	*Şarap ile sakiden, dilberin fincanından*
Mekin bawer bi heş bim ey berader	*Sanmayın akıllıyım, ey kardeşim bunu bil*
Çu Eshabulkehf î ta rozê mehşer	*Ashab-ı Kehf misali, ta mahşer gününe dek*
Te'alellah ji Padişahê Miqeddes	*Ne yücedir o Allah, o Mukaddes Padişah*
Di bin daireyê çerxê miqewwes	*Bu yuvarlak dünyada, kâinat dairesinde*
Çi çêkirye ji şewqê mîm û dalan[221]	*Ne yapmış şavkından, mîm ile dâl harflerinin[221]*
Gelî yaran nezerden zilf û xalan	*Nazar edin dostlarım, zülüf ile benlere*
Ji qewlê rawiyê sirrê heqîqet	*Hakikat sırrı bilen, ravinin sözlerinden*
Mûti'ê emr û fermanê Şerî'et	*Kî uymakta emrine, Şeriat fermanına*
Ji cezb û fikr û seyranê tarîqî	*Cezbinden ve fikrinden, seyrinden tarikatın*
Deranî durr di nêv behra 'emîqî	*Çıkardılar inciyi, derin bahrin içinden*
Binêrin xemzebazê surmeyê çav	*Bakın göz sürmesinden, çıkıp gelen bakışlar*
Çi reng rihtin cewahir durrê xoşnav	*Ne renk cevher döktüler ne meşhur incileri*

[220] "Ebter", bi wateya xwe, kesê bênifş û bêzuriyet e. Bi wateya mecazî, bêencam, kêm û kêmasî ye. Li vir, di wateya duyem de ye.

[221] Mebest ji "Mîm" û "Dal"ê, Cnb. "Muhemmed" e. Nivîskar, balê dikşîne ser hedîsek qudsî ya ji bo kesayetiya manewî (mîsyona) ya Cenabê Pêxember hatiye gotin. Wiha ye: "Ger tu tinebay, ger tu tinebay, min ê ev gerdûn nexuliqanda." (Bnr. Siyûtî, el-Lealîl Mesnûa, c. 1, hj. h. 272; Eliyyul Qarî, Esrarul Mertûa, r. 295-296)

[220] "Ebter", anlam olarak soyu kesik, zürriyetsiz demektir. Mecaz olarak ise, sonuçsuz, noksan, eksik anlamındadır. Burada kastedilen, ikincisidir.

[221] "Mim" ve dâldan kasıt, Hz. "Muhammed"dir. Şair, Hz. Peygamber'in manevi şahsiyetine (misyonuna) yönelik söylenmiş bir hadis-i kudsiyeye işaret ediyor. "Sen olmasaydın, sen olmasaydın; bu kâinatı yaratmazdım." (Bkz. Süyutî, el-Leali'l-Masnua, c. 1, h. no: 272; Aliyyü'l-Karî, Esrarü'l-Mertua, s. 295-296)

Ji çerxê heştemîn û ‘Erş û Kursî
Heta heftem zemîn û Ga û Masî[222]

Ta sekizinci gökten, hem Arş ile Kürsi'den
Yedinci kata kadar, Öküz ile Balık'a[222]

Çiqasî ku hebûn enwa'ê mexlûq
‘Ebûs û dilber û ‘aşiq û ma'şûq

Her ne kadar var ise, çeşidi mahlukların
Somurtkan ve dilberler, âşık ile maşuklar

Cem' bûn ew di nêv baxê Îrem da
Ji îlhamê wereng kilkam reqem da

Toplandılar tamamen, İrem bağı içinde
Bu tarzdan ilham ile, yazdı benim kalemim

Şefeq da kewkebê pirtali' û bext
Ji eywanê Ehed danîne deh text

Şafağı söktü yıldız, çok şanslı, bahtı açık
Sarayından Ehad'in, bırakmışlar on taht

Cewahirbend û zêr û zêde zîba
Fîraşê laciwerd ê xez û dîba

Cevherlerle altından, çokça süslü, bezeli
Lacivert renk sergiler, samurdan ve ipekten

Ji ewwel hate ser yek şahê Şehbal
Bi ‘îzz û şewket û ferxende îqbal

İlk olarak Şah Şehbal, oturdular birine
Saygınlıkla, heybetle, uğurluca, mutluca

Xudanê roja Sebt û leylê rabi'
Li ser textê duwem ba bext û tali'

Cumartesi sahibi, hem dördüncü gecenin
İkinci taht üstüne, ki bahtla talih tahtı

[222] Li vir, mebest ji "ga" û "masî", nîşaneya bircên asmanî ye.

[222] Burada kastedilen "Öküz" ile "Balık", burçlara işarettir.

Çeleng rûnişt li ser wî ne bi nazil	*Ona çöktü güzelce, değil inmesi gibi*
Melaîk ‘Ezraîl û Kesfeyaîl[223]	*Azrail melek gibi, hem Kesfeyaîl misali*[223]
Mi’eyyen îsmê wî Meymûnê Şah e	*Bilinen ismi onun, derler ki Şah Meymûn’dur*
Libasê wî yû etba’ sîyah e	*Siyahtır giysileri, onun ile halkının*
Şehê Muzhib xudanê roja Yekşem	*Adı Şah Muzhib olan, sahibidir Pazar’ın*
Digel leylê xemîs û textê bê xem	*Hem beşinci gecenin, gamsız tahtın sahibi*
Li ser textê sêyem rûnişt bi destûr	*Gitti üçüncü tahta, destur, izin alarak*
Li ser wî nazil e Rûqyaîlê nûr	*İnmektedir üstüne, hem nurdan Rûkyail*
Çû ser textê çiharem şibhê lem’e	*Dördüncü tahta gitti, tıpkı parıltı gibi*
Xudanê roja Duşem leylê Cum’e	*Pazartesi sahibi, hem Cuma gecesinin*
Şehê Ebyez xudanê sidq û tesdîq	*Doğrulukla onayın, sahibiydi Ebyaz Şah*
Li ser wî nazil e Cebraîl tehqîq	*Şüphe yok ki üstüne, inmekteydi Cebrail*
Xudanê leylê Sebt û rojê Sêşem	*Cumartesi gecesi, Salı günün sahibi*
Çeleng ew hate ser wî textê pêncem	*Güzel bir eda ile, çıktı beşinci tahta*

[223] Li gor baweriya kahîn û medyûmên ku bi cin, stêrk û tilisman re mijûlin, Kesfayîl, wek ferîşteyê berpirsê roja şemiyê dihesibînin. (Nîşe: Piştî vî navî, navên dahatû jî (Ezrayîl, Cebrayîl, Mikayîl, Îsrafîl ne tê de) divê li ser vî şêweyî were nirxandin).

[223] “Kesfeyail”, cin, yıldız, tılsım ilmiyle uğraşan kâhin ve medyumların inanışına göre, Cumartesi gününden sorumlu meleğin adıdır. (Not: Bu isimden sonrakiler de (Azrail, Cebrail, Mikail, İsrafil hariç) aynı minvalde değerlendirilmeli).

Şehê Ehmer ew e ba Qehremaîl
Odur Şah Ahmer olan, Kahremail ile hem

Li ser wî nazil e hem Semsemaîl
İnmektedir üstüne, onun da Semsemail

Xudanê leylê Yekşem roja çaran
Gecesi Pazar'ın hem, dördüncü gün sahibi

Çû ser textê şeşem şibhê xumaran
Altıncı tahta gitti, tıpkı bir sarhoş gibi

Bizan ew şahê berqan bû we bê bak
Şimşekler şahıydı bil, hem de korkusuz idi

Li ser wî nazil e Mikaîlê pak
İnmekteydi üstüne, pak Hazret-i Mikail

Xudanê roja Pêncşem leylê isneyn
Perşembe'nin sahibi, hem ikinci gecenin

Şehê Exder bizan ew qurretul'eyn
Bil ki Ahder Şah'tır o, gözlerin aydınlığı

Li textê heftemîn ew pirr fezaîl
Yedinci taht üstüne, fazlasıyla erdemli

Çeleng rûniştli ser wî Serfeyaîl
Usulünce oturdu, Sarfeyail o tahta

Xudanê roza Cum'e leylê Sêşem
Cuma günün sahibi, hem Salı gecesinin

Çû rûniştew li bala textê heştem
Gidip oturuwerdi, sekizinci tahta o

Dibêjin Şah Seyyîd 'Ebdurrehman
Derler bu Şah'ın adı, Seyyid Abdurrahman'dır

Li ser wî 'Eyneyaîl e hemî an
Onun üstünde daim, bulunur Ayneyail

Dibêjin Zewbi'e maîl bi şewqê
Derler ki Zevbia'dır, meyillidir ışığa

Dixwazîtin gelek aheng û zewqê
İstemektedir çokça, zevk ile eğlenceyi

Diger qaziyê wan Meyteterûn e	*Kadıları onların, o da Meyteterun'dur*
Çû ser textê nehan ew rehnimûn e	*Çıktı dokuzuncuya, o yol gösteren kılavuz*
Li ser textê dehan ew Şahê Qulzem	*Onuncu taht üstüne, o Kulzem'in Şahı ki*
Çeleng rûnişt wekî Keyxusrew û Cem[224]	*Usulünce oturdu, Keyhüsrev ve Cem gibi*[224]
Emîr û begler û pismîr vewestan	*Duruyorlardı emirler, beyler ve beyzadeler*
Diken seyra cemalê şox û mestan	*Dalmışlardı cemaline, işveliyle mestlerin*
Kirin zewq û sirûr û keyf û aheng	*Zevk ettiler sevinçle, keyif ile eğlence*
Bi cam û tas û saz û nexme û çeng	*Cam ile hem tas ile, sazla, nağmeyle, çenkle*
Bi emrê Şahibalê sînesade	*Şah Şehbal'in emriyle, ki o sinesi temizin*
Kirin hazirî dîwan Şahizade	*Hazırladılar hemen, Şehzade'yi divanda*
Ji bona padîşahan xweş dû'a kir	*Padişahlar için o, etti güzelce dua*
Ji dû'ayê dilê cimle heba kir	*Duasıyla hepsinin, paraladı gönlünü*

[224] Ji bo "Keyhüsrev", bnr. têbiniya 26.
"Cem", ji yekemîn ezbetên desthilatdar yên Îranê, ji ezbeta Pişdadiyan, hukimdarê çaremîn û yê herî mezin e. Li gor hinek dîrokvanan, Cem, Cnb. Adem e, li gor hinekan jî, neviyê Geyûmers e ku heftemîn kurê Cnb. Adem e. Sedem ku rûçikê wî xweşik bû, ji Cem re, bi zimanê Pehlewî "Şîd" hatiye gotin ku ew jî di wateya "nûr û ronahî"yê de ye. Ji ber vê yekê, jê re "Cemşîd" gotinin. İbnê Esîr, dibêje wateya "Cem"ê, "heyv" e.

[224] "Keyhüsrev" için, bkz. 26. dipnota.
"Cem", İran'da hüküm süren ilk sülalelerden Pişdadiyan'ın dördüncü ve en büyük hükümdarıdır. Bazı tarihçilere göre, Cem, Hz. Âdem, bazılarına göre ise, Hz. Âdem'in yedinci oğlu Geyumers'in torunudur. Cem'e, güzel yüzlü oluşu sebebiyle, Pehlevice "ışık ve nur" anlamına gelen "Şid" lakabı verilmiş ve "Cemşid" adıyla anılmıştır. İbn-i Esir, Cem'in "ay" manasına geldiğini söyler.

Şîrîn gerya edeb zerrînkulahan	*Altın külahlılar hem, gezdi şirin, edeple*
Yekayek bûsîn textê padîşahan	*Birer birer öptüler, padişah tahtlarını*
Vewestanî şeker ber sedrê dîwan	*Tatlıca durmuştular, divanda, başköşede*
Şefeq da şemsê enwer birc û Keywan[225]	*Parlak güneş nur saçtı, burçlar ile Keyvân'a[225]*
Mîsala serw û 'er'er dest li ser dest	*Servi, ardıç misali, eller eller üstünde*
Gelek medh û dû'a kir şêrê sermest	*Etti çok övgü, dua, kendinden geçmiş aslan*
Dû'a û medhê ewreng kes nedîde	*Görmemişti o tarzda, hiç kimse dua, övgü*
Bi çeşman we ne goş ez kes şenîde	*Ne görmüştür gözüyle, ne işitmiş kulakla*
Miheyyer man li wî şah û cema'et	*Hayran kaldılar ona, şahlar ile cemaat*
Li ser wî zêde bûn meyl û mihibbet	*Ona karşı çoğaldı, sevgi ile eğilim*
Li dîwanê mi'ezzem Şahê Şehbal	*Muazzam divanında, buyurdu ki Şehbal Şah*
Go: "Ey Şehzadeyê ferxende iqbal!	*Dedi ki, "Ey Şehzade, ey geleceği uğurlu*
Tu wer rûnê digel zerrînkulehan	*Sen gel de oturuver, altın külahlılarla*
Bileyzîn fîl û ferzînê padîşahan!"[226]	*Padişahlara ait, fil, veziri oynayın"[226]*

[225] Mebest ji "Keywân"ê, gerstêrka "Saturn" e. Edebiyata dîwanî de, "Keywan" bi bêyomiyê tê naskirin.

[226] Mebest ji "Fîl" û "Ferzîn", lîstika sedrencê ye.

[225] "Keyvân"den maksat "Satürn" gezegenidir. "Keyvân", Divan Edebiyatında, "uğursuzluğuyla" anılmıştır.

[226] "Fil" ve "Vezir"den maksat, satrançtır.

Şîrîn Şehzade leyîzand Fîl û Ferzîn	*Şehzade hoş oynattı, fil ile hem veziri*
Digel şahan wekî azade berzîn	*Şahlar ile birlikte, özgür at misali*
Peyade rex dida wan padîşahan	*Piyonları kaleyi, padişahlara veriyordu*
Dikir dilxoşiya zerrînkulahan	*Hoş ediyordu gönlünü, altın külahlıların*
Di hîna dît firsend hate ewqat	*Vakti ki geldiğinde, bulduğunda fırsatı*
Li ser piştê feres wî Şeh kirin mat	*Ata binmiş olarak, mat eylerdi Şahları*
Di hîna mat bûn ew padîşahe	*Mağlup olduklarında, o padişahlar ki*
Ji dîwanê revî kelbê siyahe[227]	*Divandan kaçwerdi, o siyah renkli köpek*[227]
Bi emrê Şah li paşan tas û fincan	*Adından Şah emriyle, taslarla fincanları*
Gerandin saqiyan ser dest û pencan	*Dolaştırdı sakiler, el ve pençe üstünde*
Ji ewwel da vexwarin şah û mîran	*İlk olarak içtiler, şahlar ile hem beyler*
Heta dor hate me jar û feqîran	*Ta sıra geldiğinde, biz zayıf, fakirlere*
Ji deh fincan kirin Şehzade yekreng	*Bir defada Şehzade, içti tam on fincanı*
Ji sed rengî dinalî şibhetê çeng	*Yüz şekilde inlerdi, çenk aleti misali*
Digel çengê dinalî Şahê dilsoj	*Çenkle birlikte Şah da bağrı yanık inlerdi*
Dûxanê dil dibû mij pêşberê roj	*Bağrından çıkan duman, olurdu sis güneşe*

[227] Mebest ji "kelbê siyah", divê "Şeytan" be. Ango, wendabûna nêrîn û nêzîkbûna nebaş ya li pêşberê Şehzade ye.

[227] "Siyah köpek"ten maksat, "Şeytan" olmalıdır. Yani, Şehzade'ye olan art niyetli yaklaşımın kaybolmasına işrettir.

Ji mestiyê nebû ‘eqlê wî zail
Sarhoşluktan ötürü, kaybetmedi aklını

Şehan ew pirr hejand mislê celacil
Şahlar salladı çokça, onu ziller misali

Çiqas çerxandin ew Şehbazê Şamî
Ne kadar döndürdüler, o Şam'ın yiğidini

Nedîtin nuqteyek jê natemamî
Onda göremediler, eksik kalmış bir nokta

Ji dil wî rabû terkê masîwellah
Gönülden kalkwerdi, Allah'tan gayrıyı terk

Bi hev ra gotinê sed barekellah
Birlikte dediler hep, Allah'tan yüz mübarek

Bi meydanê siwarî yû nêzebazî
Meydanda hünerini, at binme, mızrak atma

Kirin tecribe ew şahînê xazî
Tecrübe ettirdiler, gazi olmuş şahini

Mihessel çend esbabê kemalat
Özetle, olgunluğun, sebebinden kaçını

Ji wî dîtin bi tertîb û muwalat
Gördüler Şehzadede, tertiple hem sırayla

Bi cem'î razî bûn ew şah û begler
Cümlesi razı oldu, o şahlar ve de beyler

Ji Şehbazê şîrîn mest û dilawer
O şirin Şehzadeden, mest düşmüş yürekliden

Îlahî! Min bibî ser wî meqamî
Allah'ım, götür beni, üstüne o makamın

Ji dil dûrkey mij û dûd û xemamî
Gönülden uzaklaştır, sis, duman, bulutları

‘Elîm î Tu bi esrarê qulûban
Bilen yalnızca Sen'sin, kalplerdeki sırları

Dibînî cimle qencî û ‘uyûban
Sen'sin gören hepsini, iyilik, ayıpları

Ji bo noqsaniyê ma Tu yî Cebbar
Sensin Cebbar olan, kusurlarımız için[228]

Gunehkar im nehin xeyrê Tu Xeffar[228]
Benim günahkâr olan, Sen'den gayrı yok Gaffar

Bixefrîn ey Xeffûr zenbê Sîyahpoş!
Ey Gaffur, bağışla Sen, Siyahpûş günahını

Ji camê mihbetê ke mest û medhûş!
Muhabbet kadehinden, eyle onu mest, şaşkın

Were ey saqiya mest û xumarem
Gel ey saki, beni mest ve sarhoş eden

Ji min ra bîne fincan, zilfê yarem
Getir bana fincanı, hem zülfünü yârimin

Wekî zencîr û xillan ez kişandim
Zincir ve kement gibi, çekiverdiler beni

Serê wan ef'eyan dil herişandim
O engerek zülüflerin başı, tırmaladı gönlümü

Were mitrib digel çeng û bilûrê
Ey çalgıcı sen de gel, çenginle, kavalınla

Miferreh ke dilê şeyda ji nûrê
Ferahlandır nur ile, çılgına dönmüş gönlü

Dixwazîtin dilêm nûra tecella
İstemektedir gönlüm, tecelli eden nuru

Beyana sirr û esrarên mi'ella
Sırların beyanını, hem yüce gizemleri

Bi emrê Padîşahê Padîşahan[229]
Emriyle o Zat'ın ki, en büyük Padişahtır[229]

Xeffûrê 'asî yû sahibgunehan
Gaffur'dur asilere, günahkâr kimselere

---

228 "Cebbar", yek ji wesfê Xwedê ye ku, li hember tecawizkarên sînornenas, zorê bikartîne û bi vî rêbazî, serê wan ditewîne.
"Xeffar", yek ji wesfên Xwedê ye ku, bi vi wesfê xwe, kesên gunehkar in, -bi şertê ku efûya xwe bixwazin- lêborînerê gunehên wan e.

229 Mebest ji "Padişahê Padişahan", Cenabê Xwedê ye.

228 "Cebbar", Allah'ın sıfatlarından biri olup, haddini aşan mütecavizleri zorlayan, zor kullanarak yolla getiren demektir.
"Gaffar", Allah'ın sıfatlarından biri olup, günahkâr insanların -tevbe etmeleri durumunda- günahlarını affeden demektir.

229 "En büyük Padişah"tan maksat, Cenab-ı Hak'tır.

Dibêjim bo te çend xal û nîşane	*Söylüyorum sana ben, birkaç nokta, işaret*
Nezerken hûn ji qewlê durrfeşane	*Bakınız, o sözlerden ki, inciler saçılmakta*
Çi xoş go Şahibalê sînesade	*Ne güzel dilendirdi, yüreği temiz Şehbal*
"Eger tu waqif î ey Şahizade	*"Şayet ki biliyorsan, onları ey Şehzade*
Sûalatê me ra tu bide cewabê	*Suallerimize bizim, vermelisin sen cevap*
Ji 'îrfanê dil û 'ilmê kitabe"	*Kalbinin ilhamından, kitabınsa ilminden"*
Dibên Şehzade go: "Ey Şahê Îrem!	*Derler Şehzade dedi, "Sen ey İrem'in Şahı*
Miferreh bin ji te qelb û zemîrem	*Ferahlansınlar senden, kalbim ile derunum*
Eger min zanîn ew dê b'dem cewabê	*Şayet bilirsem eğer, cevabı vereceğim*
We ger ne Şah î ez rahê sewabê	*Eğer bilmezsem Şahım, doğru olan cevabı*
Biket 'efwê gunahê bendeyê mîr	*Affedin günahını, bendesi beyimizin*
Sûalatan kerem ke ey cîhangîr!"	*Buyurun edin sual, ey dünyanın fatihi"*
Ji ewwel Şahibal go Şahizade,	*İlk olarak Şah Şehbal, dedi ki, "Ey Şehzade*
"Minewwer bî dilet ez rengê bade	*Gönlün aydınlık olsun, bâdenin rengi gibi*
Ji dinyayê bibêje ey şîrîn can!	*Ey tatlı ruhlum benim, söyle sen, bu dünyadan*
Çi nêzîktir heye bo îns û bo can?"	*İnsan ve cinler için, nedir en yakın olan"*

Go: “Ey Şehînşahê pirlutf û ihsan!
Mirin nêzîktir e bo cin û însan

Ji karê Kirdikar kes pê nizanî
Ê baqî her Ew e diket me fanî

Hezar sal ‘umrê borî şibhê xewn e
Di wextê nez’ê her ew hal û kewn e”

Di dû ra gotî Şehbalê şirînsurr:
“Ji mêran û jinan da ew keyin pur?

Go: “Ey Şehinşahê mest û dilêran!
Mu’eyyen pirtir in jin her ji mêran

Çira ê ku jin in bêqeyd in ew jin
Ji jin hem kêmtir e ê tabi’ê jin”

Diger go Şahîbazê mest û sefdurr:
“Ji miryan û ji saxan ew kî ne pur?”

Go: “Ey Şahê tebîbê derd û daxan
Mi’eyyen pirtir in mirdî ji saxan

Dedi, “Ey şahlar şahı, lütuf ve ihsanı bol
İnsan ve cinler için, en yakını ölümdür

İşinden Yaratanın, kimseler bilmez onu
Baki yalnızca O’dur, bizi edecek fani

Geçen bin yıllık ömür, tıpkı uyku gibidir
Ruhu almak anında, hazır-nazır hep O’dur”

Deyiverdi ardından, şirin huylu Şah Şehbal
Kadın ile erkekten, hangisi daha fazla

Dedi ey Şahlar Şahı, mestlerin, yiğitlerin
Kesin olan, kadınlar, fazladır erkeklerden

Çünkü o kadınlar ki, serbesttir, kayıtsızdır
Hem eksiktir kadından, tabi olan erkekler”

Yine sordu şanlı Şah, o mest ve saf inciler
“Ölülerle diriden, hangileri fazladır”

Dedi, “Ey Şah’ım benim, dert, kederler tabibi
Şüphesiz ki fazladır, ölüler dirilerden

Çira herçî mirin carek dî nayê
Neden ki her ölenler, geri gelmez bir daha

Çi saxê ku hene dê çin fenayê
Sağ olanlar ki hepsi, akıbet olacaklar fani

Kesê bi qewlê jinê kir her mirî ne
Kadını ki dinleyen, ölüdürler her vakit

Mebê sax in, bi saxî wan mebîne”
Deme ki onlar sağdır, onları sayma sağdan”

Li paşan gotî Şehbalê şîrînnam
Ardından dedi Şehbal, namı tatlı olan Şah

Bi Şehzade emîrê Misr û hem Şam,
Dedi ki Şehzadeye, Mısır ve Şam beyine

“Ji min ra bêje ger nukte tu danî
“Söyle bana o halde, şayet nükte bilensin

Xerabî zêde ne, yan abîdanî?”
Kötüler mi daha çok, yoksa kulluk eden mi”

Go “Şaha! Zêde ne herçî xerab e
Dedi, “Ey Şahım benim, daha çoktur kötüler

Çi avayî xerab dê ket weha be
Yıkarlar böyleleri, her ne ki yapılmışsa

‘Îmaretê dilê can çêtir e ey yar
Ey dost güzel olanı, yapmaktır gönülleri

Ji ‘îmaratê çi ji dar û dîwar
İster dikmek ağacı ister yapmak duvarı

Dimînit yadîgar ey dil xeberdan
Yadigâr kalan sözdür, bil ey gönül sen

Xerab dibît qesrê dar û berdan”
Yıkılıp gidecektir, taş, ağaçtan saraylar”

Go: “Ey Şehzadeyê sahibsirûr e
Dedi ki, “Ey Şehzade, ey sevincin sahibi

Bibêje da ji însanan çi dûr e?”
Söyle bana insandan, nedir uzakta olan”

Go: “Şaha! Dûr e ev dinyaya fanî
Kesê cahil nebî xweş pê dizanî

Dedi ki “Şahım benim, uzaktır fani dünya
Şayet olmazsan cahil, güzel bilirsin bunu

Kesê mir jê dibîtin bê ‘eded dûr
Çu car dî nabînî wî pîrê bê nûr”

Ölen kimse uzaklaşır, ondan sınırsızca
Bir daha göremezsin, o yaşlıyı, nursuzu”

Şehê Şehbal go: “Ey Mîrê sermest!
Ji ecsadan çi tişt e kêmtir û pest?”

Şah Şehbal dedi ona, ey sarhoş düşmüş beyim
En değersiz, adi şey, nedir maddi şeylerde

Go: “Ey Şahêm! Cesed ku bê nefes ma
Bi pûlek nahêja ew ten ‘ebes ma!”

Dedi, “Ey Şahım benim, cesettir ki nefessiz
Kalsa anlamsız olur, değersiz bir pul gibi”

Go: “Ey ferzend çiye pirtir di ten da?”
Go: “Ew şek e di nêv can û beden da”

Dedi, “Ey evlat nedir, tende en fazla olan”
Dedi ki “Kuşkudur o, ruhta ve de bedende”

Go: “Ê taltir çi tişt e di vê dinê da?”
Go: “Ew destengî û derwêşî tê da”

Dedi ki, “Bu dünyada, en acı olan nedir?
Dedi, “Biri darlıktır, dervişliktir diğeri”

“Ji dinyayê firehtir go çi tişt e?”
Go: “Ew qelbê ku qani’ wek ferişt e!”

“Dünyadan daha geniş”, dedi “şey nedir acaba”
Dedi, “Kanaatkâr kalptir, odur melek misali”

“Çi tişt e go ji seng û ber qewîtir?”
Go: “Şaha! Ew dilê bêdînê kafir!”

Dedi, “Taş ve kayadan, daha sert olan nedir”
Dedi, “Ey Şahım, o dinsiz, kafir gönüldür”

Go: “Şîrîntir çiye der qelbê însan?”	*Dedi, “İnsan kalbinde, en tatlı olan nedir”*
“Tekebbur got şîrîn e ey pirîhsan!”	*Dedi, “Kibirlenmektir, ey ihsanı bol Şahım”*
“Ji agir got germtir ew çi tişt e?”	*Dedi, “Nedir ateşten, daha sıcak olan o şey*
Go: “Ew qelbê herîs û pîs û zişt e!”	*Dedi, “O hırslı kalptir, pistir, hem de çirkindir”*
Go: “Ê bêtir çiye ez zemherîr sar?”[230]	*Dedi, “Zemheriden çok, soğuk olan şey nedir”[230]*
Go: “Ew bêhêvîbûna meqsed û kar!”	*Dedi, “Umutsuzluktur o, iş ve amaç hakkında”*
Go: “Esqeltir çîye j’koh û cibalan?”	*Dedi, “Daha ağır ne şeydir, söyler misin dağlardan”*
Go: “Ew buhtan e ey Şahê delalan!”	*Dedi ki, “İftiradır, ey nazlıların Şahı”*
“Ji ruhî go bibê da ew çi tişt e?”	*Ruhtan sordu, ne şeydir, bize ondan haber ver*
Go: “Ew emrê Heq e, Rebbê ferişt e!”	*Dedi, “O Hak emridir, O’dur melekler rabbi”*
Go: “Ey Şehzadeyê şîrîncenabe!	*Dedi ki, “Ey Şehzade, ey şirin ve saygılı*
Bibêj kengê dê rabîtin hisabe?”	*Söyle bana ne zaman, kopacaktır kıyamet”*
Go: “Şaha! Ew yek e ez pênc xewasan[231]	*Dedi, “Ey Şahım benim, beş özelden biridir[231]*
Nizanî kes bi wan ez ‘amm û xasan	*Ne ki cahil ve alim, onu kimse bilemez*

[230] “Zemherîr”, di Quranê de, di sûreya Însan de, di ayeta 13an wek “sermaya dijwar” hatiye bilêvkirin, lê belê di hinek tefsîran de wek “dojeha sar” hatiye şîrovekirin. Zemherîr, li gor rojnameya mîladî çil rojên herî sar yên salê îfade dike ku ji vî çil rojî re “erbeîn” jî tê gotin. Ev çil roj, ji 22yê Mijdarê destpêdike, heta 31ê Çile berdewam dike.

[231] Mebest ji “pênc xewasan”, “pênc nepenî/nenasî” nin ku di Sûreya Loqman, ayeta 34. de derbas dibin. Evan pênc tişt, tenê ji alê Xwedê ve tê zanîn û ji hêla herkesî ve nenas in. (Bnr. li sûre û ayeta navborî).

[230] “Zemherî”, Kur’an’da, İnsan Suresi, ayet 13’te “zemherir” olarak geçen bu kelime, meallerde “şiddetli soğuk”, bazı tefsirlerde ise, “soğuk cehennem” şeklinde yorumlanmıştır. Erbain olarak da bilinen Zemheri, Miladi takvime göre, 22 Aralık ile 31 Ocak arasındaki yılık en soğuk günlerini ifade eder.

[231] “Beş özel”den maksat, Lokman Suresi, ayet 34’te geçen “beş bilinmeyen”dir ki, onlar sadece Allah’ın ilminde olup bir başkasının bilemediği şeylerdir. (Bkz. adı geçen sure ve ayete).

Tenê Ew pê dizane ê di nêv bax	*Yalnız onu bilecek, bağ içinde Bir'idir*
Gulan rengreng didet miryan diket sax	*O ki renk renk gül verir, diriltir ölüleri*
Xudayek Zulcelal û bê nezîr e	*Celalli Yaratıcı, eşi, benzeri yoktur*
Li ser eşyan hemî yekser qedîr e	*Tüm varlıklar üstünde, mutlak güç yetirendir*
Li me nêzîktir e ji 'Heblulwerîd'an	*Bize bizden yakındır, şah damarından da öte*
Li ber Wî xef nehin sirrê 'ebîdan"	*O'ndan gizli kalamaz, kullara ait bir sır"*
Ku dît wan padîşahan Şahizade	*Ki cümle padişahlar, gördüler Şehzadeyi*
Werengî pirr kemal û sînesade	*Bu tarzda çokça olgun, o gönlü saf, temizi*
Bi hevra gotin sed barekellah!	*Dediler hep birlikte, Allah'tan yüz mübarek*
Xwedê tewfîq da "Nesrun mînellah"	*Allah muvaffak kıldı, ki nusret Allah'tandır*
Kirin Şehzadeyê Misrê mixelle'	*Süsleyip donattılar, Mısır Şehzadesini*
Ewan şahan bi heft tacê miresse'	*Şahlar onu bezedi, cevherli yedi taçla*
Durr û gewher bi ser wî da weşandin	*Döktürdüler başına, inci ile cevherler*
Gulab û misk û 'enber lê reşandin	*Serptiler üzerine, gülsuyu, miskle amber*
Gelek xoş bû dilê Şahê şîrînnam	*Mutlu oldu fazlaca, namı şirin olan Şah*
Ji dil bûsî ser û çeşmê Şahê Şam	*Öptü başla gözünü, gönülden Şam Şahı'nın*

Go: "Ey ferzendê dilbend û temîzem	*Dedi temiz evladım, ey gönlümü bağlayan*
Be to bexşîdem ewladê 'ezîzem!"	*Bağışladım ben sana, azize evladımı*
Gelek xweş bû dilê ehlê cema'et	*Fazlasıyla hoş oldu, gönlü bu cemaatin*
Li ser hukmê Zebûr û qewlê Tewrat	*Hükmü ile Zebur'un, hem sözüyle Tevrat'ın*
Girêdan 'eqdê nikahê du yaran	*Bağladılar akdini, iki yâr nikâhını*
Miferreh bû dilê mest û xumaran	*Ferahlandı gönülleri, mest ve sarhoşların*
Îlahî! Tu miferreh key dilê ma	*Ferahlı kıl Allah'ım, kalple gönlümüzü Sen*
Bi dîdarê wîsala sorgulê ma	*Ulaşmakla yüzüne, kırmızı gülümüzün*
Wekî bilbil binalînim şev û roj	*İnleteyim gün-gece, tıpkı bülbül misali*
Bibûsim rûyê werd û le'lê pişkoj	*Öpeyim ben gül yüzü, hem al tomurcukları*
Bi emrê padîşahê serfirazan	*Emriyle padişahın, başı dikler şahının*
Digel çeng û ribab û tebl û sazan	*Çenkle ve de rübapla, hem davul ile sazla*
Melaîknîsbetan bir Şahizade	*Götürdü Şehzadeyi, melek misal kimseler*
Xuddamên horîreng pirr sînesade	*Huri gibi uşaklar, çok temiz yürekliler*
Birin herdu 'uşşaqên mest û mexmûr	*İki uşak götürdü, mest ve mahmur idiler*
Li hemamê bişon ew canê pirnûr	*Yıkamak için onu, çok parlak bedenliyi*

Di nêv qubba çu çerxê laciwerdî	*Kubbenin içinde ki, mavi gök kubbe gibi*
Hilanîn perde heyv û roja ‘erdî	*Kaldırdılar perdeyi, yerin ay, güneşinden*
Ji ewwel şûştin ew Şehzadeyê şeng	*İlk önce yıkadılar, şen şakrak Şehzadeyi*
Bi av û gul vemalîn canê gulreng	*Sildiler gül suyuyla, gül renkli bedenini*
Ji pakan ra çi hacet şûştin û av	*Temizlere ne gerek, yıkanmak, su kullanmak*
Ji wan re lazim e yek lem’eyê tav	*Onlar için lazımdır, güneşten bir parıltı*
Lîbasek padîşahî kirne berda	*Giydirdiler üstüne, bir padişah giysisi*
Ji wî bedrê me bes evreng xeber da	*Yeter o dolunaydan, bu tarzda haber vermek*
Welêkin durra bircê Şahê Şehbal[232]	*Ancak incisi burcun, Şehbal Şah sarayının[232]*
Yekayek zilfê ‘enber ser wekî “dal”[233]	*Birer birer zülfünü, uçları dal misali[233]*
Ji hev pişkavt ez ser ta bi daman	*Çözdüler birbirinden, baştan ta eteğe dek*
Ji “Mîm”an “Lam” kirin dûr wan xudaman	*Mim’den uzaklaştırdı Lam’ı, hizmet eden uşaklar*
Belav bûn tayê ‘enber ber rûyê gul	*Dağıldı amber teller, gül yüzünün önüne*
Yekayek, helqe helqe, mislê sinbil	*Birebir, halka halka, tıpkı sümbül misali*
Li ser ferqê wekî miskê reşandin	*Serptirdiler başına, misk misali kokuyu*
Gulavê germ û germ ‘enber weşandin	*Saçtılar üstüne taze, gül suyuyla amberden*

[232] Mebest ji “durra bircê”, Bediülcemal e.

[233] Ji bo “Dal”ê, bnr. têbiniya 255.

[232] “İncisi burcun” ifadesi, Bediülcemal’e işarettir.

[233] dâl için, bkz. 255. dipnota.

Wekî meşate pê da anî şane	*Bezekçi vurduğunda, saçlarını tarağa*
Mi'enber ta bi ta bûn dane dane	*Tel tel ayrılıverdi, amber kokulu saçlar*
Li ser canê wekî kafûr belav bûn[234]	*Kâfur gibi cisminde, dağılıp yayıldılar[234]*
Ji ava gul tijî xweh û xunav bûn	*Gül suyundan dolup taştı, terler ile şebnemler*
Bi lovkê hevrişîm penboyê jendî	*Topaklarıyla ipeğin, taraklanmış pamukla*
Vemalîn û şewq da nûrîn ji rendî	*Temizleyip sildiler, güzellikten nur saçtı*
Nerim bû bê 'eded ew canê kafûr	*Fazlaca yumuşadı, o kâfurlu bedeni*
Mişewweş husneha nûrun 'ela nûr	*Sersemleten cemali, nur üzerine nurdu*
Wekî şûştin serapa canê enwer	*Yıkadılar tümüyle, parıldayan bedeni*
Vehûnan yek bi yek zilfê mi'enber	*Ördüler birer birer, amberli zülüfleri*
Nerim avêtne ser libsek mineqqeş	*Yumuşakça örtüler, nakışlı bir giysiyle*
Heta xuh da û hişk bû canê mehweş	*Ta terleyip kuruyana, ay gibi güzel teni*
Kirasek kirne ber canê şîrînî	*Giydirdiler entari, tatlıca bedenine*
Ji hevrişîm mineqqeş karê Çînî	*Dokunmuştu ipekten, Çin işiydi mamulü*

[234] "Kafûr", pêzeyek rengspî, pirbibêhn, nîvşefaf û perçebûna wê hêsan e ku ji dara bi heman navî tê binavkirin tê hilberandin.

[234] "Kâfur", bu isimle bilinen ağaçtan çıkarılan, hekimlikte kullanılan, yarısaydam ve beyaz, kolayca parçalanabilen çok ıtırlı bir maddedir.

Ji ‘eşqa wê mîsala mahê yekşew	*Onun aşkından tıpkı, bir gecelik ay gibi*
Ze’îf û zer dibûn Ferhad û Xusrew	*Sararıp zayıfladı, ondan Ferhat ve Hüsrev*
Kirin mehbûsê qeydê zulfê şebreng	*Bağladı örükleri, simsiyah zülüflerin*
Gelek mecnûnsifatê bê mey û beng	*Çokları mecnun etti, içki ve benk almadan*
Li ser ferqê wekî miskê bi du şeq	*İkiye ayırdılar, misk kokan zülüfleri*
Şîrîn danîn tacê zer mişeweq	*Başına ışık saçan, altın bir taç koydular*
Ji elmas û yaqût û durr û cewher	*Elmas ve yakuttandı, inciyle cevherdendi*
Selasîl secde bir ber zilfê ‘enber	*Sundular bir bir secde, amberli zülüflere*
Gul û reyhan miqabil bûn di baxan	*Bahçelerde reyhanlar, karşı idi güllerle*
Mi’enber xaleha teşbîhê zaxan	*Amber kokan benleri, tıpkı kuzgunlar gibi*
Çi heddê gul digel wechê minewwer	*Parlak yüzüyle onun, gül haddine mi yarışsın*
Miqabil bît û reyhan zilfê dilber	*Hem zülfüne dilberin, denk düşsünler reyhanlar*
Welêkin min ji bê fehmî xeber da	*Ancak konuşuverdim, bilmeden, anlamadan*
Digel wê gufteyê dil sed keser da	*O konuşmayla gönül, akıttı yüz elem, keder*
Ji libsê sindûs û îstebreqê rend	*Sırmalı elbiseden, hem değerli ipekten*
Şîrîn xemlî serapa ew şekerxend	*Süslendi o şirince, tümden tatlı gülüşlü*

Ji sed rengî kirin ber libsê faxir
Yüz renkten giydirdiler, ünlü giysilerden hep

Ji gerden rêz rêz durr û cewahir
Gerdanda dizi dizi, inci ile cevherler

Guharên şebçirax asa çu Perwîn
Şebçerağlı küpeler, parlardı Ülker gibi

Micella bûn di gûşê mahê rengîn
Renkli ay kulağında, pırıl pırıl parlardı

Cebînbedra minewwer bû du heftî
Yüzü iki haftalık, parlak ay misaliydi

Li bala zilfê ‘enbersa nehuftî
Amber misali zülfün, üstünde gizli, saklı

Wekî heyye-w eqariban bi ger bûn
Yılan, akrepler gibi, dolaşıp dururlardı

Digel dildar û meczûban beşer bûn
Ancak insan idiler, sevgililer, âşıklar

Gelek kuştin bi herban ‘aribê reş
Öldürdüler mızrakla, çok bedevi siyahı

Gelek mecnûn kirin mestane bêheş
Mecnun ettiler çokça, akılsız sarhoşları

Miqewwes ebrûweş, miskên siwadîn
Yay gibi kaşlar ile, siyah renkli misklerin

Di bin da “Elif”ek û du “Eyn” û “Sad”în[235]
Altında var bir Elif, iki de Ayn ile Sad[235]

Çu “Elfê” katibê xet lê kişandî
Elif gibi yazılmış, kâtip çekmiş hattını

Li ser ta pê bi zêrabê reşandî
Baştan ayağa dek, saçmış altın suyuyla

[235] “Elif”, “‘ayn” ve “sad”, sê tîpên elfabeya erebî ye. Di edebiyatê de van tîpana wek remza bejn, por û çavên dilber tên gotin.

[235] “Elif”, “Ayn” ve “Sad”, Arap alfabesinde üç harftir. Edebiyatta bu harfler sevgilinin boy, saç ve gözlerini ifade eder.

Digel nûnan bûyî teşbîhê du dal	*Nûnla birlikte olmuş, iki dâlın benzeri*
Ji durrek ser mineqqeş şibhetê xal	*Bir inciden ki üstü, nakşedilmiş ben gibi*
Gelek kuştin bi rû wû elf û sadan	*Fazlasıyla öldürdü, elif, sadın yüzüyle*
Gelek bexşîn muradê bêmuradan	*Bağışladı çoğuna, muratsızlara murat*
Lebê le'leş şirîn mest û mey û beng	*Al ve tatlı dudakları, sarhoş, içki ile benk*
Çu durcê durr dehen wek xonçeyê teng	*Ağız cevher kutusu, dardı gonca misali*
Cewahir nîsbetê sinîn wek elmas	*Cevher misali dişler, tıpkı elmas gibiydi*
Miradbexşê dilê sed Xizr û Îlyas	*Gönlüne murat verirdi, yüz Hızır'la İlyas'ın*
Zebanşîrîn şekerxa û şekerrîz	*Dili tatlı, şekerli, hem döktürürdü şeker*
Bi remz û keyd û fitne hîleengîz	*Rumuzlu, tuzaklıydı, fitneli, hileliydi*
Ji keydê wê xilas nabin çu erwah	*Tuzağından onun hiç, kurtulmaz asla bir ruh*
Şû'ayê şewqê xeddeynan çu mîsbah	*Yanaklarının şavkı, ışıklı lamba gibi*
Şîrîn û şeng û şox e ew şekerleb	*Tatlıydı, neşeliydi, şeker dudaklı güzel*
Ziqensîm çah û zemzem sîbê xebxeb[236]	*Çene zemzem kuyulu, gabgab elma misali[236]*

[236] "Xebxeb", binçengeya mirov e; ji vî qismî re, "gerdana duwem" jî tê gotin.

[236] "Gabgab", çenenin alt kısmına denir; bu kısma, "ikinci gerdan" da denir.

Xezalîngerden û çeşmanê ahû
Du nûnên sernigûn qewseynê ebrû[237]

Ji tîrê mijde û qewseynê yengî
Dilê mecrûhê min bû mest û bengî

Bi husnê gerdena teşbîhê ‘acê
Dê bistînin ji ahûyan xeracê

Ji Hind û Çîn û Tirkîstan û Zengî
Bûxara û Xoresan ta Frengî

Ji şerq û xerbeha distînî gerden
Xeracê dilrûbayê ta bi merden

‘Ecêb gerden ku maran lê şer û ceng
Cewahir lê bi zêr û rengê ber reng

Ji medhê gerdenê nabit temame
Eger bêjim heta yewmulqiyame

Du narincên terr û zîba û mehbûb
Li ser sedrê çu ferfûrîne mektûb

Gerdan ceylan misali, gözler ahu benzeri
Yaya benzer iki kaş, ters dönmüş nûn misali[237]

Kirpiklerin okundan, alt eden iki yaydan
Benim yaralı gönlüm, mest düştü, vurgun yedi

O fildişi misali, güzelliği gerdanın
Alacaklar haracı, o ceylanî gözlerden

Hindistan ile Çin'den, Türkistan'la Zengi'den
Buhara, Horasan'dan, ta Frengistan'a kadar

Doğu ile batıdan, almaktadır gerdanı
Gönül kapan güzelin, ta haracını mertçe

Öyle acep gerdan ki, yılanlar onda cenkte
Onda renk renk altınlar, dizi dizi cevherler

Tamam olmaz demekle, övgüleri gerdanın
Eğer söyleyiversem, sürer kıyamete dek

İki taze narençtir, süslü ve de sevimli
Yazılmış fincan gibi, dururlar göğsünde

[237] "Nûn", tîpek ji elfabeya erebî ye.

[237] "Nûn", Arap alfabesinde bir harftir.

Nizanim lîmon in yan sêb û nar in	*Bilmem limon mudurlar, yoksa elma ve nar mı*
Werengî mest û zîba û xumar in	*Mest düşmüşler bu tarzda, süslü ve sarhoşturlar*
Ji ‘eynê kafûrîn ew du hebab e	*Kâfurlu gözleri ki, iki sevgilidirler*
Diden qelbê ‘uşşaqan iztirabe	*Âşıkların kalbine, onlar verir ıstırap*
Tufeylê ‘eşq û meyxwarem çu mestan[238]	*Mestler gibi ben aşkın, içkiciler tufeyli[238]*
Mirad û meqsedem goyê du bistan	*Maksat ve arzum benim, uçları iki göğsün*
Mihessel, qedd wekî serwî û ‘er’er	*Hasılı boy, endamı, servi ve ardıç gibi*
Ji nazdarî vexwarî abê Kewser[239]	*İçmiş naz ve işveden, sularını Kevser’in[239]*
Kemer best in li bejnê şibhê ‘er’er	*Bağlamış kemerini, dağ servisi endama*
Li ser piştê ji hevrîşmek digel zer	*Omuzunda var onun, altından bir ipek şal*
Mirekkeb têkvedayê ta wekî mû	*İplikleri tüy gibi, iç içe dolanmıştır*
Serê saçaxê wê ser dan bi ejnû	*Saçağının uçları, uzanmış dizlere dek*
Cewahir lê miselsel zêrê ber zêr	*Dizi dizi cevherler, sıra sıra altınlar*
Ferehbexş û dilestîn û dilawîz	*İçi ferahlandıran, gönül alan ve kapan*

238 “Tufeyl”, ango kurtêlxur, mijok.

239 “Kewser”, li behiştê, çem an hewizek e. Bi wateyek teng, çem an hewza ku li behiştê, bi taybet hatiye bexşkirina Cnb. Pêxember e; lê bi wateya berfireh, nibuwet, hîkmet, umet, tewhîd û hw. vanan nîmetên manewî nin ku hatine litufkirin ji bo cenabê Wî. Sûreya Quranê ya 108. jî bi navê “el-Kewser” e.

238 “Tufeyl”, parazit, asalak demektir.

239 “Kevser”, Cennet’te bir nehir ya da havuz adıdır. Dar anlamıyla, Hz. Peygamber’e, cennette bahşedilen nehir ya da havuz, geniş anlamıyla ise, ona lütfedilen nübüvvet, hikmet, ümmet, tevhit vb. manevi nimetlerdir. Kur’an’ın 108. suresi de “el-Kevser” adıyladır.

Cewahir kirne enguştê hinareng	*Cevherleri takmıştır, kınalı parmaklara*
Ji wê şewqê şefeq da daneyê seng	*Şavkından şafak söktü, taştaki tanelerde*
Kirin zendan cewahir zêr û bazin	*Koydular bileklere, altın cevher bilezik*
Rewanê ‘aşiqan yekser dixwazin	*Tümden istemekteler, âşıkların ruhları*
Mikemmel xemilî canê wekî nûr	*Eksiksiz süslediler, nur misali bedeni*
Li ser textek zêrîn danîne ew hûr	*Altın bir taht üstüne, oturttular huriyi*
Kirin zewq û sirûr û keyf û aheng	*Daldılar zevk ve keyfe, sevinçle eğlenceye*
Vexwarin şerbet û şîr û mey û beng	*İçtiler şerbetle süt, hem içki ile beng*
Zuleyxa nêsbetê daxwaze Yûsif	*Züleyha benzeridir, istemekte Yusuf’u*
Sirûrê mijde da camê teessif	*Sevinç müjdeyi verdi, teessüf kadehine*
Çavnêrê Leyla ye Mecnûnê ‘aşiq[240]	*Gözlemekte Leyla’yı, âşığı olan Mecnun[240]*
Li der dabî wekî ‘Ezra û Wamiq[241]	*Aşkını vurdu dışa, Azra’yla Vâmık gibi[241]*

[240] “Mecnûn” û “Leyla”, du lehengên çîrokek evîndariyê ne ku bûnin mijara edebiyata gelek netewên misilman. Li gor destnîşanên di vî warî de, Mecnûn, bi nijada xwe Ereb, bi eşîra xwe Tay, bi pîşeya xwe şaîr, bi navê xwe yê eslî, Qeys b. Mülevvah el-Amirî ye û bi tarîxa mîladî, di sala 689an de çûye ser dilovaniya xwe. Sedem ku ji ber evîna Leylayê hişê xwe wenda kiriye, bi leqeba “Mecnûn” hatiye binavkirin. “Leyla” bixwe, ew jî ji heman eşîretê ye û bi navê xwe yê eslî Leyla bintî Mehdî el-Amiriyye ye. Li gor hinek rîwayetan, dotmama Mecnûn e.

[241] Ji bo “Ezra” û “Wamiq”, bnr. têbiniya 216.

[240] “Mecnun” ve “Leyla”, birçok Müslüman halkın edebiyatına konu olmuş bir aşk hikâyesinin iki kahramanıdır. Mecnun’un, aslen Arap bir şair olduğu, Tay aşiretinden olduğu, asıl adının da Kays b. Mülevvah el-Âmirî olduğu ve miladî 689 yılında vefat ettiği söylenmektedir. Leylâ’ya duyduğu aşktan aklını kaybedince, “Mecnun” lakabıyla anılmaya başlanmıştır. Leyla’nın ise, asıl adıyla Leylâ binti Mehdi el-Âmiriyye olduğu ve rivayete göre Mecnun’la aynı aşiretten olup amcasının kızı olduğu söylenmektedir.

[241] “Azra” ve “Vamık” için, bkz. 216. dipnota.

Ji ber bayê nesîm efşan bibit gul	*Meltem önünde gül, açılıp saçılmakta*
Ji sed destan bixwînî gul bi bilbil	*Yüz makam ile bülbül, okumakta gül ile*
Were saqî tu bîn camê meya saf	*Geliver sen ey saki, getir saf meyden kadeh*
Vexwim nase bikem me'nayê keşşaf	*İçeyim, tanıyayım, keşfedeyim manayı*
Ji le'lê camê têy mizgîn peyapey	*Gelir peş peşe müjde, dudağından kadehin*
Dilê miryan ji wê camê dibit heyy	*Dirilir ölülerin, o kadehten kalpleri*
Were mitrib digel çeng û ribabê	*Sen de gel ey çalgıcı, çenginle, rübabınla*
Bireqsîn fir bikem camê şerabê	*Oynatver, içeyim, kadehinden şarabı*
Dixwazim sewtê mitrib û mey û beng	*İsterim ben sesini, çalgıcıyla mey, bengi*
Me navên nam û namûs û şer û ceng	*İstemeyiz nam, namus, hem savaş ile cengi*
Tecellayê şefeq da badenoşan	*Yansıdı içkicilere, şafağın parıltıları*
Dilê meyxwarî bû pirr tab û coşan	*Gönlü geldi içkicinin, hararete, coşmaya*
Mîsala zerreyê bê dest û payî	*Zerre benzeridir ki, elsiz ve ayaksızdır*
Bi reqsanê çû teleb "şemsuddûha"yî[242]	*Raksa gelmekle gitti, şemsü'd-duha'yı talep*[242]
Bi zewq û keyf û xweşî yû bi aheng	*Zevkle ve de keyifle, güzellik, eğlenceyle*
Melaîknîsbetan bir canê gulreng	*Götürdü gül renkliyi, melek misal periler*

[242] "Şemsuddûha", tava dema dana ye.

[242] "Şemsü'd-duha", kuşluk vaktinin güneşi demektir.

Ji ber dergahê bircê Zuhre danîn[243]
Hîcab û perdeya şermê hilanîn

Bıraktılar kapısı önüne, Venüs burcunun[243]
Kaldırdılar utanmanın, perdesi, örtüsünü

Sifethoran li hev nêrîn ku rabin
Ku Mecnûn û Leyla ba hevdu şabin

Huri misal olanlar, bakıştılar kalkmaya
Ki Leyla ile Mecnun, baş başa mutlu olsun

Bi derkeftin bi hevra ew şekerxa
Ji Yûsif ra tenê ma ew Zuleyxa[244]

Hep birlikte çıktılar, o şeker ağızlılar
Yusuf için yalnızca, kaldı güzel Züleyha[244]

Selam kir Şahizade mislê bilbil
Ji şewqan pişkivî lebxonçeyê gul

Selam verdi Şehzade, tıpkı bülbül misali
Özleminden açıldı, gül goncası dudaklar

Digel redê selam rabû pê ew şem'
Digel perwane kirdin sohbet û cem'

Selama karşılıkla, ayağa kalktı o mum
Pervaneyle birlikte, ettiler sohbet ve cem

Vexwarin şîr û mey û şehd û şeker
Bi le'lên badenoş û mest û ehmer

İçtiler sütle şarap, yediler balla şeker
Mest ve kırmızı renkli, bade içen leblerle

Heta heft sa'etan mest bûn bi hevra
Di destan de bih û ezman di dev ra

Yedi saate kadar, birlikte mest oldular
Ellerinde ayvayla, ağız ağıza mukabil

---

243 "Birca Zuhre"ê, li gor falavêjê stêrkan, taybetiyên kesên ku li ser vê bircê ev in: "Nermî, di navbera mirovan de hezkirin û lihevkirin, dostî, sincê baş, comerdî, pakiya dil, peyivandin û lihevkirin, lîstik û aheng, dahollêdan û ji bo dilxweşkirina jinan lêdana amûrên wek ûd û hwd...

244 Ji bo "Yûsif" û "Zuleyxa"yê, bnr. têbiniya 201.

243 "Venüs burcu", yıldız falıyla ilgilenenlerce, bu burçta olanların özellikleri şunlardır: Yumuşaklık, insanlar arasında sevgi ve anlaşma, dostluk, iyi ahlak, cömertlik, kalp temizliği, konuşma ve anlaşma, oyun ve eğlence, davul çalmak ve kadınları hoş tutan ut vb. şeyleri çalmak...

244 "Yusuf" ve "Züleyha" için, bkz. 201. dipnota.

Guvaştin ‘aşiqan hevdu bi yarî
Şakalarla âşıklar, sıktılar birbirini

Ji bûse mestî bûn le’lên xumarî
Mest düştüler buseden, sarhoş olan dudaklar

Çi xoş bûs û kenar û badenoş in
Ne hoştur buse, kucak, hem de içmek badeyi

Şerabî yû xummar û meyfiroş in
Şarapçı, sarhoştular, hem de satarlardı mey

Ji şerqê, mexrebê, ta fecrê sadiq
Doğmaktan batmaya dek, sabaha varıncaya

Kirin zewq û sefa ‘Ezra û Wamiq
Zevk ve safa ettiler, Azra ile hem Vâmık

Suleyman nîsbetî Belqîsa sanî
Biri Süleyman gibi, diğer ikinci Belkıs

Cewahîr kun kirin sirrê nihanî
Gizli sırlarıyla hem, deldiler cevherleri

Di behra zînetê masî xeriq bû
Batıp boğuluverdi, balık süs denizinde

Bedexşan qetre qetre lê feriq bû
Damla damla yakutlar, fark oldu birbirinden

Ji cezb û lerzeyê seyrê terîqet
Cezbeyle titremekten, tarikat gezisinin

Mecazî çû gehişte ser heqîqet
Gitti gerçek olmayan, ulaştı gerçekliğe

Ji behrê wahdetê çûn Hewzê Kewser
Vardı vahdet bahrinden, havuzuna Kevser’in

Kirin xuslê dilê dana û dilber
Gönülleri gusletti, bilge ile dilberin

Gulab û misk û ‘enber lê reşandin
Serptiler birbirine, gülsuyu, misk, amberi

Bi ser yek da cewahir pirr weşandin
Her biri ötekine, saçtı çokça cevheri

Ji koşê sohbetê rûniştin ew yar	*Sevgililer oturdu, sohbetin köşesine*
Heta çil roj û çil şev çû bi ejmar	*Sayı olarak geçti, kırk gündüzle kırk gece*
Çi bêjim halê ‘uşşaqan bi defter	*Ne diyeyim yazmakla, âşıkların halini*
Temam nabî heta rabîte mahşer	*Tamam olamaz ta ki, kurulana dek mahşer*
‘Umr nîn e ji min ra ez bibêjim	*Ömrüm yetmiyor benim, ta ki diyebileyim*
Di medhê da cewahiran birêjim	*Övgüsünde bunların, cevherleri dökeyim*
Were saqî tu bîne camê wehdet	*Gel ey saki getir sen, vahdetin kadehini*
Ji koşa sohbetê pirr zewq û lezzet	*Çok zevkli ve lezzetli, sohbetin köşesinden*
Bibûsîn le’lê camê mestiyê ma	*Dudağından öpeyim, mestlik kadehinin*
‘Edem bîtin wicûdê hestiyê ma	*Yokluğa gitsin bizim, varlığımız, özümüz*
Were mitrib digel tenbûr û ‘udê	*Ey çalgıcı geliver, tamburunla, udunla*
Bibêje nexmeyê terkê wicûdê[245]	*Söyle nağmelerini, vücut terkine dair[245]*
Bibir wawê wicûdê sohbetullah[246]	*Kes vücudun vâvını, sohbetullahın sen[246]*
Dibit peyda-w terkê masîwellah	*Terki ortaya çıkar, Allah’tan gayrısının*

[245] “Terkê wicûd”, di terîqa Neqşî de ji çar esasan yek e. Evanan, wiha hatine formilekirin; “Terkê dinya, terkê ûqba, terkê hestî, terkê terk” e. Bi kurtî, tenha, xwegirêdana bi Xwedê re û ji xencê Wî, terka dinyayê, axiretê, hebûnê û terka van terkan; hew tenê girêdana bi Xwedê re îfade dike.

[246] “Sohbetullah”, ango sohbeta ku navenda wê bi Xwedê û riza Wî dagirtî ye. Ji bêjeya “wicûd” ya bi erebî, dema tîpa waw tê avêtin, tenê kîteya “cûd” dimîne ku ew jî bi wateya xwe “comerdî” ye.

[245] “Vücut terki”, Nakşi tarikatının dört esasından biridir. Bu esaslar; “Terk-i dünya, terk-i ukba, terk-i hesti, terk-i terk” şeklinde formüle edilmiştir. Kısacası, sadece Allah’a bağlanıp, O’nun adına, dünyayı, ahireti, varlığı ve nihayette bu terkleri de terk ederek yalnızca Allah’a bağlanmayı ifade eder.

[246] “Sohbetullah”, Allah eksenli sohbet; Allah’ın rızasını esas alan sohbet demektir. “Vücud” sözcüğünün Arapça yazılışında, başında *vav* harfi var; kaldırıldığında, “cud” hecesi kalır ki o da, “cömertlik” manasındadır.

Ji enwarê tecellayê Îlahî	*İlahî tecellinin, nurlarından fışkıran*
Nesîmek hate ser rengê siyahî	*Bir hafif rüzgâr geldi, sardı siyahî rengi*
Çi misk û ‘enber in yan zilf û xal in	*O ne misktir, amberdir ya da zülüf ve bendir*
Yeqîn neqşek ji neqşê Zulcelal in[247]	*Kesin o bir nakıştır, nakşından Zülcelal'in[247]*
Ji perda heftrengî hate der Bedr[248]	*Yetmiş renkli perdeden, çıktı dışarı Bedir[248]*
Minewwertel'et û mexmûr û dilsedr	*Parlak yüzlü ve mahmur, yüksek gönüllü dilber*
Xiramên nazenîn şahane rengî	*Şahane renkleriyle, sallanan nazeninler*
Miheyyer man boyê mexmûr û bengî	*Hayret içre kaldılar, o mahmurdan, tutkundan*
Heta çû neyşeker westa li ber Şah	*Ta o şeker kamışı, gitti Şah'ın yanına*
Şefeqroj û minewwer şibhetê mah	*Nurlu, şafak güneşi, dolunay gibi parlak*
Wekî azade serwî b'tali' û bext	*Serbest olarak servi, talih ve şanslar ile*
Temenna kird û bûsî payeyê text	*Arzuladı ve öptü, ayağını tahtının*
Sicûda mihbetê qed kir wekî dal	*Sevgi secdesi büktü, belini dâl misali*
Miferreh bû li wî pirr Şahê Şehbal	*Ferahlandı onunla, Şehbal Şah fazlasıyla*
Bi destên xwe mibarek ser hilanî	*Mübarek elleriyle, kaldırdı o başını*
Li secdê yû anî yaranê canî	*Secdeden aldırarak, can sevgiliyi yanına*

[247] Mebest ji Zulcelal, Xwedê ye ku xwedî mezinahî û berzî ye.

[248] Mebest ji "Bedr"ê, Bedîulcemal e.

[247] "Zülcelal"den maksat, ululuk ve azamet sahibi Allah demektir.

[248] "Bedir"den maksat, Bediülcemal e.

Mibarek bin li te ew cam û fincan	*Mübarek olsun dedi, sana o cam ve fincan*
Bi ser wî da reşandin durr û mircan	*Saçtılar başına, incilerle mercanlar*
Çiqas ehlê dîwanê şah û yaran	*Divan ehlinde olan, cümle şahlar ve dostlar*
Reşandin wan li ser şibhê xumaran	*Saçtılar hep başına, tıpkı sarhoşlar gibi*
Di hîna qudretullah hate dewlet[249]	*Ne zaman ki geliverse, devlete kudretullah[249]*
Ji jor da ew dibarî ser te rehmet	*Yağar üstüne senin, yukarıdan rahmet gibi*
Ji Rehman û Rehîm û Heyy û Qeyyûm[250]	*Rahman ile Rahim'den, hem Hay ile Kayyum'dan[250]*
Tecalla det dilê danayê mexmûm	*Gönlüne cilvelenir, hüzünlü bilgelerin*
Selamê Hamilanê 'Erşê her şeb[251]	*Her akşam selamları, arşı yüklenenlerin[251]*
Digel cem'ê melaîkê miqerreb[252]	*Ayrıca vardır bütün, mukarreb meleklerin[252]*

249 Mebest ji "qudretullah", alîkarî û destegîriya Xwedê ye.

250 Ji bo "Rehman" û "Rehîm", bnr. têbiniya 251. "Hey", wesfekî Xwedê ye; timûtim zindîbûn û zindîkrina wî îfade dike. "Qeyyûm", wesfekî Xwedê ye; tenha û her û her li ser pêyan û li ser kar e; her tişt û her sazûman bi saya wî li ser pêyan dimîne.

251 Mebest ji "Hamilanê 'Erş", melekên (ferişte) 'erşkêş in. Nivîskar, bi îfadeyê, balê dikşîne ser Sûreya Heqqa, ayeta 17. Herwiha, bi heman îfadeyê bal tê kişandin li ser hedîsa di vî derbarî de (bnr. Ebû Dawid, h. 18). Ev ferişte 8 hebin. ji wan re "Kerrûbiyyûn" jî tê gotin. Wek hemû feriştevan, tim bi hemd û tesbîha Xwedê mijûl in û îbadeta 'erşê ya bi zimanê hal, wek berpirsiyarên wê, bi zimanê qal pêşkeşê Xwedê dikin.

252 Mebest ji "melaîkê miqerreb", çar milyaketên mezin in. Ev îfade di Sûreya Nîsa, ayeta 172an de derbas dibe. Bi wateya xwe feriştevên nêzîktir yên Xwedê ye. Cahê wan bilind, peywira wan mezin û heyatî ye. Wek bi navê çar milyaket'en mezin jî tên naskirin. Ew, Cebrayîl, Mikayîl, Îsrafîl û Ezraîl e.

249 "Kudretullah"tan maksat, Allah'ın yardımı, desteğidir.

250 "Rahman" ve "Rahim" için, bkz. 251. dipnota. "Hay", Allah'ın, sürekli diri olan ve dirilten vasfıdır. "Kayyum", Allah'ın, sürekli ayakta, faal durumda ve her şeyin kendisiyle ayakta durduğunu, onunla devam ettiğini ifade eden vasfıdır.

251 "Arşa yüklenicileri (arşı taşıyan melekler", ifadesi, Kur'an'ın Hâkka Suresi, ayet 17'ye işarettir. Yine hadis kitaplarından Ebu Davud'da geçen bir hadise (hadis no, 18) dikkat çekilmiştir. Bu melekler 8 adet olup, "Kerûbiyyun" adıyla anılmaktadırlar. Bunlar, sürekli hamd ve tesbihle Allah'ı anar, arşı temsilen, onun hal diliyle ibadetini, kal diliyle Cenab-ı Hakka tevdi ederler.

252 "Mukarreb melekler", Kur'an'da "mukarrebûn" (Nisa Suresi, ayet 172) olarak geçer. Allah'a yakın melekler anlamındadır. Makamları yüksek, vazifeleri büyük ve hayatî olanlardır. Dört büyük melek olarak da bilinen, Cebrail, Mikail, İsrafil, Azrail'dir.

Di fecrê da dê bîn ser te peyapey	*Göreceksin fecirde, üzerine peyderpey*
Ji şewqan dê binalî dil wekî ney	*İnleyecektir gönlün, ney misali arzudan*
Ji ceberût û melekût û lahût[253]	*Ceberrut, melekûttan, ayrıca da lahuttan[253]*
Meqamatan dibînî ta bi nasût	*Makamları görürsün, ta makamına insanın*
Çi rengî qaîm in cem'ê melaîk	*Ne tarzda ayaktalar, bütünüyle melekler*
Di ber emrê Şehî nûrîn eraîk[254]	*Şahlarının emrinde, nurlu tahtlar üstünde[254]*
Bê xwab û xurden in ew bext û feyroz	*Uykusuz, yemeksizler, bahtlı ve de mesutlar*
Di emrî da mûqîm in her şeb û roz	*Daim emre hazırlar, her gece ile gündüz*
Çi xweş ta'et dimînin der qiyamê	*Ne güzel itaatle, ayaktalar daima*
Ji şewq û hibbê ta yewmulqiyamê	*Ta kıyamete kadar, şevk ile muhabbetten*
Ji raki'ê di wan min nîn hesûde	*Kıskanmıyorum ben, rükûları onların*
Welê zêde ji wan ê der sicûd e	*Ancak secdedekiler, istisnası onların*
Çi xweş e secdeyê mehbûbê canî	*Ne güzeldir secdesi, candan sevgilinin*
Di wê secdê bibî canê me fanî	*Varsın da o secdede, olsun canımız fani*

[253] "Ceberrût", di Quranê de derbas nabe. Di hedîsan de, di wateya kîbriya, ezamet, cebbarî, zorbetî de hatiye serlêvkirin. Bi rêya tesewifê derbasê literatorê bûye. Ev têgeh, îşaretê îrade û hukimraniya Xwedê dike û dide nîşandin ku tenha dê ev bipêkwerin. "Melekût", dijê "Mulk"ê ye. Ango îşaretê alema xeyb dike; rastî û rûyê hundirîn yê hertiştî nîşan dide. "Lahût", bêjeyek suryanî ye: hêla manevî û xwedawendiya Xwedê nîşan dide.

[254] Mebest ji "Şeh", Xwedê ye.

[253] "Ceberrut", Kur'an'da geçmez; hadislerde, kibriya, azamet, cebbarlık, zorbalık anlamında geçer. Literatüre, tasavvufla girmiştir. Cenab-ı Hakk'ın iradesinin hükümranlığına, irade ve takdiri ne ise, onun tahakkuk edeceğine işarettir. "Melekût", "mülk"ün zıddı, yani gayb âlemi ve her şeyin içyüzü, hakikatini ifade eder. "Lahût", Süryanice bir kelimedir; Cenab-ı Hakk'ın kendine bakan manevi, yani ilahlık yönünü ifade eder.

[254] Buradaki "Şah"tan maksat, Allah'tır.

Îlahî! Tu ji bo min key nesîbe
Sicûdê murdenê pîşê hebîbe

Siyahpoş pirr xerîb e mubtela ye
Miradê wî ji Te hibb û riza ye

Şerabê saqiyan nadem bi Kewser
Sicûdê dilberan sed textê Qeyser[255]

Wekî kelb im di ber yaran dibim renc
Ji Yemlîxa dixwazim payeyê qenc

Wekî Leyla em û Mecnûn-sifatî
Ji ednayê dibînim ez necatî

Ji renc û hem cefayê xwe ‘edem kir
Nesîbê xwe di esrarê qedem kir

Ji jor de xwe diavêt ez bilindî
Nesîbê wî dibîtin rencê kendî

Nasiplendir Allah'ım, beni de o secdeden
Ölenin secdesi ki sevgilinin önünde

Çok zavallı, düşkündür, Siyahpûş olarak ben
Sen'den muradı yalnız, sevgin ile rızandır

Değiştirmem Kevser'e, şarabı sakilerin
Dilberlere secdeyi, yüz Kayser'in tahtına[255]

İt gibi zahmet çekerim, sevgililer yüzünden
Bir güzelim rütbeyi ben, isterim Yemliha'dan

Leyla gibi olan ben, Mecnun sıfatlı gibi
Görürüm kurtuluşu, değersiz şeylerden ben

Zahmet ile cefada, yok ettim ben kendimi
Nasibimi gömdürdüm, sırların içine ben

Yukarıdan kendini, atardı yüksek yerden
Payına düşen onun, perişanlık acısı

[255] Heger li malikê pêşî bête nihêrtin, dixuye ku ev îfade tev de mecaz in (bnr. têbiniya 44.) Ji bo "Kewser"ê, bnr. têbiniya 347. "Qeyser", îfadeyek Erebî ye, lê ji bêjeye "Qaîsar" ya Aramî hatiye wergirtin. Ereban, ji bo împeratorên Roma û Bîzansa ev unwan bikardianîn. Herwekî ji bo hukimdarên Persan "Kîsra" digotin. Di dema Cnb. Omer'da, ji bo "Herakleios"ê Bîzansî re, "Qeyser" û "Melîkurrûm" dihat gotin.

[255] Önceki beyitlerle irtibatlandırılırsa, bu beyitteki ifadelerin mecaz ifadeler olduğu anlaşılır (bkz. 44. dipnota). "Kevser" için bkz. 347. dipnota. "Kayser", "Kaisar" kelimesinden alınmadır. Arapçaya Aramice yoluyla girmiştir. Roma, Bizans imparatorları için kullanılan bir unvandır. Pers hükümdarlarına da "Kisra" denilmiştir. Bu manada, Hz. Ömer döneminde yaşayan "Herakleios" için, "Kayser", "Melikü'r-Rûm" ifadeleri kullanılmıştır.

Were saqî werîne camê rahet	*Gel ey saki, getir sen, rahatlatan kadehi*
Şeh û şehzade jêkî bin bi firqet	*Ayrılıkla koparır, Şah ile Şehzadeyi*
Binoşim ku lebê fincanê mazî	*İçeyim dudağından, geçmiş fincanının*
Bibim mecnûn li pêşê tu û qazî	*Ta ki mecnun olayım, senle kadı önünde*
Were mitrib bi saz û 'ud û tenbûr	*Çalgıcı, gel sazınla, udunla, tamburunla*
Sedayê xweş ji saz û nay û sentûr	*Seslendir sen güzelce, sazı, neyi, santuru*
Tecellayê şefeq ku roj bi derket	*Tecellisi şafağın, ki güneş doğwerdi*
Dilê dana mu'erref çû bi serket	*Gitti başardı gönül, bilgece ve arifçe*
Li dîwanê Şehînşahê mi'ezzem	*Muazzam divanında, ki o şahlar şahının*
Dibên Şehzade çû nik Şahê 'Ezem	*Derler Şehzade gitti, büyük Şah'ın yanına*
Vewesta neyşeker ber sedrê dîwan	*Durdu şeker kamışı, divanın baş yanında*
Mîsala zerreyê roj û heyîvan	*Parıltısı misali, sanki güneşle ayın*
Dibên Şehbalê 'alî gotî, "Ey meh:	*Derler o büyük Şehbal, ona dedi ki, "Ey ay*
Eger bûyî tu mehzûn pirr li cem me	*Şayet çok kalmakla sen, mahzunsan yanımızda*
Ji bo te îzn e ey yaranê mexmûn	*Sana izin vardır bil, ey tasalı sevgili*
Niha bab û diya te bûne mehzûn	*Şimdi mahzun olmuşlar, annen ile hem baban*

Niha ew bûn ji bona te nerahet	*Huzursuzdurlar şimdi, onlar senden dolayı*
Vexwarin wan ji bo te camê firqet	*Senin için içmişler, ayrılık kadehinden*
Bibêj bo min tu hez ke te bişînim	*Söyle bana, istersen, göndereyim ben seni*
Ji vê qenc û selahet ez nabînim”	*Görmüyorum bundan ben, güzel ve doğru yolu”*
Welê Seyfulmilûkî hem riza da	*Seyfülmülûk ki buna, rıza yüzü gösterdi*
Li nik wî Serwebanû xoş cewab da	*Güzel karşılık verdi, yanında Servebanu*
Welê Serwê digo Şehzadeyê mexmûr	*Ancak diyordu Servi, mahmurlu Şehzadeye*
Bisik car dî biçim bixwazim destûr	*“Dur, bir daha gideyim, isteyeyim ben izin”*
Mihessel, carek dî Şahê şîrînnam	*Kısaca, bir kez daha, namıyla şirin Şah’tan*
Dida destûr ji bo Şehzadeyê Şam	*Çıktı izin ve destur, Şehzadesine Şam’ın*
Di wê gavê kirin hazir ji bo Mîr	*Hazırlığa o anda, başladılar Bey için*
Ji hedd zêde newadir û cewahîr	*Haddinden fazla şeyler, nadir şeyler, cevherler*
Meta’ê misk û ‘enber zêr û gewher	*Eşyadan misk ve amber, altın ile cevherler*
Temam nabit çi binvîsim bi defter	*Yazmakla deftere, tamam olmaz saymakla*
Ji qewlê rawiyê şîrînexbar	*Dediğince ravinin, hoş, tatlı haberlerin*
Hezar ‘ifrît li wê malê kirin bar	*O evden çıkan eşya, yüklendi bin ifrite*

Verêkir Şahibalê dilminewwer	*Yolladılar onları, kalbi münevver Şehbal*
Ji bo Şehzadeyê şîrîn dilawer	*Şirin ve yiğit olan, Şehzade'nin uğruna*
Hezar şîrîn xulamê nîk mehzer	*Hazırlandı onlarla, güzel de bin hizmetkâr*
Li ser ta pê xeriq ez zêr û gewher	*Baştan başa altınla, cevherle süslüydüler*
Hezar dî cariye wek afîtabê	*Bir o kadar cariye, her biri bir güneş gibi*
Didan te'ne li rûyê Mahîtabê	*Ay yüzüne karşı, ederlerdi kınama*
Serapa xemilîbûn ew şîrînxal	*Baştan başa süslüydü, o benleri şirinler*
Ji dîba û durr û zêrîn û xelxal	*Gümüş ile incilerle, altın ve halhallarla*
Temam mest bûn şerabî yû şekerleb	*Şaraptan tümü mestti, o şeker dudaklılar*
Dihenxonçe ji qudret sêbê xebxeb	*Kudretten gonca ağız, elma gerdanlıydılar*
Hezar dê carî yû xilmanê canî	*Sevgili bin cariye, hem de hizmetlilerden*
Verêkir Şah ji bo Belqisa sanî	*Yolculadılar Şah'ı, ikinci Belkıs için*
Ji bo destûrî bûn ew îttifaqî	*İzin üzere onlar, bir araya geldiler*
Vexwarin şerbetê camê firaqî	*İçtiler kadehinden, ayrılık şerbetini*
Qeddê Şehbal bû teşbîhê Dalê[256]	*Şehbal Şah'ın endamı, oldu dâl harfi gibi[256]*
Ji huznê firqetê ebrûhilalê	*Ayrılığının hüznünden, hilal kaşlı kızının*

[256] "Dal", tîpek ji elfabeya erebî ye. Nivîskar, di wateya "tewîn" û "dutabûnê" de, Şeh nolandiye tîpa dal'ê.

[256] Dâl, Arap alfabesinde bir harftir. "Büküldü", "iki büklüm oldu" anlamında, Şah, dâla benzetilmiştir.

Girî teşbîhê baranê Nîsanî	*Nisan yağmuru gibi, ağlamaya başladı*
Cewahir rêz kirin wî durrefşanî	*O inci saçıcı Şah, dizdirdi cevherleri*
Li werdên sor dibarî xoş gulabe	*Yağmaktaydı gül suyu, al güllere güzelce*
Çû doxter dî werengî rûyê babe	*Kızı gitti gördü ki, babasını bu tarzda*
Ji dil ahek kişand teşbîhê nare	*Yürekten bir ah çekti, sanki ateş misali*
Ji wê ahê ceger bûn pare pare	*O ahtan ki ciğeri, parçalandı adeta*
Mirarî rêzî bûn û baderengî	*Bâde renkli inciler, oldular dizi dizi*
Li ser husna şîrîn û mest û bengî	*O mest ve tutkun olan, tatlı güzel yüzünde*
Ji huzn û nalî hem Serwebanû	*Hüzünden, inlemeden, ayrıca Servi Hatun*
Binefşe-nîsbetî ser da bi ejnû	*Menekşe gibi koydu, dizlerine kafayı*
Bi reng reng zêde kir nûrîn cemalî	*Çeşit çeşit artırdı, cemali nurlu güzel*
Qeddê serwê letîf û şibhê "Dal"î	*Nazik, servi boyunu, büktü dâl harfi gibi*
Digel wê giryeyê Serwa senewber	*Ağlamakla birlikte, fıstık çamı servisi*
Ji dil bûsî rûyê wê xûb û doxter	*Kalpten öptü yüzünü, o sevimli kızının*
Digel wê bûsî destê maderê xoyeş	*Onunla o da öptü, annesinin elini*
Meha nûrînliqaya sîne pirêş	*Sinesi çok yaralı, yüzü nurlu o mehtap*

Dû'a û medhê kir hem bê hisabe	*Sayısızca bulundu, dua ile övmede*
Digel wê bûsî kef û payê babe	*Ayrıca babasının, öptü el, ayağını*
Li paşan rabû bûsî destê temamî	*Ardından kalktı öptü, hepsinin ellerini*
Digel 'izz û kerem go, "Esselamî"	*Saygı ile ikramla, dedi, "Kalın güvende"*
Dibên Şehzadeyê mest û dilawer	*Derler Şehzade ki mest ve yüreklidir*
Ji dil bûsî kefê Şehbalê serwer	*Kalpten öptü elini, halkın başı Şehbal'in*
Bi destûr û bi î'zazek temamî	*İzinle, saygınlıkla, hem eksiksiz olarak*
Li pêş wan rabû ew Şehbazê Şamî	*Kalktı o an huzurdan, Şam'ın şanlı yiğidi*
Miheyya kir ji wî ra textekî zer	*Hazır ettiler ona, bir tahtı ki altından*
Milemme' bû tijî elmas û cewher	*Pırıl pırıl kaplıydı, elmas ile cevherden*
Du sed menn bû mizeyyen durr û mercan	*Dört yüz batman kadardı, inci, mercanla süslü*
Kirin hazir li pêş Şah wan nedîman[257]	*Hazır etti nedimler, onu Şah'ın önünde[257]*
Emir kir ser 'efarîtan, "Hilînin!"	*Emretti ifritlere, "Yükleniverin!" dedi*
Gelek 'alem te'eccub jê bimînin	*Ondan çoğu insanlar, kalsınlar hayretlerde*
Mihessel, wan hilanîn doxter û Şah[258]	*Hasılı kaldırdılar, onlar Şah ile kızı[258]*
Li bala xoş dikir wan hem temaşa	*Yükseklerde güzelce, ederlerdi temaşa*

[257] "Nedîm", hevalbendê meclîsê, hevalê suhbetê.

[258] Mebest ji "doxter û Şah", Bediulcemal û Seyfulmilûk e.

[257] "Nedim", sohbet arkadaşı, meclis arkadaşı.

[258] "Şah ile kız"dan maksat, Seyfülmülûk ve Bediülcemal'dir.

Hilanîn textê zêr cimle bi nazdar
Nazikçe kaldırdılar, cümlesi altın tahtı

Dused kes bûn temamî ew bi ejmar
İki yüz kadardılar, sayı olarak onlar

Bi cimle rakirin bala bi yek ser
Tümü birden kaldırdı, yükseklere o tahtı

Eger Şah û eger etba' û doxter
Şah olsun, dilber olsun, etabıyla beraber

Li bala wî dû'a kir bê hedd efzûn
Yükseklerde etti o, sayısızca duayı

Digel hemd û sena çûn durrê meknûn
Şükürle hem övgüyle, gitti saklı inciler

Bi cimle çûn û hem bê derd û asîb
Dertsiz, belasız onlar, birlikte hep gittiler

Heta ku daxil bûn Şehrê Serendîb
Ta girinceye dek, şehrine Serendip'in

Bi zewq û keyf û şadî yû bi 'unwan
Zevkle hem de keyifle, şan ile, mutlulukla

Serendîbê neman pîr û eger can
Serendip'te kalmadı ne genci ne yaşlısı

Bi cimle hatin û vêkra temaşah
Geldiler bütün herkes, birlikte izlediler

Digel Melke w'Bedre hem zenê Şah
Melke ile Bedre'yi, hem Şah'ın karısını

Digel Şahê Serendîb Se'dê şeker
Tatlı Sad'la beraber, Serendip şehri Şahı

Be vêkra hatin û cem Şahê dilber
Geldiler yanına hep, o güzel, cazip Şah'ın

Gulab û misk û 'enber lê reşandin
Serptiler gül suyunu, hem misk ile amberi

Cewab Taculmilûk ra wan şihandin[259]
Gönderdiler haberi, Tacülmülûk'e onlar[259]

[259] "Taculmilûk", mamê Bedîulcemal e.

[259] "Tacülmülûk", Bediülcemal'in amcasıdır.

Dibên Şehzade û Se'dulmilûk Şah
Derler ki Şehzade'yle, bahtiyar Sadülmülûk

Li dîwanê rûniştin berberê Şah
Divanda oturdular, Şah'ın tam karşısında

Vexwarin şerbet û şîr û mey û beng
İçtiler şerbetle süt, mey ile bengi onlar

Wekî mexmûrî bû Şehzade ewreng
Şehzade ki o tarzda, oldu mahmur ve sersem

Ku ehwalê guzeşte wî xeber da
Ki geçmiş olayları, dile getirince o an

Dilê wî ah û efxan û keser da
Ah etti gönlü onun, feryatla, üzüntüyle

Hewalê xwe ku çû ba Şahê Qulzem
Halini ki gitmişti, Kulzem Şahı yanına

Ji wan ra got û cimle bûne milzem
Deyiverdi onlara, cümlesi oldu suskun

Welêkin wan digot, "Eşşukrulîllah
Ancak onlar diyordu, "Allah'a şükür olsun

Bixêr hatî hezar elhemdulîllah"
Hayırla geldiniz siz, binler Elhemdülillah"

Li paşê hefteyek Taculmilûk şah
Bir haftanın ardından, Şah Tacülmülûk ile

Dibên hatin cimle çûn temaşah
Derler geldi tamamı, gittiler temaşaya

Bû şadî û zewq û keyf û hem sirûre
Mutlulukla, zevk ile, hem keyifle, sevinçle

Li paşê çend rojan bû mirûre
Ardından ki birkaç gün, geçmiş idi üstünden

Welêkin Melke û Bedre û zenê Şah
Ancak Şah'ın karısı, Melke ile Bedre'yle

Mudamî bûn li nik Bedîa çun mah[260]
Yanındaydılar daim, ay gibi Bedia'nın[260]

[260] Mebest ji "Bedia"yı, Bediulcemal e.

[260] "Bedia"dan maksat, Bediülcemal'dir.

Wekî miqdarekî borî got, “Ey Se’d!
Tu çawanî bibêj ey yarê dilbend?

Bedîa Ba Cemal go bo min ehwal
Tu bûy ‘aşiq li Melke hal û ehwal

Bibêje halê xwe bo min nihayet
Temamê derd û kesran hem melamet”

Go: “Ey Şehzade dimrim nîn e derman
Meger tu bibî Eflatûn û Loqman

Xeber me j’hev heye wextê tu çûyî
Dilê wê pirr heye min bo te goyî”

Li paşan hate nik Şehzade Melke
Go: “Ey Mahî hewalê xwe tu hel ke

Bixwazim te ji bo Se’dulmilûkî
Bi izna Şah û hem Taculmilûkî”

Mihessel, Melke razî bû cewabî
Da Şehzadeyê mexmûr izdirabî

Biraz vakit geçince, “Ey Sad” diye seslendi
“Ey sevgili arkadaş, söyler misin, nasılsın

Bediülcemal bana, anlattı durumunu
Hal vaziyet olmuşsun, vurulmuşsun Melke’ye

Anlat bana nihayet, son durumun ne senin
Tüm derdini, hüznünü, hem kınanmış halini”

Dedi ki ey Şehzadem, ölüyor, ilaçsızım
Yalnızca sen olursun, Eflatun ve Lokmanım

Haberdarız ikimiz, gittiğinde buradan
Söyleyeyim ben sana, gönlü çok vardır bende”

Ardından geldi Şehzade, Melke’nin yanına
Dedi, “Hallet durumu, ey ay ışığı güzel

İsteyeyim ben seni, Sadülmülûk’üm için
Olsun Şah’ın izniyle, hem de Tacülmülûk’ün”

Özetle Melke Hatun, rıza cevabı verdi
Mahmur Şehzade’ye, çekerek ıstırabı

Dibên wê gavê Şehzade çû nik Şah
Hewalê Se'dî got û hem digel Mah

Derler ki hemen o an, Şehzade gitti Şah'a
Anlattı durumunu, Sad ile ay kızının

Welê Şeh gotî: "Ey yaranê canî!
Ew e cariye ji bo te tu dizanî!"

Ancak Şah dedi ona, "Ey canımdan sevgili
Odur cariyen senin, ne istersen o olsun"

Kirin dawet û keyf û bû sirûre
Digel saz û ney û 'ud û tenbûre

Kurdular döğün dernek, kıldılar keyif, sevinç
Sazlarla ve neylerle, utlarla, tamburlarla

Heta heft roj û heft şev wan temamî
Kirin zewq û sirûr û şahî, şamî

Yedi gün yedi gece, aralıksız tamamen
Ettiler zevkle sevinç, Şam Şahı düğününde

Li paş hefteyek Şahî da wekalet
Bi Şehzade dilê wî bû bi rahet

Verdi Şah vekâleti, bir haftanın ardından
Şehzade'yle gönlünü, verdi rahat, huzura

Girêdan 'eqd û nîkahê du yaran
Miferreh bû dilê mest û xumaran

Bağladı iki yârin, nikâh akitlerini
Ferahlandı gönüller, mestlerin, sarhoşların

Heta behsê me hate weqtê gerdek
Nebû qet wê derê esla çu ferdek

Konumuz geldiğinde, ki gerdeğin vaktine
Orada yoktu asla, insanlardan bir tek fert

Bi hevra wan dikir keyfî û şadî
Heta ew çûn gihane wê miradî

Ederlerdi birlikte, keyif ile hoş vakit
Ta onlar da kavuştu, arzulanan murada

Di weqtê ku ji gerdek ew biderket
Wekî roj û heyiv çû û bi serket

Mihessel, man li wê sê mah temame
Li wî bûn mintezir xas û ‘ewame[261]

Ji qewlê rawiyê mîzanê mewzûn
Dibên Şehbal û Serwê bûn bi mexmûn

Şehê Şehbal digel Serwê yû peryan
Hemî rabûn û hatin şibhê baran

Ku ew dîsa bi hev bûn şad û bê xem
Bedîa Ba Cemal çû wê demê cem

Ku wê rûyê maderxoş û babe
Dibên çû bi alê wan hem hîcabe

Kirin zewq û sirûr û keyf û aheng
Vexwarin şerbet û şîr û mey û beng

Kirin Şehzade û Se’dî mixelle’
Bi tacên zer libasanê milemme’

Çıktıklarında onlar, her ikisi gerdekten
Güneş, Ay gibiydiler, gittiler, başarıyla

Özetle kaldı onlar, orada üç ay kadar
Ona muntazır oldu, halk ile has kimseler[261]

Dengeli teraziden, haber veren ravice
Derler ki gamlandılar, Şehbal ile Servi’si

Şehbal Şah Servi’siyle, yanı sıra periler
Tümü kalkıp geldiler, tıpkı yağmur misali

Oldu yine birlikte, mutlu ve gamdan uzak
O anda yanlarına, gitti Bediülcemal

Ki gördü yüzlerini, güzel anne, babanın
Derler onlara taraf, gitti hicaplı yere

Ettiler zevkle sevinç, keyif ile eğlence
İçtiler sütle şerbet, hem de mey ile bengi

Şehzade ile Sad’ı, süslediler birlikte
Altından taçlar ile, rengârenk giysilerle

[261] Bêjeya “xas”, di wateya kesên bijarte û pêşketî de ye.

[261] “Has”, seçkin ve ileri gelenler demektir.

Me'elqise, dibên xoş xwestî destûr	*Sözün özü derler ki, hoşça izin istedi*
Ewî Şehzadeyê gel Se'dê mexmûr	*Şehzadeyle birlikte, mahmur olan Sad ile*
Dû'a kir hem ji wî ra Şahê mehrû	*Dua etti hem ona, yüzü ay misali Şah*
Digel Taculmilûk û Serwebanû	*Beraber Tacülmülûk, hem Servi Hatun bile*
Dibên bû hizingahek rabû dîsa	*Derler ki hüzün oldu, kabardı yeni baştan*
Di hîna meş'ela hibbê weh îsa	*Sevginin meşalesi, parıldayınca böyle*
Melekzade dibê hat bê nezîre	*Derler benzersiz olan, melek yavru misali*
Dibên bûse dida du destê Mîre	*Verirlerdi buseler, iki elinden Beyin*
Dû'a kir wî ji bona Şahê şehbal	*Şehbal Şah'a Şehzade, etti nice dualar*
Bi dewlet baqî yû ferxende-îqbal	*Devleti daim olsun, ikbali kutlu diye*
Mihessel, xwestî destûr wê ji babe	*Kısaca istedi o, babasından iznini*
Ji Serwebanûyê hem pirr hîcabe	*Hem de Servi Hatun'dan, fazlaca utanarak*
Bi emrê Şahê şehbalê minewwer	*Şehbal Şah'ın emriyle, o aydın ve nurlu kişi*
Cem' bûn û 'efarît cimle yekser	*Toplandılar hep birden, ifritlerle beraber*
Li wan bar kir ewan durr û cewahir	*Yüklediler onlara, inci ve cevherleri*
Ji enwa'ê meta'ê cimle nadir	*Çeşit çeşit eşyalar, tümü kıymetli mallar*

Bi sê sa'et ji Serendîb bi Misrê
Ewan çadir vedan û hem bi fecrê

Cewab çû Şahê 'Asimê minewwer
Ku hat Seyfulmilûk û cimle yekser

Dû'a kir wî ji bo Xaliq sena kir
Sicûda şukrê wê gavê eda kir

Wekî 'Asim ku dît rûyê Seyf
Dibê bûsî serî yû seyfê keff

Meramê wan ku hasil bû bi sohbet
Ewe qenc em bikin vê qissê temmet

Serendip'ten Mısır'a, üç saatlik konakta
Kurdular çadırları, hem de fecir vaktinde

Ulaştırdılar haber, görgülü Şah Asım'a
Ki gelmişler dediler, Seyfülmülûk ve herkes

Dua etti, ayrıca, Yaratıcıya övgüyle
Şükür secdesini hem, etti eda o anda

Asım ki gördüğünde, Seyfülmülûk yüzünü
Derler buseler verdi, başına avucuna

Arzuları ki oldu, sohbetlerle onların
Biz de tamam edelim, iyisi mi öyküyü.

D A W Î

S O N

PAŞBEND/EKLER

1) Nusxeya Mela Bekir ya di dest me de (bi navê nusxeya British jî tê nasîn), ji serî heta malika 441î kêm e. Ev nusxe, pişti 11. beyta Xezela 2. dest pê dike. Ji bilî wê, ji beyta 1108. heta beyta 1409. kêm e. Beytên kêm, bi gişti 742 heb in.

2) Ev malikên jêr, di nusxeya Mela Bekir û di nusxeya Mela Ahmed de (xebata Celîlê Celîl) derbas dibin, lê di nusxeya Mela Muhyiddîn de derbas nabin. Malikên kêm ev in:

"Gehî ba çeng û nay û xemr û caman
Gehî xwarin ji enwa'ê te'aman."

(Nîşe: Ev malika jor, di vê xebata de di navbera malikên 1018 – 1019an de cih digire.)

"Bê ser û pa şibhê goyê, dil ji min bir ca'd û mûyê
Mailê çeşm û birûyê, an mehê taban im ez

Mah û xurşîdên minewwer, best û seywanên midewwer
Xoş dibîn zilfê mi'enber, sinbil û reyhan im ez

Sinbil û reyhan û sorgul, rast û çep bûne miqabil
Lew dinalim şibhê bilbil, teyrê xoşelhan im ez

Lehn û awazê 'uşşaqan, tên ji hibba sîm û saqan
Dad ji dest derd û firaqan, waleh û heyran im ez

Waleh û heyran û dîn im, serxoşê camê yeqînim
Sakinê beytulhezîn im, çav li rê canan im ez

1) Molla Bekir'in mevcut nüshası (British nüshası olarak da bilinir), başından itibaren 441. beyte kadar eksiktir. Bu nüsha, 2. Gazel'in 11. beytinden itibaren başlamaktadır. Ayrıca, 1108'inci beyitten 1409'uncu beyte kadar da eksiktir. Eksik beyitlerin tamamı, 742 adettir.

2) Aşağıdaki beyitler, Molla Bekir ile Molla Ahmed'in nüshasında (Celilê Celîl'in çalışması) geçerken, Molla Muhyiddin'in nüshasında (esas aldığımız nüsha) geçmemektedir. Eksik beyitlerin Türkçe çevirisi, aşağıdaki gibidir.

"Bazen çenk ve ney ile, hem içki ve kadehler
Bazen yemek, yiyecek, her çeşitten taamlar."

(Not: Bu yukarıdaki beyit, bu çalışmanın 1018 – 1019 beyitleri arasındadır.)

"Top gibi elsiz, ayaksızım, aldı götürdü gönlümü, kumral saçlar ile teller
Kaşla gözüne meyyalim, şu parlayan mehtabın ben

Işık saçan ay ve güneş, yuvarlak çardak, bahçeler
Hoş kokuyor amber zülüfler, sümbülle reyhanım ben

Sümbül, reyhan ve kırmızı gül, sağdan, soldan karşılıklı
Ondandır inliyorum bülbül gibi, hoş nağmeli kuşum ben

Gelmektedir aşıkların ezgi, avazı, sevgisinden gümüşî tenlerin
Sızlıyorum elinden dert, ayrılığın, şaşkın ve hayretteyim ben

Şaşkın, hayretlerde ve deliyim, sarhoşuyum yakîn kadehinin
Hüzün evinin sakiniyim, gözlüyorum yolunu sevgilinin

Çav li rêya mahitab im, nale çun çeng û rubab im
Aşiqê rend û xerab im, mest û sergerdan im ez

Mest û sergerdan û serxoş, gahî hişyar, gahî bêhûş
Dilbirîndar û siyahpoş, pir kul û kovanim ez”

(Nîşe: Malikên li jor, berdewamiya Xezel-8. e. Di nusxeya ber destê me de, ev xezel 8 malik e, lê di nusxeya navborî de 15 malik e.)

“Nebîtin kes giriftarê firaqê
Xisûsan derd û daxê îştiyaqê
Eger waqi’ bibit yek merdê dilêr
Dibîtin rûbe ew eslanê wek şêr”

(Nîşe: Herdu malikên li jor, di xebata me de di navbera malikên 1076 – 1077an de cih digirin.)

3) Malikên jêrîn, di nusxeya Mela Ahmed de (xebata Celîlê Celîl) derbas dibe, lê di nusxeya Mela Bekir û ya Mela Muhyîddîn de derbas nabin. Li jêr, ev malikên kêm, bi awayekî latinîzekirî dixuyin:

“Şehê Şehbal ku nameyek selamî
Di gel izaz ji bona Şahê Şamî

Verêkir name, paşê go peyam e
Ji bo Salihê Poşîn Îbni Hame

Selam ken hûn li ‘am û hem xewasan
Xisûsan bab û dan, cimle û nasan

Gözlemekteyim yolunu mehtabın, inlemekteyim çenkle rübap gibi
Aşığıyım iyiyle kötünün, mest ve sersemim ben

Mest, sersem ve sarhoşum, bazen uyanık, bazen akıldan boşum
Yüreği yaralı, siyaha bürünmüşüm, çok yaralı, dertliyim ben."

(Not: Yukarıdaki beyitler, "Gazel-8"in devamıdır. Elimizdeki nüshada toplamda 8 beyit olan bu gazel, adı geçen diğer nüshalarda 15 beyittir.)

Sakın olmasın kimse, ayrılığa giriftar
Özellikle arzunun, derdine ve dağına
Yakalanmışsa şayet, ona bir yiğit adam
Aslan iken o kişi, dönüverir tilkiye

(Not: Yukarıdaki iki beyit, bu çalışmanın 1076 – 1077'inci beyitleri arasındadır.)

3) Aşağıdaki beyitler, Molla Ahmed'in nüshasında (Celîlê Celîl'in çalışması) geçerken Molla Bekir ve Molla Muhyiddin'in (esas aldığımız) nüshalarında geçmemektedir. Eksik beyitlerin Türkçe çevirisi aşağıdaki gibidir:

"Yazdı selama dair, bir mektubu Şehbal Şah
Şam Şahı'na yönelik, saygısıyla birlikte

Gönderdi mektubunu, ardından mesajında
Salih Poşin adına, ki Ham'ın oğludur o

Selam ediniz dedi, halka ve seçkinlere
Husussan anne, babam, bütün tanıdıklara

Li paşan ku ji bo wan kir wesiyet
Dibarin wî ji çavan etkî şefqet

Şahê Şehbal bi tertîb û bi temcît
Kirin ehazir li wê dused efarît”

(Nîşe: Malikên li jor, di xebata me de di navbera malikên 2829 – 2830 de cih digire.)

“Li paşê wî ji bo Sadê dilawer
Çû bûsî yedê şah xweste mehê enwer
Li paşan kirne şadî yû neşate
Di gel xwe anîn şerbet û simate”

(Nîşe: Malikên li jor, di xebata me de di navbera malikên 2857 – 2858an de cih digire.)

“Ji wan wan dûr bûn cefa û derd û zehmet
Ji qelbê wan biderket kerb û heybet

Di hîna eskerê zulmetê çû mexrîb
Tilu’ê fecrê da baxê Serendîb

Li paşê bû tilû’ şahê nihûman
Munewwer kir xewas, hem ewaman

Ji xew rabûn temam, şah û begler
Wereng şahzade ra bû dil munewwer

Ardından ki onlara, bulundu vasiyette
Yağıyor gözlerinden, gözyaşları şefkatin

Tertip ile Şah Şehbal, hem de tekrar ederek
Hazırlattı orada, iki yüz kadar ifrit."

(Not: Yukarıdaki beyitler, bu çalışmanın 2829 – 2830'inci beyitleri arasındadır.)

"Ardından ki Şehzade, yiğit Sad'ın adına
Öptü elini Şah'ın, istedi parlak ayı
Ardından ki ettiler, keyif ile eğlence
Getirttiler beraber, şerbet ile sofralar"

(Not: Yukarıdaki beyitler, bu çalışmanın 2857 – 2858'inci beyitleri arasındadır.)

"Uzaklaştı onlardan, çile, dert ile zahmet
Kalplerinden onların, çıktı kaygı, endişe

Karanlığın askeri, gittiklerinde batmaya
Vurdu fecrin ışığı, Serendip bağlarına

Ardından doğwerdi, dokuzuncular şahı
Aydınlattı herkesi, sıradanla seçkini

Uykudan uyandılar, tüm şahlar ile beyler
Aydınlandı bu tarzda, yüreği Şehzade'nin

Xiramîn ber bi şahî bi nik mexmûr
Çû kir qesdê bixwazîtê wî destûr

Çira ku wî dikir pirr cehd û fexrê
Ku ew wasil bibî der şehrê Misrê”

(Nîşe: Malikên li jor, di xebata me de di navbera malikên 2871 – 2872an de cih digire.)

Kirin hazir efarîtan bi carek,
Ji boy çûyîn kirin wan xweş tedarek.

(Nîşe: Malikên li jor, di xebata me de di navbera malikên 2878 – 2879an de cih digire.)

“Emir kir ser ‘efarîtan hilînin
Di gel hurmet, eziyet ew nebînin

Meger ew çûn hilanîn wan ‘efarît
Kirin seyran û geşt û kêyf û temşît

Wereng rabûn wekî ebr û nemê
Bilind bûn û berê xwe dane Şamê

Werengî ew diçûn bi keyf û dilxweş
Nebûn esla ji wan şeyek mişewweş

Bi rê bûn ew bi şadî û bi fexrê
Heta ew çûn gihane qurbê Misrê”

(Nîşe: Malikên li jor, di xebata min de di navbera malikên 2879 – 2880an de cih digire.)

Şah'a doğru gittiler, mahmurca sallanarak
Amaçları onların, istemekti iznini

Zira ki fazlasıyla, gayretiydi, överdi
Kavuşabilmek için, şehrine o Mısır'ın"

(Not: Yukarıdaki beyitler, bu çalışmanın 2871 – 2872'inci beyitleri arasındadır.)

Hazırlandılar ifritler, birden bütün olarak
Gitmek üzere onlar, tam hazırlık yaptılar

(Not: Yukarıdaki beyitler, bu çalışmanın 2878 – 2879'inci beyitleri arasındadır.)

Emretti ifritlere, ki kaldırın onları
Saygılı davranınız, çekmesinler eziyet

Ve böylece ifritler, gittiler kaldırmağa
Ettiler seyir, gezi, keyif ile seyahat

Kalktılar hep o tarzda, bulut, buhar misali
Yükselip yöneldiler, doğruca Şam iline

Giderlerdi öylece, keyifle, mutlulukla
Onlardan olmadı hiç, yanlış, karışık bir şey

Yol aldılar böylece, sevinçle hem gururla
Ta gidip ulaştılar, Mısır'a yakın yere

(Not: Yukarıdaki beyitler, bu çalışmanın 2879 – 2880'inci beyitleri arasındadır.)

"Didan destûr 'efarîtan, ew çûn,
Muferreh ber miqamê xwe ku ew çûn"

(Nîşe: Malikên li jor, di xebata me de di navbera malikên 2880 – 2881an de cih digire.)

Cewab ku çû şehê Asimê mibarek
Digel şoxa Yemenî kir tedarek

(Nîşe: Malikên li jor, di xebata me de di navbera malikên 2881 – 2882an de cih digire.)

4) Ev malikên jêrîn, di nusxeya Mela Bekir û Mela Ahmed de (xebata Celîlê Celîl) derbas dibe, lê di ya Mela Muhyiddîn de derbas nabe. Malikên kêm, ev in:

"Emir kir wî bi çawîş û delalan
Seda kin, kes nemînîte di malan

Çiqasî hebûn xelq di Misrê
Hemî bûn şad û kêyfxoş wekî bedrê

Buhurîn ew ji surûrê û ji şadî
Heta ew çûn gihîştin wî miradî"

(Nîşe: Malikên li jor, di xebata me de di navbera malikên 2883 – 2884an de cih digire.)

"İzin verdi gittiler, o diyardan ifritler
Onlar da makamına, ferah ile gittiler"

(Not: Yukarıdaki beyitler, bu çalışmanın 2880 – 2881'inci beyitleri arasındadır.)

"Haber gitti ulaştı, mübarek Şah Asım'a
Yemenli güzel ile, başladı hazırlığa"

(Not: Yukarıdaki beyitler, bu çalışmanın 2881 – 2882'inci beyitleri arasındadır.)

4) Aşağıdaki beyitler, Molla Bekir ile Molla Ahmed'in (Celil Celil'in çalışması) nüshalarında geçerken, Molla Muhyiddin'in esas aldığımız nüshasında geçmemektedir. Eksik beyitlerin çevirisi aşağıdaki gibidir:

"Emretti çavuşlara, hem tellal kimselere
Seslenin dedi, kimse, kalmasın evlerinde

Ne kadar halk var ise, Mısır ili ehlinden
Tümü mutlu, keyifli, döndüler dolunaya

Sevinçle mutluluktan, dönüverdi başları
Nihayet kavuştular, muratlarına onlar"

(Not: Yukarıdaki beyitler, bu çalışmanın 2883 – 2884'üncü beyitleri arasındadır.)

YARARLANILAN KAYNAKLAR

TDV İslam Ansiklopedisi, Komisyon, 1988-2013, İstanbul

Firdevsî, *Şehname*, MEB, 1990, Ankara

İlhan Ayverdi, *Kubbealtı Lügati*, Kubbealtı Neşriyat, 2016, İstanbul

Ahmed Hilmî Qoxî, *Dîwana Camî'*, İhsan Yayınları, İstanbul, 2004

Celîlê Celîl, *Siyahpûş, Seyfulmuluk*, Wien, 2000

Baba Merduh Rûhanî, *Tarih-i Meşahir-i Kürd* (Kürt Meşhurları Tarihi), c. 1, Farsça 2. baskı, Tahran 1382

Zeynelabidin Amedî, *Dîwana Siyahpoşê Diyarbekrî* (Diyarbakırlı Siyahpûş'un Divânı), Diyarbakır, 2005

Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî* (Kürt Edebiyat Tarihi), c. 1, Stockholm 1983

Seyid Kafî 'Elewî, *Sîyahpoş û Çêrista Wî* (Siyahpûş ve Hikâyesi), Ria Taza, s. 12, Ocak 2017 ve s. 13, Ocak 2017 (İlgili link için bkz. https://krd.riataza.com/2017/01/12/siyahpos-u-cerista-wi-1/ ve https://krd.riataza.com/2017/01/13/siyahpos-u-cerista-wi-2/)

M. Reşit Irgat, *Çend Xezelên Siyahpoş* (Siyahpûş'un Bir Kaç Gazeli), Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê (İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları), 1999

DESTANA SEYFULMİLÛK Û
BEDÎULCEMAL

SEYFÜ'L-MÜLÛK VE BEDİÜ'L- CEMÂL

DESTANI

YAZMALARINDAN ÖRNEKLER

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِيمِ

سِيَاهْپُوشِ فَرْمَايَدْ

لِسَرْ لَوْحِ قَلَمْ گَرْيَا ژِ حَقْ دَا ... طُلُوعِ فَجْرِ عِشْقَا قَانْ شَفَقْ دَا

ژِ بِهْنَا غُنْجَهٔ بَاغِ مَيَا صَافْ ... مُعَطَّرْبُو گُلِسْتَانْ قَافِ تَا قَافْ

مَه لَوْحَاتِنْ بِنَظْمِ اِبْنِ حِكَايَتْ ... ژِ نَقْلِ رَاوِيَانْ مِنْ كِرْ رِوَايَتْ

دَرْ اَيَامِ سُلَيْمَانِ پَيَمْبَرْ ... دِ مِصْرِيدَا هَبُو شَاهَكْ مُظَفَّرْ

ژِ عَدْلُ وَ دَادِي وِي عَالَمْ بِرَاحَتْ ... نَبُو قَطْ كَسْ بِزَهْرِ وِي قَبَاحَتْ

پَزُو گُرْ اَوْ بِهَقْرَا چُونْ چِرَاكَاهْ ... نَبُو زَهْرِ گُرَانْ اَنْ هَيْبَتِ شَاهْ

پِجَنْگَالِ سَرِي سِنَانِ زَهْرَابْ ... پَزِي بِيچَارَه رَاكَتْ اَزْ سَرِي خَوَابْ

تَعَالَى اللّٰهْ ژِوِي حُكْمُ وَ عَدَالِي ... ژِوِي جَاهُ وَ جَلَالُ وَ اِيقْبَالِي

خُدَا دَا بُو ژِ بُو عَاصِمْ بِرَحْمَتْ ... خُدِي تُرْسِي وَ تَخْتُوتَاجُ وَ دَوْلَتْ

خُصُوصَا مَدْحِ وِي پِيشِ سُلَيْمَانْ ... دِ گُوطَيْرُو وَحُوشُ وِجِنْ وَ اِنْسَانْ

دِ عَالَمْ دَا گَرَا بُو نَامُ وَ نَامُوسْ ... بِقَنْجِي لِيدِدَا اَوَازَهْ كُوسْ

دِ بَرْ حُكْمِ وِيدَا جَايِ خَرَابَه ... نَمَا بُو تُوَ اِشَارَهْ كِي سَبَابَه


چِه جَايِ كُو هَبُو خُوشْ اَبَدَانِي ... تِي دَا نِيبُو شَهِي جَنَّتْ مَكَانِي

چِه بِيزِمْ حُكْمِ وِي عَالِي جَنَابِي ... دِهُ وَ قَرْيَه تَمَامْ نَائِبِنْ حِسَابِي


"Nusxeya ku Zeynelabidîn Çiçek ji ber nivîsiye." / Zeynelabidîn Çiçek tarafından istinsah edilen nüsha (Bedirhan İpek arşivi)



"Nusxeya ku Melle Muhyiddîn ji ber nivîsiye." / Molla Muhyiddin tarafından istinsah edilen nüsha (Hattat Mehmet Ali Caduk arşivi.)



"Nusxeya Melle Bekir (Nusxeya British)" / Molla Bekir Nüshası (British Nüshası) (Bedirhan İpek arşivi)



"Nusxeya Melle Bekir (Nusxeya British)" / Molla Bekir Nüshası (British Nüshası) (Bedirhan İpek arşivi)